Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik

Doç. Dr. Abdurrahman Adak



Nûbihar

3. çapa

CamScanner ile tarandı

Nûbihar: 153
Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk
Doç. Dr. Abdurrahman Adak

Editor
Süleyman Çevik

Kapak
İHB Reklam Ajansı

Mizanpaj
Dawud Rêbiwar

Çap
Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağ. San.
Tic. Ltd. Şti. Orta Mah. Fatin Rüştü Sk.
No: 1-3/A Bayrampaşa / İstanbul
Tel: 0212 612 95 59

Çapa Yekem: 2013
Çapa Sêyem: 2015

ISBN: 978-605-5053-04-8
Yayın Sertifika No: 16919

Nûbihar
Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti.
Büyük Reşitpaşa Cad.
Yümni İş Merkezi No: 22/29
Vezneciler – Fatih / İstanbul
Tel&Faks: 0212 519 00 09
www.nubihar.com | email: nubihar@gmail.com

CamScanner ile tarandı

Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk

Doç. Dr. Abdurrahman Adak

Nûbihar

CamScanner ile tarandı

Doç. Dr. Abdurrahman Adak - Di sala 1977an de li Hezexê hat dinyayê. Di sala 1998an de Fakulteya Îlahiyatê ya Zanîngeha Ankarayê xilas kir. Digel perwerdeya fermî perwerdeya medreseyên klasîk jî wergirt. Piştî ku sê salan (1999-2002) li Diyarbekirê mamostetî kir, di sala 2003yan de li Zanîngeha Dîcleyê Fakulteya Îlahiyatê beşa Edebiyata Tirkî ya Îslamî de dest bi wezîfeyê kir. Di sala 2006an de li Enstîtuya Zanistên Civakî ya Zanîngeha Ankarayê, di warê Edebiyata Tirkî ya Îslamî de bernameya doktorayê xilas kir.

Di sala 2009an de ji bo ku di damezirandina beşa Kurdî de cih bigire derbasî Zanîngeha Mardîn Artukluyê bû. Di sala 2013an de pileya doçentiyê bi dest xist. Niha li Zanîngeha Mardîn Artukluyê wekî Serokê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî dixebite.

Pirtûkên wî yên ku heta niha hatine weşandin ev in:

1. *Sultan Memduh Divanı* (Mahzenu'l-Esrar) I-III berg (Wergera ji Erebî û Farisî bi bal Tirkî ve, digel lijneyê), Siirt 2009.
2. *Müntehebat-ı Fahrî*, (Wergera ji Erebî û Farisî bi bal Tirkî ve, digel lijneyê), Mevlana Kültür ve Sanat Vakfı Yay. Ankara 2010.
3. *Ali Emîrî Gözüyle Diyarbakırlı Şairler*, Kent Işıkları Yay. İst. 2011.
4. *Za'fî-i Gülşenî Divanı*, Kent Işıkları Yay. İst. 2011.
5. *Kurdî 5 - Kurdî 6 Pirtûka Dersê ji bo Dibistanên Navîn*, (digel lijneyê) Weş. Wezareta Perwerdeyê, Ankara 2012.

CamScanner ile tarandı

Ji bo ezîza dilê min,
bînahiya çavên min,
diya min a tebîetmelek
û gorbihişt
Fatima Mela Xelîl
yadîgar e.

CamScanner ile tarandı

NAVEROK



PÊŞGOTIN 18
JI BO ÇAPA DUYEM ÇEND GOTIN 23
DESTPÊK 25
TÊGEHA EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK 27
I. EDEBIYAT Û WÊJE 27
II. EDEBIYATA ZAREKÎ Û EDEBIYATA NIVÎSKÎ 30
III. EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK Û ÇAVKANIYÊN WÊ 32
A. PÊNASEYA EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK 31
B. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK 32
1. SEYRA TARÎXÎ 33
2. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK 36
IV. ZANISTÊN BINBEŞ ÊN EDEBIYATA KLASÎK 43

BEŞA YEKEM
ÇAVKANIYÊN TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ 47
DESTPÊK 47
1. DI EDEBIYATÊN ROJHILATÊ DE ÇAVKANIYÊN TARÎXA EDEBIYATÊ 49
2. DI EDEBIYATA KURDÎ DE ÇAVKANIYÊN TARÎXA EDEBIYATÊ 51

BINBEŞA YEKEM / SERDEMA KLASÎK 52
I. DI SERDEMA KLASÎK DE ÇAVKANIYÊN EDEBIYATA KURDÎ 52

CamScanner ile tarandı

A. RÎSALEYA "ŞA'IR Û MUSENNEFÊN DI KURDISTANÊ"
YA MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ 53
B. MECMÛ'EYÊN HELBESTAN 54

BINBEŞA DUYEM / SERDEMA MODERN 56
I. LI GORÎ KRONOLOJIYÊ QONAXÊN
ÇAVKANIYÊN TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ 57
A. QONAXA DESTPÊKÊ (DAWIYA OSMANIYAN) 57
B. QONAXA KURDISTANA BAŞÛR 59
C. QONAXA ŞAMÊ 60
D. QONAXA RÛSYAYÊ 61
E. QONAXA DIYASPORAYÊ 62
F. QONAXA KURDISTANA BAKUR 62
G. QONAXA KURDISTANA ROJHILAT 63
II. LI GORÎ CUREYAN ÇAVKANIYÊN TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ 63
A. ÇAVKANIYÊN SEREKE 63
1. BERHEMÊN TARÎXA EDEBIYATÊ 64
1.1. Bi Kurdiya Soranî û Herfên Erebî 65
1.2. Bi Kurdiya Kurmancî û Herfên Erebî 69
1.3. Bi Kurdiya Kurmancî û Herfên Latînî 70
1.4. Bi Rûsî 75
1.5. Bi Erebî 76
2. MEQALE Û NIVÎSÊN LI SER TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ 78
3. ANTOLOJÎ Û BERHEVOK 79
4. BERHEMÊN DESTPÊKA EDEBIYATÊ 86
5. MONOGRAFIYÊN BAJARAN 87
6. MONOGRAFIYÊN JINAN 89
B. ÇAVKANIYÊN TALÎ: BIYOGRAFIYÊN GIŞTÎ 90
1. LI KURDISTANA BAŞÛR 90
1.1. Bi Soranî 90
1.2. Bi Erebî 91
2. LI KURDISTANA ROJHILAT 92
2.1. Bi Soranî 92
2.2. Bi Farisî 93

CamScanner ile tarandı

3. LI KURDISTANA BAKUR....93
3.1. Bi Kurdiya Kurmancî....93
3.2. Bi Tirkî....94
4. LI DIYASPORAYÊ....95
4.1. Bi Erebî....95
III. BERHEMÊN BÎBLIYOGRAFÎK....96
PÊVEK I....99
LI GORÎ KRONOLOJIYÊ ÇAVKANIYÊN
SEREKE YÊN TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ....99
PÊVEK II....101
LI GORÎ KRONOLOJIYÊ ÇAVKANIYÊN TALÎ
YÊN TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ....101
PÊVEK III....102
TABLOYA KATEGORÎK A ÇAVKANIYÊN SEREKE....102

BEŞA DUYEM
TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK....105
DESTPÊK....107
BI AWAYEKÎ GIŞTÎ TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ....107
I. EDEBIYATA KURDÎ YA BERÎ ÎSLAMÊ Û PIŞTÎ ÎSLAMÊ....108
A. EDEBIYATA KURDÎ YA BERÎ ÎSLAMÊ....109
B. EDEBIYATA KURDÎ YA PIŞTÎ ÎSLAMÊ....114
II. DIYALEKTÊN KURDÎ Û NAVENDÊN WAN ÊN EDEBÎ....114
A. DIYALEKTÊN KURDÎ....114
B. NAVENDÊN EDEBÎ YÊN DIYALEKTÊN KURDÎ....115
1. EDEBIYATA KURDIYA LORÎ....116
2. EDEBIYATA KURDIYA GORANÎ....116
3. EDEBIYATA KURDIYA KURMANCÎ....118
4. EDEBIYATA KURDIYA SORANÎ....119
5. EDEBIYATA KURDIYA ZAZAKÎ....119

BINBEŞA YEKEM / EDEBIYATA KURDIYA LORÎ....120
BABA TAHIRÊ URYAN....120

CamScanner ile tarandı

C. MEWLEWÎ / ME'DÛMÎ 154
D. MESTÛRE MAHŞEREF XANIMA KURDISTANÎ 158
BINBEŞA SÊYEM / EDEBIYATA KURDIYA KURMANCÎ 161
I. SERDEMA BERÎ MÎREKTIYAN 162
A. SERDEMA BERÎ HIKÛMETÊN KURDAN 163
B. SERDEMA HIKÛMETÊN KURDAN 163
1. HESENÊ PEŞNEWÎ 166
2. EVDISEMEDÊ BABEK Û HELBESTEKE BI GUMAN 167
3. EDEBIYATA ÊZÎDIYAN 169
3.1. Êzîdîtî 170
3.1.1. Şêx 'Edî 170
3.1.2. Mishefa Reş 171
3.1.3. Şêx Hesenê Hekkarî 171
3.1.4. Ebu'l-Berekatê Hekkarî 172
3.2. Edebiyata Êzîdiyan 172
3.2.1. Şêx Fexirê Adiyan 173
3.2.2. Komkirina Qewlên Êzîdiyan 175
3.2.3. Ji Qewlên Êzîdiyan Çend Mînak 176
II. SERDEMA MÎREKTIYAN 183
DESTPÊK 183
A. PEYDABÛNA LÎTERATURA VÊ SERDEMÊ 183
B. DABEŞKIRINA VÊ SERDEMÊ 186
1. LI GORÎ ASTA BERHEMÊN EDEBÎ 186
2. LI GORÎ MÎREKTÎ Û DEVERAN 187
3. LI GORÎ SEDSALAN 189
I. JI DESTPÊKA MÎREKTIYAN HETA BI TIFAQA KURD OSMANIYAN REWŞA EDEBIYATA KURDÎ 191
A. DI VÊ SERDEMÊ DE GIRÎNGIYA MÎREKTIYA BEDLÎSÊ 192
B. ŞIKRIYÊ BEDLÎSÎ 193
II. JI TIFAQA KURD OSMANIYAN HETA BI DAWIYA MÎREKTIYAN REWŞA EDEBIYATA KURDÎ 195
DESTPÊK 195
1. TIFAQA KURD Û OSMANIYAN 195
2. DI SERDEMA MÎREKTIYAN DE DESTHILATDARÎ

CamScanner ile tarandı

Û PERWERDEYA BI KURDÎ 197
A. SEDSALA ŞAZDEHEM 200
1. MÎR YE'QÛBÊ ZIRKÎ 200
2. ELIYÊ HERÎRÎ 202
B. SEDSALÊN ŞAZDEHEM Û HIVDEHEM 208
1. MELAYÊ CIZÎRÎ 208
2. FEQIYE TEYRAN 232
3. MÎR ÎMADEDÎNÊ HEKKARÎ 243
C. SEDSALA HIVDEHEM 244
1. DI SEDSALA HIVDEHEM DE NEZM/HELBESTA KURDÎ 245
1.1. ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ QUTBÊ EXLATÎ 245
1.2. EHMEDÊ XANÎ 250
1.3. REMEZANÊ CIZÎRÎ 260
1.4. AXAOKÊ BÊDARÎ 263
1.5. XALID AXAYÊ ZÊBARÎ/LAXER 264
1.6. MELA REMEZANÊ EBBASÎ 266
2. DI SEDSALA HIVDEHEM DE PEXŞANA KURDÎ 267
2.1. ELIYÊ TEREMAXÎ 268
D. SEDSALA HIJDEHEM 270
1. DI SEDSALA HIJDEHEM DE NEZM/HELBESTA KURDÎ 271
1.1. MELAYÊ BATEYÎ 271
1.2. SELÎMIYÊ HÎZANÎ 284
1.3. HARISÊ BEDLÎSÎ 288
1.4. MELA MENSÛRÊ GIRGAŞÎ 293
1.5 SEYFIYÊ ŞÛŞÎ 294
1.6. ÎSMAÎLÊ BAZÎDÎ 295
1.7. MIRADXANÊ BAZÎDÎ 296
1.8. MACIN 297
1.9. MÎNA Û SADIQ 299
1.10. ŞÊX XALIDÊ ZÊBARIYÊ YEKEM 301
1.11. BASILYOS ŞEMÛN II 303
2. DI SEDSALA HIJDEHEM DE PEXŞANA KURDÎ 304
2.1. MELA YÛNISÊ HELQETÎNÎ 305
2.2. MELAYÊ ERWASÎ 308

CamScanner ile tarandı

E. SEDSALÊN HIJDEHEM Û NOZDEHEM 310
1. DI SEDSALÊN HIJDEHEM Û NOZDEHEM DE NEZM/HELBESTA KURDÎ 311
1.1. SIYAHPOŞ 311
1.2. PERTEW BEGÊ HEKKARÎ 317
1.3. WEDA'Î 321
1.4. ŞÊX NÛREDÎNÊ BIRÎFKANÎ 322
1.5. MELA XELÎLE SÊRTÎ 325
1.6. FEQE REŞÎDÊ HEKKARÎ 331
1.7. BEKIR BEGÊ ERIZÎ 332
1.8. MIHEMED TEYAR PAŞAYÊ AMÊDIYÊ 333
1.9. ŞÊX EHMEDÊ FEQÎR 334
2. DI SEDSALA NOZDEHEM DE PEXŞANA KURDÎ 340
2.1. MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ 340
2.2. ŞERHA "CAMÊ WEHDET" 342

BINBEŞA ÇAREM / EDEBIYATA KU RDIYA SORANÎ 344
I. DESTPÊKA EDEBIYATA KURDIYA SORANÎ 344
II. DAMEZIRÊNERÊN HELBESTA SORANÎ 346
A. NALÎ 346
B. SALIM 348
C. KURDÎ 351

BINBEŞA PÊNCEM / EDEBIYATA KURDIYA ZAZAKÎ 353
I. PEYDANEBÛNA EDEBIYATA KURDIYA ZAZAKÎ DI SERDEMA MÎREKTIYAN DE 353
II. NÛNERÊN PÊŞÎ YÊN EDEBIYATA KURDIYA ZAZAKÎ YA KLASÎK 355
A. MELA EHMEDÊ XASÎ 355
B. OSMAN ES'ED EFENDÎ BABIJ 358

BEŞA SÊYEM
DI HELBESTA KLASÎK DE RUXSAR 361
DESTPÊK 362
LÊKOLÎNA LI SER METNÊ EDEBÎ 363

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA YEKEM / KÊŞA ERÛZÊ 365
DESTPÊK 365
1. Pênaseya Erûzê 365
2. Dîroka Kêşa Erûzê 365
I. QALIBÊN ERÛZÊ Û TEF'ILE 367
II. BEHRÊN ERÛZÊ 368
III. DÎTINA QALIBÊN ERÛZÊ 369
A. KURTÎ Û DIRÊJIYA HÊCEYAN 376
B. TEQTÎ' 377
IV. QUSÛRÊN HELBESTVAN: ZÎHAF Û ÎMALE 380
V. DI DÎTINA QALIBÊ ERÛZÊ DE ÇEND NÎŞEYÊN GIRÎNG 382
VI. DI ÇARÇOVEYA "NÛBIHARA BIÇÛKAN" DE QALIBÊN ERÛZÊ 383
VII. MÎNAK Û RAHÊNAN 385
..... 390

BINBEŞA DUYEM / SERWA Û PAŞSERWA 395
I. SERWA 395
A. LI GORÎ CIH CUREYÊN SERWAYÊ 395
1. SERWAYA BÊPAŞSERWA 395
2. SERWAYA BIPAŞSERWA 396
B. LI GORÎ HEVBEŞIYA DENGAN CUREYÊN SERWAYÊ 397
1. SERWAYA MUCERRED 397
2. SERWAYA MUREKKEB 397
2.1. Serwaya Murdef 397
2.2. Serwaya Muqeyyed 398
2.3. Serwaya Muesses 398
II. PAŞSERWA 399
A. QERTAF 399
B. QERTAF Û BÊJE/KOMBÊJE 399
C. TENÊ BÊJE/KOMBÊJE 400

BINBEŞA SÊYEM / TEŞEYÊN NEZMÊ 401
DESTPÊK 401
A. NEZM Û HELBEST 401

CamScanner ile tarandı

B. YEKEYÊN HERÎ BIÇÛK ÊN NEZMÊ 403
1. Misra 403
2. Beyt 403
3. Bend 404
I. TEŞEYÊN NEZMÊ YÊN KU JI BEYTAN PÊK TÊN 405
A. QESÎDE Û XEZEL 405
1. QESÎDE 405
2. XEZEL 409
2.1. Xezela Mustezad 412
2.2. Xezela Musemmet 416
B. MESNEWÎ 417
II. TEŞEYÊN NEZMÊ YÊN KU JI ÇAR MISRAYAN PÊK TÊN 423
A. RUBA'Î 423
B. DUBEYTÎ 424
III. TEŞEYÊN NEZMÊ YÊN KU JI BENDAN PÊK TÊN / MUSEMMET 427
A. KOMA YEKEM 427
1. YÊN KU JI ALIYÊ HELBESTVANEKÎ VE TÊN NIVÎSANDIN 428
2. YÊN KU JI ALIYÊ DU HELBESTVANAN VE TÊN NIVÎSANDIN 431
B. KOMA DUYEM: TERKÎB-BEND Û TERCÎ'-BEND 437
IV. TEŞEYÊN HEVPAR 444
A. NEZÎRE 444
B. MULEMMA 447

BINBEŞA ÇAREM / TEŞEYÊN BERHEMÊN KLASÎK 450
I. DÎWAN 450
II. DÎWANÇE 452
III. MECMÛ'E 452
IV. MESNEWÎ 453
V. MENZÛME 453

REFERANS 455

CamScanner ile tarandı

KURTEBÊJE

Amd.	: amadekar
b.	: berg
b.c.	: bêcih
b.d.	: bêdîrok
bnr.	: binêr
b.n.	: berhema navborî
g.n.	: gotara navborî
h.b.	: heman berhem
h.g.	: heman gotar
h.c.	: heman cih
hwd.	: her wekî dî
hj.	: jimar
k.d.	: koça dawiyê
r.	: rûpel
s.	: sal
t.ç.	: teza çapnebûyî
wer.	: wergêr
weş.	: weşan, weşanxane

CamScanner ile tarandı

PÊŞGOTIN

Edebiyata Kurdî ya klasîk edebiyateke nivîskî ye û di serdema Îslamê de di bin bandora unsurên dînî, Erebî, Farisî û çanda Îranê de li gorî hinek rêzikan derketiye meydanê. Ev edebiyat, zanistên binbeş ên wekî tarîxa edebiyatê, kêşa erûzê, serwa (qafiye), paşserwa (redîf), teşeyên nezmê (şiklên nezmê), rewanbêjî (belaxet), ciwankarî (hunerên edebî), cureyên edebî, şîroveya metnan û edebiyata berawirdkarî (edebiyata muqayeseyî) di xwe de dicivîne ku ji van zanistan bi taybeti tarîxa edebiyatê ji aliyê girîngiyê ve zêdetir derdikeve pêş. Tarîxa edebiyatê li ser metnên edebî û nivîskarên wan ên ku di pêvajoya tarîxê de derketine meydanê radiweste. Di lêkolînên edebiyatê de ev metnên edebî materyalên sereke ne û zanistên dî yên navborî ji bo têgihîştina van metnan arîkar in. Eger metnên edebî tinebin îmkana tetbîqa zanîstên teorîk namîne. Ji ber vê yekê jî di nav binbeşên edebiyata klasîk de ya herî girîng zanista tarîxa edebiyatê ye.

Di çarçoveya tarîxa edebiyata Kurdî de derbareyê metnên edebî, lê zehftir jî derbareyê nivîskarên wan metnan de heta niha gelek berhem hatine nivîsandin. Di vî warî de yekemîn car Emîn Feyzî, di sala 1920/1921ê de li Stenbolê bi navê "Encumenî Edîbanî Kurdî" berhemek nivîsandiye. Piştî Emîn Feyzî bi nîv qernî vê carê li Kurdistana Başûr bi navê "tarîxa edebiyatê" çend berhemên hêja hatine dayîn ku "Mêjûy Edebî Kurdî" ya Elaedînê Secadî û "Mêjûy Edebî Kurdî" ya Me'rûf Xeznedar di vî warî de du berhemên gelekî hêja ne. Ji bilî van

CamScanner ile tarandı

her duyan berhema Sedîq Sefîzade Borekeyî ya bi navê "Mêjûy Wêjeyî Kurdî" ku li Kurdistana Rojhilat hatiye nivîsandin divê neyê jibîrkirin. Ev her sê berhem jî, ji ber ku bi Kurdiya Soranî û bi herfên Erebî hatine nivîsandin, Kurdên Bakur heta niha derfet nedîtine ku ji wan sûd wergirin. Lê vê dawiyê ji aliyê Kurdên Bakur ve li Tirkiyeyê bi Kurdiya Kurmancî û bi herfên latînî du berhemên tarîxa edebiyata Kurdî hatin weşandin ku yek ji wan "Tarîxa Edebyeta Kurdî" ya Qenatê Kurdo û ya dî jî "Dîroka Wêjeya Kurdî" ya Feqî Huseyn Sağnıç e.

Ji bilî berhemên tarîxa edebiyatê jî, di warê kesayetên edebî yên Kurdînûs de çi bi Kurdî û çi bi Erebî, Farisî yan jî Tirkî gelek gotar, antolojî, berhevok û monografiyên dî hatine nivîsandin. Lê ji ber ku beşeke serbixwe ya vê xebatê ji bo van berheman hatiye terxankirin em dê li vir yek yek li ser navê wan ranewestin.

Bêguman perspektîfa akademîk a li ser edebiyata Kurdî ya klasîk û di vî warî de kirina lêkolînên zanistî rasterast û di pileya yekem de daxwaza zanîna kîtabiyat û lîteratura tarîxa edebiyatê dikin. Herweha li ser esasên agahiyên di vê lîteraturê de bi şêweyekî sîstematîk tesbîtkirina qonax, kesayet, metin û ekolên tarîxa edebiyatê jî di pileya duyem de cih digire. Piştî vê merheleyê jî, vê carê wekî pileya herî dawî, bi awayekî spesîfik û bi hûrgilî û bi arîkariya zanistên teorîk ên edebiyatê dor tê ser vekolînên li ser metnên edebî.

Paralelî vê perspektîfa sêgoşeyî di vê pirtûkê de jî hewl hatiye dayîn ku di çarçoveya sê beşên sereke de pêşî çavkaniyên tarîxa edebiyata Kurdî yên heyî bên nasandin, piştre tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk bi şêweyekî sîstematîk bê pêşkêşkirin û herî dawî jî agahiyên teorîk ên edebiyata klasîk bên dayîn. Lê berî her tiştî di destpêka pirtûkê de li ser têgeha edebiyata Kurdî ya klasîk û pênaseya wê hatiye rawestan û çavkaniyên wê yên zanistî, hizrî û hunerî hatine tesbîtkirin.

Di beşa yekem a di bin sernavê "Çavkaniyên Tarîxa Edebiyata Kurdî" de di çarçoveya serdema klasîk û ya modern de li gorî

CamScanner ile tarandı

qonax û cureyan li ser lîteratura çavkaniyên tarîxa edebiyata Kurdî hat rawestan. Di vê beşê de ji bilî çavkaniyên rasterast, derheqê çavkaniyên arîkar (biyografiyên giştî) de jî agahî hatin dayîn. Di vê beşê de ji herêm û zimanên curbicur li ser her cure xebatan hat rawestan. Bi vî awayî lîsteyeke dewlemend derket meydanê. Bêguman ev lîste di lêkolînên tarîxa edebiyata Kurdî de dê wekî rêbernameyekê her dem li ber destan bimîne.

Beşa duyem a bi sernavê "Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasik" beşa herî berfireh û herî girîng a vê pirtûkê ye. Di destpêka vê beşê de li ser mijarên "Edebiyata Kurdî ya Berî Îslamê û Piştî Îslamê" û "Navendên Edebî yên Diyalektên Kurdî" hat rawestan. Piştre ev beş li gorî diyalektên Kurdî li ser pênc binbeşên sereke hat dabeşkirin ku ev binbeş bi rêzê ji edebiyata Kurdiya Lorî, edebiyata Kurdiya Goranî, edebiyata Kurdiya Kurmancî, edebiyata Kurdiya Soranî û edebiyata Kurdiya Zazakî pêk tên.

Di vê beşê de me xwestiye em çar tiştan bi dest bixin:

1. Tesbîtkirina qonaxên edebiyata Kurdî bi giştî: Ji bo vê mebestê edebiyata Kurdî pêşî wekî "berî Îslamê" û "piştî Îslamê" bi bal du qonaxên sereke ve û edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê jî di nav xwe de wekî serdema berî mîrektiyan, serdema mîrektiyan û serdema piştî mîrektiyan bi bal sê qonaxan ve hatiye dabeşkirin.

2. Komkirina edebiyatên her pênc diyalektên Kurdî: Bêguman her diyalekteke Kurdî xwediyê edebiyateke serbixwe ye û di paşerojê de tarîxa her diyalektekê bi şêweyekî serbixwe dê bê nivîsandin. Lê berî vê di çarçoveya edebiyata Kurdî de tesbîtkirina edebiyatên hemû diyalektan bi hev re ji bo bidestxistina yekparetiyê tiştekî zehf girîng e.

3. Bi taybetî tesbîtkirina kesayet û qonaxên edebiyata Kurdiya Kurmancî: Bi giştî di nav edebiyata Kurdî de herçiqas a herî kevin edebiyata Kurdiya lorî jî be, em dikarin bêjin ku wê edebiyatê bi Baba Tahir dest pê kiriye û bi wî qediyaye. Edebiyata Kurdiya Goranî jî herçiqas kevin be, lê wê

CamScanner ile tarandı

jî di serî de hemû taybetiyên edebiyata klasîk di xwe de nehewandine. Edebiyata Kurdiya Soranî di sedsala XIXan de û edebiyata Kurdiya Zazakî jî di sedsala XXan de bi derengî dest pê kirine. Lê dema em li edebiyata Kurdiya Kurmancî dinêrin, em dibînin ku di tarîxa edebiyata Kurdî de cara pêşî edebiyata Kurdiya Kurmancî bi hemû rengên xwe edebiyata klasîk temsîl kiriye û temenê wê ji gişan dirêjtir e. Ji ber vê yekê jî di binbeşa edebiyata Kurdiya Kurmancî ya klasîk de li ser vê mijarê bi firehî hat rawestan. Di vê çarçoveyê de di qonaxa piştî Îslamê de rewşa edebiyata Kurdiya Kurmancî paralelî rewşa siyasî ya tarîxa Îslamê hat nîşandan û nimûne negihîştibin me jî li ser rewşa edebiyata Kurdiya Kurmancî di dewra Emewî, Ebbasî û Akkoyuniyan de jî agahî hatin dayîn. Bi vî awayî hem muqayeseya qonaxên edebiyata Kurdiya Kurmancî di nav xwe de dê bê kirin, hem jî muqayeseya edebiyata Kurdiya Kurmancî dê bi edebiyatên cîranan re bê kirin.

4. Digel helbestê tesbîtkirina pexşana Kurdî: Herçiqas pexşana Kurdî lawaz jî be, tesbîtkirina qonaxên pexşana Kurdî di nav tarîxa edebiyata Kurdî de bi giştî tiştekî zehf girîng e. Loma jî di çarçoveya materyalên di dest de li ser vê mijarê jî hat rawestan.

Ji bo ku em tixûbekî ji vê beşa duyem a vê pirtûkê re xêz bikin, pêwist e ev xal li ber çavan bê girtin: Edebiyata Kurdî û bi taybetî jî Kurdiya Kurmancî ji destpêka Îslamê heta bi mîrektiyan, ji wir heta bi dawiya mîrektiyan (nîvê sedsala XIXan) û ji wê demê heta roja îro li ser sê beşan parve dibe. Bi baweriya me du sebebên vê yekê hene. Yek jê tarîxî ye ku heta bi dawiya mîrektiyan Kurd di nav şert û mercên tarîxî de xwediyê otonomiyeke siyasî bûn û vê rewşê rengê xwe yê erênî dabû edebiyata Kurdî. Lê piştî jiholêrakirina mîrektiyan, Kurd êdî bê desthilatdarî man û vê yekê jî rengê erênî yê edebiyata Kurdî guherand. Sebebê duyem jî ew e ku heta bi dawiya mîrektiyan edebiyata Kurdî bi terzê edebiyata klasîk a rojhilatî berhem dida. Lê piştî wê demê, li aliyekî bi terzekî nû û rojavayî ber-

CamScanner ile tarandı

hem hatin dayîn û li aliyekî dî jî edebiyata klasîk dewam kir. Îcar hem ji ber cudatiya van serdeman, hem jî ji ber ku xebat di nav tixûbekî de bimîne, me xwest ku em vê xebatê bigihînin heta bi dawiya mîrektiyan û li wir rawestin. Xwedê hes bike dema ku derfet çêbû, em dê ji cihê mayî dewam bikin û tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk bigihînin heta bi serdema hevdem.

Em iddîa nakin ku di vê beşê de behsa hemû helbestvan û pexşannûsên heta bi dawiya mîrektiyan hatiye kirin. Bêguman bi dehan helbestvanên ku derfeta me çênebûye em cih bidin wan û ewqas berhemên ku hunda bûne, yan jî haya me ji wan çênebûye dê hebin. Lê dîsa bi qasî derfeta xwe me xwestiye em cih bidin hemû helbestvan û pexşannûsan. Lewra ji bo ku tarîxeke edebiyata Kurdî ya tekûz bê nivîsandin, pêwist e ku yek yek hemû helbestvan û pexşannûsên Kurdan bên tesbîtkirin. Di edebiyata Kurdî de kêmasiya nebûna "tezkîre"yên helbestvanan belkî bi vî awayî bê telafikirin. Hêvî ew e ku ev xebata me jî bo nivîsandina tarîxeke edebiyata Kurdî ya tekûz bibe destpêkek.

Di warê rêbazê de du xal hene ku pêwist e em li ser wan rawestin. Xala yekem, me xwestiye ji bo her helbestvanekî bi kurtasî sê tiştan nîşan bidin; tesbîtkirina dewr, yan jî sedsala ku tê de jiyaye, nasname û jiyannameya wî û tesbîtkirina cih û nirxê wî di tarîxa edebiyata Kurdî de ka gelo bi Kurdî çi nivîsandiye, kijan ekolê temsîl dike û bandora kê li ser çêbûye yan jî wî bandor li kê kiriye. Ji vê zêdetir ji her aliyî ve û bi taybetî jî ji aliyê tehlîla metnên wan ve li ser her wêjevanekî ne hatiye rawestan. Bêguman li ser her yekî ji van kesên ku di vir de derbas dibin, tezên akademîk û xebatên cûrbicûr dikarin bên çêkirin.

Xala duyem heta ku ji destê me hat, me di vê lêkolînê de çavkanî nîşan dan û me xwe gihîştand çavkaniyên sereke yên di pileya yekem de. Eger em gihîştibin çavkaniyên sereke, îcar me pêdawîstî nedît ku em çavkaniyên di pileya duyem de jî nîşan bidin û me ev ji xwe re nekir armanc. Dibe ku ev tişt di xebatên bi çarçove û sînorkirî de bê kirin.

CamScanner ile tarandı

Beşa sêyem a vê xebatê bi sernavê "Di Helbesta Klasîk de Ruxsar" hatiye amadekirin. Di vê beşê de piştî destpêkê di bin banê çar binbeşan de li ser kêşa erûzê, serwa, paşserwa, teşeyên nezmê û teşeyên berhemên klasîk hatiye rawestan. Agahiyên di vê beşê de agahiyên teorîk û hevbeş ên edebiyata klasîk a rojhilatê temsîl dikin ku bi arîkariya van agahiyan dê li ser metnên edebî yên ku di beşa duyem de hatine nasandin lêkolîn bên kirin.

Ji ber ku di warê edebiyata Kurdî ya klasîk de berhemeke bi vê sîstematîkê û bi perspektîfa akademîk tinebû, bi taybetî di Kurdiya Kurmancî de pêdawîstiyeke mezin ji bo berhemeke bi vî rengî hebû. Em bawer dikin ku ev berhem di warê zanista edebiyata Kurdî ya klasîk de valahiya ku heye dê tije bike û dê rola "destpêk"ê jî bilîze. Herweha berhem di zaningehan de di dersên edebiyata Kurdî ya klasîk de dê wekî pirtûka dersê jî bê bikaranîn. Em hêvî dikin ku berhem di warê edebiyata Kurdî ya klasîk de bibe sedemê rewşenbîrî û hişmendiyeke nû.

Ev berhem di nav çar salan de derket meydanê. Di vê maweyê de gelek kesan bi awayên curbicur arîkarî dan min. Hayrullah Acar, Tehsîn Î. Doskî, Metin Bozan, Birgül Açıkyıldız û Shahab Vali xebatên xwe bi min re parve kirin û berhemên di pirtûkxaneyên xwe de pêşkêşî min kirin. Şeyhmus Kurt û Ziyaddin Yıldırımçakar xwendina ewilîn a pirtûkê kirin. Hevjîna min Sînemê, atmosfera xebata li malê bênavber ji bo min saz kir. Di qonaxa çapkirinê de editorê weşanxaneya Nûbîharê Süleyman Çevik û hevalên wî yên mesaiyê Davut Özalp û Halil Îbrahim Baran eleqeyeke mezin nîşan dan. Ez spasiyên xwe bi taybetî pêşkêşî van kesên navborî û bi giştî jî pêşkêşî hemû kesên ku keda wan di vê xebatê de gihîştiye min dikim.

Doç. Dr. Abdurrahman Adak
Mêrdîn 2013

CamScanner ile tarandı

JI BO ÇAPA DUYEM ÇEND GOTIN

Her ku diçe di warê Kurdî de xebatên nû tên kirin û paralelî vê jî eleqeya ji bo Kurdî zêdetir dibe. Dema ku eleqe zêde dibe, lêkolîner jî xwe ji bo xebatên nû mecbûr hîs dike. Di encamê de her du jî hevudu xwedî dikin. "Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk" ku bi xebat û cehdeke dirêj derketibû meydanê, çi li welêt û çi li derveyê welêt; çi xwendekar, çi xwendevan ji aliyê hemû Kurdîhezan ve eleqeyeke mezin dît û di nav şeş mehan de çapa wê ya yekem xilas bû. Bêguman di zanîngehan de vebûna/hebûna beşên Kurdî, ji bo geşepêdana xebatên Kurdî bûye mecaleke nû. Cihê kêfxweşî û şanaziyê ye ku êdî mamoste û xwendekar, di perwerdeya zanistên Kurdî de, pirtûkên dersê yên Kurdî dişopînin.

Ji ber ku "Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk", ne xebateke di mijareke spesîfik de ye, ber'eksê wê qada wê gelekî berfireh e, gihîştina xala dawî ya lêkolînê jî zehmet e. Loma jî her ku biçe lêkolîna li ser pirtûkê dê dewam bike û naverok jî dê bê berfirehkirin.

Di çapa yekem de, di mijara "Edebiyata Kurdî ya Berî Îslamê" de, li ser şopa lêkolînvanên berê, "Nivîstekên Hewramanê" wekî nivîstekên Kurdî yên berî Îslamê hatibûn nîşandan û di vî warî de şaşiyek hatibû kirin. Di vê çapê de ev şaşî hat sererastkirin û mijar, bi awayekî ku amaje bi hemû şaşiyên ku di vî warî de hatine kirin bike, hat berfirehkirin.

Di beşa "Sedsalên Hijdehem û Nozdehem" a Edebiyata Kurdiya Kurmancî de, helbestvanekî girîng bi navê Şêx Ehme-

CamScanner ile tarandı

dê Feqîr û pexşannûsekî nenas ku şerheke Kurdî li ser menzûmeyeke Farisî çêkiriye hatin zêdekirin. Herweha di beşa "Edebiyata Goranî ya Klasîk" de jî, helbestvanên bi navê Xanay Qubadî û Mewlewî hatin zêdekirin. Zêdebarî van, di tevahiya pirtûkê de, zimanê pirtûkê hat sererastkirin û di cihên pêdawîst de pêşdexistinên guncaw hatin kirin.

Herî dawî, ji bo ku her yek ji wan bi awayekî bûn sebebê pêşdaxistina pirtûkê, ez dixwazim spasiyên xwe yên jidil ji Hayrullah Acar, Huseyn Şemrexî, Rahmetullah Karakaya, Farûk Îsmaîl, Perwîz Cîhanî û Tehsîn Î. Doskî re pêşkêş bikim.

Digel silav û rêzê.

Doç. Dr. Abdurrahman Adak
Mêrdîn 2014

CamScanner ile tarandı

DESTPÊK

TÊGEHA EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK

CamScanner ile tarandı

CamScanner ile tarandı

TÊGEHA EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK



Di destpêka vê pirtûkê de, pêwistî bi danasîna têgeha edebiyata Kurdî ya klasîk heye. Ji bo ku ev têgeh bê fêmkirin pêwistî bi zanîna hinek têgehên bingehîn ên wekî edebiyat û wêje, edebiyata zarekî û edebiyata nivîskî, edebiyata klasîk û edebiyata nûjen jî heye. Di vê beşa destpêkê de piştî ku bi kurtî li ser van têgehan hat rawestan, dê bi firehî mijara pênaseya edebiyata kurdî ya klasîk û pêkhateyên wê pênaseyê, yan jî çavkaniyên edebiyata kurdî ya klasîk ên hizrî bê pêşkêşkirin. Di dawiya vê beşê de di çarçoveya kifşkirina mijar û tixûbê edebiyata kurdî ya klasîk dê li ser zanistên binbeş ên edebiyata klasîk bê rawestan.

I. EDEBIYAT Û WÊJE

"Edebiyat" û "wêje" du peyvên hemwate ne, ya pêşî bi Erebî ya duyem jî bi Kurdî ye. Di zimanê Îngilîzî de beramberî wan terma "literature" tê bikaranîn. "Edebiyat" di zimanê Erebî de forma pirjimar a peyva "edebiyye"yê ye. Edebiyye ji forma nîsbetê ya peyva "edeb"ê ye. Lê Ereb, di zimanê Erebî de ji bo vê disîplînê peyva "edebiyat"ê bi kar naînin. Şûna wê peyva "edeb"ê (forma yekjimar) bikartînin. Wekî ku dibêjin "el-edebu'l-Kurdî" (wate: edebiyata Kurdî). Heçî Tirk û Faris û Kurd in, ji bo vê disîplînê ne peyva "edebê", pirjimara wê ya bi şiklê "edebiyat"ê bi kar tînin. Wekî "Türk Edebiyatı", "Edebiyatî Farisî" û "Edebiyata Kurdî". Dema Ereb, peyva edebê di forma pirjimariyê de bi kar tînin, ne şiklê "edebiyat"ê, şiklê "adab"ê bikartînin. Wekî ku dibêjin "Kulliyyetu'l-Adab" (wate: Fakulteya Edebiyatê).

CamScanner ile tarandı

Peyva "edeb"ê di zimanê Erebî de tê wateya zerafet, nezaket û xweşikayiyê. Ev wateya wê jî di du tiştan de xwe nîşan dide:

1. Exlaq: Ji xweşikayiya exlaq re edeb tê gotin. Wekî nimûne di vê îfadeya Mewlana Celaleddînê Rûmî ya bi Farisî de wateya peyva edebê exlaqê xweş e: "*Ayet ayet hemegî me'naî Qur'an edeb est.*" (wate: Ayet ayet wateya Qur'anê tev edeb e.) Mewlana, li vir ji peyva edebê, exlaqê xweş qest dike û dibêje ku ayet bi ayet wateya Qur'anê hemû exlaqê xweş e. Ev cureya edebê wekî "edeba nefsî" (ew edeb/xweşikayiya ku di hundirê însan de heye) tê binavkirin.

2. Mi'amelat: Ji xweşikayiya ku di danûstandinên di navbera însanan de (mi'amelat) peyda dibe re jî edeb tê gotin. Wekî nimûne ji xweşikayiya axaftinê re "edeba kelamê", ji xweşikayiya rabûn û rûniştin û danûstandina bi însanan re "adabên mi'aşeretê" tê gotin. Ev cureya edebê wekî "edeba dersî" (ew edeba ku di derveyê însan de ye û piştre bi fêrbûnê tê bidestxistin) tê binavkirin.

Bikaranîna peyva edebê di van her du wateyan de di Kurdî de jî tê dîtin. Dema ku tê gotin "filankes zehf bi edeb e", mebest carinan exlaqê xweş e, carinan jî xweşikayiya di danûstandinên bi însanan re ye.

Di encamê de xuya dibe ku wateya edebê bi kurtî xweşikayî, zerafet û nezaket e. Îcar danerên vê têgehê, yanî zanayên Ereban ên ku ev nav li zanista edebiyatê kirine, weha fikirîne û gotine ku madem wateya peyva "edeb"ê xweşikayî ye û ev xweşikayî bi vegotinê tê îfadekirin, nexwe agahiyên derheqê vegotina xweş û bi huner de, yan jî zanista vegotina xweş û bi huner bila bi "edeb"ê bên îfadekirin. Bi vî awayî peyva edebê, ji bilî wateya xwe ya ferhengî, wateyeke îstîlahî/têgehî jî bi dest xistiye.

Eger em bidestxistina vê wateya têgehî wekî teşmîlekê bifikirin û vê jî bikin merheleya yekem, di merheleya duyem de jî teşmîleke hê berfirehtir heye. Di vê merheleyê de nivîskar

CamScanner ile tarandı

weha fikiriye û gotiye ku bila ev peyva edebê ji bo wan zanistên dî yên ku ji axaftina xweş û bi huner re dibin arîkar re jî bê gotin. Ji ber vê jî ji zanistên luxet (ferhengnasî), serf (morfolojî/peyvsazî), nehw (sentaks/hevoksazî), her sê beşên belaxetê (retorîk/rewanbêjî) meanî, beyan û bedî', wed', erûz, serwa, xettatî (xweşnivîsî), qiraet (dîksiyon/xweşxwendinî) û înşaê re jî peyva "edeb"ê hatiye bikaranîn û ev wateya vê peyvê careke dî hatiye firehkirin û teşmîlkirin. Ji ber vê ji van zanistan tevan re "'ilûmên edebî" (zanistên edebî) hatiye gotin.

Di merheleya sêyem û ya herî dawî de teşmîleke hê jî firehtir heye. Di dawiya Osmaniyan de dema ku li Stenbolê zanîngeh vebû, li kêleka van zanistên navborî ('ilûmên edebî) zanistên sosyal ên wekî felsefe, civaknasî, derûnnasî, dîrok, û hwd. jî hatin danîn û ev hemû ketin bin banê fakulteya edebiyatê. Bi vî awayî têgeha edebiyatê wateya xwe ya herî berfireh bi dest xist. Bi rastî jî di vegotin û nivîsandinê de pêdawîstiya zanistên sosyal bi rêzikên edebiyatê heye û ji vî aliyî ve kombûna wan di bin navê edebiyatê de ne tiştekî şaş e.[1]

Peyva "wêje"yê ku vê dawiyê Kurdên Bakur bi kar tînin, ji Kurdiya Soranî derbasî Kurdiya Kurmancî bûye. Kurdên Soran vê peyvê di pratîkê de di wateya edebiyatê de bikartînin. Bo nimûne Sedîq Sefizade Borekeyî ku ji Kurdistana Rojhilat e, navê berhema xwe ya li ser tarîxa edebiyata Kurdî kiriye "Mêjûy Wêjeyî Kurdî" ku wateya wê "Tarîxa Edebiyata Kurdî" ye. Peyva wêjeyê ji aliyê etîmolojiyê ve ji mesderê "wutin"ê hatiye çêkirin. "Wutin" ji bilî Kurdiya Kurmancî, di Kurdiya Soranî, Kurdiya Goranî û Kurdiya Zazakî de bi fonetîkeke nêzî hev beramberî peyva "gotin"ê tê bikaranîn. Nexwe terma "wêje"yê jî bi "gotin"ê re têkildar e ku mirov dikare di navbera wateya wê ya ferhengî (gotin) û wateya têgehî/îstîlahî ya edebê (gotina xweş û bi huner) de têkiliyekê dayne.

---

1 Mensûr Restgar Fesaî, *Enwa'ê Şi'rê Farisî*, Şîraz 1373, r. 19-22; Tahir-ül Mevlevî, *Edebiyat Lûgatı*, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994, r. 39.

CamScanner ile tarandı

II. EDEBIYATA ZAREKÎ Û EDEBIYATA NIVÎSKÎ

A. EDEBIYATA ZAREKÎ

Edebiyata zarekî, edebiyata herî kevn a gelekî/miletekî ye. Edebiyata devkî, berî ku edebiyata nivîskî dest pê bike heye û piştî ku edebiyata nivîskî dest pê dike jî li kêleka wê hebûna xwe berdewam dike. Nexwe mirov dikare wan form û cureyên edebî yên ku ji demên herî kevn ve bi riya gotinê tên veguhestin wekî "edebiyata zarekî" bi nav bike. Kilam, destan, şerên ku dengbêj dibêjin, gotinên pêşiyan, lawij, mamik, biwêj, lorîk û hwd. dikevin nav van cureyên edebî yên edebiyata zarekî de. Mehsûlên edebiyata zarekî ne malê nivîskarekî/nivîskarekê ne, malê gel tevî ne.

B. EDEBIYATA NIVÎSKÎ

Ji wê edebiyata ku di demeke diyar de, ji aliyê nivîskarekî/nivîskarekê ve hatiye dayîn re edebiyata nivîskî tê gotin. Destpêkirina tarîxa edebiyata gelekî/miletekî li gorî destpêkirina berhemên nivîskî tê hesibandin. Berhemên nivîskî yên gelekî/miletekî çiqas kevin bin, edebiyata wî gelî jî ew qasî kevin e. Edebiyata gelekî çiqas kevin be, nirxê wê edebiyatê jî ewqas bilind dibe.

Edebiyata klasîk û ya nûjen binbeşên edebiyata nivîskî ne. Heçî edebiyata zarekî ye ew di bin banê "folklor"ê de disîplîneke serbixwe ye.

1. EDEBIYATA KLASÎK

Ji edebiyata nivîskî ya ku di serdema Îslamî de di bin bandora dînê Îslamê, zimanên Erebî û Farisî û çanda Îranê de li gorî hinek rêbazan hatiye meydanê re "Edebiyata Klasîk" tê gotin.

2. EDEBIYATA NÛJEN

Ji edebiyata nivîskî ya ku di serdema modernîzmê de di bin bandora edebiyata Ewropî de hatiye meydanê re "Edebiyata Nûjen" tê gotin.

CamScanner ile tarandı

III. EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK Û ÇAVKANIYÊN WÊ YÊN HIZRÎ

Gelek zanistên binbeş ên edebiyata klasîk ên wekî tarîxa edebiyatê, erûz, serwa (qafiye), paşserwa (redîf), teşeyên nezmê (şiklên nezmê), rewanbêjî (belaxet) û ciwankarî (hunerên edebî), cureyên edebî, şîroveya (şerha) metnan û edebiyata berawirdkarî (edebiyata muqayeseyî) hene. Ji bilî tarîxa edebiyatê ku ew diyardeyeke nûjen e, yên dî tev di nav civaka Mislimanan û şert û mercên siyasî û sosyal ên taybet de derketine meydanê û ji aliyê îlmî, hizrî û hunerî ve di bin bandora van şertan de kemilîne. Bi vî awayî ew taybetî û unsurên ku bandor li edebiyata Kurdî ya klasîk kirine û tê de reng vedane, çavkaniyên hizrî yên edebiyata Kurdî ya klasîk tînin meydanê. Lê berî ku em derbasî vê mijarê bibin em dixwazin li ser pênaseya edebiyata Kurdî ya klasîk ku van çavkaniyan jî di xwe de dihewîne rawestin.

A. PÊNASEYA EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK

Eger em bixwazin pênaseyeke edebiyata Kurdî ya klasîk ku unsur û taybetiyên wê di xwe de bicivîne (cami'ê efradê xwe be) û wê ji tiştên dî veqetîne (mani'ê exyarê xwe be) bikin em dikarin weha bêjin: "Ji edebiyata Kurdî ya nivîskî ya ku di serdema Îslamî de di bin bandora dînê Îslamê, unsurên Erebî û Farisî û çanda Îranê de li gorî hinek rêzikan hatiye meydanê re "Edebiyata Kurdî ya Klasîk" tê gotin.

Di vê pênaseyê de bi îfadeya "edebiyata Kurdî" edebiyatên dî (edebiyatên Erebî, Farisî, Tirkî û hwd) li derve dimînin û hebûna edebiyateke serbixwe ya Kurdî tê dûpatkirin. Piştî wê bi peyva "nivîskî" edebiyata Kurdî ya zarekî li derve dimîne. Wate edebiyata Kurdî ya zarekî di çarçoveya edebiyata klasîk de nayê hesibandin û ew şaxeke serbixwe teşkîl dike. Piştre bi îfadeya "di serdema Îslamî de", çi nivîskî çi devkî, edebiyata Kurdî ya berî Îslamê li derve dimîne. Edebiyata Kurdî ya berî Îslamê

CamScanner ile tarandı

wekî sahayeke serbixwe tê hesibandin. Em ji "Serdema Îslamî" wê maweya ku dînê Îslamê tê de serdest e qest dikin. Destpêka wê sala 610 e ku di vê salê de wehy bo Cenabê Pêxember hatiye. Herçiqas em dewra edebiyata nûjen bi destpêkirina modernîzma edebiyata Kurdî ya dawiya sedsala XIXan didin destpêkirin jî, ev nayê wê me'nayê ku bi destpêkirina dewra edebiyata nûjen dewra edebiyata klasîk qediyaye. Ber'eksê wê piştî ku edebiyata Kurdî ya nûjen dest pê kiriye jî, li kêleka wê edebiyata Kurdî ya klasîk jî hebûna xwe berdewam kiriye û gihîştiye heta roja me. Bi rastî ev tişt bi hebûna dezgehên Îslamî yên wekî medrese û dergahan ve, ku evana cihên şaxvedana edebiyata klasîk in, girêdayî ye. Ji ber ku di serdema modernîzmê de jî, van dezgehan bi awayekî di nav Kurdan de xwe parastine, di wê serdemê de edebiyata Kurdî ya klasîk jî hebûna xwe domandiye.

Di pênaseyê de îfadeya "li gorî hinek rêzikan" rêbaz û rêzikên edebiyata Kurdî ya klasîk tîne zimên ku ev xal rêzikên edebiyata modern û gelêrî li derve dihêle.

Herweha îfadeya "di bin bandora dînê Îslamê, unsurên Erebî û Farisî û çanda Îranê de" jî çavkaniyên edebiyata Kurdî ya klasîk tîne zimên. Di metnên edebî yên klasîk de ev her çar unsur teqez cih digirin. Ev jî edebiyata Kurdî ya klasîk ji ya modern vediqetîne. Lewra di edebiyata Kurdî ya modern de ev her çar unsur bi hev re cih nagirin; teqez divê hin ji van unsuran kêm bin. Edebiyata Kurdî ya modern, bereksê ya klasîk, ne di serdema klasîk de ye, di serdema modernîzmê de ye; ne di bin bandora çanda dînê Îslamê û Îranê de ye, di bin bandora çanda Ewropa de ye, termînolojiya xwe ne ji zimanên Erebî û Farisî wergirtiye, ji zimanên Ewropiyan wergirtiye.

B. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK

Em dê çavkaniyên hizrî yên edebiyata Kurdî ya klasîk, di bin banê du beşên sereke de lêbikolin.

CamScanner ile tarandı

1. Seyra Tarîxî ya Çavkaniyên Edebiyata Kurdî

2. Çavkaniyên Hizrî yên Edebiyata Kurdî ya Klasîk.

Lê di serî de lazim e bê gotin ku çavkaniyên edebiyata Kurdî ya klasîk bi giştî li ser du beşan e. Beşa yekem ew çavkanî ne ku ji aliyê îlmî, fikrî û hunerî ve nivîskar ji wan sûd werdigire (Çavkaniyên Hizrî). Li vir mijara me ev cure çavkanî ne. Ya duyem jî ew çavkanî ne ku ji bo danasîna nivîskar û berheman hatine nivîsandin (Çavkaniyên Nivîskî). Ew berhem û xebatên ku di demên curbicur de derheqê jînenîgariya edîb û helbestvanan (yên biyografik) û berhemên wan (yên bîbliyografik) de hatine nivîsandin û ew belge û materyalên ku mijareke tarîxa edebiyatê ronî dikin vê cureya çavakniyên edebiyatê tînin holê. Lêkolînerê tarîxa edebiyatê bi arîkariya van berhem û belgeyan jînenîgarî û berhemên edîban nas dike û bi komkirin û dîzaynkirina naveroka wan berheman dikare tarîxa edebiyatê binivîse. Lê li vê derê em dê ne li ser vê cureyê, li ser cureya yekem, wate li ser çavkaniyên hizrî rawestin.

1. SEYRA TARÎXÎ

Çawa ku li jorê jî hat gotin, unsurên dînî, zimanê Erebî, zimanê Farisî û çanda Îranê ku di pênaseya edebiyata Kurdî ya klasîk de cih digirin, herweha wekî çavkanî û jêderên edebiyata Kurdî ya klasîk jî tên hesibandin. Lê ev taybetî ne aîdê edebiyata Kurdî bi tenê ne, ev taybetî herweha di serdema Îslamî de di nav edebiyatên gelên Misliman ên wekî Ereb, Faris, Tirk, Urdu û Kurdan de wekî xalên hevbeş derdikevin pêş. Tişta ku edebiyatên klasîk ên van gelan ji hev vediqetîne, zimanên wan gelan Erebî, Farisî, Tirkî, Kurdî û hwd. ye. Çawa ku latînî di edebiyatên rojava de xala hevbeş e, di edebiyatên Mislimanan de jî ev taybetî xalên hevbeş in. Ev xalên hevbeş ên edebiyatên gelên Misliman, ji aliyê dîrokî ve vedigerin heta bi serdema berî Îslamê. Di civaka Ereban a berî Îslamê de, ku wekî "Dewra Cahiliyeyê" tê binavkirin, edebiyat, bi taybetî jî helbest gelekî

CamScanner ile tarandı

pêşketî bû. Di vê serdema ku berî Îslamê bi qasî 150 salan dom kiriye de helbestvanên wekî Îmruu'l-Qeys, Zuheyr, Lebîd, 'Entere û hwd perwerde bûbûn ku helbestên wan li bajarê Mekkeyê li sûka Ukazê di pêşbaziyan de hatibûn ecibandin û bi dîwarê "Ke'be"yê ve hatibûn daleqandin. Bi vî rengî ji wan heft yan jî deh helbestên ku bi dîwarê Ke'beyê ve hatibûn daleqandin re "Mu'elleqatê Seb'e" wate "heft helbestên deleqandî" yan jî "Mu'elleqatê 'Eşere" wate "deh helbestên deleqandî" tê gotin. Di vê serdemê de helbestvanên Ereban bi taybetî bi terzê "qesîde"yê helbest dinivîsandin ku merheleya pêşî ya hevbeşiya edebiyatên van gelan ji vir dest pê dike. Ew xalên ku hevbeşiyê pêk tînin jî teşeyê nezmê (qesîde), kêş (erûz) û serwa ye.

Piştî ku dînê Îslamê hat û Ereb bûn Misliman, helbesta Erebî ji aliyê ruxsarê ve neguherî, lê ji aliyê naverokê ve guherî. Wate dîsa bi terzê qesîdeyê û kêşa erûzê, lê bi unsur û naveroka Îslamî helbestên Erebî hatin nivîsandin. Bo nimûne Ke'b b. Malik (Ke'bê kurê Malik) dema ku bawerî bi dînê Îslamê anî, çû cem Cenabê Pêxember û li ser wî medhiyeyek bi navê "Banet Su'adu" ku piştre wekî "Qesîdeya Burde"yê hat naskirin, got. Ev helbesta wî ji aliyê ruxsarê ve li ser terzê berê bû; bi gotineke dî bi teşeya qesîdeyê û bi kêşa erûzê bû, lê ji aliyê naverokê ve di bin bandora Îslamê de bû. Lewra pesnê Cenabê Pêxember dida. Bi vî awayî em dikarin wekî encam bêjin ku forma ruxsarî ya edebiyata Erebi ya Îslamî dewama ya dewra cahiliyeyê ye, lê naveroka wê nûjen e.

Di serdema xelîfeyê duyem Umerê kurê Xettab de, bi şerê Nîhawendê ku di sala 642yan de qewimî bû, dewleta Sasaniyan ket bin desthilata dewleta Îslamê de. Wê demê Kurd jî wekî Farisan ketin dînê Îslamê û Ereban di serdema "Çar Xelîfeyan", dewleta Emewiyan û nîvê pêşî yê dewleta 'Ebbasiyan de, bi riya waliyan welatên Faris û Kurdan idare kirin. Lê di nîvê serdema dewleta Ebbasiyan de ji aliyê Faris, Tirk, Kurd û Çerkezan ve li coxrafyaya Ebbasiyan gelek hikûmet ava bûn ku hikûmeta Seffariyan jî yek ji van hikûmetan bû. Di serdema vê hikûmetê de ku di sala 862yan ava bûbû û yekem hel-

CamScanner ile tarandı

bestên Farisî hatin nivîsandin. Ew kesên ku di vê serdemê de bi Farisî nivîsandibûn kesên wekî Muhemmed b. Wasifê Segzî, Bessamê Kurdê Sîstanî û Muhemmed b. Muxelled Sîstanî bûn ku yek ji wan kesan (Bessam) Kurd bû. Dîsa di serdema Ebbasiyan de di sedsala Xan de yekem helbestên Kurdî bi Kurdiya Goranî û Kurdiya lorî li herêma Hewraman û Loristanê jî aliyê pêgirtî û bawermendên mezhebê Ehlê Heqê ve hatin vegotin. Wekî nimûne em dikarin di edebiyata Kurdiya Goranî de navê Baba Serhengê Dewdanî (k.d.1007) û di edebiyata Kurdiya lorî de navê Baba Tahirê Uryan (k.d.1010) bidin.

Îcar di vê serdema rêvebiriya Emewî û Ebbasiyan de Kurd û Farisên ku Îslamiyet qebûl kiribûn, ketibûn bin bandora zimanê Erebî û kultura Îslamê de. Dema Kurd û Farisan dest bi nivîsandina bi zimanê xwe kirin, her duyan jî kultura Îslamê naskiribûn û pejirandibûn. Bi vî awayî, piştî misilmanbûna Kurdan edebiyata Kurdî di bin bandora unsurên dînî û Erebî de dest pê kiriye. Bi gotineke dî di dewra Îslamî de edebiyata Kurdan û Farisan ji Erebên Misliman du tişt standin: Unsurên Îslamî û yên Erebî.

Di dawiya dewleta Ebbasiyan de, yan jî di dewra duyem a dewleta Ebbasiyan de gelek hikûmet ava bûn ku hijmara wan digihîje 30-40 hebî. Ji van hikûmetan di serdema Seffarî (861-1003), Samanî (874-999) û Xeznewiyan (961-1187) de zimanê Farisî bûbû zimanê edebiyatê û edebiyata Farisî ya wan dewletan bandoreke mezin li yên pişt xwe kirin. Li aliyeki dî ji ber ku Kurd hem ji aliyê zimên hem jî ji aliyê coxrafî ve nêzî Farisan bûn û edebiyata Farisî berî ya Kurdî kemilî bû, wekî edebiyatên dî yên rojhilatê Kurdî jî kete bin bandora edebiyata Îranê de.

Piştî ku Kurdan û Farisan dînê Îslamê qebûl kirin, di sedsala Xan de Tirk jî ketin dînê Îslamê û cara ewil berhemên edebî yên Tirkî di sedsala XIan de di bin bandora vî dînî de derketin meydanê. Lê li kêleka unsurên dînî (Îslamî) û Erebî unsurên Îranî jî ketin edebiyata Tirkî. Bi vî awayî di nav edebiyatên Farisî, Kurdî û Tirkî de unsurên muşterek ên Îslamî û çanda Îranê peyda bûn. Dema em edebiyata Erebî têxin navê, di nav wan her çar edebiyatan de ev unsurên muşterek dibin unsurên Îslamî û Erebî.

CamScanner ile tarandı

Helbet Kurdan jî wekî Faris û Tirkan di edebiyata xwe ya klasîk de hinek tiştên nû afirandin. Lê bi piranî zanista edebiyata Kurdî ya klasîk, di vê paşxenaya tarîxî ya ku me behs kir de, rêngên şaristaniya Îslamê û zimanên Erebî û Farisî wergirtiye û rehên wê digihîjin heta bi serdema berî Îslamê ya civaka Ereban.

2. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK

Çavkaniyên hizrî yên edebiyata Kurdî ya klasîk, di çarçoveya pênaseya edebiyata Kurdî ya klasîk û agahiyên ku li jorê derbas bûn de, di bin banê çar sernavan de dikare bê komkirin: Unsurên Îslamî, unsurên Erebî, unsurên Farisî û unsurên Çanda Îranê/Asyayê.[2]

2.1. Unsurên Îslamî

Dema berhemên pêşî yên edebiyata Kurdî ya klasîk dihatin dayîn, civaka Kurdan bûbû civakeke Îslamî û şaristaniya Îslamî bandor li wê civakê kiribû. Edebiyata Kurdî di bin bandora wê şaristaniyê de pêşve çû û kemilî. Sîstema Îslamiyetê di destpêkê de li ser esasên kitêba pîroz Qur'an û hedîsên Cenabê Pêxember ava bû û ji van her du çavkaniyan sîstema fiqhî ya ku navê wê "Şerî'et" e derket meydanê. Lê piştre di nav Mislimanan de sîstemeke nû bi navê "Terîqet"ê jî saz bû. Bi vî awayî unsurên Îslamî di bin navên unsurên dînî û unsurên tesewifî de dibin du beş.

2.1.1. Unsurên Dînî

Dînê Îslamê li ser du riknên sereke ava bûye. Yek ji van kitêba pîroz Qur'an, ya dî jî gotinên Cenabê Pêxember "hedîs" û kirinên wî "sunnet" e. Ev her du rikn herweha ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk jî du çavkaniyên sereke yên dînî ne. Lê ji bilî

2 Ji bo van mijaran bnr. Ahmet Mermer (L. Alıcı, M. Eflatun, Y. Bayram, N. K. Keskin), Eski Türk Edebiyatına Giriş, Akçağ, Ankara 2006, r. 29-41.

CamScanner ile tarandı

van, zanistên Eqaîd, Kelam û Fiqhê û kesayetên dînî û tarîxî jî ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk çavkanî ne. Di vê çarçoveyê de unsurên dînî yên ku ji edebiyata Kurdî ya klasîk re bûne çavkanî li jêrê hatine diyarkirin.

2.1.1.1. Xweda û Qur'ana Pîroz

Qur'an ew esasên semawî ne ku di bîst û sê salan de (610-632) ji aliyê Xwedayî ve bo Cenabê Pêxember hatine şandin ku ji wê kitêba di nav du bergan de "mushef" jî tê gotin. Ji ber ku Qur'an kitêba pîroz a dînê Îslamê ye û şikil daye civaka Mislimanan, ji gelek aliyan ve ji edebiyata Kurdî ya klasîk re bûye çavkanî. Hetta mirov dikare bêje ku hem Xweda, hem pêxember, hem qisseyên pêxemberan tev ku hemuyan jî di edebiyata Kurdî ya klasîk de reng vedane, bi awayekî dikevin bin sîwana Qur'anê de. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de gelek caran navê parçeyên Qur'anê yên wekî "cuz", "sûre", û "ayet"an û herweha gelek têgehên ku di Qur'anê de derbas dibin cih digrin. Wekî nimûne, Ehmedê Xanî di vê beyta jêrîn a "Mem û Zîn"a xwe de, bi vî awayî cih daye hinek ji van têgehan:

Qur'an û xeber çi mu'cîzat in
Ayat û suwer çi beyyînat in

Di metnên edebî yên klasîk de carinan deqên hinek ayetan bi lefzê xwe, carinan jî bi me'neya xwe tên îqtîbaskirin. Wekî nimûne di beyta jêrîn de Melayê Cizîrî hem cih daye têgeha "sûre", hem jî ayeta "Înna Fetehna" îqtîbas kiriye:

Ey şehînşahê mu'ezzem Heq nîgehdarê te bî
Sûreê Înna Fetehna dor û madarê te bî

Menzûmeyên "tecwîd"ê yên ku derheqê rastxwendina metnê Erebî yê Qur'anê de hatine nivîsandin jî, di edebiyata Kurdî ya klasîk de rengvedaneke dî ya Qur'anê ye.

CamScanner ile tarandı

2.1.1.2. Cenabê Pêxember û Hedîsên wî

Pêxemberê dînê Îslamê Muhemmed (s.x.l.) ku di navbera salên 571-632yan de jiyaye, bi gelek şiklan ji edebiyata Kurdî ya klasîk re bûye çavkanî. Di serî de jiyana wî bi berfirehî bala helbestvanan kişandiye û bûye mijara berhemên edebî. Di vî warî de hinek cureyên edebî yên serbixwe derketine ku "Mewlûdname" yek ji van cureyan e. Di van cure berheman de bi taybetî jidayîkbûna Cenabê Pêxember û zarokatiya wî cih digire. Bo nimûne kêlîka ku Cenabê Pêxember ji diya xwe çêbûye di Mewlûda Melayê Bateyî de weha hatiye nîşandan:

Cumle zerratê cîhan da ev nîda
Kirne gazî pêkve gotin merheba

Herweha derheqê Cenabê Pêxember de hinek cureyên edebî yên dî jî hene. Wekî nimûne derheqê jiyana wî tevî de "siyerên menzûm", derheqê taybetiyên wî yên bedenî û rûhî de "şemaîl" û derheqê mî'raca wî de "mî'raciyye" hatine nivîsandin.

Hesjêkirina Cenabê Pêxember, di dînê Îslamê de wekî diyardeyeke dînî hatiye qebûlkirin û di vî warî de ji bo pesindayîna Cenabê Pêxember gelek "medhiye" û "ne't" hatine nivîsandin. Evana bi taybetî di destpêka dîwan û mesnewiyan de, lê carina jî wekî helbestên serbixwe hatine nivîsandin.

Wekî îqtîbaskirina deqên ayetan îqtîbaskirina deqên hedîsan jî di metnên edebî yên klasîk de gelekî tê dîtin.

2.1.1.3. Eqaîd û Kelam

Di nav Mislimanan de derheqê dînê Îslamê de hinek zanistên serbixwe derketine meydanê ku mijarên wan zanistan jî ji edebiyata Kurdî ya klasîk re bûne çavkanî. Yek ji van zanistan "Eqaîd" e. Ev zanist behsa riknên baweriyê yên dînê Îslamê dike. Baweriya bi Xudê, bi melaîketên wî, bi kitêbên semawî (Tewrat, Zebûr, Încîl, Qur'an û suhufên her pênc pêxemberan), bi pêxemberên wî, bi axîretê û qederê her şeş rikênên

CamScanner ile tarandı

sereke ne. Evana tev bi awayekî di edebiyata Kurdî ya klasîk de cih digirin. Derheqê Xwedayî de cureyên edebî yên bi navê "tewhîd" û "munacat"ê hene ku di van cure helbestan de helbestvan li ser yekîtiya Xwedayî radiweste û gazî û lavayên xwe jê dike. Derheqê van riknên baweriyê de gelek menzûmeyên eqaîdê yên serbixwe jî hatine nivîsandin. Herweha li ser axîret û mehşerê jî menzûmeyên serbixwe hene.

Zanisteke dî ya dînî bi navê "Kelam"ê jî heye ku ew jî bi zanista Eqaîdê re têkildar e. Eqaîd tenê bi rêbazeke sade behsa riknên baweriyê dike, lê kelam bi rêbazên mentiqî û felsefî li ser gengeşeyên wan riknan disekine. Îcar têgehên vê zanistê jî ji edebiyata Kurdî ya klasîk re bûne çavkanî. Di vê beyta jêrîn a Melayê Cizîrî de hinek têgehên "Eqîde" û "Kelamê" bi hev re cih digirin.

Sirrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed
Wahid û ferd e bi zatê xwe wî nînin çu eded

2.1.1.4. Fiqih

"Fiqih" ew zanist e ku mijara wê pratîk û rîtuelên dînê Îslamê ne. Têgehên fiqhî yên wekî selat/nimêj, sewm/rojî, hec, destmêj, seccade, wacib, heram, guneh û hwd gelek caran di edebiyata klasîk de cih digirin. Di edebiyata Kurdî de li ser esasên fiqhê û bi taybetî nimêjê gelek menzûmeyên serbixwe jî hatine nivîsandin. Melayê Cizîrî di vê beyta jêrîn de cih daye têgeha "selem"ê ku di fiqha Îslamî de bi me'neya dayîna pereyî pêşîn û stendina mal bi derengî tê bikaranîn.

Da wextê lîqayê bi te hey bin di beqayê
Min neqdê dil û can di fenayê bi selem da

2.1.1.5. Kesayetên Dînî-Tarîxî

Gelek kesayetên dînî yên ku di tarîxa pêş Îslamê de û yên di tarîxa Îslamê de peyda bûne jî ji edebiyata Kurdî ya klasîk re

CamScanner ile tarandı

bûne çavkanî. Di tarîxa pêş Îslamê de bi taybetî navê pêxemberên berê û qisseyên wan û di tarîxa Îslamê de jî navê sehabî, welî û arifan û taybetiyên wan cih digirin. Dîsa ji bûyerên tarîxa Îslamê bi taybetî bûyera Kerbelayê di edebiyata Kurdî ya klasîk de zehf cih digire.

2.1.2. Unsurên Tesewifî

Tesewif bi tena serê xwe belkî bi qasî çavkaniyên dînî hemûyan di edebiyata Kurdî ya klasîk de cih girtiye û jê re bûye çavkaniyeke girîng. Herçiqas di destpêkê de tesewif di çarçoveya esasên dînî de derketibe meydanê jî, piştre wekî bizaveke nûjen hinek esasên nû ku di zahirê şerîetê de cihê wan tinebûn ketine nav wê û bi vî awayî ji aliyê "ehlê şerî'tê" ve hatiye redkirin.

Di sedsala duyem a hicrî de di nav civaka Mislimanan de bizaveke nû ku wekî hereketa "zuhd"ê dihate binavkirin derket meydanê. Ji endamên vê bizavê re "sûfî" dihate gotin. Binemaya vê bizavê perhîza ji çêj û zewqên dinyayê bû. Di serdema Emewiyan de zewq û sefaya ku rêvebirên dewleta Emewiyan tê de dijiyan û hereketên Xariciyan ên hişk, kir ku ev zahid û sûfî bi temamî xwe ji nav civakê dûr bixin û heyateke dînî ya ferdî bijîn. Di encamê de prensîbên tesewifî ku dê di edebiyata Kurdî ya klasîk de jî cih bigrin ên wekî uzlet, tewekkul, riyazet, mucahede, sebir, xeşyetullah û were'ê peyda bûn. Piştre gelek têgehên dî yên tesewifî jî li wan zêde bûn. Bi Bayezîdê Bistamî (k.d.874), Hellacê Mensûr (k.d.921), Şîhabeddînê Suhrewerdî (k.d.1190) û Muhyeddînê Îbnî Erebî (k.d.1239) fikra "wehdetu'l-wucûdê/yekîtîbûnê" rengekî felsefî û teorîk da tesewifê. Piştî sedsala XIIan jî gelek terîqetên wekî Qadiriyye, Rufa'iyye, Suhrewerdiyye, Xelwetiyye, Mewlewiyye, Neqşebendiyye û hwd ava bûn.

Çi tesewifa zuhdî çi ya felsefî be, gelek têgehên tesewifî di edebiyata Kurdî ya klasîk de cih digirin. Bi taybetî tesewifa terîqetan gelek bandor li edebiyata Kurdî kiriye ku bi navê "edebiyatê tekyayê" şaxekî edebî yê serbixwe saz bûye. Ev edebiyat zehftir li ser bingeha medhiyeyên pîr û şêxên van tekyayan ava bûye.

CamScanner ile tarandı

Wekî mînak Melayê Cizîrî di vê beyta xwe ya jêrîn de weha cih daye hinek têgehên tesewifî:

'Arif heta nenoşî ji destê meyfiroşî
Xaib nebû ji hoşî peyda nekir wilayet

2.2. Unsurên Erebî

Ziman û edebiyata Erebî jî çavkaniyeke edebiyata Kurdî ya klasîk e. Hem peyv û îfadeyên Erebî, hem têgehên edebî, hem teşeyên nezmê yên ku Ereban afirandibûn, hem jî wezna 'erûzê ya ku di van helbestan de bikaranîbûn ji edebiyata Erebî derbasî edebiyata Kurdî bûn. Gelek helbestvanên Kurdan hinek helbêstên xwe bi tevahî bi Erebî nivîsandine. Hinek helbestvanan jî di nav helbestên xwe yên kurdî de cih dane hinek misrayên Erebî ku ji van cure helbestan re mulemma tê gotin. Bo nimûne Melayê Cizîrî di vê beyta jêrîn de misraya duyem bi tevahî bi zimanê Erebî nivîsandiye.

Mela her wî bibîn her wî eger her wî dinasî tû
Huwe'l-me'bûd huwe'l-meşhûd bel la xeyre fi'd-dareyn

Ji bilî van hemû helbestvanan di dîwan û menzûmeyên xwe yên Kurdî de teqez cih dane îfadeyên Erebî.

2.3. Unsurên Farisî

Ziman û edebiyata Farisî jî wekî ya Erebî çavkaniyeke edebiyata Kurdî ya klasîk e. Peyv û îfadeyên Farisî, hinek têgehên edebî û teşeyên nezmê ji edebiyata Farisî derbasî edebiyata Kurdî ya klasîk bûn. Bandora helbestvanên Faris yên wekî Hafizê Şîrazî, Nîzamî ji yên Ereb zehftir li ser helbestvanên Kurdan çêbûye. Bo nimûne Melayê Cizîrî di vê beyta jêrîn de weha cih daye misrayeke Hafizê Şîrazî:

CamScanner ile tarandı

Dizanî rûd û 'ûd ewwel çi tavêtin sirûd ewwel
Kî 'işq asan nimûd ewwel welî uftad muşkîlha

Gelek helbestvanên Kurdan bi heman rengê Erebî, hinek helbêstên xwe bi tevahî bi Farisî nivîsandine. Hinek helbestvanan jî di nav helbestên xwe yên kurdî de cih dane hinek misrayên Farisî ku ji van cure helbestan re mulemma tê gotin. Çawa ku di beyta jorê ya Melayê Cizîrî de tê dîtin.

Ji bilî van hemû helbestvanan di dîwan û menzûmeyên xwe yên Kurdî de teqez cih dane îfadeyên Erebî.

2.4. Unsurên Çanda Îranê/Asyayê

Çawa ku ziman û edebiyata Farisî ji edebiyata Kurdî ya klasîk re çavkaniyek bû, bi heman rengî çanda Îranê ya kevn û berfireh jî ji wê edebiyatê re çavkaniyek e. Bi rastî jî bandora Îranê ne ji aliyê zimên tenê ve çêbûye, di heman demê de ji aliyê naverokê ve jî hemû unsurên çanda coxrafyaya Îranê di edebiyata Kurdî de reng vedane. Divê em vê jî bêjin ku mebesta me ji vê coxrafyayê ne dewleta Îranê ya modern tenê ye. Dema em dibêjin çanda Îranê, em wê çanda ku di nav gelên Îraniyan/Ariyan û Asyayê tevan de peyda bûye qesd dikin û kesayetên dîrokî, efsane, baweriyên dînî û gelek tiştên dî yên wan gelan têxin nav wê. Di vî warî de divê bi taybetî em çand û baweriyên li Hindê bibîr bînin. Wekî nimûne Manî û koleksiyona wî ya wêneyan a bi navê "Erjeng"ê ji çanda Hindistanê derbasî edebiyata Farisî û ji wir jî derbasî ya Kurdî bûne. Bo nimûne Siyahpoş di beyta xwe ya jêrîn de behsa Manî dike.

Ji neqqaşî dikir wan neqşê texmîn
Wekî Manî neqqaşê Çîn û Maçîn
(Siyahpoş, *Seyfulmulûk*)

Di warê çanda Îranê de "Şehname"ya Firdewsî çavkaniya herî girîng e. Lewra di wir de derheqê Pîşdadî, Keyanî, Eşkanî û Sasa-

CamScanner ile tarandı

niyan de agahiyên tarîxî û efsanewî tên dayîn. Di edebiyata Kurdî de gelek caran kesayetên van dewran ên wekî Cemşîd, Dahak, Ferîdûn, Rustem cih digirin. Wekî nimûne Ehmedê Xanî di "Mem û Zîn"ê de weha cih daye palewanê bi navê Rustem.

Yûsuf ji melaheta wî mehcûb
Rustem ji şece'eta wî mexlûb

IV. ZANISTÊN BINBEŞ ÊN EDEBIYATA KLASÎK

Edebiyata klasîk, gelek zanistên xwe yên binbeş hene. Hin ji wan bi merheleyên tarîxî yên edebiyatê ve, hin ji wan bi erûz, qafiye, redîf, teşeyên nezmê, rewanbêjî û hunerên edebî ve û hin ji wan jî bi cureyên edebî, şerha metnan û edebiyata berawirdî re têkildar in.

Ji bo zanistên binbeş ên ku edebiyata klasîk ji wan pêk tê, yan jî wan di xwe de dicivîne, dabeşkirineke weha dikare bê kirin:

1. Zanista Tarîxa Edebiyata Klasîk
2. Zaniztên bi Ruxsarê re Têkildar
3. Zanistên bi Naverokê re Têkildar
4. Zanistên Hem bi Ruxsar Hem bi Naverokê re Têkildar

1. Zanista Tarîxa Edebiyata Klasîk

Zanista tarîxa edebiyatê, li gorî merheleyên tarîxî li ser edîb û berhem wan ên edebî radiweste. Tarîxa edebiyatê li gorî perspektîfên curbicur dikare bê nivîsandin.

2. Zanistên bi Ruxsarê re Têkildar

Zanistên wekî erûz, serwa (qafiye), paşserwa (redif) û teşeyên nezmê (şiklên nezmê) bi ruxsarê re girêdayî ne.

3. Zanistên bi Naverokê re Têkildar

Zanistên wekî cureyên edebî, têgeh û mezmûnên edebî û şîroveya (Şerha) metnan bi naverokê re têkildar in.

4. Zanistên Hem bi Ruxsar Hem bi Naverokê re Têkildar

Zanistên wekî rewanbêjî (belaxet) û ciwankarî (hunerên

CamScanner ile tarandı

edebî) û edebiyata berawirdî (edebiyata muqayeseyî), hem bi ruxsar hem bi naverokê re têkildar in.

Dikare bê gotin ku ji van binbeşan a herî girîng û herî berfireh zanista tarîxa edebiyatê ye. Lewra zanista tarîxa edebiyatê ji metnên edebî û nivîskarên wan ên ku di pêvajoya dîrokê de derketine meydanê pêk tê. Ji xwe zanistên dî hemû (erûz, serwa, paşserwa, teşeyên nezmê, hunerên edebî, cureyên edebî, şîroveya metnan) ji bo fêmkirina metnê edebî zanistên arîkar in. Eger metnên edebî yên gelekî/miletekî tinebin, bi gotineke dî tarîxa edebiyata wî gelî tinebe, wê deme ew zanistên dî tev bê wate dimînin. Lewra hebûna wan zanistan bi hebûna metnên edebî ve girêdayî ye. Eger metnên edebî tinebin mirov nikare wan zanistan li ser tiştekî tetbîq bike. Ji ber vê di nav binbeşên edebiyata klasîk de ya herî girîng zanista tarîxa edebiyata klasîk e.

CamScanner ile tarandı

BEŞA YEKEM

ÇAVKANIYÊN TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ

CamScanner ile tarandı

ÇAVKANIYÊN TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ

DESTPÊK

Ji bo mirov bikaribe li ser çavkaniyên tarîxa edebiyata Kurdî raweste, berî çavkaniyan lazim e tarîxa edebiyatê bê naskirin. Dema em pênaseyên ji bo têgeha "tarîxa edebiyatê" hatine kirin vedikolin, encameke bi vî rengî derdikeve holê: Ji wê zanista ku bi awayekî kronolojîk ji destpêkê heta îro bi perspektîfên curbicur behsa dîroka metnên edebî, kesayet, qonax û ekolên edebî dike re "tarîxa edebiyatê" tê gotin. Eger mijara me tarîxa edebiyata Kurdî be wê demê em metnan dikin metnên Kurdî û kesayetan dikin kesayetên Kurd yan jî yên Kurdînûs û hwd.

Çawa ku di beşa pênaseya edebiyata Kurdî ya klasîk de jî amaje pê hatibû kirin, çavkaniyên edebiyata Kurdî li ser du cureyan dikare bê dabeşkirin: Çavkaniyên hizrî û çavkaniyên nivîskî.

1. Çavkaniyên Hizrî

Ew çavkaniyên ku ji aliyê îlmî, hizrî û hunerî ve taybetî û unsurên edebiyata kurdî ya klasîk tînin meydanê, çavkaniyên hizrî ne. Ev cureya çavkaniyan di sazkirina metnê edebî de, digel şiyana nivîskar, dibin faktorên herî girîng. Bi gotineke dî nivîskar, di amadekirina metnê xwe yê edebî de ji van çavkaniyan sûd werdigire. Wekî termînolijiya edebiyata klasîk a ku ji Ereban û Farisan hatiye wergirtin, çanda Îslamî û çanda Îrana kevin ku di beşa pênaseya edebiyata Kurdî ya klasîk de li ser van çavkaniyan hatibû rawestan.

CamScanner ile tarandı

2. Çavkaniyên Nivîskî

Ew çavkaniyên ku di warê mijareke edebiyata klasîk de bi awayekî nivîskî hatine amadekirin û ji wan sûd tê wergirtin vê cureya çavkaniyan tîne meydanê. Ev cureya çavkaniyan li ser du beşan dikare bê dabeşkirin: Çavkaniyên tarîxa edebiyatê û çavkaniyên bi lêkolîna metnê edebî ve têkildar .

a) Çavkaniyên Tarîxa Edebiyatê

Ew çavkaniyên ku di çarçoveya serdemên tarîxî de, derheqê danasîna nivîskar û berheman de hatine nivîsandin, çavkaniyên tarîxa edebiyatê tînin holê. Ev jî di nav xwe de dibin çend cure:

Çavkaniyên Biyografîk

Çavkaniyên biyografîk, ew berhem û xebat in ku di demên curbicur de derheqê biyografiya edîb û helbestvanan de hatine nivîsandin.

Çavkaniyên Bîbliyografîk

Çavkaniyên bîbliyografîk, ew berhem û xebat in ku derheqê danasîna berhemên edebî de hatine nivîsandin.

Çavkaniyên Arîkar

Çavkaniyên arîkar, ew belge û materyal in ku mijareke tarîxa edebiyatê ronî dikin.

Lêkolînerê tarîxa edebiyatê bi arîkariya van cureyên çavkaniyan dikare tarîxa edebiyatê binivîse. Ew di merheleya pêşî de van çavkaniyan û berhem û belgeyan kom dike, di merheleya duyem de bi xwendina wan, jînenîgarî û berhemên edîbên kevn nas dike, di merheleya sêyem de wan berhem û edîbên ku di çavkaniyan de belawela cih digirin, li gorî hinek xalan kom dike û dîzayn dike û di merhelaya çarem de jî bi perspektîfên siyasî, sosyal, dînî, felsefî, psîkolojîk û hwd. tarîxa edebiyatê dinivîse.

b) Çavkaniyên bi Lêkolîna Metnê Edebî ve Têkildar

Ew çavkaniyên ku li ser metnê edebî wekî lêkolîn hatine amadekirin vê cureyê tînin meydanê. Lêkolînên ku di warê mijarên bi ruxsar û naveroka metnê edebî ve têkildar dikevin bin banê vê cureyê de.

CamScanner ile tarandı

Di vê beşê de em dê tenê li ser çavkaniyên tarîxa edebiyata Kurdî rawestin. Lê berî ku em dest bi mijarê bikin, bi heseb ku edebiyata Kurdî ya klasîk parçeyek ji edebiyata klasîk a rojhilatê ye, pêwîst e em bi kurtî di vî warî de li rewşa edebiyatên klasîk ên rojhilatê binêrin. Lewra bi vî awayî em dê bikaribin edebiyata Kurdî ji aliyê çavkaniyên edebiyatê ve bi edebiyata klasîk a gelên rojhilatê re rûbirû bikin û cihê wê destnîşan bikin. Herweha naskirina wan edebiyatan dê ji me re bibin qalib û model da ku em bikaribin li ber wan qaliban kêmayî û zêdehiyên edebiyata Kurdî bipîvin.

1. DI EDEBIYATÊN ROJHILATÊ DE ÇAVKANIYÊN TARÎXA EDEBIYATÊ

Di edebiyatên gelên rojhilatê de di serdema Îslamî de kevneşopiya nivîsandina berhemên biyografîk ên derbareyê helbestvanan de gelekî bi hêz e. Ev berhemên bi vî rengî bi piranî di edebiyata Erebî de wekî "Tebeqatu'ş-Şu'ara" û di edebiyatên Farisî û Tirkî de wekî "Tezkîretu'ş-Şu'era" hatine binavkirin. Di van berheman de nivîskar, nav an jî mexlesên helbestvanên ku heta bi serdema wî jiyane, yan jî yên di serdema wî de dijîn, yan jî yên endamê meslekekê/ekolekê yan jî deverekê ne; bi piranî bi awayekî alfabetîk (li gorî rêza herfên hêceyê yên elîfbêya Erebî) bi rêz dike û li binê navê her helbestvanekî pêşî derheqê jiyana wî de bi kurtî agahiyan dide, piştre cihê wî yê edebî nîşan dide, helbestên wî dinirxîne û herî dawî jî hinek mînakên bijarte ji helbestên wî pêşkêş dike.

Ev cure berhem li gorî kronolojiyê pêşî di edebiyata Erebî de hatine dayîn, lê di van berheman de biyografiya endamên meslekên curbicur yên wekî feqîh, qarî, helbestvan û hwd tevan bi hev re cih girtine. Berhemên taybet ji bo biyografiya helbestvanan cara pêşî di edebiyata Farisî de peyda bûne. Herçiqas di edebiyata Farisî de Nîzamiyê Erûzî (k.d.1157) bi terzê "Tebeqat"ên Erebî berhemek bi navê "Çehar Meqale"

CamScanner ile tarandı

ku tê de biyografiya helbestvan, tebîb û gelek meslekên dî cih girtine nivîsandibe jî, berhema ewil ya ku ji bo helbestvanan hatiye terxankirin piştî wî ji aliyê Muhemmed Ewfî (k.d.1233) ve bi navê "Lubabu'l-Elbab"ê hatiye nivîsandin. Piştî vê berhemê vê carê bi îfadeya "tezkîre"yê di vî warî de berhemeke gelekî girîng ji aliyê Dewletşah (k.d.1485) ve bi navê "Tezkîretu'ş-Şu'era"yê hatiye nivîsandin. Piştre di edebiyata Farisî de gelek tezkîreyên dî yên wekî "Heft Îqlîm"a Emîn Ehmed Razî (k.d.1602) û "Ateşgede"ya Azar Lutf Elî Beg hatine nivîsandin.

Li pey rêça edebiyata Farisî di edebiyata Tirkî de jî di vî warî de gelek berhem hatine dayîn. Cara pêşî di sala 1491ê de helbestvanê Tirk ê Çağatay Elî Şîr Newayî bi navê "Mecalîsu'n-Nefayîs"ê tezkîreyek nivîsandiye. Piştî wî di dema Osmaniyan de li Anadolê cara pêşî di sala 1538an de Sehî Beg tezkîreyek bi navê "Heşt Behîşt"ê nivîsandiye. Piştî Sehî Beg di sahaya Osmaniyan de bi giştî derdora 30 heb tezkîre hatine nivîsandin ku "Tezkîretu'ş-Şu'era"ya Latîfî, "Meşa'îru'ş-Şu'era"ya 'Aşiq Çelebî, "Gulşen-î Şu'era"ya 'Ehdî, Tezkîreya Salim û ya Sefayî ji van berheman çend mînakê girîng in.[3]

Herçiqas cureya "tezkîre"yê ji bo tarîxa edebiyatê çavkaniya sereke be jî ji bilî wan gelek cure-berhemên dî jî hene ku mirov dikare wan berheman jî ji bo tarîxa edebiyatê wekî çavkaniyên talî yan jî yên dereceya duyem binirxîne û ji wan sûd wergire. Lewra di wan berheman de jî gelek caran derheqê edîb û helbestvanan de agahî hatine dayîn. Mecmû'e, conk û berhemên biyografîk yên meslek/ekolên curbicur (wekî biyografiya xettat, mûsîqîşinas, mî'mar, ulema û mutesewwif û hwd.) di vê çarçoveyê de ne.

Di edebiyatên Erebî, Farisî û Tirkî de di serdema modern de jî herçiqas li ser tarîxa edebiyata klasîk gelek xebat hatibin

3 H. İpekten, M. İsen, F.Kılıç, İ. H.Aksoyak, A. Eyduran, Şâir Tezkireleri, Grafiker. Ankara 2002; Iskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, L&M,Ist. 2003, r. 469-471.

CamScanner ile tarandı

kirin jî ev xebat ji yên serdema klasîk cuda ne û ne bi şêweya tezkîre û mecmû'eyan, lê bi şêweyeke modern bi terzê tarîxên edebiyatê û antolojiyan hatine nivîsandin.

2. DI EDEBIYATA KURDÎ DE ÇAVKANIYÊN TARÎXA EDEBIYATÊ

Sedsala XIXan di dinyayê tevî de wekî sedsala modernîzmê tê binavkirin. Kurdên ku berê bi form û hizrên xwe di nav serdemeke klasîk de bûn, wekî gelên dî yên rojhilatê di serdema modernîzmê de ketin bin bandora hizra modernîzma Ewropî û di vê serdemê de edebiyata wan jî kete bin bandora edebiyata modern a Ewropiyan. Ji ber ku taybetiyên her du serdeman (serdema klasîk û ya modern) ji hev cuda ne em dê di vê çarçoveyê de li gorî her du serdeman li çavkaniyên tarîxa edebiyata Kurdî binêrin.

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA YEKEM
SERDEMA KLASÎK

Di serdema klasîk de edebiyata Kurdî ya klasîk ji aliyê teşeyên nezmê û cureyên edebî ve di nav edebiyata klasîk a rojhilatê de cihê xwe yê taybet girtiye. Lê digel vê jî di hinek waran de hinek valahî mane û di wan waran de ji ber hinek sedeman di edebiyata Kurdî de nimûne nehatine dayîn, yan jî nimûneyên zeîf peyda bûne. Berhemên biyografik ên derheqê jînenîgariya edîb û helbestvanan de û yên bîbliyografik ên derheqê kunyeyên berheman de di nav van waran de derdikevin pêş. Bi qasî ku tê zanîn di serdema klasîk de di edebiyata Kurdî de çi bi navê "tezkîre"yan û çi bi navekî dî berhemên serbixwe û biyografik ên edîb û helbestvanan nehatine nivîsandin. Bo nimûne berhemeke biyografik ku di sedsala XVIan, yan jî XVIIan de hatibe nivîsandin naye zanîn. Bêguman ev tişt bi rewşa Kurdan a dîrokî ve girêdayî ye.

I. DI SERDEMA KLASÎK DE ÇAVKANIYÊN EDEBIYATA KURDÎ

Digel ku di serdema klasîk de berhemên serbixwe yên biyografik ên derbareyê helbestvanên Kurdan de nehatine nivîsandin jî, bêguman pêwist e hin cure çavkaniyên di ku di nivîsandina dîroka edebiyata Kurdî de ji wan sûd bê wergirtin hebin. Di vê çarçoveyê de em dikarin mecmû'eyên helbestan ên serdema klasîk û agahiyên di destnivîsên Kurdî (wekî dîwan û mesnewiyan) yên wê serdemê de ji bo tarîxa edebiyata Kurdî wekî çavkaniyên sereke nîşan bidin. Herweha berhemên dîroka Kurdan, berhemên curbicur ên bi zimanên Tirkî, Farisî û Erebî û belgenameyên di erşîvan de jî di vî warî de weki çavkanî derdikevin pêş. Lê ji bilî van em dikarin rîsaleya Mela Mehmûdê Bazîdî û A. Jaba ya derheqê helbestvanên klasîk ên Kurdan de di vî warî de wekî xebata yekem bihesibînin.

CamScanner ile tarandı

Li vê derê wekî çavkaniyên serdema klasîk em dê pêşî li ser rîsaleya Mela Mehmûd û piştre jî li ser sê mecmû'eyên wê demê rawestin.

A. RÎSALEYA "ŞA'IR Û MUSENNEFÊN DI KURDISTANÊ" YA MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ

Ev rîsale ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve bi piştgiriya Alexsandre Jaba di nîveka sedsala XIXem de hatiye nivîsandin. Piştî ku li Ewropa xebatên li ser Kurdolojiyê di sala 1789an de bi gramera Garzoniyê Îtalî dest pêkiriye ne bi gelekî, di nîveka pêşîn a sedsala XIXan de Rûsan jî dest avêtine Kurdolojiyê. Di vê demê de Akademiya Rûsîstanê, balyozê Rusîstanê yê Erzeromê A. Jaba (1800-1891), bi komkirina berhemên Kurdî û rêkirina wan bo Rûsîstanê wezîfedar kirine. Jaba, li Erzeromê 17 salan jiyaye (1848-1866) û bi arîkariya melayên Kurdan ên wekî Mela Mehmûdê Bazîdî, Taha Hecî Ebdulezîz, Mihemed Xerîb Silêman, Şah Neze, Mela Mihemed, Hesen Hekîmbaşî û Mihemedê Muksî li ser destnivîsên Kurdî gelek xebat kirine.

Rîsaleya "Şa'ir û Musennefên di Kurdistanê" jî yek ji van xebatan e. Ev xebat di sala 1860î de li Petersbûrgê bi navê "Recueil de Notices et Recits Kourdes" (Cimayî rîsaleyan û hikayetan bi zimanê Kurdî) hatiye çapkirin. Bi vî awayî cara pêşî di vê berhemê de derheqê biyografiya helbestvanên Kurdan de rîsaleyek hatiye çapkirin.[4]

Herçiqas ev berhem û ev rîsale ji aliyê Jaba ve hatibe çapkirin jî, wekî hemû berhemên wî yên li ser Kurdan, di amadekirina vê berhemê de jî rola sereke ya Mela Mehmûdê Bazîdî ye. Eger Jaba nexwestiba, ew berhem û agahiyên derbareyê vê edebiyatê de kom nedibûn. Herweha eger Bazîdî di serî de piştgirî û agahî nedaba Jaba, dîsa ev tişt pêk nedihat.

Di vê rîsaleyê de derbareyê heşt helbestvanên Kurd de agahî hene. Ev helbestvan jî ev in: Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê

4 Qenatê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Öz-Ge, Ankara 1992, r. 14.

CamScanner ile tarandı

Teyran, Melayê Bateyî, Ehmedê Xanî, Mela Îsmaîlê Bazîdî, Şerefxan û Muradxanê Bazîdî. Çawa ku tê dîtin di rîsaleyê de tenê helbestvanên Kurdên Kurmanc cih girtine.

Bi qasî ku tê zanîn ev rîsale yekem xebata biyografîk e ku derheqê helbestvanên Kurdan de hatiye amadekirin. Herçiqas rîsaleyeke biçûk jî be, ji ber ku di vî warî de xebata ewilîn e zehf bi qîmet e. Dîsa herçiqas rîsale hatibe çapkirin jî, ji ber ku di serdema klasîk de hatiye amadekirin û agahiyên wê ji aliyê melayekî klasîk ve bi terzê berê hatine dayîn em vê rîsaleyê wekî tezkîreyeke biçûk ku bi terzê tezkîreyên rojhilatê hatiye nivîsandin dihesibînin.

B. MECMÛ'EYÊN HELBESTAN

Ji ber ku mecmû'eyên helbestan nav û helbestên gelek helbestvanan di xwe de dicivînin, em wan jî ji tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk re wekî çavkanî dihesîbînin. Lewra ew helbestvanên ku helbestên wan di wan mecmû'eyan de peyda dibin, ji tarîxa edebiyata Kurdî re dibin mijar û navên wan li lîsteyên helbestvanan tên zêdekirin. Carcaran di wan mecmû'eyan de derheqê wan helbestvanan de hinek agahî jî tên peydakirin. Lêkolînerê tarîxa edebiyatê ji van agahiyan sûd werdigire û cihê wan di tarîxa edebiyata Kurdî de destnîşan dike. Bi vî awayî mecmû'eyên helbestan di serdema klasîk de dibin cureyek ji çavkaniyên tarîxa edebiyata Kurdî. Li jêrê em dê wekî mînak behsa sê heb mecmû'eyan bikin.

1. Keşkûlî Şiîrênî Kurdî "Kurdiya Goranî"/ Anthology of Gorani Kurdish Poetry

Ev mecmû'e ji helbestên Kurdiya Goranî pêk tê. Helbestên tê de ji aliyê Şêx Abdelmomenî Merdoxî (1739-1797) ve hatine komkirin. Anwar Sultanî, ev mecmû'e li Londonê di sala 1998an de çap kiriye. Mecmû'e, piştî vê çapê li Silêmaniyê jî ji aliyê "Binkey Jîn" ve careke dî hatiye çapkirin.

CamScanner ile tarandı

2. Dîwana Kurmancî

Ebdureqîb Yûsif di sala 1961ê de li pirtûkxaneya Mûsilê mecmû'eyeke helbestan a destnivîsar ku di sala 1767an de hatiye nivîsandin dîtiye û ev mecmû'e digel hinek şîroveyan di sala 1971ê de li Necefê bi navê "Dîwana Kurmancî" çap kiriye. Di vê mecmû'eyê de helbestên gelek helbestvanên Kurmanc ên wekî Eliyê Herîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, Melayê Cizîrî, Mensûrê Girgaşî, Mîna, Macin, Sadiq, Pertew Beg û Şêx Nûredînê Birîfkanî cih girtine. Bi taybetî helbestvanên bi navê Macin, Sadiq û Mîna berî dîtina vê mecmû'eyê nedihatin naskirin. Latîniya vê berhemê ji aliyê Elîşêr ve hatiye amadekirin û pêşî li Ewropayê ji aliyê weşanxaneya Jîna Nû ve (sal: 1988) û herî dawî jî li Stenbolê ji aliyê weşanxaneya Dîwanê ve (sal: 2012) hatiye belavkirin.

3. Keşkûla Kurmancî

Ev mecmû'eya ku Celîlê Celîl amade kiriye helbestên bijarte yên helbestvanên navbera sedsalên X û XXan di xwe de dicivîne. Mecmû'e li Kurdistana Rojava (Sûrî) ji aliyê Mela Mirad ve hatiye parastin. Celîlê Celîl, ev mecmû'e bi navê "Keşkûla Kurmancî" li Wienê di sala 2004an de çap kiriye.

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA DUYEM
SERDEMA MODERN

Serdema modern taybetiyên serdema klasîk di xwe de na hewîne. Ji ber vê yekê çavkaniyên edebiyata Kurdî yên serde ma modern jî ji yên serdema klasîk cuda ne. Dema em li var cudahiyên di navbera wan de dinêrin, tabloyeke weha derdike ve pêşiya me.

a. Di serdema klasîk de çavkaniyên ku dîrekt li ser tarîxa edebiyata Kurdî hatine nivîsandin nînin, lê çavkaniyên ser dema modern dîrekt li ser tarîxa edebiyata Kurdî hatine nivî sandin. Wekî nimûne di serdema klasîk de tezkîreyên helbest vanên Kurdan nayên dîtin, lê di serdema modern de berhemên tarîxa edebiyata Kurdî peyda dibin.

b. Cureyên çavkaniyên serdema klasîk ji yên serdema modern cuda ne. Bo nimûne di serdema klasîk de mecmû'e, dîwan û mesnewiyên destnivîs hwd. hene, lê di serdema modern de antolojî, berhemên tarîxa edebiyatê hwd. hene.

c. Çavkaniyên serdema klasîk destnivîs in, lê yên serdema modern çapkirî ne.

d. Çavkaniyên serdema klasîk ne di asta dewra xwe de ne, lê yên serdema modern di asta dewra xwe de ne. Di serdema klasîk de dema ku li nav Faris û Tirkan bi navê "tezkîre"yan berhemên biyografîk yên helbestvanan dihatin nivîsandin, Kurdan bi vî rengî ti berhem nenivîsandine. Lê di serdema modern de Kurdan jî wekî Faris û Tirkan bi terzê antolojî û berhemên tarîxa edebiyatê çavkaniyên edebiyata xwe dane.

Li jêrê em dê bi firehî behsa cureyên çavkaniyên serdema modern bikin. Lê berî em derbasî wê bibin em dê pêşî li gorî kronolojiyê behsa qonaxên wan berheman bikin.

CamScanner ile tarandı

I. LI GORÎ KRONOLOJIYÊ QONAXÊN ÇAVKANIYÊN TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ

Ji aliyê kronolojiyê ve em dikarin nivîsandina çavkaniyên tarîxa edebiyata Kurdî bikin heft merhele:

1. Qonaxa Destpêkê (Qonaxa Dawiya Osmaniyan).
2. Qonaxa Kurdistana Başûr.
3. Qonaxa Şamê.
4. Qonaxa Rûsyayê.
5. Qonaxa Diyasporayê.
6. Qonaxa Kurdistana Bakur.
7. Qonaxa Kurdistana Rojhilat.

A. QONAXA DESTPÊKÊ (QONAXA DAWIYA OSMANIYAN)

Berhema yekem ku li gorî taybetiyên serdema modern hatiye amadekirin "Encumenî Edîbanî Kurdî" ye ku ev berhem ji aliyê Emîn Feyzî ve di sala 1920/21ê de di vê qonaxê de li Stenbolê hatiye nivîsandin. Emîn Feyzî Kurdeki Soran e, xelkê Silêmaniyê ye. Di sala 1860î de hatiye dinyayê. Li Bexdayê mudûrtiya mekteba eskerî kiriye. Piştre walîtiya bajarê Silêmaniyeyê kiriye û ji ber vê jî wekî Emîn Feyzî Beg hatiye naskirin. Piştî ku malnişîn bû derket seyahetê û çû Ewropa. Ji wir jî hat Stenbolê û dawiya temenê xwe li wir bûrand. Berî ku "Encumenî Edîbanî Kurdî" binivîse, bi taybetî di warê riyaziyatê de sê berhem nivîsandin. Dîwana wî ya bi navê "Şu'aat" ji helbestên wî yên Tirkî pêk tên. Ew û Şêx Riza Talebanî dostên hev bûn û ji hev re nameyên menzûm ên bi Farisî dişandin. Piştî nivîsandina berhema xwe (1920-21) di jiyana xwe ya şexsî de gelek zehmetî û nexweşî kişandine û di sala 1923 yan 1924an de li welatê Ereban wefat kiriye.

Emîn Feyzî di vê berhema xwe de cih daye helbestên 16 helbestvanên Soran ku ew jî ev in: Salim, Nalî, Şêx Riza, Kurdî, Hicrî, Ahî, Xeste, Herîs, Herîq, Arif, Mihemed Axa, Mewlewî ,

CamScanner ile tarandı

Emîn Feyzî, Mewlana Xalid Ziyaeddîn, Ahî, Hesen Kenoş. Di berhemê de ji bo her helbestvanekî çendîn helbest hene. Lê ji bo her yekî ji wan beşeke serbixwe nehatiye terxankirin, helbestên wan tevlihev hatine rêzkirin.[5]

Emîn Feyzî sebebê nivîsandina berhema xwe bi Kurdiya Soranî weha îfade kiriye:

> "Udeba û Şu'eray Kurd zor in. Lakîn asariya be tewawî cem' û telîf nekirawe. Min niyetim kird ke be'zê le eş'arî Kurdî Baban teb' û neşir bikem ta bizanrê mulkî Baban çend menbe'ê feyz û zeka ye."[6]

Ev berhem di sala 1983ê de ji aliyê "Korî Zanyarî Iraq-Destey Kurd" ve digel zêdekirina hinek têbîniyên edebî û tarîxî, ji nû ve hatiye çapkirin. berhem piştre di sala 1988an de li Erbîlê dîsa hatiye çapkirin. Berhem, herî dawî ji aliyê M. Xalid Sadînî ve bi herfên latînî hat amadekirin û di nav weşanxaneya Dîwanê de hat weşandin (2013).

Ji ber ku ev berhema Emîn Feyzî yekem berhema li ser edebiyata Kurdî ya di serdema modern de ye girîngiya wê zehf e. "Encumenî Edîbanî Kurdî" hemû taybetiyên serdema modern di xwe de dihewîne. Lewra Emîn Feyzî ev berhema xwe dîrekt li ser edebiyata Kurdî bi navê "Encumenî Edîbanî Kurdî", wekî yên Farisi û Tirkî di asta serdema xwe de û bi cureyekî modern (antolojî) amade kiriye û ya herî girîng jî wekî mecmû'eyan bi destnivîsî nehiştiye, çap kiriye.

Emin Feyzî berhema xwe di serdema dawî ya dewleta Osmaniyan de li Stenbolê nivîsandiye. Di wê dewrê de li Stenbolê di navbera Tirk û Kurdan de têkiliyên rewşenbîrî zehf bûn. Berî Emîn Feyzî li Stenbolê berhemên ewilîn li ser tarîxa edebiyata Tirkî dihatin çapkirin. Bi îhtîmaleke gelekî mezin Emîn Feyzî di nivîsandina vê berhema xwe de îlhama xwe ji wan xebatan girtiye.

---

5 Emîn Feyzî, *Encumenî Edîban*, (Amd. M. Xalid Sadînî), Dîwan, Stenbol 2012, r. 17-24.

6 Emîn Feyzî, h.b., r. 27.

CamScanner ile tarandı

Piştî ku Emîn Feyzî di sala 1920/1921ê de ev berhema xwe nivîsand, di dewra dewleta Osmanî de bi vî rengî berhemeke duyem nehat nivîsandin. Emîn Feyzî, ku bîra nivîsandina antolojiyekê biriye, eger di jiyana xwe de derfet bidîta bêguman dê xebatên dî yên orjînal jî bikira. Piştî wî di demeke kurt de dawî li dewleta Osmaniyan hat û rewşenbîrên Kurd ên li Stenbolê belav bûn.

B. QONAXA KURDISTANA BAŞÛR

Piştî serdema Osmaniyan bi taybetî Kurdistana Başûr (Kurdistana Iraqê) bûye cihê xebatên li ser Kurdolojiyê û vê qonaxê ji sala 1932yan destpêkiriye û heta bi sala 1980yî dewam kiriye. Ev qonax ji aliyekî ve dewama qonaxa yekê ye. Lewra di destpêka vê qonaxê de çawa ku Emîn Feyzî li Stenbolê bi Kurdiya Soranî û li ser helbestvanên Soran antolojiya xwe nivîsandibû, piştî wî li Kurdistana Başûr dîsa bi Kurdiya Soranî, li ser helbestvanên Soran û bi şiklê antolojiyan xebat hatin kirin. Piştî van antolojiyan berhemên tarîxa edebiyatê jî hatin nivîsandin û piştre îcar bi Kurdiya Kurmancî hinek berhem hatin nivîsandin. Ev qonax temendirêjtirîn û dewlemendtirîn qonax e. Lewra biqasî ku me tesbît kiriye di navbera salên 1932-1980yî de di vê qonaxê di warê çavkaniyên tarîxa edebiyata Kurdî de de 13 heb berhem hatine dayîn. Ew berhem jî e v in:

1. Ebdulkerîm Xakezî, *Berhevok*, Bexda, 1932.
2. Pîremêrd, *Guldesteyî Şu'erayî Haw'esrim* (Gulçîna Gulîstanê), 1939.
3. Elaeddîn Seccadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, (2 berg) Çapxane-i Ma'arif, 1952.
4. Refîq Hilmî, *Edebî Kurdî / Şi'r û Edebiyatê Kurdî* 1956.
5. Me'rûf Xeznedar, *Exanî Kurdistan*, 1960.
6. Kerîm Şereza, *Koye û Şairên wê*, 1961.
7. Sadiq Behaedîn Amêdî, *Şa'irên Navça Amêdiyê* 1970-71.

CamScanner ile tarandı

8. Ebdureqîb Yûsif, *Dîwana Kurmancî*, Necef, 1971.
9. Me'rûf Xeznedar, *Kurtnivîsandina Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Nûjen*, Moskova 1967.
10. Me'rûf Xeznedar, *Le Babet Mêjûy Edebî Kurdiyewe*, Bexda, 1984.
11. Sadiq Bahaeddîn Amêdi, *Hozanvanêt Kurd*, Bexdad 1980.
12. Kurdistan Mukriyanî, *Honrawey Afretî Kurd Lêkolînewe*, Erbîl 1980.
13. Izzeddîn Mustefa Resûl, *eş-Şi'ru'l-Kurdî Heyat we Nitac Şu'eraihî*, Bexda 1980.

Piştî salên 1980yî jî li Kurdistana Başûr ev berhemên jêrîn hatine dayîn:

1. Hemdî Ebdulmecîd Selefî, Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Mu'cemu'ş-Şu'erai'l-Kurd*, Spîrêz Dihok 2008.
2. Tehsîn Îbrahîm Doskî, *el-Medxel li Diraseti'l-Edebi'l-Kurdî, Cem'iyetu Ulemaî Kurdistan*, 1993.
3. Me'rûf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Hewlêr 2001.
4. Reşîd Findî, *Min Yenabî'ı eş-Şi'ru'l-Klasîkî el-Kurdî*, Erbil 2004.
5. Izzeddîn Mustefa Resûl, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Silêmaniye 2012.

C. QONAXA ŞAMÊ

Di vê qonaxê de meqaleya Celadet Elî Bedirxan a ku di Hawarê de weşandiye zehf girîng e. Bedîrxan ev nivîsa xwe bi mexlesa Herekol Azîzan di bin sernavê "Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin" de weşandiye.[7] Ev xebat jî wekî yên Kurdistana Başûr di demeke zû de hatiye nivîsandin, lê bereksê Kurdistana Başûr, piştre li Sûrî dewama xebatên bi vî rengî nehatiye.

7 Herekol Azîzan, "Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin", *Hawar*, Nûdem, Stokolm 1998, (s. 1941, hj. 33), r. 6.

CamScanner ile tarandı

Rewşen Bedîrxan jî bi navê "Sefehat Mîne'l-Edebi'l-Kurdî" (ji edebiyata Kurdî çen rûpel) li Beyrûdê berhemeke bi Erebî weşandiye (1954).

D. QONAXA RÛSYAYÊ

Piştî Kurdên Başûr û Rojhilat cara pêşî li Rûsyayê li bajarê Lenîngradê ji aliyê Qenatê Kurdo ve li ser tarîxa edebiyata Kurdî berhemek hat nivîsandin. Kurdo wekî binema ji Qersê ye, lê wekî malbat koçî Ermenistanê kirine. Wî li Lenîngradê salên direj serokatiya beşa Kurdî kiriye û di warê Kurdolojiyê de berhemên hêja dane.

Ev berhema Kurdo ya li ser tarîxa edebiyata Kurdî bi navê "Tarîxa Edebyeta Kurdî" hatiye nivîsandin û cara pêşî li Stokolmê di sala 1983yan de di nav du bergan de hatiye çapkirin (Roja Nû).

Bi qasî ku tê zanin, di qonaxa Rûsyayê de di warê tarîxa edebiyata Kurdî de tenê ev xebata Qenatê Kurdo heye. Lêbelê xebata Marûf Xeznedar a doktorayê ku li Rûsyayê hatiye nivîsandin jî ("Oçerkî Îstorî Sovremennoy Kûrdskoy Lîtêratûrî"/Kurtnivîsandina Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Nûjen" du vî warî de dikare bê hesibandin. Di vê qonaxê de ji aliyê gelek Kurdologan ve li ser Kurdî gelek xebatên bi şêweya lêkolînî jî hatine kirin.

Li gorî agahiyên ku Qenatê Kurdo dide, haya rojhilatnasên Ewropî ji xebatên ku li Rûsîstanê û li Iraqê li ser Kurdî hatibûne kirin tinebû. Lewra yên wekî Katrêmêr E. M., Dravêr G. R. di nivîsarên xwe de gotine ku literatura Kurdî nin e. Di dawiya sedsala nozdehan û di destpêka sedsala bîstan de haya dinyayê ji edebiyata Kurdî çêbûye. Ew jî bi saya serê zanyarên Kurd li Iraqê û saya serê pirtûkên M. B. Rudenko û pirtûka Me'rûf Xeznedar li Rûsyayê çêbûye.[8]

---

8 Kurdo, h.b., r. 19-20.

CamScanner ile tarandı

E. QONAXA DIYASPORAYÊ

Bi qasî ku em dizanin li diyasporayê di warê tarîxa edebiyata Kurdî de heta niha çar xebat hatine çapkirin:

1. Qenatê Kurdo, "Tarîxa Edebiyata Kurdî", Roja Nû, Stokolm 1983. Herçiqas Kurdo, ev berhema xwe cara pêşî li diyasporayê çap kiribe jî, ev berhme di binemaya xwe de aîdê qonaxa Rûsyayê ye.

2. Keşkûlî Şiîrênî Kurdî "Kurdiya Goranî", Girdekoy: Şêx Abdelmomenî Merdoxî. London: Trastî Son bo Kurdistan, 1998. / Anwar Sultanî, ed. Anthology of Gorani Kurdish Poetry. Comp. A. B. Mardoukhi (1739-1797). London: Soane Trust for Kurdistan, 1998.

3. Zeynelabidîn Zinar, Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexekirî, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Stockholm 1991.

4. Celîlê Celîl, Keşkûla Kurmancî sedsal X-XX, Wien 2004.

F. QONAXA KURDISTANA BAKUR

Qonaxa Kurdistana Bakur piştî qonaxên Başûr, Rojava, Rojhilat û Rûsyayê dest pê kiriye û lewma qonaxeke derengmayî ye. Sebebê vê jî ew e ku piştî avakirina Cumhûriyeta nû zimanê Kurdî û xebatên li ser wê hatine qedexekirin û heta salên 1990î wekî gelek warên dî li ser tarîxa edebiyata Kurdî jî ti xebat nehatin kirin. Piştî ku di sala 1990î de qedexe ji holê rabû ji aliyê Kurdên bakur ve li Tirkiyeyê li ser edebiyata Kurdî hinek çavkanî hatin dayîn. Ew jî ev in:

1. A. Balî. Antolojiya Helbestvanên Kurd, Pelê Sor Yayıncılık, Stenbol 1992.

2. Mehmed Uzun, Antolojiya Edebiyata Kurdî, Aram, Stenbol 1995.

3. Feqî Huseyn Sağnıç, Dîroka Wêjeya Kurdî, Stenbol 2002.

4. Selim Temo, Kürt Şiiri Antolojisi, Agora İst. 2007.

5. Evîn Şikakî, Fîxana Pênûsên Nazik, Antolojiya Helbesta Kurdî, Ronahî, 2012 Amed.

CamScanner ile tarandı

Çawa ku tê dîtin herçiqas Kurdên Bakur bi derengî dest bi xebatên li ser tarîxa edebiyata Kurdî kiribin jî, piştî ku qedexe rabûye bi awayekî çalak di vî warî de berhem dane û herçiqas ev qonax ji aliyê kronolojiyê ve li pey qonaxa Kurdistana Rojhilat jî be, ji aliyê dana berheman ve ketiye pêşiya wê.

G. QONAXA KURDISTANA ROJHILAT

Li Kurdistana Rojhilat (Kurdistana Îranê) bi qasî ku em dizanin, heta niha derheqê tarîxa edebiyata Kurdî de tenê berhemek hatiye nivîsandin. Ew jî berhema Sedîq Sefizade Borekeyî ya bi navê "Mêjûy Wêjeyî Kurdî" ye. Ev berhem di sala 1375/1997an de hatiye çapkirin. Çawa ku tê dîtin, li Kurdistana Rojhilat li gorî Kurdistana Başûr di warê tarîxa edebiyatê de bi derengî berhem hatiye dayîn. Lê çawa ku dê bê dîtin, qonaxa Kurdistana Rojhilat di vî warî de berî qonaxa Kurdistana Bakur e.

II. LI GORÎ CUREYAN ÇAVKANIYÊN TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ

Du cure çavkaniyên tarîxa edebiyata Kurdî hene: Çavkaniyên sereke û çavkaniyên talî. Mebest ji çavkaniyên sereke

ew berhem in ku rasterast derbareyê tarîxa edebiyata Kurdî de hatine nivîsandin, yan jî ew mecmû'e û antolojî ne ku helbestên helbestvanên Kurdan di wan de hatine komkirin. Mebest ji çavkaniyên talî jî ew berhem in ku di wan de digel edîb û helbestvanan, biyografiyên zana û navdarên Kurdan tevan cih digrin. Bi gotineke dî berhemên sereke yên tarîxa edebiyata Kurdî tenê behsa wêjevan û helbestvanên Kurdan dikin, lê berhemên talî, digel wêjevan û helbestvanan herweha cih didin hemû zana û navdarên Kurdan.

A. ÇAVKANIYÊN SEREKE

Di nav çavkaniyên sereke de berhemên tarîxa edebiyata Kurdî, mecmû'e, keşkûl, antolojî û hwd. cih digirin. Li jêrê em

CamScanner ile tarandı

dê yek yek li ser van cure-berheman rawestin. Dema em behsa berhemên aîdê cureyekê bikin, bi mebesta ku seyra nivîsandina van berheman a dirokî jî bê dîtin, em dê li gorî kronolojiyê cih bidin wan.

1. BERHEMÊN TARÎXA EDEBIYATÊ

Di nav çavkaniyên sereke de cureya herî girîng berhemên tarîxa edebiyatê ne. Nivîsandina berhemên bi vî rengî diyardeyeke modern e û ev cure-berhem pêşî li Frensayê di dawiya sedsala XVIIIan de hatine nivîsandin. Di vî warî de berhema yekem jî aliyê François Granet ve bi navê "Reflexion sur les ouvrages de literature/Ramanên li ser Berhemên Edebî" (12 berg) hatiye nivîsandin. Piştî Frensiyan destpêka nivîsandina berhemên tarîxa edebiyatê li nav hinek miletên Ewropî li gorî kronolojiyê weha ye: Îtalyan: 1772, Alman: 1795, Rûs: 1822, Îspanî: 1861, Îngilîz: 1864.[9]

Piştî Ewropiyan Osmaniyan jî dest bi nivîsandina berhemên bi navê tarîxa edebiyatê kirin. Di vî warî de berhema yekem "Tarîxî Edebiyatî Osmaniyye" ye ku di sala 1888/89an de ji aliyê Ebdulhelîm Memdûh ve hatiye nivîsandin. Piştî vê berhemê di sala 1910ê de Şehabeddin Suleyman û di sala 1911an de jî Faîq Reşad bi heman navî du berhemên dî jî nivîsandin. Lê bêguman di nav Tirkan de Fuad Köprülü wekî damezirênerê modern ê vê sahayê tê hesibandin. Wî di sala 1914an de li gorî rêbazên Ewropiyan dest bi xebatên tarîxa edebiyata Tirkî kiriye û ev xebatên xwe demeke dirêj domandine. Köprülü halê dawî ya van xebatên xwe di sala 1926an de bi navê "Türk Edebiyatı Tarihi" çap kiriye.[10]

Dema ku Osmaniyan li Stenbolê ev xebat dikirin li wir Kurdên rewşenbîr jî dijiyan û bivênevê lazim e ev rewşenbîrên Kurdan di bin bandora van xebatan de mabin. Ji van Kurdan

9 Orhan Okay, "Edebiyat Tarihi", *DIA*, b. X, r. 403-405.

10 Burak Fatih Açıkgöz, "İlk Osmanlı Edebiyat Tarihleri ve Tarihçileri Hakkında Bazı Değerlendirmeler", *Selçuk Ünv. Sosyal Bilimler Enst. Dergisi*, s. 2012, j. 27.

CamScanner ile tarandı

Emîn Feyzî ne bi terzê tarîxa edebiyatê jî be, bi terzê antolojiyê berhemeke bi navê "Encumenî Edîbanî Kurdî" nivîsandiye ku di mijara "Qonaxa Destpêkê" de behsa wê hat kirin. Lê ji bo ku bi terzê tarîxa edebiyatê berhemên Kurdî bên nivîsandin lazim e em li hêviya sala 1951ê bimînin.

Berhemên tarîxa edebiyatê pêşî li Kurdistana Başûr bi Kurdiya Soranî û bi herfên Erebî hatine nivîsandin. Piştre bi herfên Erebi û bi Kurdiya Kurmancî, herî dawî jî bi herfên latini û Kurdiya Kurmancî berhem hatine dayîn. Li jêrê li gorî vê rêzê em dê li ser berhemên tarîxa edebiyata Kurdî rawestin.

1.1. Bi Kurdiya Soranî û Herfên Erebî

1.1.1. Elaeddîn Seccadî, Mêjûy Edebî Kurdî

Navê tam ê berhema Elaeddîn Seccadî (1907-1984) "Mêjûy Edebî Kurdî ji Zemanê Berê Kevn Heta Kutabûna Nîvê Sedsaliya Bîstan" e. Berhema Seccadî, yekemîn berhem e ku derbareyê tarîxa edebiyata Kurdî de hatiye nivîsandin. Berhem bi Kurdiya Soranî hatiye nivîsandin. Berhem cara pêşî ji aliyê nivîskarî ve di sala 1952yan de li Bexdayê li "Çapxaneî Me'arîf"ê hatiye çapkirin û di sala 1971ê de dîsa ji aliyê nivîskarî ve digel hinek destkarî û zêdehiyan li heman çapxaneyê çap bûye. Piştre di salên 1973 û 1980yî de jî çapên wê dubare bûne. Di van çapan de berhem du berg e. Herî dawî berhem di sala 2012an de li ber çapa duyem digel pêdaçûna Se'îd Keremî li Sineyê ji aliyê weşanxaneya Kurdistanê (Întîşaratê Kurdistan) ve di nav bergekê de hat çapkirin.

Di berhemê de hem helbestvanên kevn, hem jî yên nû cih girtine. Berhem bi gištî du beş in. Beşa yekem derheqê dîroka Kurdan û agahiyên derheqê wan de ye. Beşa duyem jî "Mêjûy Edeb û Edebî Kurdî" ye. Di vê beşê de pêşî agahiyên teorîk li ser dîroka edebiyatê û hinek têgehên edebiyatê hatine dayîn, piştre jî di bin sernavê "Şa'iregewrekanî Kurd" de behsa 24

CamScanner ile tarandı

helbestvanan hatiye kirin. Di dawiya vê beşê de ji bo edebiyata cîhanê jî binbeşek hatiye terxankirin. Di vir de behsa edebiyatên Misrî, Farisî, Çînî, Hindî, Îbrî, Yûnanî û Romanî yên kevin hatiye kirin û têkiliya wan bi Kurdî re hatiye destnîşankirin.

Qenatê Kurdo derbareyê girîngiya vê berhema Elaeddîn Seccadî de weha dibêje:

"Di kitêba xwe de ewî aniye ber çawa miletê Kurd mîna miletên din pêşda çûye, rabûye ser xwe, bi tevî miletên dinyayê bûye hevkarê efrandina kultura dinyayê. Ewî di xebata xwe da di komkirin û lêgerîna cure cure zarava da zehmetekî gelek mezin kiriye û baş bi hûr û kûr mijûlî lêgerîna peydabûn û pêşveçûna edebiyatê bûye. Berî wî kesek bi vê pirsê ve mijûl nedibû. Me'lûmatiyên baş ên serhatî, îş û karên nivîskar û helbestvanên Kurd gişk ne 'eyan bûn, Elaeddîn Seccadî ev gişk hildan, dane ser milê xwe û bi camêrî û serfirazî nivîsara xwe wek monografiya binaxe û wek xebatên zemanê xwe çap kir. Bona nivîsandina wê ewî gelek çavkanî bi zimanê Kurdî, Farisî, Erebî dane xebitandinê."

"Elaeddîn Seccadî di vî îş û karê xwe de tîne ber çavan ku berê berê da pêwendiya edebiyata Kurdî bi edebiyata gelek kevn ra hebûye. Ew basa edebiyata Misrê, edebiyata farisî, edebiyata çînî, edebiyata yahudî, edebiyata yûnanî, edebiyata romanî dike. Lê ewî mesele neanîne ku gotina xwe îsbat bike. Ew pêwendiya edebiyata Kurdî û edebiyata van miletên kevn bi arîkariya yeksanî û yekrengiya folklora Kurdî û edebiyata van miletan îsbat dike."

"Bona nivîsandina kitêba xwe ya hêja û bi qîmet Elaeddîn Seccadî sûdî ji nivîsarên nivîskar û lêgerînkerên Ewropayê û rojhilatê wergirtiye, hemî materyalê bi qîmet û nirx jê hilçandiye, anye ber çavên xwendewerên xwe. Kêmasiyên nivîsara wî ewe, ku ewî ew materyal bê krîtik daye xebitandinyayê û lêgerîna kultura miletê Kurd bi abûr û jiyîna civakê re girênedaye."[11]

Berhema Seccadî ji aliyê helbestvanên Kurmancan ve gelek kêm e. Lewra wî ji Kurmancan tenê behsa Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî kiriye.

---

11 Qenatê Kurdo, *Tarixa Edebyeta Kurdî*, Özge, Ankara 1992, r. 46.

CamScanner ile tarandı

1.1.2 Me'rûf Xeznedar, Le Babet Mêjûy Edebî Kurdiyewe

Ev berhema Me'rûf Xeznedar bi navê "Le Babet Mêjûy Edebî Kurdiyewe" bi Kurdiya Soranî ye û rasterast derheqê tarîxa edebiyata Kurdî de ye. Berhem di sala 1984an de li Bexdayê hatiye çapkirin. Mirov dikare vê berhema Xeznedar, ji bo berhema wî ya berfireh a bi navê "Mêjûy Edebî Kurdî" wekî bingehekê bihesibîne.

1.1.3. Sedîq Sefizade Borekeyî, Mêjûy Wêjeyî Kurdî

Berhema Sedîq Sefizade Borekeyî ya bi navê "Mêjûy Wêjeyî Kurdî", bi Kurdiya Soranî hatiye nivîsandin û di sala 1375/1997an de li Kurdistana Rojhilat li bajarê Baneyê ji aliyê Întîşaratê Nacî ve weki du bergan hatiye çapkirin. Çapa duyem a berhemê di sala 2008an de li Hewlêrê wekî sê berg hatiye kirin.

"Mêjûy Wêjeyî Kurdî", ji navdartirîn berhemên tarîxa edebiyata Kurdî tê hesibandin. Berhem ji aliyê qewareyê ve berhemeke berfireh e û tê de bi qasî 500 helbestvanî cih girtine.

Taybetiyeke vê berhemê ew e ku nivîskar bergê yekem ê berhemê ji bo helbestvanên pêgirtiyên baweriya Ehlê Heqê terxan kiriye û di vî warî de ji yên pişt xwe re bûye çavkaniya sereke. Bi rastî jî li Kurdistana Başûr Me'rûf Xeznedar û li Kurdistana Bakur Feqî Huseyn Sağnıç di warê edebiyata Ehlê Heqê de xwe spartine vê berhemê. Lê tişta sosret ew e ku kêmasiya berhemê jî dîsa di vir de derdikeve holê. Lewra Borekeyî diyalogên bawermend û derwêşên Ehlê Heqê ku ne bi mebesteke edebî, lê di konteksteke dînî de di navbera xwe de bi awayekî zarekî îcra kirine, wekî helbestên nivîskî pêşkêş kirine û ev nêrîn hem li Kurdistana Başûr, hem jî li Kurdistana Bakur di nav nivîskar û lêkolîneran de belav bûye. Di vî warî de kêmasiyeke dî jî ew e ku nivîskar dema behsa defterên Ehlê Heqê dike, cihên wan defteran nîşan nade.

Nivîskar dema mînakên helbestan dane, wekî rêbaz, hem cih daye helbestên bi diyalektên Goranî û Kurmancî, hem jî cih daye wergerên wan ên bi Kurdiya Soranî.

CamScanner ile tarandı

1.1.4. Me'rûf Xeznedar, Mêjûy Edebî Kurdî

"Mêjûy Edebî Kurdî" a Me'rûf Xeznedar ji aliyê weşanxaneya Arasê ve li Hewlêrê di sala 2001ê de hatiye çapkirin. Çapa herî dawî di sala 2010an de ji aliyê heman weşanxaneyê dîsa li Hewlêrê hatiye kirin. "Mêjûy Edebî Kurdî" di warê tarîxa edebiyata Kurdî de berhema herî dawî û herî berfireh a Me'rûf Xeznedar e û naveroka her sê berhemên nivîskar; "Exanî Kurdistan" (1960), "Oçerkî Îstorî Sovremennoy Kûrdskoy Litêratûrî" (1967) û "Le Babet Mêjûy Edebî Kurdiyewe" (1984) ên di vî warî de dikare di vê berhemê de bê dîtin.

Di vê çapê de berhem 7 berg e. Bergê yekem ê berhemê ji bo dirok û çavkaniyên edebiyata Kurdî û helbestvanên Lor û Goran ên pêgirtiyê Ehlê Heqê hatiye terxankirin. Bergê duyem ji bo helbestvanên Kurmanc hatiye terxankirin (Eliyê Herîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî). Di bergên peyrew de zêdetir li ser edebiyata Kurdiya Soranî, carinan jî li ser edebiyata Kurdiya Kurmancî hatiye rawestan.

Mirov dikare çend taybetiyên "Mêjûy Edebî Kurdî" weha rêz bike:

1. "Mêjûy Edebî Kurdî" di nav berhemên ku heta niha hatine nivîsandin de, girîngtirîn û berfirehtirîn berhema di warê tarîxa edebiyata kurdî de ye.

2. Berhem ji aliyê akademîsyenekî ve bi mejiyekî akademîk hatiye amadekirin û bi awayekî sîstematîk û akademîk behsa tarîxa edebiyata Kurdî û nûnerên wê hatiye kirin.

3. Di berhemê de nûnerên edebiyata klasîk û edebiyata nû bi hev re cih digirin.

4. Di çarçoveya deqên edebî de bi awayekî berfireh li ser hizrên helbestvanan hatiye rawestan.

5. Di berhemê de hem edebiyatên Kurdiya Lorî, Kurdiya Goranî, Kurdiya Kurmancî û Kurdiya Soranî hemû bi hev re cih digirin. Di berhemên Sedîq Sefîzade Borekeyî û Feqî Huseyn de jî behsa van gişan hatibe kirn jî, ev bi qasî "Mêjûy Edebî Kurdî" ne berfireh in.

CamScanner ile tarandı

6. Di berhemê de herî zêde ji bo edebiyata Soranî cih hatiye veqetandin.

7. Di nav berhemên bi Kurdiya Soranî de, herî zêde di vê berhemê de behsa helbestvanên Kurmanc hatiye kirin. Bergê duyem bi tevahî ji bo edebiyata Kurmancî hatiye terxankirin. Herweha di bergên dî de jî behsa edebiyata Kurdiya Kurmancî hatiye kirin. Lê kesên ku behsa wan hatiye kirin ji yên ku Qenatê Kurdo behsa wan kiriye ne zêdetir in. Bi gotineke dî di çarçoveya rîsleya Mela Mehmûdê Bazîdî de behsa wan hatiye kirin.

1.1.5. Izedîn Mistefa Resûl, Mêjûy Edebî Kurdî

Berhema herî dawî ya ku bi Kurdiya Soranî û bi alfabeya Erebî hatiye nivîsandin, "Mêjûy Edebî Kurdî" ya Izedîn Mistefa Resûl e. Nivîskar bergê yekem ê vê berhemê di sala 2012an de li Silêmaniyê çap kiriye. Nivîskar pêşî cih daye du nivîsên teorîk û rexneyî yên bi navê "Le kûyewe destpêbikeyn" û "Çon mêjuwê edebiyatman denûsînewe?". Piştî vê jî cih daye lêkolînên xwe yên berê yên derheqê tarîxa edebiyata Kurdî de ku ji van babetan pêk tên: Baba Tahirê Uryan, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, û Ehmedê Xanî.

1.2. Bi Kurdiya Kurmancî û Herfên Erebî

1.2.1. Sadiq Behaedîn Amêdi, Hozanvanêt Kurd

Sadiq Behaedîn Amêdî (1918-1982), yekem kes e ku derbareyê tarixa edebiyata Kurdî de bi Kurdiya Kurmancî berhemek daye. Ev berhema wî ya bi navê "Hozanvanêt Kurd" di sala 1980î de li Bexdayê di çapxaneya "Mecme'i'l-'Ilmî" de bi herfên Erebî hatiye çapkirin. Berhem ji aliyê Zeynelabidîn Zinar ve bi herfên latînî jî hatiye amadekirin û çapkirin (Pencînar, Stockholm 1998).

Mirov dikare çend taybetiyên "Hozanvanêt Kurd" weha birêz bike:

CamScanner ile tarandı

1. Sadiq Behaedîn di berhemê de cih daye 19 helbestvanan. Lê ev hemû jî helbestvanên Kurmanc in.

2. Nivîskar, ji bilî helbestvanên navdar ên wekî Eliyê Herîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Pertewê Hekkarî cih daye dozdeh helbestvanên dî ku piraniya wan ji devera Behdînanê ne. Ew jî ev in: Mela Mensûrê Girgaşî, Xalid Axayê Zêbarî, Mela Huseynê Bateyî, Bekir Begê Erizî, Şêx Nûredînê Birîfkanî, Şêx Tahayê Mayî, Huseynê Bamernî, Şêx Xiyaseddîn Neqşebendî, Mela Enwer Mayî, Tahirê Şûşî, Ehmed Emînê Nalbend û Tahirê Ruşdî.

3. Sadiq Bahaeddin di berhema xwe de cih daye hûrgiliyên jînenigariya van helbestvanan, nimûneyên helbestên wan nîşan dane û têkilî û danustendinên di navbera wan de destnîşan kirine.

4. Dikare bê gotin ku bi "Hozanvanêt Kurd", edebiyata Kurdiya Kurmancî li Kurdistana Başûr hatiye naskirin. Lewra berî ku Sadiq Behaedîn vê berhema xwe binivîse di berhemên li ser tarîxa edebiyata Kurdî de (wekî berhemên Emîn Feyzî û Elaedînê Secadî) kêm helbestvanên Kurmanc cih girtibûn. Di wan berheman de bi piranî helbestvanên Soran di navendê de bûn. Loma, berî Sadiq Behaedîn helbestvanên Kurmanc li Kurdistana Başûr di nav lêkolînvanên Soran de zêde nedihatibûn naskirin. Vê berhema Sadiq Behaedîn di vî warî de valahiyeke mezin dagirt.

5. Herweha lêkolînvanên Kurmanc jî gelek helbestvanên Behdînî yên wekî Mela Mensûrê Girgaşî, Xalid Axayê Zêbarî, Bekir Begê Erizî, Şêx Nûredînê Birîfkanî, Şêx Tahayê Mayî, Huseynê Bamernî, Şêx Xiyaseddîn Neqşebendî, Mela Enwer Mayî, Tahirê Şûşî bi saya vê berhema Sadiq Behaedînî bihîstin.

1.3. Bi Kurdiya Kurmancî û Herfên Latînî

1.3.1. Qenatê Kurdo, Tarîxa Edebyeta Kurdî

Berhema Qenatê Kurdo (1909 Sûsiz-Kaxizman-1985 Leningrad) ya bi navê "Tarîxa Edebyeta Kurdî" duyemîn berhema tarîxa

CamScanner ile tarandı

edebiyata Kurdî ye ku bi Kurdiya Kurmancî û yekemîn berhema tarîxa edebiyata Kurdî ye ku bi Kurdiya Kurmancî û bi herfên latînî hatiye nivîsandin. Navê berhemê ji aliyê nivîskar ve wekî "Gulçîna Gulîstana Şêrbêj û Helbestbêjên Kurdan" hatiye destnîşankirin. Lê berhem ne bi navî, wekî "Tarîxa Edebyeta Kurdî" meşhûr bûye.

Nivîskar berhema xwe li Rûsyayê nivîsandiye, lê li Stokolmê çap kiriye. Berhem li Stokolmê di nav weşanxaneya Roja Nû de wekî du berg hatiye çapkirin (bergê yekem di sala 1983yan de û bergê duyem di sala 1985an de). Berhem cara duyem di sala 1992yan de li Ankarayê ji aliyê weşanxaneya "Öz-Ge"yê ve wekî cildekî hatiye çapkirin. Herî dawî di sala 2011an de ji aliyê weşanxaneya Lîsê ve dîsa wekî bergekî li Diyarbekirê hat çapkirin.

Qenatê Kurdo berhema xwe kiriye sê beş. Beşa yekem ku di pozîsyona destpêkekê de ye, wekî "Tarîxa Edebiyata Kurdî bi Kurteberî" bi nav kiriye û di wir de cih daye 4 meqaleyên li ser tarîxa edebiyata Kurdî. Ev meqale jî ev in:

a. Tarîxa Lêgerîna Edebiyata Kurdî li nav Kurdan de û li Rûsistanê da

b. Rola Kovar û Rojnameyên di Tarîxa Lêgerîna Edebyeta Kurdî da

c. Melûmetiyên Şerefxan Bitlîsî û Evliya Çelebî Derheqê Zanyar, Hozan û Şayîrên Kurdan da

d. Lêgerîna Edebyeta Kurdî li Iraqê da.

Beşa duyem ku bi sernavê "Şêrbêj û Helbestbêjên Kurmanc" e, derheqê helbestvanên Kurmancan de ye. Nivîskar di vê beşê de cih daye 13 helbestvanan ku 10 heb ji wan ên klasîk in, 3 heb jî ên nû ne. Helbestvanên klasîk ev in (Bi îmlaya orjînal): Elî Herîrî,Ehmed Mele Batê, Feqê Teyran, Meleyê Cizîrî, Selîm Sulêman, Ahmedê Xanî, Xaris Bîtlîsî, Pertew Begê Hekarî, Şêx Xalid. Helbestvanên nû jî ev in: Cigerxwîn, Osman Sebrî, Qedrîcan.

Beşa sêyem ku bi sernavê "Şêrbêj û Helbestbêjên Soranî" ye, derheqê helbestvanên Soranan de ye. Nivîskar di vê beşê de

CamScanner ile tarandı

jî cih daye 22 helbestvanan ku ew jî ev in: Nalî, Kurdî, Hacî Qadir Koyî, Şêx Riza Telebanî, Edeb Ebdila Misbah, Mela Mihemed Koyî , Wefayî , Xerîq , Bêhûd, Zîver , Sebrî, Selam, Salim, Qane Muzher, Ahmed Muxtar Beg, Pîremêr, Ebdula Goran, Dildar, Bêkes, Remzî û Mela Marif Hejar.

Kurdo di vegotina mijaran de pêşî behsa jînenigariya helbestvanan kiriye û piştre ji helbestên wan gelek nimûne dane.

Çend taybetiyên girîng ên "Tarîxa Edebyeta Kurdî" ev in:

1. "Tarîxa Edebyeta Kurdî" yekemîn berhema tarîxa edebiyata Kurdî ye ku bi Kurdiya Kurmancî û bi herfên latînî hatiye nivîsandin. Ji sala 1983ê ve di vî warî de di nav Kurdên Kurmanc de rêçikeke mezin vekiriye û ji bo lêkolîneran bûye çavkaniyeke girîng.

2. Di Kurdiya Kurmancî de yekemîn berhema akademîk e. Ji ber ku Qenatê Kurdo akademisyen e, dema derheqê helbestvanan de agahî dane, xwe spartiye jêderên berî xwe û di çarçoveya çavkaniyan de axifiye. Berhem ji vî aliyî ve ji bo pisporan bûye nimûneyeke baş.

3. Her çar nivîsên di serê berhemê de yên derhqê tarîxa edebiyata Kurdî de gelekî girîng in û ev jî aliyê berhemê yê akademîk nîşan didin. Bi saya van nivîsan berhem ji berhemeke biyografik a jirêzê vediqete û nirxê wê zêde dibe.

4. Digel ku Kurdo Kurmanc e û li cihekî dûrî Kurdistana Başûr jiyaye, hem di nivîsên destpêkê de, hem jî di beşa helbestvanên Soran de bi awayekî serkeftî mijar pêşkêş kiriye.

Hinek kêmasiyên "Tarîxa Edebyeta Kurdî" jî hene:

1. Hijmara helbestvanên Kurmanc ên ku di berhemê de cih digirin hindik e. Kurdo digel ku berhema Sadiq Behaedîn Amêdî bihîstiye jî, negihîştiye ji wê berhemê sûd wergire û helbestvanên di wir de li berhema xwe zêde bike. Wî di çarçoveya rîsaleya Mela Mehmûdê Bazîdî de behsa helbestvanên berê kiriye. Di vî warî de tenê Pertew Begê Hekarî û Şêx Xalid (Mewlana Xalidê Şehrezorî) li lîsteyê zêde kirine.

CamScanner ile tarandı

2. Digel ku navê berhemê "Tarîxa Edebyeta Kurdî" ye jî di berhemê de di çarçoveyeke tarîxî de li gorî serdeman tesnîfek nehatiye kirin. Tenê helbestvanên Kurmanc û Soran hatine rêzkirin.

3. Nivîskar agahiyên derbareyê jiyannameya helbestvanan de bi tevahî spartiye agahiyên A. Jaba, A. Sosin û M. Rudenko ku em wan wekî kurdologên ji ekola Rûs dihesibînin. Bêguman Qenatê Kurdo jî xelekeke girîng a vê ekolê ye. Di mijara agahiyên derheqê helbestvanên Kurmanc ên berê de, ev ekol bi agahiyên di rîsaleya Mela Mehmûdê Bazîdî ve girêdayî ne. Piştî ku Kurdo berhema xwe weşandiye, bi taybetî di warê helbestvanên Kurmancan de ji aliyê lêkolînvanên Kurdistana Başûr ve gelek agahiyên nû derketine meydanê.

Digel van kêmasiyan jî berhema Qenatê Kurdo ya bi navê "Tarîxa Edebyeta Kurdî" ji ber ku yekemîn berhema tarîxa edebiyata Kurdî ya bi Kurdiya Kurmancî û bi herfên latînî ye û bi perspektîfeke akademîk hatiye nivîsandin qîmetekî xwe yê mezin heye.

1.3.2. Feqî Huseyn Sağnıç, Dîroka Wêjeya Kurdî

Berhema Feqî Huseyn a bi navê "Dîroka Wêjeya Kurdî" bi Kurdiya Kurmancî ye û li Stenbolê di sala 2002yan de ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve bi herfên latînî hatiye çapkirin.

Nivîskar di berhemê de wekî destpêkekê li ser alfabeyên Kurdan rawestiyaye. Piştre helbestvan û nivîskarên Kurd li gorî rêvebiriyên siyasî yên dîrokî (dugel), dabeş kirine. Ev dugel jî dugelê Benîdolef, Deylemî, Eyarî, Êzîdî, Etabegî, Erdelan, Baban, Dêrsim û Xalidî ne. Nivîskar di dawiyê de cih daye nivîskarên Kurd ên ku bi Kurdî nenivîsandine.

Mirov dikare çend taybetiyên "Dîroka Wêjeya Kurdî" weha birêz bike:

1. Eger berhema Mehmed Uzun a bi navê "Kürt Edebiyatına Giriş/Destpêka Edebiyata Kurdî" a ku di sala 1992yan bi Kurdî hatibû çapkirin neyê hesibandin, berhema Feqî Huseyn yekem

CamScanner ile tarandı

berhema tarîxa edebiyata Kurdî ye ku ji aliyê Kurdên Bakur ve bi Kurdî hatiye amadekirin.

2. "Dîroka Wêjeya Kurdî" di nav berhemên tarîxa edebiyatê yên bi Kurdiya Kurmancî de berhema herî berfireh û herî dewlemend e.

3. Li Kurdistana Bakur yekem car di vê berhemê de derwêş û pêgirtiyên Ehlê Heqê yên ku bi Kurdiya Goranî/Hewramî menzûmeyên xwe yên dînî gotine hatine nasandin.

4. Herweha di berhemê de hebûna agahiyên derheqê edîb û helbestvanên sedsala XXem ên ku di serdema Komara Tirkiyeyê de gihîştine û di çaroveya edebiyata klasîk de berhem dane xaleke erênî ye (Wekî Mela Nûrulahê Kodişkî û Seyîd Qedriyê Cizîrî). Di berhemên dî yên tarîxa edebiyatê de behsa van kesan nehatiye kirin.

5. Helbestvanên ku bi Kurdiya Zazakî nivîsandine tenê di vê berhemê de hene. Di berhemên dî yên tarîxa edebiyatê de behsa edebiyata Zazakî nehatiye kirin.

5. Behskirina Kurdên ku ne bi Kurdî, lê bi Tirkî nivîsandine jî taybetiyeke dî ya vê berhemê ye.

Ji bilî van xalên erênî hinek kêmasiyê "Dîroka Wêjeya Kurdî" jî hene:

1. Dikare bê gotin ku "Dîroka Wêjeya Kurdî", di mijarên menzûmeyên dînî yên Ehlê Heqê de, wergereke nebinavkirî ya berhema Sedîq Sefîzade Borekeyî ya bi navê "Mêjûy Wêjeyî Kurdî" ye. Lewra hem sernav û naverokên mijaran, hem helbestên mînak, hem jî çavkaniyên mijaran ji yên Sedîq Borekeyî ne cuda ne. Gelek çavkaniyên ku di dawiya mijaran de hatine dayîn (wekî defterên Ehlê Heqê), ne yên li ber destan e û rasterast ji berhema Borekeyî hatine wergirtin. Ji ber vê jî tohmeta întîhalê li ser vê berhemê heye.[12]

12 Bnr. Sidqî Hirorî, "Feqî Huseyn Sagniçî û Dîroka Wêjeya Kurdî", http://www.kulturname.com/?p=301.

CamScanner ile tarandı

2. Nivîskar di vê berhemê de vegotineke bi mubalexe bi kar aniye û gelek caran ketiye nav anakronîzmê. Dema ku behsa helbestvanên berê kiriye, herwekî ku ew helbestvanê berê di atmosfera siyasî ya serdema nivîskar de jiyabin, behsa wan hatiye kirin.

Digel van kêmasiyan jî berhema Feqî Huseyn a bi navê "Dîroka Wêjeya Kurdî" di nav Kurdên Bakur de di warê tarîxa edebiyata Kurdî de valahiyeke mezin tijî kiriye û di hişmendiya lêkolîneran de roleke girîng lîstiye.

1.4.1. Bi Rûsî

Me'rûf Xeznedar, Oçerkî Îstorî Sovremennoy Kûrdskoy Lîtêratûrî

Me'rûf Xeznedar (1932-2010) yek ji wan kesan e ku cara pêşî li Rûsyayê li ser edebiyata Kurdî doktora kiriye. Xeznedar piştre li Zanîngeha Bexdayê mamostetî kiriye û jiyana xwe bi tevahî ji bo xebatên li ser tarîxa edebiyata Kurdî terxan kiriye. Xebatên wî yên girîng ên di vî warî de 4 heb in ku li jorê behsa sê heban ji van hat kirin.

Ji van xebatên wî a yekem û herî kevin teza wî ya doktorayê ye. Xeznedar teza xwe di sala 1967yan de bi zimanê Rûsî bi navê "Oçerkî Îstorî Sovremennoy Kûrdskoy Lîtêratûrî" (Kurtnivîsandina Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Nûjen" li Moskovayê çap kiriye.

Li gorî agahiyên ku Qenatê Kurdo dide, Xeznedar di vê berhema xwe de tarîxa edebiyata Kurdî ji sala 1890î heta bi sala 1960î rewşen kiriye û rola jojname û kovarên Kurdî di pêşketin û pêşveçûna lîteratûra Kurdî ya niha de aniye ber çavên xwendevanan. Herweha nîşan daye ku afirandinên helbestvanên nîvê sedsala nozdehan û helbestvanên nîvê sedsala bîstan di lîteratûra Kurdî de ciyê pêşîn digrin.

Li gorî agahiyên ku Qenatê Kurdo dide, haya rojhilatnasên Ewropî ji xebatên ku li Rûsîstanê û li Iraqê li ser Kurdî hatibûne kirin tinebû. Lewra yên wekî Katrêmêr E. M., Dravêr G. R.

CamScanner ile tarandı

di nivîsarên xwe de digotin ku literatura Kurdî nin e. Di dawiya sedsala nozdehan û di destpêka sedsala bîstan de haya dinyayê ji edebiyata Kurdî çêbû. Di vî warî de rola xebatên li Iraqê û li Rûsyayê ku ev berhema Me'rûf Xeznedar jî yek ji wan e, gelekî çêbûye.[13]

Xeznedar di vê berhema xwe de ji Kurmancan tenê behsa Cegerxwîn û Qedrîcan kiriye.[14]

Ev berhema Xeznedar ji aliyê Ebdulhemîd Şêxo ve bi navê "Mûcez Tarîxi'l-Edebi'l-Kurdî el-Mu'asir" bi bal Erebî ve hatiye wergerandin û di sala 1993yan de li Helebê hatiye çapkirin.

1.5. Bi Erebî

1.5.1. Me'rûf Xeznedar, Exanî Kurdistan

Xeznedar ev berhema ku wateya wê "Helbestên Kurdistanê"ye di salên 60î de ji bo ku Ereb hay ji edebiyata Kurdî hebin, bi Erebî nivîsandiye. Tê de behsa 12 helbestvanan kiriye û li ser serpêhatiya wan rawestiyaye. Ev helbestvan ev in: Di Kurdiya Kurmancî de Ehmedê Xanî û Mîhreban Xatûn; di Kurdiya Soranî de Pîremêrd, Dildar, Bêkes, Nalî, Bêxud, Goran, Mîrza Şafî, Baba Tahir û Welî Dîwane. Xeznedar bi kurteberî li ser nav û nîşanên helbestvanan û naveroka afirandinên wan rawestiyaye, çend nimûneyên helbestên wan nîşan kiriye û herweha li ser formê helbestan û kêş û qafiyeya wan jî sekiniye. Lê bi tarîxê re bi girêdan li nivîsandina afirandinên wan nenihêriye. Mijûlî berepêşçûna civata Kurd nebûye û nivîsandina helbestên wan bi tevgera Kurdan ve girênedaye.[15]

13 Kurdo, h.b., r. 19-20.
14 Kurdo, h.b., r. 8.
15 Kurdo, h.b., r. 47, 48.

CamScanner ile tarandı

1.5.2. Izedîn Mistefa Resûl, eş-Şi'ru'l-Kurdî Heyat we Nitac Şu'eraihî

Ev berhema Izedîn Mustefa Resûl jî bi Erebî hatiye nivîsandin. Wergera navê wê bi Kurdî "Helbesta Kurdî, Jiyanname û Berhemên Helbestvanên Kurd" e. Ev berhem di sala 1980yî de li Bexdayê di çapxaneya Hewadisê de hatiye çapkirin. Usman Deştî navê berhemê bi Kurdî dide: "Şi'rî Kurdî Jiyan û Berhemî Şa'iranî"

1.5.3. Rîwî, Tarîxu'l-Edebi'l-Kurdî el-Hedîs we'l-Mu'asir

Ev berhem çawa ku ji navê wê tê fêmkirin derheqê dîroka edebiyata Kurdî ya hevçerx de ye. Berhem di sala 1997an de li Beyrûdê hatiye çapkirin.

1.5.4. Reşîd Findî, Min Yenabî'î eş-Şi'ru'l-Klasîkî el-Kurdî

Ev berhema Reşîd Findî jî bi Erebî hatiye nivîsandin. Wateya navê wê "Ji Çavkaniyên Helbesta Kurdî ya Klasîk" e. Di berhemê de bi taybetî li ser jiyannameya helbestvanan bi hûrgilî hatiye rawestan û ji helbestên wan jî mînak hatine dayîn. Berhem di sala 2004an de li Hewlêrê hatiye çapkirin.

1.5.5. Hemdî E. Selefî-Tehsîn Îbrahîm Doskî, Mu'cemu'ş-Şu'erai'l-Kurd

Berhem li gorî sedsalan hatiye tesnîfkirin û di her sedsalekê de behsa helbestvanên wê sedsalê hatiye kirin. Berhem bi vî halê xwe dişibe tezkîreyen berê. Lê bi fihrîstên xwe yên dewlemend zehftir dikeve kategorya berhemeke ansîklopedîk. Berhem bi Erebî hatiye nivîsandin û di sala 2008an de li Dihokê ji aliyê weşanxaneya Spîrêzê ve hatiye çapkirin.

CamScanner ile tarandı

2. MEQALE Û NIVÎSÊN LI SER TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ

Bêguman meqale û nivîsê li ser tarîxa edebiyata Kurdî zehf in. Lê li vir em dê ji wan tenê behsa du hebên kevn û ji ber vê yekê jî girîng bikin.

2.1. Herekol Azîzan, Klasîkên Me an Şair û Edîbên Me ên Kevin

Derheqê vê nivîsa Celadet Elî Bedîrxan a ku di Kovara Hawarê de bi mexlesa Herekol Azîzan hatiye weşandin (Hawar 1941, hej. 33, r. 6) de di mijara "Qonaxa Sûriyeyê" de hatibû gotin ku di warê tarîxa edebiyata Kurdî de yekemîn xebata ku li Sûrî hatiye kirin ev nivîs e.

Ev xebat piştî rîsaleya û A. Jaba ya navborî duyemîn xebata tarîxa edebiyatê ye e ku bi Kurdiya Kurmancî hatiye nivîsandin.

Celadet Elî Bedîrxan di vê nivîsa xwe de digel ên ku Jaba li ser wan sekiniye, behsa gelek helbestvanên dî jî kiriye. Bi van taybetiyên xwe nivîsa "Klasîkên Me" qîmetekî xwe yê taybet heye.

Lazim e em bêjin ku herçiqas ev xebat di formata nivîseke kovarekê de jî be, qîmetê wê zehf e. Lewra berî ku Qenatê Kurdo bi Kurdiya Kurmancî û bi herfên latînî berhema xwe binivîse bi qederekê ev xebat ji aliyê Celadet Elî Bedîrxan ve hatiye weşandin.

Bedîrxan di vê nivîsê de behsa gelek helbestvanên Kurmanc û Soran kiriye û derheqê jiyana wan de bi kurtî agahî dane. Ji aliyê hijmara helbestvanên Kurmanc ve ji berhema Kurdo dewlemendtir e. Bedîrxan, di vê nivîsê de wekî çavkanî ji agahiyên ku Şêx Ebdurehmanê Garisî dane wî û rîsaleya û A. Jaba sûd wergirtiye.

Bedîrxan, di nivîsa xwe de ji bilî helbestvanan cih daye nivîskarên wekî Elî Teremaxî, Mela Ûnisê Erqetînî û Melayê Erwasî ku berhemên mensûr/pexşan dane.

Helbestvan û pexşannûsên ku di vê nivîsa Bedîrxan de cih girtine 26 kes in ku li jêrê navên wan hatine dayîn:

CamScanner ile tarandı

Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Batê, Axayê Bêdarî, Ehmedê Xanî, Simaîlê Bazîdî, Şerefxan, Miradxan, Siyahpoş, Axaok, Mewlana Xalid, Mela Yehyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Şêx Evdilqadirê Gêlanî , Hecî Fetahê Hezroyî, Şêx Mihemedê Hadî, Şêx Evdirehmanê Taxê, Nalî, Şêx Riza, Hacî Qadirê Koyî, Şêx Nûredînê Birîfkî, Evdirehmanê Axtepî, Eliyê Teremaxî, Mela Ûnisê Erqetînî, Melayê Erwasî.

2.2. Reşîd Findî, Cewletun Esre' fi Be'dî Mufredati Tarîxi'l-Edebi'l-Kurdî

Ev meqaleya Reşîd Findî bi Erebî ye û di tarîxa 8. 10. 1984an de di kovara "Cerîdetu'l-Iraq"ê de hatiye weşandin. Wateya navê meqaleyê "Li Ser Destpêka Tarîxa Edebiyata Kurdî Nêrîneke Kurt" e.

2.3. Usman Deştî, Sebaret be Mêjûnûsî Edebî Kurdî

Usman Deşît di vê lêkolîna xwe ya neçapkirî de li ser berhemên tarîxa edebiyatê nirxandineke giştî dike û li ser rê û rêbazên nivîsandina tarîxa edebiyata Kurdî radiweste.[16]

3. ANTOLOJÎ Û BERHEVOK

3.1. Emîn Feyzî, Encumenî Edîbanî Kurdî

Ji ber ku li jorê di "Qonaxa Destpêkê" de me behsa Emîn Feyzî Beg û berhema wî kiriye li vir bi kurtî em dikarin bêjin ku ev berhem yekemîn antolojiya Kurdî ye û li Stenbolê di sala 1339-1920/1921an de hatiye çapkirin. Berhem bi Kurdiya Soranî ye û nivîskar tê de behsa 15 helbestvanên Kurdên Soran kiriye. Li gorî ku Alakom dibêje ev berhem di sala 1983yan de

16 Ji bo ku Usman Deştî ev lêkolîna xwe pêşkêşî me kiriye, em ji wî re spasdar in.

CamScanner ile tarandı

ji aliyê "Karî Zanyarî Iraq-Destey Kurd" ve bi zêdekirina hinek têbîniyên edebî û tarîxî ji nû ve hatiye çapkirin.[17] Lê nusxeya di destê me de di sala 1988an de li Erbîlê hatiye çapkirin.

3.2. Ebdulkerîm Xakezî, Komele-Şi'rî Şa'iranî Kurd

Ev berhema bi Kurdiya Soranî duyemîn antolojiya helbesta Kurdî ye. Li gorî ku Rohat Alakom dibêje berhem cara pêşî di sala 1932an de li Bexdayê hatiye çapkirin. Alakom navê vê berhemê jî bi zimanê Tirkî wekî "Kürt Şairlerinin Şiirlerinden Bir Derleme" bilêv kiriye.[18]

Berhem di sala 1938an de li Silêmaniyê jî hatiye çapkirin. Qenatê Kurdo jî behsa vê çapê kiriye, lê nivîskarê berhemê wekî Ebdullah Kerim Hezzaz bi lêv kiriye û navê berhemê jî negotiye.[19]

3.3. Piremêrd, Guldesteyî Şu'erayî Haw'esrim

Pîremêrd, berhevoka xwe ya bi navê "Guldesteyî Şu'erayî Haw'esrim" di sala 1939an de li Silêmaniyê çap kiriye. Çapa duyem a vê berhemê bi serpereştiya Elî Kemal Bapîr di sala 1969an de bi destûra Wezaretu's-Seqafe we'l-Î'lam/Wezareta Çand û Ragihandinê li Silêmaniyê hatiye çapkirin. Qenatê Kurdo ev berhem wekî "Gulçîna Gulîstanê" bi nav kiriye[20] Nivîskar di vê berhema xwe de cih daye helbestên helbestvanên hevçerxê xwe Elî Kemal (Bapîr), Ehmed Muxtar Beg, Şêx Ebdulxaliq (Esîrî), Bêxud Mela Mehmûd, Pîremêrd, Hemdî, Tahir Beg, Goran, Mela Ebdullah Zîwer, Mehwî, Mela Ebdullah Miftî, Mîrza Maruf, Nûrî Şêx Salih, Natiq, Selam, Mihemed Remzî, Qanî', Refiq Hilmî, Ebdullah Hesen, Narî, Bêkes, Urfî, Şikrî. Ji ber ev berhem berî berhemên Refiq Hilmî û Elaeddînê Seccadî hatiye nivîsandin girîngiyeke wê ya taybet heye. Ji ber ku di zemanê

17 Rohat, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi*, Deng, İst. 1991, r. 167.
18 Rohat, h.b., r. 168.
19 Kurdo, h.b., r. 45.
20 Kurdo, h.b., r. 44.

CamScanner ile tarandı

Pîremêrd de piraniya van helbestvanan li heyatê bûn, Pîremêrd di çapa yekem de dîroka koça wan a dawiyê nenivîsandiye. Lê ji ber ku piştî Pîremêrd van kesana koçî dawiyê kirine, Elî Kemal Bapîr di çapa duyem de behsa vê yekê jî kiriye.[21]

3.4. Rewşen Bedîrxan, Sefehat Mîne'l-Edebi'l-Kurdî

Li gorî ku ji navê berhemê tê fêmkirin, di berhemê de ji hinek helbest û metnên Kurdî nimûne hatine dayîn. Berhem bi Erebî ye û di sala 1954an de li Beyrûdê hatiye çapkirin.

3.5. Hecî Şêx Hamid Hîsamî, Yadî Şa'îranî Kurd

Ev berhem di sala 1375/1963yan de di nav weşanên Întîşaratî Mesûd de li Tehranê hatiye çapkirin. Çawa ku ji navê wê tê fêmkirin, berhem derheqê bibîranîna helbestvanên Kurd ên berê de ye.

3.6. Refiq Hilmî, Şi'r û Edebiyatê Kurdî

Refiq Hilmî jî ji Kurdistana Başûr e. Di navbera salên 1898 û 1960an de jiyaye[22]. Nivîskar berhema xwe di sala 1941ê de nivîsandiye û di wê salê de li Bexdayê çapkiriye. Berhem piştre di sala 1956an de dîsa li Bexdayê, di sala 1988an de jî li Hewlêrê hatiye çapkirin. Herçiqas nivîskar berhem wekî du bergan amade kiribe jî, her du berg di nav cildekî de hatine çapkirin.

Hilmî, di berhema xwe de behsa helbestvanên Soran yên dema xwe kiriye. Di bergê yekem de Ehmed Begê Fettah Beg, Ehmed Begê Wesman Paşa, Emîn Feyzî Beg, Emîn Zekî Beg, Esîrî, Ahî, Bêxud, Bêkes, Pîremêrd, Hecî Qadirê Koyî, Herîq, Hemdî û Xakî cih digirin. Di bergê duyem de jî Dildar, Remzî, Zîwer, Salim, Selam, Elî Bapîr Axa, Goran û Şêx Nûrî Şêx Salih

21 Pîremêrd, *Guldesteyî Şu'erayî Haw'esrim*, (Amd. Elî Kemal Bapîr, Wezaretu's-Seqafe we'l-Î'lam (Wezareta Çand û Ragihandinê), Silêmaniye 1969.

22 Kurdo, b.n., r. 45, 47.

CamScanner ile tarandı

(21 helbestvan) cih digirin.[23] Nivîskar bi gotina Kurdo "*Bi dîtin û direj mijûlî lêgerîna afirandinên wan bûye û ramana wetenperweriya wan aniye ber çavê xwendevanan.*"[24]

3.7. Zeynelabidîn Zinar, Nimûne ji Gencineya Çanda Qedexekirî

Berhema Zeynelabidîn Zinar a bi navê "Nimûne ji Gencineya Çanda Qedexekirî" yekem berhem e ku di warê xwe de ji aliyê Kurdekî bakur ve bi herfên latînî hatiye amadekirin. Lê berhem ne li Bakur, li Stokolmê ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd ve hatiye çapkirin (di sala 1991ê de). Di berhemê de wekî rêbaz pêşî li ser jinenigariya helbestvan/nivîskaran hatiye rawestan, piştre jî ji berhemên wan deqên nimûne hatine dayîn. Berhem ji du beşan pêk hatiye. Beşa Dimîlî û beşa Kurmancî. Di beşa Dimîlî de 6 kes, di beşa Kurmancî de 65 kes cih digirin. Nivîskar beşa Kurmancî jî di nav xwe de kiriye sê binbeş. Di binbeşa yekem de zêdetir helbestvanên klasîk ên berê û hin nivîskarên nûjen, di binbeşa duyem de helbestvanên hevdem ên mutesewif ên ku zêdetir derheqê şêxên xwe de medhiye nivîsandine û di beşa sêyem de helbestên efare yên ku xwediyên wan ne diyar in cih digirin.

3.8. A. Balî, Antolojiya Helbestvanên Kurd

Antolojiya A. Balî yekem antolojî ye ku ji aliyê Kurdên Bakur ve bi Kurdiya Kurmancî hatiye amadekirin. Berhem di sala 1992yan de li Stenbolê ji aliyê weşanxaneya Pelê Sor ve hatiye çapkirin. Nivîskar di berhemê de cih daye 40 helbestvanî û jî helbestên wan nimûne pêşkêş kirine.

3.9. Mehmed Uzun, Antolojiya Edebiyata Kurdî

Ev berhema Mehmed Uzun duyemîn antolojiya bi Kurdiya Kurmancî ye ku ji aliyê Kurdên Bakur ve hatiye amadekirin.

---

23 Refiq Hilmî, *Şi'r û Edebiyatê Kurdî*, Hewlêr 1988.

24 Kurdo, b.n., r. 45, 47.

CamScanner ile tarandı

Berhem cara pêşî di sala 1995an de wekî du bergan hat çapkirin (Tümzamanlar) û di sala 2003yan de jî wekî bergekî hat çapkirin (Aram). Berhem di sala 2007an de ji aliyê Metin Aksoy ve bi navê "Kürt Edebiyatı Antolojisi"yê bi bal Tirkî ve hat wergerandin (Ithaki). Di berhemê de bi qasî 100 heb nivîskar û helbestvan û nivîs û helbestên wan ên bi Kurdiya Kurmancî, Kurdiya Soranî û Kurdiya Zazakî cih digirin. Ev nivîskar û helbestvan ji aliyê 30 heb lêkolînvanî ve hatine danasîn.

Di antolojiyê de nivîskarê herî kevn Fuad Temo ye (Tarîxa nivîsandina çîrokê "Şewêş"ê 1913 e). Wate antolojî destpêka sedsala XXan dest pê dike û heta bi dawiya vê sedsalê tê.

3.10. Gulçînî Şi'rî Şa'iranî Kurd

Ev berhem di sala 1381/2002yan de ji aliyê saziya Întîşaratî Selaheddînî Eyyûbî ve li li Urmiyeyê hatiye çapkirin. Lê nivîskarê berhemê ne diyar e. Xuya ye berhem ji aliyê lijneyekê ve hatiye amadekirin.

3.11. Seyîd Ebdulhamîd Heyretê Seccadî, Gulzarî Şa'iranê Kurdistan

Ev berhem bi Farisî ye û di sala 1382/2003yan de li Tehranê hatiye çapkirin.

3.12. Selim Temo, Kürt Şiiri Antolojisi

Di nav hemû antolojiyên Kurdî de, ji bo vê kêliyê, ya herî berfireh, antolojiya Selim Temo ya bi navê "Kürt Şiiri Antolojisi" ye. Berhem di sala 2007an de li Stenbolê ji aliyê weşanxaneya Agorayê ve, di nav du bergan de hatiye çapkirin.

Nivîskar, di antolojiyê de, piştî pêşgotineke dirêj, li gorî kronolojiyê cih daye 293 helbestvanan. Di dawiya berhemê de jînenîgariya helbestvanan hatiye dayîn û di beşa jêderan de jî, ji bo lîteratura edebiyata Kurdî lîsteyeke gelekî dewlemend hatiye pêşkêşkirin. Di berhemê de ji hemû diyalektên Kurdî helbest cih digirin.

CamScanner ile tarandı

Nivîskar, wekî rêbaz, li aliyekî ji helbestên helbestvanan nimûne pêşkêş kirine û li aliyê dî jî cih daye wergerên wan ên Tirkî.

Berhem, ji aliyê latînîzekirina metnên edebiyata Kurdî ya klasîk û wergerên wan metnan bi bal Tirkî ve bi qisûr e. Qisûreke dî ya berhemê ew e ku, helbestên kesên wekî Borazboz û Ebdusemedê Babek, ku hebûna helbestên wan ên Kurdî bi awayekî zanistî nehatiye îsbatkirin, hatine neqilkirin. Herweha, bereksê antolojiyên dî, zimanê vegotina berhemê Tirkî ye.

Lê digel van qisûran jî, ji ber ku helbestên jimareke ne kêm ên helbestvanên Kurd hatine komkirin û wergerên wan ên Tirkî hatine kirin, berhem ji bo Kurdên bakur bûye çavkaniyeke girîng û pêdawîstiya lêkolînerên li Tirkiyeyê dibîne.

3.13. Mihemed Elî Qeredaxî, Deqname-Beyt û Honrawe Kurdiyekan

Nivîskar di vê berhemê de helbest û metnên edebî yên klasîk ku ji aliyê kesên curbicur ve hatine nivîsandin komkirine. Nivîskar bergê yekem ê vê berhemê kiriye du beş. Beşa yekem derheqê helbest û beytan de ye û di vê beşê de 12 beyt/menzûme cih digirin. Beşa duyem jî derheqê pexşanê de ye û di vir de jî sê deqên pexşan cih digirin. Bergê yekem ê vê berhemê di sala 2008an de ji aliyê weşanxaneya Arasê ve li Hewlêrê hatiye çapkirin.

3.14. Seyid Muhemmed Huseynî, Ruhtaw ez Berzence ta Pirdiwer

Ev berhem berhevokeke ku derheqê metnên Ehlê Heq-Kakaiyan de hatiye amadekirin. Berhem du berg in û di sala 2011an de di nav weşanên Enstîtuya Ferhenga Kurdî (KHI) ve li Silêmaniyê hatiye weşandin. Li ser bergê berhemê li binê navê wê "Mecmû'e kelamî ez mutûnê kohenê Yarsan (Ehlê Heq-Kakaî)" dinivîsê. Wate: Berhevoka metnên kevin ên Yarsaniyan". Di berhemê de hem metnên pexşan, hem jî yên menzûm bi hev re cih digirin.

CamScanner ile tarandı

3.15. Mela Ehmedê Qoxî, Dîwana Cami'

Ev mecmû'eya Mela Ehmedê Qoxî ya bi navê Dîwana Cami', ji dîwan û helbestên curbicur ên gelek helbestvanên klasîk pêk hatiye. Dema mirov li naveroka mecmû'eyê dinêre, çar kategorî derdikevin holê:

1. Destpêk: Di destpêkê de hinek helbestên bi Erebî û Kurdiya Kurmancî ku di nav Mislimanan de, bi taybetî jî di nav mitesewifan de zêde belav bûne cih digirin.

2. Beşa Dîwanan: Di vê beşê de dîwana Şêx Ebdurehmanê Aqtepî, dîwana Mihemed Kerbelayî, dîwana Seyîd Eliyê Findikî cih digire.

3. Beşa Helbestên Farisî: Di vê beşê de helbestên Şemsedînê Tebrîzî, Mewlana Camî û Hafizê Şîrazî cig digirin.

4. Beşa Helbestên Kurdiya Kurmancî: Di vê beşê de helbestên Feqe Mihemedê Teyran, Melayê Cizîrî, Şêx Eliyê Herîrî, Şêx Nûredînê Birîfkanî, Mensûrê Girgaşî, Sadiq, Bekir Begê Erizî, Pertew Begê Hekkarî, Xakî, Mela Hesenê Qerenazî, Mela Ebdiselamê Mermerî, Mela Ebdurehmanê Melakendî, Mela Mihemed Hadiyê Licî, Şêx Ebdilqadirê Sanî, Şêx Ehmedê Xanî, Şewqî, Siyahpoş, Mela Hisênê Bateyî, Melayê Sinceqî, Macin, Seydayê Taxî, Mela Mûsayê Mizî, Melayê Mezin, Şêx Eladînê Xeznewî, Mela Mihemed Emînê Heyderî, Mela Necmedînê Tengezarî, Mela Ebdilmecîd, Şêxmûsê Hesarî, Seydayê Xasî, Îskender Bilwanî, Axaok.

Dîwana Cami', di sala 2004an de li Stenbolê ji aliyê weşanxaneya Îhsanê ve hatiye çapkirin. Dikare bê gotin ku ev mecmû'e, kultura edebiyata klasîk a di nav melayên medreseyên Bakur de baş nîşan dide. Ji ber wê jî di nav wan de gelekî belav bûye û gelek çapên wê hatine kirin.

CamScanner ile tarandı

4. BERHEMÊN DESTPÊKA EDEBIYATÊ

4.1. Elaeddîn Seccadî, Edebî Kurdî û Lêkolînewe le Edebî Kurdî

Ev berhema Elaeddînê Seccadî bi Kurdiya Soranî ye û derheqê edebiyata Kurdî û lêkolîna edebiyata Kurdî de hatiye nivîsandin. Berhem di sala 1967an de li Bexdayê hatiye nivîsandin.

4.2. Mehmed Uzun, Destpêka Edebiyata Kurdî (Kürt Edebiyatına Giriş)

Nivîskar Mehmed Uzun ev berhema xwe ya bi Kurdî di sala 1992yan de nivîsandiye û berhem ji aliyê weşanxeneya Beybûnê ve di heman salê de hatiye çapkirin. Nivîskar heman berhem di sala 1994an de bi navê "Einführung in die Kurdishe literatur" bi zimanê Almanî jî weşandiye. (Ararat Pub.) Herweha di berhema xwe ya bi navê "Antolojiya Edebiyata Kurdî" (Tümzamanlar, 1995) de di şûna pêşgotinê de dîsa cih daye metnê vê berhemê. Berhem di sala 1992yan de di rojnameya Ozgur Gundemê de bi Tirkî hatiye belavkirin û di sala 2004an de jî bi Tirkî hatiye çapkirin (Gendaş). Piştre ji aliyê weşanxaneya Ithaki ve gelek çapên vê berhemê hatin kirin.

Berhem ji destpêk, neh beş û encamê pêk tê. Beşên wê ev in:

1. Edebiyata Kurdî: Têkoşîna man û nemanê
2. Zimanên Kurdî û Zehmetiyên li Berê
3. Edebiyata zarekî ya Kurdî-Destpêka Edebiyata Nivîskî û Pexşan
4. Edebiyata Nûjen a Kurdî
5. Edebiyata Kurdî li Kurdistana Başûr û Rojhilat
6. Edebiyata Kurdî li Yekîtiya Sovyetê
7. Edebiyata Kurdî li Kurdistana Bakur û Rojava

Herçiqas ne berhemek zêde berfireh e û tê de derheqê tarîxa edebiyata Kurdî de hinek agahiyên kevn jî hebin, lê ji ber ku di sedsala XXan de yekem car ji Kurdên Bakur nivîskarekî li ser mijarên tarîxa edebiyatê berhemek nivîsandiye, qîmetê wê heye. Berhem di nav weşanên Îthakiyê de tê belavkirin.

CamScanner ile tarandı

4.3. Tehsîn Îbrahîm Doskî, el-Medxel lî Dîraseti'l-Edebi'l-Kurdî

Ev berhema Tehsîn Îbrahîm Doskî li ser mijarên edebiyata Kurdî bi giştî hatiye amadekirin û di sala 1993yan de ji aliyê "Cem'iyeta Ulemayên Kurdistanê" ve hatiye çapkirin. Berhem bi Erebî hatiye amadekirin û navê wê wateya "Destpêka Perwerdeya Edebiyata Kurdî" dide.

5. MONOGRAFIYÊN BAJARAN

5.1. Kerîm Şareza, Koye û Şairên Wê

Berhema Kerîm Şareza ya bi navê "Koye û Şairên wê" yekemîn monografî ye ku derbareyê helbestvanên Kurd ên bajerekî bi tenê hatiye nivîsandin. Niviskar di vê berhema xwe de li ser helbestvanên bajarê Koyê rawestiyaye. Berhem di sala 1961ê de li Bexdayê çap bûye.

Li gorî ku Kurdo dibêje, ew, Hacî Qadirê Koyî ne tê de, li ser wan helbestvanên Koyî yên ku di kitêba Elaeddîn Seccadî de cih negirtine, rawestiyaye. Wekî Mela Xafizê Mexzûn, Kak Mistefa Safî yên ku bi Erebî, Kurdî û Farisî helbest nivîsîne. Bi kurteberî li ser nav û nîşanên helbestvanan û naveroka afirandinên wan rawestiyaye û çend nimûneyên helbestên wan nîşan kiriye. Lê bi tarîxê re bi girêdan li nivîsandina afirandinên wan nenihêriye. Mijûlî berepêşçûna civata Kurd nebûye û nivîsandina helbestân wan bi tevgera Kurdan ve girênedaye.[25]

5.2. Sadiq Bahaeddîn Amêdî, Şa'irên Navça Amêdiyê

Ev berhema Sadiq Behaedîn Amêdî di sala 1970 yan jî 1971ê de hatiye çapkirin. Çapa wê jî yan li Bexda yan jî li Hewlêrê ye.[26] Ev monografiya duyem e ku derbareyê helbestvanên bajarekî bi tenê de hatiye nivîsandin. Ferqa wê ji ya berî xwe ew e ku zimanê vê berhemê Kurdiya Kurmancî ye.

---

25 Kurdo, b.n., r. 48.

26 Kurdo, b.n., r. 50.

CamScanner ile tarandı

5.3. Îbrahîm Efxemî, Tarîx û Edebî Mukriyan

Ev berhem, çawa ku ji navê wê tê fêmkirin, derheqê tarîx û edebiyata herêma Mukriyan de ye. Mukriyan li Kurdistana Rojhilat herêmeke girîng e. Berhem di sala 1373/1993yan de li Tebrîzê wekî du bergan hatiye çapkirin.

5.4. Mistefa Nerîman, Edîb û Nûseranî Kifrî û Dewrupiştî

Ev berhem, derheqê edîb û nivîskarên bajarê Kifrî û derdora wê de hatiye nivîsandin. Ev herêm, li Kurdistana Başûr e û dikeve aliyê Kurdistana Rojhilat de. Berhem, di sala 2007an de li Bexdayê hatiye weşandin. (Dezgayî Roşenbîrî û Belawkirdi-neweyî Kurdî)

5.5. Usman Deştî, Şi'rî Nawçeyî Mukriyan

Mukriyan, herêmeke Kurdistana Rojhilat e ku îro dikeve nav wîlayeta Azerbeycana Rojava. Nivîskar di vê monografiyê de tenê li ser helbestvanên vê herêmê yên nîveka pêşî ji sedsala bîstan rawestiyaye û berhemên wan ji aliyê ruxsar û naverokê ve tehlîl kirine. Berhem bi Kurdiya Soranî ye û di sala 2009an de li Silêmaniyê hatiye çapkirin.

5.6. Ebdurehman Bamernî, Şa'irên Bamernê

Nivîskar Ebdurehman Bamernî helbestvanên devera Bamernê (li Kurdistana Başûr li herêma Behdînan) di vê berhema xwe de kom kirine. Nivîskar di vê berhemê de behsa 11 helbestvanên Bamernê kiriye. Berhem di sala 2011an de li Dihokê bi Kurdiya Kurmancî û alfabeya Erebî hatiye çapkirin.

5.7. Abdurrahman Adak, Helbestvanên Sêrt, Şirnex, Silîvan û Liceyê

Nivîskar, derheqê helbestvanên herêmên Sêrt, Şirnex, Silîvan û Liceyê de ev lêkolînên li jêrê weşandine.

1. "Klasik Edebiyatta Siirtli Şairler", *Uluslararası Siirt Sempozyumu Bildirileri*, Birleşik Matbaa, İzmir 2007.

CamScanner ile tarandı

2. "Siirtte Şiir ve Şair Üzerine Bazı Analiz ve Değerlendirmeler", *İbrahim Hakkı ve Siirt Uleması Sempozyumu*, Beyan. İst. 2008.

3. "Şırnak ve Çevresinde Yetişmiş Kürtçe Yazan Şairlere Genel Bir Bakış", (Uluslararası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu, 14-16 Mayıs 2010 Şırnak-Cizre), Şırnak Ünv. Şırnak 2010.

4. "Silvanlı Şairlere Genel Bir Bakış", *Uluslararası Silvan Tarihi Sempozyumu*, (Silvan, 25-27 Nisan 2008) Kent Işıkları, İst. 2012.

5. "Liceli Şairlere Genel Bir Bakış", *Dünden Bu Güne Lice Sempozyumu* (05-06 Eylül 2008, Lice), Mardin Artuklu Ünv., Mardin 2012.

6. MONOGRAFIYÊN JINAN

6.1. Kurdistan Mukriyanî, Honrawey Afretî Kurd Lêkolînewe

Bi qasî ku xuya dike ev berhema Kurdistan Mukriyanî, yekem berhema edebiyata Kurdî ye ku derbareyê helbestvanên jin ên Kurd de hatiye nivîsandin. Berhem di sala 1980yî de li Erbîlê hatiye çapkirin. Mukriyanî di vê berhema xwe de li ser 19 helbestvanên jin ên Kurd rawestiyaye (Rohat, 170.)

6.2. Evîn Şikakî, Fîxana Pênûsên Nazik

Ev berhem jî antolojiya helbestên jinan e û piştî berhema Mukriyanî duyemîn berhem e ku hemû helbestvanên jin di nav xwe de civandine. Di antolojiyê de bi Kurdiya Kurmancî û Kurdiya Soranî helbestên 70 helbestvanî cih digirin. Helbestvanên di antolojiyê de ji her çar aliyên welatê Kurdan in ku nivîskar di vê çarçoveyê de berhem kiriye çar beş: Bakurê Helbestê, Başûrê Helbestê, Rojavayê Helbest û Rojhilatê Helbestê. Antolojî di sala 2012an de ji aliyê weşanxaneya Ronahiyê ve li Amedê hatiye çapkirin.

CamScanner ile tarandı

B. ÇAVKANIYÊN TALÎ: BIYOGRAFIYÊN GIŞTÎ

Çavkaniyên talî ew çavkanî ne ku mebest ji nivîsandina wan ne edebiyata Kurdî ye. Ev çavkaniyên bi vî rengî berhemên biyografiyê yên giştî ne. Di wan de ji hemû meslekan (siyaset, zanist, tesewif, jin, eskeriye û hwd.) derheqê hemû navdarên Kurdan agahî cih digrin. Lê digel van meslekan mirov dikare derheqê edîb û helbestvanên Kurdan de jî agahiyan peyda bike. Ji ber vê yekê ev çavkanî ji bo edebiyata Kurdî li gorî yên sereke di dereceya duyem de ne.

Ev cure-berhem jî weki yên sereke di serdema modern de hatine nivîsandin û di sedsala XXan de li dewletên ku Kurd lê dijîn, yan jî li dîasporayê hatine dayîn. Qismekî mezin ji van berheman ji bo îsbata hebûna Kurdan bi zimanê dewletan ên fermî (Erebî, Farisî û Tirkî) hatine nivîsandin. Herweha seyra van berheman li gorî rewşa siyasî ya wan dewletan diguhere. Ji ber vê yekê em dê hem li gorî dewletan, hem jî li gorî zimanên van cureyan dabeş bikin.

1. LI KURDISTANA BAŞÛR

1.1. Bi Soranî

Piraniya biyografiyên giştî li Kurdistana Rojhilat û Başûr hatine amadekirin. Sebebê vê ew e ku di sedsala XXan de li van welatan kultura Kurdî nehatiye qedexekirin û di vî warî de azadiyek hebû. Ji ber vê azadiyê jî hem ji nav Kurdên van her du dewletan kesên zana û rewşenbîr derketine, hem jî bi Kurdî yan jî li ser Kurdan bi zimanê Erebî û Farisî berhem hatine nivîsandin. Ji ber ku azadiyeke bi vî rengî li Tirkiyeyê tinebû berhemên bi vî rengî li wir nehatin dayîn.

1.1.1. M. Emîn Zeki Beg, Meşahîrî Kurd û Kurdistan

Ev berhem di warê biyografiya giştî de berhema yekem e. Ji ber vê yekê qîmetê wê gelek mezin e. Berhem ji aliyê Muhemmed 'Elî 'Ewnî ve bi bal Erebî ve hatiye wergerandin û di sala 1947an de li Misirê çap bûye. "Daru'z-Zeman"ê di 2011an

CamScanner ile tarandı

de berhem cara duyem çap kir. Piştî wergera Erebî îcar ji aliyê Mehmet Bayrak ve bi navê "Kürt ve Kürdistan Ünlüleri" wergera wê ya Tirkî hat kirin û ev berhem sala 2005an di nav weşanên Oz-ge yê de derket.

1.1.2. Ebdulkerîm Muhemmed Muderris, Yâdî Merdân

Ebdulkerîm Muhemmed Muderrisê ku di navbera salên 1902-2005an de jiyaye, alimekî mezin yê medreseyên Kurdan e û gelek berhemên hêja li pey xwe hiştine. Yek ji van berheman jî "Yâdî Merdân" (Tezkâru'r-Ricâl, Remembering The Great Men, Bîranîna Mezinan) e. Ev berhema ku bi Kurdiya Soranî û wekî du bergan hatiye amadekirin li Bexdayê ji aliyê "Mecma'u'l-İlmiyyi'l-Kurdî" ve hatiye çapkirin. (çapên wê: 1979, 1983). Nivîskar di vê berhema xwe de biyografiya metesewwifên Neqşebendî dide.

1.1.3. M. Eli Qeredaxî, Bojandnewey Mêjûy Zanayanî Kurd le Rêgey Destnivîsekanyanewe

Ev berhema ku heta niha ji dehan zêdetir bergên wê hatine çapkirin, ji aliyê M. Elî Qeredaxî ve di çarçoveya xebateke domdarî de tê amadekirin. Çawa ku ji navê wê jî tê fêmkirin nivîskar destnivîsan kom dike û bi vî awayî tarîxa zanayên Kurdan dinîvîsîne. Her ku cildek diqede wê cildê çap dike û piştre xebata xwe didomîne. Berpirsiyariya çapa van berheman li Hewlêrê weşanxaneya Arasê girtiye ser milê xwe.

1.2. Bi Erebî

1.2.1. Ebdulkerîm Muhemmed Muderris, 'Ulemâuna Fi Xîdmeti'l-'İlmî We'd-Dîn

Ebdulkerîm Muderrisê ku "Yadê Merdan" nivîsandibû, ji bilê wê, berhemeke dî bi navê "'Ulemâuna Fi Xîdmeti'l-'İlmî We'd-Dîn" jî nivîsandiye. Ev berhem bi Erebî ye û wateya navê

CamScanner ile tarandı

wê "Di Xizmeta Dîn Û Zanînê de Alimên me" ye. Berhem, di sala 1403/1983yan de li Bexdayê ji aliyê "Dâru'l-Hurriyye"yê ve hatiye çapkirin. "'Ulemâuna Fi Xidmeti'l-'İlmi We'd-Dîn" di warê xwe de berhemeke ewlîn û sereke tê hesibandin. Tê de behsa 506 zanayên Kurd hatiye kirin.[27]

1.2.2. Hemdi Ebdulmecîd es-Selefi û Tehsin İbrahîm Doski, 'Iqdu'-Ciman

Navê tam yê vê berhema ku ji aliyê Hemdi Ebdulmecîd es-Selefi (k.d.2012) û Tehsin İbrahîm Doski ve hatiye nivîsandin "'Iqdu'l-Ciman fi Teracimi 'Ulema we Udeba el-Kurd we'l-Mensûbine ila Qura we Mudun Kurdistan" e. Ev berhem ji bi Erebî ye û wateya navê wê "Jînenigariya Zana û Wêjevanên Kurd yan ji yên Xelkê Gund û Bajarên Kurdistanê" ye. Berhem sê berg e û di sala 2008an de ji aliyê weşanxaneya "Mektebetu'l-Esaleti we't-Turas"ê ve hatiye çapkirin.

2. LI KURDISTANA ROJHILAT

2.1. Bi Soranî

Li Kurdistana Rojhilat ji di warê biyografiya navdarên Kurdan de gelek berhemên hêja hatine nivîsandin. Sebebê vê her wekî Kurdistana Başûr hebûna azadiya çandî ye. Li vir cihê Erebî Farisî digire. Li Kurdistana Başûr hinek kesan bi zimanê fermî yê Iraqê Erebî berhem dane, li Kurdistan Rojhilat ji hin kesan bi zimanê wî welatî yê fermî Farisî berhem dane. Li jêrê em dê behsa van berheman bikin.

2.1.1. Sedîq Sefîzade Borekeyî, Bozorganî Yarsan

Sefîzadeyê ku li ser tarîxa edebiyata Kurdî berhema "Mêjûy Wêjeyî Kurdî" nivîsandibû, ev berhema bi navê "Bozorganî Yarsan" ji nivîsandiye. Berhem bi Kurdiya Soranî ye û derheqê jînenigariya mezinên baweriya Yarsanê de ye. Berhem di sala 1982yan de li Tehranê hatiye çapkirin.

---

27 Rohat, b.n., r. 170.

CamScanner ile tarandı

2.1.2. Muhemmed Salih Îbrahîm Muhemmedî, Jînawerî Zanayanî Kurd le Cîhanî Îslametî ya Gencîney Ferheng û Zanîst

Ev berhem jî bi Kurdiya Soranî ye û di sala 1364/1985an de li Tehranê hatiye çapkirin. Çawa ku ji navê wê tê fêmkirin berhem derheqê jînenîgariya zanayên Kurdan li cîhana Îslamê de ye.

2.2. Bi Farisî

2.2.1. Seyîd Ebdulhamîd Heyretê Seccadî, Şa'iranî Kurdî Parsîgûy

Ev berhem bi Farisî hatiye nivîsandin û tê de bi qasî 1232 Kurdên ku helbestên xwe bi Farisî dane cih digirin. Berhem ji aliyê weşanxaneya Neşrê Îhsan ve hatiye çapkirin.

2.2.2. Baba Merdûxê Rûhânî, Tarîxî Meşâhîrî Kurd

Ev berhem jî bi Farisî ye û çawa ku ji navê wê tê fêmkirin li ser navdarên Kurdan hatiye nivîsandin. Berhemeke girîng e û di sala 1382/1962yan de li Tehranê ji aliyê weşanxaneya Surûşê ve di nav sê bergan de hatiye çapkirin. Berhem cara duyem di nav du bergan de hatiye çapkirin.

3. LI KURDISTANA BAKUR

Ji ber qedexeya li ser zimanê Kurdî, jj aliyê Kurdên Bakur ve li Tirkiyeyê heta salên 1990î di vî warî de xebat nehatine kirin. Piştî serbestiyê jî xebatên ku hatine kirin hindik in.

3.1. Bi Kurdiya Kurmancî

3.1.1. Abdulkadir Bingöl, Kulîlkên Baxê Botan

Ev berhem monografiya navdarên herêma Botan (bajarê Cizîrê û derdora wê) e û bi Kurdiya Kurmancî hatiye amadekirin. Berhem di sala 2008an de ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve hatiye çapkirin.

CamScanner ile tarandı

Berhem ji 8 beşan pêk tê:

1. Kesayetên ji malbata Bedirxaniyan
2. Kesayetên dîrokî yên Cizîrê
3. Şêx, mela û seyidên Cizîrê
4. Siyasetmedarên Cizîrê
5. Nivîskarên hevçerx
6. Şaredarên Cizîrê
7. Dengbêj û stranbêjên Cizîrê
8. Kesên dî yên navdar

3.2. Bi Tirkî

3.2.1. Mehmet Çağlayan, Şark Uleması

Ji aliyê Kurdên Bakur ve li Tirkiyeyê xebata herî girîng a ku di vî warî de hatiye kirin berhema Mehmet Çağlayan a bi navê "Şark Uleması" ye. Ev berhem bi Tirkî hatiye nivîsandin û mija-ra wê alimên şerqê/rojhilatê ne ku mebest ji şerqê Kurd in. Çag-layan ev xebata xwe li ser bingeha xebata Ebdulkerîm Muderris ya bi navê "'Ulemâuna Fi Xîdmeti'l-'İlmî We'd-Dîn" ava kiriye. Herweha jiyannameya mela, şêx û zanayên Kurdên Bakur ên ku di sedsala XXan de jiyane jî xistiye berhema xwe. Berhem di sala 1996an de li Stenbolê ji aliyê weşanxaneya Çaglayanê ve hatiye çapkirin. nivîskar di berhema xwe de beşeke taybet ji bo jinên Kurd ên navdar veqetandiye û di vir de cih daye 33 jinan. Bi giştî di berhemê de jiyannameya 566 kesî hatiye dayîn.

Nivîskarê berhemê Mehmet Çaglayan di sala 1923yan de li Mûşê hatiye dinyayê, li medreseyên Kurdan xwendiye û bi awayekî fermî jî karê miftîtiyê kiriye û di salên dawî de wefat kiri-ye. Berhem ji ber ku ji aliyê kesekî mensûbê ekola medreseyên Kurdan ve hatiye amadekirin balê dikişîne. Lê ji ber şertên wê demê û hinek mebestan berhem bi Tirkî hatiye nivîsandin.

CamScanner ile tarandı

4. LI DIYASPORAYÊ

4.1. Bi Erebî

4.1.1. Muhemmed Elî es-Suwerekî, el-Mewsû'etu'l-Kubra lî Meşahîri'l-Kurd 'Ebre't-Tarîx

Muhemmed Elî es-Suwerekiyê ku bi binemaya xwe ji Sêwregê ye, li Urdunê dijî û li wir li ser Kurdan xebatên xwe didomîne. Ev berhema wî bi Erebî ye. Wateya navê berhemê "Ansîklopediya Navdarên Kurdan di Tarîxê de" ye. Berhem di sala 2008an de di nav weşanxaneya "ed-Daru'l-'Erebiyye li'l-Mewsû'at"ê de di nav 7 bergan de hatiye weşandin.

4.1.2. Muhemmed Elî es-Suwerekî, Mu'cem E'lami'l-Kurd

Ev berhem jî ya Muhemmed Elî es-Suwerekî ye. Navê wê yê dirêj "Mu'cem E'lami'l-Kurd fi't-Tarîxî'l-Îslamî we'l-'Esri'l-Hedîs fi Kurdistan we Xarîcîha" ye. Wateya wê "Ansîklopediya navdarên Kurdan di tarîxê û sedsala modern de li Kurdistanê û Derveyê wê" ye. Berhem ansîklopedîk e û li ser biyografiya navdarên Kurdan bi Erebî hatiye amadekirin. Berhem di nav weşanên "Binkey Jîn"ê de di sala 2006an de li Silêmaniyeyê hatiye çapkirin.

4.1.3. Muhemmed Elî es-Suwerekî, Min E'lami'l-Kurd fi Kurdistanî Turkiya

Ev berhema sêyem a Muhemmed Elî es-Suwerekî ye ku dîsa bi Erebî nivîsandiye. Lê ev berhema wî tenê li ser jînenîgariya navdarên Kurdên Bakur e.

CamScanner ile tarandı

III. BERHEMÊN BÎBLIYOGRAFÎK

1. Bîbliyografyayî Akadîmyayî Kurdî

Di vê berhema bîbliyografîk de, bi awayekî alfabetîk (alfabeya Erebî) lîsteya berhem, meqale û her cure nivîsên ku di Akademiya Kurdî (li Hewlêrê) de peyda dibin hatiye dayîn. Bergê yekem ê vê berhemê bi xebatên ku bi alfabeya Erebî hatine nivîsandin û herweha bi ziman ve girêdayî ne hatiye sînorkirin. Berhêma ku di sala 2010an de li Hewlêrê hatiye çapkirin, ji aliyê lijneyeke ku ji Wirya Omer Emîn, Şefiq Qezaz, Şiwan Silêman Yabe, Nerîman Ebdulla Xoşnaw û Mihemed Wesman ve hatiye amadekirin.

2. Rêberî Bîbliyografiye Kurdiyekan

Ev bîbliyografya ji xebat û bîbliyografyayên curbicur ên derheqê Kurdî Kurdan de ku di navbera salên 1937-2005an de hatine kirin pêk tê. Berhema ku ji du beşên giştî pêk tê bi awayekî alfabetîk hatiye amadekirin. Beşa yekem derheqê xebatên Kurdî, beşa duyem jî derheqê xebatên Erebî de ye. Di her du beşan de jî van binbeşan cih girtine: Lîsteya sermijaran, lîsteya mijaran, lîsteya nivîskaran û lîsteya navnîşanan. Berhem ku ji aliyê Şiwan Silêman Yabe ve hatiye amadekirin û di sala 2006an de li Hewlêrê ji aliyê Korî Zanyarî Kurdistanê ve hatiye weşandin.

3. Bîbliyografyayî Kurdnasî

Ev bîbliyografyaya ku ji aliyê Necatî Ebdulla ve hatiye amadekirin li ser du pirtûkan hatiye dabeşkirin û her du pirtûk jî di sala 2009an de ji aliyê Korî Zanyarî Kurdistanê ve hatiye weşandin. Pirtûka yekem bi mijara "Kurd û Kurdistan le Serçawe Frensiyekan da" û pirtûka duyem jî bi mijara "Kurd û Kurdistan le Serçawe Îngîlîziyekan de" hatine sînorkirin. Her du pirtûk jî li ser heşt binbeşan hatine dabeşkirin:

1. Mêjû, Arçîtekçir, Arkeolojya
2. Le Nîwey Duwemî Sedey Nozdehemewe ta Wekû Dirustbûnî Komarî Turkiya

CamScanner ile tarandı

3. Polîtîk, Nasyonalîzm û Dewlet

4. Bizavî Netewayetî Kurd le Diway Cengî Yekemî Cîhaniyewe ta Wekû Cengî Kendaw

5. Sefername, Cografya û Aborî

6. Komel, Ayîn û Komeleetniyekan

7. Komelnasî, Şar û Komelge

8. Ziman, Kultur û Huner

Di bîbliyografyayê de di binê her yek ji van beşan de jî binbeşên wan hene û di binê wan binbeşan de jî lîsteyên xebatan hatine rêzkirin û di binê her xebatekê de jî derheqê wê xebatê de bi Kurdiya Soranî agahî hatine dayîn.

4. Ferhenga Edîb û Nivîskarêt Devera Behdînan

Di vê berhemê de navê edîb û nivîskarên devera Behdînan bi awayekî alfabetîk hatiye rêzkirin û berhemên her nivîskarekî li binê navê wan hatine rêzkirin. Di berhemê de nivîskarên maweya 1935-2000î hatine komkirin. Berhem, ji aliyê Wesfî Hesen Ridînî ve hatiye nivîsandin û di sala 2006an de ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd ve li Dihokê hatiye weşandin.

5. Kürdoloji Bilimin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)

Ev bîbliyografyaya bi Tirkî, dewlet bi dewlet lîsteyên xebatên ku li Awropayê li ser Kurdan hatine kirin pêşkêş dike. Berhem xebatên ku di maweya 1787-1987an de hatine kirin di nav xwe de dihewîne. Nivîskar xebata xwe, ji sala 1787an ku M. Garzoniyê Îtalî wê salê li Romayê xebata xwe ya bi navê "Grammatica e vocabolario della lingua Kurda" çapkiri ye, daye destpêkirin. Berhema ku ji aliyê Rohat Alakom ve hatiye amadekirin, di sala 1991ê de ji aliyê weşanxaneya Dengê ve hatiye çapkirin.

CamScanner ile tarandı

6. Rêberî Nameekadîmiyekanî Zimanî Kurdî

Ev berhem, ji kunyeyên tezên master û doktorayê yên ku di navbera salên 1989-2006an de li Kurdistana Başûr hatine amadekirin pêk tê. Di berhemê de mijar, li gorî sê kategoriyan hatiye pêşkêşkirin: Di beşa yekem a berhemê de kunyeya tezên master û doktorayê yên derheqê ziman û edebê de li gorî kronolojiya salan hatine dayîn.; Di beşa duyem de tezên master û doktorayê bi awayekî alfabetîk li gorî nivîskaran û di beşa sêyem de jî dîsa bi awayekî alfabetîk li gorî mijaran hatine dayîn. Berhem, ji aliyê Şiwan Silêman Yabe ve hatiye amadekirin û di sala 2006an de li Silêmaniyê ji aliyê weşanxaneya Soran ve hatiye çapkirin.

7. Îndêksî Govarî Korî Zanyarî Kurd

Ev îndeks, ji kunyeyên gotarên ku di navbera salên 1973-2002yan de, di Govarî Korî Zanyarî Kurd de hatine belavkirinpêk tê. Di berhemê de du beşên sereke hene. Beşa Kurdî û Beşa Erebî. Di her du beşan de jî kunyeyên gotaran, li gorî mijar, nivîskar û sernavan cuda cuda hatine pêşkêşkirin. Ev berhem jî ji aliyê Şiwan Silêman Yabe ve hatiye amadekirin û di sala 2006an de li Hewlêrê ji aliyê Korî Zanyarî Kurd ve hatiye çapkirin.

CamScanner ile tarandı

PÊVEK I

LI GORÎ KRONOLOJIYÊ ÇAVKANIYÊN SEREKE YÊN TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ

1. Mela Mehmûdê Bazîdî, A. Jaba, Recueil de Notices et recits kourdes, Petersbûrg 1860.
2. Emîn Feyzî, Encumenî Edîbanî Kurdî, Stenbol 1920/21.
3. Ebdulkerîm Xakezî, Berhevok, Bexda, 1932 û 1938.
4. Herekol Azîzan, Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin, Hawar 1941, hej. 33.
5. Pîremêrd, Gulçîna Gulîstanê, 1939.
6. Elaeddîn Seccadî, Mêjûy Edebî Kurdî, (2 berg) Çapxane-i Ma'arif, 1952.
7. Sedîq Borekeyî Sefîzade, Mêjûy Wêjeyî Kurdî, 1997.
8. Refiq Hilmî, Edebî Kurdî / Şi'r û Edebiyatê Kurdî 1956.
9. Me'rûf Xeznedar, Exanî Kurdistan, 1960.
10. Kerîm Şereza, Koye û Şairên wê, 1961.
11. Sadiq Behaedîn Amêdî, Şa'irên Navça Amêdiyê 1970-71.
12. Ebdureqîb Yûsif, Dîwana Kurmancî, Necef, 1971.
13. Me'rûf Xeznedar, Kurtnivîsandina Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Nûjen, Moskova 1967.
14. Me'rûf Xeznedar, Le Babet Mêjûy Edebî Kurdiyewe, Bexda, 1984.
15. Sadiq Behaedîn Amêdi, Hozanvanêt Kurd, Bexda 1980.
16. Kurdistan Mukriyanî, Honrawey Afretî Kurd, Erbîl 1980.
17. Izedîn Mistefa Resûl, eş-Şi'ru'l-Kurdî Heyat we Nitac Şu'eraihî, Bexda 1980.
18. Qenatê Kurdo, Tarîxa Edebyata Kurdî, Stokolm 1983.
19. Zeynelabidîn Zinar, Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexekirî, Stokolm 1991.
20. Mehmed Uzun, Destpêka Edebiyata Kurdî, Tumzamanlar, Stenbol 1992.

CamScanner ile tarandı

21. Abuzer Balî, Antolojiya Helbestvanên Kurd Stenbol: Pelê Sor Yayıncılık, 1992.
22. Keşkûlî Şiîrênî Kurdî "Kurdiya Goranî", Girdekoy: Şêx Abdelmomenî Merdoxî. London: Trastî Son bo Kurdistan, 1998. / Anwar Sultanî, ed. Anthology of Gorani Kurdish Poetry. Comp. A. B. Mardoukhi (1739-1797). London: Soane Trust for Kurdistan, 1998.
23. Feqî Huseyn Sağnıç, Dîroka Wêjeya Kurdî, Stenbol 2002.
24. Mehmed Uzun, Antolojiya Edebiyata Kurdî, Tümzamanlar, İst. 1995.
25. Hemdi A. Selefi, Tehsîn îbrahîm Doskî, Mu'cemu'ş-Şu'erai'l-Kurd, Spîrêz Dihok 2008.
26. El-Medxel li Diraseti'l-Edebi'l-Kurdî, Cem'iyet Ulemai Kurdistan, 1993.
27. Me'rûf Xeznedar, Mêjûy Edebî Kurdî, Hewlêr 2001.
28. Celîlê Celîl, Keşkûla Kurmancî sedsal X-XX, Wien 2004.
29. Reşîd Findî, Min Yenabî'î eş-Şi'ru'l-Klasîkî el-Kurdî, Erbil 2004.
30. Selim Temo, Kürt Şiiri Antolojisi, Agora, İst. 2007.
31. Ebdurehman Bamernî, Şa'irên Bamernê, Dihok 2011.
32. Evîn Şikakî, Fîxana Pênûsên Nazik, Ronahi, Amed 2012.

CamScanner ile tarandı

PÊVEK II

LI GORÎ KRONOLOJIYÊ ÇAVKANIYÊN TALÎ YÊN TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ

1. M. Emîn Zeki Beg, Meşahîrî Kurd û Kurdistan, 1947.
2. Baba Merdûxê Rûhânî, Tarîx-î Meşâhîr-i Kurd, 1962.
3. Ebdulkerîm Muhemmed Muderris, Yâdî Merdân, 1979.
4. Sedîq Borekeyî Sefîzade, Bozorganî Yarsan, 1982.
5. Ebdulkerîm Muhemmed Muderris, 'Ulemâuna Fi Xîdmeti'l-'İlmî We'd-Dîn, 1983.
6. Muhemmed Salih Îbrahîm Muhemmedî, Jînawerî Zanayanî Kurd le Cîhanî Îslametî ya Gencîney Ferheng û Zanîst, 1985.
7. Mehmet Çağlayan, Şark Uleması, 1996.
8. Muhemmed Elî es-Suwerekî, Mu'cem E'lami'l-Kurd, 2006.
9. Abdulkadir Bingöl, Kulilkên Baxê Botan, 2008.
10. Muhemmed Elî es-Suwerekî, el-Mewsû'etu'l-Kubra lî Meşahîri'l-Kurd 'Ebre't-Tarîx, 2008.
11. Hemdî Ebdulmecîd es-Selefî û Tehsîn Îbrahîm Doskî, 'Iqdu'l-Ciman, 2008.
12. Muhemmed Elî es-Suwerekî, Min E'lami'l-Kurd fi Kurdistanî Turkiya
13. M. Eli Qeredaxî, Bojandnewey Mêjûy Zanayanî Kurd le Rêgey Destnivîsekanyanewe

CamScanner ile tarandı

PÊVEK III

TABLOYA KATEGORÎK A ÇAVKANIYÊN SEREKE

Tarîxa Edebiyatê

Hj.	Berhem	Nivîskar	Sal	Cih	Cure	Ziman/ Diyalekt	Alfabe
1	Mêjûy Edebî Kurdî (2 berg)	Elaedînê Seccadî	1952	Bexda	Tarîx	Krd. Soranî	Erebî
2	Mêjûy Wêjeyî Kurdî (2 berg)	Sedîq Sefîzade Borekeyî	1997	.Bane	Tarîx	Krd. Soranî	Erebî
3	O. Îstorî S. Kûrdskoy Lîtêratûrî	Me'rûf Xeznedar	1967	Moskowa	Tarîx	Rûsî	Krîlî
4	Le Babet Mêjûy Edebî Kurdiyewe	Me'rûf Xeznedar	1984	Bexda	Tarîx	Krd. Soranî	Erebî
5	Mêjûy Edebî Kurdî (7 berg)	Me'rûf Xeznedar	2001	Hewlêr	Tarîx	Krd. Soranî	Erebî
6	Mêjûy Edebî Kurdî	Izeddîn Mistefa Resûl	2012	Silêmaniye	Tarîx	Krd. Soranî	Erebî
7	Hozanvanêt Kurd	Sadiq Behaedîn Amêdi	1980	Bexda	Tarîx	Krd. Kurmancî	Erebî
8	Tarîxa Edebyata Kurdî	Qenatê Kurdo	1983	Stokolm	Tarîx	Krd. Kurmancî	Latînî
9	Dîroka Wêjeya Kurdî	Feqî Huseyn Sağnıç	2002	Stenbol	Tarîx	Krd. Kurmancî	Latînî
10	Exanî Kurdistan	Me'rûf Xeznedar	1960	Bexda	Tarîx	Erebî	Erebî
11	eş-Şi'ru'l-Kurdî	Izedîn Mistefa Resûl	1980	Bexda	Tarîx	Erebî	Erebî
12	Min Yenabî' eş-Şi'ri'l-Klasîkî el-Kurdî	Reşîd Findî	2004	Erbîl	Tarîx	Erebî	Erebî
13	Mu'cemu'ş-Şu'erai'l-Kurd	H. E. Selefî, T. Î. Doskî	2008	Dihok	Tarîx	Erebî	Erebî
14	Tarîxu'l-Edebi'l-Kurdî el-Hedîs we...	Rîwî	1997	Beyrûd	Tarîx	Erebî	Erebî

CamScanner ile tarandı

Mecmû'e û Antolojî							
1	Encumenî Edîbanî Kurdî	Emin Feyzi	1920	Ist.	Antolojî	Krd. Soranî	Erebî
2	Komeleşi'rî Şa'iranî Kurd	Abdulkerim Xakezî	1932, 1938	Bexda	Antolojî	Krd. Soranî	Erebî
3	Guldesteyî Şu'erayî Haw'esrim	Pîremêrd	1939	Silêmanî	Antolojî	Krd. Soranî	Erebî
4	Sefehat Mîne'l-Edebi'l-Kurdî	Rewşen Bedîrxan	1954	Beyrûd	Antolojî	Erebî	Erebî
5	Edebî Kurdî / Şi'r û Edebiyatê Kurdî	Refîq Hilmî	1956	Stenbol	Tarîx	Krd. Soranî	Erebî
6	Dîwana Kurmancî	Ebdureqîb Yûsif	1971	Necef	Mecmû'e	Krd. Kurmancî	Erebî
7	Nimûne ji Genc. Çanda Qedexekirî	Zeynelabidîn Zinar	1991	Stokolm	Antolojî	Krd. Kurmancî	Latînî
8	Antolojiya Helbestvanên Kurd	A. Balî	1992	Stenbol	Antolojî	Krd. Kurmancî	Latînî
9	Anthology of Gorani Kurdish Poetry	A. B. Mardoukhi	1998	London	Antolojî	Îng.	Latînî
10	Gulçînî Şi'rî Şa'iranî Kurd	Lijne	1381/ 2002	Urmiye	Antolojî	Krd. Soranî	Erebî
11	Gulzarî Şa'iranê Kurdistan	S. Ebdulhamîd H. Seccadî	1382/ 2003	Tehran	Antolojî	Farisî	Erebî
12	Antolojiya Edebiyata Kurdî	Mehmed Uzun	1995	Stenbol	Antolojî	Krd. Kurmancî	Latînî
13	Keşkûla Kurmancî	Celîlê Celîl	2004	Wien	Mecmû'e	Krd. Kurmancî	Latînî
14	Kürt Şiiri Antolojisi (2 berg)	Selim Temo	2007	Stenbol	Antolojî	Tirkî	Latînî
15	Deqname-Beyt û Honrawe Kurdiyekan	Mihemed Elî Qeredaxî	2008	Hewlêr	Berhevok	Krd. Sorani	Erebi

CamScanner ile tarandı

16	Ruhtaw ez Berzence ta Pirdiwer	Seyid Muhemmed Huseynî	2011	Silêmanî	Berhevok	Krd. Sorani	Erebi
Destpêka Edebiyatê							
1	Edebî Kurdî û Lêkolînewe le Edebî Kurdî	Elaeddîn Seccadî	1967	Bexda	Destpêk	Krd. Soranî	Erebî
2	Destpêka Edebiyata Kurdî	Mehmed Uzun	1992	Stenbol	Destpêk	Tirkî	Latînî
3	El-Medxel li Diraseti'l-Edebi'l-Kurdî	Tehsîn îbrahîm Doskî	1993	Kurdistan	Destpêk	Erebî	Erebî
Berhemên Monografîk							
1	Koye û Şairên wê	Kerîm Şereza	1961	Bexda	Monografî	Krd. Soranî	Erebî
2	Şa'irên Navça Amêdiyê	Sadıq Bahaeddîn Amêdî	1970-71	Bexda ?	Monografî	Krd. Kurmancî	Erebî
3	Honrawey Afretî Kurd	Kurdistan Mukriyanî	1980	Erbîl	Monografî	Krd. Soranî	Erebî
4	Tarîx û Edebî Mukriyan	Îbrahîm Efxemî	1373/ 1993	Tebrîz	Monografî	Krd. Soranî	Erebî
5	Edîb û Nûseranî Kifrî û Dewrupiştî	Mistefa Nerîman	2007	Bexda	Monografî	Krd.Soranî	Erebî
6	Şi'rî Nawçeyî Mukriyan	Usman Deştî	2009	Silêmaniyê	Monografî	Krd.Soranî	Erebî
7	Şa'irên Bamernê	Ebdurehman Bamernî	2011	Dihok	Monografi	Krd. Kurmancî	Erebi
8	Fîxana Pênûsên Nazik	Evîn Şikakî	2012	Amed	Monografi	Krd. Kurmancî	Latinî

CamScanner ile tarandı

BEŞA DUYEM

TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK

CamScanner ile tarandı

DESTPÊK

BI AWAYEKÎ GIŞTÎ TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ

Eger ji bo tarîxa edebiyatê pênaseyek bê kirin, weha dikare bê gotin: Tarîxa edebiyatê, ew zanist e ku ji destpêkê heta îro, bi awayekî kronolojîk, li ser dîroka metnên edebî, kesayet, qonax û ekolên edebî radiweste. Dema ev metn metnên Kurdî bin û ev kesayet jî kesayetên Kurdî bin, wê demê ev dibe tarîxa edebiyata Kurdî.

Çawa ku di beşa çavkaniyên tarîxa edebiyatê de jî hatibû destnîşankirin, lêkolînerê tarîxa edebiyatê bi arîkariya çavkaniyan dikare tarîxa edebiyatê binivîse. Ew di merheleya pêşî de çavkaniyan kom dike, di merheleya duyem de bi xwendina wan, jînenîgarî û berhemên edîbên kevn nas dike, di merheleya sêyem de wan berhem û edîbên ku di çavkaniyan de belawela cih digirin, li gorî hinek xalan kom dike û di merhelaya çarem de jî bi perspektîfên siyasî, sosyal, dînî, felsefî, psîkolojîk û hwd. tarîxa edebiyatê dinivîse.

Di vê beşê de jî di çarçoveya vê rêbazê de çavkaniyên tarîxa edebiyata Kurdî yên ku di beşa yekem de cih digirin hatine berhevkirin, piştre berhem û edîbên di wan çavkaniyan de hatine tesbîtkirin, piştre ev materyal li gorî serdemên tarîxî û zaraveyên Kurdî hatine dabeşkirin û di dawiyê de bi metodeke dîskrîptîf û perspektîfa tarîxa siyasî, tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk hatiye nivîsandin.

CamScanner ile tarandı

Berî ku em bi awayekî kronolojîk dest bi mijarên tarîxa edebiyata Kurdî bikin û yeko yeko bi awayekî berfireh edebiyatên diyalektên Kurdî destnîşan bikin, eger em wêneyekî giştî yê diyalekt û navendên edebî yên van diyalektan bigirin, bê guman ji bo mijarê dê bibe girîzgaheke bimefa. Em dikarin edebiyata Kurdî ji aliyê tarîxî ve di bin du beşan de dabeş bikin û binirxînin. Edebiyata Kurdî ya berî Îslamê û edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê. Lê ji ber ku edebiyata diyalektên Kurdî em dikarin bêjin bi tevahî di serdema Îslamî de ye, lazim e pêşî em li ser mijara edebiyata Kurdî ya berî Îslamê û piştî Îslamê agahî bidin da ku em bikaribin li ser navendên edebî yên serdema Îslamî rawestin.

I. EDEBIYATA KURDÎ YA BERÎ ÎSLAMÊ Û PIŞTÎ ÎSLAMÊ

Eger em ji roja pêşî heta îro li edebiyata Kurdî binêrin, em dibînin ku di sedsala heştan de, ji aliyê Kurdan ve qebûlkirina Îslamê wekî dînekî, rengekî nû daye edebiyata Kurdî ku ev reng di edebiyata Kurdî ya berî Îslamê de nîne. Edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê ji ber ku di serdema serdestiya çanda Îslamê de hatiye holê, bi awayekî, di bin bandora vê çandê de maye. Lê ev tişt ji bo edebiyata Kurdî ya berî Îslamê nayê gotin. Di her halî de ew edebiyata ku di serdema Îslamê de hatiye afirandin, ji serdema berî Îslamê cuda ye.

Eger em her du serdeman bidin ber hev dîmenekî weha derdikevê holê:

1. Edebiyata Kurdî ya berî Îslamê ji destpêkê heta bi dema misilmanbûna Kurdan, wate heta bi sedsala heftan a mîladî didome. Heçî edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê ye ew ji destpêka misilmanbûna Kurdan heta roja me ya îro didome.

2. Derheqê edebiyata Kurdî ya berî Îslamê de di destê me de gelek hindik agahî hene. Lê derheqê edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê de di destê me de zehftir agahî hene.

CamScanner ile tarandı

3. Edebiyata Kurdî ya berî Îslamê zehftir edebiyata zarekî ye. Ev cureya edebiyatê bi riya bihîstin û guhdarîkirinê ji nifşekê derbasî nifşa dî bûye. Nimûneyên edebiyata Kurdî ya nivîskî ya ku ji wê serdemê gihîştiye roja me, vê kêliyê, nayên zanîn. Herçiqas şîrovekirina derheqê wê serdemê de zehmet jî be, mirov dikare bêje ku yan di wê serdemê de edebiyata Kurdî ya nivîskî bi rastî jî hindik e, yan jî eger hebe jî negihîştiye roja me. Yekûna herî mezin a edebiyata Kurdî ya nivîskî piştî Îslamê pêk hatiye.

4. Edebiyata Kurdî ya berî Îslamê, ne di nav formên edebî de ye, yan jî ne bi terzê berhemên edebî ye. Eger nimûneyên wê derkevin meydanê jî, ew dê zêdetir bi terzê nivîstek û tabletan be. Lê edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê di nav formên edebî yên Îslamî, piştre jî di nav formên edebî yên Ewrupî de hatiye nivîsandin û bi terzê berhemên edebî ye.

A. EDEBIYATA KURDÎ YA BERÎ ÎSLAMÊ

Edebiyata Kurdî ya berî Îslamê, wekî şimûl, hem edebiyata Kurdî ya zarekî, hem jî edebiyata Kurdî ya nivîskî di nav xwe de dihewîne. Ji destpêkê heta serdema Îslamê, çi belgename û nivîstekên bi Kurdî hebin, dê bikevin nav vê çarçoveyê de.

Bêguman gihîştina belge û metnên Kurdî ji serdema berî Îslamê bo roja me tiştekî girîng e. Lewra ev belge ji aliyê ziman, îfade û uslûbê ve dê bikevin nav mijarên lêkolînên edebî de jî. Bêguman tiştekî tebî'î ye ku ji serdema berî Îslamê hindik belge û nivîs bigihîjin roja me. Ev ji bo hemû zimanan wisa ye. Lê gelo di warê zimanê Kurdî de, ji serdema berî Îslamê, belge û nivîs qet gihîştine me û eger gihîştibin ew çi ne? Heta niha, ji aliyê gelek kesan ve, gelek belge wekî belgeyên Kurdî yên aîdê serdema berî Îslamê hatine nîşandan. Lêbelê Kurdîbûna van belgeyan bi awayekî zanistî nehatiye îsbatkirin. Di vî warî de tenê qeydeke nivîskî heye ku, li gorî vê qeydê, berî Îslamê Kurdên Pînoşad û Masî-Soratî bi kurdî hinek berhem nivîsandine, lê ew berhem jî negihîştine îro.

CamScanner ile tarandı

1. BERHEMÊN KU BI ALFABEYA BÎNUŞAD Û MASSÎ SÛRATÎ HATINE NIVÎSANDIN

Li gorî agahiyên tarîxî, berî serdema Îslamê alfabeyeke Kurdan a taybet heye û bi vê alfabeyê berhemên Kurdî jî hatine nivîsandin. Ev agahî di berhema nivîskarê Keldanî Îbnu'l-Wehşiyye a bi navê "Şewqu'l-Musteham fî Me'rifetî Rumûzi'l-Eqlam"ê de nivîsandiye (sal: 856) cih digire. Îbnu'l-Wehşiyye ev berhema xwe di dewra Emewiyên Endulusê de li ser daxwaza siltanê wê dewletê nivîsandiye. Berhem derheqê alfabeyên berê de hatiye nivîsandin. Di vê berhemê de nivîskar behsa hemû alfabeyên berî xwe dike û herweha behsa alfabeyeke Kurdan jî dike.

Nivîskar derheqê alfabeya Kurdan de dibêje ku ev alfabe ji aliyê pêşiyên Kurdan ên bi navê Bînuşad û Massî Sûratî ve di berhemên wan de hatiye bikaranîn. Li gorî agahiyên ku nivîskar dide, ev alfabeyeke xerîb e, gelekî cuda ye û di alfabeyên dî de herfên wekî yên wê ji aliyê wî ve nehatine dîtin. Li gorî ku nivîskar dibêje wî li Bexdayê di navê lehîdekî de nezî 30 heb berhemên ku bi vê alfabeyê hatine nivîsandin dîtine û li Şamê jî du berhemên ku bi vê alfabeyê hatine nivîsandin bi wî re hebûne: Yek ji wan derheqê rezên tirî û xurmeyan de û ya dî jî derheqê tesbîtkirina çavkaniyên avê û derxistina avê ji binê erdê de bûne. Dîsa li gorî ku nivîskar dibêje, wî ev her du berhem ji Kurdî qulibandine zimanê Erebî.[1]

Ji van agahiyan derdikeve meydanê ku di serdema berî Îslamê de alfabeyeke Kurdan a bi vî rengî hebûye û Kurdan

---

1 Ebûbekir Ehmed b. Elî b. Wehşiyye en-Nibtî, *Şewqu'l-Musteham fî Me'rifeti Rumûzi'l-Eqlam*, (http://manuscrit-spirituel.blogspot.com.tr/2013/06/blog- post_1838.html) r. 60, 134-135; Ji bo hinek gotarên di vî warî de bnr. Kadri Yıldırım, "Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni", Kürt Tarihi, s. 2013, j. 5, İstanbul, r. 24-29; Wisif Zozanî, "En Eski Kürt Alfabesi", Gazetekurd.com, 01.10.2012; Muhammed Ronî el-Meranî, Bilinen En Eski Kürt Alfabesi, (wer. ji erebî: Haşim Özdaş), Kürt Tarihi, s. 2013, j. 5, İstanbul, r. 14-20.

CamScanner ile tarandı

bi vê alfabeyê gelek berhem jî nivîsandine. Herçiqas her du berhemên ku jî aliyê nivîskar ve bi bal Erebî ve hatine wergerandin, berhemên zanistî jî bin, îhtîmal heye ku hin jî wan berhemên dî yên edebî bin. Herweha wergera van berheman bi bal Erebî ve jî, bi tena serê xwe, girîngiya wan nîşan dide.

2. ŞAŞIYÊN KU DI VÎ WARÎ DE HATINE KIRIN

Heta niha jî aliyê hin lêkolînerên Kurdistana Başûr û Rojhilat ve, wekî belgeyên nivîskî yên Kurdî yên berî Îslamê, hinek materyal hatine pêşkêşkirin û jî aliyê hin lêkolînerên Kurdistana Bakur ve jî ev nêrînên wan hatine parvekirin û belavkirin.[2] Lê vê dawiyê hat îsbatkirin ku ev nêrînên ku di vî warî de tên derbirîn, jî rastiya zanistê dûr in.[3]

Belgeyên ku jî bo serdema berî Îslamê tên nisbetkirin, li ser du beşan dikarin bên dabeşkirin: Yên ku wekî Kurdî hatine qebûlkirin û pêşkêşkirin û yên ku hebûna wan nehatiye îsbatkirin. Di beşa yekem de hebûna materyalan tê zanîn, lê Kurdîzekirina wan tişteki keyfî ye. Di beşa duyem de hebûna belgeyan nayê îsbatkirin. Her du rewş jî perspektîfa zanistî dûr in.

Gelo jî aliyê Kurdan ve çima ev helwest hatiye nîşandan? Wusa xuya ye ku du sedemên vê hene: Ew belge yan bi şaşî bo serdema berî Îslamê hatine referekirin, yan jî di çarçoveya kompleksekê de, li ser navê neteweperweriya Kurdî, hin tişt hatine afirandin.

Bi qeneeta me, ev helwest, li hember nijadperestiya Ereb û Farisan, wekî reaksiyoneke Kurdên Başûr û Rojhilat dika-

---

2 Feqî Huseyn Sağnıç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2000, r. 23-33; Mamoste Qedri, "Helbestvanên Kurd Heta Baba Tahir", *Bir*, hj. 4. (http://www.kovarabir.com/mamoste-qedri-helbestvanen-kurd-heta-baba-tahir/); Kadri Yıldırım, "Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni", Kürt Tarihi, s. 2013, j. 5, İstanbul, r. 24-29; Selim Temo, *Kürt Şiiri Antolojosi*, b. I, r. XLIX-LI.

3 Ergin Öpengin, "Kadim Kürtçe'nin İzinde Tevatür ve Temellük Kıskacında Kürt Kültür Tarihçiliği", Kürt Tarihi, s. 2013, j. 11, İstanbul.

CamScanner ile tarandı

re bê nirxandin ku di encamê de li hember şaşiyekê şaşiyeke dî hatiye kirin. Herweha çawa ku di nimûneya Evdisemedê Babek de jî xuya dike, ji bo serdema piştî Îslamê jî, helwesta weşandina helbestên ku hebûna wan nehatine îsbatkirin tê dîtin. (Bnr. Beşa "Edebiyata Kurdiya Kurmancî-Serdema Berî Mîrektiyan")

Li jêrê bi kurtî dê li ser van nêrînan bê rawestan.

2.1. Belgeyên ku Wekî Kurdî Hatine Qebûlkirin

Belgeyên ku wekî Kurdî hatine qebûlkirin du heb in. Yek ji wan Avesta ye, ya dî jî nivîstekên Hewramanê ne.

2.1.1. Avesta

Heta niha ji aliyê hin lêkolîneran ve Avesta (pirtûka pîroz a Zerdeştiyan), wekî metnekî Kurdî/Medî ku aîdê serdema berî Îslamê ye hatiye pêşkêşkirin û ev rêzên jêrîn ji gotinên Zerdeşt Pêxember wekî mînak hatine dayîn.

Yemm e xişter awrûh e
Newît ewtem newît germem
Newît zor û newît miritiyuş

Wate:
Cem padişahek pir navdar bû,
Dema wî ne sar bû ne germ bû,
Ne pîrbûn hebû ne mirin hebû

Lêbelê bi awayekî zanistî hatiye îsbatkirin ku têkiliya Kurdî, yan jî zimanê Medan bi zimanê ku Avesta pê hatiye nivîsandin re tuneye. Lewra Kurdî û Avestaî du zimanên Îranî yên cihê ne.

2.1.2. Nivîstekên Hewramanê

Di sala 1909an de li Hewramanê li şikeftekê hinek nivîstek hatine dîtin. Se'îd Kurdistanî (Se'îd Xan Sineyî) sê heb ji van tabletan birine Birîtanyayê. Yek ji wan nivîstekan bi alfabeya

CamScanner ile tarandı

Aramî û du hebên dî jî bi ya Yûnanî hatine nivîsandin. Minss li ser yên bi alfabeya Yûnanî, A. Cowley û yên dî jî li ser a bi alfabeya Aramî lêkolîn kirine û lêkolînên xwe weşandine. Piştî van lêkolînan derketiye meydanê ku yek ji wan nivîstekan 88 sal, yek jê 22 sal, ya dî jî 11 sal berî zayînê di dema Eşkaniyan de hatine nivîsandin.

Lê ji aliyê pisporan ve hatiye îsbatkirin ku her du nivîstekên bi alfabeya Yûnanî, bi zimanê Yûnanî û nivîsteka bi alfabeya Aramî jî, bi zimanê Partî hatine nivîsandin.

2.2. Belgeyên ku Hebûna Wan Nehatiye Îsbatkirin

Hin ji belgeyên ku wekî belgeyên nivîskî yên Kurdî yên berî Îslamê amaje bi wan hatiye kirin, heta niha qet nehatine bidestxistin û ji bo cîhana zanistê nehatine pêşkêşkirin. Bi gotineke dî hebûna wan nehatiye îsbatkirin. Ev jî du heb in: Helbesta Boraboz û helbesta rahibekî Zerdeştî bi navê Xelîl Mendelîcî.

2.2.1. Helbesta Boraboz

Li gorî ku hatiye îddîakirin, helbesteke ku bo kesekî bi navê Boraboz tê nisbetkirin, berî mîladê bi 330 salî li herêma Hewramanê li ser kêla gorekê hatiye dîtin. Helbesta ku amaje pê tê kirin weha dest pê dike:

Xwazdî ez tu bi hev ra bin
Bi hev re herin xorînê

Lê heta niha ew helbesta Boraboz ku li ser kêlê hatiye nivîsandin, ji bo cîhana zanistê nehatiye nîşandan. Herweha hem ji aliyê dîrokî ve hem jî ji aliyê filolojîk ve hebûna helbesteke bi vî rengî ne pêkan e.

2.2.2. Helbesta Rahibekî Zerdeştî

Dîsa li gorî îddîayan rahibekî Zerdeştî ku navê wî Xelîl Mendelîcî ye, di sedsala VIIem de (640-641) li Silêmaniyeyê helbestek nivîsandiye û di helbestê de behsa êrîşên Ereban bo

CamScanner ile tarandı

Şarezorê û zererên ku dane Şarezorê kiriye. Helbesta ku amaje pê tê kirin weha hatiye pêşkêşkirin:

Hurmuzgan raman aritan kejan

Wêşan şarduwe gewreê gewrekan

...

Wate:

Perestgeh xira bûn agirê wan vemirî

Mezinê mezinan jî xwe veşartin

Lê heta niha orjînala vê helbesta ku amaje pê tê kirin, qet nehatiye dîtin û ji bo cîhana zanistê nehatiye pêşkêşkirin.

B. EDEBIYATA KURDÎ YA PIŞTÎ ÎSLAMÊ

Edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê wê edebiyata ku di serdema Îslamê de hatiye afirandin dihundurîne. Ev serdem di maweyeke dirêj (14 qern) û di erdnîgariyeke fireh (welatê Kurdan hemû) de xwe nîşan dide. Xaleke dî ya girîng ew e ku di vê serdemê de edebiyata Kurdî ne bi diyalekteke tenê, lê bi çend diyalektan hatiye nivîsandin. Ji ber wê berî ku em bi hûrgilî dest bi tarîxa edebiyata Kurdî bikin, li jêrê em dê ji aliyê diyalekt û navendan ve dîmenekî giştî yê edebiyata Kurdî destnîşan bikin. Bi vî awayî şopandina mijaran dê hêsantir be.

II. DIYALEKTÊN KURDÎ Û NAVENDÊN WAN ÊN EDEBÎ

Berî ku em yek bi yek dest bi edebiyatên diyalektên Kurdî bikin, pêwîst e em tabloyeke giştî ya diyalektên Kurdî û navendên edebî yên wan diyalektan destnîşan bikin.

A. DIYALEKTÊN KURDÎ

Bi giştî Kurdî li ser sê diyalektan tê dabeşkirin: Kurdiya Kurmancî, Kurdiya Goranî-Kurdiya Zazakî û Kurdiya Lorî.[4]

4 Me'rûf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, weş. Aras, Hewlêr 2010, b. I, r. 50.

CamScanner ile tarandı

1. KURDIYA KURMANCÎ

Kurdiya Kurmancî jî di nav xwe de dibe du beş. Beşa yekem Kurmanciya Jorê û ya duyem jî Kurmanciya Jêrê ye. Kurmanciya Jorê devokên wekî Bayezîdî, Hekkarî, Botanî, Aştî û Badînanî di nav xwe de dihewîne. Kurmanciya Jêrê jî di nav xwe de devokên wekî Kurdiya Soranî, Mukriyanî, Erdelanî (sineyî), Silêmanî û Germiyanî (Kerkûkî) dihewîne.

2. KURDIYA GORANÎ-KURDIYA ZAZAKÎ

Çawa ku diyar e ev diyalekt di nav xwe de dibe du beş. Beşa yekem Kurdiya Goranî ye. Devokên Kurdiya Goranî Hewramî, Zengeneyî, Kakeyî (Maço) û Bacelanî ye. Kurdiya Zazakî jî ji aliyê devokan ve dibe sê beş. Zazakiya Bakur/Kirmanckî (Dêrsim, Qoçgirî, Warto), Zazakiya Navîn (Bîngol, Elezîz) û Zazakiya Başûr/Kirdkî (Sêwreg).

3. KURDIYA LORÎ

Kurdiya lorî ji aliyê devokan ve dibe şeş beş: Feylî, Kirmaşanî, Bextiyarî, Lekî, Kelhûrî û Mamesanî.

B. NAVENDÊN EDEBÎ YÊN DIYALEKTÊN KURDÎ

Bêguman ji aliyê edebî ve her yek ji van diyalekt û devokên Kurdî bi qasî hev pêş ne ketine. Li gorî şert û mercan hin ji van zehftir derketine pêş, hin ji wan jî li paş mane. Em dikarin edebiyata Kurdî li gorî diyalekt û devokên edebî li ser pênc beşan parve bikin: Edebiyata Kurdiya Lorî, edebiyata Kurdiya Goranî, edebiyata Kurdiya Kurmancî, edebiyata Kurdiya Soranî û edebiyata Kurdiya Zazakî.

Destpêkirina van edebiyatan helbet ne bi hevre ye. Di nav wan de kevintirîn edebiyat, edebiyatên Kurdiya Lorî û Kurdiya Goranî ne. Piştre bi rêzê edebiyata Kurdiya Kurmancî, edebiyata Kurdiya Soranî û herî dawî jî edebiyata Kurdiya Zazakî tê. Edebiyata Kurdiya Lorî û Kurdiya Goranî derdora sedsala

CamScanner ile tarandı

Dînewer	: Mela Perîşan Dîneweri
Pawe-Ciwanru	: Cîhanara Xanim
Merîwan	: Ehmed Begê Komasî
Rîwar	: Mele Xidir Rîwarî
Textê	: Şêx Ehmedê Textî
Dewdan	: Baba Celilê Dewdanî
Şêxan	: Seyîd Ekabîrî Xamoşî
	Xatûn Dayraki Remzbar
Serket	: Daye Xezana Serketî
Kirmanşah	: Seyîd Yaqubê Mahideşti

2.2. Herêma Loristanê

Loristana tarîxî ji bajarê Hemedanê û derdora wê pêk tê. Lê Hemedan û Loristan îro li Îranê du eyaletên ji hev cuda ne. Li vê herêmê du navendên edebî balê dikişînin: Hemedan û Yafte.

Hemedan

Li Hemedanê nimûneyên edebiyata Kurdiya Lorî hatine dayîn. Baba Tahirê 'Uryan û Fatime Lore ji Hemedanê ne.

Yafte/Yafteko

Yafte, yan jî Yafteko li Loristanê li Xurremabadê navê çiyayekî ye. Ev der jî bûye navendeke edebî û tarîxî ya diyalogên Ehlê Heqê. Lê li vir ne bi Kurdiya Lorî, bi Kurdiya Goranî nimûneyên edebî yên aîdê Ehlê Heqê hatine dayîn. Ji vir kesên wekî Rihan Xanima Loristanî, Xatû Mey Zerd, Şa Xweşînê Loristanî derdikevine pêş.

2.3. Herêma Erdelanê

Herêma Erdelanê ji bajarê Sinê û derdora wê pêk tê. Îro ev herêm li Îranê wekî eyaleta Kurdistanê tê binavkirin. Ji bajarê Sinê kesên wekî Yûsif Yaske, Mestûre Mahşeref Xanima Kurdistanî û Mehcûri derketine.

CamScanner ile tarandı

2.4. Helebce (Caf) û Kerkûk

Li Kurdistana Başûr du navendên edebiyata Kurdiya Goranî hene: Helebce (Caf) û Kerkûk. Ev her du bajar li Kurdistana Iraqê nêzî tixûbê Îranê ne û dewama Erdelanê têne hesibandin. Ji Helebceyê kesên wekî Mewlewî, Ehmed Pirisî, Baba Nawusî Caf û Liza Xanima Caf û ji Kerkûkê jî Mir Ehmedê Zengene û Xemnake Kerkûkî derdikevin pêş.

3. EDEBIYATA KURDIYA KURMANCÎ

Edebiyata Kurdiya Kurmancî ji aliyê coxrafî ve berfirehtirîn edebiyata Kurdî ye ku cihên belavbûna wê îro di nav tixûbên dewletên Tirkiye, Iraq, Îran, Sûrî, Ermenîstan, Gurcistan û Kazaxistanê de dimîne. Hinek navendên tarîxî yên edebiyata Kurdiya Kurmancî ev in:

3.1. Li Kurdistana Bakur

Bedlîs:	Emîr Ye'qûbê Zirkî, Şukriyê Bedlîsî û Siwadî.
Cizîr:	Melayê Cizîrî, Mela Remezanê Cizîrî.
Hekkarî:	Melayê Bateyî, Feqe Reşîdê Hekkarî, Pertew Begê Hekkarî.
Miks:	Feqiyê Teyran, Weda'î, Eliyê Teremaxî, Mela Yûnisê Helqetînî.
Hîzan:	Selîmê Silêman, Axaokê Bêdarî.
Sêrt:	Mela Xelîlê Sêrtî, Şêx Ehmedê Feqîr.
Bazîd:	Ehmedê Xanî, Îsmaîlê Bazîdî, Miradxanê Bazîdî, Mela Mehmûdê Bazîdî.
Diyarbekir:	Şêx Evdirehmanê Axtepî, Şêx Mihemed Can, Şêx 'Eskerî, Şêx Kerbela.
Licê:	Seydayê Licî, Şêx Mistefayê Sîsî.
Xelat:	Şêx Şemsedînê Xelatî.

3.2. Li Kurdistana Başûr

Laleş:	Şêx Fexrê Adiyan
Birîfkan:	Şêx Nûredînê Birîfkanî.

CamScanner ile tarandı

Amêdiyê: Mihemed Teyar Paşa.
Eriz: Bekir Beg
Girgaş: Mela Mensûrê Girgaşî

4. EDEBIYATA KURDIYA SORANÎ

Edebiyata Kurdiya Soranî, li Kurdistana Başûr û Rojhilat belav bûye.

4.1. Li Kurdistana Rojhilat

Erdelan : Yusuf Yaske
Mehabad : Edeb Ebdila Misbah

4.2. Li Kurdistana Başûr

Silêmaniye : Kurdî, Salim, Mehwî.
Qeredax : Nalî
Koye : Hacî Qadirê Koyî
Kerkûk : Mir Ehmedê Zengene, Xemnake Kerkûkî, Şêx Riza Talebanî.

5 . EDEBIYATA KURDIYA ZAZAKÎ

Edebiyata Kurdiya Zazakî tenê li Kurdistana Bakur derketiye meydanê. Di navendên herî girîng ev in:

Hezan : Mela Ehmedê Xasî.
Sêwreg : Osman Efendiyo Babij

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA YEKEM
EDEBIYATA KURDIYA LORÎ

Çawa ku berî niha hatibû gotin, edebiyata Kurdiya lorî edebiyata herî kevin a Kurdî ye. Li vir wekî nûnerê herî girîng ê edebiyata Kurdiya lorî, em dê li ser Baba Tahirê Uryan rawestin. Piştî Baba Tahirê Uryan, nûnerên edebiyata lorî zêde derneketine. Belkî jî sedemê vê ew e ku Lor ji ber ku ji aliyê erdnigariyê ve nêzî Farisan bûn, ketin bin bandora Farisî û di encamê de jî hizra neteweyî di nav wan de winda bû. Parelelî vê jî nûnerên bihêz ên helbesta Kurdî ya Lorî derneketin.

BABA TAHIRÊ URYAN

I. JIYANA WÎ

A. KUNYEYA WÎ

Sê pêkhateyên kunyeya Baba Tahirê Uryan hene ku ji van pêkhateyan a duyem (Tahir) navê wî nîşan dide. Helbestvan herweha navê xwe Tahir di helbestên xwe de wekî mexles jî bi kar aniye.

Xudaya işqê Tahir bê nîşan bî
Ki ez işqê butan bê pa serestem

Heçî pêkhateyên yekem û sêyem in (Baba û Uryan), ew jî aliyê wî yê tesewifî nîşan didin. Peyvên wekî "Baba" û "pîr" (di Tirkî de Dede) di ekolên Batinî û terîqetên tesewifî de ji bo mezin û rêberên manewî yên van ekol û terîqetan tên bikaranîn. Wekî Baba Îshaq, Pîr Siltan Abdal, Dede Ömer Rûşenî, Ev peyv li cem Yarsaniyan jî ji bo mezinên vê baweriyê hatiye

CamScanner ile tarandı

bikaranîn. Wekî Baba Serhengê Dewdanî. Pêgirtiyên van ekol û terîqetan van kesan ji bo xwe wekî bavên manew dibînin.

Peyva "Uryan" jî wekî peyva "Baba" aliyê helbestvan ê tesewifî nîşan dide. Ev peyva ku di zimanê Erebî de tê wateya "kesê rût", di dîroka terîqetan de ji bo derwêşên ekola Qelenderiyan hatiye bikaranîn. Ji ber ku derwêşên vê ekolê xwestine ku ji aliyê xelkê ve lome û îtab li wan bê kirin, hem cil û kincên qetandî li xwe kirine, hem jî serî, birû, simbêl û riha xwe tiraş kirine ji wan re "uryan" hatiye gotin. Jixwe Baba Tahir jî ji aliyê pisporan ve ji pêşiyên ekola Qelenderiyan tê hesibandin. Li gorî Me'rûf Xeznedar ev peyv ji aliyê xelkê Hemedanê ve ji bo wî hatiye bikaranîn. Lewra Baba Tahir li wir hatiye dinyayê, jiyana xwe li wir bûrandiye û li wir koçi dawiyê kiriye.

Herçiqas di Ansîklopediya Îslamê de îfadeya Erebî ya bi şiklê "Emseytu Kurdiyyen we esbehtu Erebiyyen" (Wekî Kurd li min bû evar û wekî Ereb li min bû sibeh) bi bal Baba Tahir ve hatiye nîsbetkirin jî, di vir de gumana me heye. Lewra heman îfade di pêşgotina *Mesnewî*ya Mewlana Calededdînê Rûmî de bi bal bapîrê Husamedîn Çelebî ve hatiye nîsbetkirin[5] ku ew jî Ebu'l-Wefayê Kurdî ye.

B. SERDEMA WÎ

Jidayîkbûna Baba Tahir û û koça wî ya dawiyê bi awayekî zelal ne diyar in. Derheqê serdema wî de du nêrîn hene:

1. Sedsala XIem

Derheqê serdema Baba Tahir de nêrîna yekem ew e ku ew di sedsala XIem de jiyaye. Li gorî çavkaniya herî kevn a ku behsa Baba Tahir dike, ku navê wê "Rahetu's-Sudûr we Ayetu's-Surûr der Tarîxê Alê Selçûq" e û di sala 1202yan de ji aliyê Rawendî ve hatiye nivîsandin, ew hevçaxê Siltan Tuxrulê Selçûqî ye. Di vê çavkaniyê de tê gotin ku dema Siltan Tuxrul çûye

5 Celaleddîn Muhemmed b. Muhemmed Mewlewî, *Mesnewiyî Me'newî*, Întîşaratî Hermes, Tehran 1337, r. 3-4.

CamScanner ile tarandı

Hemedanê, li wir ji ewliyayên sûfiyan sê pîr (Baba Tahir, Baba Ce'fer û Şêx Hemşa) hebûn û li derwazeyê bajêr rawestiyabûn. Dema Siltan ew dîtine, ji hespê xwe peya bûye û çûye cem wan û xwestiye destê wan maç bike. Wê demê Baba Tahir di halê cezbeyê de bûye û ji Siltan pirs kiriye:

-Ey Tirk, tu dixwazî çi ji xelkê Xuda bikî? Siltan weha gotiye:

-Tu çi ferman bikî ez dê wê bikim. Baba Tahir gotiye:

-Wê tiştê bike ku Xuda dixwaze. Xuda dibeje: "Bêguman Xuda fermana we bi edalet û îhsanê dike."[6] Siltan bi girî weha bersiv daye:

-Ez ê weha bikim. Baba Tahir destê wî girtiye û gotiye:

-Tu vê diyariyê ji min werdigirî? Siltan gotiye:

-Erê. Baba Tahir jî serikê misînê xwe yê destnimêjê ku bi salan bikaranîbû û wekî gustîlkê di tiliya wî de bû ji tiliya xwe derxistiye û xistiye tiliya siltan û gotiye:

-Min hemû serweta xwe xist destê te. Piştî ku min ev gustîlk xist destê te adil be.

Piştî hingî siltan çûye kîjan şerî ew gustîlk xistiye tiliya xwe û ev bûyer bi bîr aniye.

Ji ber ku Siltan Tuxrul yan di sala 447/1055, yan jî di sala 450/1058an de çûye Hemedanê, ev hevdîtina wan jî lazim e di heman salê de be. Ev jî tê wateya ku Baba Tahir berî vê tarîxê hatiye dinyayê û piştî wê bi demeke hindik jî koçî dawiyê kiriye. Lewra ew kesê ku siltan destê wî maç bike, pêwist e kesekî pîr be. Reşîd Yasemiyê ku ji bo çapa dubeytiyan a li Îranê pêşgotinek nivîsandiye, hem vê yekê li ber çavan digire, hem jî ji îfadeya Baba Tahir a ku di vê dubeytiya jêrîn de dibêje "ez di serê hezar salî de hatime" digihe wê encamê ku ew di serê 1000ê mîladî de hatiye dinyayê û piştî wê bi 55 yan jî bi 58 salan Siltan Tuxrul dîtiye. Ew dubeytiya ku Yasemî pê serdema Baba Tahir kifş dike ev e:

---

6 Qur'ana Pîroz, Nehl/16-90.

CamScanner ile tarandı

Mu an behr um ki der zerf amedestum
Mu an nuqte kî der herf amedestum
Be her elfi elif qeddî ber ayu
Elif qeddum kî der elf amedestum

Wate:
Ez ew behr im ku di zerfê de hatime
Ez ew nuqte me ku di nav herfekê de hatime
Serê her hezar salî qamet elîfek tê
Ez ew qamet elîf im ku di serê hezar salî de hatime

2. Sedsala Xem

Derheqê serdema Baba Tahir de nêrîna duyem jî ew e ku ew di sedsala Xem de jiyaye û di serê sedsala XIem de koçî dawiyê kiriye. Li gorî Riza Qulî Xan Hîdayet ew ne di dema Siltan Tuxrul de, berî wî jiyaye. Qulî Xan weha gotiye:

> "Navê pîrozê Tahirê Uryanê Hemedanî, Baba Tahir e. Ji zana û arifên serdema xwe bûye. Xwediyê keramet û meqamatên bilind bûye. Hin kes wî hevçaxê siltanên Selçûqî dizanin, ev ne rast e. Baba Tahir ji şêxên kevn e û hevçaxê Deylemiyan e. Di sala 410/1019an de berî Unsurî û Firdewsî koçî dawiyê kiriye."

Li gorî ku Mîrza Mehdî Xanî Kewkeb di sala 1904an de di nivîseke xwe ya di kovara *Mecelleyê Asyayê Bingale* de tesbît kiriye, Baba Tahir di vê dubeytiya xwe ya ku li jorê derbas bûye de, bi hesabê Ebcedê jidayîkbûna xwe aniye zimên. Li gorî vê di misraya sêyem de îfadeya "elf qed elif" (ا ل ف ق د ا ل ف) bi hesabê Ebcedê beramberî jimara 326a hicrî tê ku ev jimar bi mîladî beramberî 937an tê. Li gorî vê nêrînê ne mimkin e ku Baba Tahir gihîştibe Siltan Tuxrul û di sala 1058ê de li Hemedanê bi wî re hevdîtin kiribe. Herweha xaleke dî ya ku vê nêrînê piştrast dike ew e ku peyva "الف"ê ya ku di dubeytiya navborî de derbas dibe teqez ne di wateya "hezar"î de ye. Li gorî Me'rûf

CamScanner ile tarandı

Xeznedar wateya wê herfa "elîf"ê ye û helbestvan di çarçoveya fikra wehdetu'l-wicûdê de dibêje ku "Ezê qamet elîf, di şiklê "elîf"ê de, ku yekîtiya Xuda temsîl dike, hatime"[7]

Di piraniya çavkaniyên sereke de di çarçoveya nêrîna duyem de jidayîkbûna Baba Tahir wekî 937 û koça wî ya dawîyê jî wekî 1010 tê qebûlkirin. Loma jî ev nêrîn zehftir nêzî rastiyê xuya dike.

Gora Baba Tahir niha li Hemedanê ye û qubek li ser hatiye çêkirin. Li gorî ku Me'rûf Xeznedar dibêje micêwirên aramgaha Baba Tahir di vê serdema me de bi Kurdiya Goranî diaxifin.[8]

II. TÊKILIYA BABA TAHIR BI YARSANÊ RE

Baba Tahir ji aliyê Yarsaniyan ve wekî pîrekî Yarsanê tê qebûlkirin. Lê zimanê Baba Tahir ne wekî zimanê pîrên Yarsaniyan e. Zimanê Yarsaniyan Kurdiya Goranî ye, lê zimanê Baba Tahir Kurdiya Lorî ye. Loriya wî Loriyeke navendî û têkel e. Bandora Kurdiya Goranî jî li ser zimanê wî heye.

Ji ber ku Yarsanî Baba Tahir wekî kesekî pîroz dizanin, dubeytiyên wî li dora kitêba xwe ya pîroz a bi navê "Serencam"ê nivîsandine. Herweha li gorî ku di "Serencam" û hinek menzûmeyên Yarsanê de derbas dibe, Şa Xweşîn (1015-1074) li Hemedanê mala Baba Tahir ziyaret kiriye. Lê ji ber ku Şa Xweşîn piştî koça Baba Tahir a dawiyê bi pênc salan hatiye dinyayê ev riwayet lazim e efsaneyek be. Lê ev vê yekê nîşan dide ku Baba Tahir li cem Yarsaniyan kesekî girîng e. Hetta navê wî di nav ferîşteyên Yarsanê de jî derbas dibe:

Rewacî her dîn ser-helqeyî şahan
Cemşîdî Cem ben şon berî rahan[9]

---

7 Xeznedar, b.n., b. I, r. 208.

8 Xeznedar, "Nihêrînekî Gelemperî li Edebiyatê Kurdî", *Yekemîn Rojên Edebiyatê li Diyarbekirê*, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2004, r. 28.

9 Tu serdarê hemû dîn û serhelqeyî şahan î. Tu Cemşîdê Cem î,

CamScanner ile tarandı

Îrecî Yehya Siyaweşî key
Huseyn şehîd ne Kerbelayî tey[10]
Elî Qelender Tahir Qelender
Henî çîş wa çûm pûrî Eskender[11]

Hin lêkolînerên Yarsanê ji vê helbestê derdixin ku 'Alî Qelender û Tahir Qelender (Baba Tahir) ji mezintirîn kesên Yarsanê ne û rihên wan yek in (Li gorî prensîba reenkarnasyonê rihê Baba Tahir ketiye bedena 'Alî Qelender de). Lewra serdana Şa Xweşin bo 'Ali Qelender, weki serdana Şa Xweşin bo Baba Tahir hatiye hesibandin.

III. BERHEMÊN BABA TAHIR

Herçiqas bi qasî 22 berhemên Baba Tahir hebin jî, di nav gişan de du berhemên wî derketine pêş: "Dubeytî" û "Kelîmatu'l-Qîsar".

A. KELÎMATU'L-QÎSAR

"Kelîmatu'l-Qîsar" berhemeke tesewifî ye û di nav sûfiyan de eleqeyeke mezin dîtiye. Berhem ji aliyê Huseyn Wehîd Destgerdî ve di sala 1952yan de digel dubeytiyan hatiye çapkirin. Berhem ji 23 beş û 368 wecîzeyan pêk tê. Tê de mijarên wekî 'îlm, me'rîfet, îlham, 'eql û nefs, dinya û 'uqba, sema û zikr cig digirin.

B. DUBEYTIYÊN BABA TAHIR

Bêguman Baba Tahir bi dubeytiyên xwe nav daye û ji aliyê edebiyata Kurdî ve jî dubeytiyên wî me eleqedar dikin. Dubeytiyên Baba Tahir ji aliyê ruxsarî ve bi kêşa erûzê ji behra Heze-

rênîşaner û şûncihgir î.

10 Tu Îrecî Yehya û Siyaweşî Key î. Tu li seraya Kerbelayên Huseynê Şehîd î.

11 Elî Qelender û Tahir Qelender. Ez çi kesê dî jî bêjim tu zêdetir î, kurê Eskender î.

CamScanner ile tarandı

cê li ser wezna "Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun" hatine nivîsandin. Serwaya (qafiyeya) dubeytiyan, wekî serwaya ruba'iyê ye. Misrayên yekem, duyem û çarem hemserwa ne, ya sêyem ji wan cihê ye (aaxa).[12]

1. BÎBLIYOGRAFYAYA DUBEYTIYAN

1.1.Nusxeyên Destxet ên Dubeytiyan

Di pirtûkxaneyên Tirkî (Stenbol) Ewrupa, Rûsya û Îranê de di gelek mecmû'eyên helbestan ên destnivîs de dubeytiyên Baba Tahir ji hev belawela cih digirin. Ji van hinek nusxeyên girîng ev in.

• Nusxeya Muzexaneya Konyayê.

Kevintirîn nusxeya ku hinek dubeytiyên Baba Tahir tê de cih digire, nusxeya li muzexaneya Mewlana Celaleddînê Rûmî ya li Konyayê ye. Di vê nusxeyê de 2 qit'e û 8 dubeytî hene. Ev nusxe di sala 848/1444an de hatiye nivîsandin.

• Nusxeya Pirtûkxaneya Neteweyî ya Parîsê

Pêşgotina vê nusxeyê ji aliyê Bexş Qulî Qerebaxî ve di sala 1844an de hatiye nivîsandin. Tê de 175 dubeytî hene. Bi fermana Mihemed Şahê Qaçar ev dubeytî hatine komkirin. Pêşekînûs dibêje ku eger hinek dubeytiyên nû bên dîtin ez dê wan jî lê zêde bikim û ji bo vê jî 6 rûpel vala hiştine.

• Nusxeya Pirtûkxaneya Rojhilatnasiyê ya Petersbûrgê

Ev nusxe keşkûleke bi navê "Gulşen" e. Di vê keşkûlê de digel sed mînyatûrên rengareg, helbestên curbicur û beşek ji dubeytiyên Baba Tahir cih digirin. Jimareya vê keşkûlê E-12 e.

• Nusxeya Kutubxaneya Hisarê a İzmirê

Ev nusxe mecmû'eyeke ku ji munacatên Xace Ebdullahê

12 Ji bo jînenîgarî û berhemên Baba Tahir bnr. V. Minorsky, "Baba Tahir", *İslam Ansk.*, İstanbul 1993, b. II, r. 166-169, Xeznedar, b.n., b. I, r. 205-212; Sabah Kara, *Dubeytî Baba Tahirê Uryan*, Nûbihar, Stenbol 2012, r. 5-8; Kadri Yıldırım, "*Baba Tahirê Uryan, Hayatı, Eserleri ve Görüşleri*", *Mulemma*, h. 2, r. 7-20, Mardin 2013.

CamScanner ile tarandı

Ensarî, ruba'iyên Omer Xeyyam û dubeytiyên Baba Tahir pêk tê. Di vê nusxeyê de 57 dubeytî hene.

1.2. Nusxeyên Çapkirî yên Dubeytiyan

Dubeytiyên Baba Tahir gelek caran hatine çapkirin û li ser Baba Tahir jî gelek xebat hatine kirin. Ev çap û xebat jî bi gelek zimanan û li deverên cihê hatine amadekirin. Cara pêşî rojhilatnasan li ser dubeytiyên Baba Tahir lêkolîn kirine. Di nav van da M. Clement Huart di sala 1885an de 59 dubeytî weşandine û di sala 1908an de jî 28 dubeytiyên dî û xezeleke Baba Tahir weşandine. Leszczynsky ji pirtûkxaneyên Berlînê 8 dubeytî û xezeleke wî weşandine. Edward Heron-Allen wergera wan a Îngilîzî kiriye (*The Lament of Baba Tahir*, Londra 1902).

Nusxeya destxet a li kutubxaneya İzmirê ku li jorê behsa wê hat kirin, di sala 1319/1901ê de li Stenbolê hatiye çapkirin.

Li Îranê Huseyn Wahîd Destgerdî di sala 1927an de 296 dubeytî û 4 xezelên Baba Tahir weşandine. Çapa vê xebatê ya ku Reşîd Yasemî jê re pêşgotinek nivîsandiye (1952) girîng e. Berhema Xetîbî Wezîrî ya ku derheqê Baba Tahir de nivîsiye jî di vî warî de lêkolîna herî berfireh tê qebûlkirin. Lê Xetîbî di vê xebata xwe de ji çarçoveya Pan Îranîzmê derneketiye.

Rüştü Şardağ, di sala 1966an de dubeytiyên Baba Tahir, bi navê "Perîşan Baba Taher ve Çift Beyitleri" bi bal Tirkî ve wergerandine. Piştre Ömer Kavalcı, di berhema xwe ya bi navê "Baba Tahir Uryan ve Şiirleri" de (Kültür Bak. Yay. 1989) û Talat Sait Halman jî, di berhema xwe ya bi navê "Aşk Çırçıplak" (weşan: Koç Kültür Sanat, Stenbol 2003) dubeytiyên Baba Tahir bi bal Tirkî ve wergerandine.

Dubeytiyên Baba Tahir li Li Kurdistana Bakur cara pêşî ji aliyê Sabah Kara ve bi navê "Dubeytî-Baba Tahirê Uryan" (Weşan: Nûbihar, Çapa yekem 1998, çapa sêyem 2012) hatin weşandin. Kara di berhema xwe de li aliyekî cih daye orjînala dubeytiyan bi Lorî û herfên Erebî, li aliyê dî jî bi awayekî menzûm cih

CamScanner ile tarandı

daye wergera wan a Kurdiya Kurmancî bi herfên latînî. Herweha Kara di dawiya çapa sêyem de cih daye faksîmîleya nusxeya kutubxaneya Hisarê a İzmirê (çapa sêyem: 2012). Kadri Yıldırım jî bi navê "Espîdebazê Hemedanî" dubeytiyên Baba Tahir digel wergerên wan ên menzûm bi Kurdiya Kurmancî, Kurdiya Hewramî û Tirkî weşandin (Weş. Avesta, 2014).dengdêrên

2. ZIMANÊ DUBEYTIYAN

Li ser zimanê dubeytiyan hinek gengeşe hene û ev mijar di nav lêkolînên tarîxa edebiyata Kurdî û Farisî de mijareke girîng tê qebûlkirin. Lewra Baba Tahir di demeke zû de jiyaye û li gorî aîdiyeta zimanê wî, dubeytiyên wî dê di tarîxa edebiyata gelê ku bi wî zimanî diaxife de cihê xwe yê tarîxî bigirin. Bi taybetî ji ber ku Baba Tahir ji helbestvanê Farisan ê neteweyî Firdewsî jî kevintir e, aîdiyeta zimanê wî girîngtir dibe.

Bi qeneeta me ji ber ku Baba Tahir Lor e û ji Hemedanê ye, di Kurdîbûna wî de ti guman û arîşe tine ye. Lewra di çavkaniyên tarîxî de Lor jî wekî gelek unsurên dî Kurd tên jimartin û Hemedan jî tarîxen welatê Kurdan tê qebûlkirin ku ji dewleta Medan re paytextî kiriye. Mînorskî jî vê tiştê piştrast dike û dibêje ku, Baba Tahir Kurdê Lor e û zimanê wî jî zimanê Hemedanê ye ku ew jî Kurdiya Lorî ye.

Dema em li zimanê dubeytiyên ku li ber destê me ne dinêrin, em dibînin ku zimanê wan herî kêm ji sedî 80 wekî Farisiya îro ye, lê bi tevahî ne wekî wê ye; di navbera wan de hinek cudahî jî hene. Îcar dema Faris dibînin ku zimanê dubeytiyan bi temamî ne wekî Farisiya îro ye, rêyeke hêsan hildibijêrin û dibêjin ku dubeytî bi Farisiya kevin hatine nivîsandin.

Bi mebesta ku em li ser van nêrînan hinek analîzan bikin, em dê li jêrê cih bidin çend dubeytiyan û li ser zimanê wan rawestin.

Dilê mu xeyrê te dilber negîre
Bi cayê cewherî cewher negîre

CamScanner ile tarandı

Dilê mu sûte mihrê te azer
Benê nasote azer dernegîre

***

Dilem ez 'ışqê xûban gêc û wêc e[13]
Muje berhem zenem xûnawe rêce
Dilê aşiq mîsalê çûbê ter be
Serî soce serî xûnabe rêce

***

Bê te ser der girîban um şew û roc
Sirişk ez dîde baranum şew û roc
Ne bîmar um ne cayum mî kero derd
Hemî zûnum ki nalûn um şew û roc

Dema em li van dubeytiyan dinêrin em dibînin ku di ya yekem de peyvên "mu", "negîre", "cayê", "ben", di ya duyem de "gêc û wêc", "xûnawe", "rêce", "soce", "rêce" di ya sêyem de "şew û roc", "cayim", "mî kero", "danum" ne wekî Farisiya îro ne û herweha di dubeytiyan de rêjeya bikaranîna wan jî ne hindik e.

Dema em di çarçoveya van xalên jêrîn de bifikirin, bi rehetî dikare bê gotin ku ev dubeytî ne bi Farisî, lê bi Kurdiya Lorî hatine nivîsandin.

1. Firdewsî di dewra Baba Tahir de jiyaye. Eger zimanê dubeytiyan bi Farisiya kevn be nexwe lazim e zimanê Şehnameya Firdewsî jî wekî zimanê dubeytiyan bi Farisiya kevn be. Lê dema em dinêrin Farisiya îro dewama Farisiya Şehnameyê ye û taybetiyên zimanê dubeytiyan (ew peyvên li jor hatin nîşandan) di Şehnameyê de tineye. Ev jî dibe delîl ku zimanê dubeytiyan ji Farisî cuda ye.

2. Hinek peyvên di nivîsê de hevpar hene ku, xwediyê her zimanekî li gorî fonetîka xwe wan peyvan dixwîne û bi vî awayî cudahî çêdibe. Bo nimûne fonetîka peyva "dest"ê li cem Fari-

13 Yan jî: Dilî dîrum zi 'ışqet gêc û wêc e.

CamScanner ile tarandı

san û Kurdan ne wekî hev e. Kurd dengdêra vê peyvê ku "e" ye, bi kurtî dixwînin, lê Faris dengê wê dirêj dikin. Mînakeke dî jî îfadeya "نه نالم" e. Bidengkirina vê îfadeyê li cem Kurdan bi şiklê "ne nalim", li cem Xurremabadî û Burûcerdiyan bi şiklê "ne nalum" û li cem Farisan bi şiklê "ne nalem" e. Herweha "girîban um" û "girîban em" jî bi vî rengî ye. Di encamê de mirov bi riya fonetîkê dizane ka ev peyv yan jî îfade bi Farisî ye yan bi Kurdî ye, yan jî bi zimanekî dî ne. Ji ber vê jî çênabe mirov van peyvên di nivîsê de hevpar, lê di bilêvkirinê de cuda ên ku di dubeytiyan de derbas dibin bike malê zimanê Farisî tenê.

3. Bikaranîna peyvên Farisî yên wekî "nam", "destem" "reftem", "dûr" bi şiklê "nûm", "destum", "reftum" û "dîr" taybetiyên Kurdiya Lorî ne.

4. Peyvên "mîkerû" (dike), "ayû" (tê) bi Kurdiya Goranî ne. Dîsa peyvên "wac" (axaftin) kar (kirin) bi Kurdî ne.

5. Bi vî rengî çênabe mirov peyva "dîrem"ê ya ku di dubeytiyan de gelekî zêde derbas dibe, li şûna "darem" a ku di Farisiya îro de heye bihesibîne. Xuya ye ev jî cudahiyeke di navbera Kurdiya lorî û Farisî de ye.

6. Wisa tê qebûlkirin ku dubeytiyên Baba Tahir di devê xelkê de ji bo ku zehftir bên fêmkirin guherîne û bi vî awayî hatine komkirin. Herweha di destên mustensixên Faris de jî zimanê Baba Tahir hinekî guheriye. Vê dawiyê her careke ku dubeytî hatine çapkirin hinek peyvên Kurdiya Lorî bi bal Farisî ve hatine nêzîkkirin û bi yên Farisî hatine guhertin. Wekî nimûne di çapên cuda de peyvên Kurdiya Lorî yên wekî amête, te, şew, meke, taw, rêje, kirin, mu, witim û wînem bi rêzê bûne amîxte, tû, şeb, mekun, tab, rîzed, kunend, men, goyem û bînem.

7. Di dubeytiyan de peyvên dî yên di navbera Farisî û Kurdiya lorî de hevbeş, ji xwe peyvên hevpar ên zimanên Îranî ne.

Dema mirov van xalan li ber çavan digire derdikeve meydanê ku zimanê dubeytiyên Baba Tahir Kurdiya Lorî ye.[14]

---

14 Bnr. Xeznedar, h.c., Yıldırım, h.c.

CamScanner ile tarandı

3. NAVEROKA DUBEYTIYAN

Çawa ku li jorê jî hatibû destnîşankirin, ji aliyê hizrî ve têkiliya Baba Tahirê Uryan bi Qelenderîtiyê û Yarsanê re heye. Ew wekî qelenderiyê yekem tê hesibandin û Yarsanî jî wî ji xwe dihesibînin. Digel vê jî ev rengên wî di dubeytiyên wî de zêde dernakvin pêş. Ji aliyê naverokê ve di dubeytiyên Baba Tahir de mijarên lîrîk/evînî û fikra wehdetu'l-wucûdê (yekîtîbûn) bi hev re xuya dikin. Dema mirov "el-Kelîmatu'l-Qîsar"a wî ya ku derheqê tesewifê de ye jî li ber çavan digire, mirov dikare bêje ku hizra tesewifê li cem wî girantir e. Di wan dubeytiyên ku li jorê derbasbûn de bi awayekî zelal lîrîzm heye. Di van dubeytiyên jêrîn de jî fikra wehdetu'l-wucûdê li ber çavan e.

Be derya bingerem derya tu wînum
Be sehra bingerem sehra tu wînum
Be her ca bingerem kûh û der û deşt
Merge an dem kî zîbayî tu wînum

***

Eger dil dilber e dilber çi nûm e
Weger dilber dil e ez çi nûm e
Dil û dilber be hem amête dêrum
Nezûnum dil keh e dilber ku dûm e

***

Mu an behr um kî der zerf amedestum
Mu an nuqte kî der herf amedestum
Be her elfî elif qeddî ber ayu
Elif qeddum kî der elf amedestum

CamScanner ile tarandı

Bê te gulşen çi zindan e bi çeşmem
Gulistan azeristan e bi çeşmem
Bê te aram û 'umrê zindeganî
Heme xab û perîşan e bi çeşmem

C. XEZELÊN BABA TAHIR

Ji bilî dubeytiyan helbestên Baba Tahir ên dî jî hene. Hinek ji van helbestan xezel in û di dawiya dubeytiyan de hatine çapkirin ku bi gişti çar xezel in.[15] Li jêrê xezeleke Baba Tahir cih digire:

Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun

Mu an miskînî tezrû bêperestem
Mu an sûzende şem'î bêberestem

Heme der aşiyan dîrem nişîmen
Der în wîrane murxî bêperestem

Be dîn merdanigî hestem çunan xwar
Te pindarî kî ber ser me'cerestem

Dila namurde asayîş nebînî
Kî mu ta can nedadem wa nerestem

Dil ez a lalerûyan sûte dîrem
Ez înan der reg û can neşterstem

Mu ez rûzî ezel ***Tahir*** *bizadim*
Ez an rû namî **Baba Tahirestem**

15 Sabah Kara, *Dubeytî Baba Tahirê Uryan*, Nûbihar, Stenbol 2012, r. 160-162.

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA DUYEM
EDEBIYATA KURDIYA GORANÎ



Edebiyata Kurdiya Goranî digel edebiyata Kurdiya lorî edebiyata herî kevn a Kurdî ye. Em diyalekt û devokên wekî Kurdiya Goranî, Kurdiya lorî, lekî, feylî û senendecî di bin sernavê edebiyata Kurdiya Goranî de dihesibînin. Melbenda vê edebiyatê Kurdistana Rojhilat e û beşeke biçûk a Kurdistana Başûr e. Berî niha di mijara "Diyalekt û Navendan" de em li ser coxrafyaya edebiyata Kurdiya Goranî rawestiyabûn. Ji ber wê li vir derbareyê mijara coxrafyaya edebiyata Kurdiya Goranî de emê tenê navên her sê herêmên vê edebiyatê bi bîr bînin:

a. Herêma Hewramanê ku navenda wê Kirmanşah e.
b. Herêma Loristanê ku navenda wê Hemedan e.
c. Herêma Erdelanê ku navenda wê Sine ye

Edebiyata Kurdiya Goranî ji aliyê metnan û taybetiyên wan metnan ve dibe du beş: Diyalogên Yarsanê yên Goranî û Edebiyata Gorani ya Klasik.

I. DIYALOGÊN YARSANÊ YÊN GORANÎ

A. YARSAN Û EHLÊ HEQ

Piraniya helbestvanên vê edebiyatê ji endamên baweriyeke dînî a bi navê Yarsanê ne. Derheqê binemaya peyva "yarsan"ê de du nêrîn hene. Ya pêşî ew e ku ev peyv ji "yarê san" hatiye. Di vir de yar dost û mirîd, san jî San Sehaq e ku San Sehaq forma sivik ya Siltan Îshaq e. Li gorî vê nêrînê wateya "yarsan", ew kesê ku heval û mirîdê Siltan Îshaq e ku baweriya Yarsanê ji aliyê wî ve hatiye sîstematîzekirin. Nêrîna duyem jî ew e ku "yarsan" ji peyva "yaristan"ê hatiye. Wateya yaristanê jî melbenda yaran e, yanî ew cihê ku yar û mirîd lê zehf in.

Yarsanî ji aliyê yên derveyî wan ve bi navên "Xulatê Şî'e", "Batinî" û "Elîîlahî/Eliyullahî" tên binavkirin. Lewra li gorî Yarsani-

CamScanner ile tarandı

yan Îmamê Elî ser her tiştî re ye û di vê xalê de hevbeşiya wan bi mezhebê Şî'e re heye. Lê ew bixwe derheqê xwe de van terman bikarnaînin. Di çavkaniyên Yarsaniyan de derheqê wan de têgehên wekî "Yarsan", "Yaristan", "Kakeî" û "Dînê Yar" derbas dibin:

Yarî *çuwar çiştên baweri wê ca*
Pakî û rastî, nîstî û reda

Ez Abidîn im kurî Feqyan
Reqim kird bo ***Kakeiyan***

Derheqê çavkaniya vê baweriyê de sê nêrîn hene. Li gorî nêrîna yekem Yarsanî ji "xulatê Şî'e" ne. Li gorî vê Yarsanî berê ji Şî'iyan bûn, lê piştre di hinek prensîbên Şî'îtiyê de zêdegavî kirine û ji çarçoveya Şî'îtiyê derketine, lewma jî ji wan re bi wateya "zêdegavên di prensîbên Şî'îtiyê de" "xulatê Şî'e" hatiye gotin. Li gorî nêrîna duyem, Yarsanîtî baweriyeke dînî ya têkel e ku ji unsurên dînî yên berî Îslamê û piştî Îslamê pêkhatiye. Li gorî nêrîna sêyem jî Yarsanîtî dînekî serbixwe ye.

Li gorî Me'rûf Xeznedar, di warê tarîxa baweriya Yarsanê de xebata Nî'metullahê Mukrî ya bi navê "Şahnameyê Heqîqet" xebateke zehf girîng e.[16]

Ji ber ku Kurdiya Goranî zimanê dînî yê Yarsaniyan e û wan bîr û bawerî û felsefeya dînê xwe bi helbestê anîne zimên, ev helbestên vê baweriyê dibin mijara edebiyata Kurdiya Goranî.

B. TAYBETIYÊN DIYALOGÊN YARSANÊ

Dema em li edebiyata Kurdiya Goranî dinêrin ev taybetiyên li jêrê derdikevin pêş:

1. Edebiyata Goranî ne edebiyateke nivîskî ye. Metnên vê edebiyatê, ji gotûbêj û diyalogên derwêşên dînî yên Yarsanê pêk hatine. Ev diyalog, di rewşên xwezayî de û di navbera gelek

16 Me'rûf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, I, 212.

CamScanner ile tarandı

derwêşan de çebûne. Ji ber wê jî ev metin ne bi saîqên edebî derketine meydanê û wekî metnên edebî nayên qebûlkirin. Ew kesên beşdariya van diyalogan kirine, ne helbest gotine, nêrînên xwe yên dînî anîne zimên. Lê ji ber ku ji aliyê ruxsar û naverokê ve diyalogên xweş in, em di tarîxa edebiyata Kurdî cih didin van diyalogan jî.

2. Edebiyata Kurdiya Goranî ya ku ji diyalogan pêk tê, gelekî kevn e. Ev edebiyat di derdora sedsala VIIIan a mîladî de derketiye meydanê û heta bi sedsala XVIIIan dewam kiriye. Lê di vê pêvajoyê de qonaxên wê û taybetiyên wan qonaxan hene.

3. Kurdiya Goranî zimanê dînî yê Yarsanê ye û bîr û baweriyên Yarsanê bi nezmê hatine îfadekirin. Ji ber vê jî diyalogên edebiyata Kurdiya Goranî di navbera, pîr/mezinên dînî yên baweriya Yarsanê de çebûne û diyalogên wan jî dînî ne. Li gorî nêrînekê ji ber ku ji aliyê sîstema siyasî ya dewleta Ebbasiyan ve bi çavekî baş li pêgirtiyên Yarsanê nedihate nêrîn, Yarsaniyan di'a û nêrînên xwe yên dînî ne bi Erebî, bi gorani îfade kirine, da ku bikaribin nêrîn û baweriyên xwe veşêrin. Lê bi baweriya me ji ber ku diyalog ne nivîskî ne, ji xwe pêdawîstî bi veşartina wan tine ye.

4. Ji diyalogên Yarsaniyan re "kelam" tê gotin. Her kelameke wan ji bendekê pêk tê. Koma bendên helbestvanekî yan jî bendên qonaxekê, defterekê (mecmu'e) tînin meydanê ku ji wan re "Dewre" jî tê gotin. Piştî koça dawiyê ya van kesan, diyalogên dînî yên ku di dewra wan de hatine gotin, di van mecmû'eyan de hatine komkirin û nivîsandin. Di van mecmû'eyan de hem diyalogên van kesan, hem jî yên mirîd û derwêşên wan cih digirin. Diyalogên wan ên ku gihiştine roja me di van defteran de ne: Dewrey Balul (837), Dewrey Şa Xweşîn (1077), Serencam (Siltan Sehaq/1388), Dewrey Qirmizi (1514), Dewrey Babe Celil (1560) û hwd.

5. Ji xwediyên diyalogan gelek kes hem dengxweş bûn, hem jî li sazê dixistin.

6. Hemû diyalogên wan ne gihîştine îro.

CamScanner ile tarandı

7. Diyalogên Kurdiya Goranî yên Yarsaniyan ji aliye ruxsarî ve bi terzê "pehlewiyat"an (helbesta Îranê ya berî Îslamê) hatine nivîsandin. Di her du misrayên pêşî yên bendan de tekrara hinek îfade û qaliban tê dîtin. Lê piştre ev rewş hatiye guhartin.

8.Ji aliyê naverokê ve babetên edebiyata Yarsanê ev in:

- Ravekirina bawerî, felsefe û doktrîna Yarsanê.
- Ravekirina têgehên taybet bi Yarsanê re yên wekî tecellî, dûnadûn (cureyekî reenkarnasyonê) û "zat"ê.
- Şeş ferişteyên baweriya Yarsanê.
- Ravekirina qonaxa qiyametê (Apocalypse).
- Mîtolojiya Kurdi.
- Dînê Zerdeştiyê û baweriyên dînî yên berî Îslamê.
- Şer û cengê di navbera ronahî û tarîtiyê de.
- Pêşbînî (gumankirina paşerojê).
- Diroka dînê Îslamê, bi taybetî jî mezhebê Şî'itiyê.

9.Berevajiyê edebiyata Kurdên Sunnî, di edebiyata Kurdiya Goranî ya Yarsaniyan de gelek helbestvanên jin jî hene ku li jêrê em cih didin navên wan[17]:

- Daye Tewrêza Hewramî (Sedsala X.)
- Celale Xanima Loristanî (Sedsala X.)
- Rihan Xanima Loristanî (sedsala XI.)
- Liza Xanima Caf (Sedsala XI.)
- Xatû Mey Zerd (Sedsala XI.)
- Daye Xezana Serketî (Sedsala XI.)
- Fatîme Lore
- Nazdar Xatûna Şîrazî (k.d.1363)
- Yay Hebîbeya Şarezorî (k.d.1348)
- Xatûn Dayrakî Remzbarî (k.d.1345)
- Nêrgîz Xanîma Şarezori (sedsala XIV.)
- Xatûn Zerbanuya Derzyanî (k.d.1440)
- Semen Xanima Dewdanî (sedsala XVI)
- Cîhanara Xanim (k.d.1911)

17 Ji bo van kesan bnr. Sedîq Sefîzade Borekeyî, *Mêjûy Wêjeyî Kurdî*, b.c. 1375, b. I.

CamScanner ile tarandı

C. QONAXÊN DIYALOGÊN YARSANÊ

Edebiyata Kurdiya Goranî ya Yarsaniyan ji aliyê diyalogên Yarsanê ve li ser sê qonaxan tê dabeşkirin. Di vê dabeşkirinê de kesê diyarker San Sehaq e ku baweriya Yarsanê ji aliyê wî ve hatiye sîstematîzekirin. Her sê qonaxên edebiyata Yarsanê ev in:

1. Qonaxa Yekem: Qonaxa Berî San Sehaq (Sedsal: VIII-XII).
2. Qonaxa Duyem: Qonaxa San Sehaq (Sedsal: XIV-XV).
3. Qonaxa Sêyem: Qonaxa Piştî San Sehaq (Sedsal: XVI-XIX).

Ji aliyê dînî ve di nav pîrên Yarsanê de yên herî zêde xwedî bandor şeş kes in: Behlûl (Sedsalên VIII), Baba Serhengê Dewdanî (Sedsal IX), Şa Xweşînê Loristanî (Sedsal XI), Baba Nawusî Caf (Sedsal XII), Siltan Sehak (Sedsal XIV) û Heyderî/ Seyid Birakê (Sedsal XVIII). Her yekî ji van pîran navê xwe dane serdema xwe ku wekî Dewrey Behlûl, Dewrey Baba Serhengê Dewdanî, Dewrey Şa Xweşînê Loristanî, Dewrey Baba Nawusî Caf, Dewrey Siltan Sehak, Dewrey Heyderî tên binavkirin.

Eger em van pîran bi her sê qonaxan re hevyek bikin, em dibînin ku Behlûl, Baba Serhengê Dewdanî, Şa Xweşînê Loristanî û Baba Nawusî Caf dikevin nav Qonaxa yekem, Siltan Sehaq dikeve qonaxa duyem, Heyderî jî dikeve nav qonaxa sêyem.

1. QONAXA YEKEM: SERDEMA BERÎ YARSANÎTIYÊ (SEDSALÊN VIII-XII)

Qonaxa yekem, edebiyata Kurdiya Goranî ya Yarsaniyan e ku di navbera sedsalên VIII-XIIan de peyda bûye. Di vê qonaxê de Yarsanîtî, hê bi awaeykî nîzamî nehatiye sîstematîzekirin. Lê digel vê jî nûnerên hizra Ehlê Heqê hene. Ji ber ku Yarsanîtî piştre dê ji aliyê San Sehaq (k.d.1388) ve bê sîstematîzekirin, ev qonax wekî serdema berî Yarsanîtiyê tê binavkirin. Di vê qonaxê de digel Dewrey Balûl, Dewrey Baba Serheng, Dewrey Şa Xweşîn, Dewrey Baba Nawus jî hene ku evana ji şeş pîrên herî girîng ên Yarsanê ne û her yek ji wan bûne nûnerên serdema xwe. Li jêrê em dê cih bidin nûnerên herî girîng ên vê qonaxê.[18]

18 Ji bo nûnerên vê qonaxê bnr. Xeznedar, b.n., r. 260-276.

CamScanner ile tarandı

1.1. Behlûl

Li gorî çavkaniyên Yarsan damezrênerê baweriya wan Behlûlê Dana (k.d.806) ye û cara pêşî wî ev bawerî aniye nav Kurdan û ev bawerî li Kirmanşah û Xaneqînê belav kiriye. Behlûl ji şeş pîrên Yarsanê yên herî zêde xwedî bandor ê yekem e. Li gorî baweriya Yarsaniyan, Behlûl zatê Xuda ye:

Behlûl Zativê, Zatî yekdanê
Ewaman maçan Behlûl Dîvanê
Divaneyî Zahir
Danayi Yaranim Divaneyî Zahir

Diyaloga Dewrey Behlûl, ji aliyê hecmê ve biçûk e û ji 9 bendan pêk tê. Lê digel vê jî zehf giring e. Lewra ev diyalog yekem diyaloga dînî ya edebiyata Yarsan e. Diyalogên wî û yaranên wî di "Defterî Dewrey Behlûl" de hatine nivîsandin. Derwêşên Qonaxa Behlûl ev in: Behlûl, Baba Lorê, Receb, Hatem û Nujûm.

1.2. Baba Serhengê Dewdanî

Baba Serheng kurê Îbrahîmî Dewdanî ye. Li herêma Dewdanê li navçeya Şaxî (çiyayê Şahû) Hewramanê ku nêzî bajarê Sinê ye di sala 935an de hatiye dinyayê. Baba Serheng, ji şeş pîrên Yarsanê yên herî zêde xwedî bandor ê duyem e. Di sala 1007an de koçî dawiyê kiriye û gora wî li gundê Tewîleyê ye. Piraniya rojên xwe li Hewramanê derbas kirine. Diyalogên wî û yaranên wî di "Defterî Dewrey Baba Serheng" de hatine nivîsandin. Diyalogên wî tev bi teşeya dubeytiyan e û serwaya her çar misrayan yek e. (aaaa)

Pey emantan pey emantan
Gird amade ban pey emantan
Ez melhem meniye û zamantan
Meresem we heq îmamantan

CamScanner ile tarandı

Serhengî Dewdan Serhengî Dewdan
Ez kî namman Serhengî Dewdan
Çenî êrmanan megêlim herdan
Mekoşim perê ayînî Kurdan

Derwêşên Qonaxa Baba Serheng ev in: Baba Serheng, Rûhtaf, Xulam, Rûm, Xunkar, Yerenc, Nêva, Qeyser, Gerçek, Seburê, Tebriz, Serenc.

1.3. Şa Xweşînê Loristanî

Navê wî Mubarek Şa ye (Şah e). Leqeba wî Baba Xweşîn yan jî Şa Xweşîn e. Şa Xweşîn ji şeş pîrên Yarsanê yên herî zêde xwedî bandor ê sêyem e. Li gorî Serencamê di sala 1015an de li Loristanê hatiye dinyayê. Şa Xweşîn kesekî efsanewî ye. Zarokatiya xwe li Loristanê bûrandiye. Ji bo xwendinê çûye Hemedanê. Dîsa li gorî rîwayetê dema ku carekê li ser lutkeya çiyayê Yafteyê li Xurremabada Loristanê ji Xwedê re mûnacatek kiriye û nûra Xwedê ketiye laşê wî û bûye pîrê Yarsan. Di sala 1074ê de dema ku li Kîrmanşahê di geştekê de bû, li nêzîkî Hersînê wefat kiriye. Dubeytiyên wî yên dînî û diyalogên dî yên ku di dewra wî de hatine gotin di deftera bi navê "Dewrey Şa Xweşîn" de hatine komkirin. Di vê defterê de 111 bend hene. Di dubeytiyên wî de jî her çar misra hem serwane (aaaa).

Yarsan wera yarsan wera
Wayî Heq rasiyen biranan wera
Pakî û rastî û nêwekî û rida
Qedem we qedem ta we menzilga

Heyderî nazar Heyderî nazar
Ez çenî tomen Heyderî nazar
Perê qebale mekere înkar
Liza kaweroş bigîre qerar

CamScanner ile tarandı

Du mirîd/peyrewên wî yên bi navûdeng hene: Pîr Şehriyar/ Şalyar Hewramî û Baba Tahirê Uryanê Hemedanî.

1.4. Pîr Şalyar

Navê wî Xudadadê kurê Camasb e. Lê wekî Pîr Şalyarê Hewramî yan Zanayê Sîmyar navdar bûye. Binemaya Şalyarê Şehryar e. Pîrekî herî mezin ê Yarsan e. Li gorî agahiyên di Serencam û Dewrey Şa Xweşînê de derbas dibin, di sala 1006an de li Hewramanê hatiye dinyayê. Di ciwaniya xwe de çûye Loristanê cem Şa Xweşîn û 3 salan li cem wî maye. Piştre li ser daxwaza Şa Xweşîn vegeriyaye Hewremanê û li wir baweriya Yarsan belav kiriye. Herçiqas di nav xelkê Hewramanê wekî rîwayetekê tê bawerkirin ku Pîr Şalyar li pişt xwe berhemeke bi nave "Ma'rifetu Pîr Şalyar" hiştiye jî ev berhem negihîştiye roja me. Heta niha çend dubeytiyên Pîr Şalyar hatine tesbîtkirin. Pîr Şalyar di sala 1098an de wefat kiriye.

Yaran ce rêwas yaran ce rêwas
Padşam peyda bî ce daney rêwas
Meşye û meşyane beraman cewas
Perê azmayî merdan rewas

Daran giyan daren cerg û dil bergen
Gayî pir bergen gayî bê bergen
Kerge ce hêlên hêlê ce kergen
Rewas ce rewas wergê ce wergen

1.5. Baba Nawusî Caf

Navê wî Îbrahim û navê bavê wî Ehmed e. Li cem Yarsan wekî Baba Nawusî Caf tê naskirin.

Namim Bile (Îbrahîm) û sûretim Nawus
Babum Ehmed in sahîb caw û kûs
Pêkanim we ser cûqey per tawûs
Zat aswarenan çenî Keykawûs

CamScanner ile tarandı

Baba Nawus, ji şeş pîrên Yarsanê yên herî zêde xwedî bandor ê çarem e. Li gorî Kake Rizayî di sala 1084an de li Hewremanê li gundê Sergetê hatiye dinyayê. Li gorî Serencamê Baba Nawus di destpêkê de xwendiye lê piştre jiyaneke derwêşane û tesewifî bûrandiye. Ev tişt di diyalogên wî de jî derdikeve ber çavan. Di sala 1161ê de li Hewramanê koçî dawiyê kiriye. Dubeytiyên wî di pirtûka "Dewrey Baba Nawusî Caf" de hatine komkirin. Di vê defterê de 53 bend hene ku di wan de herî zêde behsa mîtolojiya Kurdan û bi taybetî jî Kawayê Hesinker hatiye kirin:

Duwazdeh ferzenan Kaway Ahinger
Yekî perîş min duwanzdêş birin ser
Lê mowday elmas kirşan çak çak
Mexziş hawerdin pey marî Zehak
Merdim bizanin ew Şayi Zehak
Zatiş napakin, Dûn wê dûn napak
Destî berû zimawen Kawa im Kawa im
Ez merê jînê

Ce seraw serê ceban û mahê
Çenî koldir gum kerde rahê
Şîn bîn we mêhman yek şan û şahê
Ferqman nabê ne rûy textgahê

Di vê serdemê de çend kesayetên dî jî hene ku hindik jî bin hinek diyalogên wan hatine tomarkirin. Li jêrê em dê cih bidin wan kesan.

1.6. Rihan Xanima Loristanî

Rihan Xanim di sedsala XIan de jiyaye. Li Loristanê li herêma Yafte jiyana xwe bûrandiye. Rihan Xanim peyrewa Şa Xweşînê Loristanî ye.

CamScanner ile tarandı

1.7. Liza Xanima Caf

Liza Xanim di sedsala XIan de jiyaye. Wekî binema ji malbata Caf e. Li şarezorê hatiye dinyayê, lê çûye Loristanê û jiyana xwe li wir bûrandiye. Liza Xanim jî peyrewa Şa Xweşînê Loristanî ye.

1.8. Xatû Mey Zerd

Xatû Mey Zerd, di sedsala XIan de li Loristanê jiyaye û hê di 12 saliya xwe de bûye peyrewê Şa Xweşîna Loristanî. Xatû Mey Zerd li çiyayê Yafte wefat kiriye. Li ser Şa Xweşîn helbest gotiye.

1.9. Daye Xezana Serketî

Daye Xezana Serketî di sedsala XIan de jiyaye, li Hewramanê li gundê Serketê hatiye dinyayê û li wir wefat kiriye.

1.10. Xatûn Dayrakî Remzbarî

Xatûn Dayrakî Remzbarî xanima Şêx 'Îsayê Berzencî û diya Siltan Sehak e. Li Helwanê hatiye dinyayê û di sala 1345an de li Şêxanê (Hewraman) koçî dawiyê kiriye.

1.11. Yay Hebîbeya Şarezorî

Navê wê Şêx Hebibeya Şêx Hebîbşah e. Keça Şêx Sedreddînê Şarezorî ye. Di sala 1282an de li Şarezorê li gundê "Yawa"yê hatiye dinyayê. Piştî ku li cem bavê xwe xwendina seretayî xilas kiriye, bi birayê xwe re çuye Helwanê û li wir jî du salan xwendiye. Piştî wefata bavê xwe, çûye Hewremanê li Şêxanê bi cih bûye. Yay Hebîbeya Şarezorî qet ne zewiciye û di sala 1348an de li Şêxanê koçî dawiyê kiriye.

2. QONAXA DUYEM: SERDEMA YARSANÎTIYÊ (SEDSAL XIV-XV)

Di edebiyata Kurdiya Goranî ya Yarsaniyan de qonaxa duyem, di sedsala XIVan de destpêkiriye û heta bi sedsala XVan dewam kiriye. Di vê qonaxê de baweriya Yarsanê ji aliyê Siltan

CamScanner ile tarandı

Sehaq (Siltan Sehaq) ve hatiye nûjenkirin. Kitêba herî girîng a vê qonaxê kitêba Serencamê ya Siltan Sehaq e. Ji bilî Serencamê di dewra Siltan Sehaq de hinek defterên dî jî hatine nivîsandin ku navê wan ev in: Defterî Pirdîwerî (Defgerî Dîwane Gewre), Defterî Sawa, Defterî Ramyar, Defterî Zulal Zulal, Defterî Gewahî Xulaman, Defterî Abidînî Caf.

Edebiyata Yarsan a vê qonaxê, hem ji aliyê hecm û hem jî ji aliyê hêza vegotinê ve ji ya qonaxa pêşî zehftir pêşveçûye. Pirê herî girîng ê vê serdemê Siltan Sehaq e û ev qonax bi wî dest pê dike û heta bi sedsala XVan dewam dike. Li jêrê em dê cih bidin nûnerên herî girîng ên vê qonaxê.[19]

2.1. Siltan Sehak

Siltan Sehaq (Siltan Îshaq) kurê Şêx Îsayê Berzencî ye ew jî kurê Baba 'Eliyê Hemedanî ye. Di sala 1272yan de li gundê Berzencê hatiye dine. Diya wî Xatun Dayrakî Remzbarî, keça Husên Begê Caf e. Şahî Hewraman, Perdîwer Nişim, Şahî Keremdaran, Aqayî Caf, Siltanî Ser Cem leqebên wî ne. Siltan Sehaq di destpêkê de xwendina xwe xilas kir û di zanistên felsefe û edebiyatê de pêş ket. Piştî ku bavê wî koçî dawiyê kir, navbera wî û birayên wî xira bû û dev ji Berzencê berda û koçî gundeki Hewremanê bi nave Şêxan kir. Piştre ji wir jî çû û li gundê Pirdîwerê bi cih bû û li wir ji bo belavkirina baweriya xwe zehf xebitî. Di sedsala XIIIan de Yarsanîtî zeîf bûbû û bi tinebûnê re rûbirû mabû. Siltan Sehaq ji nû ve ev bawerî sax kir. Li Hewraman, Şehrezor, Ciwanro û Şaxî Daleho dest bi belavkirina baweriya xwe kir. Di dîroka Yarsanê de cara pêşî niyazxane û cemxane wî sazkirine. Siltan Sehaq ji sed salî zehftir temen kiriye û di sala 1388an de li gundê xwe Pirdîwerê wefat kiriye. Siltan Sehaq ji şeş pîrên Yarsanê yên herî zêde xwedî bandor ê pêncem e.

Dewra Siltan Sehak li cem Yarsaniyan wekî "Dewrey Heqîqet" yan "Dewrey Perdîweri" tê binavkirin. Diyalogên edebî yên Sil-

19 Ji bo nûnerên vê qonaxê bnr. Xeznedar, b.n., r. 276-335.

CamScanner ile tarandı

tan Sehaq û yaranên wî bi piranî di Serencamê de peyda dibin. Di dewra Siltan Sehaq de defterên qonaxên berî Siltan Sehaq (Behlûl, Baba Serheng, Şa Xweşin, Baba Nawus) di bin navê "Defterî Serencam" yan "Dîwane Gewre" de hatin civandin.

Diyalogên Siltan Sehaq di hin defterên dî de jî peyda dibin ku di nav van de "Defterî Perdîwerî" ya herî girîng e. Defterî Perdîwerî ji 5 beşan pêk hatiye: Bargê, Heftewanê, Gilim we Kûl, Çil Ten û Xûrdê Serencam.

Nazrewayî yaran
Husênî şehîd nazrewayî yaran
Tuhfeyî 'ecûz reng Tebrêz şaran
Qerînit niya hewar hewaran

Dawûd ser qetar çil ten çilane
Şefeq kêş subh ke bû nîşane
Subh û ro reng in cew ray dêwane
Hewalen baro pîrewî mekane

A derga wû perde
Xulaman nîgayker a derga wû perde
Beyan bu wênan wêl keran herde
Ce sirrî qudret ce rengîm kerde
Biyayî sacî nar îgam awerde
Xulaman wêl newan î seraw perde
Saz nam heft nûr cam bê gerde
Ce ezel mêrdan ser pêş siperde

Di dewra Siltan Sehak de hinek "Kelam"ên dî jî hatine nivîsandin ku navê wan ev in: Kelamî Damyarî, Zulal Zulal, Kelamî Gewahî Xulaman, Kelamî Abidin Caf yan Abidin Çawûş.

Yaran nazanim çime
Emro wek rojan nime
Xudayî heft tebeq zemîn heft asîman

CamScanner ile tarandı

We çawî xwem dime
Di naxwenim siya xetan
Narom be kunci mizgewtan
Erom be xizmeti Siltan
Ez Abidîn Çawuş im
Quway qed im kune pûş im
Barim jarê jar defiroşim
Ez axabeydinim Kurê Feqyan
Reqim kird be Kakeiyan
Gotim le gûli suhbet çiyan
Ta royim be xizmeti Siltan

Di edebiyata Yarsan de, di qonaxa Siltan Sehak de, heta bi sedsala XVIIIan, hinek defterên dî jî hatine nivîsandin ku navê wan ev in: Defterî Pîr Alî, Defterî Şaweys Qolî, Defterî Sawa, Defterî Seyîd Xamûş (Ekabir), Defterî Îl Bêgî Caf, Defterî Xan Elmas, Defterî Şêx Emîr.

2.2. Abidînî Caf

Abidînê Caf kurê Nûrullahê Caf e. Li gorî Serencamê di sala 1320î de li Şehrezorê hatiye dinyayê. Li wir li cem Mele Îlyasê Şehrezorî xwendiye. Zanistên belaxet û kelamê jî dîsa li Şehrezorê li cem Mele Xefûrê Şehrezorî xwendine. Dawiyê çûye cem Siltan Sehak û bûye peyrewê wî. Di sala 1394an de wefat kiriye. Abidînî Caf kesayetekî girîng ê edebiyata Yarsan e. Bi diyalektekî nêzî Kurdiya Soranî nivîsandiye. Ev rewş zehftir li Şehrezor û rojavayê çemê Sîrwanê tê dîtin. Di mecmû'eya "Dewrey Abidîn" de hinek ji diyalogên wî hatine komkirin.

Men 'aşiqî xawendkar im
'Eşqî yar e wa bê 'ar im
Emin giraw şaw çiwar yar im
Nuxtey Xuda wa le zar im
Ez ke wêl bûm le cê wû şar im

CamScanner ile tarandı

Beled mî kird şay şaswar im
Bezerbî dest ke mandar im
Be fidayî yarî kirdar dar im
Ke minî xiste ser rê rasî
Heta bijîm be bê kes î
Min 'Abidînî Kakeyîm
Axir be yarî xom geyîm

2.3. Şa Îbrahîm Eyyût

Şa Îbrahîm kurê Seyîf Mihemedî Gewre Siware, ew jî kurê Siltan Sehak e. Di nav Yarsanê de nasnavê wî yên wekî Eyyût, Roçyar û Melek Teyar jî hene. Li gorî Serencamê di sala 1324an de li gundê Şêxanê hatiye dinyayê. Diya wî Xatûn Zeyneba keça Mîr Xusrewê Loristanî ye. Di zarokatiya xwe de di xanqaha Sergermê de xwendiye. Di ciwaniya xwe de dersên dînî û tesewifî ji Siltan Sehaq wergirtine. Li ser xwestina Siltan Sehak ji bo belavkirina baweriya Yarsanê çûye Kurdistana Xwarê û li gundê "Serane"yê ku niha navê wê "Baba Yadgar" e bi cih bûye. Di sala 1407an de li heman cihî wefat kiriye. Yên ku li pey wi çûne wekî Kakeyî tên binavkirin û heta niha jî li Kerkuk, Xaneqîn û Mendeliyê dijîn. Kakeyî li pey baweriyên Yarsanê yên dewra Şa Îbrahîm diçin. Li gorî ku Me'rûf Xeznedar dibêje helbestên Şa Eyyût bi navê "Dîwana Şa Eyyût" li ber desta ne. Piraniya helbestên wî bi terzê bendan hatine nivîsandin. Her bendek derheqê jiyan û bûyerên pêxemberekî, pîrekî, weliyekî yan jî sûfiyekî de ye. Di van helbestên wî de fikra reenkarnasoyonê aşîkar e.

Îbrahîm 'eyan Îbrahîm 'eyan
Derûnim coşa murxim kerd 'eyan
Mezher tûs bîm şazadeyî keyan
Pûrî şa nozer zerrîn poş beyan
Kakem yadgar donî siyawehş
Ne pişt kerd we êran we dewanî dew

CamScanner ile tarandı

Kuşte bî we tîx şay efrasiyew
Ta girey fanos xewrew bî rewşen
We zorî rostem heqî baboş sen

2.4. Baba Yadgar

Navê Baba Yadgar, Seyîd Ehmed e. Lê nasnavê wî yê dînî Baba Yadgar e. Pirekî zehf girîng ê Yarsan e. Li gorî Serencamê Baba Yadgar di sala 1359an de li Gundê Şêxanê hatiye dinyayê. Xwendina xwe li cem Siltan Sehaq xilas kiriye. Îcazetnameyên zanistî û tesewifî ji Siltan Sehaq wergirtine. Li ser daxwaza Siltan Sehak ji bo belavkirina baweriya Yarsanê çûye heta bi Hindistanê û muddetekê li wir maye. Piştre vegeriyaye gunde "Serane"yê ya li çiyayê Dalehoyê li Kirmanşahê. Piştî temenekî dirêj di sala 1480î de li wî gundî hatiye kuştin. Ji ber ku jiyana xwe li gundê Seraneyê bûrand wekî Seyîd Ehmedê Seraneyî jî tê naskirin. Pişti koça wî ya dawiyê navê gundê wî bûye "Baba Yadgar". Baba Yadgar qet nezewiciye. Berî ku bimire Seyîd Xeyal û Seyîd Wîsal li şûna xwe wekî cîgir (postnişîn) danîne. Wekî gelek pîrên Yarsanê ji bo wî jî hinek efsane tên gotin. Baba Yadgar li pişt xwe dîwaneke helbestan bi navê "Zulal Zulal"ê hiştiye. Helbestên wî ji bendan pêk hatine û di her bendekê de behsa pêxemberek, pîrek, sûfiyek, yan jî weliyekî dike.

Yadgar dona don Yadgar dona don
Gerdişî dewran dunyayî dona don
Îrec biyanî pûrî fereydûn
Kakem Îbrahîm ferî fereydûn
Çûn pîrî Ken'an dû dîdem kûr bî
Gerdinim we hûn tîx selm û tûr bî
Ta ke menûçer azawe zerûr
Xerq kerdiş ne behr sipayî selm û tûr

CamScanner ile tarandı

2.5. Qirmizî / Şa Weys Qulî

Qirmizî kurê pîr Qenberî Şahoyî ye. Qirmizî nasnav wî ye û bi nasnav xwe hatiye naskirin. Li gorî agahiyên ku di "Dewrey Qirmizî" de hatine dayîn, ew di sala 1407an de li gundê Derziyanê ku li ser navçeya Şaxî Şaho ye hatiye dinyayê. Li cem Yarsaniyan kesekî zehf girîng e. Di zaroktiya xwe de xwendiye û menzûme gotine. Qirmizî qet ne zewiciye û wextê xwe ji belavkirina baweriya Yarsanê re veqetandiye. Qirmizî temenekî dirêj bûrandiye û di sala 1514an de koçî dawiyê kiriye. Cihê gora wî ne diyar e. Diyalog û menzûmeyên wî di mecmû'eya bi navê "Dewrey Qirmizî" de hatine komkirin.

Eslî men ce Kurd eslî men ce Kurd
Babom Kurdenan eslimen ce Kurd
Min ew şêrenan çenî destey gurd
Silsiley spay zehak kerdim hurd

2.6. 'Alî Qelender

'Alî Qelender pêşivanekî Yarsanê ye. Li gorî Serencamê ew di sala 1434an de li gundekî nezîkî çiyayê Daleho hatiye dinyayê. Ji bo xwendinê çûye Dînewerê. Di sala 1484an de Li Bexdayê ji aliyê hinek kesan ve hate kuştin. 'Alî Qelender piştî Siltan Sehaq e û di payeya Îbrahîm Eyyût de ye.

Ew koy serendîl
'Alînan 'alî ew koy serendîl
Qurbanîm kerden newanî zelîl
Habîl biyanî kuştim kerd Qabîl

Mest û dîwane
'Alînan 'alî mest û dîwane
Yurt we yurt yawan yane we yane
Xoşal ew gele 'alî çobane

CamScanner ile tarandı

2.7. Seyîd Ekabîrî Xamoşî

Seyîd Ekabîrî Xamoşî kurê Şêx 'Elî Xamoşî ye. di sala 1440î de li gundê Şêxanê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî li wir qedandiye. piştre çûye Hewremanê û li wir bûye pîrekî Yarsanîtiyê. Di sala 1493an de li wir wefat kiriye. Heta niha diyalogên wî nehatine komkirin, lê di defterên Yarsaniyan de belamela hene.

Bînayî gişt karan
Azîz her tunî bînayî gişt karan
Ez siweylenan merjî nedaran
Dildar mewênî sub û êwaran

3. QONAXA SÊYEM: SERDEMA RAWESTANÊ (SEDSAL XVI-XX)

Edebiyata Kurdiya Goranî ya vê qonaxê, ku ji sedsala XVIan destpêkiriye û heta bi sedsala XXan dewam kiriye, dubarekirina bîr û baweriyên Siltan Sehaq e. Ji ber vê yekê ev serdem dewama serdema duyem tê hesibandin. Di vê serdemê de gelek dewre û defter hatine komkirin ku yên herî girîng ev in: Dewrey Ateş Begî, Dewrey Baba Celîl, Dewrey Çil Ten, Dewrey Heyderî, Dewrey Heyas, Dewrey Heftewane, Kelamî Elmas Xan, Dîwanî Derwêş Qulî Kirindî, Dîwanî Zulfeqar, Dîwanî Seyîd Ye'qûbî Mahîdeştî, Dîwanî Şa Teymûrî Banî Yaranî, Dîwanî Qasid, Kelamî Şêx Emîr, Kelamî Newroz. Li jêrê em dê cih bidin nûnerên herî girîng ên vê qonaxê.[20]

3.1. Baba Celîlê Dewdanî

Baba Celîl kurê Cozî Dewdanî ye. Di sala 1478an de li Dewdanê (Hewraman) hatiye dinyayê. Temenê xwe ji bo Yarsanê serf kiriye. Helbestên wî û yên yaranên wî di kitêba bi navê "Dewrey Baba Celîl" de hatine komkirin. Di sala 1560î de wefat kiriye.

20 Ji bo nûnerên vê qonaxê bnr. Xeznedar, b.n., r. 259, .336-338.

CamScanner ile tarandı

Ecir ma 'ezîm
Ez wûzûgenan ecir ma 'ezîm
Xofî xulaman hîç niyan perîm
Penem mewaçan celîlî rehîm
Riyazetkêş im
Ezîzim pey to riyazetkêş im
Bizêker we hal derûnî rêş im
Gulim we destan pey çêşen bêşim

3.2. Semen Xanima Dewdanî

Semen Xanim, di sedsala XVIan de jiyaye. Di sala 1530î de li Dewdanê intisabî Baba Celil kiriye.

3.3. Heyderî (Seyîd Birakê)

Seyid Heyder yan Sey Birakê, kurê Seyîd Mensûr e. Ji şeş pîrên Yarsanê yên herî zêde xwedî bandor ê şeşem e. Li Goranê li gundê Tûtşamî hatiye dinyayê. Di sedsala XVIIIan de jiyaye. Pîreki girîng ê Yarsan e. Edebiyata Yarsan a vê qonaxê, hem ji aliyê hecm (3000 rûpel) û hem jî aliyê hêza vegotinê ve ji ya qonaxa pêşî zehftir pêşve çûye. Ji Dewrey Heyderî re "Dewrey 36 şa'ir" yan "Yerî Tenî" jî tê gotin. Helbestvanên Dewrey Heyderî 37 derwêş in:

Derwîş Abbas Kerendî, Derwêş Mîrza Elî Abbaswendî, Derwîş Bêgmurad Gehwarêyî, Derwîş Braxas Beyameyî, Derwîş Dûsê Beyameyî, Derwîş Fariq Kirmaşanî, Derwîş Xulam Çegabûrî, Derwîş Heyder Keçikbelî, Derwîş Heyder Qelxanî, Derwîş Heyder Paydar, Derwîş Hosên Elî Şiyanî, Derwîş Îbrahim Abbaswendî, Derwîş Îmam Beyameyî, Derwîş Cozê Tufengçî, Derwîş Kemer Beyameyî, Derwîş Kerîm Gehwareyî, Derwîş Kerîm Xelil Tûtşamî, Derwîş Xudawerdî, Derwîş Xuda Murad Qelxanî, Derwîş Laçîn Abbaswendî, Derwîş Mulk Elî Siltan, Derwîş Murad Qelxanî, Derwîş Newroz, Derwîş Ocaq Beyameyî, Derwîş Pîrweys Qelxanî, Derwîş Riza Elî Beyameyî, Derwîş Rustem Babacanî, Derwîş Rustem Kerendî, Derwîş Seyfûr Beyameyî, Derwîş Şah Nezer Berwendî, Derwîş Şah Riza Kerendî, Derwîş Şîrxan Kerendî, Derwîş Şîrxan Weys Elî

CamScanner ile tarandı

Siltan, Derwîş Şukur Gehwareyî, Derwîş Tehmas Gehwareyî, Derwîş Teymûr Banyaranî, Derwîş Velî Mucrî Lanî.[21]

II. EDEBIYATA GORANÎ YA KLASÎK

Edebiyata Kurdiya Goranî ya nivîskî ya klasîk li herêma Hewramanê û bi taybetî jî li erdnîgariya mîrnişîniya Erdelanê gelekî pêş ketiye. Nûnerên vê edebiyatê, di helbestên xwe de zêdetir devoka Hewramî bi kar anîne. Hin helbestvanên girîng ên ku bi Kurdiya Goranî nivîsandine ev in:

1. Mela Perîşan (1356-1421)
2. Êl Begê Caf (1492-1553)
3. Bêsaranî (1643-1701)
4. Elmas Xanê Kendoleyî (1702-1776)
5. Xanay Qubadî (1704-1778)
6. Welî Dîwane (1745-1801)
7. Mewlewî (1806-1882)
8. Rencûrî (1750-1809)[22]
9. Mestûre Mahşeref Xanima Kurdistanî
10. Mewlana Xalidê Şarezorî

Ji van helbestvanan ê herî kevin Mela Perîşan e. Mela Perîşan helbestvanê sedsala XVIem e. Edebiyata Goranî ya klasîk herî zêde di sedsala XVIIIem de pêş ketiye. Di vê sedsalê de kesên wekî Rencûrî, Welî Dîwane û Mewlewî dîwan nivîsandine. Xanay Qubadî jî bi "Xusrew û Şêrîn" û "Leyla û Mecnûn"a xwe mohra xwe li vê sedsalê xistiye. Di sedsala XIXem de jî Mewlewî, Mestûre Mahşeref Xanima Kurdistanî û Mewlana Xalidê Şarezorî derdikevin pêş.

Helbestvanên Kurdiya Goranî ya klasîk, ji aliyê ruxsarî ve helbestên xwe li ser kêşa xwemalî ya Goranî/Hewramî (kêşa birgeyî, sîlabî, pençeyî) nivîsandine. Helbestên wan ji misrayên

21 Ji bo ku agahiyên derheqê Heyderî de pêşkêşî min kirine, ez spasdarê Dr. Şehab Welî me.

22 Derheqê van de bo agahiyên berfireh bnr. Xeznedar, b.n., r. 22-173.

CamScanner ile tarandı

dehhêceyî pêk tên û di nîvê misrayan de jî tê rawestan. Helbesta Goranî ya klasîk, di vê xalê de ji helbesta klasîk a rojhilatê ku helbestên wê bi kêşa erûzê hatine nivîsandin, vediqete.

Em dê li vir wekî nimûne li ser helbestvanê herî kevin ê edebiyata Kurdiya Goranî ya klasîk Mela Perîşan Dînewerî, helbestvanê "Xusrew û Şêrîn" û "Leyla û Mecnûn"ê Xanay Qubadî, helbestvanê xwedî dîwan Mewlewî û herçiqas helbestên wê yên Kurdî kêm jî bin, helbestvana jin a mîrnişîniya Erdelanê Mestûre Mahşeref Xanima Kurdistanî rawestin.

A. MELA PERÎŞAN DÎNEWERÎ

Mela Perîşan Dînewer, helbestvanekî girîng ê Kurdiya Goranî ye. Kunyeya wî Ebu'l-Qasim e. Ew di sala 1356an de li Kurdistana Rojhilat, li bajarê Dînewerê ku li ser Kirmaşanê ye hatiye dinyayê. Di sala 1421ê de koçî dawiyê kiriye. Digel Kurdî bi Erebî, Farisî û Tirkî dizanî.

Mela Perîşan helbestên xwe bi Kurdiya Hewramî nivîsandine, lê tenê çend helbestên wî gihîştine roja me. Destxeta helbestên wî niha li Almanya li Zanîngeha Marbogê tê parastin. Helbestên wî di sala 1915an de li Kirmaşanê bi navê "Dîwanî Mela Perîşanî Kurd" hatine çapkirin. Ji helbestên wî tê fêmkirin ku ew di bin bandora Hurûfîtî û Şî'îtiyê de ye:[23] Ev beytên li jêrê yên wî ne:

Ewwelîn herfî nubuwwet "Nûn" e
Melfûzeş sê hef "Waw"eş meknûn e

"Waw" xod kînaye ji wîlayeten
Neminye watem nessî ayeten

Ewwelînî herf wîlayet "Waw"en
Ew nîz melfûzeş sê herfî "Waw"en

23 Xeznedar, b.n., r. b.II, r. 22-24; Baba Merdûxê Rûhanî, *Mêjûy Nawdarani Kurd*, (wer. Macid Merdûx Rûhanî), weş. Akadîmyayî Kurdî, Hewlêr 2011, b. I, r. 124-125.

CamScanner ile tarandı

Ewset "Elif"en ji ulûhiyyet
Munkir înkar kerd ji bulûhiyyet

***

Dinyaw axîret her du îhsan en
Her xurdebînî dirişt ziyan en

B. XANAY QUBADÎ

Xanay Qubadî, di sala 1673 yan jî 1704an de li gundê Derne ku li ser Ciwanrûyê ye hatiye dinyayê. Bi îhtîmaleke mezin ji malbata birevebirên Bacalan/Derne ye. Hevaltiya wî bi munşiyê xanên Erdelanê Mîrza Şefi'î Kulyayî hebûye û ji hev re gelek helbest nivîsandine. Qubadî, di serdema Nadirşahê Sefewî de jiyaye. Qubadî temenekî dirêj bûrandiye (bi qasî 85 salan jiyaye) û di sala 1754 yan 1778an de koçî dawiyê kiriye.

Qubadî di warê edebiyata klasîk de berhemên edebî yên hêja dane. Pêşî "Xusrew û Şîrîn", piştre jî "Leyla û Mecnûn" nivîsandiye. Qubadî bi saîqa hizra neteweyî ev berhem nivîsandine. Herweha di van berheman de li pey şopa Camî û Nîzamiyê Gencewî çûye.[24] Qubadî, di destpêka "Xusrew û Şîrîn"ê de weha dibêje:

Ce lay 'aqilan sahibeql û dîn
Dana bizurgan Kurdistan zemîn

Rasten miwaçan Farsî şekeren
Kurdî ce Farsî bel şîrînteren
...
Xaric ce me'na ne bo mezmûneş
Kiryabo çûn şi'r ***Camî*** *mezmûneş*

24 Xeffar Îbrahîmî, *Xanay Qubadî Leyla û Mecnûn*, Binkey Jîn, Silêmanî 2011, r. 25-29; Xeznedar, b.n., r. b.II, r. 89-94.

CamScanner ile tarandı

Ce lay xîredmend dil pesend mibo
Şîrînter ce şehd şîrey qend mibo

Ce 'ersey dinyayê dûn bedfer cam
Be destûrî nezim ***Nîzamî*** *meqam*

Be lefzî ***Kurdî Kurdistan*** *temam*
Pêş bi wan mehzûz baqî we's-selam

Çend beytên pêşî û dawî ji "Leyla û Mecnûn"a Xanay Qubadî weha ne:

Be namî ew kes be "Kun feyekûn"
'Alemeş ce ketm 'edem kerd bîrûn

Mehzî xatiran Seyyidu'l-kewneyn
Muhemmed Fatih Xeyber û Huneyn

***

Hezar û şeş sed û çil û çiwar bêten
Pey dostan ne bo xane pey kêten

Sed hezar sel'wat xatimey kelam
Be Rewzey Resûl 'eleyhi's-selam

C. MEWLEWÎ / ME'DÛMÎ

1. ZANYARIYÊN NASNAMEYA WÎ

Navê wî Ebdurehman, navê bavê wî Mela Se'îdê Tawegozî ye. Mexlesa wî ya helbestê "Me'dûmî" ye, lê di nav gel û edebiyatvanan de wekî "Mewlewî" hatiye naskirin. Dema ku Mewlewî, li Sineyê li mizgefta Daru'l-Ihsanê xwendekar bûye,

CamScanner ile tarandı

waliyê Erdelanê Riza Qulî Xan kurê Xusrew Xan ev nav lê kiriye. Ew hicreya ku Mewlewî lê maye, heta îro jî wekî hicreya Mewlewî tê binavkirin.

Mewlewî, di sala 1806an de, li gundekî Tawegozê bi navê Serşate ku beşek ji Kurdistana Başûr e, hatiye dinyayê. Di serdema wî de mîrnişîniya Baban desthilatdar bû.

Di zaroktiya wî de, bavê wî li gundekî nêzî Helebçeyê bi navê Bijawe bicih bûye. Mewlewî pêşî li cem bavê xwe xwendiye. Piştre ji bo xwendinê li cihên wekî Pawe, Merîwan, Sine, Silêmanî (li cem Şêx Marûfê Nodehî), Helebce û Ciwanrûyê geriyaye. Ji bo jiyaneke tesewifî çûye Tewîleyê û li wir bûye pêgirtiyê Şêx Osmanê Tewîleyî ku ew jî xelîfeyê Mewlana Xalidê Şarezorî ye. Mewlewî di encamê de bûye şêx û murşidekî vê terîqetê. .

Piştî ku Mewlewî xwendina xwe xilas kiriye, li gûnde Çoristanê (nêzî Helebçeyê) dest bi melatiyê kiriye. Li wir têkiliya wî bi hin malbatên Neqşebendî yên Efxanî re çêbûye. Li wê derê bi keçeke bi navê Enber Xatûn re zewiciye. Di gelek helbestên xwe de behsa Enber Xatûnê kiriye. Piştî mirina wê zewaceke duyem jî kiriye.

Mewlewî, demeke dirêj li cihekî nesekiniye. Piştre li gundên Bijawe û Biyawêle melatî kiriye. Herî dawî li gundê Serşateyê ku lê hatibû dinyayê, bi cih bûye û di sala 1882yan de li wir koçî dawiyê kiriye. Mewlewî, berî ku koçî dawiyê bike bi çend salekê her du çavên xwe winda kirine.

Mewlewî digel ku sûfî jî bo, ne kesekî koşegîr bû. Ew di nav civatê de bû û têkiliyên wî bi şêx, axa, rewşenbîr û helbestvanên serdema xwe re gelekî zêde bûn.

2. CIHÊ WÎ DI EDEBIYATA KURDÎ DE

Mewlewî, di warê edebiyata Kurdiya Goranî de du berhemên girîng dane: Dîwan û Eqîdename.

CamScanner ile tarandı

2.1. Dîwan

Mewlewî, yek ji wan helbestvanan e ku dîwana wan gelek rexbet dîtiye. Çapên dîwana wî li jêrê hatine destnîşankirin:

1. Cara pêşî Pîremêrd bi navê "Dîwanî Mewlewî û Rûhî Mewlewî" dîwana wî çap kiriye (Bergê yekem 1935, bergê duyem 1940). Pîremêrd, di rûpelekî de cih daye orjînala helbestan a bi Kurdîya Hewramî, di rûpelekî de jî cih daye Soraniya wan.

2. Çapa duyem, ji aliyê Mela Ebdulkerîm Muderris ve bi navê "Dîwanî Mewlewî" hatiye amadekirin (Bexda 1961).

3. Mihemed Emînê Erdelanî, dîwana Mewlewî bi navê "Dîwanî Mewlewî Seyîd Ebdurehîmê Me'dûmî" wergerandiye Soranî (Bexda 1991).

4. Soran Sineyî, bi navê "Rîsaley Işq le Mewlewînasî da", li ser Mewlewî lêkolînek kiriye û di vir de cih daye helbestên wî jî (Întîşaratê Selahedînê Eyyûbî, Urmiye 1991).

Dîwana Mewlewî, ji aliyê sîtema tertîbê ve, ji dîwanêk klasîk cudâ ye. Di dîwanên klasîk de helbest, li gorî herfên qafiyeyan tên rêzkirin. Lê di dîwana Mewlewî de li gorî herfên pêşî yên misrayên yekem hatine rêzkirin û bi hemû herfên hêceyê yên alfabeya Erebî helbest hatine nivîsandin. Bo nimûne helbestên ku di beşa herfa "B"yê de cih digirin, bi herfa "B"yê dest pê dikin. Wekî;

Ba'isê wucûd ce mah ta mahî
Delîlê isbat sun'ê îlahî

Ziyayî bînayim nûrê çemanim
Sermayey heyat dîn û îmanim

Min wêm mizanû bê emrîm kerden
Eta'ey ferman 'ebdîm neberden

CamScanner ile tarandı

'Umrim serapa xerqê xefleten
Zadê axirim barê xecleten

...

Mewlewî gelek caran di destpêka helbestê, yan jî di nîvê helbestê de cih daye mexlesa xwe (Me'dûmî).

Mewlewî, helbestên xwe ji aliyê ruxsarî ve li ser kêşa xwemalî ya Hewramî/Goranî (kêşa birgeyî) nivîsandine. Hemû helbestên wî deh hêceyî ne û di nîvê misrayan de rawestan heye.

Taybetiyeke dî ya dîwana Mewlewî ew e ku di dîwana wî de bi teşeyên xezel û qesîdeyan helbest peyda nabin. Helbestên wî hemû bi teşeya mesnewiyê (aa, bb, cc, ...) hatine nivîsandin. Parçeyên ku ji beytek (ferd), yan jî ji du beytan pêk tên jî, dîsa bi teşeya mesnewiyê ne û bi qafiyeya "aa bb" hatine nivîsandin.

Mînaka Ferdekê:

Pîrî û feqîrî û kesîfî her sê
Nebowe hîcran barê hîç kesê

Helbestên Mewlewî ji aliyê naverokê ve ji van mijaran pêk tên: Helbestên dînî, helbestên tesewifî (îrfanî), helbestên dildarî û siruştî, medh (pêdahildan) û fexir (şanazî), matemname (derhewê xanima wî Enber Xatûn û bi qasî deh kesên dî de), helbestên komelayetî, şîkayet, gilî û gazin (li ser mirina Enber Xatûn, şewata pirtûkên wî, korbûna wî)

Matemname

Îmsal new wehar çûn xezan serd
Bergê werdê bax Me'dûm berd pey herd

Mişêw taley min xîlafengîz bo
Wer ne key key dê wehar gul rêz bo

CamScanner ile tarandı

Dil we gêc bazî ç' pgerd bazîş werd
Cift arezû kerd ç' pgerd taq awerd

Bo 'Enber ne toy demaxim dûr kerd
Firisteş awerd heway we bay derd

Ney çi we bê bezmê yaran canî
Kam sefa menden pey zindeganî

Çûn mezaq talen ce gerdîn lawe
Bo we şîrîn î yek du newawe

Yekê yekcarî tawî nomewe
Ew yek lawî nom yawî nomewe

2.2. Eqîdename

Mewlewî derheqê zanistên Îslamî de menzûmeyek bi navê "el-Eqîdetu'l-Merziye" jî nivîsandiye. Eqîdenameya wî cara pêşî li Qahîreyê di sala 1933yan de, cara duyem jî li Silêmaniyê di sala 2000î de hatiye çapkirin. Zimanê eqîdenameya wî ji diyalektên Hewramî, Sineyî, Silêmanî, Goranî û Soranî têkel e. Lê helbestên wî ne wisa ne, tenê bi Hewramî hatine nivîsandin.[25]

Destpêka eqîdenameya wî weha ye:

Zubdey eqîdew xulasey kelam
Her le tow bo toy hemd û senay tam

D. MESTÛRE MAHŞEREF XANIMA KURDISTANÎ

Mestûre Xanim, di sala 1220/1805an de li Sinê/Senendecê hatiye dinyayê. Mahşeref navê wê, Mestûre jî mexlesa wê ye, lê ew wekî Mestûre Mahşeref Xanima Kurdistanî hatiye naskirin.

25 Xeznedar, b.n., b. 3, r. 433-481; Mela Ebdulkerîm Muderris, *Dîwanî Mewlewî*, Bexda 1961, Beşa Sereta.

CamScanner ile tarandı

Bavê wê Ebu'l-Hesen Begê Qadirî ye. Malbata bavê wê nûnerê terîqeta Qadirî bûn, herweha dostên xanên Erdelanê bûn û di rêvebiriya Erdelanê de wezîfeyên girîng dikirin. Ji ber vê yekê jî Mestûre Xanim bi Xusrew Xanê Erdelanî re zewicî ku ew jî helbestvan bû û mexlesa wî Nakam bû. Lê piştî zewaca wan bi demeke hindik di sala 1834an de Xusrew Xan koçî dawiyê kir. Ji ber ku piştî wî di navbera kurên wî de li ser text milmilane çêbû, Mestûre Xanim di heman salê de di serdema Ehmed Paşayê Baban de koçî Silêmaniyê kir. Mestûre Xanim piştî salekê di sala 1844an de li Silêmaniyê koçî dawiyê kir.[26]

1. BERHEMÊN WÊ

Mestûre Xanim, hem zana, hem jî edebiyatvan bû û di her du waran de berhem dane. Tê gotin ku dîwana wê kêmzêde ji 20. 000 beytan pêk dihat. Lê piştî wê, ji ber milmilaneyên siyasî gelek helbestên wê winda bûne. Şêx Yehya Me'rîfet di sala 1304/1887an de helbestên wê yên Farisî kom kirine û wekî dîwanekê li Tehranê çap kirine. Ev dîwan piştre di sala 1906an de li Senendecê jî çap bûye. Di dîwanê de ku kêmzêde ji 2000 beytan pêk tê, 178 xezel, 29 rubaî, 5 tarîx, 2 mersiye, terkîb bendek hene.[27]

Berhemeke wê ya dî jî "Tarîxî Erdelan" e. Herçiqas ev berhem jî bi Farisî be, lê di warê tarîxa Erdelanê xezineyeke bêhemta ye. Berhem di sala 1920an de ji aliyê Nasirê Azadpûr ve li Sineyê, piştre jî li Tehranê hatiye çapkirin. Ji bilî "Dîwan" û "Tarîxî Erdelan"ê dîsa bi Farisî derheqê eqaida Îslamê de û bi Erebî jî derheqê helbestên bijarte de bi navê "Mecma'u'l-Udeba" du berhemên wê yên dî jî heye. Lê ev berhem heta niha nehatine çapkirin.

---

26 Rûhanî, b.n. b. I, r. 362-368; Hemdî Ebdulmecîd Selefî, Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Mu'cem Şu'arai'l-Kurd*, weş. Spirêz, Erbîl 2008, r. 031; Feqî Huseyn Sağnıç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2000, r. 179.

27 Mestûre Mahşeref Xanim, *Diwan*, (Amd. Şêx Yehya Me'rîfet), Tehran 1887, Dîbace, r. 4.

CamScanner ile tarandı

2. HELBESTÊN WÊ YÊN KURDÎ

Çawa ku li jorê jî hat gotin, ji ber ku gelek helbestên Mestûre Xanimê negihîştine roja me, em nizanin bi giştî çiqas helbestên wê yên Kurdî hene. Heta niha tenê sê helbestên Mestûre Xanimê bi Kurdî hatine weşandin. Du heb ji van mersiye ne ku derheqê koça dawiyê ya hevserê xwe Nakam de bi Goranî nivîsandine ku yek ji wan weha dest pê dike:

Xusrewim wehar, xusrewim wehar
Ya şa nebûwe, îmsal ne wehar

Ber neyan we ber gulan ce gulzar
Nekro dirext şikufe izhar

Ne sehnî çemen newano bulbul
Henî ne nîşo jale ne rûy gul

Nîlufer ta heşr ber ne yoce aw
Ce rûy gul surx nekêşû gulaw

Helbesta wê ya sêyem jî bi Kurdiya Soranî ye ku beytên wê yên pêşî û dawi weha:

Giriftar im be nazî çawekanî mestî fettanet
Birîndar im be tîrî sînesûzî nîşî mujganet
Eto emro le mulkê dilberî da nadreyî dehrî
Be resmî bendegî ***Mestûre*** *wa hatûte dîwanet*

Mestûre Xanim li pey şopa Xanayê Qubadî çûye û têkiliya wê bi Mela Xidir Nalî û Yaxmayê Cendeqî re hebûye. Nali û Mewlewî derheqê wê de medhiye nivîsandine ku ev jî girîngiya Mestûre Xanimê bi me dide nîşandan.[28] Bi rastî jî di tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk tevî de wekî helbestvaneke jin, cihê Mestûre Xanimê zehf binirx e.

---

28 Rûhanî, b.n., b. I, r. 379-380; Sağnıç, b.n., r. 178.

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA SÊYEM
EDEBIYATA KURDIYA KURMANCÎ

Çawa ku me gotibû piştî destpêkirina edebiyata Kurdiya Goranî di sedsala VIIIan de, edebiyata Kurdiya Kurmancî jî di sedsala XV-XVIan de dest pê dike. Di vê beşê de em dê li ser edebiyata Kurdiya Kurmancî rawestin. Em dikarin Edebiyata Kurdiya Kurmancî, di çarçoveya tarîxa Kurdan de li ser sê serdeman parve bikin:

1. Serdema Berî Mîrektiyan
2. Serdema Mîrektiyan
3. Serdema Piştî Mîrektiyan.

Mebesta me ji van mîrektiyan, ew mîrektî ne ku di sedsalên XIII-XIVan de, ji aliyê Kurmancan ve hatine damezrandin û heta bi nîvê sedsala XIXan li ser piyan mane. Ji ber ku mijara me edebiyata Kurmanci ye em mîrektiyên zaza û Soranan ên vê serdemê li derveyî mijarê dihêlin. Edebiyata Kurdî ya vê serdemê serdema mîrektiyan tîne holê. Serdema berî mîrektiyan ji misilmanbûna Kurdan dest pê dike û heta bi dawiya hikûmetên Kurdan yan jî heta bi dawiya dewleta Ebbasiyan dewam dike. Serdema piştî mîrektiyan jî ji nîveka duyem a sedsala XIXan heta bi roja me ye.

Eger em ji aliyê edebiyata Kurdiya Kurmancî ve li taybetiyên van serdeman binêrin bi kurtî em dikarin weha bêjin: Di serdema pêşîn de anko di serdema berî mîrektiyan de helbestvanên ku bi Kurdiya Kurmancî nivîsandine zehf kêm in. Di vê serdemê de helbestvanên Kurmanc helbestên xwe bi piranî bi Erebî hûnandine. Di serdema duyem de anko di serdema mîrektiyan de gelek nûnerên edebiyata Kurdiya Kurmancî derketine holê û helbesta klasîk ya Kurdiya Kurmancî di vê serdemê de gihaye asta xwe ya herî bilind. Ev rewşa edebiyata Kurdiya

CamScanner ile tarandı

Kurmancî ya vê serdemê, herweha bi tevahî edebiyata Kurdî jî temsîl dike. Lewra edebiyata Kurdî cara pêşî di vê serdemê de ji aliyê helbestvanên Kurmancan ve di nav edebiyatên gelên Rojhilata Navîn de cihekî taybet ji xwe re bi dest xistiye. Di serdema sêyem de anko di serdema piştî mîrektiyan de edebiyata Kurdiya Kurmancî ji aliyê terz û ekolan ve ji edebiyata serdema berî xwe cihê bûye. Di vê serdemê de ji aliyekî ve edebiyata nûjen, ji aliyekî ve jî edebiyata millî dest pêkiriye. Edebiyata klasik jî di vê serdemê de li pey şopa serdema mîrektiyan çûye lê li ji aliyekî dî ve jî bi piranî bi şêweyekî tesewifî xwe nîşan daye û cureyên edebî yên nû derketine holê. Li jêrê em dê bi firehî li ser van serdeman rawestin.

I. SERDEMA BERÎ MÎREKTIYAN VII – XIII

Ji ber ku edebiyata Kurdiya Kurmancî ya klasîk di bin bandora dînê Îslamê de ye û di serdema Îslamê de derketiye meydanê em vê serdemê bi hatina Îslamê ya nav Kurdan didin destpêkirin. Vê serdemê ji destpêka Îslamê destpêkiriye û heta bi dawîlêhatina hikûmetên Kurdan û dewleta Ebbasiyan û piştî wan jî damezrandina mîrektiyên Kurmancan, wate ji sedsala VIIan heta bi sedsala XIIIan bi qasî şeş qernan dom kiriye. Ev serdem wekî desthilatdariya siyasî rastî dewra dewletên Emewî (661-750) û Ebbasiyan (750-1258) tê. Herçiqas di nîveka duyem a dewleta Ebbasiyan de hinek hikûmetên Kurdan ava bûbin jî, di vê serdemê de desthilatdariya siyasî di destê Ereban de ye û zimanê zanist û edebiyatê Erebî ye. Lewra ev serdema dirêj ji aliyê edebiyata Kurdî ve bûye serdema bêdengiyê. Bi taybetî di her du-sê qernên pêşî yên serdema Îslamî de ne bi Kurdî tenê, bi Farisî jî ti berhem nehatine dayîn.

Em serdema berî mîrektiyan jî di nav xwe de dikin du serdemên binbeş. Ya yekem serdema berî hikûmetên Kurdan û ya duyem jî serdema hikûmetên Kurdan.

CamScanner ile tarandı

A. SERDEMA BERÎ HIKÛMETÊN KURDAN

Vê serdemê ji destpêka Îslamê heta bi damezrandina hikûmetên Kurdan, yanî ji sedsala VIIan heta bi sedsala Xan dewam kiriye. Çawa ku me li jorê jî got di vê serdemê de di her warî de zimanê Erebî serdest e. Piştî hatina Îslamê ji bo bawermendên dînê Îslamê Erebî bû zimanê dînî û di dema Emewî û Ebbasiyan de jî bû zimanê dewletê. Di encamê de di warên zanist, edebiyat û hemû warên jiyanê de zimanê Erebî bû zimanê zal.

Di vê serdemê de ne bi Kurdî tenê bi Farisî jî berhem nehatine dayîn û ev jî ji aliyê Farisan ve bûye sebebê hinek rexneyan. Di vî warîde Ebdulhuseyn Zerrînkûb bi navê "Du Qernê Sukût" (Du Qernên Bêdengiyê) berhemek jî nivîsandiye. Nivîskar di vê berhema xwe de ji destpêka Îslamê heta bi damezrandina dewleta Tahiriyan ku du qern in, bêdengî û tinebûna Farisan tîne zimên. Di vê serdemê de Tirk hê misilman jî nebûne û berhemên edebî jî bi zimanê Tirkî hê nehatine dayîn. Dema mirov di vê çarçoveyê de bifikire, nebûna berhemên Kurdî tiştekî ji rêzê ye. Di vê serdemê de nivîskar û helbestvanên Kurd û Kurmanc hebin jî, ewana helbestên xwe ne bi zimanê xwe, bi zimanê Erebî nivîsandine.

B. SERDEMA HIKÛMETÊN KURDAN

Di dawiya serdema dewleta Ebbasiyan de çi ji aliyê Ereban ve û çi ji aliyê gelên ne Ereb yên wekî Faris, Tirk û Kurdan ve, li deverên curbicur gelek hikûmetên nû (biçûk-mezin bi qasî 30-40 heban) hatin avakirin.[29] Di dewra van hikûmetan de ji bilî Erebî bi zimanên dî jî berhem hatin dayîn. Di dewra hikûmeta Saffariyan de bi zimanê Farisî û di dewra hikûmeta Qerexaniyan de jî bi zimanê Tirkî berhem hatin dayîn.

Di vê serdemê de Kurdan jî hinek hikûmet ava kirine. Hinek ji hikûmetên vê serdemê yên ku ji aliyê Kurdan ve hatine damezirandin ev in:[30]

29 Hüseyin Algül, *İslam Tarihi*, Weş. Gonca, İstanbul 1991, b. III, r. 364-370.

30 M. Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, (Wer.: V. İnce, M. Dağ, R. Adak, Ş. Aslan), Nûbihar, Stenbol 2010, r. 423-694.

CamScanner ile tarandı

1. Hikûmeta Rewadiyan

Hikûmeta Rewadiyan, di navbera salên 845-1222yan de li Azerbeycanê desthilatdarî kiriye.

2. Hikûmeta Hesnewiyan

Hikûmeta Hesnewiyan, di navbera salên 942-1015an de li Hemedan, Dînewer û Nîhawendê desthilatdarî kiriye.

3. Hikûmeta Şeddadiyan

Hikûmeta Şeddadiyan, di navbera salên 952- 1072yan de li Aran/Azerbeycanê desthilatdarî kiriye.

4. Hikûmeta Hezbaniyan

Hikûmeta Hezbaniyan, di sedsala dehem de li Azerbeycanê desthilatdarî kiriye.

5. Hikûmeta Merwaniyan

Hikûmeta Merwaniyan, di navbera salên 983-1085an de li Diyarbekir, Silîvan û el-Cezîreyê desthilatdarî kiriye.

6. Hikûmeta Fedlewiyan

Hikûmeta Fedlewiyan, di navbera salên 1156-1424an de li Loristanê desthilatdarî kiriye.

7. Hikûmeta Eyyûbiyan

Hikûmeta Eyyûbiyan, di navbera salên 1172-1287, 1553yan de li Misr û Şamê desthilatdarî kiriye.

Di dewra van hikûmetan de jî ew bêdengiya ku li jorê me behs kiribû xira nebûye û bi Kurdîya Kurmancî berhem nehatine dayîn. Bi gotineke dî di vê çarçoveyê de di hukûmetên Kurmancan ên vê serdemê de jî Erebî zimanê serdest bû. Li vir tişta ku balê dikişîne ev e ku di heman dewrê de di bin desthilatdariya hikûmetên Faris û Tirkan de bi zimanên wan berhem hatine dayîn lê di bin desthilatdariya hikûmetên Kurdan de bi Kurdî berhem nehatine dayîn.

Lê dîsa ev dewr ji ya berî xwe cuda ye. Lewra di vê dewrê de di gelek waran de gelek zanayên Kurd derketine meydanê.

CamScanner ile tarandı

Herçiqas van kesan berhemên xwe ne bi zimanê Kurdî, lê bi Erebî jî dabin ev tişt bûye sebebê hişyariyekê jî.

Vê rewşê ji du aliyan ve xwe daye der. Yek jê ji ber ku zimanê Erebî zimanê dînê Îslamê bû, alimên Kurdan ên ku li ser dîn pispor bûn berhemên xwe bi Erebî didan. Zimanê Kurdî di nav van aliman de nebû zimanê tedawilê. Ji van aliman em dikarin kesên wekî Îbnu's-Selah (1181-1245) her sê Îbnu'l-Esîrê Cizîrî nîşan bidin. Vê rewşê di dema hikûmetên Kurdan yên dawiya Ebbasiyan û piştî dema Ebbasiyan jî dewam kir. Li gorî ku tê zanîn cara yekem di dawiya sedsala hivdehan de ji aliyê Ehmedê Xanî ve ev rewş hate guherandin û menzûm jî be Ehmedê Xanî derbareyê 'îlmê Eqîdê (zanista baweriya olî) de bi Kurdiya Kurmancî berhemek da. Ev berhem ne ku bi Kurdiya Kurmancî tenê, herweha di nav hemû diyalektên Kurdî de yekem berhem bû ku bi Kurdî di warê zanisteke dînê Îslamê de hatibû nivîsandin. Eger em vê berhema Ehmedê Xanî û çend berhemên dî yên ku di vî warî de hatine nivîsandin nehesibînin, di nivîsandina berhemên dînî-Îslamî de vê rewşê heta dawiya sedsala bistan dewam kir.

Ya dî jî ew bû ku ne di warê zanistên dînî tenê de herweha di warê zanistên curbicur de jî zanayên Kurdan di vê serdemê de berhemên xwe bi Erebî didan. Ji ber serdestiya zimanê Erebî di vê serdemê de Kurdên ku dixwestin dengê xwe bigihînin qadên zanistî û cihên fermî diviyabû bi Erebî nivîsandibana. Di vî warî de em dikarin zanayên wekî Ebû Henîfe Dîneweri (828-896) û Îbn Xelkan (1211-1282) nîşan bidin.

Wekî van zana û alimên Kurdan, helbestvanên wan jî di serdema van hikûmetên Kurdan de helbestên xwe ji ber serdestiya zimanê Erebî bi Erebî dinivîsandin. Lê herçiqas zimanê wan ne Kurdî jî be, em dikarin bêjin ku di vê serdemê de qet nebe rihê hinek ji wan helbestvanan Kurdî ye. Wekî mînak li jêrê em dê cih bidin helbestvanekî Kurmanc ku di vê serdemê de helbestên xwe ne bi Kurdiya Kurmancî lê bi Erebî nivîsandine. Ew jî Hesen b. Dawûd el-Beşnewî (Hesenê kurê Dawudê Peşnewî) ye.

CamScanner ile tarandı

1. HESENÊ PEŞNEWÎ

Kunyeya tam ya vî helbestvanî bi zimanê Erebî bi şiklê "Ebu'l-Huseyn el-Hesen b. Dawûd el-Beşnewî" hatiye nivîsandin ku tê wateya "Bavê Huseyn, Hesenê kurê Dawudê Peşnewî". Hesenê Peşnewî di serdema hikûmeta Merwaniyan (983-1085) de jiyaye û di sala 465/1072yan de wefat kiriye. Helbestvanê me ji hêrêma Botan, ji eşîra Peşnewiyan e. Ev eşîr xwediyê keleha Finikê bûn û eqrebayê mîrên Cizîra Botan bûn. Hesenê Peşnewî jî kurmamê hikumdarê vê kelehê bû.[31]

Hesenê Peşnewî xwediyê dîwaneke Erebî ye. Digel ku Kurd e jî helbestên xwe bi zimanê serdest ê serdema xwe nivîsandine. Ev jî li gorî şertên wê serdemê yên ku li jorê behsa wan hat kirin, tiştekî asayî ye. Hesenê Peşnewî herçiqas helbestên xwe bi Kurdî nenivîsandibin jî, ji aliyê hinek nêrînên xwe yên ku di wan helbestan de derbirîne balê dikişîne ser xwe. Ew ji vî aliyî ve ji Kurdên dî yên ku di wê serdemê de di berhemên xwe de Erebî bikardianîn vediqete.

Dema em guh didin Peşnewî[32], em dibînin ku di beyteke xwe de weha xitabî malbata Merwaniyan kiriye "Peşnewî alîgirên dewleta we ne. Di nav Ereb û Eceman de ev ne tiştekî veşartî ye."[33] Peşnewî, di beyteke dî de bi Kurdîtiya xwe iftîxar kiriye û weha gotiye: "Li cem ceddên min fexr û serbilindiya Kurdan heye. Di întîsaba min a Kurdan de fexra Ereban heye (Fexra li cem Ereban heye, li cem Kurdan jî heye)"[34] Di beyteke

---

31 Ji bo Peşnewiyan bnr. Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, Weş. Avesta, Stenbol 2007, r. 245.

32 Ji bo helbestên wî bnr. Selefî, Mu'cem, r. 15-16; Tehsîn Î. Doskî, *el-Medxel lî Dîraseti'l-Edebi'l-Kurdî*, Dihok 2011, r. 26-27.

33 Erebiya vê beytê weha ye:
البشنـية أنـصار لدولتـكم
وليس في ذا خفا في العجم والعرب

34 Erebiya vê beytê weha ye:
مـفـاخر الكرد في جـدودي
ونـخـوة العرب فـي انتسابي

CamScanner ile tarandı

dî de jî pesnê eşîreke Kurdan bi navê Mihraniyan ku di dema Ebbasiyan de li devera Mûsilê dijiyan daye û weha gotiye: "Eger insan resmê bindestiyê li cihekî bizanibin, ev bindestî ji aliyê Mihraniyan ve nayê zanîn."[35]

Bêguman li gorî wê serdemê derbirîna hizrên bi vî rengî ji aliyê hişmendiyê ve asteke bilind nîşan dide. Helbestvan di ferqê de ye ku li ser axa dewleta Ebbasiyan ji aliyê Faris, Tirk û yên dî ve gelek hikûmet ava bûne û hikûmeta Merwaniyan jî di wê kategoriyê de ye. Lewra dema xîtabî Merwaniyan dike, dewletbûna wan derdixe pêş. Zimanê van helbestan li aliyekî, naveroka wan nîşan dide ku hê ji wê demê ve hestên Kurdîtiyê û heta pileyekê hizra neteweyî di nav hinek rewşenbîrên Kurdan de çêbûne. Eger mirov tarîxa rewşenbîriya Kurdî, yan jî tarîxa helbesta neteweyî ya Kurdî binivîsîne, divê mirov Hesenê kurê Dawudê Peşnewî li pêş çavan bigire.

2. EVDISEMEDÊ BABEK Û HELBESTEKE BI GUMAN

Çawa ku me li jorê jî got, di serdema berî mîrektiyan de, anko ji destpêka Îslamê heta bi dawiya dewleta Ebbasiyan zana û wêjevanên Kurdan ne bi Kurdî lê Erebî nivîsandine. Lê di dawiya Ebbasiyan de di dewra hikûmetên Kurdan de hijmara zana û nivîskarên Kurdan zêde bûye û helbestvanekî wekî Hesenê Peşnewî di helbestên xwe yên Erebî de behsa Kurdan kiriye.

Dîsa di vê dewrê de helbestvanekî dî yê Kurd bi navê Ebdisemedê Babek heye ku li gorî ku Enwer Mayî di sala 1961ê de li Bexdayê di kovara Ronahiyê de (hj. 5-6an) îfade dike, vî helbestvanî bi Kurdî hinek helbest nivîsandine û dîsa ji aliyê Mayî ve di heman cihî de helbesteke wî hatiye weşandin. Helbest ji 18 beytan pêk tê ku li jêrê em cih didin her sê beytên pêşî û paşî yên vê helbestê:

---

35 Erebiya vê beytê weha ye:
إن يَعْرِف الناسُ رَسْم الذُّلّ في جهةٍ
فالذلُّ عند بني مهران مجهولُ

CamScanner ile tarandı

Her sê beytên pêşî:

Dila şad be çi xoş dem hat bihar e
Reşeme çû, terazin bûn diyar e

Nihal der bûn, xişa hat av û cûbar
Befr kerkir bibû keftî nizar e

Kulîlk û gul be ken der çûn ji kajan
Sivik hat nêrgiza mest kofî xwar e

Her sê beytên dawî:

Li min xoş hat nesîmê vê sibê zîrî
Hejandî şengebî, leyzî çinar e

Her newroz ey dil sed tebarek
Were geştî, sema ye li çar nîgar e

Peşîman im ji umrê çûy perîşan
Be satûrî mebirî dost û yar e

Ebdisemedê Babek xelkê Colemêrgê ye. Ew jî wekî Hesenê Peşnewî di dewra Merwaniyan de jiyaye. Lewra di sala 972yan de hatiye dinyayê û di 46 saliya xwe de sala 1020an de wefat kiriye. Li gorî ku Mayî ji "Wefeyatu'l-E'yan"a Îbnî Xelkan neql kiriye, sê dîwanên wî yên helbestan hebûne û Îbnî Xelkan bi xwe ev dîwan dîtine. Herweha çawa ku nivîskar ji "Keşfu'z-Zunûn"a Katib Çelebî jî neql dike, helbestên Babek yên Kurdî jî hebûne.

Enwer Mayî derheqê Evdisemedê Babek û hîkayeta peydakirina vê helbestê de weha nivîsiye:

"Di sala 1932 da ez feqe bûm li nav Guliya, li gundekî digotî Şîlan. Kevne feqek li wêrê bû, navê wî "Feqe Mihemedê Dirêj" bû. Wî keşkûleka şi'rêt Kurdî hebû, zora hêz bi nirx. Gelek şi'rêt wêjevanêt Kurdî tê da hebûn. Wek şi'rêt Melayê Cizîrî, Remezanê Cizîrî, Mîr Emadînê Hekarî, Feqiyê Teyra, Şah Perto Hekarî û gelek dî ji wêjevanêt Kurdî yêt kevn."

CamScanner ile tarandı

Paşê Mayî weha dewam dike:

"Min di vê keşkûlê de hinde şi'rêt Kurdî dîtin li ser nivîsî bû "Ebdilsemed Babek fermayed", yanî "Eve ji şi'rêt Evdisemedê Babek e"

Mayî dibêje ku min çiqas xwest ku ew feqî wê keşkûlê bide min, lê ez di vê daxwaza xwe de bi ser neketim; lê razî bû ku ez li ber wê ji xwe re binivîsim.[36] Mayî jî herî dawî metnê vê helbestê bi tevahî weşandiye. Di dawiya nivîsa xwe de helbesteke Erebî jî weşandiye.

Herçiqas metnê vê helbestê hatibe weşandin jî, dîsa li ser helbestê guman hene. Lewra nivîskar destnivîsa wê ya kevn nîşan nedaye û heta niha jî nayê zanîn ka gelo ev destnivîsa wê (mecmû'eya Feqe Mihemedê Dirêj) li kû derê ye. Bi gotineke dî ji ber ku cihê ku niha ev helbest lê tê parastin nayê zanîn, li ser vî helbestvanî û vê helbesta ku hatiye weşandin lazim e şerhek bê danîn.

3. EDEBIYATA ÊZÎDIYAN

Di serdema berî mîrektiyan û di dawiya Ebbasiyan de ku leqayî serdema hikûmetên Kurdan tê, ekoleke girîng ya edebiyata Kurdiya Kurmancî peyda bûye ku ev ekol wekî edebiyata Kurdên Êzîdî tê binavkirin. Edebiyata Êzîdiyan ji aliyê kronolojiyê ve li pêşiya edebiyata klasîk a Kurdiya Kurmancî ye, yani berî ku edebiyata Kurdiya Kurmancî ya klasîk berheman bide edebiyata Êzîdiyan derketiye meydanê.

Edebiyata Êzîdiyan jî wekî ya edebiyata Ehlê Heqê dînî ye. Ev menzûmeyên dînî ku wekî "qewl" tên binavkirin dîsa wekî menzûmeyên ehlê Heqê ji aliyê kesayetên dînî ve hatine gotin. Menzûmeyên Êzîdiyan jî wekî yên yên Ehlê Heqê piştre derbasî nivîsê bûne. Lê menzûmeyên Êzîdiyan li gorî yên Ehlê Heqê derengtir hatine komkirin.

Bereksê edebiyata klasîk ya Kurdiya Kurmancî, edebiyata Êzîdiyan ne nivîskî ye, zarekî ye û di vê çarçoveyê de ji aliyê

36 Enwer Mayî, "Evdisemedê Babek", *Ronahî*, j. 5-6, Bexda 1961, r. 62-67.

CamScanner ile tarandı

form û muhtewayê ve jî ji edebiyata klasîk ya Kurdiya Kurmancî cihê ye. Lê digel vê jî hinek taybetiyên edebiyata Kurdiya Kurmancî ya piştî Îslamê dixwe de dihewîne ku di hemûyan de têgehên Îslamî yên hevpar cih girtine. Di vê çarçoveyê de hem bi mebesta ku di tarîxa edebiyata Kurdî de cihê edebiyata Êzîdiyan kifş bibe û serdema wê ya tarîxî bê zanîn, hem jî ji ber wan xalên hevpar ên di navbera edebiyata Êzîdiyan a zarekî û edebiyata klasîk a nivîskî de, rawestana li ser edebiyata Êzîdiyan girîng e.

Ji ber ku edebiyata Ezîdiyan bi damezrandina Êzîdîtiyê û kesayetên Ezîdî yên girîng ve girêdayî ye em dê di serî de li ser Êzîdîtiyê û kesayetên damezrêner ên baweriya Êzîdîtiyê rawestin.

3.1. Êzîdîtî

Derheqê çavkaniya Êzîdîtiyê de li ser du nêrînan dikare bê rawestan. Li gorî nêrîna yekem Êzîdîtî dînekî serbixwe ye. Li gorî nêrîna duyem jî Êzîdîtî baweriyeke dînî ya têkel e ku ji unsurên dînî yên berî Îslamê û piştî Îslamê pêkhatiye.

3.1.1. Şêx 'Edî

Damezrênerê Êzîdîtiyê Şêx Ediyê kurê Misafir e. Navê wî yê tam bi Erebî weha tê destnîşankirin: Edî b. Sexr b. Sexr b. Musafir b. İsma'îl Ebulfedail ibn Ebilberekat el-Emewî el-Hekkarî. Şêx Edî piştî bavê xwe postnişîniya terîqeta Edewiyyeyê kiriye. Îbnu'l-Mustewfî dibêje gelek caran hatiye Erbîlê û dema ku dihat re'iye û sefele bi wî re bûn.[37] Şêx 'Edî di sala 611an de çûye hecê. Li vegerê hatiye Şamê û Helebê. Li Helebê çûye ziyareta Siltan Zahir. Li wir gelek feqîrên Helebê li dora wî kom bûbûn û gelek caran bi wan re di nav sema' û reqsê de bû. Şêx 'Edî di sala 1227an de di meha Zilhicceyê de di riya Mekkeyê de wefat kir.[38]

---

37 Ev îfadeyên Îbnu'l-Mustewfî ji ber wê yekê ne ku berê ulema û ehlê medreseyan li sûfî û derwêşan baş meyze nedikirin û hinek sûfiyên melamî meşreb jî qîmet nedidan cil û berg û hereketên xwe.

38 Hemdî Ebdulmecîd Selefî, Tehsîn Î. Doskî, *Iqdu'l-Ciman fî Teracimî*

CamScanner ile tarandı

3.1.2. Mishefa Reş

Mishefa Reş ji aliyê Êzîdiyan ve wekî kitêba pîroz tê zanîn. Lê Mishefa Reş, ne li ber destan e û di malên Êzîdiyan de peyda nabe. Lê digel vê jî her Êzîdî wisa bawer dike ku mishefa reş kitêba wan a pîroz e û li çiyayên Şîngalê ye. Li gorî nêrînekê Şêx Edî "Mishefa Reş" bi kurê xwe daye nivîsandin. Li gorî nêrîneke dî jî Mishefa Reş berî Şêx 'Edî jî di nav Êzîdiyan de dihate zanîn û di hafizeya wan de hebû.

Mishefa Reş di hafizeya Êzîdiyan de maye heta ku gihîştiye roja me û rojhilatnasan ew qeyd kirine. "Mishefa Reş" û "Kîtaba Cilwe" di sala 1913an li Wiyanayê ji aliyê rojhilatnasê Awusturyayî M. Hartmann ve hatine weşandin.[39]

3.1.3. Şêx Hesenê Hekkarî

Şêx Hesen kurê Şêx 'Edî ye. Navê wî yê tam bi Erebî weha hatiye destnîşankirin: Hesen b. Edî b. Sexr b. Musafir Ebû Muhemmed Şemsedîn el-Hekkarî. Ji aliyê eqîdeyê ve di navbera wî û bavê wî de gelek ferq hebûye. Li gorî ku Îbn Teymiyye dibêje di zemanê Şêx Hesen de tiştên ku li cem Şêx Edî tinebûn peydabûne.

Li gorî ku Îbnu'l-Mustewfî dibêje Şêx Hesen di sala 1195an de li gundekî Hekkarî[40] bi navê Lalişê hatiye dinyayê.

Di dewra Şêx Hesen de Êzîdiyan gelek tade dîtine. Di sala 1195an de ji aliyê atabegên Mûsilê ve tirba İbn Heddad hat xirakirin û hestûyên wî ji gorê hatin derxistin. Şêx Hesen wê salê çûye Erbîlê. Li ser fetwaya Ebû Hamid Muhemmed b. Yûnis Ebulfedail, atabegê Mûsilê Bedreddîn Lulu b. Ebdullah û Êzîdiyan li Mûsilê li hev xistin. Bedreddîn Lulu piştre ew ji Lalişê

'Ulema we Udeba el-Kurd we'l-Mensûbîne îla Qura we Mudun Kurdistan, Mektebetu'l-Esaletî we't-Turas, 2008, b. I, r. 166-170.

39 Ji bo metnê Mishefa Reş û Cîlweyê bnr. John S. Guest, *Yezidilerin Tarihi*, Avesta, İstanbul 2007, r. 349-356.

40 Berê Laliş û derdora wê jî di nav axa Hekkarî de dihat hesibandin. Lewma nîsbeta Şêx 'Edî û Şêx Hesen bi Hekkarî ve tê kirin.

CamScanner ile tarandı

derxistin. Şêx Hesen jî sala 627an bo Erbîlê nefî kirin. Piştî 11 rojan Melik Muzeffer nexwest li Erbîlê bimîne, nefeqe dayê û got ku bila biçe.[41] Piştre Şêx Hesen şeş sala xwe veşart. Birayê wî Şêx Fexreddîn ma li dewsa wî. Dema vegeriya kitaba Cilweyê nivîsandibû. Bedreddîn Lulu Şêx Hesen li Mûsilê hebs kir û di sala 644/1246an de kuşt.

Bedreddîn Lulu sala 652/1254an de dîsa êrîşî Lalişê kir li wir 100 kes bi darve kir. Hemû belawela bûn. Di sala 1254an de êrîş bire ser Geliyê Lalişê, rêberê wan Şêxisn girt, xiste girtîgeha Mûsilê û di wir de kuşt, gora Şêxadî vekir û hestûyên wî şewitand. Ji tirsa Êzîdî bêgav man baweriya xwe veşartî bihêlîn û sirrê xwe ji yên biyanî re venekin.

Şêx Hesen, li ser koça dawiyê ya bavê xwe mersiye nivîsandine.

3.1.4. Ebu'l-Berekatê Hekkarî

Ebu'l-Berekatê Hekkarî biraziyê Şêx Edî ye. Di sala 1138an de hatiye dinyayê û di sala 1208an de koçî dawiyê kiriye. Li gorî ku tê gotin helbestên wî yên Kurdiya Kurmancî hene.[42]

3.2. Edebiyata Êzîdiyan

Di sedsalên XI û XIIIan de li devera Lalişê kesayetên dînî yên wekî Şêxisn (Şerfedînê kurê Şêx Hesen), Pîr Reşê Heyren, Pisê Cemê, Pîr Xidir, Pîr Hevind, Şêx Mend û Pîr Şeref wekî nûnerên edebiyata dînî ya Êzîdiyan derdikevin pêş. Bingehê vê edebiyatê ji aliyê van kesan ve hatiye avêtin.

Kategoriyên edebiyata Êzîdiyan, qewl, beyt, qesîde, di'a, destan, çîrok, xizêmok, payîzok û hinek cureyên dî ne. Pîrên Êzîdiyan ên navborî bi taybetî bi formên qewl, beyt û qesîdeyan gelek menzûmeyên dînî gotine û ev menzûme bi melodî û meqam hûnandine.[43] Herçiqas tifaqek li ser pênaseyên van ka-

41 Selefî û Doskî, b.n., b. I, r. 242-243.

42 Selefî û Doskî, b.n., b. I, r. 308-309; Tosinê Reşîd, *Êzdiyatî*, Stenbol 2010, r. 122-167.

43 Eskerê Boyîk, "Şemsedîn û Edeba Êzdiyan a Sedsalên XI û XIIIan", *Şêx Fexrê Adiyan Filosof û Xasê Ola Êzdiyatiyê*, weş. Dengê Êzîdiyan,

CamScanner ile tarandı

tegoriyan tinebe jî, qewl ji bo menzûmeyên dînî û kevin, beyt ji bo menzûmeyên nedînî û nêz, qesîde jî ji bo menzûmeyên ku di wan de pesnê kesekî hatibe dayîn tê gotin. Ji xwe yên herî girîng jî ev her sê ne. Yên dî vê dawiyê hatine îfadekirin û mînakên wan jî zêde nînîn.[44]

Ji ber ku di nav nûnerên edebiyata Êzîdiyan de, yê herî girîng e, li jêrê bi taybetî em dê li ser wî rawestin.

3.2.1. Şêx Fexirê Adiyan

Şêx Fexir di navbera salên 1190 û 1260-70'yî de jiyaye. Pîrekî gelekî navdar e û qewlbêjekî zehf zana ye. Çawa ku di vî qewlê jêrîn de jî hatiye gotin ew birayê Şemsedîn e. Her du zarokên Stiya Zîn û Şêx Êzdîn in û neviyê Şerfedîn in. Şerfedîn jî kurê Şêx Hesen, Şêx Hesen jî kure Şêx Edî ye.

Şemsedîn û Fexredîn e
Her du pisêt Stiya Zîn e
Her dû xelefêt Şêx Êzdîn e (êzdînê Mîr)
Her du nevyêt Şerfedîn e

Bi qasi ku tê gotin, di dema Şêx Fexir de 11 000 qewl, qesîde û hwd. hebûne. Lê ji ber zilm û zordestiyê, rev û koçberiyê piraniya wan tekstan winda bûne û ji wana tenê nêzî 200 hebî gihane roja îro.[45]

Gelek ji wan texstên ku ji aliyê Şêx Fexir ve hatine gotin ku wekî "Qewlên " tên binavkirin ev in:

1. Qewlê Zebûnê Meksûr
2. Qewlê Texta

Oldenburg 2009, r. 9.

44 Philip Kreyenbroek, Xelîl Cindî Reşow, *Tanrı ve Şeyh Adi Kusursuzdur Yezidi Tarihinden Kutsal Şiirler ve ve Dinsel Anlatılar*, (wer. İbrahim Bingöl), Avesta 2011, r. 92.

45 Şemsedînê Boyîk, h.g., r. 9.

CamScanner ile tarandı

3. Qewlê Erd û Ezman
4. Qewlê Qiyametê
5. Qewlê Silav û Sed Silav
6. Qewlê Silavêt Melik Fexreddîn
7. Qewlê Şêx û Aqûb
8. Qewlê Ji Hindev de Çûme Banî
9. Qewlê ji Şamê Têm Meclisê
10. Qewlê Gîla Çar Ziman
11. Qewlê Omer Xala
12. Qewlê Miskîn Tajdîn
13. Qewlê Şeqe Serî
14. Qewlê Qerefirqan
15. Qewlê Xwedanê Malê
16. Qewlê Şîrê Rastiyê
17. Qewlê Meha
18. Qewlê Beygoya
19. Qewlê Deyik û Baba
20. Qewlê Axretê
21. Qewlê Miskîno Jaro
22. Qewlê Pîr Dewid
23. Qewlê Tawisî Melek
24. Qewlê Îman e Bi Çi nîşan e
25. Qewlê Cimcimê Siltan
26. Qewlê Mûsa Pêxember
27. Qewlê Hefsarî
28. Qewlê Xweş Malî Baba
29. Qewlê Sibe ye ji Yêt 'Edewiyan
30. Qewlê Ereb Begiya
31. Qewlê Civat û Cimlet e
32. Qewlê Rojekê ez sefer bûm
33. Qewlê Seremergê
34. Qewlê Terqînê
35. Qewlê Şêx Fexirê Zergûn Beyta Bilbila
36. Beyta Sibê
37. Beyta Cindî

CamScanner ile tarandı

38. Qesîde Xayib Kunî[46]
39. Qesîda Sibhan ji te Melekê Ekber
40. Beyta Çarşembuyê
41. Di'a Heyvê
42. Gêla Xerîb

3.2.2. Komkirina Qewlên Êzîdiyan

Di sala 1920an "Qewlê Zebûna Meksûr" ji aliyê Lazo E. B. Kazaryan ve ji zarê Şêx Hemze û di sala 1939an de jî "Sura Afirîna Dinyayê" ji zarê Eloyê Silo li Gurcistanê hatine nivîsandin[47].

Di salên 1930î de Roger Lescot li Sûriyê li ser Êzîdiya xebatek kir. (Enquête sur les Yezidis de Syrie et du Djebel Sindjar, Beyrouth 1938. Lescot di vê xebata xwe de bal kişand ser qewlên Êzîdiyan. Di salên 1950-70yan de xwendekarên Êzîdiyan qewl berhev û tomar kirin. Li Kurdistana Başûr Pîr Xidir Silêman û Dr. Şêx Xelîl Cindî, di xebata bi navê "Êzdiyatî" yê de (Bexda 1979) ev tişt kirin. Li Sovyeta berê Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl 166 qewl berhev kirin û ji vana 66 heb çap kirin (Zargotina Kurdan I, Erivan 1978).[48]

Bedelê Feqîr Hecî sala 1983ê ji qewlzanan dest bi komkirina tekstan kir û di sala 1988ê dest bi weşandina wan kir. Ji bo ku bavê wî feqîr bû û mala wan jî li Lalişê bû hem ji bavê xwe û hem ji gelek qewlzanên dî ev metin di pirtûka xwe ya bi navê "Bawerî û Mîtologiya Êzîdiyan" (Dihok 2002) de berhev kirin.[49]

---

46 Şewqî, Şemmo Îssa, "Şêx Fexirê Adiyan: Qewlên wî yên Pîroz û Felsefa wî", *Şêx Fexrê Adiyan Fîlosof û Xasê Ola Êzdiyatiyê*, weş. Dengê Êzîdiyan, Oldenburg 2009, 161-162.

47 Boyîk, h.g., r. 15.

48 Celîlê Celîl, "Mishefa Reş bi Zar li Nav Sîstema Qewl û Beytên Êzdiyan", *Şêx Fexrê Adiyan Fîlosof û Xasê Ola Êzdiyatiyê*, weş. Dengê Êzîdiyan, Oldenburg 2009, r. 54.

49 Bedelê Feqîr Hecî dibêje gelek qewlzanan qewl nedigotin û ev tişt wekî guneh didîtin. Bedel, deh salan pey yekî ketiye, da ku qewlan jê guhdarî bike, lê nekarıye tişteki bi dest bixe. Bnr. Bedelê Feqîr Hecî, *Bawerî û Mîtologiya Êzîdiyan*, Dihok 2002.

CamScanner ile tarandı

Ji bilî van di van xebatên jêrîn de jî hinek tekstên edebiyata Êzîdiyan hatine weşandin:

Kreyenbroek, Philip G. , *Yezidism-Its Background, Observances and Textual Tradition* (Lewiston/Queenston/Lampeter: Edwin Mellen Press, 1995).

Christine Allison, *Yezidi Sözlü Edebiyatı* (Istanbul: Avesta Yayınları, 2007).

John S. Guest, *Yezidilerin Tarihi*, Avesta, İstanbul 2007.

Şêx Fexrê Adiyan Fîlosof û Xasê Ola Êzdiyatiyê, Dengê Êzîdiyan, Oldenburg 2009. Ev berhem ji têkstên gotarên ku du sempozyuma li Almanya li ser hatine pêşkêşkirin pêk hatiye.

Xanna Omerxalî, Kovan Xankî, *Analîza Qewlên Êzîdiyan*, Avesta, Stenbol 2009.

Philip Kreyenbroek, Xelîl Cindî Reşow, *Tanri ve Şeyh Adi Kusursuzdur Yezidi Tarihinden Kutsal Şiirler ve ve Dinsel Anlatılar* (wer. İbrahim Bingöl), Avesta 2011. Ev berhem ji aliyê tekstên edebiyata Êzîdiyan girîng e.

Metin Bozan, *Şeyh Adi bin Müsafir Hayatı*, Menkıbevi Kişiliği ve Yezidi İnancındaki Yeri, Nûbihar 2012.

Yaşar Kaplan, *Günümüz Yezidiliği*, Nûbihar 2013.

3.2.3. Ji Qewlên Êzîdiyan Çend Mînak

3.2.3.1. Qewlê Qiyametê

Rojekê ji rojan dibî
Terqîn li erşan dibî
Xebare li çiyan dibî
Suniye li behiran dibî
Ne kesê kesan dibî
Ne babê pisan dibî
Ewê rojê xelikê zalim,
Li wê derê nuqisan dibî

CamScanner ile tarandı

Ew bû roja dijiwar dibî
Kursiya pedşa li xwar dibî
Qazî bi xwe cebar dibî
Ne sed xwezî bi ruha enkar dibî
Sed xwezme bi ruha ehil qiriyar dibî
Ew bû roja mezin dibî
Qazî bi xwe kerîm dibî
Xelik hemû xetxwîn dibî
Ewê rojê ne sed xwezme bi wê,
ruha derewîn dibî
Ew bû roja li wê dibî
Kursiya padşê li erdê dibî
Qezî bi xwe Xwedê dibî
Sed xweziya wî mêrî kar û emelê wî çê dibî
Herkesekî kar û emelê wî vedibî
Hey nebî ha nebî
Hebîbî ya rebî
(Dilovanê yarê bî)
Himeta seyda nebî
Me û hazir û guhidaran,
li ber dîwana Şîxadî û melik Şêxsin hebî.

3.2.3.2. Qewlê Tawisî Melek

Ya Rebî 'ela şanek û 'ela mekanek û 'ela siltanek
Ya Rebî tuyî kerîm î tuyî rehîm î
Ya Rebî her tu Xuda yî
Her tuy î layiqî medih û sena yî

Ya Rebî tu melekê melekê cîhan î
Ya Rebî tu melekê melekê kerîm î
Tu melekê 'erşê 'ezîm î
Ya Rebî ji enzel de her tu yî qedîm î
Tu tam û kam û ra yî

CamScanner ile tarandı

Ya Rebî her tu Xuda yî
Her tu heyî û
Her tu layiqî medih û sena yî
Ya Rebî tu melekê ins û Cins î
Ya Rebî tu melekê 'erşû kursî
Ya Rebî tu melekê gay û masî
Ya Rebî tu melekê 'alem û qudsî
Tu el-semed î li liftî lemayî
Tu el-semedî hey el-mecîd î
Wehdê ferz el-hemîd î
Ya Rebî tu xudawendê sepehr î
Ya Rebî tu xudanê meh û mehr î
Ya Rebî tu xudanê ceh û mer î
Ya Rebî tu xudawendê eta yî
Ya Rebî tu layiqî medih û sena yî

Ya Rebî ji îsma tuyî bilind î
Te nav li çû ne, tuy çendî
Nazêyî nazayî tu zend î
Miqadestê dû pa yî
Tuyî layiqî medih û sena yî

Ya Rebî tu kerem daye hatî
Mendayê qût î
Helîmî melik kût î
Ya Rebî tu 'alimê îlmay
Ya Rebî tu hem hekîm î û hem mecal î

Ya Rebî te ne xaf e te ne xurd e
Xudan malî xudan perde
Ya Rebî ciyê te wê li hemû erde

Ya Rebî te ne lewm e te ne reng e
Te ne awaz e te ne deng e
Te ne endam e te ne çeng e

CamScanner ile tarandı

Ya Rebî kes nizane tuy kusa yî (çewayî)
Ya Rebî tu weliyê ferza nimêj î
Ruh diperêjî
Ji milan milkan dibêjî
Ya Rebî hekîmê şah û gedayî

Ya Rebî tu hekîmê cimletî 'alem
Ya Rebî te tobe danabû li ser Adem
Ya Rebî tu hakimê şîfa yî
Ya Rebî tu rehm î, kerem î, emîn î
Ya Rebî tuyî el-semed î, em çû nînîn
Ya Rebî ezî ketîme î tawîme
Tu hem derman î û hem dawa yî
Tu hem derman î û hem tebîb î

Tu hekîm î em xerîbîn
Ya Rebî her tu dizanî dermanê me bi çi dibe
Ya Rebî tu unsê xurbay î
Li sûc û guneh û mişewî

Me kirin tehiyat û gewşe
Ya Rebî li me bibexşe

Ya Rebî her tu yî hey û tu xuday
Her tu layiqî medih û senay

Ya Rebî tu xaliq î em mexlûq în
Tu miraz î em daxwaz în

3.2.3.3. Qewlê Silav û Sed Silav

Silav û sed silav
Hey Meleko şirîn kilav
Ya Melek Şêxsin ku baxo Şêx Fexrê Adiya ez bim xulam

CamScanner ile tarandı

Silavên me li Melek Şêxsin e
Hey mêrdaro yî mezin e
Ya melek Şêxsin ji heybeta te dijmin dimirin e

Şêxê mino ji Adiya
Rêber e ber suniya
Ya melek Şêxsin tu wê li dereca zor hêviya

Şêxê mino ji Lalişê
Ji qewlê te xilas bûn xişê
Ya Melek Şêxsin tu baxo şêx Fexrê Adiya

Ez beniyekî ji beniya bi te dijiye
Şêxê mino temam
Di giriya te de digrî şerq hetanî Şam
Ya melek Şêxsin tu baxo şêx Fexrê Adiya ez xulam

Tu behrî ez rêm e
Tu kanî ez com e
Ya melek Şêxsin tu li dehir ez li kû me

Tu behrî ez kanîm e
Tu kelehî ez holîm e
Ya melek Şêxsin tu li dehir ez li kû me

Tu behrî ez şîv
Tu zêrî ez zîv
Ya melek Şêxsin tu rojî ez hîv

Tu şems î ez qemer im
Tu xundkar î ez babzer im
Ya melek Şêxsin tu alim î ez defter im

Tu alimî ez rêzan
Tu siwarî ez çogan
Ya melek Şêxsin tu goykerî ez meydan

CamScanner ile tarandı

Tu elf î ez rûm e
Tu siwar î ez kaşom e
Ya melek Şêxsin tu ferz î ez sunet im

Tu elîf î ez bê me
Tu bajêrî ez rê me
Ya melek Şêxsin di nêv karên te de dimanî ne

Tu bajêrî ez sûk
Tu miftî ez sindrûk
Ya melek Şêxsin tu yî mezin î ez yî piçûk

Tu bab î ez pisim
Tu Mekeh î ez Quds im
Ya melek Şêxsin tu mîr î ez meclis im

Tu mîrî ez heval
Li min tacirî ez delal
Ya Melek Şêxsin tu sûk î ez sewal

Tu xinê ez yî dirêj
Tu melhem î ez yî rêj
Ya melek Şêxsin ji di nav û kerên te de dibim hawêj

Zêwe tu Lalişî
Mekehê tu berê reşî
Ya melek Şêxsin ji maldara tu maltijî

Tu hostay ez kitêb
Bixûne eger te heye êb
Tu hostay ez binyat
Tu xetîb î ez civat
Ya melek Şêxsin tu el-Hemd î ez Tehiyat

CamScanner ile tarandı

Tu alimî ez emel im
Tu mêvanî ez mezel im
Ya Melek Şêxsin li di nav karê te yî kamil im

Ji kesa me tu kesî
Ji weliya me tu pisî
Ya Melek Şêxsin hem tu ruh î hem nefes î

Ji nafesa tu sur î
Ji horiya tu hur î
Ji sedefa tu dur î
Ji dura tu sedef î
Ji Qurana tu elîfî

Ya Melek Şêxsin ji sûnda tu bo me meshefî

Ji desta emîn î
Qurana tu Yasîn î
Behrên giran di meyînî
Tu bo me meseb û dîn î
Ya Melek Şêxsin xwezma wê ruhê tu bidî û jê nestînî

Bi zor derecare gehînî
Esehî tu Melek Şêxsin î
Mêrdarekî mezin î
Bînaya çavê min î
Sunet navê Şêxadî li Melek Şêxsin sekinî[50]

---

50 Ji bo ku Metin Bozan metnên van qewlan pêşkêşî me kiriye, em minetdariyên xwe pêşkêşî wî dikin.

CamScanner ile tarandı

II. SERDEMA MÎREKTIYAN

Di sêdsala XIIIan de piştî êrîşên Moxolan li ser cîhana Îslamê, bi taybetî jî li ser paytexta dewleta Ebbasiyan, dawî li dewleta Ebbasiyan hat (sal: 1258) û bi vî awayî di cîhana Îslamê de serdemeke nû dest pê kir. Di vê navberê de hikûmetên Kurdan yên ku di nîveka serdema Ebbasiyan de ava bûbûn jî, temenê xwe tijî kiribûn. Ev serdema nû ji bo Kurdan serdema mîrektiyan e. Mîrektiyên herî girîng ên Kurdan û bi taybetî yên Kurmancan piştî êrîşên Moxolan hatin avakirin û heta bi nîveka sedsala XIXan li ser piyan man. Ev serdem ji bo edebiyata Kurdiya Kurmancî serdemeke zêrîn e. Lewra em dikarin bêjin ku hemû berhemên klasîk ên Kurdiya Kurmancî yên ku di destê me de ne di vê serdemê de hatine dayîn.

DESTPÊK

Berî ku em li gorî sedsalan dest bi nîşandana nûnerên edebiyata Kurdiya Kurmancî bikin, wekî destpêkê em dixwazin cih bidin du mijaran: 1. Ew helbestvan û edîbên ku di serdema mîrektiyan de em dê behsan wan bikin, kengî û bi çi awayî derbasî lîteratura edebiyatê bûn? 2. Berî ku yek bi yek behsa helbestvan û edîbên vê serdemê bê kirin, li gorî sê rêbazan lîstekirina van helbestvan û edîban û nîşandana wêneyekî giştî yê wan.

A. PEYDABÛNA LÎTERATURA VÊ SERDEMÊ

Çawa ku li jorê jî me got, berî ku em derbasî lêkolîna bi hûrgilî bibin, em dixwazin li vir bersiva vê pirsê bidin? Gelo helbestvanên Kurmanc ên vê serdemê çawa û kengî ketin literatura Kurdolojiyê û haya me bi çi awayî ji wan çêbû?

Dema ku Ewropiyan dest bi xebatên rojhilatnasiyê kirine, di çarçoveya xebatên Îranolojiye de cih dane Kurdolojiyê jî. Piştî ku xebatên Kurdolojiyê di sala 1789an de bi gramera Garzoniyê Îtalî dest pêkiriye ne bi gelekî, di nîveka pêşî ya sedsala XIXan de Rûsan jî dest avêtine Kurdolojiyê. Di vê demê

CamScanner ile tarandı

de Akademiya Rûsîstanê, balyozê Rusîstanê yê Erzeromê Alexsandre Jaba (1800-1891) bi komkirina berhemên Kurdî û rêkirina wan berheman bo Rûsîstanê wezîfedar kiriye. Jaba jî, ji bo vî karî kesekî bikêrhatî bû. Lewra ew bi xilaskirina zanîngeha Petersbûrgê bûbû rojhilatnas û fêrî Tirkî, Farisî, Îngilîzî û Fransî bûbû.

Jaba li Erzirûmê 17 salan maye (1848-1866) û di vê maweyê de li Erzirûmê bi arîkariya mela û zanayên Kurdan ên wekî Mela Mehmûdê Bazîdî, Taha Hecî Ebdulezîz, Mihemed Xerîb Silêman, Şah Neze, Mela Mihemed, Hesen Hekîmbaşî û Mihemedê Muksî gelek berhemên destnivîs berhevkirine û şandine Akademiya Rûsîstanê. Ji wan berhemên ku Jaba şandine Rûsistanê di pirtûkxaneya Gişti ya Lenîngradê de 54 heb hene û ji van jî 44 heb bi Kurdî ne. Ev berhemên Kurdî hemû bi Kurdiya Kurmancî ne.

Di Pirtûkxaneya Akademiya Zanistî ya Rojhilatnasiyê de digel berhemên ku Jaba şandine herweha berhemên ku Vilyaminov, Zirnof û Minorsky jî peyda kirine hene. Ev berhemên di vê pirtûkxaneyê de ne, bi hemû diyalektên Kurdî hatine nivîsandin.

Lê li vir bi taybetî lazim e em li ser berhema Jaba ya derheqê serhatî û çîrokên Kurdan de nivîsiye û ji Erzeromê şandiye Rûsîstanê rawestin. Lewra ev berhem yekem çavkanî ye ku tê de behsa tarixa edebiyata Kurdî hatiye kirin. Berhem di sala 1860î de li Petersbûrgê bi navê "Recueil de Notices et Recits Kourdes" (Cimayî Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurdî) hatiye çapkirin û tê de rîsaleyeke derheqê heşt helbestvanên Kurd de jî cih digire. Ev helbestvan ev in: Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, Ehmedê Xanî, Mela Îsmaîlê Bazîdî, Şerefxan û Miradxanê Bazîdî.[51]

Bi vî awayî berhemên kurdî yên klasîk ên serdema mîrektiyan hatin parastin û bûn mijarên lêkolînên zanistî. Di vî karî de herî zêde rola A. Jaba û Mela Mehmûdê Bazîdî çêbûye. Lewra eger Jaba nexwestibana, ew berhem û agahiyên derbareyê

51 Kurdo, b.n., r. 14-17.

CamScanner ile tarandı

edebiyata vê serdemê de kom nedibûn. Herweha eger di serî de Mela Mehmûd û yên dî ev berhem û agahî nedabana Jaba, dîsa ev tişt pêk nedihat. Bi vî awayî cara pêşî agahiyên derheqê edebiyata Kurdên Kurmanc a ku di serdema mîrektiyên wan de peyda bûbû di pirtûkxaneya Rûsan de cih girtiye.

Pêwist e em bêjin ku dema A. Jaba li ser berhemên Kurdiya Kurmancî dixebitî, qonsolosekî dî yê Rûsan Xodzko jî li Parîsê digel Ehmed Paşayê Baban li ser berhemên Kurdiya Soranî dixebitî. Lê li vir ji ber ku mijara me tenê edebiyata Kurdiya Kurmancî ye, em li ser xebatên Xodzko ranawestin.

Şagirda Qenatê Kurdo Margarîta Barisova Rudenko, di navbera salên 1958-1967yî de li Rûsîstanê li ser hinek ji van berhemên ku li Pirtûkxaneya Akademiya Zanistî ya Rojhilatnasiyê kom bûbûn lêkolînên akademîk kirine. Navên van xebatên ku Rudenko kirine ev in:

1. Nivîsandin li Nav û Nîşanên Destnivîsarên Kurdî (Moskova 1961).
2. Mem û Zîna Ehmedê Xanî (Moskova 1962).
3. Nivîsara Mela Mehmûdê Bazîdî, Jiyîn û Ayîna Kurdan (1963).
4. Leyl û Mecnûna Harisê Bedlîsî (1963).
5. Şêxê Sen'an a Feqiyê Teyran (Moskova 1965)

Li gorî ku Qenatê Kurdo radigihîne, di dema ku li Rûsîstanê ji aliyê A. Jaba ve li ser edebiyata Kurdî xebat dihatin kirin de, haya rojhilatnasên Ewropî ji van xebatên li Rûsîstanê tinebû. Herweha haya wan ji xebatên ku Kurdên Iraqê kiribûn jî tinebû. Lewra yên wekî Katrêmêr E. M. û Dravêr G. R. di nivîsarên xwe de gotine ku literatura Kurdî nin e. Nîhayet di dawiya sedsala nozdehan û di destpêka sedsala bîstan de haya dinyayê ji edebiyata Kurdî ya klasîk çêbû. Di vê yekê de xebatên zanyarên Kurd li Iraqê, pirtûkên M. B. Rudenko û pirtûka Me'rûf Xeznedar mezintirîn rol leyîstin.[52]

52 Kurdo, b.n., r. 18-20.

CamScanner ile tarandı

Bêguman di vî karî de divê behsa rola Celadet Elî Bedirxan jî bê kirin. Lewra wî, derbareyê helbestvanên Kurdan de di kovara Hawarê de nivîsek nivîsandiye. Bedîrxan ev nivîsa xwe bi mexlesa Herekol Azîzan di bin sernavê "Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin" de nivîsandiye. Wî di vir de digel ên ku Jaba li ser wan sekinîbû, behsa gelek kesên dî jî kiriye. Ji ber ku ev nivîsa Bedirxan bi herfên latînî bû û li derveyê welêt hatibû weşandin, ew jî di kifşkirina edebiyata klasîk a vê serdemê de dê xwedî rol be.

B. DABEŞKIRINA VÊ SERDEMÊ

Mirov dikare serdema mîrektiyan bi sê şiklan dabeş bike û vekole. Ya yekem li gorî ast, taybetî û nirxên berhemên edebî; ya duyem li gorî mîrektiyan; ya sêyem jî li gorî sedsalan e. Her dabeşkirinek li gorî perspektîfeke cuda ye û xwediyê rêbazeke taybet e. Lê di her sêyan de jî malzeme (nûner û berhem) yek e. Bo nimûne Melayê Cizîrî ji aliyê asta edebî ve di lutkeyê de ye, di mîrektiya Azîzan de berhemên xwe dane û di sedsala XVI û XVIIan de jiyaye.

Aliyekî van dabeşkirinan tesbîtên zanistî bin, aliyê dî jî pedagojîk e da ku di fêrkirin û fêmkirina serdema mirektiyan de hêsanî çêbe.

1. LI GORÎ ASTA BERHEMÊN EDEBÎ

Li gorî dabeşkirina yekem anko li gorî taybetî û nirxên berhemên edebî, mirov dikare serdema mîrektiyan di bin du qonaxan de binirxîne.

1.1. Qonaxa Pêşveçûn û Orjînalîteyê

Ev qonax sedsalên XVI û XVIIan di xwe de dihewîne. Di van sedsalan de edebiyata Kurdiya Kurmancî gelekî pêş ve çûye û berehemên orjînal hatine dayîn. Di van sedsalan de wekî yekemîn car di cureyên curbicur de berhemên edebî yên Kurdiya Kurmancî hatine dayîn ku berî hingî ew cure-berhem

CamScanner ile tarandı

nehatibûn dayîn. Wekî dîwan, mesnewiyên evînî, menzûmeyên dînî-tesewifî û nesra Kurdî. Di van her du sedsalan de ji aliyê pêşveçûn orjînalîteyê ve edebiyata Kurdiya Kurmancî di lutkeyê de ye û gihiştiye asta xwe ya herî bilind

Helbestvanên vê serdemê yên wekî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Şêx Şemsedînê Exlatî û Ehmedê Xanî ne û van helbestvanan tesîreke gelekî mezin li ser helbestvanên pey xwe kirine.

1.2. Qonaxa Teqlîdê

Ev qonax jî sedsalên XVIII û XIXan di xwe de dihewîne. Di van sedsalan de piraniya helbestvanan li pey şopa helbestvanên berî xwe Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî çûne û ew teqlîd kirine. Li digel vê hejmara helbestvanan gelekî zêde bûye û di hinek waran de berhemên ojrînal jî hatine dayîn. Bo nimûne yekem Leyla û Mecnûn û Yûsuf û Zelîxa di vê qonaxê de hatine dayîn.

2. LI GORÎ MÎREKTÎ Û DEVERAN

Eger em serdema mîrektiyan li gorî mîrektî û deveran dabeş bikin tabloyeke weha derdikeve pêş me:

1. Mîrektiya Bedlîsê

Şikriyê Bedlîsî (k.d.1523)	SEDSAL XVI
Harisê Bedlîsî (1775)	SEDSAL XVIII

2. Mîrektiya Dêrzinê

Mîr Ye'qûbê Zirkî (k.d.1579)	SEDSAL XVI

3. Mîrektiya Ezîzan (Botan)

Melayê Cizîrî (1567-1640)	SEDSAL XVII
Mela Remezanê Cizîrî	SEDSAL XVII
Şêx Xalidê Yekem (k.d.1805)	SEDSAL XVIII
Basilyos Şemûn II	SEDSAL XVIII
Şêx Ehmedê Feqîr	SEDSAL XVIII-XIX

CamScanner ile tarandı

4. Mîrektiya Miksê

Feqiyê Teyran	SEDSAL XVII
Eli Teremaxî	SEDSAL XVII
Weda'î	SEDSAL XVIII-XIX
Mela Yûnisê Erqetînî	SEDSAL XVIII

5. Mîrektiya Colemêrgê

Mîr Îmadeddînê Hekkarî	SEDSAL XVII
Melayê Bateyî	SEDSAL XVIII
Feqe Ebdulqadir	SEDSAL XVIII
Pertew Begê Hekkarî	SEDSAL XVIII-XIX
Feqe Reşîdê Hekkarî	SEDSAL XVIII-XIX

6. Mîrektiya Bazîdê

Şêx Ehmede Xanî (1651-1707)	SEDSAL XVII
Îsmaîlê Bazîdî	SEDSAL XVIII
Miradxanê Bazîdî	SEDSAL XVIII
Mela Mehmûdê Bazîdî	SEDSAL XIX

7. Mîrektiya Hîzanê

Axaokê Bêdarî	SEDSAL XVII
Selîmê Silêman	SEDSAL XVIII

8. Mîrektiya Amêdiyê/Behdînan

Xalid Axayê Zêbarî	SEDSAL XVII
Mela Mensûrê Girgaşî	SEDSAL XVIII
Bekir Begê Erizî	SEDSAL XVIII-XIX
Seyfiyê Şoşî	SEDSAL XVIII
M. Teyar Paşayê Amêdiyê (1817)	SEDSAL XVIII-XIX
Şêx Nûredînê Birîfkanî (1851)	SEDSAL XIX
Macin	SEDSAL XVIII
Mîna	SEDSAL XVIII
Sadiq	SEDSAL XVIII
Mela Remezanê Ebbasî	SEDSAL XVII

CamScanner ile tarandı

9. Herîr

Eliyê Herîrî	SEDSAL XVI

10. Xelat

Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî	SEDSAL XVII

11. Sêrt

Mela Xelîlê Sêrtî (1750-1843)	SEDSAL XVIII-XIX
Şêx Ehmedê Feqîr	SEDSAL XVIII

12. Îran

Siyahpoş	SEDSAL XVIII-XIX

3. LI GORÎ SEDSALAN

Dabeşkirina sêyem ya vê serdemê jî li gorî sedsalan e. Eger em serdema mîrektiyan li gorî sedsalan dabeş bikin tabloyeke weha derdikeve pêş me:

1. Sedsal: XIII Û XV

Sedsalên destpêkê	
Şikriyê Bedlîsî	BEDLÎS

2. Sedsal: XVI

Eli Herîrî	HERÎR
Emîr Ye'qûbê Zirkî (k.d. 1579)	BEDLİS

3. Sedsal: XVI-XVII

Melaye Cizîrî (1567-1640)	CIZÎR
Feqiyê Teyran	MIKS
İmaduddin Hakkarî	HEKKARİ

4. Sedsal: XVII

Ş. Şemseddin Xelatî (1588-1674)	BEHDÎNAN
Xalid Axayê Zêbarî	BEHDÎNAN
Ehmede Xanî (1651-1707)	BAZÎD
Axaok Bêdarî	HÎZAN

CamScanner ile tarandı

5. Sedsal: XVIII

Melayê Bateyî	HEKKARÎ
Haris Bedlîsî (k.d.1775)	BEDLÎS
Selîm Silêman	HÎZAN
Muradxan Bayezîdî	BAZÎD
Şêx Xalidê Yekem (k.d.1805)	CIZÎR
Mela Mensûrê Girgaşî	BEHDÎNAN
Seyfiyê Şoşî	BEHDİNAN
Macin (berî 1767an)	BEHDİNAN
Mîna	BEHDÎNAN
Sadiq	BEHDÎNAN
Mela Ramazanê Ebbasi	BEHDÎNAN
Basilyos Şemûn II	TOR

6. Sedsal: XVIII-XIX

Pertew Begê Hekkarî	HEKKARÎ
Feqe Reşîdê Hekkarî	HEKKARÎ
Siyahpoş	ÎRAN
Weda'î	MIKS
Şêx Nûredînê Birîfkanî	BEHDÎNAN
Bekir Begê Erizî	BEHDÎNAN
M. Teyar Paşayê Amêdiyê	BEHDÎNAN
Mela Xelîlê Sertî (1750-1843)	SÊRT
Mela Mehmûdê Bazîdî	BAZÎD
Şêx Ehmedê Feqîr	SÊRT

Di vê beşê de em dê ji van her sê cureyên dabeşkirinan "dabeşkirina li gorî sedsalan" esas bigirin û di çarçoveya vê dabeşkirinê de bi awayekî berfireh li ser tarîxa edebiyata Kurdî rawestin.

CamScanner ile tarandı

I. JI DESTPÊKA MÎREKTIYAN HETA BI TIFAQA KURD OSMANIYAN REWŞA EDEBIYATA KURDÎ (SEDSAL XIII-XV)

Ev serdem dawiya sedsala XIIIan heta bi dawiya sedsala XVan di xwe de dihewîne ku ev mawe kêm-zêde beramberî du sed û pêncih salî tê. Di sala 1258an de bi êrîşên Moxolan dawî li dewleta Ebbasiyan hat û dîsa di wê tarîxê de ji bilî hikûmetê-nEyûbî û Fedlewiyan ji xwe dawî li hikûmetên Kurdan jî hatibû. Îcar piştî sedsala XIIIan, anko piştî rûxandina dewleta Ebbasiyan, ji aliyê rewşa Kurdan ya siyasî ve serdemeke nû dest pê kir ku ev serdem wekî serdema mîrektiyan tê binavkirin. Di destpêka vê serdemê de cara pêşî li cihên wekî Hekkarî, Cizîr, Amêdiyê û Erdelanê û piştî wan jî li cihên wekî Bedlîsê, Bazîdê, Miksê, Hîzanê, Şêrwanê, û Gêlê mîrektiyên Kurdan ava bûn ku heta bi nîvê sedsala XIXan desthilatdariya wan dewam kiriye.

Dema ku Kurd û Osmaniyan di sedsala XVIan de bi hev re tifaq çêkirin ku em dê li ser rawestin, pêvajoya damezrandina mîrektiyan qediyabû û ew mîrektiyên ku navên wan li jorê ne jî tê de, bi qasî 46 heb mîrektî ava bûbûn.

Ji destpêka serdema van mîrektiyan (sedsala XIII) heta bi tifaqa Kurd û Osmaniyan (sedsala XVI) li kêleka van mîrektiyên Kurdan Tirkmenên Artukî (1102-1409), Qereqoyunî (1380-1469) û Akkoyunî (1340-1508) û di dema îstîlaya Anadolê de Tîmurî (1370-1507) jî li welatê Kurdan li ser desthilatê bûn. Piştî Akkoyuniyan jî li Îranê dewleta Sefewiyan (1501-1736) ava bûbû.

Em dikarin bêjin ku di van sedsalan de mîrektiyên Kurdan hê sistema xwe ya siyasî û bi taybetî ya perwerdeyî rûneniştandibûn. Sebebê vê yekê jî nebihêzbûna van mîrektiyan û nebûna îstiqrarê bû. Lewra di vê serdemê de mîrektiyên Kurdan pêşî rastî êrîşên hêzên Tirkmenên wekî Akkoyuniyan û piştî wan jî rastî êrîşên Sefewiyan dihatin. Di bin vê bêîstiqrariyê de jî derfet ji bo pêşketina edebiyata Kurdî çênedibû. Lewra di van se-

CamScanner ile tarandı

dsalan de bi qasî ku tê zanîn bi Kurdî berhem nehatine dayîn. Lê em van her du sedsalan ji bo sedsalên pişt xwe re wekî sedsalên amadekarî û destpêkê dibînin. Eger di vê serdemê de desthilatdariya van mîrektiyan dest pê nekiriba, bêguman peyre jî ji nişka ve mîrektiyên bihêz ava nedibûn û di bin siya van mîrektiyan de jî edebiyateke Kurdî çênedibû.

A. DI VÊ SERDEMÊ DE GIRÎNGIYA MÎREKTIYA BEDLÎSÊ

Dawiya sedsala XVan û destpêka sedsala XVIan ji bo edebiyata Kurdiya Kurmancî serdemeke girîng e. Lewra di vê serdemê de yekem helbestvanê serdema mîrektiyan derketiye holê ku ew jî Şikriyê Bedlîsî ye.

Di vê serdemê de ji bo rewşenbîrên Kurdan bajarê Bedlîsê navendeke gelekî girîng bû. Li vî bajarî ji sala 1421ê ve desthilatdariya malbata Şerefxaniyan dest pê kiribû û mîrektiyeke gelekî bi hêz peyda bûbû. Vê desthilatdariya Şerefxaniyan piştre heta bi derdora sala 1894an dewam kiriye.

Di maweya vê desthilatdariya mîrektiya Bedlîsê de bi tevahî û bi taybetî di dawiya sedsala XVan û destpêka sedsala XVIan de ji bajarê Bedlîsê gelek rewşenbîrên Kurd derketine. Lê di nav van rewşenbîran de edebiyata Kurdî zêde ne di rewacê de bû. Rewşenbîrên Kurdan yên wê demê bi piranî bi zimanên serdest ên dema xwe; Farisî û Tirkî nivîsandine. Wekî nimûne Îdrîsê Bedlîsî (k.d.926/1520) berhemên xwe yên bi navê "Heşt Behişt" (Jînenîgariya heşt siltanên Osmaniyan) û "Selîmname" (Jînenîgariya Siltan Selîmê Osmanî) yên bi Farisî nivîsandine. Herweha kesayetekî dî yê Bedlîsî Şikriyê Bedlîsî (k.d.1523) jî berhema xwe ya bi navê "Selîmname"yê bi Tirkî nivîsandiye. Sebebê vê yekê jî ew e ku di vê serdemê de di qadên fermî de zimanên Farisî û Tirkî di rewacê de ne.

Lê dîsa niha helbestên wî di destê me de tine bin jî di vê serdemê de helbestvanek heye ku bi Kurdiya Kurmancî xezel

CamScanner ile tarandı

nivîsandine û bi vî awayî nimûneyên edebiyata Kurdiya Kurmancî dane. Ev helbestvan jî Şikriyê Bedlîsî ye.

Taybetiya mîrektiya Bedlîsê ew e ku hê berî tifaqa Kurd û Osmaniyan mîrektiyeke gelekî bi hêz bû. Ji xwe di vê tifaqê de rola herî mezin Îdrîsê Bedlîsî leyîstibû. Paralelî vê hêza wê ya siyasî zana û rewşenbîrên Kurd jî ji wir derketibûn. Di vê atmosferê de derketina helbestvanekî ku bi Kurdiya Kurmancî jî nivîsandibe (Şikriyê Bedlîsî) tiştekî xwezayî ye. Lê helbestvanên dî yên Kurd bi qasî ku xuya dike hemû piştî tifaqa Kurd û Osmaniyan derketine. Di vî warî de wekî encam mirov dikare bêje ku hê berî tifaqa Kurd û Osmaniyan li Bedlîsê bi qasî ku helbestvanekî Kurd derkevê şert û merc li hev hatine.

B. ŞIKRIYÊ BEDLÎSÎ

Şikriyê Bedlîsî yekem helbestvan e ku di serdema mîrektiyên Kurmancan de û berî tifaqa Kurd û Osmaniyan bi Kurdiya Kurmancî helbest nivîsandine. Ji ber ku Şikrî berî tifaqa Kurd û Osmaniyan hê li Tebrîzê di qesra Akkoyuniyan de perwerde bûye em wî wekî helbestvanekî vê serdemê dihesibînin. Ew di dawiya sedsala XVan û destpêka sedsala XVIan de jiyaye û di sala 1523yan de koçî dawiyê kiriye. Ji ber ku bi zimanê Tirkî berhem û helbestên wî hene di hemû tezkîreyên helbestvanên Tirkan ên sedsala XVIan de û di berhemên pisporê edebiyata Tirkî Fuat Köprülü de behsa wî hatiye kirin. Berhema wî ya herî girîng Selîmname (1521) ye. Di vir de jiyannameya Siltan Selîmê Osmanî aniye zimên.

Şerefxanê Bedlîsê dibêje ku babîrê wî Mîr Şerefê kurê Şemsedîn dema diçû şerekî carinan bi qasî 500 zana û edîb bi xwere dibirin şer. Şikriyê Bedlîsî jî yek ji wan kesan bû. Herweha bi begên Zulqadiriyan Ali Bey û Qoçî Bey; bi mîrêmîrê Diyarbekirê yê yekem Bıyıklı Mehmed Paşa, bi Sedrazam Îbrahim Paşa re têkiliyên wî çêbûne. Bi arîkariya Sedrazam Îbrahim Paşa Selîmnameya xwe pêşkêşî Siltan Selîm kiriye.[53]

53 Ji bo Şikriyê Bedlîsî bnr. Bedlîsî, b.n., r. 446; Abdurrahman Adak,

CamScanner ile tarandı

Şikrî ji bilî berhema xwe Selîmnameyê, Kurdî jî tê de bi şeş zimanan helbest nivîsandine. Wî bi xwe ev taybetmendiya xwe di fexriyeya xwe ya ku pêşkêşî Siltan Selîm kiribû de weha aniye zimên:[54]

Şairem işte ortalıkda sözüm
Altı dilde gazel dirin ben özüm

Türkî dirin revan Nevaî gibi
Farisîde heman Benayî gibi

Arabî söylerüm velî Kürdüm
Aybsuz Tanrıdur bu derhordum

Ermenî dilini kemalince
Bilürüm Hindî dahi halümce[55]

Ev şeş zimanên ku Şikrî bi wan helbest nivîsandine ev in: Tirkî, Farisî, Erebî, Kurdî, Ermenî û Hindî. Lê mixabin, helbestên wî yên Kurdî heta niha neketine destê me û nehatine dîtin.

"Şükrî-i Bitlîsî", *Uluslararası Tatvan ve Çevresi Sempozyumu*, weş. Beyan., İst. 2008, r. 673-690.

54 Mustafa Isen, *Künhü'l-Ahbar'ın Tezkire Kısmı*, weş. AKM, Ankara 1994, r. 233.

55 Wergera van beytan a bi Kurdiya kurmancî weha ye:

Ez şair im eva ne gotinên min
Bi şeş zimanan xezel dibêje şexsê min

Tirkî rewan dibêjim wekî Nevayî
Di Farisî de tam wekî Benayî

Bi Erebî dibêjim lê ez Kurd im
Bê eyb Xuda ye ez jî xwedî liyaqet im

Zimanê Ermeniyan di kemala wî de
Zimanê Hinduyan di halê wî de

CamScanner ile tarandı

II. JI TIFAQA KURD OSMANIYAN HETA BI DAWIYA MÎREKTIYAN REWŞA EDEBIYATA KURDÎ (SEDSAL XVI-XIX)

Berî ku em li gorî sedsala behsa nûnerên edebiyata Kurdî yên serdema mîrektiyan bikin, pêşî em dê di beşa destpêkê de cih bidin du xalan. 1. Di milmilaneya Osmanî û Sefewiyan de rewşa Kurdan û tercîhkirina Osmaniyan li dijî Sefewiyan, 2. Di vê serdemê de desthilatdariya bi îstîqrar û di medreseyên Kurdan de bicihbûna perwerdeya Kurdî ku bû sebebê derketina edebiyata Kurdiya Kurmancî.

DESTPÊK

1. TIFAQA KURD Û OSMANIYAN

Di destpêka sedsala XVIan de bûyereke girîng qewimiye ku vê bûyerê tesîreke mezin li istiqrara mîrektiyên Kurmancan û li edebiyata Kurdiya Kurmancî kiriye. Ev bûyer jî peymannameya Kurd û Osmaniyan e ku di navbera wan de li hemberî Sefewiyan hatibû lidarxistin.

Malbata Sefewiyan ji aliyê dîrokî ve digihin Şêxekî mutesewif bi navê Şêx Sefiyudînê Erdebîlî. Şêx Sefiyudîn di sedsala XIVan de li bajarê Erdebîlê ku îro li Îranê li rojhilatê Tebrîzê nêzî deryaya Xezerê ye, xwediyê tekyayeke tesewifî bû û wekî nijad jî Kurd bû. Terîqeta Sefewiye piştre li Azerbeycanê bi taybetî di dewra Şêx Cuneyd û Şêx Heyder de di nav Tirkmenên Şî'î de belav bûye û bi piştgiriya van Tirkmenên li Îranê bûye hêzeke siyasî û herî dawî mumessilê vê terîqetê yê bi navê Şah Îsmaîlê Sefewî di sala 1502yan de bi dagîrkirina Tebrîza paytexta Akkoyuniyan dewleta Sefewiyan ava kiriye.

Berî damezirandina dewleta Sefewiyan, mîrektiyên Kurdan ji xwe ava bûbûn û têkiliyên mîrektiyên Kurdan berî Osmaniyan bi Sefewiyan re çêbûn. Piştî ku Şah Îsmaîl dewleta xwe ava kir pêşî berê xwe da aliyê Kurdan û cihên wekî Diyarbekir, Hesenkêf, Sêrt, Hezzo, Hetax, Meyafarqîn, Palo û Gêlê dagir kir.

CamScanner ile tarandı

Yazdeh mîrên Kurdan bi mebesta ku desthilatiya wî nas bikin çûn bajarê Xoyê, lê wî li wir li wan xiyanet kir û ew xistin girtîgehê. Şah Îsmaîl wekî siyaset dixwest ku mîrên Kurdan ji desthilatê dûr bixe û waliyên xwe di şûna wan de wezîfedar bike. Lê ji aliyekî dî ve ji bêgavî jî be, Şah Îsmaîl hinek mîrektiyên Kurdan ên wekî Hekkarî û Şêrwanê siyaseten nas kiribûn.

Di wê dema ku Şah Îsmaîl welatê Kurdan dagir kiribû, Siltan Selîmê Yekem ê Osmanî jî berê xwe dabû rojhilatê û dixwest ku bandora Şah Îsmaîl ji holê rake. Jî bo vê jî Siltan Selîm mihtacê piştgiriya mîrektiyên Kurdan bû û jî bo ku vê piştgiriyê bi dest bixe arîkarî ji siyasetmedarê Kurd Îdrîsê Bedlîsî xwestibû. Îdrîsê Bedlîsî ji malbateke mutesewif bû û li qesra Akkoyiniyan wekî sekreter xebitî bû, herweha bi navê "Heşt Behişt"ê û "Selîmname"yê bi zimanê Farisî derheqê Osmaniyan de du berhem jî nivîsandibû. Di encama dîplomasiya Îdrîsê Bedlîsî de mîrên Kurdan Osmanî tercîhî Sefewiyan kiribûn. Mirov dikare bêje ku di vê tercîhê de du sedeman rola sereke lîstibûn: 1. Şah Îsmaîl xiyanet li mîrên Kurdan kiribû û dixwest desthilatdariya wan ji holê rake 2. Osmanî jî wekî Kurdan Sunnî bûn, lê Şah Îsmaîl Şî'î bû û di şî'itiyê de zêde tund bû.

Di sala 1514an de di navbera hêzên Osmanî û Sefewiyan de şerê Çaldiranê qewimî. Di vî şerî de piraniya Kurdan li aliyê Osmaniyan cih girtin, lê hin ji wan jî li aliyê Sefewiyan mabûn. Di encama vî şerî de Osmanî bi ser ketin. Piştî şer bi dîplomasiya Îdrîsê Bedlîsî di navbera mîrên Kurdan de yekîtiyeke gelekî bihêz çêbû û mîrên Kurdan bi piştgiriya hêzên Osmaniyan jî hêzên Sefewiyan ji Diyarbekirê û Mêrdînê derxistin û bi vî awayî Sefewî bi temamî ji Kurdistanê hatin derxistin. Piştre dîsa bi navgîniya Îdrîsê Bedlîsî di navbera mîrên Kurdan û Osmaniyan de peymannameyek hat îmzekirin ku li gorî vê peymannameyê bi şertê ku Kurd li hemberî Sefewiyan arîkariya Osmaniyan bikin, ew dê di welatê xwe de serbixwe hereket bikin. Ew mîrektiyên ku Îdrîsê Bedlîsî bi wan re ketiye nav têkiliyê ev in: Mukrî, Bradost, Baban, Soran, Amêdiye,

CamScanner ile tarandı

Botan, Xîzan, Bedlîs, Çemîşgezek, Palo, Çepeqçur, Hesenkêf, Sason û hwd.[56]

Piştî vê tifaqa di navbera Kurd û Osmaniyan de mîrektiyên Kurdan heta bi dereceyekê gihîştin îstiqrareke baş. Vê yekê jî ji edebiyata Kurdiya Kurmancî re bingeh û atmosfereke guncaw ava kir. Di vê serdemê de hijmareke gelekî zêde helbestvanên Kurd xuya dibin ku mirov dikare bêje edebiyata Kurdiya Kurmancî ya klasîk ji xwe di vê serdemê de derketiye meydanê û aîdê wê ye. Lê ji bo ku ev rewşa nû fêkiyên xwe bide bi kêmasî derbasbûna nîv qernê (pêncih salan) lazim bû.

2. DI SERDEMA MÎREKTIYAN DE DESTHILATDARÎ Û PERWERDEYA BI KURDÎ

Çawa ku me li jorê jî got, di sedsala XIIIan de piştî êrîşên Moxolan li ser cîhana Îslamê û dawîlêhatina dewleta Ebbasiyan (1254), di cîhana Îslamê de serdemeke nû dest pê kir. Di vê qonaxê de hêdî hêdî mîrektiyên Kurdan ên wekî Hekkarî, Cizîr, Amêdiyê û Erdelanê ava bûn. Piştî ku di sala 1514an dewleta Osmaniyan bi arîkariya mîrên Kurdan di şerê Çaldiranê de Sefewî têk birin, ji bo Kurdan serdemeke nû destpêkir û mîrektiyên Kurdan desthilatdariya xwe bihêztir kirin. Herweha saziyên wan ên siyasî, dînî û perwerdeyî ava bûn û geştir bûn. Di vê atmosfera rewşenbîrî de helbestvan perwerde bûn û di encamê de helbestên Kurdî derketin holê.

Di vê serdemê de helbestvan li dora qesrên mîran kom dibûn. Bi rastî jî gelek ji helbestvanên vê serdemê yên wekî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Wedaî, Selîmê Silêman û Harisê Bedlîsî li derdora qesrên mîran rabûne û bûne helbestvanên

56 Derheqê tifaqa Kurd û Osmaniyan de bnr. M. Emin Zeki, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, r. 161-171; Lazerîv, *Tarîxu Kurdistan* (Wer. Ebdî Hacî), weş. Spîrêz, Hewlêr 2011, r. 80-82; V. Mînorsky, "Kürtler", *Ansk. Îslamê*, weş. Milli Eğitim Bakanlığı, Stenbol, 1993, C. VI, r. 1089-1114; Şakir Epözdemir, *İdris-i Bitlisi ve Kürt Meselesi*, weş. Fanos, Ankara 2011.

CamScanner ile tarandı

wan. Bi vî awayî sîstema patronajê/hîmayeyê jî derketiye meydanê ku li gorî vê sîstemê desthilatdar hamiyê helbestvan e û helbestvan jî bi piştgiriya wî desthilatdarî helbesta xwe dinivîse.

Şerefxanê Bedlîsê dibêje ku bapîrê wî Mîr Şeref, dema ji bo şerekî çûye Ercîşê, bi qasî 500 zana û edîb bi xwe re birine.[57] Dîsa Şerefxanê Bedlîsê dibêje ku derwêşekî bi navê Derwêş Mihemedê Qeleçarî hebû. Ew ji eşîra Rojkan bû. Di dîwana Rustem Paşayê wezîrê Siltan Silêman de serkariya karên dîwanê dikir. Di karê rexneya helbest û înşayê/pexşanê de û di uslûba nivîsê de şagirdê Mewlana Îdrîsê Bedlîsî ye.[58]

Di vê demê de ji bo geşbûna edebiyata Kurdî faktora herî girîng hebûna medreseyan bû. Em dikarin bêjin ku di her bajarekî ku mîrekî Kurdan lê hebû medreseyên wan jî hebûn. Piraniya van medreseyan di sedsalên XV û XVIan de hatine avakirin. Ev medrese bi mîmariya xwe û bi sîstema xwe ne medreseyên kêm bûn. Hinek ji van medreseyan (wekî medreseya Qubehanê û medreseya Sor) di asta medreseyên paytextên cihana Îslamê yên wan deman bûn. Di van medreseyan de zimanê perwerdeyê Kurdî bû. Vê yekê jî rê li ber derketina helbestên Kurdî vekir û gelek helbestvan ji van medreseyan rabûn. Piraniya helbestvanên vê serdemê li van medreseyan xwendibûn. Ji van medreseyan ên herî giring li jêrê hatine rêzkirin:

1. Li Cizîrê Medreseya Sor
2. Li herêma Erûhê Medreseya Tanzê
3. Li Amêdiyê Medreseya Amêdiyê
4. Li Amêdiyê (li jêrê bajarê Amêdiyê) Medreseya Qubehanê
5. Li Hîzanê Medreseya Dawudiyê (ji aliyê Siltan Dawid Beg ve hatiye avakirin.)
6. Li Miksê Medreseya Mir Hesenê Welî (1520-1566)
7. Li Şîrwanê Medresa Zeynel Beg (Zeynel Beg ev medrese di ala 1591ê de ava kiriye û di sala 1597an de koçî dawiyê kiriye)
8. Li Licê medreseya Weqif Ehmed Beg (Ehmed Beg Etaxî)

57 Bedlîsî, b.n., r. 447.

58 Bedlîsî, b.n., r. 229.

CamScanner ile tarandı

9. Li Xoşabê Medreseya Îlmê (Extaiyye)
10. Li Derzinê Medreseya Şaqûlî Beg
11. Li Girdikan Medreseya Nasir Beg
12. Li Bazîdê Medreseya Sînaniye
13. Li Hesenkeyfê
- Medreseya Adiliye (Siltan Adil)
- Medreseya Kamiliye (Melik Kamilê Eyyûbî)

14. Li Bedlîsê
- Medreseya Hacî Begî (Mewlana Muhammed Zirkî)
- Medreseya Îdrîsiyeyê (Mewlana Ebdirrehman (Melê Reşik)
- Medreseya Îxlasiyeyê (Mewlana Mıhemmed Şêrenîşî)
- Medreseya Şerefiyeyê (Mewlana Xidir Bîbî)

Qenatê Kurdo di destpêka pirtûka xwe ya bi navê "Tarîxa Edebiyata Kurdî" de balê dikişîne ser rewşa îlm û zanînê ya di dewra mîrektiyên Kurdan de.[59] Dema Şerefxanê Bedlîsî behsa medreseya Dawudiyeyê ya ku ji aliyê Mir Dawudê kurê Mîr Melik ve li Xîzanê hatiye ava kirin dike weha dibêje: "Heta niha jî di vê medreseya han de gelek zanayên bikêr û xwendevanên evîndarê zanistiyê hene".[60]

Dîsa li gorî ku Şerefxan behsa Amêdiyê dike[61], mîrên Amêdiyê li wir gelek mizgeft û medrese çêkirine. Di wan de bi destê zana û alimên bifezîlet, îlmên dînî tên dayîn û stendin. Ji herêma Zaxo jî gelek zanayên Kurdistanê derketine.

Li gorî agahiyên ku Şerefxan derheqê mîrên Cizîrê de dide, Mîrê Cizîrê Bedir Beg gelekî miqateyî alim û zanayan bû. Tu caran bi qasî dewra wî li Cizîrê zana kom nebûbûn. Ji wan zanyaran ên herî mezin û navdar Mewlana Mihemed Berqel'î, Mewlana Ebûbekir, Mewlana Hesen Surçî, Mewlana Zeyneddîn Bîbî, Mewlana Seyîd Elî û gelek kesên dî yên ku berhemên wan dihatin zanîn bûn.[62]

59 Kurdo, b.n., r. 33.
60 Bedlîsî, b.n., r. 307.
61 Bedlîsî, b.n., r. 201-202.
62 Bedlîsî, b.n., r. 224.

CamScanner ile tarandı

Di encamê de di serdema mîrektiyan de çi di çarçoveya sîs-tema patronajê/hîmayeyê de be, çi jî derveyî wê bi hişmendiye-ke entellektuelî be helbesta klasîk a Kurdî derketiye meydanê.

A. SEDSALA ŞAZDEHEM (SEDSAL: XVI)

Mirov dikare helbestvanên sedsala XVIan bike du beş. Hel-bestvanên berî tifaqa Kurd û Osmaniyan û yên piştî wê. Berî tifaqê bi qasî ku em dibînin tenê Şikriyê Bedlîsî heye. Lê piştî wê helbestvanên gelekî bi hêz derdikevin meydanê ku mirov dikare van jî bike du beş:

1. Yên ku di nav sedsala XVIan de ne: Mîr Ye'qûbê Zirkî û Eliyê Herîrî

2. Yên ku di dawiya sedsala XVIan û di destpêka sedsala XVIIan de jiyane: Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Mîr Îmade-dînê Hekarî.

Di vê beşê de em dê tenê li ser helbestvanên sedsala şaz-dehan rawestin. Ji helbestvanên vê sedsalê berhemên Mîr Ye'qûbê Zirkî negihîştine me. Herçiqas Eliyê Herîrî ne xwediyê dîwaneke tam jî be, yekem helbestvanê ku helbestên wî yên bi terzê xezelan gihîştine me dîsa ew e. Herîrî, her weha bi "Borê Qer" nûnerekî cureya cengnameyê ye jî.

1. MÎR YE'QÛBÊ ZIRKÎ

1.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Piştî tifaqa Kurd û Osmaniyan helbestvanê yekem ku em dibînin Mîr Ye'qûbê Zirkî ye. Li gorî ku Şerefxanê Bedlîsî di-bêje, Mîr Ye'qûbê Zirkî ji nesla kesayetekî mutesewif û seyîd bi navê Şêx Hesenê Ezreqî ye. Ji ber ku cilên şîn li xwe kirine, jê re bi wateya şîn "Ezreqî" hatiye gotin. Lê piştre di nav gel de Ezreqî bûye Zerraqî, ew jî bûye Zirkî. Şêx Hesen bi eslê xwe ji Şamê ye, gora wî jî li gundekî Licê bi navê Dêrxustê ye. Mal-bata Zirkiyan bi giştî li çar deveran mîrektiya Kurdan kirine ku ew jî ev in: Licê (Hetax/Etax), Hezro (Tercil), Girdikan û

CamScanner ile tarandı

Derzin. Li gorî dabeşkirina îdarî ya îro her du cihên pêşî li ser Diyarbekirê, her du cihên dawî jî li ser Bedlîsê ne.

Bapîrê Mîr Ye'qûbê Zirkî Hemze bi destûra Şah Îsmaîlê Sefewî li keleha Derzinê bûbû mîr. Derzin, îro di navbera Bayikan û Bedlîsê de dimîne.[63] Bavê wî Mihemed jî di şerê Çaldiranê de bi Îdrîsî Bedlîsî re hereket kiribû û hevaltiya Siltan Selîm kiribû. Piştî ku Mîr Mihemed wefat dike kurê wî Elî beg, piştî wî jî kurê dî Şahqulî Beg dibine mîr. Ji ber ku Şahqulî Beg li Boluyê ji aliyê eqrebayên wî ve tê kuştin (949/1543) îcar helbestvanê me birayê wî Mîr Ye'qûb dibe mîr. Mîr Ye'qûb li Derzinê 25 salan desthilatdarî kiriye. Piştre di sala 984/1577an de mîrîtî dewrî kurê xwe Dûman Beg kiriye. Mîr Ye'qûb di sala 987/1580yî de koçî dawiyê kiriye.[64]

1.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Mîr Ye'qûb Beg piştî Şikriyê Bedlîsî duyemîn helbestvan e ku li devera Bedlîsê bi Kurdiya Kurmancî nivîsandiye. Ji ber ku Derzin nêzî Bedlîsê ye, girîngiya Bedlîsê wekî navendeke pêşîn ji bo edebiyata Kurdî jî derdikeve holê. Lewra ev her du helbestvanên ku di serdema destpêkê ya edebiyata Kurdiya Kurmancî de cih digirin ji heman herêmê ne. Şerefxanê ku ji Bedlîsê ye, di berhema xwe de behsa van her du helbestvanan kiriye û her du jî ji nêz ve bihîstine. Lewra Şerefxan dibêje ku dema bapîrê wî Mîr Şerefê kurê Şemsedîn diçû şerekî gelek zana û helbestvan bi xwe re dibirin ku Şikriyê Bedlîsî yek ji wan helbestvanan e. Wate Şerefxan Şikrî ji malbata xwe nas dike.

Heçî Mîr Ye'qûb e, Şerefxan ev agahî piştî wefata wî bi 20 salan daye. Ji ber ku Derzin nêzî Bedlîsê ye mirov dikare texmîn bike ku hevdîtina wan jî qewimî be. Bi hindikayî Şerefxan Mîr Ye'qûb ji nêz ve şopandiye.

Agahiyên ku Şerefxanê Bedlîsî derheqê Mîr Ye'qûb Beg de dide ev in:

---

63 Derheqê Derzinê de bnr. Şakir Epözdemir, *Di Dîroka Mîrekiyên Zirkan de Mîrekiya Derzin*, weş. Fanos, Stenbol 2011.

64 Bedlîsî, b.n., r. 332-334.

CamScanner ile tarandı

"Li hemberî şi'r û nezmê hewesa wî hebû. Di vî warî de xwediyê çalakiyên aktîf bû. Gelek şi'rên xwediyê naveroka yekîtiya Xwedê û heqîqetan li pey xwe hiştin. Piraniya şi'rên wî bi Kurdî ne. Ez bawer dikim dîwanek wî ya bi Kurdî jî heye".[65]

Ev dîwana Mîr Ye'qûb Begê Zirkî di tarîxa edebiyata Kurdî de wekî yekem dîwana Kurdî tê hesibandin. Lê mixabin ev dîwan negihîştiye roja me û heta niha kesek jê ageh nîne. Dîsa jî îhtîmal û hêvî heye ku rojekê ev dîwan ji nişka ve derkeve holê û rola xwe di tarîxa edebiyata Kurdî de bileyîze.

2. ELIYÊ HERÎRÎ

2.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Eliyê Herîrî, jî yek ji helbestvanên herî kevin kevin ên serdema mîrektiyan e. Şikriyê Bedlîsî û Mîr Ye'qûbê Zirkî jî di vê kategoriyê de ne, lê helbestên her duyan jî negihîştibûne roja me. Lê helbestên Eliyê Herîrî gihîştine roja me. Ji ber vê yekê Eliyê Herîrî helbestvanê Kurmanc ê herî kevin tê hesibandin ku helbestên wî niha di destê me de ne.

Lê dîsa li ser serdema ku Eliyê Herîrî tê de jiyaye gelek tişt hatine gotin.

Ji van beytên ku Ehmedê Xanî tê de behsa Eliyê Herîrî kiriye, em têdigihin ku Eliyê Herîrî di her halî de berî Ehmedê Xanî jiyaye. Xanî di Mem û Zînê de weha behsa her sê helbestvanên navdar ên berî xwe kiriye:

Bînave ruha Melê Cizîrî
Pê hey bikira Eli Herîrî

Keyfek we bida Feqîhê Teyran
Hetta bi ebed bimayî heyran

65 Bedlîsî, b.n., r. 333.

CamScanner ile tarandı

Li gorî Mela Mehmûdê Bazîdî[66], Eliyê Herîrî di salên 1010-1078 de jiyaye. Piştî Bazîdî bi taybetî Kurdologên Rûs jî di vê mijarê de ew şopandine.[67]

Li gorî nêrîneke dî jî, dema Mela Cami (1413-1492) sala 1472yan de di Erbîlê ve çûye Hecê ev beyt gotiye:[68]

Pîremerdî bedîdeem zi Cizîr
Nîmemerdî bedîdeem zi Herîr

Ebdureqîb Yûsif di sala 1961ê de li Mûsilê mecmû'eyeke destnivisar ku di sala 1767an de hatiye nivisandin dîtiye ku di vê destnivîsarê de helbestên Eliyê Herîrî jî hene. Ji vir tê fêmkirin ku Eliyê Herîrî berî sala 1767an jiyaye. Lê tişta gelek balkêş ew e ku; Ebdureqîb Yûsif di "Dîwana Kurmancî" de dibêje diroknas el-Muhibbî di "Xulasetu'l-Eser" de behsa kesekî bi navê Şêx Ehmedê kurê Şêx Elî Herîrî kiriye. li gorî vê agahiyê ev Şêx Ehmed li Şamê li gundê Esalê hatiye dinyayê. Bavê wî Kurd e, ji Herîrê ye. Şêx Ehmed 1638an de li Şamê li Salihiyê koçî dawiyê kiriye.[69] Di van agahiyan de ji ber ku dibêje bavê Şêx Ehmed Kurd e û ji Herîrê ye, bi mirov re ev bawerî çêdibe ku di vir de behsa helbestvanê me hatiye kirin. Li gorî vê Eliyê Herîrî ji Herîrê çûye Şamê û li wir bi cih bûye, kurekî wî bi navê Şêx Ehmed heye û ev kurê wî li gundê Şamê Esalê hatiye dinyayê û di sala 1638an de li taxa Salihiyyeyê ya Şamê wefat kiriye. Nexwe eger wisa be, madem kurê wî di sala 1638an de koçî dawiyê kiriye, bavê wî Eliyê Herîrî jî texmînen dê destpêka vê sedsalê de miribe û di sedsala XVIan de jiyabe.

---

66 Mela Mehmûdê Bazîdî, "Rîsaleya Şa'ir û Musennefên di Kurdistanê" *Camî'eya Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*, Amd. Ziya Avcı, Lis, St. 2010, r. 13.

67 Kurdo, b.n., r.

68 Sadiq Behaedîn Amêdî, *Hozanvanêt Kurd*, (Amd. Zeynelabidîn Zinar), Pencînar, Stockholm 1998, r. 50.

69 Ebdurreqîb Yûsif, *Dîwana Kurmancî Şaîrên Klasîk ên Kurd* (Latînîzekirin: Ziya Avcı), weş. *Dîwan*, Stenbol 2012, r. 19-20.

CamScanner ile tarandı

Digel ku kesên wekî A. Jaba, Micirson, M. Emin Zeki, Qenatê Kurdo dibêjin ew ji Şemzînana Hekkarî ye û li wir veşartî ye, lê çawa ku Beleç Şîrku û Elaeddînê Seccadî jî dibêjin ew ji Herîra Erbîlê ye. Li Herîrê îro peykerekî wî jî hatiye çikandin.

Hin kesan Eliyê Herîrî û Herîriyê xwediyê berhema bi navê "Meqamat"ê ku zêdetir wekî "Meqamata Herîrî" hatiye naskirin tevlîhev kirine û wisa guman kirine ku ew Herîriyê ku "Meqamat" nivîsandiye ji Herîrê ye. Mesela Baba Merdox, bi vê nêrînê Herîrîyê xwediyê "Meqamat"ê Kurd hesibandiye. Di rastiya xwe de ev du kesayetên ji hev cuda ne. Herîriyê xwediyê "Meqamatê", Ebu Muhemmed Qasim b. Elî ye. Berî Eliyê Herîrî bi gelekî di sala 446/1054an de li Besrayê li gundê Meşanê hatiye dinyayê û dîsa li Besrayê di sala 516/1122an de koçî dawiyê kiriye.[79] Sebebê ku jê re hatiye gotin Herîrî ew e ku pîşeya bavê wî "herîr", anko "hevrîşim" bû. Loma jî ti têkiliya navê wî bi bajarê Herîrê ve tine ye.

Li gorî ku ji helbestên Eliyê Herîrî tê fêmkirin ew Huseynî ye.

2.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

2.2.1. Helbestên wî

Eliyê Herîrî ji helbestvanên kevin û yekemîn ê edebiyata Kurdiya Kurmancî ye. Belkî jî ji ber ku kevn e hemû helbestên wî negihîştine roja me. Heta niha 6 helbestên Eliyê Herîrî hatine weşandin ku mirov dikare wan helbestan di kategoriya dîwançeyekê de bihesibîne. Bêguman hijmara helbestên Herîrî qîmetê wî danaxîne. Tişta ku di tarîxa edebiyata Kurdî de qîmetê wî bilind dike ew e ku, ew jî wekî Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran ne yek ji avakerên edebiyata Kurdiya Kurmancî tenê ye, di çarçoveya hemû zaraveyan de ji yekîmînan e. Hetta mirov dikare bêje ku di hişê Kurdî de helbestvanê klasîk ê yekem ew e. Ji aliyê teşe û naverokê ve bingehê helbesta klasîk a Kurdiya Kurmancî digel Melayê Cizîrî ji aliyê Herîrî ve hatiye avêtin.

70 Şemsedîn Sami, *Kamûsu'l-A'lam*, weş. Kaşgar, Ankara 1996. b. III, r. 1938.

CamScanner ile tarandı

Eliyê Herîrî di helbestên xwe de mexlesa Elî, Eliyo, Şêx Elî û Huseynî bi kar aniye.

Mehweş ku westan sef bi sef ew hate der Misrî di kef
Wan got Eliyo "la texef" me b'mirdinê qewî xweş e

Reyahîn sosin û werd in li Şêx El'yê xerîb ferd in
Weristî ehmer û zerd in hero sed car di efxan têt

Li jêrê em dê li gorî kronolojiya weşanê behsa helbestên Herîrî bikin.

Albert Sosin di sala 1887an de li Petersbûrgê di berhevoka xwe "Kurdische Samlungen" de ev helbesta wî weşandiye[71]:

Ger hûn bibînin narê eşq tenê li bom zarî dikin
Herkes bizanit halê eşq bi hîle dijwarî dikin

Ebdureqîb Yûsif di sala 1971ê de di "Dîwana Kurmancî" de du helbestên wî çap kirine[72]. Ev helbest weha dest pê dikin:

Dîsan ji nû eşqa berê pir enderûnim ateş e
Zulfa muzeyyen enberî de'wa digel xala reş e

Dilê mehzûn kefaret bêt kî îmşeb taze mihman têt
Bi mizgînî beşaret bêt kî mihman canê canan têt

Sadiq Behadîn Amêdî di "Hozanvanêt Kurd" de (1980) 5 helbestên wî çap kirine.[73] Sê heb ji van helbestan ên li jorê ne. Lê her duyên dî, bi qasî ku em dizanin, cara pêşî ji aliyê wî ve hatine weşandin. Li jêrê em cih didin metlayên van her du helbestan:

71 Kurdo, b.n., r. 57.
72 Yûsif, b.n., r. 33-36.
73 Amêdî, b.n., r. 152-168.

CamScanner ile tarandı

Sefer di werê şebê tarî ey Elî û tu bir ray î
Da bikeyn zikrê cebbarî belkî li me xoş bêt sala

Heçî şêx û mirîdin kû bibêjin qet we nakim ez
Eger rûhim dikin xaret ji yaran re binoşim ez

Ji bilî van her pênc helbestan helbesteke bi guman jî heye. Kurdnasa Sovyetistanê M. B. Rudenko di pirtukxaneya Saltikov-Şidrinê de li Leningradê ev helbesta jêrîn ditiye û di sala 1972yan de di berhevoka rojhilatêde di meqaleyeke xwe de wekî helbesta Eliyê Herîrî çap kiriye.[74]

Xelkno werin bibînin çi husneke b' kemal e
Heyran ji dil bibînin ji sun'ê zu'l-celal e

*Çend bibêje **Elî Sadiq** ji esrarê di xayib*
Ji wan wasfê di layiq ji husna ya delal e

Lê li gorî ku Ebdureqîb Yûsif dibêje ev helbest ne ya Herîrî ye, ya helbestvanekî dî bi navê Sadiq e.[75] Sebebê derketina vê rewşê ew e ku di nusxeya Rudenko de di beyta mexlesê de peyvên Elî û Sadiq bi hev re derbas dibin. Ji ber vê yekê jî Rudenko ev helbest nisbetî Eliyê Herîrî kiriye. Lê di nusxeya Yûsif de navê Elî derbas nabe.

Dê çend bibêjî Sadiq ji esrar û deqaîq
Evan wesfên di laîq ji husna ya delal e

Bi rastî jî dema mirov li kêşa helbestê dinêre ku ew jî, "Mustef'ilun fe'ûlun mustef'ilun fe'ûlun" e, aşîkar e ku di nusxeya Rudenko de peyva Elî li risteyê hatiye zêdekirin. Ev jî dide nîşandan ku ev helbest dê ne ya Eliyê Herîrî be. Ew ya helbest-

74 Kurdo, b.n., r. 58.
75 Yûsif, b.n., r. 101.

Mîna Sadik Macin] ev helbestvan

CamScanner ile tarandı

vanekî dî bi navê Sadiq e ku di rûpelên pêş ên pirtûkê de dê li ser wî bê rawestan.

2.2.2. Menzûmeya Borê Qer

Ji bilî van helbestên li jorê, versiyoneke hîkayeta "Borê Qer" jî ji aliyê Herîrî ve hatiye nivîsandin. "Borê Qer" ne ji aliyê kesekî bi tenê ve hatiye nivîsandin. Tişta ku xuya ye hem Feqiyê Teyran, hem Eliyê Herîrî, hem jî hin kesên dî versiyonên cuda yên vê menzûmeyê nivîsandine. Borê Qera ku bi Eliyê Herîrî ve tê nisbet kirin niha di nav destnivîsarên Petersborge de heye.[76] Herweha nusxeyek jî li cem Mela Dawud e (Biraye Mela Mihemede Dengnekir). Feqiyê Mela Dawud Zeynelabidîn Amidî nusxeyek li ber vê zêde kiriye û ev nusxe li Diyarbekirê çap kiriye (Weş. Söz, Diyarbakır 2004.). Di dawiya vê nusxeyê de navê Eliyê Herîrî weha derbas dibe:

El'yê Herîr jî sohtî
Di çil çiyan werdigrin

Di vê nusxeyê de menzûmeya Borê Qer weha dest pê dike:

Mecal ew mecal bû
Heçî hespê reş bîne

Kafirek dîn betal bû
Qesrek ji min bis'tîne

76 Cewdet Huşyar, *Zexaîru't-Turasi'l-Kurdî fî Xezainî*, Petersborg, http://brob.org/old/bohoth/bohoth/bohoth026.htm, 29.10.2013.

CamScanner ile tarandı

B. SEDSALÊN ŞAZDEHEM Û HIVDEHEM (SEDSAL: XVI-XVII)

Sedsalên şazdehem û hivdehem di tarîxa edebiyata kurdiya kurmancî de du sedsalên zêrîn tên hesibandin. Lewra di van her du sedsalan de ji bo edebiyata Kurdiya kurmancî bingeheke bihêz hatiye avêtin ku tesîrên wê bingehê heta îro jî dom dikin. Em dê helbestvanên van her du sedsalan li ser du beşan dabeş bikin: Yên ku di van her du sedsalan de jiyane û yên ku tenê di sedsala hivdehan de jiyane.

Di vê beşê de em dê li ser helbestvanên ku di dawiya sedsala şazdehem û destpêka sedsala hivdehem de jiyana rawestin ku ew jî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Mîr Îmadedînê Hekarî ne. Melayê Cizîrî helbestvanê yekem ê xwedî dîwan e û helbestvanê xezel û evîna îlahî ye. Feqiyê Teyran jî helbestvanê yekem e ku hinek hîkayetên tesewifî derbasî nezmê kirine û di helbestên xwe de zimanekî sade bikar aniye.

1. MELAYÊ CIZÎRÎ

1.1. Jiyana wî

1.1.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Melayê Cizîrî yekem helbestvanê Kurd e ku bi terzê edebiyata klasîk a rojhilatî dîwaneke bi Kurdî aniye holê. Navê wî yê rastîn Ehmed e. Bi heseb melatiya wî ya di medreseyan de û bajarê wî Cizîrê wekî Melayê Cizîrî hatiye naskirin. Wî bi xwe di gelek beytên dîwana xwe de navê xwe emilandiye. Bo nimûne;

Ehmed im sîne siper pêşberî tîra felekê
De'wedarê te me îro tû ji dehlê were der

Melayê Cizîrî di helbestên xwe de bi piranî mexlesa "Mela" bi kar aniye. Ew kesên ku ji medreseyên berê mezûn dibûn û ji wan medreseyan destûrnameya ilmî distandin wekî "Mela"

CamScanner ile tarandı

dihatin binavkirin. Îcar Melayê Cizîrî jî melayekî bi vî rengî bû û çawa ku di vê beyta jêrîn de xuya ye, wî di helbestên xwe de ev wesfê xwe ji xwe re wekî mexles xebitandiye.

*Rohniya çehvên **Melayî** ew tecellaya te dayî*
Ya ji Ehmed dil rewayî dil ji min bir dil ji min

Wî carinan mexlesa "Nîşanî" jî bi kar aniye ku ev mexlesa wî di duwazde helbestên wî de derbas bûye. Bi qasî ku tê şîrovekirin Mela bi neqandina vê mexlesê xwestiye îşaret bike ku ew bûye hedefa tîrên evînê, yan jî tîrên mûsîbetan. Herweha dibe ku emilandina "nîşanî" ji ber hebûna nîşanan li ser rûyê wî jî be. Wekî nimûne di vê beyta jêrîn de Melayê Cizîrî wekî mexles bêjeya Nîşanî bi kar aniye.

*Qesdê serçeşmeê heywanê heqîqet ke **Nîşanî***
Bi cihanê mebe mexrûr ku cîhan 'eynê serab e

Li gorî nusxeya Ebdulqadirê kurê 'Eliyê Amêdî ku di sala 1238/1822an de hatiye nivisandin navê bavê Melayê Cizîrî Mela Mihemed e. Dîsa li gorî destnivîsa Omerê kurê Es'ad ku di sala 1937an de hatiye nivîsandin ew ji malbata Ensariyan e. Herweha ew ji eşîra Bohtiyan e ku wî bi xwe di beyteke xwe de ev tişt aniye zimên:

Gulê baxê Îremê Bohtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistan im

1.1.2. Serdema wî

Derheqê serdema Melayê Cizîrî de gelek nêrînên ji hev cuda hene ku mirov dikare van nêrînan bike sê kom.

1.1.2.1 Nêrînên Derheqê Serdema wî de

CamScanner ile tarandı

1.1.2.1.1. Sedsala XIIem

Cara pêşî Mela Mehmûdê Bazîdî di "Rîsaleya Şa'ir û Musennefên di Kurdistanê" de[77] û piştre jî A. Jaba di kitêba xwe "Recueil de notices et recits" de behsa Mela kirine û li gorî îfadeya wan, ku şaşiya wê aşîkar e, Mela di sala 540/1145an de hatiye dinyayê û di sala 556/1160î de wefat kiriye.[78]

Li gorî nêrînekê Melayê Cizîrî hevçerxê Imadeddin Zengî (k.d.1145) yê damezrênerê dewleta Atebegiyan li Musil û Helebê ye û di sedsala XII û XIIIan de jiyaye. Li gorî van beytên jêrîn ên Mela, gihaye wê encamê ku Mela nusxeyek ji dîwana xwe ji Xanê Xanan hakimê Tebrîzê re şandiye.[79]

Xanê Xanan lami'ê necma te her pur nûri bî
Keştiya bextê te ez bayê muxalif dûri bî

Ey şehinşahê Mu'azzem Heq nigehdarê te bî
Sûreê Înna Fetehna dor û madarê te bî

Dîsa li gorî Kurdologên li Rûsyayê yên wekî Wezîrê Nadirî û Qenatê Kurdo Mela di sedsala XIIan de jiyaye û wefat kiriye.[80] Xuya ye ku ev kesên han li pey nêrîna Jaba çûne. Li gorî wan Mela di dema êrîşên Selçûqiyan de ku Mir Umadin wê demê mîr bû, di navbera 1101-1169an de jiyaye.

1.1.2.1.2. Sedsala XVem

Kesên wekî Elaeddîn Seccadî û Sadiq Bahaeddin Amêdî dibêjin ku Mela di navbera salên 1407 û 1481ê de jiyaye. Li gor wan dema Mela Camî (1413-1492) di sala 1472yan de di Hewlêrê ve çûye Hecê, li ser pirsa "di sefera xwe de te kî dît?" bi zimanê Farisî ev bersiv daye:[81]

---

77 Bazîdî, *Rîsaleya Şa'ir û Musennefên di Kurdistanê*, r. 13-14.
78 Kurdo, b.n., r. 90.
79 Abdullah Yaşın, *Tarih Kültür ve Cizre*, weş. Kent, İstanbul 2011, 417-418.
80 Kurdo, b.n., r. 90-92.
81 Amêdî, b.n., r. 50. Hacî Qadirê Koyî jî di helbesteke xwe de cih daye vê

CamScanner ile tarandı

Pîremerdî bedîdeem zi Cizîr
Nîmemerdî bedîdeem zi Herîr[82]

Li gorî nêrîna Mela Şefîq Erwasî (ji nav Kurdan çapkerê pêşî yê dîwana Mela) jî serdema Mela rasti vê sedsalê tê. Erwasî di sala 1335/1919an de di kovara Kurdistanê de helbesteke Mela weşandiye û di binê wê de derheqê Mela de bi Tirkî hinek agahî dane[83] ku li jêrê em dê cih bidin wergera wan a Kurdiya Kurmancî:

"Ev zatê muhterem, şêx û ustazê edîbên Kurdan e ku di îlm û fezîletê de şohreta wî zehf zêde bûye. Teqrîben berî niha bi 500 salî gihîştiye serdema mîrên şerqê yên ku prensên Cizîrê û ji malbata Azîzan bûn û bi destên qehremane yên van mîran rizgarkirina Kurdistanê, bi sayeya şûrên eşîra Botan mexlûbiyeta fahîş a Uzun Hesenê Akkoyunî û sê caran jî mexlûbiyeta Şah Îsmaîlê navdar û îstîqlal û îstîkmala Kurdistanê dîtiye."

Li vir Şefîq Erwasî li ser serdema Mela rawestiyaye û gotina "berî niha bi 500 salî" balê dikişîne ku li gorî niha ev dibe berî niha bi 600 salî. Lewra ev nivîs di sala 1919an de hatiye nivîsandin. Beguman ev jî beramberî sedsala XVan tê.

1.1.2.1.3. Sedsala XVI-XVIIem

Mela Ehmedê Zivingî gihîştiye wê encamê ku Mela piştî 1500î hatiye dinyayê û di sala 1640î de koçî dawiyê kiriye.[84] Li gorî Marûf Xeznedar Mela di navbera salên 1567-1640î de jiyaye.[85]

---

beytê. Bnr. Amêdî, b.n., r. 105.

82 Wate: "Min li Cizîrê zilamekî tam û li Herîrê zilamekî netam dît."
Versiyoneke dî ya vê beytê jî weha ye:
Tam merde der Cizîr
Nim merde der Herîr
Wate: "Li Cizîrê zilamekî tam, li Herîrê zilamekî netam."

83 Veysel Aydeniz, *Seyyid Şefîk Arvasî*, Nûbihar, Istanbul 2013, r.100-102.

84 Mela Ehmedê Zivingî, "Hinek Agahdarî li Ser Tarîxa Jiyana Mela", *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, (Wer. M. Emîn Narozî), Avesta Stenbol 2013, r. 22.

85 Xeznedar, b.n., b. III, r. 289-90.

CamScanner ile tarandı

1.1.2.2. Nirxandina Serdemê

1.1.2.2.1. Nirxandina Nêrîna Yekem

Ji wan kesayetên ku navên wan di dîwana Mela de derbas dibin, em ê têbigihin ku Mela heta kîjan serdemê jiyaye. Lewra bi awayekî mentiqî ne mumkin e ku Mela berî wan kesên ku di dîwana xwe de cih dabe navên wan jiyabe. Ew dê yan di serdema wan de yan jî piştî koça wan a dawiyê jiyabe. Ew kesên ku di dîwana Mela de navê wan derbas dibin ev in:

Cengîz (k.d.1227)
Ji re'na nêrgizên tey mest û xwînrîz
Zeman bû 'ehdê cengengîzê Cengîz

Se'dî (k.d.1291)
Me ra j'ewwel çi bir xamî kişand axir bi bednamî
Ji rengê Se'dî yû Camî ji şuhret pê hisîn 'amî

Hafizê Şîrazî (k.d.**1390)**
Ji Hafiz qutbê Şîrazî Mela er fehm bikî razî
Bi awazê ney û sazî bibî ber çerxê perwazî

Ger lu'luê mensûr(i) ji nezmê tu dixwazî
Wer şi'rê Melê bîn te bi Şîrazî çi hacet

Tîmurleng: (k.d.1405)[86]
Sef sef mi dîn hindî û zeng Cengîz(i) hat Teymûr(i)leng
Xef wan reşandin dil xedeng teşbîhê tîrên Xan-Şeref

Mela Camî (1413-1492)
Me ra j'ewwel çi bir xamî kişand axir bi bednamî
Ji rengê Se'dî yû Camî ji şuhret pê hisîn 'amî

86 Tîmurleng, di sala 1394an de, di serdema Mîr Izzeddin de Cizîr istila kiriye

CamScanner ile tarandı

Ehmed Paşa (k.d.1497)

Ya ramiye qelbî bi sihami'l-lehezatî
Heyhate Necatî
Ma zale fidaen leke rûhî we heyatî
Min qebli mematî

Çawa ku xuya dibe, ew kesên ku Mela di dîwana xwe de cih daye navê wan, digihine heta bi dawiya sedsala XVan. Nexwe ji vir derdikeve holê ku Mela ne berî sedsala XVan, yan di wê sedsalê de, yan jî piştî wê jiyaye. Ji vir jî derdikeve holê ku nêrîna ku Mela di sedsala XIIan de jiyaye ne durust e.

1.1.2.2.2. Nirxandina Nêrîna Duyem

Derheqê sedsala XVan de du arguman hene û her du jî ji belgeyan zêdetir pişta xwe didin agahiyên devkî.

Ya pêşî îfadeya Mela Camî ye ku dibêje min li Cizîrê zanayekî mezin (tam merde) dîtiye. Bêguman wekî teorîk îmkan heye ku Mela di dewra Mela Camî de jiyabe û di dîwana xwe de behsa wî kiribe. Herweha Mela di dîwana xwe de behsa kesekî dî yê ku piştî Mela Camî (piştî sedsala XVan) jiyabe jî nekiriye. Lê ev îfadeya Mela Camî ne nivîskî ye û eger nivîskî jî be, dibe ku ew kesê tam ê Cizîrî ne Melayê Cizîrî be. Lewra di îfadeyê de navê Melayê Cizîrî nehatiye bilêvkirin û di her sedsalekê de li Cizîrê zanayên mezin hebûn.

Argumana duyem jî agahiyên Şefiq Erwasî ne ku li gorî wan agahiyan Mela berî niha bi 600 salî jiyaye. Ev agahî bi rastî jî zehf bi qîmet in. Lewra yê ku agahiyan dide, hem rewşenbîrekî Kurdan ê berî bi sed salî ye, hem jî ji nav Kurdan ê ku cara yekem dîwana Mela çap kiriye ew e. Ev nêrîn ji ber ku hizra rewşenbîriya Kurdan a berî niha bi sed salî derheqê serdema Mela de nîşan dide girîng e. Lê dîsa xuya ye ku Erwasî di van agahiyan de pişta xwe ne daye çavkaniyeke berê, wî dîsa pişta xwe daye agahiyên devkî.

Lê xala herî girîng a ku vê nêrîne bi zehmetiyan re rû bi rû dihêle ew e ku Şerefxanê Bedlîsî di sala 1596an de *Şerefname*

CamScanner ile tarandı

xilas kiriye û tê de behsa Melayê Cizîrî nekiriye. Eger Mela berya Şerefxan bijiyaya, yan jî di dema ku wî Şerefname nivîsandî de kesekî navdar bûya pêwist bû ku behsa wî bikira. Lewra Şerefxan, di berhema xwe de behsa gelek navdarên Kurdan ên ku Mela gelekî ji wan li pêştir e kiriye. Ev jî dide xuyakirin ku Mela ne berî Şerefxan e û piştî ku wî di sala 1596an berhema xwe nivîsandiye gihaye şohretê. Lewra Şerefxan di berhema xwe de cih nedayê. Ev jî vê nêrîna ku Mela di sedsala XVan de di dewra Mela Camî de jiyaye dixe zehmetiyê û nêrîna sêyem (sedsala XVI û XVIIan) û tarîxa 1640î ji bo wefata wî piştrast dike.

1.1.2.2.3. Nirxandina Nêrîna Sêyem

Li gorî van xalê li jêrê Mela di sedsala XVI-XVIIan de jiyaye.

1. Feqiyê Teyran di muşa'ereya xwe ya ku bi Mela re kiriye de tarixa vê muşa'ereyê bi awayekî aşîkar weha daye:

Birîndarê işqê me dûr im ji siha bihan
Dizanim meddahê kê me di hezar û yek û sihan
Senaxahê Melê me li hemû erd û cihan

Ji îfadeya "hezar û yek û sihan" mebest hezar û sih û yek e (1031) ku beramberî 1621ê mîladî tê. Ji vê benda Feqiyê Teyran aşîkar tê fêmkirin ku Mela di sala 1621ê de li heyatê bûye.

2. Li gorî hinek lêkolîneran[87] jidayîkbûna Mela bi hesabê ebcedê ji vê beyta wî ya li jêrê derdikevê holê:

Şevê zulmat û deryayê ji mewcan qet xeber nayê
Şikestî keştiya bayê ecacê wê şefeq dayê
Ji herfan mah û salê ma, nehat der şiklê falê ma
Kuca danendi halê ma sibikbaranê sahilha

87 Tehsîn Î. Doskî, *Dîwana Melayê Cizîrî*, Spîrêz Dihok 2005, r. 26.

CamScanner ile tarandı

Di misraya sêyem a vê bendê de, bêjeyên **herf, mah, sal, ma, şikl, fal, ma** bi hesabê ebcedê beramberî sala 975an tên. Ev jî bi mîladî beramberî sala 1567-68an tê. Ji vir jî tê fêmkirin ku Mela di vê salê de (di sedsala XVIan de) hatiye dinyayê.

1.1.2.3. Encama Serdemê

Ji van her sê nêrînan û argumananên wan derdikevê holê ku nêrîna sêyem (sedsala XVI û XVIIan) zehftir nêzî rastiyê ye. Ji ber ku Mela di dîwana xwe de behsa kesayetên ku heta bi dawiya sedsala XVan jiyane kiriye, nêrîna ku ew di sedsala XIIan de jiyaye pûç dibe. Ji ber ku Şerefxanê Bedlîsî di berhema xwe ya ku di sala 1596an de nivîsandiye de behsa Mela nekiriye, nêrîna ku ew di sedsala XVan de jiyaye jî pûç dibe. Li aliyê dî ji ber ku bi hesabê ebcedê jî be, tarîxa jidayîkbûna wî kifş bûye ew tê fêmkirin ku Mela di sedsala XVI û XVIIan de jiyaye. Ev encam û fikra ku helbesta klasîk a Kurdiya Kurmancî di serdema bihêzbûna mîrektiyan de pêşketiye jî li hev dikin.

1.1.3. Temenê Mela

Sala jidayîkbûn û koça dawiyê ya Mela, di çavkaniyan de nehatiye diyarkirin. Lê çawa ku li jorê jî hate nîşandan, ji helbestên Mela bi hesabê Ebcedê jidayîkbûn (975/1567-68) û koça wî ya dawiyê (1050/1640) hatiye derxistin. Li gorî ku Elaeddîn Seccadî, ji destnivîsa Ebdulqadir Amêdî neql kiriye, Mela 75 salan jiyaye. Bi rastî jî li gorî tarîxa jidayîkbûn û koça wî ya dawiyê ku bi hesabê ebcedê derketibû holê jî temenê Mela 75 sal çêdibe (1050-975=75).

1.1.4. Mîrên Cizîrê û Melayê Cizîrî

Gelo di temenê Mela de kîjan mîrên Cizîrê desthilatdarî kirine? Li jêrê em dê hinekî behsa wan mîrên ku eleqeya wan bi Mela re hene bikin.

Mir Şah Elî Beg, di lihevkirina mîrên Kurdan û Siltan Selîmê Osmanî ya sala 1517an de iltihaqî Osmaniyan kiriye.

CamScanner ile tarandı

Ew mîrên ku Mela di serdema wan de jiyaye, yan jî ew mîrên ku di jiyana Mela Mela (1567-1640) de hatine ser desthilatê bi rêzê ev in:[88]

1. Mîr Bedir kurê Elî Beg (1556-1571).
2. Mîr Mihemedê kurê Bedir Beg (1571-1578).
3. Siltan Mihemedê kurê Mîr Mihemed (1578-1583).
4. Nasir Begê kurê Şah Elî Beg (1583).
5. Mîr Ezîzê kurê Kek Mihemed (1583-1584), cara pêşî.
6. Mîr Mihemedê kurê Xan Abdal (1584-1585), cara pêşî.
7. Mîr Ezîzê kurê Kek Mihemed (1585-1592), cara duyem.
8. Mîr Mihemedê kurê Xan Abdal (1592-1595), cara duyem.
9. Mîr Şerefê kurê Xan Abdal (1595-1618): (Xan Şeref)

Mîrê 22yem e. Şerefxan di 1596an de dema Şerefname nivisandiye behsa wî kiriye. Mela jî di vê beyta xwe de behsa wî kiriye:

Xef wan reşandin dil xedeng Teşbîhê tîrên Xan-şeref
Sef sef mi dîn Hindî û Zeng Cengîz(i) hat Teymûr(i)leng

10. Mîr Ebdal Xan kurê Şeref (1618-1627).

Mela ji van mîrên jêrîn muhtemelen di dema Şerefxan yan jî Mensûrxan de koçî dawiyê kiriye.

11. Şerefxan, Mensûrxan, Ismaîlxan, Mustefaxan, Ebdullah, Seyfeddîn (1627-1821)

Piştî koça Mela ya dawiyê bi 200 salan, di sala 1843yan de dawî li desthilatdariya mîrê dawî yê Cizîrê Mîr Bedirxan Beg (1821-1843, k.d.1868) hatiye.[89]

1.1.5. Xwendina Mela

Li gori ku hatiye rîwayetkirin Mela, li Cizîr, Hekkarî, Imadiye û Diyarbekirê xwendiye. Di 32 saliya xwe de, li gundê Strabasê yê Diyarbekirê ji Mela Taha icazet girtiye. Piştre li gundeki dî yê Diyarbekirê bi navê Sirba melatî kiriye. Piştre

88 Yaşın, b.n., r. 82-91.
89 Yaşın h.b., r. 91-103.

CamScanner ile tarandı

çûye Hesenkeyfê û li wir dersdarî kiriye. Piştre çûye Cizîrê û li Medresa Sor dersdarî kiriye û di heftê û pênc saliya xwe de wefat kiriye û li medreseya sor hatiye defnkirin.[90]

Piştî ku Cizîr 30 salan di destê Çelebî yê Akkoyunî de maye, mîrê çardehem Mîr Şerefxan kurê Bedir (...1512) di sala 1508an de Cizîr ji wî kesî stendiye û Medreseya sor ya ku Mela tê de medfûn e ava kiriye. Mîr Şerefxan herweha sê êrîşên Safewiyan jî berteref kirine.[91]

1.1.6. Zewaca Mela

Li gorî rîwayeta xelkê Cizîrê Mela ne zewiciye. Li gorî ku Mela Mehmûdê Bazîdî dibeje Mela aşiqê xweha mîr Îmadedîn bûye[92]. Herweha tê gotin wî ji Keça Melik Kamilê Heskîfê Selmayê hes kiriye û ev beytên li jêrê derheqê wê de gotine.

Îde û herkes ji dîdara te lê pîroz e îd
Ez tenê mehrûmê dîdar im bi sed menzil be'îd

Ma bi le'lên canfeza navê me bînit carekê
Bi'd-du'a bellix tehiyyatî li Selma ya berîd

Hin kes jî wekî dilbera Mela Sitiya bisk-kesk nîşan didin. Sitî keçek ji malbata Mîr bûye.

1.2. Cihê Melayê Cizîrî di Edebiyata Kurdî de

1.2.1. Berhemên Melayê Cizîrî

Bêguman Melayê Cizîrî bi dîwana xwe û menzûmeyên xwe yên derveyî dîwanê mohra xwe li tarîxa edebiyata Kurdî daye. Berhema herî girîng a Mela dîwana wî ye.

---

90 Xeznedar, b.n., b. I, r. 290.
91 Yaşın, b.n., r. 176.
92 Bazîdî, *Rîsaleya Şa'ir û Musennefên di Kurdistanê*, r. 13-14.

CamScanner ile tarandı

1.2.1.1. Dîwan

Dîwana Mela di tarîxa edebiyata Kurdî de yekemîn dîwan e ku bi awayekî muretteb û di asta dîwanên Farisî, Erebî û Tirkî yên navdar de hatiye nivîsandin. Nusxeya Cizîrê, digel helbesta "Ya Ramiye Qelbî" ku bi bal Xizir û Ehmed Paşa ve tê nîsbetkirin 114 helbest in.

- Qesîde: 21 heb.
- Xezel: Nûbihar: 87 heb.
- Medhiye: 2 heb.
- Rubaî: Di çapa Zivingî de 3 hene. Digel yên Hartman dibine 16 heb.
- Tesdîsa Şêx Remezan 1 heb.
- Terkîb bend: 1 heb.
- Terci' bend: 4 heb.
- Terdiye: 1 heb.
- Ferd: 2 heb.
- Hinek helbestên Mela yên ku ne ketine dîwana wî jî hene. Bo nimûne, di mecmû'eya Ebdureqîb Yûsif de 2 heb ji wan hene. (r. 16-20).

Ji bilî van helbestên Mela yên ku di çarçoveya dîwanê de hatine nivîsandin, hinek menzûmeyên wî yên dî jî hene ku evana jî piştre li dawiya dîwanê hatine zêdekirin û bi dîwanê re di nav yek bergî de hatine çapkirin. Ew menzûme jî ev in:

1.2.1.2. Gotûbêja Melayê Cizîrî Digel Mîr Îmadedîn

Ev menzûme ji gotûbêja Mela digel Mîr Îmadedîn pêk hatiye. Her yekî ji wan 19 bend gotine.

Gotûbêj bi van bendan dest pê dike:

Gotina Mela

Selama min senaxwanî
Sehergeh gewherefşan bit
Bi xizmet 'erzê siltanî
'Ebîr û 'enberefşan bit
Bi sûret emrê subhanî
Ser elqabê zerefşan bit

CamScanner ile tarandı

Gotina Mîr
Selama sani'ê qadir
Mela da pê mu'etter bî
Muferreh bit Melê xatir
Peyapey lê mukerrer bî
Ji cama xatirê 'atir
Me jê ayîne enwer bî

Gotûbêj bi van bendan diqede:

Gotina Mela
Ji behra qulzuma mîran
Bi xewwasî guherçîn im
Di behsa 'ilm û tefsîran
Tu deryayan we nabînim
Ji mîr û begler û çîran
Xulamê Mîr 'Umadîn im

Gotina Mîr
Di baxê lefz û me'nayê
Suxen min serwê azad e
Ji vê îmla û înşayê
Me lewhê dil numa sade
Ji husnê rewneqek dayê
Ku Şêx Ehmed me ustad e

Li gorî agahiyên ku Doskî dide, Mîr Îmadedîn ji malbata Şenbû, anko ji malbata mîrên Hekkariya ye. Derheqê tarîxa jidayîkbûn û wefata Mîr Îmadeddîn de jî ti agahî nîne. Lê dîsa li gorî wan agahiyên ku Doskî dide, ew di sala 1060/1650'î de li heyatê bûye û di vê salê de êrîşek biriye ser mîrnişîniya Behdînan. Ji gotûbêja wî û Mela tê fêmkirin ku ew çûye Cizîrê û li cem Mela ders xwendiye.[93] Li gorî van agahiyan eleqeya vî Mîr Îmadedînî bi mîrên Cizîrê re nîne.

93 Selefî û Doskî, *Mu'cem*, r. 75-76.

CamScanner ile tarandı

1.2.1.3. Gotûbêja Melayê Cizîrî Digel Feqiyê Teyran

Ev menzûme jî ji gotûbêja (muşa'ere/diyalog) Mela digel Feqiyê Teyran pêk hatiye. Di vê gotûbêjê de Feqî 12 bend, Mela jî 11 bend gotine. Li gorî hinek nusxeyên dî Feqî 25, Mela jî 25 bend gotine.

Gotûbêj bi van bendan dest pê dike:

Gotina Feqî
Selama min heqîrî
Sedefek divê tê kin
Iroke li Cizirê
Heq e ku Ii Melê kin
Helakên ji derba tîrê
Çi derman heye lê kin

Gotina Mela
Selamên milyaketan
Bê hedd û bê hisêb in
Şibhetê avên şetan
Ji Mela li Mîm û Hê bin
Helakên ji zehmetan
Derman ji lam û bê bin

Gotûbêj bi van bendan diqede:

Gotina Feqî
Birîndarê 'işqê me
Dûr im ji siha bihan
Dizanim meddahê kê me
Di hezar û yek û sihan
Senaxwanê Melê me
Li hemû erd û cihan

CamScanner ile tarandı

Gotina Mela

Çendî ku digerihim
Dikêşim sebr û hîrê
Şibhetê çeng û jeh im
Helak im ji derba tîrê
Senaxwanê Feqeh im
Îroke di Cizirê

Feqiyê Teyran di metnê vê gotûbêjê de tarîxa muşa'ereyê bi awayekî aşîkar weha daye: "Dizanim meddahê kê me, di **hezar û yek û sihan".** Ji îfadeya "hezar û yek û sihan" mebest hezar û sih û yek e (1031) ku beramberî 1621'a mîladî tê. Ji vê benda Feqiyê Teyran aşîkar tê fêmkirin ku Mela di sala 1621ê de li heyatê bûye.

1.2.1.4. Menzûmeya Ellah Sehergaha Ezel

"Ellah Sehergaha Ezel" îfadeya destpêkê ya vê menzûmeyê ye ku beyta pêşî ya vê menzûmeyê weha ye:

Ellah Sehergaha Ezel yelmûmê işqê şu'le da
Nûra cemala lem yezel zatê tecellaya xwe da

Ev menzûme ji 284 beytan pêk hatiye û di dawiya dîwanê de hatiye çapkirin. Menzûme ji aliyê naverokê ve hin mijarên felsefî di xwe de dihewîne.

Herçiqas ev menzûme ji aliyê teşeyê ve "qesîde" jî be, ji ber ku di qewareya menzûmeyeke serbixwe de ye, me ew ne wekî qesîdeyek ji qesîdeyên dîwanê, wekî menzûmeyeke serbixwe hesab kir.

1.2.2. Destpêkirina Helbestê

Derheqê destpêkirina Mela ji bo helbestê hinek şîrove hatine kirin.[94] Mela di hinek beytên xwe de behsa hinek salan

94 Selefî û Doskî, *Mu'cem*, r. 65.

CamScanner ile tarandı

kiriye. Mesela di vê beyta jêrîn de behsa 30 salî kiriye ku wekî îhtîmalekê mirov dikare bêje Mela ev beyt di 30 saliya xwe de hûnandiye. (1005/1596)

Sih sale ji derd û ji belayê te hilakîn
Hetta bi felek her diretin ahû ehê min

Ji vê beyta jêrîn jî tê fêmkirin ku dema Mela ev beyt nivîsandiye 40 sali bûye. Yani di sala 1015/1606an de ev helbest nivîsandiye:

Turkê xûnrîz û xumarî me bi yek xemzeyekê
Zuhdê çilsale li min zîr û zeber kir ji esas

Dema ku ev beyta jêrîn jî nivîsandiye 66 salî bûye. Lewra bêjeya Ellah bi hesabê Ebcedê jimareya 66an nîşan dide.

Ellah li min heyat e çi şeker û nebat e
Ji nû ve dê cuwan bim ger bêhn bikim gula geş

Dîsa bi hesabê Ebcedê derdikeve holê ku Mela ev misrayên li jêrê di tarîxa 1 Muherrem 1041 (29 Temmûz 1631)'ê de nivîsandiye:

Lew elîf tên me di herfên falan
Ku li şiklê reqemê sersalan
Tu wî murada me ji ererbalan

Li vir peyva "reqem"ê beramberî 340, peyva "şikl"ê beramberî 350 û peyva "sersal"ê beramberî 351ê tê ku kojima wan dike 1041. Ev jî beramberî 1631ê mîladî tê.

CamScanner ile tarandı

1.2.3. Bîbliyografyaya Dîwana Melayê Cizîrî

Dîwana Mela ji aliyê belavbûna di nav Kurdan de di pileya yekem de ye. Ji ber vê yekê jî gelek destnivîs, çap, şerh û wergerên dîwana wî hene. Herweha derheqê Mela û dîwana wî de gelek lêkolîn jî hatine kirin. Mirov dikare bêje ku di edebiyata Kurdî de ji aliyê bîbliyografya û lîteraturê ve, dîwana Mela û Mem û Zîna Ehmedê Xanî di asta herî bilind de ne.

Ji bilî yên ku di destên şexsan de hene, hin ji destnivîsên dîwana wî li pirtûkxaneyên Îngilistan (Bodileian), Almanya (Marburg), Ermenistan (Erivanê), Stenbol û Ankarayê tên parastin. Destnivîsa herî kevin a mîrê Amêdiyê M. Tayyar Paşa (k.d.1231/1819) ye ku di sala 1815an de îstînsax kiriye.

1.2.3.1. Çapên Dîwana Melayê Cizîrî

Dîwana Mela, gelek caran hatiye çapkirin. Li jêrê em dê bi awayekî kronolojîk cih bidin çapên dîwana Mela.

1. Dîwana Mela cara pêşî di sala 1904an de li Berlînê (Almanya) ji aliyê Martin Hartmann ve bi navê "Der Kurdische Diwan Des Schech Ahmed" hatiye çapkirin (Weşanxane: S. Calvary&Co.).
2. Cara duyem di sala 1337/1919an de li Stenbolê ji aliyê M. Şefîq Erwasî û Evdirehim Rehmî ve hatiye çapkirin.
3. Di navbera salên 1941-1943yan de ji aliyê Qedrî Cemil Paşa ve li Şamê di kovara Hawarê de (hej. 35-58) qismen hatiye weşandin.
4. Li Helebê di sala 1940î de hatiye çapkirin.
5. Di sala 1964an de li Hewlêrê ji aliyê Gîwî Mukriyanî ve hatiye çapkirin.
6. Li Qahîreyê ji aliyê Mihemed Nûrî ve bi navê "Dîwanu'ş-Şeyxi'l-Cezerî" hatiye çapkirin (bêtarîx).
7. Di sala 1977an de li Bexdayê ji aliyê Sadiq Behaedîn Amêdî ve hatiye çapkirin.
8. Di sala 1981ê de li Tehranê ji aliyê Mamoste Hejar ve hatiye çap kirin.

CamScanner ile tarandı

9. Di sala 1987an de ji li Swêdê ji aliyê Zeynelabidîn Kaya û M. Emîn Narozî ve hatiye çapkirin (Weş. Roja Nû). Dîwana Mela yekem car bi herfên latnî hat çapkirin.
10. Di sala 1992yan de li Stenbolê ji aliyê Zeynelabidîn Zinar ve hatiye çapkirin (Weş. Fırat). Dîwana Mela yekem car bi herfên latînî gihîşte ber destê Kurdên bakûr.
11. Di sala 2000î li Dihokê ji aliyê Tehsîn Î. Doskî ve hatiye çapkirin (Weş. Spîrêz)
12. Di sala 2004an ji aliyê Arif Zêrevan ve li Stockholmê hatiye çapkirin (Weş. Nefel).
13. Di sala 2008an de li Stenbolê ji aliyê Selman Dilovan ve bi herfên latînî hatiye çapkirin. (Weş. Nûbihar).
14. Di sala 2013an de li Stenbolê ji aliyê Tehsîn Î. Doskî ve bi herfên Erebî hatiye çapkirin (Weş. Nûbihar)
15. Weşanxaneya Wezareta Çandê di sala 2013an de li ber çapên Nûbiharê (latînîzekirina Selman Dilovan û wergera Osman Tunç) digel destnivîsa ku Hartman çapkiribû ji nû ve çap kiriye.

1.2.3.2. Şerhên Dîwana Mela

Li ser dîwana Mela gelek şerh hatine çêkirin. Ew kesên ku dîwana Mela şerh kirine ev in:

1.2.3.2.1. Mela Yehyayê Mizûrî

Bi qasî ku tê zanîn yekem kesê ku di warê şerha dîwana Mela de gav avêtiye Mela Yehyayê Mizûrî (1772-1836) ye. Mela Yehya melayekî medreseya Qubehanê ya li Amêdiyê bûye. Wî şerha qesîdeya "Muxbeçeyên meyfiroş" bi Farisi kiriye.

1.2.3.2.2. Seyîd Ehmedê Kilirmanî

Seyîd Ehmedê Kilirmanî xelkê Kurdistana Başûr e. Mirîdê Şêx Nureddînê Birifkanî (1792-1851) ye. Wî jî bi Erebî û Farisî şerha qesîdeyeke Mela çêkiriye.

CamScanner ile tarandı

1.2.3.2.3. Şêx Qedriyê Kurê Hesen

Şêx Qedrî miftiyê Cizirê bûye. Di sala 1947an de koçî dawiyê kiriye. Şêx Qedrî beşek ji dîwana Mela bi Erebî şerh kiriye.

1.2.3.2.4. Mela Ebdurrehîmê Westanî

Mela Ebdurehîm digel ku bi eslê xwe ji Westana Wanê bûye, piştî şerê cîhanê yê yekem koçî Cizîra Botan kiriye û li wir bi cih bûye. Bi qasî ku tê zanîn yekem şerha tekûz a dîwana Mela şerha wî ye. Wî di sala 1958an de şerha xwe bi sê zimanan (Tirkî, Erebî, Farisî) çêkiriye. Şerha wî destnivîs e û têbînî û şîrove hem li dora metnê dîwanê hem jî li ser kaxezên sipî hatine nivîsandin. Ev kaxez bi rûpelên dîwanê ve hatine zeliqandin.

1.2.3.2.5. Mela Abdusselam Nacî

Mela Abdusselam Nacî (1878-1952) ji Cizîrê ye, navê bavê wî Mirad e. şerha Mela Abdusselam bi zimanê Erebî ye û yekemîn şerha bi rêkûpêk e. Berhem di sala 2004an de ji aliyê weşanxaneya Spîrêzê ve hatiye çapkirin.

1.2.3.2.6. Mela Ehmedê Zivingî

Mela Ehmedê Zivîngî (k.d.1971) jî şerha xwe bi Erebî çêkiriye. Zivingî ji şerha Mela Ebdusselam Nacî jî sûd wergirtiye û şerheke tekûz û bi mefa amade kiriye. Şerha wî di sala 1959an de bi navê "el-Iqdu'l-Cewherî fi Şerhî Dîwanî Şeyxi'l-Cezerî" di nav du bergan de li Sûrî çap bûye û di vî warî de yekem e. Ji roja ku hatiye çapkirin ve ji bo fêmkirina metnê dîwana Mela bûye çavkaniya sereke. Lê ji ber ku zimanê wê Erebî bû, derveyî kesên Erebîzan û melayên medreseyan herkesî nedikarî ji wê şerê sûd wergirin. Herî dawî M. Emîn Narozî wergera wê ya bi Kurdiya Kurmancî çêkir û ev werger bi navê "Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî" di nav weşanên Avestayê de derket (sal:2013)

CamScanner ile tarandı

1.2.3.2.7. Ebdurrehman Şerefkendî (Hejar)

Şerha Ebdurrehman Şerefkendî (1921-1991) ya bi navê Dîwanî Arifî Rebbanî Şêx Ehmedî Cizîrî Meşhûr be Melayê Cizîrî" bi qasî ku em dizanin yegane şerha bi Kurdiya Soranî ye. Ev şerh, bi rêkûpêk e û di sala 1361ê de li Tehranê bi yekbergî hatiye çapkirin.

1.2.3.2.8. Cegerxwîn

Cegerxwîn (k.d.1984) jî bi Kurdiya Kurmancî şerheke dîwana Mela çêkiriye.

1.2.3.2.9. Abdulmükit Septioğlu

Abdulmükit Septioğlu bi navê "Melayê Cizîrî Dîvani'nin Şerhi" beşek ji helbestên Mela bi Tirkî şerh kiriye. Berhem di sala 2005an de ji nav weşanên Nûbiharê derketiye.

1.2.3.2.10. Celalettin Yöyler

Celalettîn Yöyler yekemîn car bi Kurdiya Kurmancî û bi herfên latînî şerheke dîwana mela amade kiriye. Berhema bi navê "Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî" di sala 2006an de ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hatiye çapkirin.

1.2.3.2.11. Mihemed Emîn Doskî

Mihemed Emîn Doskî, bi Kurmanciya başûr û bi herfên Erebî dîwana Mela şîrove kiriye. Ji aliyê hecmê ve ji yên dî berfirehtir e (4 berg). Berhema bi navê "Şîrovekirina Dîwana Melayê Cizîrî" li Dihokê di nav weşanxaneya Spîrêzê de weşiya (2008).

1.2.3.2.12. Abdulbaki Turan

Abdulbaki Turan, dîwana Mela bi perspektîfa pisporekî zanistên dînî û tesewifê dîwana mela şerh kiriye. Şerha wî bi Tirkî ye û di sala 2012an de ji aliyê weşanxaneya Nûbiharê ve bi navê "Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi" hatiye çapkirin.

CamScanner ile tarandı

Ji bilî van kesan gelek kesên ku helbestên Mela yek yek şerh kirine jî hene.

1.2.3.3. Wergerên Dîwana Mela

Bi qasî ku tê zanîn dîwana Mela bi Rûsî û Tirkî hatiye wergerandin.

1.2.3.3.1. Kerîmî Eyyûbî

Kerîmî Eyyûbî, digel pêşgotineke direj dîwana Mela bi navê "Dîvan Gazêlêy" wergerandiye Rûsî. (St. Petersbûrg 1994)

1.2.3.3.2. Osman Tunç

Osman Tunç, bi awayekî serkeftî dîwana Mela wergerandiye Tirkî. Ev werger ji bo Tirkîzanan bûye çavkaniyeke sereke. Werger, cara pêşî di nav weşanên Nûbiharê de derket. Herî dawî heman werger di nav weşanên wezareta çandê ya Tirkiyeyê de weşiya.

1.2.3.4. Lêkolînên li ser Dîwana Mela

Hinek lêkolînên li ser dîwana Mela ev in:

1. Me'rûf Xeznedar, Melayê Cizîrî Şitêk Derbarey Jiyan û Berhemî, Hewlêr 1990

2. Nayîf Tahir Mîkaîl, eş-Şeyxu'l-Cezerî Nehcuhu we Eqîdetuhu min Xîlalî Dîwanîhi'ş-Şi'rî, Spîrêz, Dihok 2005.

3. Muhammed Halid Cemil, Melayê Cizîrî Sevgi ve Güzelliğin Şairi (wer. Ümit Demirhan), Hivda İstanbul 2008.

4. Muhemmed Emîn ed-Doskî, Felsefetu'l-Işqi'l-Îlahî, Akademiyî Kurdî, Erbîl 2010.

5. Nesim Doru, Melayê Cizîrî Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri, Nûbihar, Istanbul 2012.

CamScanner ile tarandı

1.2.4. Cihê Melayê Cizîrî di Tarîxa Edebiyata Kurdî de

Melayê Cizîrî, ne tenê di Kurdiya kurmancî de, di çarçoveya edebiyata Kurdî tevî de helbestvanê herî girîng tê hesibandin. Ev girîngiya wî ya ku ji dîwana wî tê, di du xalan de xwe nîşan dide:

1. Di edebiyata Kurdî de cara ewil Melayê Cizîrî, li gorî krîterên edebiyata rojhilatê, bi taybetî ya Îranê dîwaneke muretteb nivîsandiye. Bi gotineke dî dîwana Melayê Cizîrî, yekem dîwana muretteb a bi Kurdî ye ku gihîştiye roja me. Di nav zaravayên dî de jî berî Mela, dîwaneke bi rêk û pêk û muretteb ne hatiye nivîsandin. Ev qidema Melayê Cizîrî, cihê wî di tarîxa edebiyata Kurdî de bêhemta dike.

2. Dîwana Melayê Cizîrî ji aliyê çêja edebî, hêz û qeweta vegotinê û taybetiyên dî ve di nav edebiyata Kurdan de di dereca yekê de ye. Di nav Ereban de îbnu'l-Farid, di nav Farisan de Hafizê Şîrazî û di nav Tirkan de Fuzûlî çi be, Melayê Cizîrî jî di nav Kurdan de ew e. Dîwana Mela digel ku yekem e jî, di asteke gelekî bilind de hatiye nivîsandin.

Ji bo ku derbareyê girîngiya dîwana Mela de fikrekê bide me, li jêrê em dê cih bidin pêşgotin û xatîmeya M. Şefiq Erwasî û medhiyeyeke Ebdurehîm Rehmiyê Hekkarî ku di çapa dîwanê ya dema Osmaniyan (1337/1922) de hatine weşandin.[95]

Pêşgotina Tabi'ê Dîwana Melayê Cizîrî M. Şefiq Erwasî

Şem'ê ser nûr nadirit ger ew nekit perhîzê dil
Zewqê cama 'ışqê nakit ger nekit imsakê rûh

"Me'rûd û me'lûm bit ji bo temamê yar û biran. Eger çi zehf qiymetdar û nadîde edebiyatê Kurdiyye hene, lakin ji hemyan mumtaz û namdar dîwana puxtiyê agirê işqa ezelî û têhniyê

95 Şêx Ehmed el-Cezerî, *Dîwana Cizîrî*, (Amdk. M. Şefiq el-Erwasî el-Huseynî), Ewqaf-ı İslamiyye Mat., İst. 1337, r. 2, 96.

CamScanner ile tarandı

nûra cemala lemyezelî Şêx Ehmed el-Cezerî ye. Lewra bi i'tîbar me'nayê xwe çawan xayet nefîs û bê hemta ye û muştemil e li ser heqayiq, deqayiq, îşaratê kesîre; wisan di menzûmat, ibaratê wê da jî uslûbekî alîbelaxetî şu'ledar e. Hetta şîrînî, helawet û teraweta di nezm û kelîmatê wê da heyî ji emsalê dîwana Îbnu Farid û dîwana Hafizê Şîrazî faîq û zêdetir nebit, kêmtir jî nehin. Çawan ku di axirê qesîdekkê de gotiye,

Ger lu'luê mensûrî ji nezmê tu dixwazî
Wer şi'rê Melê bîn te bi Şîrazî çi hacet

Wexta ku teb' û neşrkirina vê dîwanê min ji bo miletê xwe xizmet dizanî û ji bo xwe jî feyzekî me'newî hesab dikir, eger çi hal û zeman jî musa'id nebûn lakin bi 'ewn û 'inayeta Xwedayê Te'ala me dest teb'kirina wê kir."

M. Şefiq el-Erwasî el-Huseynî

Xatîme

"Bi tewfîqa Xuda rabbê Te'ala temam bû tab'kirina dîwana Cezerî di sala hezar û sêsad û sih û heştan, di meha Nîsan û Şe'banê da. Xudayê Te'ala neşr û nef'a wê 'am bike ji bo temam biraê me û bigerînî xalis ji bo xwe. Ya Rebbena tu bi qedrê zat û sıfatê xwe kî, tû rûhaniyeta 'uşşaq û ewliyaê xwe bigerînî wesîle ji bo hişyarbûna ji xwea xefletê û hisseyek ji muhabbeta cemala xwe yê zatî jî nasîbê me bikî. Amîn, bicahî seyydi'l-murselîn." Ş. Q.

Şîrazî li nav fursan kêşa 'elema 'ışqê
Mela! Te bire ewcan Hafız bike pê meşqê

Lakin bi kirasek dî nûr û şefeqek tê da
Dîbayekî Kurmancî raçand di Cizîrê da

Mela te wekî Hafız Firdewsî te kir ustad
Hem 'ışq ji nû hilkir Kurmancî te kir îcad

CamScanner ile tarandı

Polê di zexel Kurdî te bi yek nezerê zer kir
Mala ku feqîr mayî tijî dur û gewher kir

Kurmanc divê her dem fexrê bi te kin el-Heq
Lakin tu ku Mansûrî rutba te bû "Ene'l-Heq"

(Ji mala Hekkariya Ebdurehîm Rehmî)

1.2.5. Helbestvanê Patronajê

Di edebiyata Kurdî de yekem helbestvanê ku di bin hîmayeya desthilatdarekî de dîwanek nivîsandiye Melayê Cizîrî ye. Li gorî vê sistema ku berî Kurdan li cem Faris û Tirkan di rewacê de bû, desthilatdar hamî yan jî patron e û bi taybetî ji aliyê malî ve xwedîtiyê li helbestvan dike, da ku hunerê xwe derxe meydanê û pêşkêş bike. Melayê Cizîrî jî di bin hîmayeya mîrên Cizîra Botan de jiyaye û di nezdê wan de qîmetekî wî yê mezin hebûye û ji ber vê yekê jî di goristana taybet a mîrên Cizîrê de hatiye veşartin. Mela, di dîwana xwe de du helbestên xwe pêşkêşî hamiyê xwe mîrê Cizîrê kirine ku metle'ên wan ev in:

Ey şehînşahê mu'ezzem, Heq nigehdarê te bî
Sureyê "înna Fetehna" dor û madarê te bî

Xanê xanan lamiê necma te her pur nûr(i) bî
Keştiya bextê te ez bayê muxalif dûr(i) bî

1.2.6. Terzê Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî, di edebiyata kurdî de nûnerê terzê xezelê ye. Dîwana wî bi piranî ji xezelan pêk tê. Wî hem xezelên rindane, hem yên şûxane, hem yên hekîmane, hem yên sûfiyane nivîsandine. Mela di terzê xwe de bi taybetî di bin bandora Hafizê Şîrazî de maye ku ev bi awayekî aşîkar ji dîwana wî derdikeve holê. Herweha Mela di dîwana xwe de ji edîbên Farisan behsa Se'dê Şîrazî û Ferruxî jî kiriye.

CamScanner ile tarandı

Bêguman eger Mela di edebiyata Kurdiya Kurmancî de nûnerê xezelê be, Ehmedê Xanî (1651-1707) jî nûnerê mesnewiyên evînî ye. Her du di edebiyata Kurdî de du sitûnên qewî ne. Mela bi dîwana xwe, Xanî ji bi "Mem û Zîn"a xwe, di serî de ne. Xanî bi xwe di kontekstekê girîng de Mela di dereceya yekem de nîşan daye.

Ger dê hebûya me jî xudanek
Sahibkeremek letîfedanek

Min dê elema kelamê mewzûn
Alî bikira li banê gerdûn

Bînave rihê Melê Cizîrî
Pê hey bikira Elî Herîrî

Keyfek we bida Feqîhê Teyran
Hetta bi ebed bi mayî heyran

(Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*)

1.2.7. Ekola Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî, di edebiyata Kurdî de ekola tesewifê temsîl dike, bi gotineke dî ew helbestvanekî mutesewif e. Lê digel vê jî ew ne nûnerê edebiyata tekyayê ye. Lewra di dîwana wî de derheqê tekya û pîrê tekyayê de helbest peyda nabin. Tesewifa li cem Mela, tesewifa felsefî ye ku di du xalan de di dîwana wî de reng vedaye.

1. Xala pêşî hizra wehdetu'l-wicûdê (yekîtîbûn) ye. Mela, di vê çarçoveyê de di dîwana xwe de cih daye navên çendîn feylesof û mutesewifên girîng ên wekî Me'rûfê Kerxî, Şiblî, Hellacê Mensûr û Iqlîdesê Yûnanî. Dîsa Mela di dîwana xwe de behsa hinek berhemên felsefî û nezerî jî kiriye ku ew jî ev in: "Gulşena Raz"a Mehmûdê Şebûsterî, "Şerha Lubabê" ya Şêx Ebdulxenî el-Meydanî, "Hikmetu'l-'Eyn"a Muhemmed Zekeriya el-Qezwînî, (k.d.1283), "Keşşaf"a Zemexşerî (k.d.1144), "Qanûn"a Îbn Sîna û "Şîfa"ya wî.

CamScanner ile tarandı

Ev tev nîşan didin ku Mela çi rasterast çi ne rasterast ji van kesan û berhemên wan sûd wergirtiye û di bandora wan de maye. Eger mirov bêje hizra Mela ya tesewifî û felsefî li ser hizra tesewifî û felsefî ya ku ev kes temsîl dikin ava bûye dê ne şaş be.[96]

2. Xala duyem jî hizra evîna îlahî ye ku wekî eşqa heqîqî jî tê binavkirin. Herçiqas di xezelên Mela de yên şûxane hebin jî, bi giştî Mela, di çarçoveya nêrîna tesewifî de, hizra evîna îlahî diparêze. Lê Mela evîna mecazî ji bo gihîştina evîna heqîqî wekî pirekê dibîne.[97]

1.2.8. Bandora Melayê Cizîrî

Edebiyata Kurdiya Kurmancî di sedsala XVIan de destpêkiriye. Dîwana Mela jî, çawa ku me gotibû, ji bo edebiyata Kurdiya Kurmancî dîwana yekem e. Piştî Melayê Cizîrî bi taybetî di nav Kurdên kurmanc de di asta dîwana wî de dîwan nehatine nivîsandin.

Mela bi helbestên xwe tesîrek gelek mezin li ser yên pişt xwe kiriye. Lewra gelek helbestvanên ku piştî wî hatine, li ser helbestên wî texmîs û tesdîs nivîsandine. Wekî Laxer, Şêx Remazan, Şêx Nûredînê Birîfkanî, Şêx Tahayê Mayî, Teyar Paşayê Amêdî (k.d.1817), Xalid Beg, Halet (sedsala 19.), Mela Ehmed Nalbend, Ehmed, Ebdusselam Naci, Mehmûd Bilge, Pertew Begê Hekarî, Hacî Qadirê Koyî, Şêx Tahirê Şûşî (1336-1381), Seyîd Qedriyê Cizîrî, Cegerxwîn, Mesûd Mistefa Amêdî.[98]

2. FEQIYE TEYRAN

2.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Feqiyê Teyran helbestvanekî herî girîng ê sedsala XVI û XVIIan e. Ji vê helbesta wî ya jêrîn tê derxistin ku jidayîkbûna wî di sala 971ê hicrî/1563yê mîladî de ye. Lewra li gorî vê hel-

---

96 Ji bo aliyê Mela yê hizrî, tesewifî û felsefî bnr. Nesim Doru, *Melayê Cizîrî Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri*, Nûbihar, Istanbul 2012.

97 Ji bo mijara evîna îlahî li cem Mela bnr. Muhemmed Emîn ed-Doskî, *Felsefetu'l-Işqi'l-Îlahî*, Akademiyî Kurdî, Erbîl 2010.

98 Di warê bandora Mela de ji bo hinek mînakan bnr., Amêdî, b.n., r. 97-105.

CamScanner ile tarandı

bestê wî di heftê saliya xwe de (lewra ifadeya "heft felek", heftê salî îşaret dike.) di sala 1041ê de ev helbest nivîsandiye. Naxwe eger ew di sala 1041ê de heftê salî be, pêwist e ku ew di sala 971ê de hatibe dinyayê.

Mîm û Hê heft felek çûn
Ji hieretê dewran gelek çûn
Sal hezar û çil û yek çûn
Ev xezel anî diyare

Feqiyê Teyran ji devera Miksê ye. Di qeydeke bi Erebî de ku di dawiya menzûmeya wî ya bi metlaya"Dilo rabe dilo rabe veke çavan ku êvar e" de ji aliyê mustensixê menzûmeyê ve hatiye nivîsandin, navê Feqî û cihê jidayîkbûna wî weha hatiye îfadekirin:

"Navê Feqe, Mihemed e. Ji gundê Warezûrê ye û li wir hatiye dinyayê. Li gundê Şandîsê ku li ser qezaya Nemira ye hatiye veşartin. Heçî Warezûr e, ew jî li ser qezaya Miksê ye."[99]

Feqî, di vê helbesta xwe ya jêrîn de navê xwe weha bi kar aniye:

Gul im di destê xaran
Bi îsmê Mihemed nav im
Bilbil im di gulzaran
Ji işqê lew zerbav im
Di remza muhurdaran
Tu roj î ez hetav im

Navê bavê wî Ebdulah e. Di nav gel de wekî Feqiyê Teyran meşhûr bûye. Muhtemelen ji ber ku piştî feqîtiyê melatî nekiriye, navê feqîtiyê li ser maye. Dîsa muhtemelen ji ber ku ji teyran zehf hes kiriye û di helbestên xwe de zehf behsa wan kiriye, bi teyran ve hatiye nisbetkirin û jê re hatiye gotin "Feqiyê Teyran".

99 Bnr. Seîd Dêreşî, *Dîwana Feqiyê Teyran*, Lîs, Ankara 2011, Beşa Pêvekan.

CamScanner ile tarandı

Bi qasî ku hatiye gotin wî pêşî li Miksê di Medreseya Mîr Hesenê Welî de dest bi xwendina xwe kiriye û piraniya xwendina xwe li wê derê pêk aniye. Piştre ji wir çûye Finika Botan û ji wir jî çûye Cizîra Botan. Wê demê li Cizîrê Melayê Cizîrî dîtiye, li cem wî xwendiye û bi hevre hinek muşaere/gotûbêj gotine. Ev muşaere di dawiya dîwana Melayê Cizîrî de hatine çapkirin. Feqî, tarixa vê muşa'ereyê bi awayekî aşîkar weha daye:

Birîndarê işqê me
Dûr im ji siha bihan
Dizanim meddahê kê me
Di hezar û yek û sihan
Senaxanê Melê me
Li hemû erd û cihan

Ji îfadeya hezar û yek û sihan mebest hezar û sih û yek e (1031) ku beramberî 1621a mîladî tê. Ji vê benda Feqiyê Teyran bi awayekî aşkera tê fêmkirin ku Mela û Feqî di sala 1621ê de li heyatê bûne û di vê tarîxê de hev dîtine.[100]

Feqiyê Teyran di sala 1041/1632yan de li gundekî Xîzanê bi navê Şandîsê koçî dawiyê kiriye. Gora wî li wî gundî ye. Agahiya derheqê gora wî de hem di qeydeke bi Erebî ku di dawiya menzûmeya wî ya bi navê "Dilo Rabe" de ji aliyê mustensixê menzûmeyê ve hatiye nivîsandin de[101], hem jî di du salnameyên wîlayeta Bedlîsê de hatiye dayîn. Agahiyên ku di van salnameyan de hatine dayîn, herweha şohret û bandora Feqî jî nîşan didin. Li jêrê em cih didin wergera van agahiyan ku orjînalên wan bi Tirkiya Osmanî ne:

"..Li nahiyeya Uçumê li gundê Şandîsê Feqiyê Teyran ê ku di zimanên Farisî û Kurdî de xwediyê helbestên dilkêş û bihikmet e veşartî ye."[102]

---

100 M. Xalid Sadînî, *Mela Huseyn Bateyî Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2010, r. 13-63, Seîd Dêreşî, *Dîwana Feqiyê Teyran*, Lîs, Ankara 2011, r. 13-30.

101 Bnr. Seîd Dêreşî, *Dîwana Feqiyê Teyran*, Lîs, Ankara 2011, Beşa Pêvekan.

102 Bitlîs Vilayetine Mahsûs Salnamedir. İkinci Def'a. Sene-i Hicriye-i Kameriye: 1316, Bitlîs Vilayet Matbaası, r. 174.

CamScanner ile tarandı

"Li ziyaretgaha Şêx Teyran û Şêx Sînan ku di nav tixûbê Nahiyeya (Spayîrtê) de veşartî ne, rojên Înan û Duşeman ji her aliyî ve gelek ziyaretvan kom dibin."[103]

Ji van agahiyan tê fêmkirin ku piştî ku Feqî koçî dawiyê kiriye, hem helbestên wî di nav xelkê de belav bûne, hem jî gora wî ji aliyê xelkê ve her hefte rojên înan û duşeman bi awayekî nîzamî hatiye ziyaretkirin.

Şandîs di sala 1892yan de li ser nahiyeya Spayîrtê ye û di sala 1898an de li ser nahiyeya Uçumê ye. Niha hem Spayîrt, hem Uçum, hem jî Şandîs gund in û li ser qezaya Xîzanê ne.

Sala ku Feqî koçî dawiyê kiriye 1041ê hicrî ye ku beramberî 1632yê mîladî tê. Ev tarîx di nivîsteka kêla ber serî ya gora Feqî ku li Şandîsê ye bi zimanê Erebî hatiye nivîsandin ku kurdiya wê weha ye:

"Ev gora dilşad, rehmetî, bexşandî û mihtacê rehmeta Xwedê Mihemedê navdarê bi Feqehê Teyran e ku di sala 1041ê de koçî dawiyê kiriye."

Li gorî ku ji nivîstekên kêlên gora Feqî tê fêmkirin, gora Feqî, di sala 1117/1705an de, piştî koça Feqî ya dawiyê bi qasî 76 salan ji aliyê mîrê Xîzanê Mîr Huseyn ve hatiye avakirin. Mîr Huseyn di heman salê de li Xîzanê ji bo mesrefên gora Feqî weqfek jî saz kiriye û ji bo micêwirên gorê 50 qurûş ratib tayîn kiriye. Mîr Huseyn ji eşîra Nemira ye û bavê wî Mîr Şeref Beg jî mîrekî navdar bûye.[104]

2.2. Aliyê wî yê Edebî

2.2.1.Cihê wî di Tarîxa Edebiyata Kurdî de

Feqiyê Teyran jî wekî Melayê Cizîrî di dawiya sedsaa XVIem û destpêka sedsala XVIIem de jiyaye. Her du jî damezirînerên

103 Salname-i Vilayet-i Bitlîs, Birinci Def'a. 1310, r. 190.

104 Ji bo agahiyên berfireh derheqê gora Feqiyê Teyran de bnr. Mûfid Yüksel, Feka Teyran'ın Mezar Şahidesi, http://mufidyuksel.com/category/tarihe-notlarim; M. Xalid Sadînî, Feqiyê Teyran'ın Mezar Taşı Bulundu, http://www.ilkehaber.com/haber/feqiy-teyranin-mezartasi-bulundu-27816.htm; Abdurrahman Adak, Yusuf Baluken, Hayrullah Acar, "Gora Feqiyê Teyran (Faqah Tayrān's Tomb)", Kovara Nûbihar Akademî, I/1, s. 2014, r. 109-118.

CamScanner ile tarandı

edebiyata kurdiya kurmancî ne. Berhemên wan orjînal in û terzê wan cara pêşî ji aliyê wan ve hatiye bikaranîn. Dema ku Ehmedê Xanî jî pey wan re tê, her sê damezirînerên edebiyata kurdiya kurmancî temam dibin. Ji xwe Ehmedê Xanî di bin bandora wan de mezin bûye. Lewma Xanî di di "Mem û Zîn"ê de behsa wan kiriye. Xanî (1650-1707) di "Mem û Zîn"ê de ji helbestvanên berî xwe behsa 3 kesan kiriye ku du heb ji van Mela û Feqî ne, yê dî jî Eliyê Herîrî ye.

Bînave rihê Melê Cizîrî
Pê hey bikira Elî Herîrî

Keyfek we bida Feqîhê Teyran
Hetta bi ebed bimayî heyran

Herçiqas ji vê beyta Xanî tê fêmkirin ku Herîrî jî di kategoriya Mela û Feqî de ye, lê dema em li berhemên wan ên li ber destên me ne dinêrin, Herîrî nakeve kategoriya Mela û Feqî de.

Terzê Feqiyê Teyran

Feqiyê Teyran di nav helbestvanên klasîk de ji aliyê bikaranîna zimên ve zimanê xwerû û sade temsîl dike. Feqî di helbestên xwe de li gorî dema xwe zimanê gel, bi awayekî zelal û xwerû bikar aniye. Bêje û têgehên Erebî û Farisî di helbest û berhemên wî de hindik in. Gava hinek bêje û têgehên Erebî û Farisî xebitandine jî gelek caran hemwateyên wan ên Kurdî jî li pey wan bikaranîne.

Sotim bi nar û agirî
Zulmeta tarî û kûr e

Loma Feqî di navbera helbesta gelêrî û ya klasîk de wekî pirekê ye. Ew ji aliyê kêş, teşe û naverokê ve aîdê helbesta klasîk e. Lê ji aliyê zimanê xwerû û zelal ve aîdê helbesta gelêrî ye.

Eger mirov Feqî bi Melayê Cizîrî re muqayese bike, dê terzê wî baştir bê fêmkirin.

CamScanner ile tarandı

1. Zimanê Mela zimanekî giran e. Mela helbestên xwe di çarçoveya mezmûnên edebiyata klasîk de nivîsandine. Lê zimanê Feqî sade ye û wî mezmûnên edebiyata klasîk zêde bi kar neanîne. Hinek tiştên ku Mela bi beytekê behs bike, Feqî bi zimanê xwe yê herikbar bi dirêahî behsa wê kiriye. Mesela Mela di du beytan behsa bûyera Şêxê Sen'anî kiriye, ê Feqî menzûmeyeke serbixwe ji bo wê mijarê terxan kiriye.

2. Mela helbestên xwe li gorî pênaseya dîwanê nivîsandine û kom kirine. Yanî Mela helbestên li gorî rêza elîfbêya zimanê Erebî nivîsandine. Lê menzûme û helbestên Feqî bi pênaseya dîwanê ve ne negirêdayî ne.

3. Mela di çarçoveya mezmûnên edebiyata klasîk de dîwana xwe nivîsandiye. Lê Feqî li gorî mijaran menzûmeyên serbixwe nivîsandine.

Bandora Feqiyê Teyran

Feqiyê Teyran wekî helbestvanekî dameziriner ê edebiyata kurdiya kurmancî, ne guncaw e ku bandor li yên pey xwe nekiribe. Çawa ku li jorê jî derbas bû, Xanî di Mem û Zînê de behsa Feqî jî kiriye ku ev jî nîşan dide ku haya Xanî ji helbestên Feqiyê Teyran hebûye û bandora Feqî li ser Xanî çêbûye. Xanî piştî Feqî bi 19 salan hatiye dinyayê û aşîkar e ku bi helbestên Feqî mezin bûye.

Ji bilî Xanî hinek helbestvanên dî jî di bin bandora Feqî de mane. Feqe Reşîdê Hekkarî yê ku xwediyê berhema bi navê "Sirru'l-Mehşer"ê ye û Bekir Begê Erizî hem di bikaranîna zimanê sade de hem jî di bikaranîna mexlesê de li pey rêça Feqî çûne.

Lê bandora Feqî li gorî ya Mela bi sînor e. Mela û Xanî ji Feqî gelekî zêdetir bandor li helbestvanên pey xwe kirine.

Mexlesên Wî

Feqiyê Teyran jî wekî Melayê Cizîrî di helbestên xwe de sê mexles bi kar anîne. Carinan ji van her sê mexlesan du heb jê bi hev re (li pey hev) bi kar anîne. Li jêrê em dê cih bidin van her sê mexlesan.

CamScanner ile tarandı

1. Mîm û Hê: Mîm û Hê (م ح), li gorî rênivîsa Erebî her du herfên pêşî yên navê wî "Mihemed" in.

Ey **Mîm û Hê** *xweş defter e*
Herçî ji min ne bawer e
Ne j' ummeta Pêxember e
Ne laîqê şefa'etê

2. Miksî: Ji ber ku Feqiyê Teyran xelkê Miksê ye, di helbestên xwe de mexlesa "Miksî" jî bi kar aniye. Ji xwe ew wekî Mihemedê Miksî jî hatiye binavkirin.

Miksî *ji işqê sohtî ye*
Ev qewl bi şêx ve nohtiye
Halê xwe tê da gohtiye
Ji Xeyn û Lamê hicretê

3. Feqî: Ji ber ku wekî "feqî" meşhûr bûye, ev peyv jî di helbestên xwe de wekî mexles bi kar aniye.

Dê biçne nîva axekê
Perda turabê tarî ye
Feqî *dê rakit rahekê*
Bi mehdera wî barî ye
Bo çak û parsa b' carekê
L' cennet bikin serdarî ye

Bi qasî ku tê zanîn Feqiyê Teyran, di tarîxa edebiyata Kurmancî de yekem helbestvan e ku derheqê hinek çîrok û serpêhatiyên çanda tesewifî (wekî Bersîsê Abid, Şêxê Sen'anî) de menzûme nivîsandine. Ji bilî van menzûmeyan gelek helbestên wî yên curbicur jî hene. Li jêrê em dê li ser van menzûme û helbestên Feqiyê Teyran rawestin.

2.3. Berhemên wî

CamScanner ile tarandı

2.3.1. Menzûmeya Şêxê Sen'anî

Feqiyê Teyran menzûmeya Şêxê Sen'anî di sala 1030/1620î de nivîsandiye. Menzûme ji 362 bendan pêk tê. Menzûme behsa evîna şêxekî zahid ji bo keçeke Mesîhî ya Ermenî dike. Ev evîna wî dike ku Şêx tekya û mirîdên xwe terk bike û biçe welatê evîndara xwe. Di encamê de Şêx terka dînê xwe kiriye, xaç xistiye stûyê xwe û şivantiya berazên bavê mehbûba xwe kiriye. Piştî demekê dema ku Şêx digihe ruşda xwe, her du bi hev re Misliman dibin.

Menzûmeya Şêxê Sen'anî cara pêşî di sala 1965an de ji aliyê M. Rûdenko ve li Rûsyayê hatiye çapkirin. Heman berhem ji aliyê Memo Yetkin ve bi herfên latînî hat amadekirin û di sala 1986an de di nav weşanên Roja Nû de li Stokolmê hat çapkirin. "Şêxê Sen'anî" herî dawî ji aliyê M. Reşît Irgat ve di sala 1999an de di nav weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de li Stenbolê hat weşandin. Her weha di xebatên giştî yên li ser Feqî de jî ev menzûme cih digire.

Şêxê Sen'anî weha dest pê dike:
Guhdêrin nutqa aşiqî
Da ez bixûnim vê xetê
Hemd û senaya xaliqî
Subhan ji şahê qudretê

Şêxê Sen'anî weha diqede:
Miksî ji 'işqê sohtî ye
Ew qewl bi şêx ve nohtiye
Halê xwe tê da gohtiye
Ji xeyn û lamê di hîcretê

2.3.2. Menzûmeya Bersîsê Abid

Menzûmeya "Bersîsê Abid", derheqê abid û zahidekî Îsraîlî bi navê Bersîs de ye ku işqa mecazî ew ji ya heqîqî dûr xistiye. Menzûme cara pêşî ji aliyê Ebdureqîb Yûsif ve di rojnameya

CamScanner ile tarandı

Hawkarî û di kovara Nûserî Kurd de hatiye nasandin û piştre dîsa ji aliyê wî ve di sala 2001ê de wekî kitêbekê hatiye çapkirin. Menzûmeya ku ji 211 bendan pêk hatiye weha dest pê dike û diqede:

Benda pêşî:

Guh bidne pîrê deftera
Da ez bixwînim vê xetê
Me'zen bibî baxo me ra
Li cindiyê di xizmetê

Benda dawî:

Fi'la xirab xudbînî ye
'Ucbê mekin li dînî ye
Derba serast sekîniye
Ji derwêşî û heqaretê

2.3.3. Menzûmeya Zembîlfiroş

Menzûmeyeke dî ya Feqiyê Teyran menzûmeya Zembîlfiroş e. Zembîlfiroş bûyereke evînî ye ku di navbera Zembîlfiroş û Gulxatûnê de û bi îhtîmaleke mezin di dema Merwaniyan de li bajarê Farqînê qewimiye.[105] Di edebiyata Kurdî de di nivîsandina menzûmeyên wekî Zembîlfiroşê yên ku bingehên xwe ji folklorê digirin de dewlemendiyek heye. Zembîlfiroş jî berhemeke wisa ye û ji aliyê gelek kesan ve derbasî nivîsê bûye. Bi qasî ku tê zanîn ji van kesan ê pêşî Feqiyê Teyran e. Piştî Feqiyê Teyran Melayê Bateyî û Miradxanê Bazîdî jî menzûmeyên Zembîlfiroşê nivîsandine. Zembîlfiroşa Feqî ji 65 bendan pêk tê. Li jêrê em dê cih bidin bendên pêşî û dawiyê.

105 Di vî warî de bnr. Aziz Samur, *Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê*, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, t.ç, Mardin 2012.

CamScanner ile tarandı

Benda pêşî:

Ey dil were dîsa bicoş
Carek ji cama mey binoş
Bêjim qisa Zembîlfiroş
Da seh bikin hîkayetê

Benda dawî:

Ey Mîm û Hê xweş defter e
Herçî ji min ne bawer e
Ne j' ummeta Pêxember e
Ne laîqê şefa'etê

2.3.4. Menzûmeya Dimdimê

Dimdim li Kurdistana rojhilat kelehek e ku ji aliyê mîrê Biradostan Emîr Xanê Biradostî (Xanê Lepzêrîn) ve li cem çiyayên Dimdimê hatiye damezirandin. Di sala 1610an de di navbera Kurdên wê kelehê û şahê Îranê Şah Ebasde şerekî dijwar qewimiye û di encamê de kurdên wê kelehê tev telef bûne û hatine kuştin. Bûyer hem ji aliyê dengbêjan ve hatiye gotin, hem jî di teşeyea edebiyata klasîk de hatiye nivîsandin. Nûnerê ku ev bûyer di teşeyê edebiyata klasîk de nivîsiye Feqiyê Teyran e. Menzûmeya Dimdimê ji 67 bendan pêk tê. Li jêrê em dê cih bidin bendên pêşî û dawiyê.

Du bendên pêşî:

Helal kirye Tahayê
Mezhebê ve b' kêr nayê
Em dimirin naêne rayê
Axret xoştir e ji dinyayê
Qeda l' dunyayê b' kevî
Dê rûreş bin l' nik Nebî
Qebûl nekin vî mezhebî
Hemyan go: Belave bî

CamScanner ile tarandı

Du bendên dawî:

Wan hemî rûsipî bin
Muqîm li nik Nebî bin
Di cennetê baqî bin
Mehderçiyê Feqî bin

Di paşî wan qisan ra
Ji nebî û ewliyan ra
Ji Mîm û Hê û Xan ra
Fat'he ji rihê wan ra

2.3.5. Helbestên Curbicur

Feqiyê Teyran ji bilî van menzûmeyên li jorê gelek helbest jî nivîsandine. Wî di van helbestên xwe de cih daye mijarên wekî evîn, şîn, teyr û tebî'etê. Wekî "Ey Av û Av", Îro Ji Dest Husna Hebîb", "Feqe û Bilbil, "Dilo Rabe", "Îro Werin Lêzim Werin" û hwd.[106]

Bîbliyografyaya Feqiyê Teyran

Helbest û menzûmeyên Feqiyê Teyran di demên curbicur de ji aliyê lêkolîneran ve hatine komkirin û çapkirin. Ev helbest û menzûme cara pêşî ji aliyê Seîd Dêreşî ve hatine komkirin û di sala 1989an de li Bexdayê û di sala 2005an de li Dihokê (weşanxaneya Spîrêzê) hatine çapkirin.

Helbestên Feqiyê Teyran ji aliyê Kurdên Bakur ve li Tirkiyeyê, di sala 1999an de bi navê "Ey Avê Av-Şêxê Sen'anî" ji aliyê M. Reşît Irgat û Ismet Kiliçaslan ve hatin weşandin (Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 1999 Stenbol). Piştre di sala 2000î de ji aliyê Xalid Sadînî ve bi navê "Feqiyê Teyran" li Stenbolê di nav weşanxaneya Nûbiharê de li ser Feqî berhemek hat çapkirin. Vê berhema ku hem jînenîgarî, hem jî helbestên Feqî di xwe de dihewandin, di nasandina Feqî de roleke

106 Ji bo helbest û menzûmeyên Feqiyê Teyran bnr. Dêreşî, *Dîwana Feqiyê Teyran*; Sadînî, *Feqiyê Teyran*.

CamScanner ile tarandı

girîng leyîst. Loma jî ev berhem gelek caran hat çapkirin. (çapa yekem 2000, çapa şeşem 2012.).

Xebata Dêreşî di sala 2011ê de ji aliyê weşanxaneya Lîsê ve li Diyarbekirê bi tîpên latînî jî hat çapkirin.

Helbestên Feqî, bi navê "Feqiyê Teyran Hemû Berhemên Wî" di nav weşanxaneya Belkî de di sala 2008an de hatin weşandin.

3. MÎR ÎMADEDÎNÊ HEKKARÎ

3. 1. Zanyariyên Nasnameya wî

Mîr Îmadedînê Hekkarî hemdem û hevalê Melayê Cizîrî ye. Anko ew jî helbestvanê sedsala XVI û XVIIan e. Ev tişt ji gotûbêja (muşa'ere) wî ya digel Melayê Cizîrî derdikevê meydanê. Lewra ji bo ku gotûbêj çêbe lazim e her du helbestvan hevçerxê hev bin. Ev gotûbêj di dawiya dîwana Melayê Cizîrî de cih girtiye.

Ji ber hebûna vê gotûbêja di navbera her duyan de, di nav ehlê medreseyan de hatiye zenkirin ku Mîr Îmadeddîn jî wekî Mela ji Cizîrê ye. Li gorî vê nêrînê ew yan bira yan jî kurê Mîr Şerefê ku Mela di dîwana xwe de pesnê wî daye. Heta niha tiştên ku derheqê Mîr Îmadedîn de dihate zanîn ev bû. Lê hinek agahiyên ku vê dawiyê Tehsîn Îbrahîm Doskî di hinek destnivîsan de dîtin, nêrînên derheqê jiyana Mîr Îmadedîn de zelaltir kirin. Li gorî van agahiyan helbestvanê me ji malbata Şenbû, anko ji malbata mîrên Hekkariya ye û Ebbasî ye.

Dîsa li gorî agahiyên ku Doskî dane, hinek çavkanî dibêjin ku Şerefxanê mîrê Colemêrgê di sala 1049/1640î de wefat kiriye, lê hinek çavkanî jî dibêjin ku ew di sala 1060/1650'î de hê li heyatê bûye û di vê salê de êrîşek biriye ser mîrnişîniya Behdînan.[107]

Ji ifadeya wî ku dibêje "Şêx Ehmed me ustad e" ku di gotûbêja wî û Mela de derbas dibe, tê fêmkirin ku ew çûye Cizîrê û li cem Mela ders xwendiye.

---

107 Selefî û Doskî, *Mu'cem*, r. 77.

CamScanner ile tarandı

3.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Ji bilî gotûbêja Mîr Îmadedîn ya digel Mela berhemên yên dî di destê me de nînin. Lê ji vê berhema wî tê fêmkirin ku Mîr Îmadeddînê Hekkarî helbestvanekî bihêz e û lazim e helbestên wî yên ku negihîştine me hebin.

C. SEDSALA HIVDEHEM (SEDSAL: XVII)

Di dawiya sedsala şazdeh û destpêka sedsala hivdehan de ji aliyê Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran ve di warê xezel û menzûmeyên tesewifî de bingeh hatibû avêtin. Îcar di sedsala hivdehan de jî di hinek warên dî de bingeh hatiye avêtin. Ehmedê Xanî di warê mesnewiyên evînî û mesnewiyên dîdaktîk ên derheqê ferhengnasî û zanistên dînî de bingeheke baş avêtiye û digel Mela û Feqî edebiyata Kurdî ya klasîk saz kirine. Di vê sedsalê de Şêx Şemsedînê Exlatî, wekî şêxekî terîqeta Xelwetî di warê helbesta tekyayê û remzî de pêşengî kiriye. Bi vî awayî Xanî û Exlatî wekî du nûnerên herî girîng ên vê sedsalê derdikevîn pêş. Lê ji bilî Xanî û Xelwetî hinek nûnerên dî yên edebiyata Kurdiya Kurmancî yên wekî Remezanê Cizîrî, Axaokê Bêdarî, Laxer û Mela Remezanê Ebbasî jî derketine meydanê ku mirov dikare peyrewiya Melayê Ciziri hê di wê demê de bi van kesan bide destpêkirin.

Sedsala hivdehan di warê pexşana Kurdî de jî sedsala destpêkê ye ku nûnerê pexşana Kurdî yê yekem Eliyê Teremaxî di vê sedsalê de jiyaye. Mirov dikare bêje ku di sedsala hivdehan de edebiyata Kurdiya Kurmancî ya klasîk bi her awayî dameziriîna xwe temam kiriye.

CamScanner ile tarandı

1. DI SEDSALA HIVDEHEM DE NEZM/ HELBESTA KURDÎ

1.1. ŞÊX ŞEMSEDÎNÊ QUTBÊ EXLATÎ

1.1.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî di sala 997/1588an de li Xelatê/ Exlatê hatiye dinyayê. Malbata wî malbateke dîrokî û tesewifî ye ku xelekezincîra wan digihije heta bi Cenabê Pêxember. Binerîha wan ji Şêx Şemsedîn heta bi Cenabê Pêxember weha ye:

Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî, Seyyid Ebdurehman, Seyyid Ebdulkerîmê Exlatî, Seyyid Mûsayê Exlatî, Silêmanê Exlatî, Ebdulxeniyê Exlatî, İshaqê Exlatî, Babamensûrê Exlatî, Şêx Huseynê Exlatî, Ebu'l-Hesen Eliyê Xelwetiyê Exlatî (k.d.781/1379 wefat kiriye.), Haci Nizamedînê Exlatî, Seyîd Ehmedê Exlatî, Zeynelabidîn Eliyê Zûrdanî Hemedanî Xoresanî Bozincirdî (Mîr bûye, k.d. 685), Salihê Hemedanî, Yûsifê Hemedanî, Eyûb, Mihemed Yusuf, Celaleddin Huseyn, Zeynelabidin, Ce'fer, Muhammed, Mehmûdî, Ehmed, Ebdullah, Elî, İmam Ce'fer, İmam Eli Hadi, İmam Muhammed Cevvad, Elî Rıza, Musa Kazım, Îmam Ce'fer, İmam Muhammed Bakır, Îmam Zeynelabîdin Elî Succad, Îmam Huseyn, Fatımetu'z-Zehra, Cenabê Muhemmed.

Seyîd Ehmedê Exlatiyê ku di rêza dozdehem de ye ji Hemedanê koçî Exlatê kiriye û li wir bi cih bûye. Ev Seyîd Ehmed bi terîqeta Suhrewerdiye ve girêdayî bûye. Şêx Huseynê Exlatiyê ku di rêza nehem de ye di sala 790/1388an de ji ber talana Cengizxan digel dozde hezar mirîdên xwe koçi Misrê kiriye û di sala 1405an de li wir koçî dawiyê kiriye.

Şêx Şemsedîn, pêşî li Exlatê li cem Seyîd Ebdulkerîm xwendiye. Piştre digel bavê xwe Seyîd Ebdurehman û birayê xwe Mihemed Emîn Xelat terk kirine û li wir di dema Mîr Îmadedînê Hekkarî de çûne Hekkarî û demekê di nav eşîra Doskiyan de mane. Digel ku ehlên wî li Hekkarî diman, ew bixwe tevlî eşîra

CamScanner ile tarandı

Ertûşiyan dibû ku di navbera Hekkarî û Behdînan de koçberî dikirin. Şêx Şemsedîn di seferekê de bi Ertûşiyan re çûye Imadiyê paytexta mîrnişîniya Behdînan û bi mîrê wê demê Seydî Xan re hevdîtin kiriye. Mîr zehf jê hes kiriye û heft gundên eşîra Mizûriyan dane wî. Ew jî ji wan gundan li Birîfkanê bi cih bûye û li wir tekyayeke Xelwetiyan ava kiriye. Ev bûyer di sala 1030/1621ê de qewimiye. Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî ji wê salê û şûn de bi qasî 53 salan li Birîfkanê di tekyaye xwe de wezîfe kiriye û di sala 1085/1674an de 88 salî koçî dawiyê kiriye.

Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî di tesewifê de bi terîqeta Xelwetiyeyê ve girêdayî bû. Terîqeta Xelwetiye di sedsala XIVan de li Maweraunnehrê derketiyê meydanê û şaxek ji terîqeta Suhrewerdiye ye. Kesê ku wekî damezirênerê vê terîqetê tê qebûlkirin Ebû Ebdullah Sîracuddîn Omer b. eş-Şeyx Ekmeluddîn el-Geylanî el-Lahicî el-Xelwetî (k.d.1397) ye. Terîqet piştre bi riya xelîfeyên Seyîd Yehyayê Şîrwanî (k.d. 1463) li Anadolê, Stenbolê, Balkanan û Misirê belav bûye. Ji ber vê jî terîqeta Xelwetiye wekî terîqeteke Tirkan hatiye naskirin.

Di destê me de derheqê întîsaba Şêx Şemsedîn bi terîqeta Xelwetiye re ti agahî nînin. Lê tişta ku tê fêmkirin ew e ku Xelwetîbûna Şêx Şemsedîn ji malbata wî tê. Lewre dema em li şecereya malbata wî dinêrin bapîrê wî yê mezin Ebu'l-Hesen Eliyê Xelwetiyê Exlatî ku di sala 781/1379an de wefat kiriye endamekî terîqeta Xelwetiye bûye. Ev jî dide nîşandan ku ev bapîrê Şêx Şemsedîn û damezirênerê terîqeta Xelwetiye Şêx Omer el-Xelwetî hevdemê hev in. Ji ber ku bapîrê Ebu'l-Hesen Eliyê Xelwetiyê Exlatî Seyîd Ehmedê Exlatî jî Suhrewerdî bû û terîqeta Xelwetiye jî şaxekî Suhrewerdiyan bû, ev yek bûye sebeb ku ev malbat bibe endamê terîqeta Xelwetiyan.

Şêx Şemsedîn di seyr û silûka tesewifî de gihiştiye meqamekî bilind. Lewra ew wekî "Qutbê Exlatî" hatiye naskirin. Şêx Şemsedînê Qutb li ser kevneşopiya terîqeta Xelwetiyeyê çûye; xwe ji têkiliyên bi insanan re dûr xistiye û di sehra û şikeftan de gelek wext derbas kiriye, anko ketiye 'uzlet û xelwetê.[108]

108 Mihemed Emîn Doskî, *Lewami'u'ş-Şehib*, weş. Spîrêz, Dihok 2007, r.

CamScanner ile tarandı

1.1.2. Aliyê wî yê Edebî

Cihê wî di Tarîxa Edebiyata Kurdî de

Herçiqas navê Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî wekî yên Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran zêde belav nebûbe jî, ew jî helbestvanê serdema Mela û Feqî ye û yek ji nûnerên kevin û ewilîn ên edebiyata kurdî ya klasîk e. Edebiyata Kurdiya Kurmancî ya klasîk di sedsala hivdehem de nûnerên xwe yên herî gring derxistine û di wê sedsalê de gihîştiye asteke bilind. Şêx Şemsedîn jî yek ji pêkhateyên vê sedsalê ye. Mela û Feqî temenê xwe di dawiya sedsala XVIem de jî bûrandine, lê di destpêka sedsala XVIIem de gihîştine asta kemalê. Lê heçî Şêx Şemsedîn e, wî piraniya temenê xwe yê 88 salî di sedsala hivdehem de bûrandiye û di sala 1674an de koçî dawiyê kiriye. Wate Şêx Şemsedîn piştî koça wan a dawiyê nêzî nîv sedeyî li jiyanê maye. Loma jî Şêx Şemsedîn gihîştiye serdema Ehmedê Xanî jî. Lê Xanî jiyana xwe zêdetir piştî Şêx Şemsdîn bûrandiye û piştî wî kemiliye. Lewra Xanî berhemên xwe piştî sala koça dawiyê ya Şêx Şemsedîn (1674) daye. Mirov dikare bêje ku Şêx Şemsedîn helbestvanê maweya di navbera serdema Mela û Feqî û serdema Xanî de ye.

Helbestên wî

Li gorî ku Şêx Nûredînê Birîfkanî gotiye Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî xwedî dîwan bûye, lê dîwana bi tevahî negihîştiye roja me. Ji dîwana wî tenê 16 helbest û du helbestên netemambûyî gihîştine îro. Ev helbestên wî yên ku ji aliyê Şêx Memdûhê Birîfkanî ve hatine parastin cara pêşî di sala 2001ê de li Swêdê ji aliyê weşanxaneya Roja Nû ve bi navê "Dîdarê Yar" hatin çapkirin (Amd. Zahid Birîfkanî). Mihemed Emîn Doskî jî ev helbestên wî bi zimanê erebî bi navê "Lewami'u'ş-Şehib" şerh kirine. Ev şerh di sala 2007an

9-15; Şêx Nûredînê Birîfkanî, *Dîwan Zibanê Kurdî*, Amd. Zahid Birîfkanî weş. Aras, Erbîl 2002, 28-35; Serdar Yılmaz, Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2013.

CamScanner ile tarandı

de li Dihokê ji aliyê weşanxaneya Spîrêzê ve hatiye çapkirin. Herî dawî ji aliyê Serdar Yılmaz ve li Zanîngeha Mardin Artukluyê li ser Şêx Şemsedîn û helbestên wî tezeke masterê jî hat amadekirin.

Mexlesa wî

Şêx Şemsedîn di helbestên xwe de mexlesa "Xelwetî" bi kar aniye. Wî mexlesa xwe di çarçoveya bîr û baweriyên xwe de bi kar aniye û navê terîqeta xwe ji xwe re wekî mexles neqandiye.

Terzê wî yê Edebî

Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî, çawa ku ji navê wî jî tê fêmkirin, ji aliyê yê tesewifî ve gelekî derketiye pêş. Lê digel vê di edebiyata Kurdî ya klasîk de jî cihekî wî yê taybet heye. Mirov dikare bêje ku tişta ku wî taybet dike jî ev aliyê wî yê tesewifî ye ku şêxek û endamekî terîqeta Xelwetiyeyê ye. Lewra bi qasî ku tê zanîn di tarîxa edebiyata Kurdî de nûnere yegane û herî girîng ê Xelwetiyan Şêx Şemsedîn e û ji bilî wî di nav helbestvanên Kurdan de yên ku vê ekolê temsîl dikin nînin.

Şêx Şemsedîn bi awayekî giştî helbestvanekî mutesewif e. Lê esil tişta ku dirûv daye terzê wî yê edebî, bîr û baweriyên wî yên derheqê terîqeta wî de ne. Ew di vî warî de bi tena serê xwe wekî ekolekê ye. Di vê çarçoveyê de mirov dikare taybetiyên wî yên edebî weha destnîşan bike:

1. Şêx Şemsedîn jiyaneke di çarçoveya bîr û baweriyên xwe yên tesewîfî de jiyaye. Di terîqeta wî de, xelwet dustûreke sereke ye. Li gorî vê dustûrê pêgirtiyên vê terîqetê divê ji bazar û civatê dûr bikevin û tenha bimînin. Îcar Şêx Şemsedîn jî di çarçoveya vê dustûrê de xwe ji insanan dûr xistiye û derketiye sehra û çolan û li wan deran di kavil û şikeftan de jiyaye. Şêx Şemsedîn di vê jiyanê de bi heywanan re maye û belkî helbestên xwe jî di vê xelwetê de li cem heywanan nivîsandine. Di encamê de vê yekê rengê xwe daye helbestên wî. Wî di

CamScanner ile tarandı

helbestên xwe de behsa gelek heywanan kiriye. Bo nimûne di helbesteke xwe de, ku tenê sê beytên wê gihîştine me, dengên kund û hudhudê weha tîne zimên:

Uzlet dikirim daîm dîsan wekû kungir
Her wê ku hebit kavilek ez lê dixûnim qu qu

Geh geh wekû hudhud menzûrê Suleyman im
Geh geh li rûyê sehra bi fixan dibêjim pu pu

Dîtim ku li ser darê ba zebanê fesîh gapil
Digirî ku dibin xafil ev xelqe hemû ku ku

2. Di terîqeta wî Xelwetiyeyê de hizra wehdetu'l-wicûdê gelekî bi hêz e. Endamên ve terîqetê ji ber hizrên xwe yên batinî bi gelek zehmetiyan re rûbirû mane û hin ji wan hatine bidarvekirin. Hizra wehdetu'l-wicûdê li cem Şêx Şemsedîn jî heye. Lê wî ev hizra xwe bi îfadeyên girtî û bi dirûvê hinek remz û şifreyan aniye zimên. Bi rehetî dikare bê gotin ku wî nexwestiye bi awayekî aşîkar behsa wehdetu'l-wicûdê bike. Lewra bi vî awayî ew xwe ji êrîş û tahlokeyan diparêze. Di tarîxa edebiyata kurdî de ev uslûb û terz belkî jî tenê li cem wî tê dîtin.

Eger Şêx Şemsedîn bi Melayê Cizîrî rê bê muqayesekirin, her du jî di çarçoveya giştî de helbestvanên mutesewif in, lê terzê wan di îfadeyê de ne wekî hev in.

Li jêrê wekî mînak em ê cih bidin beytên pêşî (metle') û yên dawî (meqte) yên du helbestên wî ku di her duyan de jî du îfadeyên bi vî rengî wekî neqerat tên dubarekirin.

Ez ku mestê meyê 'işq im tene naha ya hû
Mis'r û Bexdad û Dimeşq im tene naha ya hû

Xelwetî *'aşiqê mest e qedehê bade bi dest e*
Ji dinê ew bi perest e tene naha ya hû

CamScanner ile tarandı

Mest û xerab im ji meyê ten tele lat la la
Dibêjim ez ya lebeyê ten tele lat la la

Li 'aşiqê te subhetê bêxûd bûye şerbetê
Dîsan bi xwe çû Xelwetê *ten tele lat la la*

Bandora wî

Herçiqas, bi qasî ku xuya dibe, ji aliyê terzê edebî ve Şêx Şemsedîn wekî Mela, Feqî û Xanî li pey xwe peyrewên zêde nehiştibin jî, di vî warî de gelek tiştên nayên zanîn û divê li ser vê mijarê lêkolîn bên kirin. Lêbelê pey wî re ji dundana wî du helbestvanên girîng derketine ku nebûna bandora kalikê wan li ser wan ne pêkan e. Piştî wî bi du sedeyan neviyê wî yê xeleka çarem Şêx Nûredînê Birîfkanî (k.d. 1851) helbestvanekî girîng e ku dê di beşa sedsala nozdehem de behsa wî bê kirin. Herweha piştî Şêx Nûredîn bi sedeyeê neviyê wî Şêx Memdûhê Birîfkanî (k.d. 1976) îcar di sedsala bîstem de jiyaye. Dikare bê gotin ku malbata Birîfkaniyan weke coweke edebî ye ku binemaya wê Şêx Şemsedîn e û ev co di sedsalên XVIIem û XIXem re herikiye heta ku gihîştiye îro.

1.2. EHMEDÊ XANÎ

1.2.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Ehmedê Xanî di sala 1061/1651ê de li Bazîdê hatiye dinyayê. Wî bi xwe di berhema xwe ya bi navê "Nûbihara Biçûkan" de tarîxa jidayîkbûna xwe weha aniye zimên:

Lewra ku dema ji xeybê fek bû
Tarîx ***hezar û şêst û yek*** *bû*

Peyva "Xanî" eşîra wî nîşan dide. Eşîra Xanî eşîrek ji eşîrên herêma Hekkarî ye. Malbata Xanî di sedsala XVIan de ji herê-

CamScanner ile tarandı

ma Hekkarî pêşî koçî Wanê kirine, piştre ji wir jî koçî Bazîdê kirine.

Navê bavê Xanî Mela Îlyas, navê diya wî jî Gulnîgar e. Bavê wî Mela Îlyas û birayê wî Mela Qasim wekî katibên dîwana mîrê Bazîdê wezîfe kirine. Xanî jî piştî wan di dema mîr Mihemed Pirbelalî de ev wezîfe domandiye.

Xanî, piştî ku bavê wî wefat kiriye, li cem birayê xwe yê mezin Mela Qasim dest bi xwendinê kiriye. Piştre çûye Muradiyeyê û li wir li medreseya Gulgûnê xwendiye. Navê wî di lîsteya xwendekarên vê medreseyê yên sala 1661ê de heye.

Li gorî ku tê rîwayetkirin Xanî li Xelat, Riha û Bedlîsê jî xwendiye. Piştre vegeriyaye Bazîdê û ji wir jî çûye Cizîrê. Herweha wî mîrektiyên Behdînan û Serhedan jî ziyaret kirine. Dîsa tê gotin ku ji bo perwerdeyê çûye Bexda û Misirê, ji bo hecê jî çûye Hîcazê û ji bo ku bi padîşahê Osmaniyan re têkiliyê dane çûye Stenbolê jî. Xanî îcazeya xwe li Xoşabê li Medreseya Etaiyyeyê li cem Mela Camî stendiye. Piştre li Bazîdê medreseyek ava kiriye û heta ku koçî dawiyê bike (1121/1709) li vê medreseyê dersdarî kiriye.

Ehmedê Xanî çawa ku zanayekî medreseyê ye, herweha kesayetekî mutesewif e jî. Rengvedana vê yekê di Mem û Zîna wî û helbestên wî de aşîkar e. Li cem helbestvanên Kurd ên klasîk ên wekî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî hizra tesewifê hebe jî, di çarçoveya tesewifa pratîk de em nizanin ka gelo pêgirtina wan bi terîqeteke tesewifê ve heye yan na. Lê heçî Ehmedê Xanî ye, ew hem xwediyê hizra tesewifê ye, hem jî pêgirtiyê terîqeta Neqşebendî ye. Xanî, ev taybetiya xwe di beyta pêşî ya vê helbesta xwe de aniye zimên:[109]

Me dî neqşek ji neqşê Neqşebendan
Vebû qeydên di min yek yek ji zendan

109 Ji bo agahiyên berfireh bnr. Abdurrahman Durre, *Şerha Diwana Ehmedê Xanî*, Keskesor, Stenbol 2002, r. 47-52.

CamScanner ile tarandı

Kûşada dil ji bo min ra muyyeser
Nebû bê suhbeta sûretlewendan

Li min kurt bû riya Ke'ba wîsalê
Ji nûra tel'eta balabulendan

Me j' Ahoyan, Hoyan xwestin û emma
Dilê min ma digel mişkîn kemendan

Heçî pêlek di işqê da 'emel kir
Dibîtin 'aqîbet şadan û xendan

Xanî, li gorî nêrîna ku kêm-zêde tifaq li ser çêbûye di sala 1121/1709an de 57 salî li Bazîdê wefat kiriye. Derheqê wefata wî de îfadeya "Tare Xanî ila rebbihî" hatiye gotin ku ev îfade bi hesabê ebcedê sala 1121/1709 nîşan dide. Ev îfade bi zimanê Erebî ye û di Kurdiya Kurmancî de tê vê wateyê: "Xanî bi bal Rebbê xwe ve firî"[110].

1.2.2. Berhemên wî

Ehmedê Xanî, digel Melayê Cizîrî, du sitûnên qewî yên avahiya edebiyata Kurdî ne. Mela bi dîwan û xezelên di dîwanê de, Xanî jî bi mesnewiya xwe ya bi navê "Mem û Zîn"ê di lutkeyê de ne. Ji bilî helbestên Xanî sê berhemên wî hene ku her sê berhem jî ji bo tarîxa edebiyata Kurdî gelekî bi nirx in û di warên xwe de berhemên orjînal in. Ev berhemên ku Ehmedê Xanî di ciwaniya xwe de nivîsandine ev in:

1. Nûbihara Biçûkan (1683)
2. Eqîdeya Îmanê (1687)
3. Mem û Zîn (1694)

---

110 Ji bo agahiyên berfireh bnr. Abdullah M. Varlî, *Dîwan û Jînewarî ya Ahmedê Xanî*, weş. Sîpan, Stenbol 2004, r. 36-241; Durre, b.n., r. 10-19; Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî Külliyatı Nûbehara Biçûkan*, Avesta, Stenbol 2008, r. 13-33.

CamScanner ile tarandı

4. Helbestên Wî

Berî ku em derbasî van berhaman bibin, pêwist e em balê bikişînin ser xaleke bi mijarê re têkildar. Heta niha berhemên ku ji aliyê lêkolînvanan ve bi bal Xanî ve hatine nîsbetkirin ne ev tenê ne û ev berhemên jêrîn jî wekî berhemên wî hatine nîşandan:[111]

1. Tuhfetu'l-'Ewam (şerî'eta Îslamê)
2. Yûsuf û Zelîxa
3. Leyla û Mecnûn
4. Qewlê Newala Sîseban
5. Qewlê Hespê Reş
6. Sekerata Mirinê
7. Berhemeke coxrafyayê
8. Nehcu'l-Enam

Hinek sebebên nîsbetkirina van berheman bi bal Xanî ve ev in:

1. Ji ber ku Xanî kesekî gelekî navdar e û her berhemên orjînal dane, dema ku ji aliyê lêkolînvanekî ve berhemeke nû hatiye dîtin, ew berhem ya Xanî hatiye zenkirin û bêyî ku lêkolîn bê kirin wekî ya Xanî hatiye nîşandan.

2. Hinek berhem hene ku ji aliyê gelek kesan ve hatine hûnandin. Di hinek nusxeyan de di dawiya van berheman de mexlesa Xanî hatiye nivîsandin.

Berhemên Xanî yên ku aîdiyeta wan teqez in, li gorî kronolojiya nivîsandinê ev in:

1.2.2.1. Nûbihara Biçûkan

Xanî, ev berhema xwe di 33 salî ya xwe de nivîsandiye. Berhem ferhengeke menzûm a Erebî-Kurdî û Kurdî-Erebî ye. Ferheng bi mebesta ku di sîstema medreseyan de ji bo pêdawîs-

111 Ji bo agahiyên berfireh bnr. Varlî, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî yêd Mayî*, weş. Sîpan, İstanbul 2004, r. 229-236; Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, r. 53-58; Durre, b.n., r. 15-17.

CamScanner ile tarandı

tiyên zarokên Kurdan bi zimanê Erebî bibe bersivek hatiye nivîsandin. Lewra di vê sîstemê de ders ji pirtûkên Erebî dihatin xwendin. Dema zarokên biçûk piştî xilaskirina Qur'ana Pîroz dest bi xwendina pirtûkên Erebî dikirin gelekî zehmetî dikişandin. Xanî jî ji bo ku xwendekarên Kurdan di destpêkê de fêrî peyvên sereke yên Erebî bibin ev ferheng nivîsand. Xanî navê berhemê û armanca nivîsandina wê weha aniye zimên:

Vêk êxistin Ehmedê Xanî
Navê **Nûbihara Biçûkan** *lê danî*

Ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Wekî ji Qur'anê xelas bin
Lazim e li sewadê çavnas bin
.
.
Da bi van çend reşbelekan
Li wan tebî'etmelekan

Derê zihnê vebitin
Her çî bixûnin zehmet nebitin

Em ji agahiyên Mele Mahmûdê Bazîdî fêm dikin ku bi rastî jî Nûbihara Biçûkan di medreseyên Kurdistanê de wekî kitebeke dersê hatiye xwendin. Bazîdî di pêşgotina kitêba Elî Teremaxî de navên pênc berhemên ku di medreseyên Kurdistanê de wekî kitêbên dersê tên xwendin dide. Sê heb ji van derheqê rêzimana Erebî de ne (Serfa Kurmancî, Zurûf û Terkîb), du heb ji wan jî berhemên edebî ne. Yên edebî ev in: Nûbihara Ehme-

CamScanner ile tarandı

dê Xanî û Mewlûda Melayê Bateyî.[112] Bêguman ev jî girîngiya Nûbihara Biçûkan nîşan dide.

Nûbihara Biçûkan ji 13 beşan pêk tê. Tê de derdora 220 beyt û 1000 bêjeyî hene. Destpêk, beşa yekem û beşa dawî li gorî teşeya "mesnewî"yê; beşên dî jî li gorî teşeya "xezel"ê hatine nivîsandin. Di berhemê de 7 heb behrên erûzê hatine xebitandin ku ew jî ev in: Hezec, recez, remel, mudari', besît, serî' û muteqarib.

Nûbihara Biçûkan, ji ber taybetiyên xwe di dîroka edebiyata Kurdî cihekî xwe yê girîng heye. Ev taybetî jî ev in: Ev berhem yekem ferhenga Kurdî ye. Yekem ferhenga Kurdî ya menzûm e. Di tarîxa Kurdan de yekem kitêb e ku ji bo perwerdeya zarokan û herweha ji bo perwerdeya bi zimanê dayîkê hatiye nivîsandin. Yekem kitêb e ku tê de li ser 'erûzê hatiye sekinandin.[113]

Nûbihara Biçûkan cara pêşî di sala 1794an de digel ferhenga Yûsif Ziyaeddîn Paşa el-Meqdisî ya bi navê "el-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fi'l-Luxeti'l-Kurdiyye" li Stenbolê; cara duyem di sala 1323/1906an de dîsa li Stenbolê ji aliyê Şefîq Erwasî ve di metbe'eya Ehmed Kamil de[114], cara sêyem jî di sala 1903an de ji aliyê A. v. Le Coq ve di nav berhema wî ya bi navê "Kurdische Texte/Tekstên Kurdî" de li Berlînê hatiye çapkirin. Di vê qonaxa dawî de Kurdên bakur çapa Stenbolê ya Şefîq Erwasî gelek caran ji nû ve çap kirine. Herî dawî Kadri Yıldırım bi navê "Ehmedê Xanî Külliyatı Nûbehara Biçûkan" li ser Nûbihara Biçûkan lêkolîneke analîtik kir (Avesta, Stenbol 2008) û Huseyn Şemrexî jî bî herfên erebî şerheke Nûbiharê amade kir (Nûbihar, Stenbol 2008).

112 Bazîdî, "Muqeddîma "Îlmê Serfê û Be'dê Usûlê Lazîmeyê Te'lîmiyye bi Zimanê Kurdiya kurmancî", *Camî'eya Rîsaleyan û Hîkayetan bi Zimanê Kurmancî*, Amd. Ziya Avcı, Lis, St. 2010, r. 18.

113 Ji bo *Nûbihara Biçûkan* bnr. Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, r. 13-33.

114 Li ser bergê wê navê Erwasî tine ye. Lê li gorî ku Veysel Aydeniz dibêje weşanger Şefîq Erwasî ye. Bnr. Veysel Aydeniz, *Seyyid Şefik Arvasî*, Nûbihar, Istanbul 2013, r. 46, 134.

CamScanner ile tarandı

1.2.2.2. Eqîdeya Îmanê

Xanî ev berhema xwe di 37 salî ya xwe de nivîsandiye. Xwestiye ku xwendekarên medreseyan eqîdeya dînê xwe bi Kurdî fêr bibin. Eqîde ew zanist e ku li ser 6 hêmanên dînî yên baweriya dînê Îslamê radiweste. Bi awayekî xwezayî termînolojiya vê zanistê bi zimanê Erebî ye. Li vir pêwist e bê gotin ku Xanî di vê berhema xwe de hinek îstîlahên dînî ji Erebî qulubandine Kurdiya Kurmancî. Digel ku di hemû zimanên dî de ev termînolojiya Erebî hatiye parastin, veguhestina vê termînolojiyê bi bal Kurdiya Kurmancî ve, asta Xanî ya rewşenbîriyê nîşan dide.

Sifatê di seb'e ji bo Zulcelal
Bizan heft in ey arifê purkemal

"Xweşî", "şîn" û "zanîn" û "vîn" û "kelam"
"Bihîstin" digel "dîtin"ê bûn temam

Di vê beytê de xweşî di şûna heyatê, şîn di şûna qudretê, zanîn di şûna îlmê, vîn di şûna îradeyê, bihîstin di şûna sem'ê, dîtin di şûna beserê de hatiye bikaranîn û ev têgehên bi zimanê Erebî, bi bal Kurdî ve hatine wergerandin.

Ev berhem ji aliyê mijarê ve dînî ye, lê bi uslûbeke edebî hatiye nivîsandin ku ev berhem bi vî rengî edebiyata dînî tînin meydanê. Yan jî mirov dikare ji metnên bi vî rengî re metnên dînî-edebî beje. Di vê çarçoveyê de ev berhema Xanî di dîroka edebiyata Kurdî de dibe yekem berhema dînî-edebî.

1.2.2.3. Mem û Zîn

Xanî ev berhema xwe di 44 salî ya xwe de nivîsandiye. Mem û Zîn mesnewiyeke orjînal e. Lewra di edebiyata Kurdî de berî Ehmedê Xanî li ser vê mijarê û bi vî terzî ti mesnewî nehatine nivîsandin. Di tarîxa edebiyata Kurdî de yekem mesnewî ye ku bi awayekî rêk û pêk hatiye nivîsandin. Digel ku di tarîxa edebiyata Kurdî de berî wê mesnewiyên wekî "Şêxê Sen'anî",

CamScanner ile tarandı

"Bersîsê Abid" û "Kela Dimdimê" hatibin nivîsandin jî, Mem û Zîn bi hêza xwe ya edebî ji wan derbas kiriye. Ehmedê Xanî bi Mem û Zînê bandoreke mezin li yên pişt xwe yên wekî Siwadî, Weda'î, Haci Qadirê Koyî û Şêx Ebdurrehmanê Axtepî kiriye.

Nîşaneyeke dî ya bandora "Mem û Zîn"ê jî, di dema Osmaniyan de, piştî Xanî bi maweyeke hindik nivîsandina "Mem û Zîn"ên bi Tirkî ye. Cara pêşî ji malbata Şerefxaniyan mîrekî mîrnişîniya Bedlîsê bi navê Ehmed Faîq di sala 1730î de Mem û Zîn bi Tirkî nivîsandiye. Pişt wî re Ebdulezîz Xalis Çıkıntaşê Diyarbekirî û Zulfiqar Fethiyê Farqînî jî "Mem û Zîn"ên bi Tirkî nivîsandine. Lê mixabin Fethî piştre ji tirsa ku dê zererekê jê bibîne, wergera xwe şewitandiye.[115]

Piştî Osmaniyan di sedsala XXan de, kesên wekî M. Emîn Bozarslan (1968, 1975), Şamil Esgerov (Bakû 1976) û Kadri Yıldırım (Avesta, Stenbol 2012) jî wergerên Mem û Zînê yên bi Tirkî çêkirine. Wergereke Mem û Zînê ji aliyê Wezareta Çandê ya Komara Tirkiyeyê ve jî hat weşandin (Namık Açıkgöz, Ankara 2010).

Metnê "Mem û Zîn"ê, ji aliyê Huseyn Şemrexî ve di sala 2009an de bi herfên latînî û di sala 2010an de jî bi herfên erebî hat amadekirin û di weşanxaneya Nûbiharê de hat çapkirin.

"Mem û Zîn"a Jan Dost, ku bi Kurdiya îro amade kiriye (Avesta, Stenbol 2008) û şerha ku Perwîz Cîhanî li ser "Mem û Zîn"ê çêkiriye (Nûbihar, Stenbol 2010), derbareyê "Mem û Zîn"ê de du xebatên bi Kurdî yên vê dawiyê ne.

Xanî digel ku bi Erebî, Farisî û Tirkî jî dizanîbû, berhemên xwe tenê bi Kurdiya Kurmancî nivîsandine. Xanî di Mem û Zînê de sê devokên Kurdiya Kurmancî yên sereke bikaranîne ku wî bi xwe di vê beyta jêrîn a Mem û Zînê de ev yek îfade kiriye.

---

115 Ji bo agahiyên berfireh bnr. Abdurrahman Adak, "Di Serdema Osmaniyan de li Pey Rêça Ehmedê Xanî Sê Mem û Zînên bî Tirkî", *Komele Witarî Yekemîn Kory Nêwneteweyî Edebî Kurdî*, Zanistgay Kurdistan, Sine 2011, C. II, r. 585-601.

CamScanner ile tarandı

Bohtî û Mehmedî û Silîvî
Hin le'l û hinek ji zêr û zîvî

Lê digel vê jî di berhemên wî de ji Erebî, Farisî û Tirkî jî hinek unsur peyda dibin. Bo nimûne helbesteke wî ya bi teşeya mulemmayê heye ku misrayên her bendekê bi rêzê bi zimanên Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdiya Kurmancî hatine nivîsandin. Li jêrê em cih didin benda pêşî ya vê mulemmayê:

Fate umrî fi hewake ya hebîbî kulle hal
Ah û nalem hemdemem şud der firaqet mah û sal
Ger benim qanım dilersen çokdan olmuşdur helal
Dîn û ebter bûm ji 'eşqê min nema 'eql û kemal

Xanî di vê beyta jêrîn a "Mem û Zîn"ê de (misraya duyem) jî, bi zimanê Tirkî heyret û ecêbmayîna xwe aniyê zimên.

Êdî çi bibêjim ez nizanim
Bilmez ki ne söyleye zebanım

1.2.2.4. Dîwana Helbestan

Helbestên Xanî ji aliyê wî ve bi şiklê dîwaneke muretteb nehatine tertîbkirin. Helbestên wî yên ku di destnivîsan de hatine dîtin, pişt wî re ji aliyê gelek kesan ve hatine komkirin û çapkirin. Di vî warî de çend xebatên girîng ev in:

1. Abdurrahman Durre, Şerha Diwana Ehmedê Xanî, (Keskesor Stenbol 2002). Di vê xebatê de 27 helbestên Xanî hatine komkirin.

2. Ebdullah Varli, Dîwan û Gobîdeyên Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, (Weşanê Sîpanê, İst. 2004). Di vê xebatê de 109 helbestên Xanî hatine komkirin. Di nav hemû xebatan de ya ku herî zêde helbestên bi bal Xanî ve hatine nîsbetkirin tê de cih digirin ev e.[116]

3. Tehsîn Î Doskî, Cewahiru'l-Me'anî fi Şerhi Dîwani Ehmed el-Xanî, (Spîrêz, Dihok 2005).

---

116 Varlî, *Dîwan û Gobîde* r. 289-298.

CamScanner ile tarandı

1.2.3. Şopgerê Xanî: Şewqî

Ehmedê Xanî bi riya Nûbihara Biçûkan, Eqîdeya Îmanê û Mem û Zînê tenê bandor li yên pey xwe nekiriye. Wî her weha bi riya helbestên xwe jî bandor li yên pey xwe kiriye. Li jêrê wekî nimûne em dixwazin behsa helbestvanekî bi navê Şewqî bikin.[117] Herçiqas derheqê jînenîgariya vî helbestvanî de agahî tinebin jî, ji benda dawî ya helbesteke wî diyar e ku ew ji malbata Ehmedê Xanî ye. Şewqî ev helbesta xwe li ber helbesteke Ehmedê Xanî wekî nezîreyekê nivîsandiye. Çawa ku li jêrê dê bê dîtin, Şewqî jî wekî Xanî helbesta xwe bi kêşa erûzê (behra remelê) û bi teşeya murebbayê nivîsandiye. Herweha her du helbest jî bi terzê mulemmayê hatine nivîsandin ku di her bendê de bi rêzê zimanên Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdî hatine bikaranîn. Bêguman ev jî dide nîşandan ku helbestvanên piştî Xanî li pey rêça wî çûne. Li jêrê em dê cih bidin bendên pêşî û paşî yên van her du helbestan.

Bendên pêşî yên van helbestan weha ne:

Xanî:

Fate umrî fi hewake ya hebîbî kulle hal
Ah û nalem hemdemem şud der firaqet mah û sal
Ger benim qanım dilersen çokdan olmuşdur helal
Dîn û ebter bûm ji 'eşqê min nema 'eql û kemal

Şewqî:

Hubbûke efna şebabî ya hebîbî fi't-te'eb
Işqê to beg'daxt(i) canem der cefa û tab û teb
Eql û hûşem kalmadı sabr û kararım gitti hep
Sotime j' daxê firaqê lew dinalim roz û şeb

117 Zeynelabidîn Zinar, *Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Stokolm 1991, r. 104-105.

CamScanner ile tarandı

Bendên dawî yên van helbestan weha ne:

Xanî:
Hel lena min nî'metî wesli'l-hebîbî min nesîb
Ûf(i)tadem ber deret bîçare sergerdan xerîb
Derdimiz çok lîk(i) senden öte yok hîç bîr tebîb
Ey tebîbê min dewaê derdê ***Xanî*** *her wîsal*

Şewqî:
Rebben'exfir zenbe men nacake bi'l-qelbi's-selîm
Kirdîgara rehm(i) kon ber bendeyê pîr û seqîm
Fazl û ihsanın diler bîçare kulun ya Kerîm
Da bi fezla xwe 'efû ki ***Şewqiyê*** *Xanîneseb*

1.3. REMEZANÊ CIZÎRÎ

1.3.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Remezanê Cizîrî yek ji helbestvanên Cizîra Botan e ku heta niha zêde nehatiye naskirin ku îhtîmaleke mezin di dawiya sedsala XVIIan de jiyaye.

Ev helbestvan zêdetir ji tesdîsa wî ya ku li ser xezeleke Melayê Cizîrî nivîsandiye tê naskirin ku ev tesdîs di nusxeyên çapkirî yên dîwana Mela de bi vê bendê dest pê dike:

Qewî sohtime firaqa ewê ahûbeserê
Kefte pişt perdê û sitrê nema êdî bi derê
Kes nehin qet di dinê da bikitin vê hunerê
Ey nesîmê sibehê ma di mecala seherê
Sed selaman bigehînî ji me wê lebşekerê

Bêguman hebûna vê tesdîsê di destnivîsên kevn ên dîwana Melayê Cizîrî de dê ji bo kifşkirina serdema xwediyê tesdîsê Remezanê Cizîrî bibin arîkar. Hatiye tesbîtkirin ku ev tesdîs

CamScanner ile tarandı

di nusxeya Mehemed Elî Qeredaxî ya ku derdora 250-300 salî berî niha hatiye nivîsîn de derbas dibe. Ev jî dide nîşandan ku Remezanê Cizîrî helbestvanekî kevin e, lê bi îhtîmaleke mezin ne di dewra Mela de, piştî wî jiyaye. Lê dîsa îhtîmal heye ku gihîştibe serdema Mela, herweha feqiyekî wî jî be.[118]

Navê helbestvanê me di destnivîsên dîwana Melayê Cizîrî de bi yek awayî nehatiye tomarkirin, lê di hemûyan de jî navê "Remezan" derbas dibe. Li gorî ku Îsmaîl Badî neqil dike, navê wî di hinek destnivîsan de wekî "Remezanê Cizîrî", di hinekan de wekî "Remezan Axayê Cizîrî", di hinekên dî de jî wekî "Remezan Axa" hatiye nivîsîn. Herweha ji bilî van destnivîsan di lîsteya helbestvanên Kurd a Şêx Memduhê Birîfkanî de navê helbestvan wekî Remezan Axayê Cizîrî, di şerha Dîwana Melayê Cizîrî ya Zivingî de wekî Şêx Remezan, di pirtûka Sadiq Beheddîn Amêdî ya Dîwana Melayê Cizîrî de wekî Remezanê Botî û di pirtûka wî ya bi navê Hozanvanêt Kurd de jî wekî Remezanê Cizîrî hatiye nivîsîn.[119]

1.3.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Heta vê dawiyê ji bilî tesdîsa Remezanê Cizîrî ya ku di dîwana Mela de cih digirt, helbestên wî yên dî nedihatin zanîn. Li gorî ku Îsmaîl Badî neql dike, ji van helbestan pênc helbestên wî cara pêşî ji aliyê Ebdurehman Mizurî ve ji nusxeya dîwana Mela ya ku M.Teyar Paşayê Amêdiyê îstînsax kiriye wergirtine û weşandine.[120] Bi giştî şeş heb helbestên Remezanê Cizîrî ji aliyê Îsmaîl Badî ve hatine komkirin û û di sala 2011an de li Dihokê hatine çapkirin.

---

118 Îsmaîl Badî, *Remezanê Cizirî -Di duyvçûn û Tuyjandineka Dîtir da Qeftek ji Helbestên Wî*, weş. Zankoya Dihokê Fakeltiya Zanistên Mirovayetî Sikula Adabê Senterê Vekolînên Kurdî û Parastina Belgenaman, Dihok, 2011, r. 12.

119 Badî, b.n., r. 29-30. Herweha bnr. Zülküf Ergün, *Di Peydabûna Edebiyata Kurdî ya li Cizîra Botan de Karîgeriya Bajarvaniyê*, Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstituya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2012, r. 130-133.

120 Badî, b.n., r. 34

CamScanner ile tarandı

Helbestvan di çar helbestan de nasnavê Remezan, di helbestekê de nasnavê Remezanê Cizîrî, di helbesteke dî de jî nasnavê Îbn Dewdan bi kar aniye.[121]

Lutfek ji lebên le'lê şekerxar ***Remezan*** *kir*
"Ercû" û temenna meke qed fikrê mehal in

Melayê Cizirî bandoreke mezin li ser Remezan Cizîrî çêkiriye. Remezanê Cizîrî di helbestên xwe de gelek îfade û beytên Melayê Cizîrî dûbare kirine. Tesdîsa wî ya li ser xezela Mela, bandora Mela ya li ser wî bi awayekî aşkera nîşan dide. Ji bilî vê tesdîsê, Remezanê Cizîrî helbesteke xwe ya dî jî ji xezeleke Melayê Cizîrî re wekî nezîre nivîsiye ku li jêrê her du beytên pêşî yên her du helbestan cih digirin[122]:

Melayê Cizîrî:
Wellah ji her du aleman min husnê canan e xered
Lew min ji husna dilberan her sun'ê Rehman e xered
Zulfên perîşan têne mest bihna biha wan e xered

Remezanê Cizîrî:
Remzek ji dilber hate der wê cezbê îman e xered
Daîm vi min ra kîn e wê her derb û lêkdan e xered

Di van beytên jêrîn de jî hevbeşiya di navbera îfadeyên Pertev Beg û Remezanê Cizîrî de xuya dibe:

Pertew Begê Hekkarî:
Derdê di dilê xwe ger bikim cumle hisêb
Qet naête şerhekê bi sed cildê kitêb

jiber bike.

121 Badî, r. 57-80.
122 Badî, r. 40-41.

CamScanner ile tarandı

Remezanê Cizîrî:

Şerhê derd û eleman min qederek kirne kitêb
Min nivîsîne bi tertîb hemî têk da ne bi 'êb

1.4. AXAOKÊ BÊDARÎ

1.4.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Helbestvanekî dî yê sedsala hijdehem Axaokê Bêdarî ye. Bêdar, gundekî Spayirtê ye, Spayirt jî nahiyeya Hîzanê ye û dikeve navbera Hîzan û Miksê de. Herekol Azizan di nivîsa xwe ya bi sernavê "Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin" derheqê Axaokê Bêdarî de weha dibêje:

"Me tu eserên vî şairî nedîtine. Me bi tenê navê wî seh kiriye. rawiyan gote me ko Axayê Bêdarî gelek guh daye zimên û çiqas jê hat ewçend bêjeyên Erebî û Farisî nexistine şi'rên xwe. Melayê Jaba qet qala vî şairî ne kiriye. dibêjin ku Axa di pey Batê re rabûye. Ji lewra me ew daniye vê derê".[123]

Ji mersiyeya wî ya ku di sala 1140/1727an de li ser koça dawiyê ya du kurên xwe nivîsandiye, tê fêmkirin du kurên wî di salekê de wefat kirine û yek ji wan 13, yê dî jî 15 salî bûye. Ji xwe sedsala ku Axaok tê de jiyaye, ji vê tarîxa di mersiyeya wî de derdikeve meydanê.

Li gorî çavkaniyan Ebdureqîb Yûsif di Rojnameya "Rûzî Kurdistan"ê de derheqê wî de gotarek weşandiye (j. 50, sal: 1978).[124]

1.4.2 Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Axaokê Bêdarî ji wan helbestvanan e ku kêm helbestên wan gihîştine me. Wî di helbestên xwe de mexlesa Xeyn û Elîf (غ ا) ê bi kar aniye û bi vê mexlesê işaretî bi bal navê xwe kiriye ku

123 Herekol Azîzan, "Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin" *Hawar*, II, Stokolm 1998, r. 813.

124 Mela Ebdullah Tellî, "Kund ji Birayê Bazê ye", *Nubihar* j. 65, s. 1998, r. 30; Selefî û Doskî, r. 112-113.

CamScanner ile tarandı

mexlesa wî ji her du herfên pêşî yên navê wî pêk hatiye. Mirov dikare bêje ku Axaok di bikaranîna mexleseke bi vî rengî de di bin bandora Feqiyê Teyran de maye ku wî jî di helbestên xwe de mexlesa Mîm û Hê (م ح) ê bi kar aniye.

1.5. XALID AXAYÊ ZÊBARÎ/LAXER

1.5.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Berî ku em serdema Xalid Axayê Zêbarî/Laxer destnîşan bikin, lazim e em pêşî li ser têkiliya di navbera navê Xalid Axayê Zêbarî û mexlesa Laxer rawestin. Cara pêşî Sadiq Behadîn Amêdî di navbera wan de têkilî daniye û ji kesên îxtiyar neqil kiriye ku helbestvanê bi mexlesa Laxer û Xalid Axayê Zêbarî yek kes in. Herweha ji wê helbesta ku li jêrê em cih didin beyta wê ya dawî jî (meqte') tê fêmkirin ku helbestvanê bi mexlesa "Laxer" û ew kesê ku nîsbeya wî "Zêbarî" ye yek kes in.

Bi heft avan bişoyî laxerê xo
Meke de'wa xo tu l' Zêbariyê qet[125]

Lê wisa xuyaye ku mexlesa Laxer di tarîxa edebiyata Kurdî de ne ji aliyê keskekî tenê ve hatiye bikaranîn. Bo nimûne Mela Umerê Miksî (k.d.1912) jî helbestên xwe bi mexlesa Laxer nivîsandine û helbestên wî ji aliyê Tehsîn Doskî û Huseyn Şemrexî ve hatine çapkirin.[126] Lê ev laxer ji Miksê ye û Laxerê ku niha mijara me ye, li gorî neqla Sadiq Behadîn Amêdî ji eşîra Zêbariyan e.

Li ser vê esasê tişta ku hatiye fêmkirin ew e ku ev Xalid Axayê Zêbarî lazim e yek ji wan Xalidên ku di silsileya malbateke navdar de cih digirin de be ku endamên vê malbatê ji herêma Zêbarê koçî herêma Botan kirine û li wê derê wekî malbateke tesewifî bi navê "Malbata Zêbariyan" deng vedane.

125 Hizirvan, *Sîseban*, weş. Êkîtiya Nivîserên Kurd, Dihok 2007, r. 7.
126 Tehsîn Doskî û Huseyn Şemrexî, *Parçeyek ji Dîwana Laxerî*, Spîrêz, Dihok 2011.

CamScanner ile tarandı

Dema em li "Malbata Zêbariyan" dinêrin, em dibînin ku pêşiyên wan cara pêşî ji Hemayê hatine Zêbarê. Cara pêşî Kurê Şêx Selîm el-Hemewî Şêx Ehmed es-Sûfî di serdema mîrektiya Îmadiyeyê de hatiye herêma Zêbarê. Piştî Şêx Ehmed es-Sûfî silsile bir riya kurê wî Şêx Mihemed, kurê wî Şêx Nasiruddîn, kurê wî Şêx Xelîl, kurê wî Mela Elî, kurê wî Seyyid Silêman hatiye heta bi Mela Xalid.[127] Reşîd Findî piştî ku nêrînên curbicur derheqê Xalid Axayê Zêbarî de neqil kirine, gihîştiyê wê encamê ku ev Mela Xalid, helbestvanê me Xalid Axayê Zêbarî ye.[128]

Kurê neviyê Xalid Axayê Zêbarî Mela Huseynê Yekem, di dema mîrê Cizîrê Mihemed Beg de ji herêma Zêbarê hatiye Cizîrê. (Texmînen sala 1749'ê). Mîr gundê Zivingokê kû îro li ser Şirnexê ye daye wî. Mela Huseyn li Zivingokê bi cih bûye û heta ku wefat kiriye li wir dersdarî kiriye. Gora wî li vî gundî ye. Kurê wî Şêx Xalidê Yekem (k.d.1805) menzûmeya Sîsebanê nivîsandiye. Neviyê wî (Şêx Xalidê Yekem) Şêx Xalidê Zêbarî (k.d.1870) jî li gundê Şirnexê bi navê Basretê bûye postnişînê dergahê Basretê (Neqşebendîtiya Xalidî). Ji wê demê şûnde vê malbatê li herêmê roleke mezin lîstiye.[129]

1.5.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Xalid Axayê Zêbarî, ji wan helbestvanan e ku kêm helbestên wî gihîştine me. Çawa ku di vê beyta wî ya jêrîn de jî tê dîtin, di helbestên xwe de mexlasa "Laxer" bi karaniye.

Bi heft avan bişoyî laxerê xo
Meke da'wa xo tu l' Zêbariyê qet[130]

---

127 eş-Şeyx Muhammed Şefîq ez-Zîbarî, *el-Ehwalu'd-Durriye we'l-Exbaru'l-Mıskiyye fi's-Silsileti'z-Zîbariyye*, Mûsil 1935, r. 10-13; Abdurrahman Adak, "Malbata Zêbariyan û Basreta "Paytexta Neqşebendiyan"-I -Heta bi Serdema Postnişîniya Malbata Zêbariyan li Dergahê Basretê-" *Nûbihar*, j. 107, Stenbol 2009, r. 27-32.

128 Reşîd Findî, *Min Yenabî'i'ş-Şi'ri'l-Klasîkî el-Kurdî*, Erbil 2004, r. 66.

129 ez-Zîbarî, b.n., r. 10-13; Adak, g.n., r. 27-32.

130 Hizirvan, b.n., r. 7.

CamScanner ile tarandı

Di dîwana Melayê Cizîrî de jî texmîseke helbestvanekî bi mexlesa Laxer ku li ser xezeleke Melayê Cizîrî çêkiriye cih digire ku li jêrê em dê cih bidin benda dawî ya vê texmîsê:

Laxer *di zamanê xwe û şi'rê tu Ela yî*
Çendî te hebin dax û birîn têkî bela yî
Rengîn î ji derd û eleman şubhê wela yî
Ellah çi tebîetbeşerî xû ne **Mela***yî*
Vê cewr û cefayê tû peyapey dikeşî

Herçiqas tenê ji vê texmîsê teqez nayê fêmkirin ku Laxerê xwediyê vê texmîsê Xalid Axayê Zêbarî ye jî, lê dîsa zehftir nêzî eqil e ku ev Laxer Xalid Axayê Zêbariyê be. Lewra cihgirtina texmîsa helbestvanekî kevn di dîwana Melayê Cizîrî de, ji cihgirtina texmîsa helbestvanekî nêz hêsantir e.

1.6. MELA REMEZANÊ EBBASÎ

1.6.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Helbestvaneki di yê vê sedsalê Mela Remazanê Ebbasî ye ku, çavkaniya yegane ya ku behsa wî dike "Seyahetname"ya Ewliya Çelebî (1611-1682) ye. Çelebî, dema di sala 1642an de çûye Îmadiyeyê (navenda herêma Behdînan) ev helbestvan dîtiye û di berhema xwe de cih daye helbesteke wî ku ev jî serdema wî bi me dide nîşandan.

1.6.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Bi qasî ku tê zanîn ji bilî vê helbesta ku Çelebî di berhema xwe de weşandiye ti helbestên dî yên Mela Remezanê Ebbasî negihîştine me. Çelebî, berî ku cih bide vê helbestê, behsa gelek diyalekt û devokên Kurdî kiriye û di dawiyê de gotiye ku, ji van diyalekt û devokan hemûyan a ku herî zêde fesîh, zerîf û rewan tê axaftin, devoka xelkê Îmadiyeyê ye ku ew jî devoka Behdînî ye. Çelebî piştî ku cih daye hinek rîwayetên derheqê

CamScanner ile tarandı

zimanê Kurdî de gotiye ku beyt û helbestên nazik ên Behdîniyên Îmadiyeyê hene û di bin sernavê "Ji Mela Remezanê Ebbasî bi Ziman Kurdên Îmadiyeyê Helbest" cih daye helbesteke Mela Remezan.

Li jêrê em cih didin beytên pêşî û paşî yên vê helbesta ku ji 9 beytan pêk hatiye. Çawa ku di beyta paşî de tê dîtin helbestvan xwe wekî "Remezanê Kurdikî" bi nav kiriye.

Rayê li Asaf diken, walih û heyranê 'eşq
Dersê Aristo diden, serxoş û sekranê 'eşq

Faş meke razê xwe ey Remezanê Kurdikî
Şemme nesîmî dibî tazî û 'uryanê eşq

Li gorî ku Ewliya Çelebî dibeje, gelek helbest û qesîdeyên helbestvanên Îmadiyeyê hene ku bi cureyên muselles, murebbe', muxemmes, museddes, musebbe' û musemmenan hatine nivîsandin. Çelebî neqil dike ku dema Newroza Siltanî tê, hemû zarok, mezin, zana û helbestvanê vî bajarî diçûne seyrangehan û ji hev re beyt û helbest dixwendin. Ev tev didin nîşandan ku herçiqas Çelebî ji Mela Remezanê Ebasî helbesteke tenê neqil kiribe jî, ew xwediyê gelek helbestên dî ye jî û dibe ku rojekê hinek helbestên wî yên dî jî derkevin holê.[131]

2. DI SEDSALA HIVDEHEM DE PEXŞANA KURDÎ

Tarîxa edebiyata gelên rojhilatê ji aliyekî ve tarîxa helbestê ye. Lewre van gelan bi piranî ji edebiyatê helbest fêhm kirine. Bêguman têkiliya vê yekê, bi hestiyariya gelên rojhilatê û şertên tarîxî û sosyal re jî heye. Dema em bi vê perspektîfê li tarîxa edebiyata Kurdî dinêrin, em dibînin ku bi rastî jî di wir de mirov dikar bêje bi tevahî tarîxa helbesta Kurdî heye. Di serdema klasîk de met-

131 Evliya Çelebî, *Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahetnamesi*, YKY, İstanbul, 2010, b. II, r. 711-713.

CamScanner ile tarandı

nên pexşan ên Kurdî zehf kêm in. Bêguman ev bi rewşa Kurdan a siyasî û sosyal ve girêdayî ye. Bi qasî ku tê zanîn cara pêşî di vê sedsalê de (sedsala XVIIan) berhemeke pexşan bi Kurdî hatiye nivîsandin. Ew jî "Serfa Kurmancî" ya Eliyê Teremaxî ye.

2.1. ELIYÊ TEREMAXÎ

2.1.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Li gorî ku Mela Mehmûdê Bazîdî dibêje, Eliyê Teremaxî di tarîxa Hezarê de jiyaye ku mîladî beramberî derdora sedsala XVIIem tê. Teremaxî ji qezaya Miksê, qundê Teremaxê ye. Miksa ku li gorî gotina Mela Mehmûd wê demê li ser Hekkarî bû, niha jî li ser Wanê ye. Teremaxî, li cihên wekî Bexda, Mûsil, Behdînan û Soran xwendina xwe ya medreseyê kiriye. Bi taybetî di fennê 'ilmê Serfê da zêde meharet peyda kiriye. Di zemanê xwe de gelekî zêde meşhûr û naskirî bûye. Bazîdî dibêje ku heta dema ew tê de bûye, nav û nîşanên Teremaxî di Kurdistanê da hebû. Elî Teremaxî di nav gundê xwe de mizgeft û medrese ava kirine û demekê li wir ders gotine. Dema ku wefat kiriye li gundê xwe hatiye veşartin.[132]

2.1.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Eliyê Teremaxî di tarîxa edebiyata Kurdî de bi berhema xwe ya bi navê "Serfa Kurmancî" yan jî bi gotineke dî "Tesrîfa Kurmancî" cihê xwe girtiye. Di vê berhemê de pêşî serfa (morfoloji) zimanê Erebî û piştre jî ya Farisî bi Kurdiya Kurmancî hatiye nivîsandin. Mela Mehmûdê Bazîdî sebebê nivîsandina vê berhemê weha aniye zimên:

"Weku dîtiye û muşahede kirine ku 'Ilmê serfê fennekî zehmet û dijwar û asê ye û mubtedî zû bi zû sîxe û î'lalêd wan ji kitêbêd Erebiyye îxrac nakin, ji boyî hisiya mubtediyan bi zimanê Kurmancan îbaretekî tesrîfê tesnîf kiriye ku ew îbaret di nêva

132 Mela Mehmûdê Bazîdî, "Muqeddîma Îlmê Serfê", r. 55.

CamScanner ile tarandı

telebeyêd ekradan qewî meqbûl û ehemm û lazim e. Elbette weku talibî mirada xwondina Serf û Nehw û Madde û Mentiq û ulûmêd mayî dikin, elbette berê metn û îbareya Elî Teremaxî bixûnin û jiber bikin, paşê dest bi ulûmêd mayî bikin.".[133]

Çawa ku Bazîdî jî dibêje ev berhem di medreseyên Kurdan de wekî kitêbeke dersê hatiye xwendin. Berhem ji çar aliyan ve girîng e. Yek ji wan ew e ku ne bi nezmê bi pexşanê hatiye nivîsandin. Mirov dikare vê berhemê wekî yekem berhema pexşan a Kurdî bihesibîne. Ya duyem ew e ku ev berhem di destpêka serdema mîrektiyan de hatiye nivîsandin. Wate di demeke zû de hatiye nivîsandin. Ya sêyem ew e ku ev berhem taybetiyên vegotina Kurdiya Kurmancî ya dema xwe bi me dide nîşandan. Ya çarem jî di berhemê de carcaran digel qaideyên zimanê Erebî û Farisî behsa rêzikên Kurdiya Kurmancî jî hatiye kirin. Bi vî awayî ji bo gramera Kurdiya Kurmancî wekî xebateke pêşîn tê hesibandin.

Nusxeya destnivîs a pirtûkê, bi destê Mele Mehmûdê Bazîdî hatiye nivîsandin û wî jê re pêşgotineke kurt jî nivîsiye ku agahiyên li jorê ji vê pêşgotinê hatine wergirtin. Di sala 1274ê koçî (1857-58) de gava ku konsolê Rûs A. Jaba derdora Erzeromê lêkolîn li ser ziman û çanda Kurdî kiriye, Bazîdî ev destnivîsa xwe digel hinek rîsaleyên dî dane wî. Jaba jî ew birine Rûsyayê. Ev destnivîs niha li bajarê Lenîngradê li Akademiya Zanistî ya Rojhilatê, (jimara destnivîsê c 1958), di binê parastinê de ye.

Merûf Xeznedar, ev berhem bi navê "Destûrî Zimanî Erebî bi Kurdî, Elî Teremaxî Sedey Huvdemî Zayînî. " di sala 1971ê de li çapxaneya "Dar-ul Zeman"ê daye çapkirin. Piştre Reşîd Findî bi navê "Elî Teremaxî Êkemîn Rêzimannivîs û Pexşannivîsê Kurd e" ev berhem ji nû ve daye nasandin û weşandin (Bexda, sal 1985). Zeynelabidîn Zinar jî deqê berhemê latînîze kiriye û li Swêde çap kiriye: (Mele Elî Teremaxî, Serfa Kurmancî, Wergera ji tîpên Erebî, Zeynelabidîn Zinar, Pencînar, Stockholm 1997.)

133 Mela Mehmûdê Bazîdî, h. g., r. 18 (Ji rexê herfên Erebî).

CamScanner ile tarandı

D. SEDSALA HIJDEHEM (SEDSAL: XVIII)

Piştî ku edebiyata Kurdiya Kurmancî di sedsala hivdehan de damezirîna xwe temam dike, di sedsalên hijdeh on nozdehande, yanî heta bi dawiya mîrektiyan, bi heman şêweyê rêça xwe dişopîne. Bêguman helbestvanê herî navdar ê sedsala hijdehan Melayê Bateyî ye. Ehmedê Xanî di warê zanista Eqîdeyê û ferhengê de menzûmeyên dîdaktîk dabûn, lê Melayê Bateyî ne di warê dîdaktîzmê de, di warê mijareke dînî-edebî de cara pêşî berhemek daye ku ew jî "mewlûdname" ye. Bateyî di tarîxa edebiyata Kurdî de bûye damezirînerê cureya "mewlûdname"yê ku heta îro jî tesîra wî dom dike.

Di sedsala hijdehan de di warê mesnewiyên evînî de du nûnerên girîng derketine ku yek ji wan Selîmê Silêman, yê dî jî Harisê Bedlîsî (Sewadî) ye. Di edebiyata Kurdiya Kurmancî de yekem Yûsif û Zelîxa ji aliyê Selîmê Silêman ve û yekem Leyla û Mecnûn jî ji aliyê Harisê Bedlîsî (Sewadî) ve hatiye nivîsandin.

Di vê sedsalê de Îsmaîlê Bazîdî bi "Gulzar"ê di warê ferhengnasiya menzûm de li pey rêça Ehmedê Xanî û Miradxanê Bazîdî jî bi "Zembîlfiroş"ê di warê edebiyata dînî-tesewifî de li pey rêça Melayê Bateyî çûye.

Di vê sedsalê de nûnerekî ku di cureya cengnameyê de menzûmeya "Qewlê Newala Sîseban" nivîsandiye, Şêx Xalidê Zêbarî yê Yekem e.

Mela Mensûrê Girgaşî, Seyfiyê Şûşî, Evdilqadirê Hekkarî, Macin, Mîna û Sadiq helbestvanên dî yên ve sedsala hijdehan e ku li pey rêça yên berî xwe çûne.

Herçiqas ne di çarçoveya edebiyata klasîk de jî be, lawija Basilyos Şem'ûnê Duyem, ji ber ku ji aliyê Siryaniyekî ve hatiye vegotin, di tarîxa edebiyata Kurdî cihe xwe yê taybet heye.

Di warê pexşana Kurdî de di vê sedsalê de du nûnerên me hene: Mela Yûnisê Helqetînî û Melayê Erwasî.

CamScanner ile tarandı

1. DI SEDSALA HIJDEHEM DE NEZM/ HELBESTA KURDÎ

1.1. MELAYÊ BATEYÎ

1.1.1. Jiyana wî

1.1.1.1. Serdema wî

Melayê Bateyî helbestvanekî herî girîng yê vê sedsalê ye. Wekî piraniya kesayetên Kurdan digel ku agahiyên wekî jidayîkbûn û wefata wî yên derbareyê jiyana wî de ne hatine qeydkirin jî, kêm-zêde derketiye meydanê ku Melayê Bateyî di sedsala hijdehem de jiyaye. Nêrîna ku berê Mela Bateyî wekî helbestvanê sedsala XVan dihat nîşandan şaş e. Ev nêrîn li ser esasê agahiyên A. Jaba yên ku di rîsaleya helbestvanên Kurdan de di sala 1860'î de destnîşan kirine ava bûye ku li gorî vê Melayê Bateyî di navbera salên 1417 û1495an de jiyaye. Piştî Jaba jî û gelek kesên dî jî ev agahî dûbare kirine. Lê ji van argumanên jêrîn derdikeve holê ku Melayê Bateyî ne di sedsala XVan de, lê di sedsala XVIIIan de jiyaye.

Ji van arguman a yekem gotûbêja (muşa'ereya) Melayê Bateyî ya digel Mela Mensûrê Girgaşî ye. Mela Mensûrê Girgaşî jî di nîvê duyem ji sedsala XIIê hicrî de di çaxê pîrîtiya xwe de bûye ku ev jî beramberî 1737-1787ê mîladî, wate beramberî sedsala XVIIIan tê. Li gorî ku Melayê Bateyî bi Mela Mensûr re muşa'ere kiriye, lazim e ew jî di sedsala XVIIIan de li heyatê be.

Argumana duyem di dema zaroktiya Bateyî de çûyîna Êzdîn Şêrê mîrê Hekkariya bo gundê Bateyê û dîtina wî ya Melayê Bateyî ye ku wê demê Bateyî zarok bûye. Ev Êzdîn Şêr, kurê Şerefxan Begê mîrê Hekkariya ye û neviyê Zekeriya Begê hevçerxê Şerefxanê Bedlîsî ye. Şerefxanê Bedlîsî dema "Şerefname"ya xwe di sala 1596an de nivîsandiye behsa vî Zekeriya Begî kiriye. Ji vê jî derdikeve meydanê ku ev Zekeriya Beg di sala 1596an de li ser desthilatê bûye. Piştî vê tarîxê bi demekê

CamScanner ile tarandı

Zekeriya Beg koçî dawiyê kiriye û piştre kurê wî û piştre jî ne-viyê wî (Êzdîn Şêr) bûne mîrê Hekkariya. Ev jî dide nîşandan ku heta Êzdîn Şêrê ku Bateyî bi zaroktî dîtiye bûye mîr, bi îhtî-maleke mezin tarîx gihiştiye derdora 1700'î. Li gorî vê jî Bateyî di vê tarîxê de hê zarok e û piraniya temenê xwe di nîvê pêşî yê sedsala XVIIIan de derbas kiriye.

Dîsa tê gotin ku Yehya Begê kurê Êzdîn Şêr ratib/meaş daye Bateyî. Bi rastî jî di dema şerê Osmaniyan û Safewiyan de mîrekî Hekkarî bi navê Yehya Beg hebûye û ev şer jî di tarîxa 1730-1747an de qewimiye.

Dema mirov li van her sê argumanan dinêre, derdikeve holê ku Melayê Bateyî ne di sedsala XVan de, di sedsala XVIIIan de jiyaye. Lê dîsa li gorî van argumanan ne kifş e ka Bateyî di kîjan periyoda vê sedsalê de jiyaye.

Îcar eger em hinek argumanên dî jî li ber çavan bigrin pe-riyoda ku Melayê Bateyî tê de jiyaye kifş dibe. Li gorî ku hel-bestên Bateyî di mecmû'eyeke helbestan ku di sala 1767an de hatiye nivîsandin de (ku Ebdureqîb Yûsif ev berhevok dîtibû û çapkiribû) hene, lazim e Bateyî wê demê (1767) yan jî berî hingî li heyatê be. Argumaneke dî jî ew e ku eger Melayê Bateyî berî Ehmedê Xanî (1650-1707) bûya, Xanî dê di Mem û Zînê de behsa wî bikira. Ji vê jî derdikeve holê ku Bateyî ne berî Xanî ye. Bi gotineke dî Melayê Bateyî yan piştî koça dawiyê ya Xanî (1707) hatiye dinyayê, yan jî di dema nivîsandina Mem û Zînê de hatibe dinyayê jî wê demê zarok bûye, yan jî ne bi nav û deng bûye. Ji van her du argumanên dawî derdikve holê ku Melayê Bateyî ji periyoda piştî Xanî (1707) heta bi derdora tarîxa 1767an jiyaye. Tarîxa ku Merûf Xeznedar jî ji bo jiya-na Melayê Bateyî dibêje ku 1675-1760 e, bi van agahiyan re guncaw e. Wekî encam eger mirov van argumana tevan li ber çavan bigire, bi rehetî merev dikare bêje ku Bateyî di dawiya sedsala hivdehemin hatiye dinyayê û heta bi nîvê serdema du-yem ji sedsala hijdehemin jiyaye.

CamScanner ile tarandı

1.1.1.2. Navê wî

Navê Melayê Bateyî Huseyn e. Lê ji ber ku hinek lêkolînvanan di hinek çapên mewlûda wî de navê wî bi şaşî wekî Ehmed danîne, ew, demeke dirêj wekî Mela Ehmedê Bateyî hatiye naskirin. Ew kesê ku cara yekem navê wî wekî Ehmed daniye, Mela Mehmûdê Bazîdî ye.[134] Piştî wî kesên wekî Jaba, Mîcirson, Belec Şîrkû, Celadet Bedirxan, M. Emin Zeki Beg, Elaedînê Seccadî û Qenatê Kurdo jî ev tişt dûbare kirine.[135]

Di hin çapên Mewlûde de jî (Stenbolê 1323/1907) îcar navê wî wekî Mela Hesenê Ertûşî, yan jî wekî Mela Mihemed hatiye nivîsandin. Lê çawa ku me got navê wî yê rastî Mela Huseynê Bateyî ye. Ji bilî ku xelkê wî û eşîra wî heta îro jî wî weha bi nav dikin, delîleke nivîskî jî ew e ku di destnivîsara Mela Nezîrê Pîrosî de navê wî bi awayekî aşîkar wekî Mela Huseyn hatiye nivîsandin. Pîrosî derheqê wî de bi zimanê Erebî weha gotiye:

"Tişta ku xelkê Hekkariya dibêjin û çawa ku ji gotinên zarokên wî hatiye fêmkirin navê wî Mela Huseyn e, navê bavê wî Mustefa ye. Li gundê Bateyê ku li wilayeta Hekkariya dikeve rojhilatê qezaya Beytuşşebabê hatiye veşartin."

Dîsa Pîrosî dema berhema Mela Bateyî ya bi navê Hemailê nivîsandiye, di wir de bi zimanê Erebî qeydeke weha daniye: "Mela Dirbas kurê Mela Tahir kurê Mela Huseynê Bateyî ev nusxe nivîsandiye."

Herweha dema Mewlûda wî li Şamê di sala 1947an de hate çapkirin navê wî rast hate nivîsandin. Ji van belgeyan derdikeve holê ku navê Melayê Bateyî Huseyn e.

1.1.1.3. Cihwarê wî

Çawa ku di qeydên Pîrosî de ji derbas dibe, Melayê Bateyî jî gundê Bateyê ye. Ev gund dikeve rojhilatê Beytuşşebabê

134 Bazîdî, "Rîsaleya Şa'ir û Musennefên di Kurdistanê", r. 13.

135 Ji bo nêrînên van kesan bnr. Amêdî, b.n., 190-191; Azîzan, *Klasikên me*, r. 813; Kurdo, r. 65.

CamScanner ile tarandı

(Elke). Eşîra wî jî eşîra Ertûşiyan e. Lewra hem gundê wî jî vê eşîrê ye, hem jî şohreta wî bi vê eşîrê ye.

Çawa ku di qeyda Pîrosî de jî derbas dibe navê bavê Melayê Bateyî Mela Mustafa ye. Ev Mela Mustefa bi eslê xwe ji gundê Batuyan e. (Niha li ser Şirnexê ye). Ew û sê birayên xwe çûne devera Zoxo li gundê Bazingîrê li nav Mamîzdînan bi cih bûne. Piştre ji wir jî çûne li gundê Bateyê bi cih bûne. Bi navê Osman, Ehmed, Mihemed sê birayên Melayê Bateyî û bi navê Mela Ehmed apekî wî hebûye.

1.1.1.4. Xwendina wî

Melayê Bateyî, pêşî li cem apê xwe Mela Ehmed xwendiye. Li gorî rîwayetê rojekê mîrê Hekkariya Êzdînşêrê Duyem riya xwe bi Bateyê xistiye. Dema ku dîtiye Huseynê biçûk li ser kaniyê nimêjê dide kirin, gazî bavê wî kiriye û jêre gotiye ku kurê xwe bide xwendin. Bavê wî jî ew biriye Hekkarî û daniye medreseya mîrgehê. Wî jî xwendina xwe li wir xilas kiriye. Li gorî ku Ebdureqîb Yûsif dibêje ihtîmal heye ku li Muksê li medreseya Mîr Hesenê Welî jî xwendibe. Melayê Bateyî piştî xilaskirina xwendinê li gundê Pîrosa (nêzî Bate) dest bi melatiyê kiriye.

1.1.1.5. Malbata wî

Melayê Bateyî, li heman gundî (Pîrosa) bi xanimeke bi navê Hemayil re zewiciye. Ji wê qeyda ku Mela Nezîrê Pîrosî di berhema Mela Bateyî ya bi navê Hemailê de nivîsandiye, tê fêmkirin ku kurêkî Melayê Bateyî bi navê Mela Tahir û kurekî Mela Tahir, anko neviyekî Melayê Bateyî bi navê Mela Dirbas hebûye. Helbet em dizanin ku Mela Nezîr ne ku li ser behsa zarokên Mela nivîsandiye, wî dema behsa mustensixê berhema bi navê Hemailê kiriye, gotiye ku mustensixê vê berhemê Mela Dirbasê kurê Mela Tahirê kurê Mela Huseynê Bateyî ye. Nexwe dibe ku hinek zarokên dî jî yên Melayê Bateyî hebin. Ji

CamScanner ile tarandı

xwe li gorî hinek riwayetan[136] bi navê Asmîn, Zulfê û Banê sê keçê Melayê Bateyî hene.

Tê gotin[137] ku Bateyî çûye Hecê û li ser gora Cenabê Pêxember helbestek gotiye ku ev helbest weha dest pê dike:

Hilo rabe Ebu'l-Qasim
Hilo ey qasidê ekber
Hilo fexra Benî Haşim
Hilo rabe tu wî rehber

1.1.1.6. Koça Dawiyê

Dema me behsa serdema Bateyî kir, me got ku Bateyî di dawiya sedsala hivdehem hatiye dinyayê û heta piştî nîvê duyem ê sedsala hijdehem jiyaye. Ji vê jî tê fêmkirin ku wî temenekî direj bûrandiye. Ji vê beyta wî ya jêrîn derdikeve holê ku temenê wî qet nebe gihîştiye pêncih salî.

Pêncî salî şehlewendî keftime çaha resed
Min nizanim çerxê dêm e tê heye burca esed

Derheqê koça wî ya dawiyê de di nav gel de wekî efsaneyekê belav bûye ku zivistanekê dema ji Hekkariya, yan jî ji Miksê vegeriyaye û gihiştiye Zozanê Berçela, li wir berf bi ser de rijiyaye û di bin berfê de wefat kiriye. Piştî ku berf heliyaye hatiye dîtin û termê wî bo Bateyê hatiye guhastin û li wir hatiye definkirin. Tê gotin ku dema termê wî hatiye dîtin helbesta wî ya bi navê "Ji çirya paşiyê pê da" di berîka wî de bûye û piştî ku berf bi ser de rijiyaye di binê berfê de ev helbesta xwe nivîsandiye. Destpêka vê helbestê weha ye:

136 Babê Zêrevanî, "Mela Hisênê Bateyî-1", *Nûbihar*, hj. 87, sal: 2002.
137 Amêdî, b.n., r. 192.

CamScanner ile tarandı

Ji çirya paşiyê pê da
Melayê Bateyî kanê
Sefer kêşa bi Miksê da
Li ser weqtê zivistanê

Lê hin kesên wekî Mela Qasimê Ertûşî vê riwayetê durust nabînin û dibêjin tiştekî wisa neqewimiye û wî li gundê xwe koçî dawiyê kiriye. Ji xwe derheqê sebebê nivîsandina helbesta "Ji çirya paşiyê pêda" bûyerek dî jî tê gotin. Li gorî vê Yehya Begê ku her sal ratib dida Melayê Bateyî, li ser gotina hesûdan ratiba wî biriye û gotiye eger Bateyî pê bizanê ew welî ye. Bateyî jî çûye Hekkarî û gef li mîr xwarine û helbesta "Ji çirya paşiyê pêda" xwendiye û derketiye. Yan jî salekê li Muksê maye û ev helbest wekî nameyekê ji Mîr re şandiye. Piştî vê nameyê Mîr poşman bûye û rêkiriye pey wî.

Melayê Bateyî di nav xelkê herêma xwe de wekî weliyekî hatiye naskirin. Tê gotin ku dema Pîrosî ji Zozana diçûne deştê tişt miştê xwe didanîne cem gora wî û heta ku vedigeriyan kesekî destê xwe ne dida wan tiştan.[138]

1.1.2. Aliyê wî yê Edebî

Melayê Bateyî di tarîxa edebiyata Kurdî de bi taybetî di warê edebiyata dînî de derketiye pêş. Hem mewlûda wî hem jî helbestên wî vê yekê nîşan didin. Di tarîxa edebiyata Kurdî de cara pêşî Melayê Bateyî bi cureya Mewlûdê berhemeke edebî daye. Herweha helbestên wî yên lîrîk jî hene.

Mexlesa wî

Melayê Bateyî, di helbest û menzûmeyên xwe de peyva "Bateyî" wekî mexles bi kar aniye. "Bateyî" forma nîsbetê ya gundê wî ye. Navê gundê wî "Bate" ye. "Bateyî" jî tê wateya ew kesê ku ji gundê "Bate"yê ye. Helbestvan carinan di hinek helbestên

138 Ji bo agahiyên berfireh bnr. Tehsin Doskî û Muhsin Doskî, *Melayê Bateyî Jiyan û Berhem*, weş. Spîrêz, Duhok 2005, r. 13-33.

CamScanner ile tarandı

xwe de ji ber pêdiviya kêşê forma "Batey" jî bi kar aniye. Li cihekî jî "Melayê Bateyî" bi kar aniye

Helbestvan di dawiya "Mewlûd"ê de mexlesa xwe "Bateyî" weha bi kar aniye:

Bo cemî'ê Mu'minînê salihe
Bo feqîrê Bateyî el-Fatihe

Di vê benda jêrîn de jî ji ber pêdiviya kêşê "Batey" bi kar aniye:

Ey seyyidê 'alem senedê nûra hîdayet
Hêvî dikin em ji te ey sedrê rîsalet
Mehrûm nekî me tu ji dîwana şefa'et
Batey bi cehennem nebirî roja qiyamet

Helbestvan di vê beyta jêrîn de mexlesa xwe wekî "Melayê Bateyî" bi kar aniye:

Ji çirya paşiyê pê da
Melayê Bateyî kanê
Sefer kêşa bi Miksê da
Li ser weqtê zivistanê

Berhemên wî

Melayê Bateyî du menzûmeyên dînî (Mewlûd û Zembîlfiroş), berhemeke pexşan (Hemail) û helbestên curbicur nivîsandine. Li jêrê di vê çarçoveyê de em dê li ser berhemên Melayê Bateyî rawestin.

1.1.2.1. Mewlûdname

CamScanner ile tarandı

1.1.2.1.1. Girîngiya wê

Berhema herî girîng a Melayê Bateyî "Mewlûdname" ye ku wekî "Mewlûda Kurmancî" meşhûr bûye. Ev mewlûdnameya Bateyî di tarîxa edebiyata Kurdî de yekem berhem e ku di vî warê xwe de hatiye nivîsandin.

Çawa ku di mijara Nûbihara Biçûkan de jî me gotibû Mele Mahmûdê Bayezîdî di pêşgotina kitêba Elî Teremaxî de navên pênc berhemên ku di medreseyên Kurdistanê de wekî kitêbên dersê tên xwendin dide ku yek ji van jî Mewlûda Melayê Bateyî ye[139] Ev jî girîngiya Mewlûda Bateyî û cihê wê yê taybet di dîroka edebiyata Kurdî de bi me dide nîşandan.

Melayê Bateyî bi vê berhema xwe bûye yekem kes ku di warê vê cureya edebî de bi Kurdiya Kurmancî berhemek nivîsandiye. Berî wî li nav Kurdan mewlûdên Erebî dihatin xwendin. Lê piştî Bateyî êdî mewlûda wî ya bi Kurdiya Kurmancî ketiye şûna yên Erebî. Tesîra Bateyî ji aliyê mewlûdê ve li ser gelek helbestvanên Kurd çêbûye. Lewra pişt wî re gelek kesan ew şopandine û mewlûdên Kurdiya Kurmancî nivîsandine.

Mewlûdnameya ku wekî cureyeke edebî mijara wê jidayîkbûna Cenabê Pêxember e, di nav gelên Misilman de cara pêşî ji aliyê Ebu'l-Ferec Îbnu'l-Cewzî (w. 597/1200) bi navê "Mewlidu'l-`Erûs", piştre Ebu'l-Qasim es-Sebtî (w. 600/1203) bi navê "ed-Durru'l-Munezzem fî Mewlidi'n-Nebî", piştre Îbn Dihye el-Kelbî (k.d.633/1235) ve bi navê "et-Tenwîr fî Mewlidi`s-Siraci`l-Munîr" hatiye nivîsandin. (eva dawî li ser xwestina Muzafferuddîn Gokboru di sala 604/1207an de li Erbil/Hewlêrê hatiye nivîsandin û di tarîxa Îslamê de yekem car wê demê rêwresmên mewlûdê hatin îcrakirin.)

Di Mewlûda Bateyî de ji xulqiyeta nûra pêxember heta bi sê saliya wî heyata Cenabê Pêxember cih girtiye.

Nusxeya herî kevn a A. Jaba ji 17 beş û 576 beytan û ya Hazik ji 16 beş û 527 beytan pêk hatiye.

---

139 Bazîdî, "Muqeddîma 'Îlmê Serfê", r. 18.

CamScanner ile tarandı

1.1.2.1.2. Bîbliyografyaya Mewlûda Bateyî

1.1.2.1.2.1. Destnivîsên Mewlûdê

Gelek destnivîsên Mewlûda Melayê Bateyî hene. Ji van destnivîsan ên herî kevin ev in:

1. Mihemedê Muksî di sala 1791ê de li Erzeromê nusxeyek îstînsax kiriye. Ev nusxe li Leningradê li pirtûkxaneya Saltikov-Şêdrînê di jimareya Kurd 18an de ye.

2. Li Leningradê li pirtûkxaneya Saltikov-Şêdrînê di jimareya Kurd 33B de nusxeyeke ku di sedsala 18an de hatiye îstînsaxkirin heye.

3. Mela Mehmûdê Bayezîdî di sala 1857ê de li Erzurûmê nusxeyek istinsax kiriye. Ev nusxe l li Leningradê li pirtûkxaneya Saltikov-Şêdrînê di jimareya Kurd 19an de ye.

4. Hesen el-Îrûnî b. Cangîr el-Binbatî di sala 1871ê de nusxeyek istinsax kiriye.

5. Li pirtûkxaneya İxtisasê ya Diyarbekirê nusxeyek heye ku di sala1299/1881ê de hatiye îstînsaxkirin.

6. Mela. Mihemedê Wanî di sala 1887an de nusxeyek îstînsax kiriye.

7. Nusxeya ku Nûbiharê çap kiriye, di sala 1240/1825an de hatiye îstînsaxkirin.

1.1.2.1.2.2. Çapên Mewlûdê

1. Ji aliyê Haziq Derwêş Nîhadê Diyarbekrî ve di sala 1313/1895an de li Stenbolê hatiye çapkirin.

2. Ji aliyê Albert von Le coq ve di sala 1903yan de li Berlinê hatiye çap kirin.

3. Di sala 1323/1907an de li Stenbolê hatiye çapkirin. Di vê nusxeyê de navê nivîskar wekî Hesen el-Ertoşî derbas dibe.

4. Ji aliyê Kurdîzade Ehmed Ramiz ve di sala 1324/1906)an de li Qahîreyê hatiye çapkirin. (Ali Emîrî nu. 1369)

5. Di sala 1917 û 1931ê de li Stenbolê di metbe'eya Osman-bey de hatiye çapkirin.

CamScanner ile tarandı

6. Di sala 1947an de li Şamê hatiye çapkirin. Di vê çapê de navê nivîskar wekî Mela Hisên hatiye danîn.

7. Enwer Maî di sala 1960î de di pirtûka "el-Ekrad fi Behdînan" de weşandiye.

8. Di sala 1966an de li Erbîlê hatiye çapkirin.

9. Di sala 1982yan de li Bexdayê ji aliyê Sadiq Behadîn Amêdî ve bi tehqîq hatiye çapkirin.

10. Di sala 1992yan de ji aliyê Zeynelabidîn Zinar ve di nav weşanxaneya Firatê de li Stenbolê hatiye weşandin. Ev çap bi herfên latînî ye.

11. Di sala 2011an de ji aliyê Huseyn Şemrexî ve di nav weşanên Nûbiharê de li Stenbolê hatiye weşandin. ev çap bi herfên Erebî û latînî ye.

12. Di sala 2003yan de ji aliyê Mela Abdulbasıt ve di nav weşanxaneya Nûbiharê de li Stenbolê hatiye weşandin.

1.1.2.1.2.3. Lêkolînên li ser Mewlûdê

Çend lêkolînên ku li ser jiyan û berhemên Melayê Bateyî hatine amadekirin ev in.

1. Tehsîn Î. Doski, Muhsin Î. Doskî, Melayê Bateyî Jiyan û Berhem, Spirêz, Hewlêr 1996-2005 .

2. M. Xalid Sadînî, Mela Huseynê Bateyî Jiyan, Berhem û Helbestên Wî, Nûbihar, Stenbol 2010.

3. Zîver İlhan, Mewlûda Mela Huseynê Bateyî-Metn û Lêkolîn, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, t.ç, Mardin 2014.

1.1.2.1.2.4. Şerhên Mewlûdê

Çend şerhên Mewlûdê yên ku heta niha hatine çêkirin ev in:

1. *Behcetu'l-Enam bi Şerhî Mewlidi'n-Nebiyyî Eleyhisselatu Wesselam* (1971): Ev şerh ji aliyê Zeynelabidîn Amidî ve hatiye çêkirin. Zimanê wê Erebî ye.

2. *Sefwetu'd-Dîraye fî Şerhi'l-Mewlidî bi'r-Rîwaye, Cami'ê*

CamScanner ile tarandı

Mu'cîzat û Ayetan Şerha Mewlidê bi Rîwayetan: Ev şerh jî ji aliyê Zeynelabidîn Amidî ve hatiye çêkirin. Zimanê wê Kurdî ye.

3. *Sehlu'l-Mewrid fî Şerhi'l-Mewlid* (1980): Ev şerh ji aliyê Mela Nûrillahê Kodişkî ve hatiye çêkirin.

1.1.2.2. Zembîlfiroş

Berhemeke dî ya Melayê Bateyî menzûmeya Zembîlfiroş e. Bateyî di tarîxa edebiyata Kurdî duyem kes e ku ev mijar bi awayê nezmê nivîsandiye. Yê yekem Feqiyê Teyran û yê sêyem jî Miradxanê Bazîdî ye. Di sala 1978an de Kurdnasa Sovyetê Jakêlîn Şûrênovna Musaelyan di teza xwe ya doktorayê ya bi navê "Zembîlfiroş û Şovêd wê Folklorî" de li ser destnivîsara Zembilfiroşê ya Melayê Bateyî ya ku li Leningradê li pirtûkxaneya Saltikov-Şêdrînê de bûye û Zembîlfiroşên dî jî sekiniye. Li Petersbûrgê di jimareyên Kurd 27, 45, 28, 36, 26an de nusxeyên "Zembîlfiroş"ê hene. Piraniya van Zembîlfiroşan bi bal Melayê Bateyî ve tên nîsbetkirin. Herweha di mecmu'ya jimare 26 de jî digel helbestên helbestvanên dî, Zembilfiroş û helbestên dî yên Melayê Bateyî jî hene.[140]

1.1.2.3. Helbestên wî

Ji bilî Mewlûdname û Zembîlfiroşê helbestên Melayê Bateyî jî hene. Wî bi xwe ev helbestên xwe di dîwanekê de tertîb nekirine. Vê dawiyê helbestên wî ji aliyê hinek lêkolînvanan ve hatine komkirin.

Tehsin Doskî û Muhsin Doskî, di berhema bi navê "Melayê Bateyî Jiyan û Berhem" de, 21 helbest, gotûbêja wî digel Mela Mensûrê Girgaşî û texmîseke wî li ser xezeleke Macin kom kirine.

Li Petersbûrgê di jimare Kurd 26, 27 û 36an de jî hinek mecmu'e hene ku di wan de digel helbestên helbestvanên dî yên Melayê Bateyî jî hene.

---

140 Huşyar, *Zexaîru't-Turasi'l-Kurdî fî Xezainî*, Petersborg, http://brob.org/old/bohoth/bohoth/bohoth026.htm, 29.10.2013.

CamScanner ile tarandı

Di "Keşkula Kurmancî" ya Ebdureqîb Yûsif de sê helbestê wî hene.

Melayê Bateyî hem di warê dînî de hem jî di warê evînî de helbest nivîsandine. Helbestên wî yên dînî derheqê yekîtî û mezinahiya Xweda (tewhîd) û pesnê Cenabê Pêxember (ne't) de ne.

Mînaka tewhîdekê:

Subhan ji mîrê Qadirî
Adem ji tînê çêkirî
Qalib bi rûhê hey kirî
Wesfan çi bêjim ya Rebî

Min dî vebûn dergah û der
Ê têkelî bangê seher
Der kûş û hûşim şud xeber
Batey *bixwaze metlebê*

Mînaka ne'tekê:

Ey ne'tê tu ez 'erşê heta ferşê şehîra
Ez pertewê nûra te cîhan geşt(i) munîra
Ey seyyidê 'alem bike perwayê esîra
Ey tacê serê şah û selatîn û emîra
Qed kane leke'l-fedlu leke'l-cûdu kesîra
Ursîlte île'l-xelqî beşîren we nezîra

Ey seyyidê 'alem senedê nûra hîdayet
Hêvî dikin em ji te ey sedrê rîsalet
Mehrûm nekî me tu ji dîwana şefa'et
Batey bi cehennem nebirî roja qiyamet
Qed kunte lehû semme şefi'en we zehîra
Ursîlte île'l-xelqî beşîren we nezîra

CamScanner ile tarandı

CamScanner ile tarandı

Mînaka helbesteke lîrîk:

Subh û êvarê şeva tarî şemala kê yî tû?
Leyletu'l-Qedr û Berat in nûrê mala kêyî tû?
Çiçeka baxê Îrem şox bejn û bala kêyî tû?
Bo xwedê kî bêje min kanî şepala kêyî tû?
Dêm kitêb e zulf[î] haşî şerhê xala kêyî tû?

Şeh kitêbek min divêt behsê muhebbet bittemam
Sed tilism û sihrî tê da pêkve Suryanî meqam
Ebceda 'işqê me xwend û 'eql(i) winda kir we mam
Hûriya baxê bihiştê tûtiya tawus xeram
Xeyrê Batey padîşaha min delala kêyî tû?

1.1.2.4. Hemaîl

Ev berhema Melayê Bateyî ne bi Kurdî ye. Berhem bi Erebî û Farisî hatiye nivîsandin. Di berhemê de derheqê nivişt û hemayilên ku mirov bi xwe ve dikin; derman û tilismên hinek nexweşiyan û fêdeyên sûret û ayetên Quranê de agahî hene.

Nusxeyeke vê berhemê ya Mela Mihemed Nezîrê Pîrosî ye. Li gorî îfadeya bi Erebî ya li ser nusxeyê, ev nusxe ji aliyê Mela Dirbasê neviyê Melayê Bateyî ve hatiye nivîsandin. Nusxeyeke dî jî ya Mela Hacî Mihemed Şembî ye. Li ser wê nusxeyê bi Erebî weha hatiye nivîsandin: "Xwediyê vê nusxeyên Hisênê kurê Mistefa ye. " Li gorî ku tê gotin sê-çar nusxe li gundê Batê ne.[141]

1.1.3. Bandora Melayê Bateyî

Çawa ku helbestvanên berî Melayê Bateyî tesîr li wî kirine, wî jî tesîr li yên piştî xwe kiriye. Helbestvanekî ku Bateyî di bin tesîra wî de maye Macin e. Lewre Bateyî li ser xezeleke Macin texmîsek çêkiriye. Herweha gotûbêja wî digel Mela Mensûrê Girgaşî heye.

141 Babê Zêrevanî, "Mela Hisênê Bateyî-1", *Nûbihar*, j. 87, s.2002, r. 63.

Melayê Bateyî ji yên piştî xwe tesîr li ser Feqe Reşîdê Hekkarî û Seyfiyê Şûşî kiriye. Helbestvanekî dî yê ku têkiliyeke wî ya taybet bi Melayê Bateyî re çêbûye û di bin tesîra wî de maye, Evdilqadirê Hekkarî ye. Ev helbestvan feqiyê Melayê Bateyî bûye. Çawa ku ji navê wî jî diyar e, ew xelkê Hekkarî ye. Dema ku Melayê Bateyî wefat kiriye li ser wî mersiyeyek nivîsandiye. Ev mersiyeya wî weha destpê dike:

Dilo rabe bihar hat û
Mecalê geşt û seyranê

Çi seyrana gulistanê
Melayê Bateyî kanê

Mixabin derheqê jiyan û helbestên vî helbestvanî de ti agahiyên dî di destê me de nînin.[142] Çawa ku ji van her du beytan tê fêmkirin, wî ev helbesta xwe ji helbesta Bateyî ya ku bi şiklê "Ji çirya paşiyê pê da Melayê Bateyî Kanî" dest pê dike re wekî nezîreyekê nivîsandiye.

1.2. SELÎMIYÊ HÎZANÎ

1.2.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Helbestvanekî dî yê sedsala XVIIIem Selîmiyê Hîzanî ye. Ji bilî ku em dizanin ew xelkê Hîzanê ye, derheqê wî de ti agahiyên dî di dest de nînin. Ji ber ku kesên wekî Rûdenko û Qenatê Kurdo, ew wekî Selîmê Silêman dane nasandin, zêdetir bi vî awayî hatiye naskirin. Li gorî vê navê bavê wî Silêman e.

Jidayîkbûn û koça dawiyê ya Selîmî, bi awayekî zelal nayên zanîn. Lêbelê ji vê beyta jêrîn a ku di "Yûsiv û Zelîxa"ya wî de derbas dibe, sala nivîsandina berhemê derdikevê meydanê ku ev jî ji bo kifşkirina serdema wî nîşaneyeke girîng e:

142 Ji bo agahiyên heyî bnr. Tehsin Doskî û Muhsin Doskî, *Melayê Bateyî*, r. 33.

CamScanner ile tarandı

Lewra bi hîkayetê şeniyye
Tarîx(i) ji ismê Heq xenî ye

Îfadeya "Heq xenî" ya vê beytê li gorî hesabê Ebcedê beramberî tarîxa 1168/1754an tê. Ev agahî jî serdema ku helbestvan tê de jiyaye (sedsala XVIII) ji me re destnîşan dike.[143]

Herçiqas Qenatê Kurdo di berhema xwe ya bi navê "Tarîxa Edebiyata Kurdî" de li pey rêça Rudenko û A. Jaba dibêje ku Selîmê Silêman hemdemê Şerefxanê Bedlîsî (sedsal: XVI-XVII) ye û helbestvanê mîrê Hîzanê Mîr Şeref e jî, ev nêrîn jî rastiyê dûr dixuye.[144]

1.2.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

"Yûsif û Zelîxa"ya Selîmê Silêman derheqê bûyera Yûsif Pêxember û xanima ezîzê Misirê Zelîxayê de ye. Berî wî di edebiyatên Farisî û Tirkî de de ev mijar hatiye nivîsandin, lê di edebiyata Kurdî de cara pêşî ev mijar ji aliyê Selîmê Silêman ve derbasî nezmê bûye.[145]

"Yûsif Zelîxa"ya Selîmê Silêman, li Kurdistana Bakur cara pêşî di sala 1998an de ji aliyê Feqî Huseyn Sağnıç ve (Enst.Kurdî ya Stenbolê) û li Kurdistana Başûr jî di sala 2004an de ji aliyê Tehsîn Î. Doskî ve (Spîrêz) hat çapkirin. Herî dawî ji aliyê Ayhan Tek ve digel lêkolîna li ser berhemê metnekî tekûz ê berhemê hat amadekirin (Nûbihar 2013).

Berhem ji aliyê hecma xwe ve mezin e û li gorî metnê Geverî ji 2325 beytan pêk hatiye. Kêşa wê ,wekî kêşa "Mem û Zîn"ê "Mef'û-

143 Ev tarîx, ji aliyê Tehsîn Doskî ve bi hesabê ebcedê hatiye dîtin. Ji bo tarîxên dî yên ku di vê mijarê de hatine derxistin bnr. Doskî, *Yûsif û Zuleyxa-Vehandina Selîmê Hîzanî-*, Spîrêz, Dihok 2004, r. 12-15; Ayhan Geverî, *Yûsif û Zuleyxa-Selîmiyê Hîzanî-*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013, r. 45-46.

144 Ji bo nêrîna Kurdo, b.n., r. 103. Ji bo reddiyeya vê nêrînê bnr. Doskî, *Yûsif û Zuleyxa-Vehandina Selîmê Hîzanî-*, Spîrêz, Dihok 2004, r. 11-15; Ayhan Geverî, *Yûsif û Zuleyxa-Selîmiyê Hîzanî-*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013, r. 43-46.

145 Selefî û Doskî, *Mu'cem*, r. 124.

CamScanner ile tarandı

lu mefa'ilun fe'ûlun" e. Mexlesa wî "Selîmî" ye ku di berhema xwe de, yek di beşa tewhîdê de, yek jî di beşa Xatîmeyê de, bi gişti çar caran bi kar aniye. Li jêrê ji beşên tewhîdê û xatîmeyê çend beyt cih digirin ku mexlesa helbestvan jî di nav wan de dikare bê dîtin.

Çend Beyt ji Beşa Tewhîdê:

Dîbaceyê name namê Me'bûd
Qeyyûm û Qedîm û Heyy û Mewcûd

Sazendeyê mumkinat û kewneyn
Darendeyê kainat û behreyn

Bêmebde û beste û Qedîm î
Xeffar û 'Ezîm hem Rehîm î
...
Ya Reb bi cemalê Zatê Sermed
Azad(i) bikî **Selîmiyê** Bed

Çend Beyt ji Beşa Xatîmeyê:

Wehhab û Kerîm û hem Rehîmî
Mehrûm nekî ji xwe **Selîmî**

Hêvîker e ew ji Zatê Emced
Azad bikî bibexşînî Ehmed

Ez hêvî dikim ji xas û 'aman
Her weqt û zeman û hîn û anan

Wextê ku bixwûnin hûn kitabê
Min hêvî heye bikin sewabê

Mexsûs dikim ji we rica ye
Hûn fatîheyek bikin hedaye

CamScanner ile tarandı

Kî ji bo me fatihek izhar bike
Rebbê 'alem wan ji nar aza ke

Selîmê Silêman di vê berhema xwe de ji aliyê edebî û hizra neteweyî ve di bin bandora Ehmedê Xanî de maye ku di beşa sebebê telîfê ya berhema xwe de weha dibêje:

Kurdên bi zemînê xwe seza bûn
Sahibhuner û we pehlewan bûn

..

Lê çi b'kim diçin di rêka vajî
Her şaşî dibazin ne bi sazî

Her dem bi temerrud û şiqaq in
Bê ewl in bi hev re bê tifaq in

Qet nîne tu derman bo vê janê
Tedbîrê bikin di vê zemanê

Daxwaza me tu bi hîvîgah î
Tedbîr(i) bike bi lutf(i)gahî

Asar û edeb ji bona Kurdan
Agahî bikî ku bêne pêkdan

..

Nînin bi me ra kemal û îdrak
Qelbê me bibe bi wan ferehnak

Lakin e' jî mame çar û naçar
Nînin ji qumaşî ra xerîdar

Sed barî tijî bikî cewahir
Sed new'ê ji tuhfeê di nadir

Bil cumle bidî hemî temamî
Pûlek nekirî evî zemanî

CamScanner ile tarandı

Selîmê Silêman ji helbestvanên piştî xwe, bandor li helbestvanekî dî yê Bedlîsî kiriye ku ew jî Harisê Bedlîsî ye. Lewra çawa ku em dê li ser rawestin, Harisê Bedlîsî jî "Yûsif û Zelîxa"-yeke bi Kurdî nivîsandiye û ev berhema xwe li ser bingeha berhema Selîmê Silêman ava kiriye. Zimanê berhema Harisê Bedlîsî li gorî zimanê ya Selîmê Silêman sadetir û zelaltir e.

1.3. HARISÊ BEDLÎSÎ

1.3.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Helbestvanekî dî yê girîng ê vê sedsalê Harisê Bedlîsiyê xwediyê "Leyla û Mecnûn"ê ye. Ji van beytên jêrîn ku di destpêka "Leyla û Mecnûn"ê de nivîsandine, derdikeve meydanê ku Harisê Bedlîsî di sedsala hijdehem de jiyaye:

Nehroz(i) temami, paşê newroz
Menqûş(i) mi kir nigînê pîroz

Mexzê dev û lêv se'yê sinne
Tarîx ji wî lew ji mexzê sinne

Ji beyta pêşî aşîkar dibe ku nivîskar berhema xwe piştî Newrozê bi deh rojan nivîsandiye. Ev jî beramberî 31ê Adarê tê. Ji beyta duyem jî ji îfadeya "mexzê sine" bi hesabê Ebcedê tê fêhmkirin ku sala nivîsandinê 1162 (bi mîladî 1748) e. Bi vî awayî tarîxa nivîsandina vê berhemê dibe 1161/31ê Adara 1161ê hicrî ku beramberî sala 1748ê tê. Lê ji ber ku di hinek nusxeyan de peyva "sinne"yê wekî "sîne"yê jî hatiye nivîsandin, eger em hesabê Ebcedê li gorî vê çêkin, wê demê tarîx bi zêdebûna 10 salan dê bibe 1172 (bi mîladî 1758).

Eger Harisê Bedlîsî di sala 1748, yan jî 1758an de berhema xwe nivîsandibe, ev lazimî xwe dike ku ew berî vê tarîxê hatibe dinê û di vê tarîxê de bi hindikayî perwerdeya xwe xilas kiribe.

Li gorî ku ji berhema wî Leyla û Mecnûnê tê fêmkirin Harisê Bedlîsî gihiştiye serdema du mîrên Bedlîsê: Emînê Yûsif û

CamScanner ile tarandı

piştî koça wî ya dawiyê kurê wî Ebdullah Xan. Bedlîsî di berhema xwe de weha behsa van her du mîran kiriye:[146]

Mîrê ku felek li wî muessif
Zil'izz û 'ula ***emînê Yûsif***

Roja feleka kemalê 'irfan
Begzadeê 'alî ***'Ebdullah Xan***

1.3.2. Berhemên wî

Harisê Bedlîsî bi navê "Leyla û Mecnûn" û "Yûsif û Zileyxa"yê du berhem û ji bilî van jî hinek helbest nivîsandine. Bedlîsî di van berheman de mexlesa "Sewadî" bi kar aniye:

Ey hezretê muctebayê muxtar
Naçar e **Sewadiyê** *gunehkar*

1.3.2.1. Leyla û Mecnûn

Bêguman berhema Harisê Bedlîsî ya herî girîng "Leyla û Mecnûn" e. Wî ev mijara meşhûr a ku di edebiyata Erebî, Farisî û Tirkî de heyî, îcar di Kurdî de aniyê zimên. Çawa ku li jorê hat îzahkirin berhem yan di sala 1748, yan jî di sala 1758an de hatiye nivîsandin.

Berhem cara pêşî ji aliyê M. B. Rûdenko ve di sala 1965an de bi alfabeya Rûsî; Cara duyem di sala 1999an de li Stenbolê ji aliyê weşanxaneya Nûbiharê ve bi alfabeya Erebî û latînî; jî di sala 2004an de ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve li Duhokê bi alfabeya Erebî îmlaya Başûr hatiye çapkirin.

Berhem bi terzê mesnewiyê hatiye nivîsandin. Li gorî nusxeya Nûbiharê berhem ji 19 beşan û 771 beytan pêk tê.[147] Li jêrê em dê cih bidin çend beytên Leyla û Mecnûna Siwadî:

---

146 Ji bo jiyana helbestvan bnr. Harisê Bedlîsî, *Leyla û Mecnûn*, Amd. Tehsin Î. Doski, Spîrêz, Dihok 2004, r. 7-19.

147 Siwadî, *Leyla û Mecnûn*, Amd. M. Reşit Irgat, Selman Dilovan, Nûbihar 1999.

CamScanner ile tarandı

Her sê beytên pêşî:

Fihristê kitabê navê Me'bûd
Qeyyûm û Qedîm û Heyy û Mewcûd

Bê şubh û mîsal û 'Edl û Xaliq
Sazindeê mumkînat û faliq

Bê ewwel û axir û 'Ezîm î
Wehhab û Kerîm î û Rehîm î

Her sê beytên dawî:

Mame di xema xwe da îlahî
Çar û mededa me rûsiyahî

Mewta mi heqq e we ez newêrim
Lewra gunehê 'ecêb didêrim

Rakî li mi key we min riha key
Bo xatirê alê Mustefa key

1.3.2.2. Yûsif û Zelîxa

Berhema Harisê Bedlîsî ya duyem hîkayeta "Yûsif û Zelîxa"-ye. Rûdenko ev berhem li Moskowayê di sala 1963yan de çap-kiriye.

Çawa ku berî niha derbas bû, menzûmeya Yûsif û Zelîxayê di edebiyata Kurdî cara pêşî ji aliyê Selîmê Silêman ve hatibû nivîsandin.

Piştî wî îcar Harisê Bedlîsî jî Yûsif û Zelîxayek nivîsandiye. Dema mirov wan her duyan dide ber hev, derdikeve holê ku Bedlîsî berhema Selîmê Silêman ji xwe re wekî binema girtiye û zimanê wê pak û sadetir kiriye û ji peyvên Erebî û Farisî paqij kiriye. ji ber vê yekê jî bi taybetî di sedsalên XVII û XIXan de di nav Kurdan de "Yûsif û Zelîxa"ya Harisê Bedlîsî zehftir hatiye

CamScanner ile tarandı

xwendin Ji van beytên jêrîn ji her du mesnewiyan ferqa zimanê Silêman û Bedlîsî bi awayekî aşîkar derdikeve holê.[148]

Ji "Yûsif û Zelîxa"ya Selîmê Silêman

Emma bi se'adet û bi 'unwan
Behsê bikin em ji Pîrê Ken'an

Evreng e ji exterê di mezbûr
Yûsif bi **cemalê** *bûye meşhûr*

Xûna xwe ji bo mêran beyan ke
Teqrîr(i) bike *li me 'eyan ke*

Ye'qûb(i) hebû **keçek** *xebersaz*
Wextê ji peder bihîst(i) ev raz

Beyt bi me ra kûh û deştan
Reh şibhetê teyrekî bihiştan

Ji "Yûsif û Zelîxa"ya Harisê Bedlîsî

Emma bi se'adet û bi 'unwan
Behsê me dikin ji pîrê Ken'an

Ev reng ji lawê wî di mezherî
Yûsif bi **rindî** *zehf bû meşhûrî*

Xûna xwe ji bo mêran beyan ke
Tu bêje *j' mi ra li min 'eyan ke*

Ye'qûb(i) wî hebû **qîzekî** *pak*
Wextê ji **bav(i)** *bihîst(i) ev* **dak**

148 Kurdo, b.n., r. 122. Cewdet Huşyar, *Zexaîru 't-Turasi 'l-Kurdî fî Xezainî Petersborg*, http://brob.org/old /bohoth/bohoth/bohoth026.htm, 29.10.2013.

CamScanner ile tarandı

Beyt bi me ra **çiya** *û deştan*
Teşbîhê teyrekî bihiştan

1.3.2.3. Helbestên wî

Ji bilî van her du berhemên Harisê Bedlîsî Leyla û Mecnûn û Yûsif û Zelîxayê du helbestên wî jî ji aliyê Tehsîn îbrahîm Doskî ve hatine weşandin.[149] Em dê li jêrê cih bidin her du beytên pêşî û dawî yên her du helbestan:

Helbesta yekem
Ey felek dîsa te kul kir
Derd û êşanê di min
Mislê bulbul meylê gul kir
Ah û efxanê di min

Ey **Sewadî** *bes bibêje*
Qesseta eşqê dirêj e
Befr û baranê merêje
Ewr û nîsanê di min

Helbesta duyem
'Ehdê qedîm(i) hate bîr
Nalîn ji min tên bê qiyas
Mayîm di hebsê de esîr
Mihra dilim muhkem esas

Lehbeya ta key binalî
Hêstiran daim bimalî
Hirani birnî me xalî (?)
Şafiyêt suwarî nas

149 Harisê Bedlîsî, b.n., r. 20-29.

CamScanner ile tarandı

1.4. MELA MENSÛRÊ GIRGAŞÎ

1.4.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Helbestvanekî dî yê vê sedsalê ku derheqê jiyana wî de kêm agahî hene Mela Mensûrê Girgaşî ye. Helbestvanê me ji Kurdistana Başûr e. Girgaş gundê wî ye û dikeve başûrê rojavayê Amêdiyê li. Ji leqabê wî ya melatiyê ku di kunyeya wî de derbas dibe tê fêmkirin ku ew kesekî xwenda û zana bûye. Bi Melayê Bateyî (sedsala: XVIII) re gotûbêjeke wî heye ku ev ji bilî ku hevnasîn û hevaltiya di navberan wan de nîşan bide, di heman demê de serdema Mela Mensûr (sedsala: XVIII) jî destnîşan dike. Herweha destnivîseke helbestên wî ya ku di sala 1181/1768an hatiye nivîsandin jî vê tiştê piştrast dike. Li gorî rîwayetên zarekî Mela Mensûrê Girgaşî emrekî dirêj kiriye û di dawiya emrê xwe de li Îmadiyeyê bi helbestvanekî dî yê herêma Behdînan Bekir Begê Erizî re maye.

1.4.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Helbestên Mela Mensûrê Girgaşî yên ku gihîştine îro ne zêde ne û ev jî di destnivîsan de tên parastin.[150] Li jêrê wekî mînak em cih didin bêndên dawî ji gotûbêja Mela Mensûrê Girgaşî û Melayê Bateyî:[151]

Mela Mensûrê Girgaşî:

Belê Batey dê kûtah im
Ji vê înşa û me'nayê
Bi heqqê sûreyê Qaf kim
Bi wê secda di Tahayê
Mecazê işqê dê saf kim
Me dur anîn ji deryayê

150 Selefî û Doskî, Mu'cem, r. 133-134.
151 M. Xalid Sadînî, *Mela Huseynê Bateyî Jiyan, Berhem û Helbestên wî*, , Nûbihar, Stenbol 2010.

CamScanner ile tarandı

Melayê Bateyî:

Çi dur bû lefzeke xweş bû
Di me'na da qewî kûr e
Qelem te j' 'enbera reş bû
Reşandî rûyê kafûr e
Şikir xettê me gulgeş bû
Minim meddahê Mensûr e

1.5 SEYFIYÊ ŞÛŞÎ

1.5.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Helbestvanekî dî yê vê sedsalê (sedsala XVIIIan) Seyfiyê Şûşî ye. Şûşî, destnivîsa ku helbestên xwe tê de komkirine, di navbera salên 1195-1201/1780-1786an de nivîsandiye ku ev jî serdema wî ya ku tê de jiyaye (sedsala XVIIIan) destnîşan dike.

Navê helbestvanê me Ebdulletîf e. Seyfî mexlesa wî ya helbestan e. Şûşê jî li Kurdistana Başûr gundekî li ser Akrê ye. Helbestvanê me li wir hatiye dinyayê, lê tarîxa jidayîkbûna wî ne kifş e. Navê bavê wî Şêx Yûnisê Şûşî ye. Bapîrê wî jî bi navê Şêx Şemsedînê Şûşî kesekî navdar e. Şêx Tahirê Şûşî (1917-1962) ku zana û edîbekî girîng e û xwediyê berhemeke menzûm bi navê "Gulzar"ê ye, endamekî vê malbatê ye.

1.5.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Seyfiyê Şûşî, helbestvanekî bi hêz e û bi sê zimanan (Kurdî, Farisî û Erebî) helbest nivîsandine. Wî helbestvanên Kurmanc ên berî xwe şopandine û lewra jî helbestên Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî îstînsax kirine. Di helbestên wî de bandora Melayê Cizîrî û Melayê Bateyî zehf heye. Seyfî mexlesa wî ya helbestê ye:

CamScanner ile tarandı

Avêtime nav agirî
Ney ez sax im ney wek mirî
Bo min bima huzn û girî
Seyfi bizan dûr e sefer

Tehsîn Îbrahîm Doskî û Muhsîn Îbrahîm Doskî helbestên Seyfiyê Şûşî yên destnivîs di sala 1999an de çapkirine. Di vê çapê de 10 helbestên Kurdî, medhiyeyeke Erebî û yazdeh helbestên Farisî cih digirin.[152]

1.6. ÎSMAÎLÊ BAZÎDÎ

1.6.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Îsmaîlê Bazîdî jî helbestvanekî vê sedsalê (XVIII) ye. Îsmaîlê Bazîdî yek ji wan 8 helbestvanên ku Mela Mehmûdê Bazîdî di rîsaleya xwe ya derheqê helbestvanên Kurdan de behsa wan kiriye. Li gorî ku Mela Mehmûd di vir de dibeje, Îsmaîlê Bazîdî di sala 1065/1654an de li Bazîdê ji dayîk bûye û di sala 1121/1709an de li wir çûye rehmetê û li wir hatiye veşartin.

Li gorî agahiyên Mela Mehmûdê Bazîdî, Îsmaîlê Bazîdî şagirdê Ehmedê Xanî bûye. Lê Ensiklopediya Îslamê dibêje ew mueqqibê (peyrew) Ehmedê Xanî ye.[153] Îsmaîlê Bazîdî di welatê xwe de kesekî meşhûr bûye.[154]

1.6.2 Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Îsmaîlê Bazîdî ji bo zarokan bi navê "Gulzar"ê ferhengeke Kurdiya Kurmancî, Erebî û Farisî çêkiriye. Ji bilî vê bi Kurdiya Kurmancî gelek xezel û helbestên wî jî hene.[155]

---

152 Tehsîn Î. Doskî, *Muhsîn Î. Doskî, Helbestvan Seyfiyê Şûşî û Berhemê Wî*, Weş, Kovara Metîn, Dihok 1999, r. 7-10.
153 Minorsky, g.n., b. VI, r. 1114.
154 Kurdo, b.n., r. 14-17.
155 Kurdo, b.n., r. 14-17.

CamScanner ile tarandı

1.7. MIRADXANÊ BAZÎDÎ

1.7.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Li gorî agahiyên Mela Mehmûdê Bazîdî û li pey rêça wî Herekol Azîzan û Mînorsky[156] Miradxanê Bazîdî, di sala 1150/1737an de ji dayîk bûye û 1199/1784an de li Bazîdê koçî dawiyê kiriye. Li gorî Sağnıç ew di sala 1743an de hatiye dinyayê. Dîsa li gorî agahiyên ku Sağnıç dide Miradxanê Bazîdî di medreseya ku Ehmedê Xanî li Bazîdê damezrandibû perwerde dîtiye. Ji pirtûkxaneya ku Xanî li Bazîdê avakiribû istifade kiriye. Piştre li medreseyên Wan, Hekkarî û Bidlîsê xwendiye.[157]

1.7.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Berhema Miradxan a ku daye menzûmeya Zembîlfiroş e. Bi qasî ku tê zanîn Miradxan di tarîxa edebiyata Kurdî de sêyem kes e ku ev mijar bi awayê nezmê nivîsandiye. Her du niviskarên dî Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî bûn. Ji ber ku destanên bi vî rengî folklorîk ji aliyê gelek kesan ve tên nivîsandin, dibe ku Zembîlfiroşên hin kesên dî jî derkevin meydanê.

Miradxan Zembîlfiroşa xwe di sala 1190/1776an de nivîsandiye. Ev tarîx ji benda dawî ya vê menzûmeyê bi hesabê ebcedê derdikeve meydanê. Ev bend weha ye:

Sed û nehwêd sal boriye
Paşî hezara hîcrî ye
Mûradxan dibêt şer hatiye
Bi şir bi gotineka xwoş

Destana Zembîlfiroş 224 beyt in. Lê di destê me de 129 malik hene. Li Petersbûrgê di van mecmû'eyan de heye: Kurd 27, Kurd 45, Kurd 28, Kurd 36, Kurd 26.[158]

---

156 Bazîdî, *Rîsaleya Şa'ir û Musennefên di Kurdistanê*, r. 16; Azîzan, g.n., b. I, r. 815, Mînorsky, g.n., b. VI, r. 1114.

157 Sağnıç, b.n., r. 406.

158 Cewdet Huşyar, *Zexaîru't-Turasi'l-Kurdî*, http://brob.org/old/bohoth/bohoth/bohoth026.htm, 29.10.2013.

CamScanner ile tarandı

M. B. Rûdenko di kitêba xwe ya bi navê "Nivîsandina Ser û Berê Destnivîsarêd Kurdî" de dibêje ku di pirtûkxaneya Saltikov-Şêdrin de li Leningradê çend xezelê wî di destnivîsaran de hene.[159] Li Petersbûrgê (Lenîngrad) di mecmu'eya Kurd 36an de qesîdeyeke wî heye. Miradxan Bazîdî li ser helbesteke Macin texmîs û tesdîs nivîsandine.[160]

1.8. MACIN

1.8.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Macin jî helbestvanekî serdema mîrektiyan e ku derheqê jiyana wî de mixabin di destê me kêm agahî hene, lê derheqê serdema wî de qeneetek peyda bûye. Lewra ji ber ku helbesteke Macin di mecmû'eyeke helbestan ku di sala 1181/1767an de hatiye nivisandin de cih digire, em baş dizanin ku ew di sala 1767an de yan li heyatê ye, yan jî berî wê salê wefat kiriye.

Herweha du helbestvanên wekî Mela Huseynê Bateyî û Muradxanê Bazîdî li ser helbestên wî texmîs û tesdîs nivîsandine. Ev jî nîşan dide ku Macin yan hevdemê van her du helbestvanan e, yan jî berî wan e, wate ne pişt wan jiyaye. Ji ber ku em dizanin ev her du helbestvan jî di sedsala XVIIIan de jiyane, em têdigihin ku Macin ne piştî vê sedsalê ye. Wekî encam em dikarin bêjin ku Macin, yan di sedsala XVIIIan de, yan jî berî vê sedsalê jiyaye.

1.8.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Dema em li aliyê Macin ê edebî dinêrin mixabin kêm agahî di destê me de hene û helbestên wî yên ku em pê dizanin gelek hindik in. Wekî nimûne muxemmeseke wî heye ku Melayê Bateyî nezîreyek li ber nivîsandiye. Dîsa xezeleke wî heye ku Melayê Bateyî li ser texmîsek çêkiriye.

Digel ku hindik helbestên wî di destê me de hebin jî, em fêm dikin ku Macin helbestvanekî di asta dema xwe de ye. Lewra

159 Kurdo, b.n., r. 14-17.
160 Selefî û Doskî, *Mu'cem*, r. 93.

CamScanner ile tarandı

çawa me got kesekî wekî Melayê Bateyî nezîreyek li ber helbesteke wî çêkiriye û helbesteke wî jî texmîs kiriye. Herweha kesekî wekî Muradxanê Bazîdî jî li ser helbesteke wî texmîsek (yan jî tesdîsek) nivîsandiye. Ev jî derheqê qîmet û rola Macin di tarîxa edebiyata Kurdî de fikrekî baş dide me.[161]

Muxemmesa Macin:

Sorgula xunçe-dehen naziknihala kê yî tû?
Mehweşa dilpîrehen şox û şepala kê yî tû?
Gulruxa sîmen-zeqen fikr û xeyala kê yî tû?
Ahûya deşta xeten mişkîn-xezala kê yî tû?
Nazika sîma-semen qenc û delala kê yî tû?

Nezîreya Bateyî li ser Muxemmesa Macin:

Subh û êvarê şeva tarî şemala kêyî tû?
Leyletu'l-Qedr û Berat in nûrê mala kêyî tû?
Çîçeka baxê Îrem şox bejn û bala kêyî tû?
Bo xwedê kî bêje min kanî şepala kêyî tû?
Dêm kitêb e zulf[î] haşî şerhê xala kêyî tû?

Texmîsa Bateyî li ser Xezela Macin

Benda Pêşî

Baziyê hecrê ji nû dil rave rûyê mexlebê
Kun dikit furqet dilan hem rengê şîş û metqebê
Zalimê çerxê behêtim ger reşadê lewlebê
Ya Rebî dîsan muyesser ke ji bo min metlebê
Bê hicabane bibînim car(i)dî dêmkewkebê

161 Ji bo Macin û helbestên bnr. Yûsif, b.n., r. 97-100; Doskî, *Melayê Bateyî Jiyan û Berhem*, r. 175-176, 182-183; Selefî û Doskî, *Mu'cem*, r. 127.

CamScanner ile tarandı

Benda Dawî

Min nedî hemrengê rûyet gul di nêv bax û rezan
Leb ji leb ser ger helînê dê bibêjî mu'cizan
Bê hiş im **Batey** *dinasim nexme-sazê nexmeyan*
Macin*ê tûtî-zeban û bulbulê baxê gulan*
Ew dinasîtin newaya 'endelîbê xoşebê

1.9. MÎNA Û SADIQ

1.9.1. Zanyariyên Nasnameya wan

Ev her du helbestvan jî wekî Macin, di mecmû'eya helbestan a ku di sala 1181/1767an de hatiye nivisandin de cih digirin[162] û ji ber vê yekê jî em wan jî herî dereng ji helbestvanên sedsala hijdehem dihesibînin. Bêguman îhtîmal heye ku heta berî hingî biçin, lê ji ber ku delîl di destê me de nîne, em di nav helbestvanên sedsala hijdehem de cih didin wan. Ji bilî vê derheqê wan de ti agahî di destê me de nînin. Lê ji herêma ku ev mecmû'e lê hatiye nivîsandin tê texmînkirin ku ev her du helbestvan jî wekî Macin xelkê Behdînan, Colemêrg yan Botan bin.

1.9.2. Cihê wan di Edebiyata Kurdî de

Hemû berhemên Mîna û Sadiq ên ku gihîştine roja me, ew helbestên wan ên di mecmû'eya navborî de ne. Di vê mecmû'eyê de sê helbestên Mîna û helbesteke Sadiq hene. Ev helbesta Sadiq di hinek cihan de bi bal Eliyê Herîrî ve jî hatiye nîsbetkirin. Lewra Kurdnasa Sovyetistanê M. B. Rudenko di pirtukxaneya Saltikov-Şidrinê de li Leningradê ev helbest dîtiye û di sala 1972yan de di berhevoka rojhilatê de di meqaleya xwe de wekî helbesta Eliyê Herîrî çap kiriye[163]. Beyta mexlesê ya vê helbestê weha ye:

---

162 Ji bo van her du helbestvan û helbestên wan bnr. Yûsif, b.n. r. 87-95, 101-106.

163 Kurdo, b.n., r. 58.

CamScanner ile tarandı

*Çend bibêje **Elî Sadiq** ji esrarê di xayib*
Ji wan wesfê di layiq ji husna ya delal e

Lê Ebdureqîb Yûsif li dijî vê nêrînê ye û li gorî wî ev helbest ne ya Herîrî, ya Sadiq e.[164] Bi rastî jî ji ber ku di mecmû'eyê de heman helbest bi mexlesa "Sadiq" hatiye tomarkirin û dema ku "Elî Sadiq" be hem wezn, hem jî me'na xirab dibe, derdikeve meydanê ku peyva "Elî" piştre lê hatiye zêdekirin û ev helbest ne ya Eliyê Herîrî ye. Ev beyta jorîn di mecmû'eyê de bi vî rengî ye:

Dê çend bibêjî Sadiq ji esrar û deqaîq
Evan wesfên di laîq ji husna ya delal e

Li jêrê wekî mînak ji helbestên Mîna jî em dixwazin çend nimûneyan bidin:

Mîna

Min nema dil ya îlahî her tu min rizgar bikî
Min ji bada eşq û şewqê serxoş û hûşyar bikî
Min fedayî xakî paya Ehmedê muxtar bikî
Hem di nîva asîtana Mistefa m'şarda bikî
*Da ku **Mîna** şibhê qemtîrê bibête xakî der*

Beyta Pêşî

Ey çehreperî dil me ji eşqa te kebab e
Daîm ji firaqa te me can her bi ezab e

Beyta Dawî

Ya Rebbî bi heq zat û sifat û kutubên xwe
***Mînayî** li devê heremê xwe bike turab e*[165]

---

164 Kurdo, b.n., r. 58.
165 Yûsif, b.n., r. 67-75, 85-89.

CamScanner ile tarandı

1.10. ŞÊX XALIDÊ ZÊBARIYÊ YEKEM

1.10.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Helbestvanekî dî yê vê serdemê Şêx Xalidê Zêbariyê Yekem e. Herçiqas hinek nîqaş hebin jî, ev Şêx Xalidê Zêbariyê Yekem xwediyê menzûmeya Sîsebanê ye.[166] Ev Şêx Xalid di pileya duduyan de neviyê Xalid Axayê Zêbarî ye ku di beşa sedsala XVIIan de behsa wî hatibû kirin. Bavê Şêx Xalidê Zêbariyê Yekem, Mela Huseynê Yekem e. Ev Mela Huseyn, di dema mîrê Cizîrê Mihemed Beg de, texmînen sala 1749an de ji herêma Zêbarê koçî Cizîrê kiriye. Mîr jî, gundê Zivingokê kû îro li ser Şirnexê ve ye hîbeyî wî kiriye. Mela Huseyn li Zivingokê bi cih bûye û heta kû wefat kiriye li wir dersdarî kiriye. Gora wî li vî gundî ye.[167] Kurê wî Şêx Xalidê Yekem ku mijara me ye, li vir hatiye dinyayê û piştre ji wir koçî gundê Raşîneyê kû îro li ser Erûha Sêrtê ye kiriye.

1.10.2. Aliyê wî yê Tesewifî û Îlmî

Şêx Xalid ji aliyê tesewifî ve, bi terîqeta Qadirî ve girêdayî bûye. Ew ji gundê xwe çûye gundekî Mûsilê bi navê Reşîdiyeyê û li wir intisabî Şêx Ehmedê Reşîdî yê Qadirî kiriye û di encamê de ji wî xelîfetî sitandiye.[168] Di jiyana xwe de gelek caran çûye gundê şêxê xwe û li wir demekê maye. Hetta carekê şêxê wî jî bi wî re hatiye Cizîrê û demekê li wir maye. Şêx Xalid çûye ziyareta Hecê jî. Bi navê Huseyn û Ebdullah du kurê wî hebûne. Şêx Xalid di sala 1805an de li gundê xwe Reşîneyê wefat kiriye.

Ji bilî aliyê tesewifî, aliyê Şêx Xalid yê ilmî û edebî jî heye. Bi giştî sê berhem nivîsandine. Dû heb ji wan pexşan in, yek jî menzûm e. Yek ji yên pexşan kitêba derheqê kerametên şêxê

166 Hizirvan, b.n., r. 10.
167 ez-Zîbarî, b.n., r. 10-13
168 Ev Şêx Ehmedê Reşîdî, her weha şêxê Mela Xelîlê Sêrtî bûye. Bnr. ez-Zîbarî, b.n., r. 18.

CamScanner ile tarandı

wî de ye. Ev kitêb bi xetê destê wî gihiştiye hêta bi sala 1935an, ew sala ku Şêx Şefîq berhema xwe nivîsandiye. Kitêba duyem jî şîretnameyek e ku ji kurê xwe yê piçûk Huseyn re nivîsandiye. Di vê kitêbê de herweha cih daye hinek mijarên tesewifi jî.[169] Berhema wî ya sêyem jî menzûmeya wî ya bi navê Sîsebanê ye, ku li jê em dê li ser rawestin.

1.10.3. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Şêx Xalidê Zêbariyê Yekem bi menzûmeya xwe ya bi navê "Sîseban"ê cihê xwe di tarîxa edebiyata Kurdî de girtiye. Ev menzûme, wekî cureyekî edebî "cengname" ye ku tê de behsa qehremanî û egîdiya sehabiyên Cenabê Pêxember hatiye kirin. Sîseban, di nav gel û edebiyatvanên Kurdan de zehftir bi navê "Qewlê Newala Sîsebanê" tê naskirin û berhemeke geleki giring tê qebûl kirin. Lewra jî ev menzûme bûye malê gel û ji aliyê gelek kesan ve (wekî Ehmedê Xanî, Bekir Begê Hekkarî) hatiye nivîsandin[170]. Di van gişan de nav û mijara berhemê yeke, lê nivîskarên berhemê, hejmara beytan û hwd. ji hev cuda ne.

Îcar yek ji wan kesên ku Sîseban nivîsandiye Xalidê Zêbarî ye. Metnê Sîsebanê cara pêşî jj aliyê Ebdullah Varlî hat weşandin.[171] Piştre Hizirvan di xebata xwe ya navborî de li ber 7 nusxeyan deqekî Sîsebanê weşand. Ahmet Demir li ber sê nusxeyan metneki Sisebanê weşand.[172] Bi vî awayî di nav van xebatan de bi giştî 11 nusxeyên Sîsebana Xalidê Zêbarî (A. Varli: nusxeyek, Hizirvan: 7 nusxe, A. Demir: 3 nusxe) hatine tesbîtkirin. Di dawiya van manzûmeyan gişan de navê Xalidê Zêbarî derbas bûye. Wekî nimûne yek ji van nusxeyan, destnivîsara Me'rûfê kurê Şêx Hacî Mihemmed Beşîrê Xalidiyê Basretî ye. Ev nusxe di 1996an de hatiye istinsax kirin. Navê Şêx Xalid di vê nusxeyê de weha derbas dibe:

---

169 ez-Zîbarî, b.n., r. 13-17.

170 Ji bo wan kesên ku ev menzûme nivîsandine bnr. Varlî, *Dîwan û Gobîde*, r. 289-298.

171 Varlî, b.n., r. 301-410.

172 Ahmet Demir, *Qewlê Newala Sîsebanê*, Nûbihar, Stenbol 2012.

CamScanner ile tarandı

Ew Xalidê Zêbarî gote kelamê manzûm
Hêvî dikin ji barî nefsa xirab bit mazlûm
Azad bikit ji narê ji cumle fi'lê mahrûm
Me'j we re kir diyarî qissa delal û ma'lûm[173]

1.11. BASILYOS ŞEMÛN II

1.11.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Li gorî neqla ku Herekol Azîzan ji "el Mecellet el Betrirqiye el Siryaniye" (hj. 6, Kanûna Paşî-Sibat 1939) dike, mifiryanê dêra Turabdînê Basilyos Şemûnê Duyem kesekî diyanetperwer û xudan teqwa bûye. Li gorî rîwayetê, ji ber ku Mifiryan, ji aliyê dînî ve cewaz nedaye xulamê Ebdal Axa (Axayê Baminminê) da bi dotmama xwe re bizewice, Ebdal Axa mifiryan rêkiriye cem mîrê Cizîrê Mîr Miheme (k.d.1740), da mîr ceza bide wî û wî bikuje. Lê Mifiryan bi jehra ku mîr dayê koçî dawiyê nekiriye û li ser daxwaza mîr, ev lawij li wê derê di hizûra mîr de xwendiye.[174] Ji ber ku di dema mîrê Cizîrê Mihemed Begê ku di sala 1740'î de wefat kiriye de jiyaye, mirov dikare Basilyosî zehftir wekî helbestvan/edibeki sedsala XVIIIan bihesibîne.

1.11.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Tişta ku tê zanîn, di destê me de tenê ev lawija Basilyos Şemûnê Duyem heye ku bi tevahî ji 53 bendan pêk tê. Herekol Azîzan (Celadet Elî Bedirxan) deqê vê lawijê li ber sê nusxeyan amade kiriye û di Hawarê de weşandiye. Naveroka wê dînî ye û tê de li ser axîretê hatiye rawestan. Li gorî ku Azîzan dibeje, ev lawij heta wê demê di dêrên filehên Torê de li ser qeydekî

173 Xalidê Zêbarî, *Sîseban*, mustensix: Me'rûfê Kurê Şêx Hacî Muhammed Beşîr el-Xalidî el-Basretî, s. 1996, r. 28. Mustensix jî ji malbata Xalidê Zêbarî ye.

174 Herekol Azîzan "Lawijên Mîr Miheme", (jêrenot), *Hawar*, weş. Nûdem, Stokolm 1998, b. II, r. 727.

CamScanner ile tarandı

Botanî dihate xwendin.[175] Taybetiyeke vê lawijê jî ew e ku di tarîxa edebiyata Kurdî de ev deq ji aliyê kesekî Suryanî ve hatiye gotin û di dêrên Siryaniyan de hatiye xwendin.

Li jêrê wekî mînak em cih didin benda pêşî ya vê lawijê:

Lo ev çi deng e, çi heydedan e?
Û çi gurgur e, li ezmana?
Dengê nefîr û zirne û borîzana
Hin dibêjin qiyamet e
Û hin dibêjin axir zeman e

Herekol Azîzan herweha behsa hinek lawijên dî jî dike ku ewana jî ji aliyê kesên wekî Hecî Remezanê Kerî û Îsivê Melê (ji Hacî Aliyan) ve derheqê nêçîrvaniya wî û nêriyên wî Efno û Hejale de hatine gotin.[176]

2. DI SEDSALA HIJDEHEM DE PEXŞANA KURDÎ

Hem di serdema mîrektiyan de, hem jî bi giştî di tarîxa edebiyata Kurdî de pexşana Kurdî li gorî nezm û helbestê zehf lawaz e. Cara pêşî di sedsala XVIIan de nûnerekî pexşana Kurdî derketibû ku ew jî Mela Eliyê Teremaxî ye. Dema em li sedsala XVIIIan dinêrin, em dibînin ku di vê sedsalê de jî di pexşana Kurdî de pêşveçûneke berbiçav tine ye. Bi qasî ku tê zanîn di sedsala XVIIIan de du nûnerên pexşana Kurdî hene ku yek jî van Mela Yûnisê Helqetînî û yê dî jî Mela Mihemedê Erwasî ye.

175 Herekol Azîzan, "Lawij" *Hawar*, weş. Nûdem, Stokolm 1998, b. II, r. 654-658.
176 Azîzan, "Lawijên Mîr Miheme", b. II, r. 727.

CamScanner ile tarandı

2.1. MELA YÛNISÊ HELQETÎNÎ

2.1.1.Zanyariyên Nasnameya wî

Mela Yûnis di sedsala XVIIan de li gundê Helqetînê hatiye dinyayê. Herçiqas ji aliyên hin lêkolîneran ve gundê wî wekî "Erqetîn" jî hatibe bilêvkirin, em tercîha forma "Helqetînê" dikin. Ji ber ku cara pêşî Mela Mehmûdê Bazîdî behsa Mela Yûnis kiriye û navê gundê wî bi vî awayî nivîsandiye. Mela Mehmûdê Bazîdî di pêşgotina kitêba Eliyê Teremaxî de di çarçoveya mufredata medreseyên Kurdistanê de behsa Mela Yûnisê Helqetînî kiriye, lê ji bilî ku bêje "Ew di gundê xwe de medfûn"e, derheqê jiyana wî de agahiyên zêde nedane.[177] Di xebatên dî de jî, ji bilî navê gundê wî û navên berhemên wî agahî nehatine dayîn.[178]

Bi qasî ku tê gotin hem li Miksê (li aliyê Wanê), hem jî li Qulpê (li aliyê Diyarbekirê) bi navê "Helqetîn"ê du gund hene. Lê ji ber ku di dema mîrektiyan de rewşenbîriya Kurdî li herêma Miksê gelekî zêde ye, ya berbieqil ew e ku Mela Yûnis jî ji devera Miksê be.

2.1.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Mela Yûnisê Helqetînî jî wekî Ehmedê Xanî û Eliyê Teremaxî, di warê hêsankirina dersên feqiyên medreseyan de berhem dane. Ehmedê Xanî Nûbihara Biçûkan û Eqîdeya Îmanê, Eliyê Teremaxî jî Serfa Kurmancî ji bo feqiyan bi zimanê Kurdî nivîsandibûn û ev berhem ketibûn nav mufredata medreseyê. Berhemên Helqetînî jî yên Xanî zêdetir dikevin kategoriya yên Teremaxî. Lewra berhemên Teremaxî û Helqetînî di warê gramera Erebî de ne, lê yên Xanî di warê "ferhengnasî" (Nûbihara Biçûkan) û zanista "eqîde" yê (Eqîdeya Îmanê) de. Dema em di çarçoveya gramerê de li ber-

177 Bazîdî, "Muqeddîma 'Îlmê Serfê, r. 18.
178 Minorsky, g.n., b. VI, r. 1114; Sağnıç, b.n., r. 446-447.

CamScanner ile tarandı

hemên Teremaxî û Helqetînî binêrin, em ê bibînin ku berhema Teremaxî derbareyê morfolojiyê de ye, lê heçî berhemên Helqetînî ne ew derbareyê sentaksê de ne. Lê di her halî de mirov dikare bêje ku her du berhemên Helqetînî temamkerê berhema Teramaxî ne. Bi rastî jî Mela Mehmûdê Bazîdî pêşgotina kitêba Eliyê Teremaxî de di çarçoveya kitêbên ku li medrseyan tên xwendin de behsa van her sê berheman jî kiriye. Ev jî dide nîşandan ku ev berhem di dewra Bazîdî (sedsala XIX) de û berî wî jî dihatin xwendin. Van berheman heta îro jî di nav mufredata medreseyên Kurdan de hebûna xwe domandine.

Çawa ku me got Eliyê Teremaxî di warê gramera (sentaksa) Erebî de bi Kurdiya Kurmancî du berhemên pexşan nivîsandine. Navê yekê "Zurûf", navê ya dî jî "Terkîb" e.

2.1.2.1. Zurûf

Eliyê Teremaxî ev berhema xwe ji mijara "zerf/hoker"ê re terxan kiriye. Navê berhemê "zurûf" jî forma pirjimar a peyva "zerf"ê ye. Nivîskar di dawiya berhemê de, bi qasî sêyeka berhemê ji mijarên dî yên gramerê re terxan kiriye. Zurûf, ji aliyê hecmê ve berhemeke biçûk e ku mirov dikare wê wekî "rîsale"-yekê bi nav bike.

2.1.2.2. Terkîb

Terkîb jî wekî Zurûfê di warê gramera Erebî de ye. Mijara wê hevoksaziya zimanê Erebî ye. Nivîskar ev mijar di çarçoveya şerha rûpelê yekem ji pirtûka 'Ebdulqahir Curcanî ya bi navê "el-Ewamil"ê pêşkêş kiriye. Pirtûka Ewamilê bi Erebî ye, lê şerha wê bi Kurdiya Kurmancî ye.

Zurûf û Terkîb li medreseyên Kurdan bi xetê destan dihatin zêdekirin. Di vê qonaxa dawî de nusxeya ku ji aliyê kesekî bi navê Ehmedê kurê Mela Huseynê Tanzehî ve hatiye nivîsandin, bi awayekî amator (bê tarîx û cih) di çapxaneyan de dihat çapkirin û di medreseyan de dihat xwendin. Di vê nusxeyê de

CamScanner ile tarandı

digel Zurûf û Terkîbê du rîsaleyên dî yên bi Erebî jî di nav heman bergî de hene. Li gorî vê çapê Zurûf 10, Terkîb jî 40 rûpel in ku Terkîb çar caran ji Zurûfê mezintir e.

Girîngiya vê rîsaleyê ne ji naveroka wê tê. Lewra nivîskar mijar tenê di çarçoveya gramera zimanê Erebî de pêşkêş kiriye û wekî ku Elî Teremaxî kiribû, carcaran jî be tu muqayese bi Kurdî re nekiriye. Mirov dikare bêje Helqetînî di vî warî de negihîştiye têgihiştina Teremaxî. Lê digel vê jî mirov dikare girîngiya van rîsaleyan di sê xalan de destnîşan bike.

1. Tarîxa edebiyatê: Di tarîxa edebiyata Kurdî de bi piranî berhemên menzûm hatine nivîsandin, berhemên pexşan nehatine nivîsandin. Ji ber wê jî ji aliyê pexşana Kurdî ve di dîroka edebiyata Kurdî de cihekî wan ê taybet heye.

2. Perwerde û pedagojî: Ev rîsale ji aliyê mufredata perwerdeyê û pedagojiyê ve girîng in. Lewre hem berhemeke Kurdî ketiye nav mufredata medreseyê, hem jî ji bo ku xwendekar dersa xwe baştir fêr bibe, wekî metodeke fêrkirinê, mijar bi zimanê wî hatiye amadekirin.

3. Ziman: Ev rîsale ji aliyê Kurdiya Kurmancî ve jî zehf girîng in. Lewra ji bo taybetiyên gramatîk ên Kurmanciya dewra xwe di asta wesîqeyan de ne. Bi riya berhemên bi vî rengî mirov dikare derheqê peyv, îmla, sentaks, fonetîk û hwd. a Kurmanciyê wê dewrê de serwext bibe. Ji bo bibe nimûne li jêrê em dê cih bidin destpêkên her du rîsaleyan.

Destpêka Zurûfê:

"Tû bizan! Hingî eşyayê di dinyayê de hene zerf yan xeyrê zerf in. Zerf jî munqesimê li du qisman e: Zerfê heqîqî, yan zerfê mecazî. Zerfê heqîqî hulûla halekî ye de mehellê xwe da. Wekî niha zeman û mekan dibêjî."[179]

179 Mela Yûnisê Helqetînî, *Zurûf*, (Di nav pênc rîsaleyan de) b.c., b.d., r. 12.

CamScanner ile tarandı

Destpêka Terkîbê:

"Tû bizan! Du mezheb carî bûne di terkîba Bismillahî de: Mezhebê Besriyan, Mezhebê Kûfiyan. Li mezhebê Besriyan cumleyê fi'lî ye; li mezhebê Kûfiyan cumleyê îsmî ye. emma li nik mezhebê Besriyan "ba" 'amilê lefzî sema'î ye, herfek ji hurûfê carr e."[180]

2.2. MELAYÊ ERWASÎ

2.2.1.Zanyariyên Nasnameya wî

Melayê Erwasî, duyemîn pexşannûs e ku di sedsala XVIIIan de jiyaye. Lê wî dawiya temenê xwe di destpêka sedsala XIXan de bûrandiye. Celadet Elî Bedîrxan di kovara Hawarê de di nivîsa xwe ya bi navê "Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin" (Hawar 1941, hej. 33" de rasterast behsa nivîskarê me kiriye. Li gorî agahiyên Bedîrxan, Melayê Erwasî berî wî bi 150 salî koçî dawiyê kiriye. Ji vê jî derdikeve meydanê ku Melayê Erwasî di dawiya sedsala XVIIIan û di destpêka sedsala XIXan de jiyaye.

Ji xebatên ku heta niha hatine kirin derketiye meydanê ku navê nivîskarê me Mihemed e, lê ew ne bi navê xwe, wekî Melayê Erwasî yan jî Şêx Mihemedê Qutub hatiye naskirin. Ev jî dide nîşandan ku Melayê Erwasî kesayetekî dînî (mela) û tesewifî (şêx û qutub) ye. Piştî wî ji malbata wî Seyîd Sibxetulahê Erwasê di warê tesewifê de gelekî deng vedaye.

Herçiqas Yûsuf Diyaeddîn Paşa el-Meqdisî di destpêka ferhenga xwe ya bi navê "el-Hediyyetu'l-Hemîdiyye fi'l-Luxeti'l-Kurdiyye" de nivîskarê me bi bal Erqetînê ve nîsbet kiribe jî, piştre Celadet Elî Bedîrxan ew bi bal Erwasê ve nîsbet kiriye. Xebatên ku piştî Bedîrxan hatine kirin jî ew wekî "Erwasî", ne wekî "Erqetînî" nîşan dane. Erwas gundekî li ser bajarê Miksê ye û nav û dengê xwe ji malbata Erwasiyan girtiye. Li gorî

180 Mela Yûnisê Helqetînî, *Terkîb*, (Di nav pênc rîsaleyan de) b.c., b.d., r. 22.

CamScanner ile tarandı

agahiyên ku hatine bidestxistin jî vê malbatê yekemîn kesê li gundê Erwasê bi cih bûye jî nîvîskarê me Melayê Erwasî ye.[181]

2.2.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Melayê Erwasî ji wan kesên nadir e ku di dema mîrektiyan de bi Kurdî berhemeke pexşan daye. Berhema wî wekî "Tiba Melayê Erwasî" tê naskirin û wekî mijar jî derheqê tiba gelêrî de ye.

"Tiba Melayê Erwasî" di sala 2000î de jî aliyê Zeynelabidîn Amidî ve ji nû ve bi destan hatiye nivîsandin. Kadri Yıldırım ev berhem bi Kurdiya Kurmancî û bi Tirkî amade kiriye û digel dahûrînekê û nusxeya Zeynelabidîn Amidî ya bi herfên Erebî çap kiriye.

Herêma Miksê bûye warê gelek nîvîskar û helbestvanên Kurd ên klasîk. Bêguman di nav wê atmosfera rewşenbîrî de, kesekî wekî Melayê Erwasî berhemeke girîng nivîsandiye.

Bêguman berhema Erwasî ji aliyê bidestxistina taybetiyên fonetîkî, rêzimanî û termînolojiya tiba gelêrî yên serdema wî materyaleke zehf girîng e. Di berhemê de mirov dikare derheqê navên nexweşiyan, derman û nîşaneyên wan, aliyên dermanan yên nerênî û parêzê de agahiyan bibîne. Bo nimûne navên hinek nexweşiyan ên ku di berhemê de derbas dibin ev in: Ba, bawesîr, birîn, bernegirtina daran, birîn, bîrov, çavêş, êşa piştê, êşa didanan, germiya bedenê, gezkirina mar û dûbişkê, qolinc, guhêş, hemla jinê, îshal û zikêş, jehr, kurm, ketina deng, mîznehatin, nezle, sefre, sîngê girtî, ta, nefestengî, werma gewriyê, weşana mûyan, zerik û zûrekxwarin.

Ji bo zimanê berhemê jî bê dîtîn, em dê li jêrê ji berhemê çend pasajan pêşkêş bikin:

"Eger kesê nezle li serê wî peyda bibe û yan av çi çavan bê û çav tarî bit, belgê kulîlka kulmac bînin biqutin, bikelînin, ava wê bigirin di çavê xwe bixin û bikşînin demaxê xwe, wê sê rojan pak bibit. Emma eger demax gelek bişote zerar nake."

181 Jî bo agahiyên berfirehtir bnr. Kadri Yıldırım, *Tiba Melayê Erwasî*, Weşanên Enstîtuya Zimanên Zindî, Stenbol 2013, r. 9-13.

CamScanner ile tarandı

"Eger kesê reha reyhana çiyayî bikelînit, vexwot, tengasiya nefesê zaîl dike û cîgerê taze dike; emma heftayekê her roj fincanek vexwot."

"Eger kesê heft behr şîr û yek behr zencefil nav hev de bikelînin, hêdî bikelînin heta çar behr bimînit, weqtê razanê her car fincanek vexwot, di weqtê sibehê ra îshal dibit."

"Eger kesê reha tûtakê biqute hişk bikit, paş bi 'esel hevî bikit, mîqdarê du bindeqan bixwo, derdê zikêş û îshalê pak dibit."[182]

E. SEDSALÊN HIJDEHEM Û NOZDEHEM (SEDSAL: XVIII-XIX)

Ev qonaxa edebiyata Kurdiya kurmancî, ji dawiya sedsala XVIIIem dest pê dike û heta bi nîvê sedsala XIXem dewam dike. Piraniya helbestvanên vê qonaxê di serdema dawî ya mîrektiyên kurmancan de jiyana û rûxandina wan jî dîtine.

Di vê qonaxê de çar helbestvanên xwedî dîwan hene: Pertew Begê Hekkarî, Weda'î, Şêx Nûredînê Birîfkanî û Şêx Ehmedê Feqîr.

Di warê mesnewiyên evînî de Siyahpoş bi "Seyfulmilûk û Bedî'ulcemal"ê berhemeke orjînal daye.

Di warê edebiyata dînî-dîdaktîk de, Mela Xelîlê Sêrtî bi "Nehcu'l-Enam" û "Menzûmeya Tecwîd"ê; Feqe Reşîdê Hekkarî jî bi "Sirru'l-Mehşer"ê du nûnerên girîng ê vê sedsalê ne.

Pertew Begê Hekkarî di serî de Mihemed Teyar Paşayê Amêdiyê û Bekir Begê Erizî sê helbestvan in ku di heman wextî de xwediyê desthilatê ne jî. Li vir desthilatdar bixwe ku pozîsyona wan hîmayeya helbestvanan e, bûne helbestvan.

Di vê qonaxê de jî tesîra helbestvanên berê her berdewam kiriye. Pertew Beg, Weda'î, Teyar Paşa û Şêx Ehmedê Feqîr li

182 Yıldırım, *Tiba Melayê Erwasî*, r. 42.

CamScanner ile tarandı

pey rêça Melayê Cizîrî; Feqe Reşîd û Bekir Beg jî li pey rêça Feqiyê Teyran çûne.

Di vê qonaxê de, bereksê qonaxên berî wê helbestvanên pêgirtiyên terîqetên tesewifî zêde bûne. Şêx Nûredînê Birîfkanî û Şêx Ehmedê Feqîr şêxên terîqeta Qadirî bûn; Mela Xelîlê Sêrtî jî pêgirtiyê wê terîqetê bû. Siyahpoş, Pertew Beg û Weda'î jî pêgirtiyên terîqeta Neqşebendî/Xalidî bûn.

Mela Mehmûdê Bazîdî ku di vê serdemê de jiyaye, di çarçoveya serdema klasîk de nûnerê herî girîng ê pexşana Kurdî bi giştî ye. Di vê serdemê de, di warê pexşanê de, berhemeke dî jî "Şerha Camê Wehdet" e.

Di sedsalên XVIem û XVIIem de avabûna edebiyata Kurdîya kurmancî ya klasîk temam bûye û di sedsalên XVIIIem û XIXem de jî bêrawestan nûnerên nû derketine û van nûneran berhemên curbicur dane. Bi baweriya me piştî qonaxa avabûnê, herçiqas tesîra berê hebe jî, paşveçûn tine ye; qet nebe di hijmara helbestvanan de zêdebûn heye, wekî berê dîwan, mesnewî û menzûme hatine nivîsandin û di warên nû de berhemên orjînal jî hatine dayîn. Bi rehetî dikare bê gotin ku eger dawî li mîrektiyan nehatiba dayîn, edebiyata Kurdîya kurmancî ya klasîk dê di hemû warên edebiyata klasîk de xwe temam bikira.

1. DI SEDSALÊN HIJDEHEM Û NOZDEHEM DE NEZM/HELBESTA KURDÎ

1.1. SIYAHPOŞ

1.1.1. Jiyana wî

Siyahpoş helbestvanekî girîng ê Kurdiya Kurmancî ye. Navê wî Mihemed Cewad e. Lê di helbestên xwe de mexlesa Siyahpoş bi kar aniye û di nav Kurdên Kurmanc de wisa hatiye naskirin. Di berhemeke Erebî de[183] helbestvanê me wekî Mu-

183 Ebdulmecîd b. Muhemmed el-Xanî, *el-Hedaîqu'l-Werdiyye fî Heqaîqî Ecillai'n-Neqşebendiyye*, Camî'u'd-Derwîşiyye, Dîmeşq, b.d.., r. 251.

CamScanner ile tarandı

hemmed Cewad es-Siyahpûşî hatiye nasandin û nav û mexlesa wî bi hev re hatine îfadekirin. Siyahpoş di Farisî de ji wî kesê ku ji ber şînê yan jî ji ber sedemekî dî cilên reş li xwe kiriye re tê gotin ku di Kurdî de beramberî "reşgirêdayî", yan jî "reş-pêçayî" tê. Ji vê beyta jêrîn a helbestvanê me, mirov sebebê hilbijartina peyva Siyahpoş wekî mexles têdigehe:

Camê 'isqê ez kirim mest û xerab
Lew Siyehpoş bûme manendê xurab
Ke'l-'iqab im xoş xirab im dilkebab
El-firaq û el-firaq û el-firaq

Ji hinek nîşaneyan derdikeve holê ku serdema Siyahpoş beramberî dawiya sedsala XVIIIan û destpêka sedsala XIXan tê. Yek ji van nîşaneyan ew e ku wî berhema xwe "Seyful'-Milûk û Melke Xatûn" di sala 1820an de nivîsandiye. Ev yek ji vê beyta wî ya jêrîn tê fêmkirin:

Bi dil wî şahê 'Asim yek xezel xoş
Reqem da 'aşiqê bêdil Siyahpoş

Di misraya duyem a vê beytê de peyvên "reqem da" "'aşiq" "bidil" û "Siyahpoş" li gorî hesabê ebcedê beramberî sala 1236ê mişextî tê ku ew jî bi mîladî beramberî sala 1820î tê.

Nîşaneyeke dî jî ew e ku Siyahpoş li ser Mewlana Xalidê Şehrezorî mersiyeyek nivîsandiye.[184] Ev jî nîşan dide ku Siyahpoş di sala 1826an de, ku Mewlana Xalid di wê salê de koçî dawiyê kiriye, berheyat bûye.

Ji xwe Celîlê Celîl jî dibêje ku Siyahpoş di sala 1762/1831ê de wefat kiriye.[185] Herçiqas belgeya vê tarîxê nehatibe nîşandan jî, lê dîsa di çarçoveya wan her du nîşaneyan de ev tarîx şaş xuya nake. Wekî encam mirov dikare bêje ku Siyahpoş kemala

184 Xanî, h.c.
185 Celîlê Celîl, *Keşkûla Kurmancî*, Wien 2004, r. 53.

CamScanner ile tarandı

temenê xwe teqez di di destpêka sedsala XIXan de bûrandiye. Ev jî tê wê wateyê ku ciwaniya xwe jî di dawiya sedsala XVIIIan de bûrandiye.

Derheqê welatê Siyahpoş de jî belgeyeke nivîskî tine ye. Lê digel vê jî, ji hinek nîşaneyan tê fêmkirin ku ew bi eslê xwe ji Kurdistana Rojhilat e. Bo nimûne di vê beyta jêrîn de ew xwe wekî Îranî nîşan dide:

Karê şem'ê her şewat û mihbet û sohtinî ye
Lew disojitin Îranî şibhetê perwaneyê

Di vê beyta jêrîn de jî îfade dike ku ew ji Îranê derbasî Bexdayê bûye.

Me xwar camek şeraba xoş ji destê saqiyê mehweş
Wekî min hişte Îran û berê xwe da bi Bexdayê

Celîlê Celîl dibêje ku ew ji derdora bajarên Urmiye, Têrgawêr, Mêrgawer, Xoy û Salmasê ye.[186] Ev bajar tev li Kurdistana Rojhilat herêma Kurdên Kurmanc nîşan didin.[187] Ev tev Îranîbûna Siyahpoş piştrast dikin.

Li gorî zana û melayên Silîvî (Farqînî) Siyahpoş demekê hatiye Silîva û li gundê Silîva yê bi navê Kurbeytê bi cih bûye û li wir melatî kiriye. Li wê derê têkiliya wî zehftir bê Ferhoyê Izêr Axa re çêbûye.[188] Li gorî hinek melayên Silîvî, wî li gundê Kurbeytê koçî dawiyê kiriye û gora wî heta niha jî li vî gundî ye.[189] Ji bilî vê nêrînê derheqê cihê gora Siyahpoş de ti agahiyên nivîskî nînin.

---

186 Celîl, h.c.

187 Siyahpoş, *Seyf-ul Milûk û Bedî-ul Cemal*, Amd. Bedirxan Amedî, weş. Nûbihar, Stenbol Pêşgotin, r. 5; Selim Temo, *Kürt Şiiri Antolojisi*, weş. Agora, İstanbul 2007, b. II, r. 1448-1449.

188 Rojen Barnas, *Sîlvan Silîvan Farqîn*, Nûbihar, Stenbol 2013, r. 197

189 Li gorî agahiyên ku Şêx Misbahê Silîvî dan me, Şêx Mîsbah û çend hevalên xwe di sala 1976an de dora gora Siyahpoş sererast kirine û dîwar lê kirine.

CamScanner ile tarandı

Eger mirov di çarçoveya van agahiyan de li qonaxên jiyana Siyahpiş binêre, dê derkeve holê ku di jiyana wî de bi rêzê sê qonax hene: Herêma Kurdên Kurmanc (bajarên Urmiye, Têrgawêr, Mêrgawer, Xoye û Salmasê) li Kurdistana Rojhilat, Bexda (û mihtemelen Kurdistana Başûr) Diyarbekir (Kurdistana Bakur). Dema mirov li vê guzergahê dinêre, mirov têdigehe ka Siyahpoş çiqas zêde geriyaye. Ji ber vê yekê jî navê wî zêde belav bûye.

Li vir pêwist e em li ser aliyê wî yê tesewifî rawestin. Mewlana Xalidê Şehrezorî (k.d.1826) yê ku ekola wî ya tesewifî (terîqeta wî) dê bi taybetî di nav Kurdan de û bi giştî jî li coxrafyaya Mislimanan belav bibe di destpêka sedsala XIXan de derketiye meydanê. Piştî Mewlana Xalid bi taybetî di serdema piştî mîrektiyan de gelek helbestvanên Kurd ên pêgirtiyê vê ekolê derketine holê. Îcar helbestvanê me Siyahpoş, hê Mewlana Xalid li heyatê ew nas kiriye û dema ku Mewlana Xalid koçî dawiyê kiriye li ser wî bi zimanê Erebî mersiyeyek jî nivîsandiye. Bêguman sedemê çûna Siyahpoş bo Bexdayê dê ziyareta Mewlana Xalid be. Lewra Mewlana Xalid demekê li Bexdayê maye û li wir terîqeta xwe belav kiriye.

1.1.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Siyahpoş bi menzûmeya xwe ya bi navê "Seyfu'l-Milûk û Bedî-ul Cemal"ê cihekî girîng di tarîxa edebiyata Kurdî de digire. Ev berhema menzûm, wekî cure mesnewiyeke evînî ye û mirov dikare wê di nav sê-çar mesnewiyên herî girîng ên Kurdiya Kurmancî de bihesibîne. Li gorî çapa Nûbiharê berhem ji 2883 beytan pêk tê. Kêşa wê ji behra Hezecê qaliba "Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun" e. Beytên pêşî û dawiyê yên Seyfilmilûkê weha ne:

Beyta pêşî:

Li ser lewhê qelem gerya ji Heq da
Tulu'ê fecrê 'uşşaqan şefeq da

CamScanner ile tarandı

Beyta dawî:

Meramê wan ku hasil bû bi sohbet
Ew e qenc em bikin vê qissê temmet

Berhem bi taybetî ji aliyê xezelên ku di nav beytên mesnewiyê de hatine belav kirin ve di edebiyata Kurdî de bê hemta ye. Bi vê rêbazê nivîskar xwestiye ku monotoniya vegotinê ji holê rake û derfeta bêhnvedanê bide xwendevanan. Siyahpoş ev rêbaza ku berî wi di hinek mesnewiyên Farisî û Tirkî de jî hatiye bikaranîn, bi awayekî serkeftî di berhema xwe de bi cih aniye. Ev xezelên di nav Seyfu'l-Milûkê de di sala 1999an de ji aliyê M. Reşit Irgat ve di xebateke serbixwe de bi navê "Çend Xezel û Helbest" hatine çap kirin (İstanbul Kürt Enst. Yay. İst.).

Seyfilmilûk, cara pêşî ji aliyê Celîlê Celîl ve bi navê "Seyfilmilûk"ê li Wiyanayê (sal: 2000) û cara duyem jî ji aliyê Bedirxan Amedî ve bi navê "Seyfulmulûk û Melke Xatûn"ê li Stenbolê hatiye çapkirin (Nûbihar, İst. 2006, 2011.). Berhem bi navê "Seyfu'l-Milûk û Bedî-ul Cemal"ê ji nav weşanên Nûbiharê derket.

Çawa ku me li jorê jî got, Siyahpoş kesayetekî mitesewif e û peyrewê Mewlana Xalidê Şehrezorî ye. Lê ew ji helbestvanekî meddahê şêxê xwe zêdetir, kesayetekî zana û rewşenbîr e. Ew wekî Hacî Bektaş li ser têgehên şerî'et, terîqet, heqîqet û me'rîfetê rawetiyaye:[190]

Hedîsê can e eqwalê şerî'et
Terîqet fi'l û ehwal e heqîqet

Şerî'et ra bi keştî tu binase
Bina ken keştiyê mihkem esas e

190 Siyahpoş, b.n., r. 100.

CamScanner ile tarandı

Terîqet behr û deryayê mezin tê
Heqîqet durrê 'ilmê min ledun tê

Siyahpoş di çarçoveya felsefeya xwe ya tesewifê de ji sembolîzma herfên hêcayê sûd wergirtiye. Mebesta wî ji bikaranîna vê sembolîzmê gihîştina wehdetê ye ku vê yekê weha îfade dike:

Çi me'na tê j' "Elîf" û ta bi "Ya"ê
Ji hubba wehdetê ba wî Xwedayê

Piştî vê beytê jî xezela xwe ya ku di her beyteke wê de cih dide herfekê înşa dike. Ev xezela wî bi van beytan dest pê dike û diqede:

"Elîf" Ellah û "La Îlahe Îlla Hû" di me'nayê
Beraet pir mişewweş tê ji xala nuqteya "Ba"yê

Ji Ya Yewme Yekûnu'n-nasu pir xewf û mişewweş tê
Siyehpoş xweş nezim anî temam hurûfê hecayê

Taybetiyeke dî ya Siyahpoş ew e ku ji bilî Kurdiya Kurmancî bi Erebî û Tirkî jî dizanî. Ew mersiyeya ku li ser koça dawiyê ya Mewlana Xalid nivîsandiye bi Erebî ye. Zimanê vê mersiyeyê ewqasî edebî ye ku miftiyê Bexdayê Mehmûd el-Alûsî li ser wê şerhek nivîsandiye[191].

Siyahpoş di helbestên xwe de carcaran cih daye Tirkî jî. Bo nimûne di beyta dawî ya vê helbesta xwe ya ku di nav Kurdên bakur de ji aliyê qesîdebêjan ve bi kul û keser tê xwendin de cih daye Tirkî jî.

Ey hebîba qelb û rûhî wey qerara canê ma
Dê çi bîtin carekê ger tu bibî mêhmanê ma
Zilf û xalên maherûyan çok Siyahpoş ettiler
Korkarım ben kara ola çadır û seywanê ma

191 Xanî, b.n., r. 251

CamScanner ile tarandı

1.2. PERTEW BEGÊ HEKKARÎ

1.2.1.Zanyariyên Nasnameya wî

Pertew Begê Hekkarî wekî serdem di dawiya sedsala XVIIIan û di destpêka sedsala XIXan de jiyaye. Hin kes jidayîkbûn û koça wî ya dawiyê wekî 1777-1841 nişan didin. Hin kes jî jidayîkbûna wî wekî sala 1170/1756 nîşan didin. Lê tişta ku teqez tê zanîn ew e ku wî dîwana xwe di sala 1221/1806an de xilas kiriye. Li gorî van tarîxan dema wî diwana xwe nivisandiye yan 29 salî, yan jî 50 salî bûye.

Herçiqas berê derheqê nasnameya Pertew Beg de hinekî alozî û tarîtî hebû jî,[192] piştî ku Tehsîn Î. Doskî di sala 1989an de di kovara "Karwan" de bi sernavê "Pertewê Kurd Mistefa Begê Mîrê Hekkarî ye" gotarek weşandiye, aşîkar bûye ku Pertew, mexlesa Mistefa Begê mîrê Hekkarî ye.

Ev mîrektî mîrektiyeke kevn e û mîrê yekem ê mîrektiyê Siraceddîn (1280-1296). Helbestvanê me Mistefa Beg kurê Ebdulah Beg, ew jî kurê Îbrahîm Xan, ew jî kurê Mihemed Xan, ew jî kurê Izedîn Şêr, ewe jî kurê Şefef Xan, ew jî kurê Zekeriya Beg e. Ev Zekeriya Beg hevçaxê Şerefxanê Bedlîsî ye. Bi navê Kerîm Xan, Elî Beg, Teymûr Beg û Şeref Beg çar birayên Pertew Beg hene. Piştî Ebdulah Beg (bavê helbestvanê me) kurê wî Kerîm Beg çar salan mîrîtî kiriye, lê wî xwe ji mîrîtiyê vekişandiye û cihe xwe daye Pertew Beg. Di dawiya mîrektiya Pertew Beg de de kurê wî Nasir Xan serê xwe li ber bavê xwe rakiriye û demekê li Hekkarî mîrektî kiriye. Lê ji ber ku koçî dawiyê kiriye, helbestvanê me Pertew Beg cara duyem bûye mîr. Piştî Pertew Beg ji bo sê mehan biraziyê wî Îshaq Beg û piştî wî jî neviyê Pertew Beg Nurullah Beg bûne mîr. Piştî hingî di navbera Nûrullah Beg û Silêman Begê kurê Mîr Nasir de neyartiyê dest pê kiriye û ji ber ku Osmaniyan jî biryara dawîlêhatina mîrektiyan dabû, dawî li mîrektiya Hekkarî hatiye.

192 Bo nimûne bnr. Yûsif, b.n., r.107-108; Amêdî, b.n., r. 246-250; Sağnıç, b.n., r. 423-424.

CamScanner ile tarandı

Pertew Beg di dîwana xwe behsa behsa Mîr Salih Begê Şêrwanî (k.d.1818) û mîr Nûrullah Begê Miksî (k.d.1834) kiriye. Ev jî têkiliya Pertew Beg bi mîrên dî yên derdora wî re nîşan dide.[193]

Ji beyteke Pertew Beg tê fêmkirin ku ew pêgirtiyê terîqeta Neqşebendî bûye. Helbestvanê me di vê beyta ku li jêrê hatiye dayîn de, dibêje ku "Ey Pertew, dema te bi dawa pîrê Neqşebendî girt, ji xeybê ji min re hat gotin ku dilê xwe xweş bike û netirse."

Pertewa hîna te girt damanê pîrê Neqşebend
Hate goşê dil ji xeybê Ferrih we la texef

Ji ber ku di serdema Pertew Beg de terîqeta Neqşebendiye li herêma Hekkarî serdest bû, tiştekî gelek asayî ye ku Pertew Beg pêgirtiyê ve terîqetê be. Di serdema wî de li herêma Hekkarî li Şemzînan li gundê Nehrî tekyaya Seyîd Tahayê Nehrî hebû. Hêjayî gotinê ye ku helbestvanekî dî yê ve sedsalê Weda'î jî pêgirtiyê Seyîd Tahayê (Tahirê) Nehrî bû.

1.2.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Pertew Begê Hekkarî di edebiyata Kurdiya Kurmancî de nûnerekî girîng ê edebiyata klasîk e. Di serdema mîrektiyan de yek ji helbestvanên xwedî dîwan ew e. Bi qasi ku xuya dibe, piştî Melayê Cizîrî duyem helbestvanê ku li gorî rêza herfên heceyê dîwan amade kiriye Pertew Beg e. Taybetiyeke wî ya girîng ew e ku Pertew Beg bixwe helbestvanekî mîr e. Ew ji vî aliyî ve digel Bekir Begê Erizî û Teyar Paşayê Amêdiyê dikevin nav heman kategoriyê. Lê di nav her sêyan de ji aliyê edebî ve yê herî bihêz bêguman Pertew Beg e.

---

193 Bnr. Tehsîn İ. Doskî, *Dîwana Perto Begê Hekkarî*, Nûbihar, Stenbol 2011, r. 21-25.

CamScanner ile tarandı

Pertew Beg dîwana xwe di sala 1221/1806an de xilas kiriye. Katibê wê kesekî bi navê Ebdulah e. Mirovekî Soran di sala 1944an de li ber vê nusxeyê nusxeyek zêde kiriye ku ev nusxe ji bo çapa Sadiq Behaedînê Amêdî bûye bingeh. Lê berî ku çap bibe, li Kurdistana Başûr hinek kesan hinek helbestên wî weşandine. Bo nimûne, Huseyn Huznî Mukriyanî, Di "Zarê Kurmancî" de, (Rewandiz 1927) û di "Dengê Gêtiyê Taze" (1944-45) de hinek helbestên wî weşandine.

Heta niha sê kesan; Sadiq Behaedînê Amêdî (Daru'l-Hurriy, Bexda 1978), Zeynelabidîn Zinar (Bonn 1991) û Tehsîn Îbrahim Doskî, (Spîrêz 2006) dîwana Pertew Beg çap kirine. dîwana Pertew Beg dîsa ji aliyê Doskî ve ji bo Kurdên Bakur di nav weşanên Nûbiharê de derket (sal: 2011).

Di dîwana Pertew Beg de bi tevahî 10 qesîde, 4 texmîs, 39 çarîne, 166 xezel û piştî xezelan jî 10 helbestên dî hene. Helbestvanê me di van helbestan de mexlesa Perto bi kar aniye ku ev peyv di Farisî de tê wateya tîşk û ronahiyê. Wekî nimûne;

*Ey **Pertoyê** bilbilmîsal*
Ya nexmeyê şîrînmeqal
Perwaz ke pêş baxê cemal
Feslê gul e roja wîsal

Petew Begê Hekkarî peyrewekî Melayê Cizîrî ye. Çawa ku ji van nimûneyên li jêrê jî derdikeve meydanê, ew di hunera xwe de di bin bandora Mela de maye. Lê Pertew Beg wekî Mela helbesta xwe bi tegehên felsefî asê nekiriye.[194]

Nimûne 1.

Pertew Beg:
Wê ji nû cezba evînê dil ji min bir dil ji min
'Işweyek wê horî'eynê dil ji min bir dil ji min

194 Amêdî, b.n., r. 251-253.

CamScanner ile tarandı

Agirê hubbê bihêt im dil kire mislê kebab
B' awirên wê surşirînê dil ji min bir dil ji min

Melayê Cizîrî:
Şox û şengê zuhre rengê dil ji min bir dil ji min
Awirên heybetpilingê dil ji min bir dil ji min
Wê şepalê misk(i)xalê dêmdurê gerdenşemalê
Cebhetan miskan sema lê dil ji min bir dil ji min

Nimûne 2.

Pertew Beg:
Şahê cemalê 'adil e îro mi jî mexmûr e dil
Minnet ku safî şahid e lew şakir û mesrûr e dil
Ustadê 'işqa bu'l-hewes heta hebû cezake nefs
Remza Ene'l-Heq dayî des serdar û xoşmensûr e dil

Melayê Cizîrî:
Îro ji remza dêmdurê minnet ku min mesrûr e dil
Dilber bi fincana surê mey da me û mexmûr e dil
Remzek nihîn avêhte dil mihrê ji batin mêhte dil
Şehzadeyê sur rêhte dil şehkaseya ferfûr e dil

Taybetiyeke dî ya Pertew Beg ew e ku beşeke girîng ji dîwana xwe jj çarîneyan (ruba'iyan) re terxan kiriye ku hijmara wan 39 e. Wekî nimûne;

Şev nîne ku min nale nebûn ji felek
Hêstir ji Firat û Nîl boş bûne gelek
Dilber bi mi ra we'de xeber da nekitin
Tirsim bi mi ra wefa nekit çerxê felek

CamScanner ile tarandı

1.3. WEDA'Î

1.3.1.Zanyariyên Nasnameya wî

Helbestvanekî dî yê dawiya mîrektiyên Kurdan Weda'î ye. Weda'î mexlesa wî ya helbestê ye. Derheqê navê wî, malbata wî û cihê jidayîkbûna wî de agahî nînin. Wisa tê texmînkirin ku Weda'î di sala 1790î de li Miksê hatiye dinyayê.

Pîşeya Weda'î debîriya mîrên Miksê bû ku cara pêşî ji mîrekî Miksê bi navê Şêxî Beg re katibî kiriye. Di helbesteke xwe de behsa şoreşa Şêxî Beg a li hember hêzên Tirkan kiriye û di vê helbestê de diyar kiriye ku di sala 1237/1821ê de Şêxî Beg ji aliyê Adil Xan ve hatiye kuştin. Piştî kuştina Şêxî Beg, li gorî ku Weda'î di helbesta xwe de îfade kiriye, Xan Mehmûd (Mehmûd Beg) bûye mîrê Miksê:

Qet mislê Xan Mehmûd yekê
Nînin de dewra felekê
Xoş bit li cih Şêxî Begê
Kanê cîhangîrê cîhan

Piştî ku Xan Mehmûd bûye mîr, Weda'î ji wî re jî debîrî kiriye. Di heman salê de jê re kurek çêbûye û navê "Mehmûd" lê kiriye. Wisa tê texmînkirin ku wî navê Xan Mehmûdê ku piştî Şêxî Beg hatiye ser desthilatê li kurê xwe kiriye. Xan Mehmûd, di sala 1838an de Xoşeb stendiye. Di sala 1847an de teslîmî Osmaniyan bûye û di sala 1866an de li Rûsçukê koçî dawiyê kiriye.

Ji helbestên Weda'î tê fêmkirin ku piştî ku temenê wî pêş ketiye ji xwe re riya tesewifê hilbijartiye û wekî murşidê tesewifê întîsabî Seyîd Tahayê (Tahirê) Nehrî kiriye ku Seyîd Taha di wê serdemê de jiyaye û li wan herêman xwedî bandor bûye.

Terkê dinya û hewes ke
J' xizmeta mîran tu bes ke

CamScanner ile tarandı

Qesdê yek sahib nefes ke
Belku derdê te dewa ke

Hîviya min padîşaha
Seyyidê Semmiye Taha

Wedaî derdora sala 1850î de 60 salî wefat kiriye.

1.3.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Weda'î helbestvanekî xwedî dîwan e. Destnivîsa dîwana wî ya 88 rûpelî ji aliyê A. Le Coq ve ji Kurdistanê hatiye bidestxistin û di navbera salên 1905-1907ê de li Berlînê bo pirtûkxaneya Statsbibliotheka ya neteweyî hatiye firotin û piştre ji aliyê Se'îd Dêreşî ve sala 2000î di pirtûkxaneyê hatiye dîtin û di sala 2002yan de ji aliyê wî ve li Berlînê (weşanxaneya Havîbûn) hatiye çapkirin. Heman berhem di sala 2008an de ji aliyê weşanxaneya Spîrêzê ve li Dihokê hatiye weşandin. Herî dawî bi pêşgotineke firehtir di nav weşanên Nûbiharê de (Stenbol 2012) derket.

Weda'î helbestên xwe bi du zimanan nivîsandine: Kurdiya Kurmancî û Farisî. Lê helbestên wî yên Farisî ji yên Kurdiya Kurmancî zehftir in. Di dîwana wî de ji şêstî zêdetir helbestên Farisî û sîh û şeş helbestên bi Kurdiya Kurmancî hene. Di gelek helbestên xwe de li pey rêça Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî çûye.[195]

1.4. ŞÊX NÛREDÎNÊ BIRÎFKANÎ

1.4.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Şêx Nûredînê Birîfkanî temenê xwe yê pêşîn di dawiya sedsala XVIIIan de, lê piraniya temenê xwe di nîvê pêşî yên sedsala XIXan de derbas kiriye. Şêx Nûredînê Birîfkanî wekî bi-

195 Seîd Dêreşî, *Dîwana Weda'î*, Nûbihar, Stenbol 2012, r. 11-41.

CamScanner ile tarandı

nerih di xeleka pêncan de neviyê Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî (1588-Exlat-1674-Birîfkan). Bi riya bavê xwe Şêx Ebdulcebar, bavê wî Şêx Nûredîn, bavê wî, Seyyid Ebûbekir û bavê wî Seyyid Zeynelabidîn digihîje Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî. Qutbê Exlatî jî digihîje Cenabê Muhemmed. Derheqê kesên ji wî ber bi jor de di mijara Şêx Şemsedîn de agahî hatibû dayîn.

Şêx Nûredînê Birîfkanî, di sala 1791ê li gundê Birîfkanê hatiye dinyayê. Ev gund bi Şêxan (Eyn-Sifnî) ve girêdayî ye û dikeve rojhilatê Dihokê. Herweha Birîfkan gundekî eşîra Muzûriyan e.

Şêx Nûredîn biçûkê sê biran e. Her duyên ji wî mezintir Ebdullah û Muhemmed Emîn in. Malbata wî hê ew biçûk ji Birîfkanê bar kirine û li gundekî dî yê eşîra Muzûriyan bi navê Îtûtê (dikeve navbera bajarê Dihokê û gundê Birîfkan) bi cih bûne.

'Ebdê ku ev înşa kirî muştaqî 'Ebdulqadirî
Mewlûd Birîfkan axirî Îtûte sakin muddetê

Şêx Nûredîn pêşî li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye. Lê ji ber ku bavê wî Seyyid Ebdulcebbar li vî gundî di sala 1321/1815an de wefat kiriye, xwendina xwe li cem seydayên dî kiriye. Tê gotin ku di deh saliya xwe de Qur'ana Pîroz ji ber kiriye. Ew seydayên ku Şêx Nûredîn li cem wan xwedine ev in: Miftiyê Mûsilê Şêx Ebdurrehman Debbax, Mela Yehyayê Mizûrî (li Amêdiyê), Şêx Hesen el-Hebîtî, Şêx Suleyman el-Kurdî el-Berwînî, Mela Ebdurrehman b. Mela Îsa el-Mûsilî, Şihabuddîn Ehmed Efendi Xeyyatzade, Ellame Yusuf er-Remedanî û Ellame Elî Efendî Muhdirbaşî.

Malbata Şêx Nûredîn malbateke Xelwetî bûn û û ji Şêx Şemsedînê Qutb û vir ve li ser wê şopê dewam kiribûn. Şêx Nûredîn jî xelîfetiya Xelwetîtiyê ji bavê xwe Seyîd Ebdulcebar stendiye. Lê piştre wî berê xwe daye terîqetên dî. Berî bîstsaliya xwe ji Şêx Ebdulwehabê kurê Eliyê Şûşî (Xelîfeyê Şêx Xalidê Neqşebendî) xelîfetiya Nakşibendîtiyê wergirtiye. Piştre di navbera wî û şêxê wî de pirsgirêk derketiye û şêxê xwe bi irtidadê itham

CamScanner ile tarandı

kiriye. Piştre xelîfetiya Neqşebendîtiyê ji Şêx Nûr Muhemmed Şah el-Hindî en-Nisabûrî stendiye.

Şêx Nûredîn, piştre çû Mûsilê û li wir ji "Eba Elî" Şêx Mehmûd kurê Ebdulcelîl el-Xidrî el-Mûsilî el-Kurdî xelîfetiya terîqeta Qadirîtiyê stendiye (1232/1817). Herî dawî di Qadirîtiyê de maye. Di sala 1234/1819an de çûye Bexdayê û li wir careke dî intisabî şêxekî bi navê Ebdulqadir kiriye ku silsileya wî digiha Şêx Ebdurrezaqê kurê Şêx Ebdulqadirê Geylanî.

Şêx Nûredîn, Piştî vê demê li çend deveran wezîfeya xwe ya tesewifî pêk aniye. Pêşî li gundê xwe Îtûtê bi cih bûye. Di sala 1239/1824an de bar kiriye gundê Etrûşê. Ji wir çûye gundê Beraşê. Ji wir jî çûye Birîfkanê û heta ku wefat kiriye li wir maye. Şêx Nûredîn 9ê Rebî'u'l-Axirê, şeva şemiyê, sala 1268/1851ê li gundê Birîfkanê wefat kiriye û li wir hatiye definkirin.

Şêx Nûredîn, dema ku li Îtûtê, Etrûşê, Beraşê û Birîfkan wezîfe kiriye, li Behdînan, Mûsil, Hewlêr û di nav koçeran de terîqeta Qadirîtiyê belav kiriye. Ji hemû aliyê welat-Kurdan mirîdên wî hebûne. Ew bi zuhda xwe û dûrbûna xwe ji desthilatdaran dihat naskirin.

Şêx Nûredîn bi keça Şêx Feyziyê Kilîrmanî Helîme Xatunê re zewiciye. Ji vê zewaca wan bi navê Pîroz, Fatime û Xedîce sê keçên wan çêbûne.

1.4.2. Berhemên wî yên Erebî

Şêx Nûredîn derdora 30 berhemî nivîsandine. Ev behrem bi piranî bi Erebî hatine nivîsandin. Yên herî girîng ji wan derheqê ilmê tesewifê de ne. Navên çend hebên herî girîng ji van berheman ev in: Minhacu's-Salikîn, Meramu'l-Îslam, Menaqibu'l-Xewsi'l-E'zem (wergera ji Farisî ye), Telxîsu'l-Hikem.[196]

---

196 Şêx Nûredînê Birîfkanî, *Dîwan Zibanê Kurdî*, Amd. Zahid Birîfkanî weş. Aras, Erbîl 2002, r. 17-27.

CamScanner ile tarandı

1.4.3. Berhemên wî yên Kurdî

Şêx Nûredîn, bi dîwana xwe ya ku wekî "Dîwana Kurmancî" hatiye naskirin, di tarîxa edebiyata Kurdî de cihekî xwe yê taybet heye.

1.4.3.1. Zibanê Kurdî

Navê "Dîwana Kurmancî" ku Şêx Nûredîn bi zimanê Erebî lê kiriye "Zuxretu's-Salikîn"ê. Wî ev dîwan di sala 1236/1820î de li gundê Îtûtê xilas kiriye. Destnivîsên dîwanê yên dî jî hene ku ji aliyê Şêx M. Tahir Mistefayê Brîfkanî û M. Selîm Çelkî ve hatine nivîsandin. Piştre neviyê wî yê di xeleka sisêyan de Şêx Memdûhê Birîfkanî, di navbera salên 1944-1966an de helbestên wî berhev kirine, li gorî herfên hêceyê yên Erebî bi rêz kirine û di dawiyê de cih daye terbî', texmîs û tesdîsên wî.

Herî dawî Zahid Birîfkanî ku endamekî malbata Birîfkaniyan e, bi navê "Zibanê Kurdî Dîwana Şêx Nûredînê Birîfkanî", dîwana Şêx Nûredîn çap kiriye. (Weşanxaneya Aras, Erbîl 2002).

Şêx Nûredînê Brîfkanî mutesewifekî gelekî mezin e ku bandor li gelek kesan kiriye. Dîwana wî jî di edebiyata Kurdî ya tesewifî de cihekî taybet heye.

1.4.3.2. Şîroveya Dîwana Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî

Şêx Nûredînê Brîfkanî, di vir de li ser dîwana kalikê xwe Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî bi Kurdiya Kurmancî hinek îzahat dane. Ev îzahat bi taybetî ji aliyê ku pexşan e girîng e.

1.5. MELA XELÎLE SÊRTÎ

1.5.1.Jiyana wî

1.5.1.1. Serdema wî û Malbata wî

Mela Xelîlê Sêrtî, di nîvê duyem ê sedsala XVIIIan û nîvê yekem ê sedsala XIXan de jiyaye. Mela Xelîl û Bedirxan Begê

CamScanner ile tarandı

mîrê Cizîra Botan hevdemê hev bûne û eleqeya wan bi hev re çê bûye.[197]

Bavê Mela Xelîl, Mela Huseyn, bapîrê wî jî Mela Xalid e. Malbata Mela Xelîl ji eşîra Elîcanan e. Elîcanî li herêma Hîzanê li gundên wekî Gulpîk, Kilîvyan, Şên û Kûlatê dijîn. Malbata wî bi eslê xwe ji Kûlatê ne. Bapîrê wî ji wir hatiye Gulpîkê. Malbata Mela Xelîl wekî Umerî tên naskirin.

Mela Xelîl di sala 1164/1750an de li gundê Gulpîkê ku niha li ser Hîzana navçeya Bedlîsê ye hatiye dinyayê. Eqrebayên malbata Mela Xelîl ku wekî Mala Se'dla tên naskirin, heta niha jî li Gulpîkê dijîn.

1.5.1.2. Perwerdeya wî

Mela Xelîl, cara pêşî li cem bavê xwe Mela Huseyn perwerde dîtiye. Piştre bi rêzê li Gulpîkê li cem Sofî Huseyinê Qeresewî, Mela Abdurehmanê Belakî, li Bidlîsê li cem Mela Remazanê Hezwînî, li Helenzê li cem Mela Mehmûd, li Westanê (Gevaş), li Miksê li cem Mela Mihemedê kurê. Mela Ehmedê Kevnasî, li Hîzanê li cem Mela Ebdulhadiyê-Erwasî, Li Xoşabê li cem Mela Huseynê Xoşabî, Li Cizîrê li cem Şêx Ferrux, li Xoşabê li cem Mela Ebduselamê Bîzanî, Mela Hesen û Mela Îsmailê Şîsenî (?). xwendiye. Herî dawî li Kurdistana Başûr çûye Îmadiyeyê û li medreseya miftiyê İmadiyeye Mela Mahmudê Behdînî ku wekî "Medreseya Qubehanê" tê naskirin bi cih bûye.

Zanayê navdar Mela Yehyayê Mizûrî (k.d.1836) li vê medreseyê digel Mela Xelîl bûye. Mela Yehyayê ku ji kesekî ders nedis-

197 Bedîrxan Beg ji Mela Xelîl rica kiriye ku kurê wî Mela Mustefa ji bo dersdariyê bê Cizîre. Li ser vê ricayê Mela Xelîl kurê xwe Mela Mustefa rêkiriye Cizîrê û Mela Mustefa jî li cem Bedîrxan Beg dersdarî kiriye. Lewra jî li herêma Botan piraniya îcazetên medreseyan digihine Mela Mustefa û ji wî jî digihine Mela Xelîl. Ev Mela Mustafayê kurê Mela Xelîl di dawiyê de di sala 1847an de bi Bedirxan Beg re hatiye nefî kirin (Bnr. M. Asim Oxînî, *Birketu'l-Kelîmat*, Nusxeya fotokopî ya destnivîsê, Pirtûkxaneya A. Adak a taybet.)

CamScanner ile tarandı

tand, tenê jî jî Mela Xelîl ders stendiye. Mela Xelîl li cem Mela Mehmudê Behdînî kitêbên hikemî, "Minhacü'l-Usûl" xwendiye û piştî ku sê salan li wir maye jî wî icazet standiye.

1.5.1.3. Dersdariya wî

Piştî ku Mela Xelîl li Imadiyeyê îcazet standiye vegeriyaye Hîzanê û li wir di Medreseya Meydanê de 5 salan dersdarî kiriye. Piştre li ser daxwaza bavê xwe, çûye Sêrtê, li wir bi cih bûye û li wir dest bi dersdariyê kiriye. Mela Xelîl dersdariya xwe demeke dirêj domandiye û icazeya ilmî daye gelek kesan. Bi riya van kesan piraniya silsileya îcazetên melayên piştî Mela Xelîl digine Mela Xelîl.

1.5.1.4. Koça Dawiyê

Mela Xelîl, di sala 1259/1843yan de di 96 saliya xwe de li Sêrtê koçî dawiyê kiriye. Li rojhilatê bajêr, li goristana Bileyliyeyê hatiye veşartin. Mela Xelîl, li pey xwe 4 zarok hiştine. Mela Mustefa kurê wî yê mezin e. Li Ciddeyê medfûn e û li ser kêla bavê xwe bi Erebî mersiyeyek nivîsandiye.

1.5.2 Aliyê wî yê Tesewifî

Mela Xelîl ji aliyê tesewifî ve pêgirtiyê terîqeta Qadirîtiyê ye. Dema li Îmadiyeyê bûye, muhtemelen piştî ku îcazet standiye çûye Reşîdiyeyê û li wir intisabî Şêx Ehmedê Reşîdî kiriye û li ser wî medhiye nivîsandine.

Mela Xelîl piştî ku vegeriyaye welatê xwe û piştre li Sêrtê bi cih bûye, îcar, gelek caran ji bo ziyareta Şêx Xalidê Cizîrî (k.d.1839) li ser merkebê çûye gundekî bi navê Basretê (li herêma Botan) û di sohbeta wî de maye.[198] Ev Şêx Xalidê ku xelîfeyê Mewlana Xalidê Şehrezorî ye, li herêma Botan, Sêrt û Mêrdînê damezirînerê şaxekî terîqeta Neqşebendîtiya Xalidî bûye. Wate Mela Xelîl digel ku Qadirî jî bûye, lê piştî ku Neqşebendîtî li welat belav bûye çûye bi ser şêxekî Neqşebendî jî.

198 Ez-Zibarî, b.n., r. 18, 28.

CamScanner ile tarandı

Mela Xelîl di warê tesewifê de du berhemên bi navê "Minhacü's-Sünneti's-Seniyye fi Adabi Sülûki's-Sûfiyye" û "Nebzetu Mevahibi'l-Leduniyye fi'ş-Şatahati ve'l-Vahdeti'z-Zatiyye" nivîsandiye.

1.5.3. Berhemên wî yên Erebî

Mela Xelîl, ji bilî berhemên xwe yên tesewifi, di mijarên Serf-Nehiw, Belaxet, Mentiq, Munazere-Cedel, Wez', Eqaid-Kelam, Hedîs, Fiqhh, Tefsîr, Tecwîd, Mewlûd, Şemail, Edebiyata Erebi û ilmen cur bi cur de 25 berhem nivîsandine. Ev berhem hemû bi Erebî ne.

Ji bilî "el-Kafiyetü'l-Kubra fi'n-Nehwî", "el-Me'fuwwat" û "Nehcul-Enam"ê ku Ehmed Hilmî el-Koxî amade kirine, "Menzûmetu'l-Xebiyye fi'l-Munazere" ku digel şerha Mela Salihê Xursî ji aliyê Zeynelabidînê Amidî (Diyarbekır 2002, r. 1-33) û "Besîretu'l-Qulûb fi Kelamî Ellami'l-Xuyûb ku ji aliyê Mela Sibxetullehê Zoqeydî ve hatiye amadekirin (Nûbihar 2013) kiriye yên dî giş destnivîsarin.[199]

1.5.4. Berhemên wî yên Kurdî

Mela Xelîlê Sêrtî, ji bilî aliyê xwe yê îlmî, xwediye zewqeke edebî ye jî. Lewra wî çi bi Erebî çi bi Kurdî gelek berhem bi nezmê nivîsandine. Menzûmeyên wî yên bi Erebî li aliyekî, em dê li vir tenê li ser yên Kurdiya Kurmancî rawestin.

1.5.4.1. Nehcu'l-Enam

Nehcul'Enam berhemeke girîng a edebiyata dînî ye. Ev behrema didaktik a dînî û exlaqî di medreseyên Kurdan de ji bo perwerdeya xwendekarên medreseyan hatiye bikaranîn.

---

199 Ji bo jiyan û berhemên Mela Xelîlê Sêrtî bnr. Mela Fudayl, *Tercemetu Hali Ceddina'l-A'la Mela Halil es-Si'rdi*, Nusxeya fotokopî ya destnivîsê, Pirtûkxaneya A. Adak a taybet. wr., 88-94; Bursalı Mehmet Tahir, *Osmanlı Müellifleri*, Matbaa-i Amire, İstanbul 1334, b. II, r. 38; Ömer Pakiş, "Molla Halil Siirdi", *DIA*, İstanbul 2005, b. X, r. 403-405; 'E. N. S. Doskî, *el-Molla Xelîl es-Sêrtî we Menhecuhu fi İsbati'l-'Eqaidi'l-İslamiyye*, weş. Spîrêz, Erbil 2007, r. 23-73.

CamScanner ile tarandı

Ev berhema menzûm a ku bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin, ji 22 beşan û 271 beytan pêk hatiye. Ji aliyê naverokê ve du beş in. Beşa yekem derheqê Eqîdeyê de ye û 151 beytan pêk hatiye. Beşa duyem jî derheqê exlaq de ye û ji 120 beytan pêk hatiye. Xatimeya wê jî ji 14 beytan pêk hatiye.

Nehcul'Enam, cara pêşî di tarîxa Safer 1337/Ekim 1918ê de ji aliyê Mustafa Helîm (şakirdê xettatê Matba'a-ı Evqaf-ı İslamiye ve Askeriye Mir Heqqî) bi navê "Kitabu'l-Eqaid bi'l-Lugati'l-Kurdiyye" hatiye çapkirin. Piştre li Şamê du caran (salên 1938 û 1947) ji aliyê Mela Remezanê Cêlekî Bûtî ve bi herfên Erebî hatiye çapkirin.

Berhem, li Stokolmê (1988) û li Stenbolê (Osman Akdağ û Kerem Soylu latinize kirine. (Weşanên Enstîtûya Kurdî) İstanbul 2002) bi herfên latînî hatiye çapkirin. Herî dawî ji aliyê Huseyn Şemrexî ve bi herfên Erebî û bi hevberkirina heşt destxetan hatiye amadekirin (Nûbihar, Stenbol 2012).

Ji ber ku Nehcu'l-Enam di nav gel û aliman de zêde belav bûye, li ser wê hinek şerh jî hatine çêkirin. Bi taybetî ev her du şerhên jêrîn zêde belav bûne.

1. Rehberê Ewam Şerha Nehcu'l-Enam

Ev şerh ji aliyê Ehmed Hilmiyê Qoxî ve bi Kurdiya Kurmancî hatiye çêkirin û di sala 1983yan de hatiye çapkirin.

2. Şerhu Nehci'l-Enam

Ev şerh jî ji aliyê Mela Zeynulabidin Amidî ve bi Erebî hatiye çêkirin.

Nehcu'l-Enam du caran bi bal Tirkî ve hatiye tercemekirin:

1. Hellu'l-Meram Tercemetu Nehci'l-Enam

Seyyid Tahir Geylanî (serkatibê Şer'iyeê û imamê mizgeftamezin a Bidlîsê) di navbera salên 1946-1950î de Nehcu'l-Enam bi Tirkî nezm kiriye. Di sala 1992ê de li Bursa Furkan Ofset'ê bi navê "Manzum Şafii İlmihali" (4 berhemên manzûme têdehene) hatiye çapkirin.

CamScanner ile tarandı

2. Evliyalar Diyarı Siirt'in Büyük Alimi Üstad Mela Halil'in Nehcul'-Enam'ının Türkçesi: Serkan Tekin, Stenbol, sal?

1.5.4.2. Menzûmeya Tecwîdê

Ev menzûmeya Mela Xelîlê Sêrtî di warê tecwîdê de ye. Tecwîd, zanistek e ku rêzikên rastxwendin û xweşxwendina Qur'ana Pîroz nîşan dide. Menzûmeya Tecwîdê di edebiyata dînî ya Kurdiya Kurmancî de berhemeke gelek girîng e. Lewra di tarîxa edebiyata Kurdî de di warê xwe de berhema yekem e. Ev Menzûmeya Tecwîdê heta niha nehatiye çapkirin. Nusxeya ku ji aliyê Şêx Cuneyd[200] ve hatiye nivîsandin, ji 15 wereq û 241 beytan pêk hatiye.[201] Menzûme weha dest pê dike.

Bizanin bira cumle hûn ehlê dîn
Ku tecwîda Qur'anê ferd e bi te'eyîn

Çi ku ew bi tecwîdê nazil bûye
Ji ba xaliqê min û meşhûr bûye

Ew e tecwîda wî tu hîmmet bikî
Huqûqê di herfan rî'ayet bikî

1.5.4.3. Helbestên wî

Ji bilî van berhemên mensûr û menzûm ku bi Erebî û Kurdî ne, Mela Xelîlê Sêrtî hinek helbest jî nivîsandine. Ji van helbestan şazdeh heb bi Erebî, çar heb jî bi Kurdiya Kurmancî

---

200 Şêx Cuneyd, di sala 1963yan de 52 salî li Zoqeydê wefat kiriye. Derheqê Şêx Cuneyd de bnr. Abdurrahman Adak, "Şeyh Cüneyd-i Zokaydî ve Mahtut Bir Şiir Mecmuası", *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, www.e-sarkiyat.com, j. 1, s. 2009, r.133-139.

201 Edip Çağmar, Molla Halîl el-İs'irdî'nin "Risaletun fî İlmi't-Tecvîd"i, *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, www.e-sarkiyat.com, j. II, s. 2009.

CamScanner ile tarandı

ne. Heta ku ev helbest di sala 2010an de ji aliyê me ve nehatin weşandin, helbestvaniya Mela Xelîlê Sêrtî nedihat zanîn.[202] Du heb ji van helbestan medhiye ne ku helbestvan di wan de medhê şêxê xwe Şêx Ehmedê Reşîdî kiriye, yek ji wan nesîhetnameyek e ku tê de derheqê nefsê de nesîhet kiriye û yek ji wan jî munacateke ku tê de gazî û daxwazî ji Xweda kiriye. Mela Xelîlê Sêrtî di van helbestên xwe de mexlesa "Şewqî" bi kar aniye. Li jêrê wekî nimûne em ji helbesteke wî cih didin beytên pêşî û dawiyê:

Beyta Pêşî:

B'xudanî xweş dibit cih pê bizane
Ku ev qewlek bi tesdîq û beyan e

Beyta Dawî:

Fidayê wî bibin ãed mislê Şewqî
Ji dor wî kêm nebin halî we zewqî

1.6. FEQE REŞÎDÊ HEKKARÎ

1.6.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Agahiyên derheqê Feqe Reşîdê Hekkarî de kêm in. Lê ji kunyeya wî tê fêmkirin ku ji herêma Hekkariyan e. Navê wî Reşîd e. Derheqê jidayîkbûn û koça wî ya dawiyê de agahiyên teqez nînin. Lê ji ber ku berhema xwe ya bi navê Sirru'l-Mehşerê di sala 1211/1796an de nivîsandiye, tê fêmkirin ku di sedsala XVIIIan de jiyaye.

Di helbestên xwe de mexlesa xwe wekî Feqî bikar aniye. Di literatura medreseyên Kurdan de ji xwendekarên medreseyan re Feqî dihate gotin. Dema Feqiyekî destûrname bistanda jê re dihate gotin Mela îcar ew feqiyên ku destûrname nedistandin,

202 Bnr. Abdurrahman Adak, "Mela Xelîlê Sêrtî: Helbestvanê bi Mexlesa "Şewqî" û Helbestên wî yên Kurmancî", *Mukaddime*, j. I, s. 2010.

CamScanner ile tarandı

navê Feqîtiyê li ser wan dewam dikir. Ji ber vê mirov dikare bêje ku Reşîdê Hekkarî li medreseyan xwendiye lê destûrname nesitendiye.

1.6.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Feqe Reşîdê Hekkarî berhemek bi navê Sirru'l-Mehşerê nivîsandiye. Ev berhem menzûmeyeke dînî ye. ji berhema wî derdikevê holê ku di bin bandora Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî de maye. Dibe ku ji ber vê bandora Feqiyê Teyran mexlesa Feqî hilbijartibe. Çawa ku Melayê Bateyî bi Mewlûdnameya xwe mumessilê edebiyata dînî ya Kurdî ye, Feqe Reşîd jî weke wî bi "Sirru'l-Mehşer"a xwe mumessilekî vê cureya edebiyatê ye.

1.7. BEKIR BEGÊ ERIZÎ

1.7.1. Jiyana wî

Bekir Beg li keleha Erizê ya li ser herêma Doskiyan hatiye dinyayê. Eriza ku îro li ser wilayeta Dihokê ye di dema mîrektiyan de li ser mîrnişîniya Amêdiyê bû. Bekir Beg pismamê mîrên Amêdiyê bû û malbata wî desthilatdarê keleha Erizê bûn. Navê bavê wî Behdûr e û mîr Behaedînê ku navê wî li mîrnişîniyê hatiye kirin bapîrê wî yê rêza heştan e. Jidayîkbûna Bekir Beg teqez nayê zanîn. Lê ji helbesteke wî ya ku di tarîxa 1170/1756an de nivîsandiye tê fêmkirin ku di wê demê de ew li heyatê bûye. Wate ew helbestvanê sedsala XVIIIan e. Bi qasî ku tê riwayetkirin wî ji sedsalî zêdetir temen kiriye. Qesîdeyeke wî heye ku di sala 1250/1834an de nivîsandiye. Hicûma mîrê Soran Mihemed Paşa ya li ser Erizê dîtiye û herweha rûxandina mîrnişiya Behdînan ji aliyê Osmaniyan ve jî dîtiye.

Digel ku Bekir Beg kurê mezin ê bavê xwe bû jî, piştî koça dawiyê ya bavê wî, ji bo ku birayê wî Ehmed Beg bibe mîr, wî xwe ji mîrîtiyê paşve kişandiye û karê ziraetê tercîhî mîrîtiyê kiriye. Bekir Beg di kar û hunerên destan de gelek jêhatî bûye û hinek amûrên malê û hinek silahên destan (wekî kerekî ji

CamScanner ile tarandı

daran û tifingê bi destê xwe çêkirine. Bekir Beg ji bilî van wextê xwe bi hûnandina helbestan bihûrandiye.

Eleqeya Bekir Begê Erizî bi helbestvanê herêma Amêdiyê Mela Mensûrê Girgaşî re jî çêbûye û di dawiya emrê Mela Mensûr de hevûdu dîtine.

Bekir Beg li Erizê wefat kiriye û li cem bavê xwe hatiye veşartin. Bekır Beg zewiciye û jê re bi navê îbrahîm kurek jî çêbûye.

1.7.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Di bin bandora Feqiyê Teyran de maye. Lewra bi terzekî sade helbestên gelêrî nivîsandine. Hetta di hin helbestên xwe de li pey terzê Feqiyê ku mexlesa "Mîm û Hê" emilandibû, wî jî mexlesa "Bê û Kafê" emilandiye. Çawa ku Feqî her du herfên pêşî yên navê xwe Mihemed kiriye mexles, wî jî her du herfên pêşî yên navê xwe Bekir kiriye mexles. Di helbesteke xwe de bi Kurdîtî, Şafi'îtî û Erizîbûna xwe iftîxar kiriye. Ji helbestên Bekir Begê Erizî heta niha 12 heb hatine komkirin. Ev helbestên wî cara pêşî ji aliyê Ebdulkerîm Findî ve di sala 1982an de bi navê"Dîwana Bekir Begê Erizî" li Bexdayê hatiye çapkirin. piştre Mihemed Emîn Doskî, di xebata xwe ya bi navê "Eriz û Bekir Begê Erizî" de li ser Bekir Beg û van helbestên wî rawestiyaye. (Spîrêz 2002)

1.8. MIHEMED TEYAR PAŞAYÊ AMÊDIYÊ

1.8.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Mihemed Teyar Paşayê Amêdiyê, mîrê mîrnişîniya Amêdiyê bû. Bavê wî îsmaîl Paşa bû. Dema bavê wî di sala 1213/1798an de wefat kirî, ew bi temenê şazdehan bû. Piştî koça dawiyê ya bavê wî welatê Behdînan di nav birayan de hat parvekirin û mihemed Teyar Paşa li Akreyê demekê desthilatdarî kir. Di sala 1232/1816an de eşîrên devera Behdînanê mîrê Amêdiyê Zubeyr Beg ji mîrîtiyê xistin û Teyar Paşa xistin şûna wî. Piştî

CamScanner ile tarandı

ku Teyar Paşa salekê li wir desthilatdarî kir, Zubeyr Paşa Dîsa desthilatdarî ji wî sitand û ew kire zindanê. Di sala 1233/1817an de wefat kir.

Piştî wî kurê wî îsmaîl Paşa bû hakimê Amêdiyê. Di sala 1252an de hêzên Osmaniyan dawî li desthilatdariya Amêdiyê anîn û İsmaîl Paşa jî çû Bexdayê. Di sala 1267an de li wir wefat kir.

1.8.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Mihemed Teyar Paşa edîbekî jêhatî bû. Bi Kurdî û Farisî helbest hûnandine. Mihemed Teyar Paşa di hunera xetê de gelekî pêşketî bû. Berî koça xwe ya dawiyê bi du salan (1231) dîwana Melayê Cizîrî istinsax kiriye û di hamişên wê de hinek helbestên xwe û texmîsên xwe yên li ser helbestên melê nivîsandiye. Di van helbestên xwe de mexlesa Xerîb/Xerîbî emilandiye. [203]

1.9. ŞÊX EHMEDÊ FEQÎR

1.9.1. Zanyariyên Nasnameya wî

Şêx Ehmedê Feqîr, yek ji wan edîbên Kurd ên serdema mîrektiyan e ku heta niha ne navê wî, ne jî dîwana wî, ji aliyê lêkolînerên edebiyata Kurdî ve nehatiye bihîstin. Ew, helbestvanekî klasîk ê herêma Botan e û di serdema dawî ya mîrnişiya Botan de jiyaye.

Navê helbestvanê me Ehmed e. Wî navê xwe Ehmed, di helbestên xwe de jî wekî mexles bi kar aniye. Peyvên şêx û feqîr jî aliyê wî yê tesewifî nîşan didin.

Li gorî agahiyên ku Şêx Ehmedê Feqîr, di qeyda feraxê ya dîwana xwe de, bi zimanê erebî, dide, navê wî Ehmed e û navê bavê wî Şêx Şeref e. Şêx Şeref jî kurê Şêx Nasir, ew jî kurê Şêx Ebdulahê Şawirî ye. Bapîrê wî yê sêyem Şêx Ebdulahê Şawirî,

203 Selefî û Doskî, *Mu'cem*, r. 185-187.

CamScanner ile tarandı

di nav gel de weki Şêx Evdal tê naskirin. Gora Şêx Evdal, li gundê Şawira ye ku li ser qezaya Dihê/Eruhê ye. Li gorî agahiyên li ser kêla wî, wî di sala 1113/1701ê de koçî dawiyê kiriye.

Bavê Şêx Ehmedê Feqîr Şêx Şeref, nêzî Şawira gundekî dî ava kiriye ku piştre navê wî gundî bûye Gundşêx. Bi vî awayekî şaxek ji malbata Şêx Evdal li vî gundî bi cih bûne. Şaxa dî jî li gundê Şawira mane ku ji wê şaxê Şêx Ebdurehmanê Şawirî (k.d.1974) alim û mutesewifekî girîng e. Şêx Ebdurehman, kurê Şêx Mihyedîn e, ew jî kurê Mela Hesen e, ew jî kurê Şêx Evdal e.

Pêwist e bê gotin ku qezaya Eruhê ku hem Şawira, hem jî Gundşêx bi wê ve girêdayî ne, herçiqas di dabeşkirina îdarî de li ser wilayeta Sêrtê jî be, ji aliyê dîrokî ve, heta bi tixûbê Sêrtê, li ser herêma Botan tê hesibandin.

Şêx Ehmedê Feqîr, li Gundşêxê hatiye dinyayê. Herçiqas em derheqê jidayîkbûn û koça wî ya dawiyê de ne xwedî agahî bin jî, ji hinek qeydên li ser berhemên wî tê fêmkirin ku ew helbestvanekî dawiya sedsala XVIIIem û destpêka sedsala XIXem e. Li gorî agahiyên ku helbestvan, di qeyda feraxê ya dîwana xwe de dide, wî dîwana xwe di meha Rebîulaxirê, roja duşemê, sala 1237an de nivîsandiye ku ev tarîx bi mîladî beramberî meha dawî ya sala 1821ê û meha pêşî ya sala 1822yan tê. Di sala 1245/1829an de ji Neqîbuleşrafê Bexdayê nameyek gihîştiye destê wî. Di sala 1247/1832yan de bi xetê destê xwe, berhema xwe ya bi navê "Kîtabu Zuhreti'r-Riyad" nivîsandiye. Ji vê jî tê fêmkirin ku ew heta bi sala 1832yan li heyatê ye. Herçiqas tarîxa koça wî ya dawiyê nayê zanîn jî, wî li Gundşêxê koçî dawiyê kiriye û li wir hatiye veşartin. Gora wî îro naskirî ye.

Du kurên Şêx Ehmedê Feqîr hene. Yek ji wan Şêx Îbrahîm e ku piştî bavê xwe bûye postnişînê terîqetê. Şêx Îbrahîm jî helbestvan e û ji dehan zêdetir helbestên wî yên Kurdî û Erebî di dawiya dîwana bavê wî de hatine nivîsandin. Kurê dî jî Şêx Omer e.

Şêx Ehmedê Feqîr, ji bo ku îcazeya terîqeta Qadirîtiyê bisitîne, di sala 1226/1811an de çûye Bexdayê. Ji ber ku şêxê wî

CamScanner ile tarandı

li Bexdayê bûye, îhtîmal heye ku di jiyana xwe ji carekê zêdetir çûnûhatina Bexdayê kiribe.

1.9.2. Aliyê wî yê Zanistî û Tesewifî

Şêx Ehmedê Feqîr, bi zimanê Erebî çendîn berhemên zanistî jî nivîsandine ku li jêrê behsa wan hatiye kirin:

1. Mîzanu'l-Ewqat: Ev berhem derheqê jimaryarî û teqwîma salê de ye û di sala 1245/1829an de hatiye nivîsandin.

2. Kitabu'l-Xuteb: Ev berhem ji metnên xutbeyên roja înê pêk tê.

3. Nezmu'ş-Şemail fî Menaqibî Seyyidi'l-Ewaxir we'l-Ewail: Ev berhem derhqê şemaila Cenabê Pêxember de ye û di sala 1224/1809an de hatiye nivîsandin.

4. Nezmu'l-Meknûn el-Mu'teber fî Hukmi Ayati'l-Qur'ani we's-Suwer: Ev berhem derheqê zanista tefsîra Qur'ana Pîroz de ye û di sala 1240/1825an de hatiye nivîsandin.

5. Menzûmetun fî Erkani'n-Nikah we Şurûtih: Ev berhem derheqê nîkahê de ye û di sala 1242/1826an de hatiye nivîsandin.

Ji van berheman tê fêmkirin ku Şêx Ehmedê Feqîr, pisporekî girîng ê zanistên Îslamî e. Ev jî nîşan dide ku ew nûnerekî girîng ê medreseyên serdema xwe ye. Aşîkar e ku wî, di medreseyan de hem xwendiye, hem jî dersdarî kiriye. Ev yek ji agahiyên ku di qeyda feraxê ya dîwana wî de cih digirin jî tê fêmkirin. Li gorî wan agahiyan ew, ji aliyê eqîdeyê ve ji mezhebê Eş'erî û ji aliyê fiqhê ve jî ji mezhebê Şafi'î ye. Xwenisbetkirina bi bal Eş'erîtî û Şafi'îtiyê ve, taybetiyeke nûnerên medreseyên Kurdistanê yên serdema klasîk e.

Şêx Ehmedê Feqîr, digel aliyê xwe yê zanistî, herweha kesekî mutesewif e jî. Ji agahiyên qeyda feraxê ya dîwanê tê fêmkirin ku terîqeta wî şaxeke Qadirîtiyê ye ku navê wê "Bedriye" ye. Wî di sala 1226/1811an de li Bexdayê ji Şêx Ebdulahê Bexdadî 'Îdrûsî îcazeya xwe ya Qadirîtiyê stendiye. Herweha

CamScanner ile tarandı

wî wekî têgeheke tesewifî navê "feqîr" li xwe kiriye û bi şêweya tesewifî gelek helbest nivîsandine.

1.9.3. Aliyê wî yê Edebî

Şêx Ehmedê Feqîr, bi awayekî giştî, di tarîxa edebiyata Kurdî de, wekî helbestvanekî gelekî girîng derdikeve pêş. Ew hem yek ji helbestvanên girîng ê sedsala XVIII-XIXan e, hem jî digel Melayê Cizîrî yek ji du helbestvanên herî girîng ê herêma Botan e. Bi Şêx Ehmedê Feqîr hat fêmkirin ku li herêma Botan piştî Melayê Cizîrî jî edîbên girîng derketine û îmaja herêma Botan a heyî ne bê bingeh e. Bi taybetî jî divê li ser devera Eruhê bal bê kişandin ku ew dever navendeke ilmî û edebî ya girîng e ku kesên wekî Şêx Ehmedê Feqîr jî mehsûlên wê ne.

Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr, dîwaneke muretteb e. Ew ji kêm helbestvanan e ku helbestên xwe li gorî tevahiya herfên hêceyê rêz kirine. Bi qasî ku tê zanîn, di nav dîwanên Kurdî de, dîwana wî yekemîn dîwan e ku nusxeya wê ya eslî ya ku bi xetê helbestvan bi xwe hatiye nivîsandin gihîştiye roja me. Orjînala vê nusxeyê niha li Gundşêxê di destê malbatê de ye. Nusxeyeke fotokopî ya vê dîwanê di destê me de jî heye. Dîwan, li Dihokê ji aliyê Tehsîn Î. Doskî û Xalid Sadînî ve bi herfên Erebî ji bo çapê hatiye amadekirin.

Şêx Ehmedê Feqîr, ji helbestvanên herî girîng ên edebiyata Kurdiya Kurmancî ên wekî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Eliyê Herîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Macin û Sewadî sûd wergirtiye. Lewra di dawiya dîwana xwe de, cih daye helbestên wan ên ku ecibandine. Wî her weha ji helbestvanên Ereb, Faris û Tirk jî sûd wergirtiye û di dawiya dîwana xwe de cih daye helbestên wan jî. Bi kurtî wî ne ji mîrasa edebiyata Kurdî tenê, ji mîrasa her çar edebiyatên rojhilatê sûd wergirtiye. Loma jî hem çavkaniya wî ya edebî, hem jî şiyana wî ya edebî gelekî bi hêz e. Dikare bê gotin ku di tarîxa edebiyata Kurdiya Kurmancî de, ji aliyê hecma dîwanê, dewlemendiya zimanan û firehiya

CamScanner ile tarandı

mijaran ve, piştî Melayê Cizîrî, yek ji helbestvanên herî giring Şêx Ehmedê Feqîr e.

Şêx Ehmedê Feqîr, ji aliyê edebî ve helbestvanekî gelekî serkeftî ye. Bi Kurdî, Erebî û Farisî helbest nivîsandine. Zimanê wî herikbar e, di erûzê de kêrhatî ye, di vegotinê de xwedî huner e. Helbestvan di helbestên xwe de mexlesa "Ehmed" bi kar aniye. Li jêrê wekî nimûne, ji xezeleke wî beytên metla û mexlesê cih digirin:

Ez çûme baxê dilberê
Min jê çinîne gul bi dest
Bala ji qedda xawerê
Ez bûm ji bêhna wê ku mest

Ehmed *tu hişyar be gelek*
Şi'rek dirêj bêxe helek
Nexme bide ta heft felek
Bête seda şubhê cerest

Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr ji aliyê hecmê ve gelekî mezin e. Nusxeya dîwanê ya ku bi destê wî hatiye nivîsandin, li ser du beşan dikare bê dabeşkirin. Di beşa yekem de helbestên wî yên li gorî rêza herfên hêceyê cih digirin. Helbestên wî yên di vê beşê de zêdetir xezel û qesîde ne û ji bilî sê hebên Farisî hemû bi Kurdiya Kurmancî ne. Jimara wan ji sed û pêncî hebî derbas dibe.

Şêx Ehmedê Feqîr, piştî ku di dîwana xwe de, li gorî herfên hêceyê helbestên xwe xilas kirine, dest bi beşa duyem kiriye. Di vê beşê de hem cih daye helbestên xwe yên Kurdî yên derveyî xezel û qesîdeyan, hem cih daye helbestên xwe yê Erebî, hem jî cih daye helbestên curbicur ên helbestvanên serdema xwe, yan jî yên berî xwe.

Ji helbestên wî yên Kurdî yên ku di vê beşê de cih digirin pênc heb, texmîs in. Ji wan texmîsan çar heb li ser xezelên Me-

CamScanner ile tarandı

layê Cizîrî nivîsandine û yek jî li ser xezeleke Mun'imî nivîsandiye. Di vê beşê de dîsa bi Kurmancî du munacat, menzûmeyeke eqaidê, meznûmeyeke şemaila Cenabê Pêxember, medhiye û qesîdeyên derheqê Ebûbekirê Siddîq, Omer, Osman, Elî, Hesen û Huseyn, Hemze û Ebbas, îmamên çar mezheban, Ebdulqadirê Geylanî û şêxê wî Şêx Ebdulahê Bexdadî de jî cih digirin.

Helbestên wî yên Erebî yên ku di vê beşê de cih digirin, bi giştî li ser du cureyan dikarin bên dabeşkirin: 1. Munacat û îstixfara ji Xuda (texmîsek li ser munacata Rabî'etu'l-Edewiyye jî nivîsandiye). 2. Medhiyeyên derheqê hin kesan de (wekî Cenabê Pêxember, Îmamê Omer, Şêx Evdulqadirê Geylanî, şêxê wî Şêx Ebdulahê Bexdadî 'Îdrûsî û bapîrê wî Şêx Ebdullahê Şawirî).

Helbestvanên Kurmanc ên ku di vê beşê de cih daye helbestên wan ev in: Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Eliyê Herîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Macin, Sewadî, Ze'îfî, Mun'imî Seyîd Yasînê Cizîrî û Şêx Eliyê Fiskinî. Heta niha ji van helbestvanan navên Ze'îfî, Mun'imî Seyîd Yasînê Cizîrî û Şêx Eliyê Fiskinî nehatibû bihîstin.

Şêx Ehmedê Feqîr, di vê beşê de cih daye helbestên hin kesên navdar ên wekî Îmamê Elî (bi Erebî), Se'diyê Şîrazî, Şemsê Tebrîzî (bi Farisî) û Nesîmî (bi Tirkî). Herweha di vê beşê de helbestên erebî yên ku ji aliyê malbata Îsmaîl Feqîrullehê Tiloyî û hin kesên dî yên herêma Sêrtê ve hatine nivîsandin jî hene.

Çawa ku tê dîtin, di vê beşê de jimara helbestên ku ji aliyê helbestvanên dî ve hatine nivîsandin, ewqas zêde ye ku ev beş, wekî cureyeke mecmû'eyekê dikare bê hesibandin.[204]

204 Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr, *Nusxeya Fotokopî*, Pirtûkxaneya Taybet a A. Adak; Tehsîn Î. Doskî û Xalid Sadînî, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*, (Berhema Neçapkirî), r. 5-14.

CamScanner ile tarandı

2. DI SEDSALA NOZDEHEM DE PEXŞANA KURDÎ

2.1. MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ

2.1.1. Jiyana wî

Mela Mehmûdê Bazîdî di sala 1799an de li Bazîdê hatiye dinyayê. Pişti ku li Bazidê û Tebrîzê xwendina xwe xilas kiriye, pêşî li Bazîdê piştre li Erziromê melatî kiriye. Mela Mehmûd di sala 1867an de koçî dawiyê kiriye.

Mela Mehmûd dema li Erziromê mela bûye, konsolosê Rûsyayê yê Erziromê Alexandere Jaba (1803-1894) ku ji aliyê Akademiya Rûsistanê ve ji bo berhevkirina berhemên Kurdî û şandina wan bo Petersbûrgê hatibû wezîfedarkirin nas kiriye. Di navbera salên 1856-1867an de 11 salan bi hev re xebitîne. Alexsander Jaba derheqê Mela Mehmûd de weha dibêje:

"Wî ziman û edebiyata Farisî, Erebî û Tirkî jî xwendiye û van zimanan baş dizane... ew di nav hevalên xwe de ji hemûyan zanatir bû... di nav rewşenbîrên welat de jî gelek bi nav û deng û biqedir bû. Piştî sala 1856an Mela Efendî bû seydayê min û di derbareyê dîrok, ziman û kultura milletê Kurd de alîkariya min kir. Ew karê ji min re hatibû sipartin, yanî hînbûna zimanê Kurdî û berhevkirina materyalên bi zimanê Kurdî, min bi saya rewşenbîrê Kurd, Mela Mehmûdê Bazîdî ew dan hev. Piştre min ew destnivîs ji Akademiya Zanistî ya Petersbûrgê re şandin"[205]

2.1.2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Mela Mahmûdê Bazîdî yekem kes e ku ji bilî mijarên gramera Erebî, derheqê folklor, dîrok, edebiyat, etnografyayê de berhemên pexşan nivîsandine û berhev kirine. Derheqê pexşannivîsî û çîroknivîsiya wî de ji aliyê Ferhad Pirbal ve bi navê "Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867) Yekemîn Çîroknûs û

205 Bazîdî, Camî'eya *Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*, r.12.

CamScanner ile tarandı

Pexşannûsî Kurd" xebateke hêja hatiye kirin û ev xebat di nav weşanxaneya Arasê de li Hewlêrê hatiye çapkirin (sal: 2000).

2.1.3. Berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî

Berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî yên pexşan ev in:[206]

2.1.3.1. Tewarîxê Cedîdê Kurdistan

Ev berhem negihîştiye roja me.

2.1.3.2. Adat û Rusumatnameyê Tewayîfê Ekradiye

Ev berhem bi taybetî derheqê adetên koçerên Kurdan de ye. Berhem ji aliyê M. B. Rudenko ve di sala 1963an de li Moskowayê bi rûsî hatiye weşandin. Şikriye Resûl jî, ji rûsî wergerandiye Kurdiya Soranî û di sala 1982an de li Bexdayê çap kiriye. Di sala 1998an de li Stenbolê ji weşanxaneya Periyê wergera berhemê ya Tirkî çap kir. Jan Dost, di sala 2010an de Kurdiya wê ji weşanxaneya Nûbiharê derxist.

2.1.3.3. Cami'iyê Risaleyan û Hikayetan

Ev berhem du beş in. Beşa yekem ji van rîsaleyan pêk tê:

- Be'zê 'Eşair û Qebaîl û Taîfeyêd Kurdîstanê.
- Navên Mêr û Jinên Kurmancan.
- Şa'ir û Musennefên di Kurdistanê.
- Muqeddîma Îlmê Serfê û Be'zê Usûlê Lazîmeyê Te'lîmeyê bi Zimanê Kurdiya Kurmancî.

Beşa duyem jî, ji çil hîkayetên Kurdiya Kurmancî pêk tê.

Berhem di sala 1860an de li Petersbûrgê bi navê "Recueil de Notices et Recits Kourdes" hatiye çapkirin. piştre bi navê "Çîrokên Kurmancî" ji aliyê Weşana Çanda Nûjen, ve li Stocholmê hat çapkirin (2000).

---

206 Derheqê berhemên pexşan ên Mela Mehmûdê Bazîdî de ji bo agahiyên berfirehtir bnr. Ferhad Pîrbal, *Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, Aras, Hewlêr 2000.

CamScanner ile tarandı

2.1.3.4. Wergera "Şerefname"yê

Mela Mehmûdê Bazîdî, yekem kes e ku cildê pêşî ya Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî ji Farisî wergerandiye zimanê Kurdî. Berhem ji aliyê Seîd Dêreşî ve bi navê "Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî" di nav weşanxaneya Spîrêzê de li Dihokê hat çapkirin (2007).

2.1.3.5. Deqên Pexşan yên Mesnewiyên Klasîk

Mela Mehmûd gelek mesnewiyên evînî yên klasîk bi terzê çîrokan û pexşan ji nû ve nivîsandine. Hinek ji van mesnewiyên ku Bazîdî derbasî pexşanên kirine ev in:

- Mem û Zîn : Ehmedê Xanî
- Yusif û Zeliyxa : Selîmê Silêman
- Leyla û Mecnûn : Harisê Bedlîsî
- Şêxê Sen'an : Feqiyê Teyran
- Bersîsê Abid : Feqiyê Teyran
- Qewlê Hespê Reş : Feqiyê Teyran

Derheqê pexşannivîsî û çîroknivîsiya Mela Mehmûdê Bazîdî de Ferhad Pirbal, bi navê "Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd" lêkolîneke girîng kiriye. Aras, Hewlêr 2000.

2.1.3.6. Ferheng

Bazîdî du ferheng nivîsandine.

- Ferhenga Kurdî-Frensizî
- Ferhenga Kurdî ya Diyalekta Hekkarî-Rewendî

2.2. ŞERHA "CAMÊ WEHDET"

Şerha "Camê Wehdet", berhemeke pexşan e ku bi Kurdiya Kurmancî hatiye nivîsandin. Berhem, şerha menzûmeyeke bi

CamScanner ile tarandı

navê "Camê Wehdet" e. "Camê Wehdet" bi farisî ye, lê şerha wê bi Kurdiya Kurmancî ye. Nivîskarê "Camê Wehdet", kesekî bi navê Şêx Ewheduddîn e, lê nivîskarê şerha wê ya bi Kurdî nayê zanîn.

Berhem di serdema mîrnişîniya Behdînan de li medreseya Qubehanê ya Amêdiyê hatiye nivîsandin û di nav berhemên ku ji medreseya Qubehanê birine Bexdayê de, ji aliyê Mihemed Elî Qeredaxî ve hatiye dîtin. Tehsîn Îbrahîm Doskî jî ev berhem di sala 2014an de bi navê "Şerha Mesnewiya Camê Wehdet" ji bo çapê amade kiriye.

Li gorî ku ji kaxeza berhemê tê fêmkirin, berhem, bi awayekî texmînî, di sedsala XIXem de hatiye nivîsandin.

Şerha "Camê Wehdet", bi devoka Hekkarî/Behdînî hatiye nivîsandin. Nivîskar wekî rêbaz, pêşî parçe parçe Kurdiya peyv û terkîbên Farisî dide, piştre, wergera giştî dike û carinan jî hinek şîroveyan lê zêde dike. Şîroveyên wî ne zêde ne. Loma jî berhem divê wergereke tam û şerheke kurt bê hesibandin. Lê digel vê jî girîng wê gelek e. Lewra ji aliyê wergera menzûmeyekê bi bal Kurdî û şerhkirina wê ve, di nav pexşana Kurdî ya klasîk de wekî nimûneya pêşî dikare bê qebûlkirin.

Şerha Beyta Yekem:

(*Ey sezawarî perestiş zatê Heq*) Ey ê laiqê perestinê zatê Xudê ye. Me'na: Zatê Xudê laiqê 'ibadetê perestinê ye. (*Zatê Heq ra*) Zatê Xudê (*kes nedaned*) kes nizanit (*xeyrê Heq*) xeyrê Xudê. Me'na: Xudê xo xo tinasit, kes dî nanasit.

Mijara menzûmeyê, di çarçoveya mezhebê Eş'erîtiyê de eqîdeya dînê Îslamê ye. Lê nivîskar hizrên xwe yên tesewifî jî gotine.[207]

---

207 Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Şerha Mesnewiya Camê Wehdet*, Dihok, (Berhem, li ber çapê ye) r. 6-15.

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA ÇAREM
EDEBIYATA KURDIYA SORANÎ



I. DESTPÊKA EDEBIYATA KURDIYA SORANÎ

Edebiyata Kurdiya Soranî piştî edebiyatên Kurdiya Lorî, Kurdiya Goranî û Kurdiya Kurmancî di serdema dawî ya tarîxa edebiyata Kurdî de derketiye meydanê. Herçiqas hebûna nimûneyên kevintir teqez jî be, bi awayekî berbiçav sedsala XIXan ji bo vê edebiyatê wekî maweya destpêkê tê qebûlkirin. Dîsa herçiqas edebiyata Kurdiya Soranî ji yên Kurdiya Lorî, Kurdiya Goranî û Kurdiya Kurmancî derengtir derketibe meydanê jî, ev edebiyat îro ji bo Kurdan digel Kurdiya Kurmancî wekî du diyalektên edebî yên herî girîng derketine pêş. Hetta ji ber ku di nav hemû diyalektên Kurdî de yegane diyalekta ku bi awayekî fermî bûye zimanê perwerdeyê Kurdiya Soranî ye, bi taybetî di çarçoveya edebiyata nûjen de, diyalekta ku ji hemûyan zêdetir pêşketiye, edebiyata Kurdiya Soranî ye.

Ji ber ku di vê pirtûkê de mijara me bi edebiyata Kurdiya Soranî ya klasîk û heta bi dawiya serdema mîrektiyan sînorkirî ye, em dê di vê binbeşê de di çarçoveya van sînoran de li ser edebiyata Kurdiya Soranî rawestin. Ji ber wê em dê li vir tenê li ser wan helbestvanên ku heta bi dawiya mîrektiyan, yan jî heta bi dawiya sedsala XIXan bi şêwêyê klasîk berhem dane agahiyan bidin.

Cihê derketina edebiyata Kurdiya Soranî li Kurdistana Başûr bajarê Silêmaniyê û derdora wî bajarî ye. Ji nûnerên pêşî yên edebiyata Kurdiya Soranî Nalî, Salim, Kurdî û Xerîq ji Silêmaniyê, Hacî Qadir ji Koyê û Şêx Riza Talebanî jî ji Kerkûkê derketine ku ev bajar hemû heman deverê nîşan didin.

Di sala 1784an de Îbrahîm Paşayê mîrê mîrnişîniya Baban (mîrnişîniya Baban: 1649-1850), bajarê Silêmaniyê ava kiriye û navê bavê xwe Silêman li vî bajarî kiriye. Piştî avakirina

CamScanner ile tarandı

Silêmaniyê, birêvebiriya mîrnişiniyê derbasî wir bûye û ev bajar bûye paytexta mîrnişîniya Baban. Mîrnişiya Baban hêzên Osmaniyan têk birine û desthilatdariya xwe bi hêz kirine. Li aliyekî dî ji ber ku di heman demê de li Kurdistana Rojhilat mîrnişiniya Erdelanê ku bi erdê Baban re hemtixûb bû, demên xwe yên dawî dijiya (û di sala 1867an de bi tevahî ji holê rabû), valahiya desthilatdariyê ji aliyê mîrnişiya Baban ve hat tijîkirin û hêza siyasî bi tevahî kete destê Baban. Di encamê de paralelî vê hêza siyasî, li wê derê edebiyata Kurdiya Soranî dest pê kir, pêş ve çû û helbestvanên pêşî yên Kurdiya Soranî ji Silêmaniyê û derdora wê derketin ku ew jî ev in:

1. Nalî (1791-1855)
2. Salim (1805-1869)
3. Kurdî (1812-1850)

Ji helbestvanên Kurdiya Soranî, yên ku di serdema mîrnişîniya Baban de herî zêde temen bûrandine ev her sê helbestvan in. Ev her sê helbestvan wekî damezirênerên helbesta Kurdiya Soranî jî tên hesibandin. Lewma em dê di vê binbeşê de tenê behsa van her sêyan bikin. Bêguman helbestvanên dî jî yên ku gihîştine serdema mîrektiyan hene. Lê dema em li wan helbestvanan dinêrin, em dibînin ku wan tenê ciwaniya xwe di serdema mîrnişiyê de derbas kirine, lê piraniya temenê xwe piştî mîrnişîniyê bûrandine û hingî kemilîne. Ji ber vê yekê jî em van helbestvanan di çarçoveya helbestvanên serdema mîrnişiyê de nahesibînin ku ew jî ev in:

1. Hacî Qadirê Koyî (1815-1897)
2. Wefayî (1838-1902)
3. Xerîq (1851-1907)
4. Şêx Riza Talebanî (1842-1910)
5. Edeb Ebdila Mîsbah (1852-1912)

Herçiqas piraniya van helbestvanan di serdema mîrnişîniya Baban de derketibin jî, lê dîsa piştî wan di kategoriya hel-

CamScanner ile tarandı

bestvanên pêşî de ji Kurdistana Rojhilatê jî du helbestvan balê dikişînin ser xwe. Ew jî Wefayî (Mehabad) û Edeb (Mukriyan) in. Lê di vê beşê de em behsa wan nakin.

II. DAMEZIRÊNERÊN HELBESTA SORANÎ

A. NALÎ

1. Zanyariyên Nasnameya wî

Navê helbestvanê me Mela Xidir, navê bavê wî Ehmed Şaweys e. "Nalî" mexlesa wî ya helbestê ye û li gorî nêrîneke berbieqil tê wateya wî kesê ku ji êş û elemê dinale. Nalî di sala 1800î de li Kurdistana Başûr li gundekî nêzî Silêmaniyê bi navê Xakuxolê hatiye dinyayê. Li Qeredaxê dest bi perwedeyê kiriye û li Silêmaniyê li cem Mela Ebdulayê Reş perwerdeya xwe xilas kiriye û ji wî îcazet stendiye. Li wê derê bi tekyaya Mewlana Xalid re eleqeya wî çêbûye. Nalî piştî ku dawî li mîrnişîniya Baban tê di sala 1850î de ji Silêmaniyê derketiye û di riya Mûsil, Şam û Qudsê çûye Hecê, piştre çûye Şamê û li wê derê du-sê salan maye, piştre çûye Stenbolê û li wir jî bi kesayetên edebî re têkilî daniye. Nalî di sala 1856 an de li Stenbolê koçî dawiyê kiriye.[208]

2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Nalî, herçiqas ji aliyê kronolojiyê ve piştî Kurdî helbest nivîsandibin jî, ew di tarîxa edebiyata Kurdiya Soranî de yekem helbestvanê xwedî dîwan û yekem helbestvanê mezin e. Binaxeya edebiyata Kurdiya Soranî ya klasîk ji aliyê Nalî ve hatiye avêtin. Dikare bê gotin ku di edebiyata Kurdiya Kurmancî de cihê Melayê Cizîrî çi be, di edebiyata Kurdiya Soranî de jî cihê Nalî ew e.

---

208 Xeznedar, b.n., b. III, r. 61-67.

CamScanner ile tarandı

Ji ber girîngiya Nalî derheqê wî de lîteratureke gelekî dewlemend çêbûye û gelek Kurdologan jî di berhemên xwe de behsa wî kirine.

Dîwana Nalî, berî ku bê çapkirin di nav edebiyathezan de gelekî belav bûye. Lewra gelek nusxeyên wê yên destxet hene. Diwan gelek caran jî hatiye çapkirin. Cara pêşî di sala 1931ê de li Bexdayê, piştre di sala 1948an de li Senendecê, di sala 1962 û 1974an de li Hewlêrê, di sala 1967an de li Mehabadê û di sala 1976an de li Bexdayê hatiye çapkirin. Ev çapa Bexdayê ku ji aliyê Mela Ebdulkerîm Muderis û Fatih Ebdulkerîm ve hatiye amadekirin, ji ber ku vekolîn jî tê de heye,çapa herî baş e.

Di dîwana Nalî de bi teşeyên xezel, qesîde, mustezad û ferd (mufred)an bi qasî 120 heb helbest cih digirin. Ji ber ku bikaranîna teşeya xezela mustezad di edebiyata Kurdî de kêm e, bikaranîna Nalî ya vê teşeyê girîng e. Di dîwana Nalî de mustezadek heye ku weha dest pê dike:

Ey taze ciwan pîr im uftadew we kewtim
Ta mawe heyatim
Destê bidere destî şikestem ke le des çûm
Qurbanî wefatim

Nalî di helbestên xwe de li ser mijarên curbicur ên wekî niştimanperwerî, civak, evîndarî, tebî'et, şanazî (fexr) û dîn rawestiyaye.

Niştimanperweriya Nali li gorî şert û mercên serdema xwe di çarçoveya nivîsandina bi zimanê Kurdî û bêrîkirina welêt de ye. Dema Nalî li Şamê bûye ji ber ku zêde bêriya welatê xwe kiriye nameyeke menzûm şandiye Silêmaniyê da rewşa wê têbigihe. Dema Salim ev nameya Nalî xwendiye, wî jî bi nezmê bersiva wî daye û gotiye venegere Silêmaniyê. Ev helbesta wî ya dirêj û navdar weha dest pê dike û diqede:

Qurbanî tozî rêgetim ey badî xoş mirûr
Wey peykî şareza be hemû şarî Şarezûr

CamScanner ile tarandı

Halî bike be xufyeke ey yarî sengdil
***Nalî** le şewqî to ye denêrî selamî dûr*

Nalî, di van beytên jêrîn de bi helbesta xwe şanaziyê dike:

Faris û Kurd û Ereb her sêm be defter girtuwe
***Nalî** emro hakimî sê mulke dîwanî heye*

Bulbulî teb'im ewa dîsan senaxwanî deka
Nukte sencî we bezge koyî we gewher efşanî deka

Nalî, di helbestên xwe yên dînî de li ser ne'tê (pesnê) pêxember rawestiyaye ku li jêrê em cih didin beytên pêşî û dawiyê yên ne'teke wî:[209]

Ey sakinî riyazî Medîney Munewwere
Lutfê bike bifermo "Medîney minew were

*Rojî ceza rica bike bo **Nali**yê derbeder*
Çunke le rûy cîhan gunahî gelê zor û ekser e

B. SALIM

1. Zanyariyên Nasnameya wî

Navê helbestvanê me Ebdurehman Begê kurê Mihemed Begê Qerecehenemî ye. Salim mexlesa wî ya helbestê ye. Salim ji eşîra Sahibqiran ne. Dema bajarê Silêmaniyê hatiye avakirin, ev malbat li bajêr bi cih bûye. Salim, di sala 1805an de li Silêmaniyê hatiye dinyayê. Salim ji bo xwendinê çûye medreseyê, lê xwendina xwe xilas nekiriye. Ji ber ku kesekî nexweş û lawaz bûye di destpêkê de mexlesa xwe kiriye "Bîmar", lê piştre mexlesa xwe kiriye "Salim". Di helbestên xwe de mexlesa "Rencûr" jî bi kar aniye.

209 Ji bo dîwan û helbesta Nalî bnr. Xeznedar, b.n., b. III, r. 67-152.

CamScanner ile tarandı

Piraniya jiyana wî di serdema mîrnişîniya Baban de derbas bûye. Ji ber ku piştî dagirkirina Silêmaniyê ji aliyê Osmaniyan ve û dawîlêhatina mîrnişîniya Baban, li Silêmaniyê aramî nemaye, ew gelek caran çûye Îranê û li wir maye. Derûniya wî xirabûye. Demekê li bajarê Ereban Hilleyê maye. Piştre vegeriyaye Silêmaniyê û di sala 1869an de li Silêmaniyê koçî dawiyê kiriye.[210]

2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Eger Nalî di avakirina helbesta klasîk a Kurdiya Soranî de di pileya yekem de be, Salim jî di pileya duyem de ye. Di çarçoveya Kurdiya Soranî de Nalî weki mamosteyekî edebiyata klasîk e, Salim jî weki xwendekarê yekem ê wî mamosteyî ye.

Helbestên Salim ji aliyê teşeyê ve ji qesîde û xezelan pêk tên. Qewareya helbestên wî, ji yên her du helbestvanên dî yên destpêka edebiyata Kurdiya Soranî zêdetir e. Di dîwana wî de bi qasî 200 helbestî hene. Lê digel vê jî gelek helbestên wî heta niha di destxetan de mane û neketina nav dîwana wî.

Heta niha dîwana Salim du caran; di sala 1933yan de li Bexdayê û di sala 1972yan de jî li Hewlêrê hatiye çapkirin .

Di dîwana wî de bi qasî deh helbestên bi şêweya mulemmayê hene ku misrayên yekem ên van helbestan bi Kurdiya Soranî û misrayên duyem jî bi Farisî ne. Mulemmayên bi Kurdî-Erebî, yan jî bi Kurdî-Tirkî nînin.

Di dîwana Salim de du heb pêncxiştekî (texmîs) jî hene. Yek ji wan li ser xezeleke Nalî, ya dî jî li se xezeleke Farisî ye.

Ji aliyê naverokê ve di helbesta Salim de bi piranî mijarên wekî tebîet, dildarî, civak, bi hindikî jî be daşorîn (hecw) û matemname/mersiye hene.

Jiyana sosyal a bajarê Silêmaniyê ya dewra mîrnişiniya Baban, herî zêde di helbestên Salim de reng vedaye. Salim di

210 Xeznedar, b.n. b. III, r. 155-157.

CamScanner ile tarandı

helbestên xwe de derheqê kesayetên girîng ê dewra xwe de jî agahiyan dane. Bi taybetî dawîlêhatina desthilata mîrnişîniyê zehf bandor li Salim kiriye. Her du helbestên ku li jêrê beytên wan ên pêşî û dawiyê hatine dayîn di vî warî de ne:

Helbest 1:

El-weda' ey mulkî Baban el-weda'
El-weda' ey ehlî îman el-weda'

Gerçî bo ehwalî Salim bê xem î
El-weda' ey naMisliman el-weda'

Helbest 2:

Nema rengim be bê dîdarî Ehmed
Çi dilteng im be bê ruxsarî Ehmed

Le jêr barî xefet Salim sebûr be
Denêrê Ehmedet muxtarî Ehmed

Salim rêzeke mezin ji Nalî re girtiye û ew wekî "hezret" bi nav kiriye. Di warê hunerê helbestê de ketiye bin bandora wî de. Bo nimûne;

Nalî

Derûnim pir kebab û derd e bê to
Dilim germ û henasem serd e bê to

Salim

Le sînem da seday nalîne bê to
Dilî zarim besê xemgîn e bê to

Salim li ser xezeleke Nalî pêncxişteyek çêkiriye. Ev huner ji bo Kurdiya Soranî ya wê demê tiştekî nû û girîng e. Salim ber-

CamScanner ile tarandı

siva nameya Nalî jî bi şêweya helbestê û bi awayekî dirêj daye ku li jêrê beytên wê yên pêşî û dawiyê cih digirin.[211]

Canim fiday sirweket ey badekey seher
Wey peykî şareza le hemû rahî xeter

Salim sifet le bêkesya ba nebe hîlak
Min kirdim ew neyka le xema xiwênî xoy heder

C. KURDÎ

1. Zanyariyên Nasnameya wî

Navê Kurdî, Mistefa Beg, navê bavê wî jî Mehmûd Begê kurê Ehmed Beg e. Ew jî wekî Salim ji eşîra Sahibqiran, ji malbata Qrecehenemî ye û her du helbestvan kurmamê hev in. Malbata wî jı Kurdistana Rojhilat hatine Kurdistana Başûr û dema bajarê Silêmaniyê ava bûye li wir bi cih bûne. Kurdî, di sala 1812an de li Silêmaniyê hatiye dinyayê û perwerdeya hicreyên mizgeftan li wir dîtiye, lê ev perwerde xilas nekiriye. Bi taybetî piştî dawîlêhatina mînişîniya Baban, gelek caran çûye Kurdistana Rojhilat cem eqrebayên xwe. Li bajarên wekî Mehabad û Sineyê, herweha li Tehranê jî maye û li wir têkiliya wî bi edîban re çêbûye. Hinek helbestên xwe bi mexlesa "Hicrî" nivîsandine. Dibe ku ev mexles di qonaxa Îranê de bi kar anîbe. Kurdî, temenekî kurt bûrandiye (38 sal) û di sala 1850î de koçî dawiyê kiriye.[212]

2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Kurdî hevçaxê Nalî ye û her du jî bi hev re helbestvanên pêşîyên Kurdiya Soran tên qebûlkirin. Lê herçiqas serdema wan yek jî be, Kurdî berî Nalî helbestên Kurdiya Soranî nivîsandi-

211 Ji bo helbesta Salim bnr. Xeznedar, b.n., b. III, r. 157-212.
212 Xeznedar, b.n., b. III, r. 215-217.

CamScanner ile tarandı

ne. Kurdî ji bilî Kurdiya Soranî bi zimanên Erebî, Farisî û Tirkî jî helbest nivîsandine. Heta niha ji 60î zêdetir helbestên wî hatine komkirin. Ji van helbestan sê heb bi teşeya mulemmayê, yên dî jî bi teşeyên qesîde û xezelê hatine nivîsandin. Kurdî Mulemmayên xwe misrayek bi Kurdiya Soran û misrayên dî jî bi Erebî, Farisî, û Tirkî amade kirine.

Helbestvanê me ji aliyê naverokê ve li ser mijarên wekî fîrqetê, pesindayîna yarê û munacata wê, perîşanî, dûrbûna ji yarê, eşq û aşiq, bezmê rindan rawestiyaye.[213] Kurdî jî wekî Salim ketiye bin bandora Nalî de. Bo nimûne, Kurdî ji helbesta Nalî ya ku derheqê Silêmaniyê de nivîsandibû û beyta

Nalî:

Qurbanî tozî rêgetim ey badî xoş mirûr
Wey peykî şareza be hemû şarî Şarezûr

Dest pê dike re re nezîreyek nivîsandiye. Ev nezîre jî bi vê beytê dest pê dike:

Kurdî:

Derûnê zamdar û dil xemgîn e bê to
Serim gêj û leşim bê tîn e bê to

Pêwist e bê zanîn ku Salim jî bersiva vê helbesta Nalî bi riya nezmê dabû.

213 Xeznedar, b.n., b. III, r. 217-250.

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA PÊNCEM
EDEBIYATA KURDIYA ZAZAKÎ



I. PEYDANEBÛNA EDEBIYATA KURDIYA ZAZAKÎ DI SERDEMA MÎREKTIYAN DE

Çawa ku me behs kiribû di serdema dewletên Emewî, Ebbasî û hikûmetên Kurdan de bi Kurdiya Kurmancî berhem nehatibûn nivîsandin, lê piştre rewş hêdî hêdî guherîbû. Di destpêka sedsala XVIan de piştî ku di navbera mîrên Kurdan û Siltan Selîmê Osmanî de li hember Sefewiyan tifaq çêbûbû, mîrên Kurdan bi şertê ku di şer de piştgiriya Osmaniyan bikin li welatê xwe serxwebûnek bi dest xistibûn. Piştî vê serxwebûnê li welatê Kurdan li gorî berê aramî û îstîqrareke nisbî çêbûbû û vê yekê jî şert û mercên ku bi Kurdiya Kurmancî berhemên edebî bên nivîsandin bi xwe re saz kiribûn ku perwerdeya bi Kurdiya Kurmancî ya di medreseyan de di vî warî de roleke mezin lîstibû. Di encamê de Kurdî digel ku zimanê perwerdeyê bû, bûbû zimanê nivîsê jî, berhemên Kurdî di mifredata medreseyan de bûbûn berhemên perwerdeyê û gelek berhemên edebî yên Kurdiya Kurmancî hatibûn nivîsandin ku mirov bi rehetî dikare bêje ku edebiyata Kurdiya Kurmancî ya klasîk mehsûlê vê serdemê ye.

Dema em li edebiyata Kurdiya Zazakî ya klasîk dinêrin, em dibînin ku di dewra dewletên Emewî, Ebbasî û hikûmetên Kurdan de bi Dimilî jî berhem nehatine nivîsandin ku ev tê fêmkirin. Lê li vir ev pirs tê bîra meriv. Gelo dema ku mîrên Kurmancan bi Osmaniyan re tifaq saz kirin, di nav wê tifaqê de mîrên qet tinebûn da ku di dewra wan mîrektiyên de wekî Kurdiya Kurmancî berhemên Dimilî bihatana nivîsandin? Bersiva vê pirsê ji aliyê hebûna mîrektiyên dimilyan ve erê ye. Lewra hem di sedsala şazdehan de, hem jî berî wê mîrektiyên hebûn. Şerefxan Bedlîsî di Şerefnameyê de çawa ku derheqê mîrektiyên Kurmancan de agahiyan dide, bi heman rengî derheqê mîrektiyên de jî agahiyan dide. Ji

CamScanner ile tarandı

van mîrektiyên Mirdasî û Suweydî wekî du konfederasyonên mezin bûn. Mirdasiyan li Gêl, Palo û Çermûkê û Suweydiyan jî li Dara Hênê, Çepeqçur hwd. desthilatdarî dikirin. Ev mîrekti hê berî sedsala XVIan ava bûbûn û wan di tifaqa Kurd û Osmaniyan de di nav koalîsyona mîrên Kurdan de jî cih girtibûn.

Bêguman li vir xaleke gelekî enteresan heye ku digel ku pozîsyona van mîrektiyên û mîrektiyên Kurmancan bi tevahî wekî hev bû, gelo çima di encamê de di dewra mîrektiyên Kurmancan de berhemên edebiyata Kurdiya Kurmancî derketin meydanê, lê di nav mîrektiyên de berhemên edebiyata Dimilî dernektin meydanê? Tişta herî enteresan ew e ku di dewra mîrektiya Palu û Gêlê de berhem hatine nivîsandin, lê ev berhem ne bi Dimilî ne, bi Tirkiya Osmanî ne. Lewre di her du mîrektiyan de "Şerefname"ya Şerefxanê Bedlîsî bo zimanê Osmanî hatiye wergerandin. Wate digel ku di dewra wan mîrektiyan de berhem hatine dayîn jî, ev berhem ne bi Dimilî ne, bi Tirkî ne.

Bêguman nivîsandina bi Tirkî hinekî mijarê zelal dike. Lewra ev tişt, hebûna bandora zimanê Tirkiya Osmaniyan li ser wan nîşan dide. Bi îhtîmaleke gelekî mezin ji ber ku têkiliya mîrên Palu û Gêlê bi waliyê Osmaniyan ê Diyarbekirê re zehf bû, vê yekê kiriye ku ew mîr zimanê dewleta Osmaniyan di nivîsandinê de bi kar bînîn. Hetta dibe ku zanayên wan li Diyarbekirê di medreseyên ku di wan de bi zimanê Osmaniyan perwerde dihat kirin de xwendibin û ev yek jî bûbe sebebê bikaranîna Tirkiya Osmanî di nivîsandinê de. Di encamê de di dewra van mîrektiyên Dimiliyan de, bi qasî ku tê zanîn bi Dimilî ti berhem nehatine nivîsandin. Wisa xuyaye ku di vî warî dê mîrektiyên Kurmancan ne di bin bandora dewleta Osmaniyan de bûn.

Edebiyata Dimilî ya klasîk di serdema mîrektiyên de derneketiye holê. Berhemên Dimilî yên edebî cara pêşî piştî serdema mîrektiyan bi 40-50 salî di dawiya sedsala XIXan de hatine dayîn. Herweha ew cihên ku ev berhem li wan hatine dayîn jî ne Gêl û Palo ne ku cihên mîrektiyên Dimiliyan bûn. Di vî warî de du berhemên ku hatine dayîn li hînterlanda Di-

CamScanner ile tarandı

yarbekirê hatine dayîn ku cihek ji wan nahiyeyeke di navbera Diyarbekir û Licê de ye ku ew jî Nahiyeya Hezanê ye û cihê dî jî bajarê Sêwregê ye. Ev her du der jî ne bermayiyên mîrektiyên Dimiliyan e. Wekî encam mirov dikare bêje ku bereksê Kurdiya Kurmancî, hebûna mîrektiyên Dimiliyan ti bandor li ser derketina edebiyata Dimilî nekiriye.

Li jêrê em dê behsa her du helbestvanên Dimilî bikin ku di dîroka edebiyat Dimilî de cara pêşî berhemên edebî yên Dimilî ji aliyê wan ve hatine dayîn. Ew jî Mela Ehmedê Xasî û Osman Efendî Babij e.

II. NÛNERÊN PÊŞÎ YÊN EDEBIYATA KURDIYA ZAZAKÎ YA KLASÎK

A. MELA EHMEDÊ XASÎ

1. Zanyariyên Nasnameya wî

Mela Ehmedê Xasî ku zehftir wekî Seydayê Xasî, Xoceyê Xasî yan jî Melayê Xasî tê naskirin, di sala 1862 li gundekî Liceyê bi navê Hezanê hatiye dinyayê. Xasî pêşî li gundê xwe li cem Mela Mistefa Xetîb dest bi xwendinê kiriye, piştre çûye li gundekî dî yê Liceyî bi navê Peçarê xwendiye, piştî wir jî çûye Diyarbekirê li medreseya Mesûdiyeyê xwendina xwe xilas kiriye û li wê derê di sala 1902yan de ji aliyê el-Hac Îbrahîm Efendî ve îcazet stendiye. Di sala 1909an de li Diyarbekirê dest bi muderistiyê kiriye, di sala 1910an de bûye muderisê gundê xwe Hezanê. Piştre li Liceyê miftitî kiriye, lê piştî du sal û du mehan ji vî karê xwe îstîfa kiriye.

Digel ku Melayê Xasî ji Şêx Ebdulqadirê Hezanî xelîfetiya terîqeta Neqşebendîtiyê stendiye jî, jiyana xwe li gorî rêbaza terîqetê ne meşandiye, her dem bi zanînê û perwerdeyê re meşxûl bûye. Seydayê Xasî ji bilî Dimilî, bi Kurdiya Kurmancî, Tirkî, Erebî û Farisî dizanîbû. Di sala 1951ê de li Hezanê wefat kiriye û li wir hatiye defnkirin.[214]

214 Korkusuz, Şefik, *Tezkire-i Meşayîh-i Amid*, weş. Kent, İstanbul 2004, r.

CamScanner ile tarandı

2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Melayê Xasî yekem kes e ku di dîroka edebiyata Kurdî de bi Kurdiya Dimilî berhem nivîsandiye. Xasî digel ku helbestvanekî girîng e, herweha bi Dimilî mewlûdek jî nivîsandiye. Mewlûda Melayê Xasî di dîroka edebiyata Dimilî de yekem berhem û yekem mewlûda Dimilî ye.

Mewlûda Xasî cara pêşî di sala 1315/1898an de li Diyarbekirê di çapxaneya topografya da hatiye çapkirin. Lê ji ber ku di vê çapê de tenê bi qasî 400 dane hatine çapkirin, daneyên wê zû qediyan û ji ber vê yekê jî nedihat peydakirin. Di sala 1985an de Mela Zeynelabidîn Amidî, li Diyarbekirê Mewlûda Xasî ji nû ve bi xetê xwe nivîsand û wekî cara duyem da çapkirin.

Amidî di vê çapê de digel metnê mewlûdê cih daye helbestên Xasî yên curbicur ku ew jî ev in: Menzûmeyeke Eqaîdê bi zimanê Erebî (144 beyt), derheqê Esmau'l-Husna û mijareke fiqhî de du helbestên Erebî, helbesteke bi Tirkî û helbesteke bi terzê mulemmayê ku her bendeke wê bi Erebî, Farisî, Tirkî, Kurdiya Kurmancî û Dimilî hatiye nivîsandin.

Mewlûda Xasî heta niha 6 caran bi elîfbêya latînî hatiye weşandin:

1. Malmîsanij, "Hêvî Kovara Çandî ya Gişti", Parîs 1985.
2. Mihanî, Weşanxaneya Firat, Stenbol 1994.
3. Mela Mihemedê Kavarî, Diyarbekir 2005.
4. W. K. Merdimînî, Weşanxaneya Hîvda, Stenbol 2008.
5. Roşan Lezgîn, Edebiyatê Kirmanckî ra Nimûneyî, Weşanên Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn 2012.
6. Roşan Lezgîn, Mewlidê Kirdkî-Mewlidu'n-Nebî el-Qureyşî, Nûbihar, Stenbol 2013.

Mewlûda Xasî ji 16 beş û 756 beytan pêk tê. Mewlûd li gorî wezna erûzê hatiye nivîsandin û wekî piraniya mewlûdan ji behra remelê bi qalibê "Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun" hatiye nivîsandin. li jêrê wekî nimûne em dê cih bidin çend beytên wî:

62-67; Korkusuz, *Son Devir Diyarbekir Uleması*, İstanbul 1996, r. 20-21.

CamScanner ile tarandı

Her du beytên pêşî

Ez bi bismîllahî îptîda kena
Raziqê aman û xasan piya kena
Rebbî, hemd û şikrî ancax to rê bê
Kîbr û medh û fexrî pêro to rê bê

Di navbera hemû beşan de beyta neqeratê heye:

Wazenê ger ma xelasiyya temam
Vatişê ma es-selatu we's-selam

Her du beytên dawî

Be'dê cû mend yew serrêke lacerem
Kerd hîcret şî Medîne zu'l-'elem

Des serrî zî mend Medîne de temam
Umrê yê hîrê yû şeştî we's-selam

Li jêrê em dixwazin cih bidin bendên pêşî û paşî yên helbesta Xasî ya ku bi terzê mulemmayê nivîsandiye. Di her bendekê de rêza pêşî bi Erebî, ya duyem bi Farisî, ya sêyem bi Tirkî, ya çarem bi Kurdiya Kurmancî û ya pêncem jî bi Dimilî hatiye nivîsandin ku di nav dîroka hunera mulemmayê de nimûneyên bi 5 zimanan hatine nivîsandin kêm in.

Merheben ya men 'ela bi'l-husnî teqwîme'l-beşer
Hafizeş Xaliq şewed ez çeşmê bednam û nezer
Mucîdî esbab û lat û we ma mînha seder
Dil ji qeyda leşkerê xem kir reha wextê seher
Ah û nalînê verînî biy vinî nêmend eser

Fe'lemen fellahu xeyrun hafizen hale'n-newa
Xasiya ba sebr û şevta nûr şewed narê hewa

CamScanner ile tarandı

Rehberindir bîl bû derden çunkî hem odir dewa
Yawerê rindan nebî Ehmed çi insaf û rewa
Dûriyey yîne hevalo kufrî ya ey bêxeber

B. OSMAN ES'ED EFENDÎ BABIJ

1. Zanyariyên Nasnameya wî

Osman Es'ed Efendî Babij, di sala 1852yan de li Sêwregê hatiye dinyayê. Bavê wî Hacî Eyûb Efendî miftiyê Sêwregê yê berê bû. Bab navê eşîra wî ye ku peyva Babij a ku di kunyeya wî de ye nisbeya wî bi bal vê eşîrê ve nîşan dide. Li cem miftiyê Sêwregê Zulfiqar Zuhdî Efendî xwendiye û di sala 1882yan ji wî îcazet stendiye. Di sala 1884an li Sêwregê bûye endamê dadgehê. Di sala 1905an de piştî koça dawiyê ya miftiyê Sêwregê Zulfiqar Zuhdî Efendî, şûna wî bûye miftiyê Sêwregê. Osman Es'ed Efendî di sala 1929an de wefat kiriye ku wê demê jî miftiyê Sêwregê bû. Gora wî li Sêwregê ye.

Osman Es'ed Efendî ji bilî Dimilî bi Kurdiya Kurmancî, Erebî û osmanî dizanî.

2. Cihê wî di Edebiyata Kurdî de

Osman Es'ed Efendî jî wekî Mela Ehmedê Xasî mewlûdeke Dimilî nivîsandiye. Ew duyemîn kes e ku bi Dimilî berhemek nivîsandiye. Lê ew hevçerxê Mela Ehmedê Xasî ye û dîroka nivîsandina berhema wî ne piştî ya Xasî bi gelekî ye. Wate wî jî di dawiya sedsala XIXan de berhema xwe nivîsandiye.

Mewlûda wî wekî ya Xasî li Diyarbekir nehatiye çapkirin. mewlûda wî piştî wefata wî li Şamê ji aliyê Celadet Elî Bedîrxan ve hatiye çapkirin.

CamScanner ile tarandı

Destpêka mewlûdê:

Bi namey wahîrê no ard û azmên
Kî ma dest kerdo no girwe do rengîn
Şima hemdê xwi Allay rê biyarîn
Şew û roj qapî dê ey di binalin

Dawiya mewlûdê:

Hem viraşto no kitabê xasekî
Lajê miftî dê kean dê Suregî

Yanî Osman Es'ed Efendî qijî
Lajê Hec Eyyub Efendî Babijî

Eyyûb lajê pîr û pîrbabê verî
Ef kerê û şad kerê ti ey Rebbî

O kî yazî kerdo no mewlidê ma
Cennetî ednî miyandi bidi ca

CamScanner ile tarandı

BEŞA SÊYEM

DI HELBESTA KLASÎK DE RUXSAR

CamScanner ile tarandı

DESTPÊK



LÊKOLÎNA LI SER METNÊ EDEBÎ

Di vê beşê de em dê di çarçoveya edebiyata Kurdî ya klasîk de li ser mijarên ruxsarî yên helbestê/nezmê, bi taybetî li ser kêşa (wezna) erûzê, serwa, paşserwa û teşeyên nezmê rawestin. Di dawiya beşê de jî em dê ji aliyê teşeyê ve cih bidin cureyên berhemên klasîk jî.

Lê berî em dest bi van mijaran bikin, lazim e em di serî de derheqê lêkolîna li ser metnê edebî de girîzgahekê bikin.

Dema em lêkolînekê li ser nezmê yan jî helbestê (metnê edebî) bikin, em vê lêkolînê ji du aliyan ve dikin: Ji aliyê ruxsarî (şeklî) ve û ji aliyê naverokî (muhtewayî) ve. Di van lêkolînan de ji zanistên binbeş yên edebiyata klasîk sûd tê wergirtin.

1. Lêkolîna Ruxsarî

Di lêkolîna ruxsarî de ji aliyê kêş (wezn), serwa (qafiye), paşserwa (redîf), kurtî û dirêjiya helbestê/nezmê, hijmara beytan, teşeya nezmê, hunerên edebî yên ruxsarî, bêjeyên arkaîk, mijarên rêzimanî ve li ser nezmê/helbestê tê rawestan.

2. Lêkolîna Naverokî

Di lêkolîna naverokî de jî li ser wateya bêjeyên Erebî û Farisî, şîroveya têgehên curbicur, hunerên edebî yên naverokî, derxistina wateya beytê bi gişti, şîroveya beytê, cureya edebî ya nezmê/helbestê ya naverokî ve li ser nezmê/helbestê tê rawestan.

Bêguman di vê beşê de em dê li ser van mijaran tevan rawestin. Çawa ku ji sernav binbeşê jî tê fêmkirin, ev binbeş ji bo lêkolîna ruxsarî hatiye terxankirin.

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA YEKEM
KÊŞA ERÛZÊ



DESTPÊK

Erûz, di çarçoveya edebiyata klasîk de zanisteke serbixwe ye û xwediyê termînolojiyeke dewlemend û girîft e. Herçiqas ji bo bidestxistina melekeya erûzê hinekî wext lazim be jî, berî her tiştî divê di fêrkirina wê de metodeke pedagojîk bê şopandin. Di vê binbeşê de ji fêrkirina têgehên bêpayan ên erûzê zêdetir, fêrkirina tetbîqa erûzê hatiye armanckirin ku ev yek di polan de jî hatiye pratîzekirin.

Di amadekirina vê mijarê de ji çavkaniyên wekî "Mûsîqî eş-Şi'ri'l-Kurdî" ya Ebdurrezzaq Bîmar (Daru'l-Hurriye, Bexda 1992), "Wezni Şî'rî Kurdî" ya Ebdulxaliq Perhîzî (Zeman, Tehran 1385), "Berawirdeyeka Kêşnasî di Navbera Erûza Kurdî û Farisî" ya Helîma Xurşîd Ebdulla (Spîrêz, Duhok 2011) û "Eski Türk Edebiyatı: Nazım Şekilleri ve Aruz" a Haluk İpekten (Dergah Yay., İstanbul 2002) sûd hatiye wergirtin.

1. Pênaseya Erûzê

Kêş (wezn) ew pîvan (bi Tirkî ölçü) e ku helbestek yan jî nezmek ji serî heta bi dawiyê li gorî wê tê nivîsandin. Di edebiyata Kurdî de sê cure kêş hatine bikaranîn: kêşa xwemalî (kêşa hêceyê/birgê), kêşa erûzê û kêşa serbest. Kêşa xwemalî bi piranî di edebiyata gelêrî de, ya erûzê di edebiyata klasîk de û ya serbest jî di edebiyata modern de tê bikaranîn. Niha li vir di çarçoveya edebiyata klasîk de em dê li ser kêşa erûzê tenê rawestin.

Di ferhengên zimanê Erebî de ji bo peyva erûzê wateyên wekî alî, rê, rêbaz, bajarê Mekkeyê, hêştira serkeş û sitûna konê tên nîşandan. Li gorî teoriyekê ji ber ku ev zanist cara pêşî ji aliyê Xelîlê kurê Ehmed ve li Mekkeyê hatiye sazkirin, navê Mekkeyê yê bi navê "el-Erûz"ê li vê zanistê hatiye kirin. Li gorî teoriyeke dî

CamScanner ile tarandı

ji ber ku ji tef'ile/parçeya dawî ya qalibên erûzê re "erûz" tê gotin, piştre ev nav li kêşê tevî hatiye teşmîlkirin. Ji ber ku kêşa erûzê di serdema cahiliyeyê de hatiye tetbîqkirin, têkiliya wateyên peyva erûzê bi çanda Erebên bedewî yên berî Îslamê re heye. Bi taybetî dema em li wateya vê pêyvê ya "sitûna konê" dinêrin ev têkilî aşîkar e. Li gorî danerên vê peyvê ji bo vê kêşê, çawa ku sitûnê konekî ji bo wî konî tiştekî zerûrî ye, bi wî rengî erûz jî ji bo malikekê (beytekê) ewqasî zerûrî ye. Çawa ku bê sitûn kon li ser piya namîne, bi wî rengî bê kêşa erûzê jî malikek (beytek) li ser piya namîne. Li vir nivîskar malikeke helbestê şibihandiye kon, yanî mala bedewiyan û jê re gotiye "beyt" ku di Erebî de mal e. Di nav hemû têgehên malikekê/beytekê de ev kolerasyon heye. Li gorî vê kolerasyonê her du aliyên deriyê konê ku ji wan re misra tê gotin beramberî her du aliyên beyta helbestê û sitûnê konê ku jê re erûz tê gotin beramberî kêşa erûzê tê. Herweha hinek têgehên dî yên kêşa erûzê jî bi konên Ereban ve girêdayî ne. Bo nimûne her du esasên tef'ileyan "esbab" û "ewtad", formên pirjimar ên sebeb (ta) û weted (sing)ê ne ku di konan de dihatin bikaranîn. Çawa ku tê dîtin têgehên beyta helbestekê bi têgehên konê bedewiyan hatine şibihandin ku erûz jî yek ji van têgehan e.

Erûz

Misra/Riste	Misra/Riste

BEYT/MALIK

Kêşa erûzê ji hinek qalib/pîvanên kifşkirî pêk tê. Di edebiyata klasîk de ji wan pîvanên ku helbestek an jî menzûmeyek ji serî heta bi dawiyê li gorî wan tê nivîsandin re pîvanên kêşa erûzê te gotin. Bo nimûne "Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun" pîvanekî kêşa erûzê ye ku, helbestvan dikare helbesta xwe ji serî heta bi dawiyê li gorî vî qalibî yan jî li gorî qalibekî dî binivîse.

CamScanner ile tarandı

2. Dîroka Kêşa Erûzê

Kêşa Erûzê, cara pêşî di edebiyata Erebî ya beri Îslamê ya "dewra cahiliyeyê" de hatiye tetbîqkirin. Di vê serdema ku berî Îslamê bi qasî 150 salan dom kiriye de helbestvanên wekî Îmruu'l-Qeys, Zuheyr, Lebîd, 'Entere û hwd ku helbestên wan di pêşbaziyan de dihatin ecibandin û bi dîwarê "Ke'be"yê ve dihatin daleqandin perwerde bûbûn.

Piştî ku dînê Îslamê hat û Ereb bûn Misliman jî bi vê kêşê helbest hatin nivîsandin. Di dewra Emewiyan de Xelîlê Kurê Ehmed/Xelîl b. Ehmed el-Ferahîdî (k.d.792) bi berhema xwe ya bi navê "Kîtabu'l-Erûz"ê bingehê zanista erûzê daniye û cara pêşî wî ev zanist tedwîn kiriye. Berî wî herçiqas Ereban kêşa erûzê di helbestên xwe de tetbîq dikirin jî, têgehên vê zanistê nehatibûn binavkirin. Xelîlê kurê Ehmed ahengên helbestên berî xwe kategorîze kirin û ji her kategoriyê re navek danî û qalibên wan kategoriyan kifş kirin. Di edebiyata Erebî de ji her yek ji van kategoriyan re "behr"ek tê gotin. Li gorî dabeşkirina Xelîlê kurê Ehmed di helbesta Erebî de 16 behr/kategorî hene. Di binê her behrekê de jî çendîn qalibên cuda hene.

Piştî ku Kurd û Faris bi hev re misilman bûne, kêşa erûzê derbasî edebiyata Kurdî û Farisî jî bûye. Bikaranîna Kurdan a kêşa erûzê di wextekî zû de ye. Bo nimûne Baba Tahirê Uryan dubeytiyên xwe yên li ser kêşa "mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun" di sedsala Xan de nivîsandine. Kêşa erûzê piştre bi riya edebiyata Farisî derbasî edebiyata Tirkî jî bûye.

Bi qasî ku tê zanîn di nav Kurdan da cara pêşî Ehmedê Xanî bi awayekî teorîk li ser zanista Erûzê rawestiyaye û di sala 1683yan de di berhema xwe ya bi navê "Nûbihara Biçûkan" de cih daye qalibên erûzê û xwestiye ku zarokan fêrî vê kêşê bike.

CamScanner ile tarandı

I. QALIBÊN ERÛZÊ Û TEF'ILE

Her qalibekî erûzê, ku misrayek li gorî wî qalibî tê nivîsandin, ji sê yan çar parçeyan pêk tê. Her parçeyek wekî "tef'ile"-yekê tê binavkirin. Nexwe tef'ile, yekeya herî biçûk a qalibekî erûzê ye û her qalibekî erûzê jî ji kombûna sê yan çar tef'ileyan pêk tê. Peyva "ef'ile"yê jî bi heman wateyê tê bikaranîn, lê ji ber belavbûna wê em dê peyva "tef'ile"yê bi kar bînin. Di kêşa erûzê de 8 tef'ileyên bingehîn hene. Hin ji wan tef'ileyan ji sê, hin ji çar, hin jî ji pênc hêceyan pêk tên.

Tef'ileyên Sê Hêce:

Fe'ûlun : (+ _ _)
Fa'ilun : (_ + _)

Tef'ileyên Çar Hêce:

Fa'ilatun : (_ + _ _)
Mefa'îlun : (+ _ _ _)
Mustef'ilun : (_ _ + _)
Mef'ûlatu : (_ _ _ +)

Tef'ileyên Pênc Hêce:

Mufa'eletun : (+ _ + + _)
Mutefa'ilun : (+ + _ + _)

Ev tef'ile hemû ji binemaya "fe'lun" hatine dariştin. Herçiqas ev mesder di zimanê Erebî de tê wateya "kirin"ê jî, li vir tenê wekî qalib û pîvanên ahenga di dengan de ji vê mesderê sûd hatiye wergirtin. Ji ber ku di zimanê Erebî de qalib hemû peyvan ji vê binemayê tên dariştin, qalibên ahenga erûzê jî dîsa ji heman binemayê hatine dariştin. Bêguman hijmara tef'ileyan ji 8 heban gelekî zêdetir in. Lê ev 8 tef'ile yên sereke ne û yên dî hemû ji van 8 tef'ileyan hatine dariştin. Wekî nimûne,

CamScanner ile tarandı

tef'ileya "mefa'ilun"ê ji tef'ileya "mustef'ilun"ê welidiye. Pêşî bi ketina herfa "Sîn"ê (herfa "S"yê) "mustef'ilun" bûye "mutef'ilun. Piştre ji ber ku "mutef'ilun" ji aliyê lipeyhevhatina kurtî û dirêjiyê ve beramberî "mefa'ilun"ê tê, êdî li şûna wê "mefa'ilun" hatiye bikaranîn. Lewra her du jî ji aliyê kurtî û dirêjiya hêceyan ve wekî hev in: (+_+_). Di termînolojiya zanista erûzê de ji vî karî re "hebn" tê gotin.

Eger qalibek ji sê parçeyan pêk bê, tê gotin ku ew qalib ji sê tef'îleyan pêk hatiye. Bi vî rengî eger ji çar parçeyan pêk bê, te gotin ku ew qalib ji çar tef'îleyan pêk hatiye. Bo nimûne qaliba "Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun" ji çar parçeyan anko ji çar tef'ileyan pêk hatiye.

Helbestvanê ku bixwaze li gorî qalibekî erûzê misrayekê binivîse, lazim e rêza kurtî û dirêjiya îfadeyên xwe beramberî rêza kurtî û dirêjiya wî qalibê erûzê bîne.

II. BEHRÊN ERÛZÊ

Ji van 8 tefîleyan û guhertoyên wan 16 behr hatine meydanê. Em dikarin her behrekê wekî grûbekê bifikirin. Di her behrekê de qalibekî sereke heye û ji vî qalibî çend qalibên dî jî derdikevin meydanê. Bi vî awayî her behrek çendîn qaliban di nav xwe de dicivîne. Her behrek navekî xwe yê taybet heye. Wekî behra recezê, behra hezecê, behra remelê û yên dî. Derheqê etîmolojiya navên van behran de jî hinek teorî hene. Tê gotin ku di nav van behran de ya herî kevn behra recezê ye û tef'ileya sereke ya behra recezê ku "mustef'ilun" e, li ber ahenga dengên kurt û dirêj ên ku ji gavên hêştirê derdiketin hatiye sazkirin ku rêza wan dengan dirêj, dirêj, kurt, dirêj e. Ji ber ku piyekî hêştirê lawaz e, ew sê gavên tam/dirêj û gaveke lawaz /kurt diavêje.

A. QALIBÊN SALIM Û NESALIM

Çawa ku me gotibû, di binê her behrekê de gelek qalib hene. Îcar di her behrekê de bi piranî ji van qaliban yek, salim e û

CamScanner ile tarandı

qalibên dî jî ne salim in. Carinan hijmara qalibên salim ji yekî zêdetir e. Wateya vê ew e ku, binbeşên wê behrê hene, û ji bo her binbeşekî qalibekî salim heye. Mirov dikare qalibên salim, wekî qalibên bingehîn û qalibên nesalim jî wekî qalibên talî bihesibîne. Di qalibên salim de, kêşa misrayekê bi piranî ji çar tef'ile/parçeyên wek hev pêk tê. Bi gotineke dî di qalibên salim de çar parçeyên wek hev tên dubarekirin. Qalibên bi vî rengî salim in; yanî ji nexweşî û kêmasiyan dûr in. Eger di qalibê salim de, bi rengekî ji rengan guherînek hatibe meydanê wê demê ew qalib ne salim e. Yanî di wan qaliban de nexweşî û kêmasî peyda bûne. Wekî nimûne;

Ji behra Hezecê;

Salim : Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun

Nesalim : Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun

Ji behra Remelê;

Salim : Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun

Nesalim : Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Çawa ku tê dîtin di qalibên salim de çar tef'ileyên wek hev hatine bikaranîn, lê di qalibên nesalim de hijmara tef'ileyan daketiye sisêyan û di yekê ji van de jî guherîn çêbûye.

B. BEHR Û QALIBÊN KU DI HELBESTA KURDÎ DE HATINE BIKARANÎN

Nivîskar Ehmed Herdî yê ku 20 salan li ser Erûza Kurdî lêkolîn kiriye, bi riya xwendin û vekolîna berhemên helbestvanên Kurdan ên navdar, behrên erûzê û qalibên wan behran ên ku di helbestên wan de hatine emilandin tesbît kirine[215] ku li jêrê em dê cih bidin lîsteya van behr û qaliban. Pêwist e em bê-

215 Ehmed Herdî, *el-Erûz fi'ş-Şi'ri'l-Kurdî, el-Mecme'u'l-'Ilmî el-Kurdistanî*, Erbîl 2004, r. 105-194.

CamScanner ile tarandı

jin ku me di vê lîsteyê de cih nedaye hemû qalibên nesalim ên ku Herdî nîşan dane. Bêguman dibe ku hinek helbestvanên ku ji aliyê Herdî ve dîwanên wan ne hatine xwendin hinek qalibên cuda jî bikaranîbin. Lê mirov dikare bêje ku kêm zêde qalibên ku helbestvanên klasîk bi kar anîne ew in ku Herdî destnîşan kirine. Li jêrê em dê cih bidin wan behr û qalibên wan.

1. Behra "Hezec"ê

Salim

1. Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
   + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

2. Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu mefa'îlun
   - - + / + - - + / + - - + / + - - -

Nesalim

1. Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun
   + - - + / + - - + / + - -

2. Mef'ûlu mefa'îlun mef'ûlu mefa'îlun
   - - + / + - - - / - - + / + - - -

3. Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun
   - - + / + - - + / + - - + / + - -

2. Behra "Remel"ê

Salim

1. Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun
   - + - - / - + - - / - + - - / - + - -

2. Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun
   + + - - / + + - - / + + - - / + + - -

CamScanner ile tarandı

3. Fe'ilatu fa'ilatun fe'ilatu fa'ilatun
+ + - + / - + - - / + + - + / - + - -

Nesalim

1. Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
- + - - / - + - - / - + - - / - + -

2. Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
- + - - / - + - - / - + -

3. Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun
+ + - - / + + - - / + + - - / + + -

4. Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun
+ + - - / + + - - / + + - -

5. Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'lun
+ + - - / + + - - / + + - - / - -

6. Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun
+ + - - / + + - -/ + + -

7. Fe'ilatun fe'ilatun fi'lun
+ + - - / + + - -/ - -

3. Behra "Recez"ê

Salim

1. Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
- - + - / - - + -/ - - + - / - - + -

2. Mufte'ilun mufte'ilun mufte'ilun mufte'ilun
- + + -/ - + + -/ - + + - / - + + -

3. Mufte'ilun mefa'ilun mufte'ilun mefa'ilun
- + + -/ + - + - / - + + -/ + - + -

CamScanner ile tarandı

4. Mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun
+ - + - / + - + - / + - + - / + - + -

Nesalim
1. Mustef'ilun mufte'ilun fe'ûlun
- - + - / - + + - / + - -

2. Mustef'ilun mustef'ilun
- - + - / - - + -

3. Mustef'ilatun mustef'ilatun
- - + - - / - - + - -

4. Behra "Xefîf"ê

Salim
1. Fe'ilatun mefa'ilun fe'ilatun
+ + - - / + - + - / + + - -

Nesalim
1. Fe'ilatun mefa'ilun fe'ilun/fi'lun
+ + - - / + - + - / + + - / - -

5. Behra "Serî'"ê

Salim
1. Mufte'ilun mufte'ilun fa'ilat
- + + - / - + + - / - + -

Nesalim
1. Mufte'ilun mufte'ilun fa'ilun
- + + - / - + + - / - + -

CamScanner ile tarandı

6. Behra "Muctes"ê

Salim

1. Mefa'ilun fe'ilatun mefa'ilun fe'ilatun
+ - + - / + + - - / + - + - / + + - -

Nesalim

1. Mefa'ilun fe'ilatun mefa'ilun fe'ilun/fi'lun
+ - + - / + + - - / + - + - / + + - / - -

2. Mustef'ilun fe'ilatun mefa'ilun fi'lun
- - + - / + + - - / + - + - / - -

7. Behra "Muzarı'"ê

Salim

1. Mef'ûlu fa'ilatu mefa''îlu fa'ilatun[216]
- - + / - + - + / + - - + / - + - -

Nesalim

1. Mef'ûlu fa'ilatun mef'ûlu fa'ilatun
- - + / - + - - / - - + / - + - -

2. Mef'ûlu fa'ilatu mefa'îlu fa'ilun
- - + / - + - + / + - - + / - + -

3. Mef'ûlu mefa'ilun fe'ûlun
- - + / + - + - / + - -

216 Li gorî ku Herdî dibêje ev qalib di helbesta Kurdî tine ye.

CamScanner ile tarandı

8. Behra "Munserih"ê

Salim

1. Mufte'ilun fa'ilatu mufte'ilun fa'ilatu
- + + - / - + - + / - + + - / - + - +

Nesalim

1. Mustef'ilun fe'ûlun mustef'ilun fe'ûlun
- - + - / + - - / - - + - / + - -

9. Behra "Muteqarib"ê

Salim

1. Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun
+ - - / + - - / + - - / + - -

Nesalim

1. Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl
+ - - / + - - / + - - / + -

10. Behra "Mutedarik"ê

Salim

1. Fa'ilun fa'ilun fa'ilun fa'ilun
- + - / - + - / - + - / - + -

Nesalim

1. Fi'lun fi'lun fi'lun fi'lun
- - / - - / - - / - -

11. Behra "Tewîl"ê

Salim

1. Fe'ûlun mefa'îlun fe'ûlun mefa'îlun
+ - - / + - - - / + - - / + - - -

CamScanner ile tarandı

Nesalim
Tine ye.

12. Behra "Besît"ê

Salim
1. Mustef'ilun fa'ilun Mustef'ilun fa'ilun
- - + - / - + - / - - + - / - + -

13. Behra "Kamil"ê

Salim
1. Mutefa'ilun mutefa'ilun mutefa'ilun mutefa'ilun
+ + - + - / + + - + - / + + - + - / + + - + -

III. DÎTINA QALIBÊN ERÛZÊ

Li vir ev pirsa herî girîng derdikeve pêşiya me. Gelo kêşa erûzê û qalibên wê li ser çi bingehî ava bûne? Bi gotineke dî ev qalibên erûzê dê çawa bên dîtin? Ji bo vê yekê divê em bizanibin ka gelo qalibên erûzê çawa tên tetbîqkirin. Ji bo ku em qalibekî erûzê tetbîqî ser misrayekê bikin, ji serî heta dawiyê hêceyên wê misrayê ji aliyê dirêjî (girtîbûn) û kurtiyê (vekirîbûnê) ve bi hêceyên qalibekî erûzê ve tên beramberkirin û qaliba wê misrayê li hemû misrayên dî yên helbestê tê tetbîqkirin. Misraya yekem a helbestekê bi kîjan qalibî hatibe nivîsandin, hemû misrayên dî yên wê helbestê bi heman pîvanê tê nivîsandin. Ji ber vê yekê, dema ku kêşa misrayekê tenê bê dîtîn, kêşa ku di helbestê gişî de hatiye bikaranîn derdikeve meydanê. Ji ber ku hemû misrayên helbestekê bi heman qalibî tên nivîsandin, dema ku em bixwazin qalibê wê helbestê bibînin, ne lazim e em pêşî di misraya yekem de li wî qalibî bigerin. Di vir de ferqa misrayan ji hev nîne û em kîjan misrayê bixwazin em dikarin pêşî kêşa wê misrayê derbixin. Eger em nikaribin qalibê misraya pêşî bibînin, wê demê em dê derbasi misrayeke dî

CamScanner ile tarandı

bibin û hewl bidin ku em li ser wê misrayê qalibê wê helbestê bibînin. Lewra ji aliyê qalibê erûzê ve di navbera misrayan de ferq nîne. Li vir xaleke dî jî heye ku lazim e em bizanibin ku di menzûmeyên direj ên wekî mesnewiyên evîni de jî ji serî heta bi dawiyê heman qalib tê bikaranîn. Bi gotineke dî çi helbesteke kurt be, çi jî mesnewiyeke direj be her du jî ji serî heta bi dawiyê li gorî qalibekî tên nivîsandin.

Bi vî awayî dema em bixwazin qalibê erûzê yê helbestekê yan jî menzûmeyekê derbixin em dê van gavên li jêrê bavêjin:

1. Pêşî em dê tenê li ser misrayeke helbestê rawestin. Eger em qalibê wê misrayê derbixin, rasterast qalibê misraya duyem a beytê û qalibê helbestê gişî dê derdikeve meydanê.

2. Piştre li gorî rêbaza ku li jêrê hatiye gotin, em dê kurtî û direjiya hêceyên wê misrayê kifş bikin. Lazim e rêza hêceyan a kurtî û direjiyê beramberî qalibekî erûzê be. Ji bo vê yekê jî lazim e listeyeke qalibên Erûzê di destê me de hebe.

A. KURTÎ Û DIREJIYA HÊCEYAN

1. Hêceya Kurt

Eger hêceyek bi dengdêrekî kurt biqede, jê re hêceya kurt tê gotin. Hêceya kurt li ser kaxezê bi sembola zêdekê (+) tê nîşandan. Ji bo ku hêceya kurt bê naskirin, pêdawîstî bi naskirina dengdêrên kurt ên alfabeya Erebî heye.

Dengdêrên Kurt (Hereke)

Di Erebî de ji dengdêrên kurt re "hereke" tê gotin. Sê hereke, wate sê dengdêrên kurt hene. Ev hereke wekî sembol li jêrê yan li jorê herfên bêdeng tên danîn û her sembolek dengekî kurt dide herfa xwe ya bêdeng.

Ev hereke û dengên ku didin ev in:

1. Ser/Zeber (Fethe/Nesb)

Ser, dengê "e"yê dide nîşandan. Sembola wê (َ) e. Ev sembol li ser herfa bêdeng tê danîn. Wekî;

CamScanner ile tarandı

fe :فَ te:تَ he:حَ = fetehe :فَتَحَ

2. Ber/Pêş (Demme/Ref')

Ber, dengê "u"yê dide nîşandan. Sembola wê (ُ) e. Ev sembol li ser herfa bêdeng tê danîn. Wekî;

ku : كُ ti : تِ be : بَ = kutibe : كُتِبَ

3. Cir/Zêr (Kesre/Cer)

Cir, dengê "i"yê dide nîşandan. Sembola wê (ِ) e. Ev sembol li bin herfa bêdeng tê danîn.

he : حَ si : سِ be : بَ = hesîbe: حَسِبَ

Cir, di bêjeyên Erebî de dengê "i" ya di Tirkî de dide ku ev dengekî zirav û kurte. Wekî bêjeyên "iki" , "istedi" hwd. Bi gotineke dî ev deng, halê kurt a dengê "i"yê ye. Lê dema bêjeyeke Erebî ketibe Kurdî, wê demê li gorî herêman carinan dengê "i" ya kurt (Kurdî), carinan jî dengê "î" ya dirêj dide nîşandan. Ev tişt carinan di heman bêjeyê de diqewime. Wekî ihsan û îhsan, "hikmet û hîkmet" . Bi baweriya me di vê mijarê de mirov riyeke weha bişopîne dê baş be. Eger ew bêjeya Erebî bûbe malê Kurdî, bila wê demê bi dengê "i" ya Kurdî bê xwendin. Wekî "xizmet". Eger ne bûbe malê Kurdî wê demê bi mebesta ku dengê "i" ya kurta Erebî jî nîşan bide, bila bi dengê "î"ya dirêj bê xwendin. Wekî bêjeya "mîsal"ê. Lê di helbestan de cir her dem bi "i" ya Kurdî bê nîşandan baştir e.

Di Kurdî de Mînakên Hêceyên Kurt:

- bike : (++)
- were : (++)
- vegere : (+++)
- venexwe : (+++)

CamScanner ile tarandı

2. Hêceya Dirêj

Eger hêceyek bi dengdêrekî dirêj, yan jî bi bêdengekê biqede, jê re hêceya dirêj tê gotin. Hêceya dirêj li ser kaxezê bi sembola kêmekê (-) tê nîşandan. Ji bo ku hêceya dirêj bê naskirin, pêdawîstî bi naskirina dengdêrên dirêj ên alfabeya Erebî heye.

Dengdêrên Dirêj

Di alfabeya Erebî de dengdêrên dirêj bi herfan tên nîşandan, ne wekî dengdêrên kurt bi sembolan tên nîşandan. Ev herf di binemaya xwe de herfên bêdeng in. Lê dema ev herf piştî dengdêrekî kurt werin dibin dengdêrên dirêj û wî dengdêrê kurt dirêj didin xwendin.

1. ا /Elîf:

Elîf, piştî sembola "Ser/Fethe"yê (َ), wate piştî dengê (e) yê tê û dengê "a" yê dide. Bi gotineke dî piştî kîjan herfê bê, ew herf dengê "a"yê distîne.

Nîşe: "a" di elîfbêya latînî ya Kurdî de dirêj tê xwendin. Wekî;

ما: ma　　كا: ka

كال: kal　　مار: mar

2. و /Waw:

Waw, piştî sembola "Ber/Demme"yê (ُ), wate piştî dengê (u) yê tê. Waw, carinan dengê "û" yê, carinan jî dengê "o"yê dide. Wekî;

دور: dûr　　دور: dor

3. ى /Yê:

Yê, piştî sembola "Cir/Kesre"yê (ِ), wate piştî dengê (i) yê tê. Yê, carinan dengê "î"yê, carinan jî dengê "ê"yê dide. Wekî;

شير: şîr　　شير: şêr

Dema ev her sê herfên ku dibin dengdêrên dirêj, piştî herfên sitûr bên, wê demê her sê jî dengên sitûr didin. Lê dema piştî herfên zirav bên wê demê dengê zirav didin.

CamScanner ile tarandı

Nîşe: Hêceya dawî ya her misrayekê, kurt jî be dirêj tê hesibandin.

Di Kurdî de Mînakên Hêceyên Dirêj:

- hat : (-)
- zarok : (- -)
- her dem : (- -)
- axaftin : (- - -)
- arîkarî : (- - - -)

B. TEQTÎ'

Ji parçekirina misrayekê bi bal tefileyên wê û bi vî awayî dîtina qalibê wê misrayê re teqtî' (parçekirin) tê gotin. Di teqtî'ê de tef'ileyên misrayekê, li ser kaxezê bi pênûsê ji hev tên veqetandin û misra li gorî wan tef'ileyan bi aheng tê xwendin. Ji ber ku hêce tef'ileyan û tef'ile jî qalibên misrayan tînin meydanê, pêşî kurtî û dirêjiya hêceyên misrayê tê tesbîtkirin, piştre tef'ile tên dîtin. Ji ber ku her tef'ileyek bi piranî ji sisê yan çar hêceyan pêk tê, her sê yan çar hêceyên misrayê bi lîsteya tef'îleyan re tên rûbirûkirin û bi vî awayî tef'ileyên misrayê tên tesbît kirin. Kesên ku di kêşa Erûzê de xwedî tecrube ne, bi xwendina misrayêkê re, ji aheng û mûsîqiya wê misrayê dikarin demildest wê misrayê li gorî tef'ileyên wê bixwînin û di encamê de qalibê wê misrayê derbixin.

Rahênan:

Mela her wî bibîn her wî eger her wî dinasî tû
Huwe'l-me'bûd huwe'l-meşhûd(u) bel la xeyre fi'd-dareyn

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Mela her wî / bibîn her wî / eger her wî / dinasî tû
+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

Di vê beytê de misraya yekem bi Kurdiya Kurmancî û ya duyem jî bi Erebî ye. Em dê li misraya yekem tenê binêrin.

CamScanner ile tarandı

Lewra di misraya duyem de xaleke ku heta niha me nedîtiye heye. Lê dema em qalibê misraya yekem derbixin, wê demê qalibê misraya duyem jî dê heman qalib be. Ji bo ku em qalibê misraya yekem derbixin, pêşî em dê kurtî û dirêjiya hêceyên misraya yekem derbixin û piştre jî bi arîkariya lîsteya tef'ileyan tef'ileyên wê derbixin. Di vê misrayê de ji ber ku 16 heb hêce hene, bi rehetî em dikarin bêjin ku ev misra ji çar tef'ileyên çar hêceyî pêk hatiye. Nexwe em dê di nav tef'ileyên çar heceyî de li tef'îleyan bigerin. Îcar di vê merheleyê de ji aliyê kurtî û dirêjiyê ve rêza hêceyan girîngiyê bi dest dixe. Li vir ji ber ku rêza kurtî û dirêjiya hêceyên her çar parçeyan; kurt, dirêj, dirêj, dirêj e (= + - - -), bi rehetî em dikarin tesbît bikin ku her parçeyek beramberî tef'ileya "mefa'îlun" (= + - - -) tê.

Piştî ku me kurtî û dirêjiya hêceyan û tef'ileyên ku ji wan hêceyan hatine meydanê derxist, em dibînin, ev misra hem ji aliyê hijmarên tef'ileyan ve hem jî ji aliyê rêza kurtî û dirêjiya hêceyên wan tef'ileyan ve bi tevahî beramberî qalibê "Mefa'î-lun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun" ku qalibê salim yê behra Hezecê ye tê.

Di vê mijarê de divê ev jî bê zanîn ku tef'ileyek her dem beramberî peyvekê nayê. Carinan tef'ileyek ji nîvê peyva pêşî dest pê dike û di nîvê peyva duyem de diqede. Yanî hinek hêceyên wê di peyva pêşî de hinek hêce jî di peyva duyem de dimînin. Di vê rewşê de nîvê pêşî yê peyvekê di nav tef'ileyekê de û nîvê duyem jî di nav tef'leyeke dî de dimîne û bi vî awayî peyv di nîvî re tê parçekirin.

Rahênan:

Gerçi bilbil cewherê zatê gul e
Lê gulê rewneq ji 'eşqa bilbil e

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Li jêrê teqtî'a beyta jorîn hatiye kirin. Çawa ku tê dîtin di misraya yekem de peyva "zat" û di misraya duyem de jî peyva

CamScanner ile tarandı

"rewneq" di nîvî re hatine parçekirin û nîvê pêşî di nav tef'ileya yekem û nîvê duyem jî di nav tef'ileya duyem de maye.

Gerçi bilbil / cewherê **za** / **tê** gul e
- + - - / - + - - / - + -

Lê gulê **rew** / **neq** ji 'eşqa / bilbil e
- + - - / - + - - / - + -

IV. QUSÛRÊN HELBESTVAN: ZÎHAF Û ÎMALE

Eger di rêzkirina kurtî û dirêjiyê de di navbera misraya me û qalibekî erûzê de beramberiyek çênebe, wê demê em dê bigihin vê encamê ku helbestvan nekariye misraya xwe bi qalibê xwe re beramber bike û di bikaranîna erûzê de qusûr kirine. Di vê rewşê de eger em van têgehên li jêrê bizanibin û bigrin ber çavan, em dê qusûra helbestvan têbigihin û bibînin ku misraya me beramberî qalibekî erûzê tê. Ew têgeh ev in:

A. ZÎHAF

Eger hêceyeke dirêj ya beytekê, bi mebesta ku li weznê bê kurt bê xwendin, wê demê zîhaf pêk tê. Bi gotineke dî, zîhaf, kurtxwendina dengdêrekî dirêj e. Hebûna zîhafê ji helbestvan yan nazimî re wekî qusûr tê qebûlkirin. Em dê zîhafê bi sembola ( ) bidin nîşandan.

B. ÎMALE

Eger hêceyeke kurt ya beytekê, bi mebesta ku li weznê bê dirêj bê xwendin, wê demê îmale pêk tê. Bi gotineke dî, imale, dirêjxwendina hêceyeke kurt e. Hebûna imaleyê ji helbestvan yan nazimî re wekî qusûr tê qebûlkirin. Lê ev qusûr ne di dereceya zîhafê de ye. Ji wê siviktir e. Em dê imaleyê bi sembola ( ) bidin nîşandan. Du cureyên îmaleyê hene: Îmaleya kurt û îmaleya dirêj.

CamScanner ile tarandı

1. Îmaleya Kurt (Meqsûr)

Eger dengdêrekî kurt, ji bo ku li weznê bê, dirêj bê xwendin ew dibe îmaleya kurt. Wekî ku di bêjeya "bike" de dengdêrên "i" û "e"yê dirêj bên xwendin.

2. Îmaleya Dirêj (Memdûd)

Eger dengdêrekî dirêj (wekî bêjeya "naz"ê), yan jî bêjeyeke ku bi du herfên bêdeng diqede (wekî bêjeya "eşq", "derd" û hwd.), ji bo ku li weznê bên, dirêj bên xwendin, ew dibe îmaleya dirêj. Wê demê ev hêceya dirêjkirî wekî du hêceyan tê qebûlkirin. Lê hêceya pêşî dirêj, ya duyem kurt e (= - +).

Rahênan:

Hem**dê** bê hed / bo Xudayê / 'alemîn
- + - - / - + - - - + -
(zîhaf)

(îmale)
Ew Xudayê / daye **me** dî / nê mubîn
- + - - / - + - - / - + -

(Melayê Bateyî, *Mewlûd*)

Di misraya yekem a vê beytê de, eger di hêceya "**dê**" de em zîhafê çêkin, wate wê hêceyê kurt bihesibînin, em ê bibînin ku ev misra ji behra remelê beramberî qalibê "Fa'ilatun, fa'ilatun fa'ilun" tê. Dîsa eger em di misraya duyem de, di hêceya "**me**"yê de îmalêyê çêkin, wate wê hêceyê dirêj bihesibînin, em ê bibînin ku ev misra jî beramberî heman qalibî tê. Lê eger em îmale û zîhafê nizanibin wê demê ev dê beramberî ti tef'ileyan neyên û qalibê erûzê dê dernekeve.

V. DI DÎTINA QALIBÊ ERÛZÊ DE ÇEND NÎŞEYÊN GIRÎNG

1. Eger ji ber pêdiviya kêşa erûzê herfa bêdeng a di dawiya bêjeyekê de bi herfa dengdêr a serê bêjeya pişt xwe ve bê zeliqandin û her du herf bi hev re bên xwendin, wê demê "wesl"

CamScanner ile tarandı

çêdibe. Wesl ne di kategotiya zîhaf û îmaleyê de ye û ji bo hel-bestvan ne qusûr e. Wekî mînak;

*Yek di zatê surşirînan bû cema***l û** *husn* **û** *sur*
*Yek di qelbê ehlê dil na***r û** *cela***l û** *cezbe bû*

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

2 Di qalibê behra Remelê yê bi şiklê "Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun" de, gelek caran tef'ileya pêşî bi şiklê "fa'ilatun" tê û ev wekî qusûrekî erûzê nayê hesibandin. Bo nimûne di tef'ileya yekem a misraya duyem a beyta jêrîn de ev rewş tê dîtin:

Ji ezel Heq / bi Melê da / ye ji 'eşqê / qedehek
+ + - - + + - - + + - - + - -

Ta ebed mes t û xerab im ji meya vê qedehê
- + - - + + - - + + - - + - -
(zîhaf)

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

3. Dîsa di behra remelê de tef'ileyên dawî yên qalibên wekî "Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun" û "Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun" gelek caran bi şikli "fe'lun" tê. Wekî mînak;

Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun
Pur ji dîna te xerîb im **xanim**
*Ji te ser ta bi qedem hey***ran im**

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

4. Hinek peyvên bi şedde yên ku binemaya wan zimanê Erebî ye, dema ku derbasî Kurdî bûne sivik bûne û bê şedde hatine bilêvkirin. Wekî nimûne peyva "seyîd"ê di binemaya xwe de bi Erebî ye û di Erebî de bi şedde ye (سيّد). Ev peyv dema ku bê şedde derbasî Kurdî dibe, di heman demê de heceya wê ya yekem ku di Erebî de li gorî erûzê dirêj e, di Kurdî de kurt

CamScanner ile tarandı

dibe. Lê divê em vê bizanin ku ev peyv di helbestê de ji ber weznê dikare bi şedde bê nivîsandin û hêceya pêşî jî dirêj bê xwendin. Wekî mînak;

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
'Îde û herkes muferreh ez tenê bê çare bûm
Karê 'alem 'îş û 'îşret karê min huzn û humûm
Rûreş û şerma gunah im lew ji hedret dûr(i) bûm
Raciyê lutfa te şahim ez di zenban xerq(i) bûm
Seyyidê *min rehberê min el-eman şahê Seîd*

(Şêx Qutbedînê Korikî)

Li jêrê jî "xedar" bê şedde hatiye nivîsandin.

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Ateşê şewq û muhebbet fi demîrî bûn herîn
Daxê derdê dil ***xedar*** *in jê dizin her ab û xwîn*
Sailê her dem li dergah Qutbedînê pur mehîn
Mehderê ke b'wî bibexşe 'înde fexrî'l-muslîmîn
Seyyîdê min rehberê min el-eman şahê Seîd

(Şêx Qutbedînê Korikî)

VI. DI ÇARÇOVEYA "NÛBIHARA BIÇÛKAN" DE QALIBÊN ERÛZÊ

Ehmedê Xanî yekem kes e ku di tarîxa edebiyata Kurdî de li ser kêşa Erûzê rawestiyaye. Wî di berhema xwe ya bi navê "Nûbihara Biçûkan" de, digel gelek armancên dî, xwestiye ku zarokên Kurdan fêrî kêşa Erûzê jî bike. Ji ber vê yekê em dixwazin li vir cih bidin behr û qalibên ku Xanî di vê berhema xwe de bi kar anîne. Di "Nûbihara Biçûkan" de ji 7 behrên Erûzê 13 qalib hatine bikaranîn. Xanî di her 13 beşên berhema xwe de qalibekî cuda bi kar aniye. Behrên ku di "Nûbihara Biçûkan"

CamScanner ile tarandı

de hatine bikaranîn ev in: Hezec, Remel, Recez, Muzari, Besît, Serî' û Muteqarib. Li jêrê em dê li gorî van behran cih bidin qalibên Erûzê yên ku di Nûbihara Biçûkan de hatine bikaranîn.

1. **Recez**
   - Mufte'ilun mefa'ilun mufte'ilun mefa'ilun
   - Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
   - Mustef'ilatun mustef'ilatun
   - Mufte'ilun mufte'ilun mufte'ilun mufte'ilun
2. **Hezec**
   - Mefa'îlun fe'ûlun mefa'îlun fe'ûlun
   - Mef'ûlu mefa'îlun mef'ûlu mefa'îlun
   - Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
3. **Remel**
   - Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilat
   - Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilat
4. **Mudari'**
   - Mef'ûlu fa'ilatun mef'ûlu fa'ilatun
5. **Besît**
   - Mufte'ilun fa'ilun mufte'ilun fa'ilun
6. **Serî'**
   - Mufte'ilun mufte'ilun fa'ilun
7. **Muteqarib**
   - Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl

Çawa ku tê dîtin Xanî bi 4 qaliban herî zêde cih daye behra "Recez"ê. Piştî wê bi sê qaliban behra "Hezec"ê, piştî wê jî bi du qaliban behra "Remel"ê tê. Xanî ji her çar behrên dî (Mudari', Besît, Serî', Muteqarib) cih daye qalibekî bi tenê. Ev jî nîşan dide ku Xanî jî wekî piraniya helbestvanên dî yên Kurdan herî zêde ji behrên Hezec, Recez û Remelê qalibên Erûzê bi kar anîne.

CamScanner ile tarandı

Xanî, di hemû beşan de li gorî rêbazeke hevpar û pedagojîk cih daye van qaliban. Dema em lê dinêrin em dibînin ku Xanî, di destpêka her beşekê de berî ku bikeve mijara xwe ya sereke, di her du beytên pêşî de, behsa qaliba erûzê ya ku di wê beşê de bi kar aniye kiriye. Di hemû beşan de ev her du beyt jî kirine du kategorî. Kategoriya yekem, ku beytên yekem in, ji mînakên qaliba erûzê ya wê beşê û kategoriya duyem jî, ku beytên duyem in, ji qalibên erûzê bixwe pêk tê. Beytên ku wekî mînak hatine dayîn ji aliyên naverokê ve derveyî mijara sereke ya beşan e. Di van beytan de Xanî dîsa rêbazeke pedagojîk şopandiye û di mijarên curbicur de hinek pend û şîret li zarokan kirine. Xanî di çarçoveya beytên duyem de jî rêbazeke serbixwe şopandiye. Li gorî vê rêbazê di misrayên yekem yên van beytan de cih daye qalibên erûzê ku ji binemaya "فعل" tên. Di misrayên duyem de jî cih daye navên qaliban, taybetiyên wan û xweşiya wan a di ahengê de. Bi vî awayî Xanî xwestiye ku hem ji aliyê teorîk, hem jî ji aliyê pratîk ve zarokan fêrî erûzê bike. Ji ber girîngiya wê em dê li jêrê ji bo hemû beşên Nûbihara Biçûkan cih bidin her du beytên pêşî.

Beş 1: Hezec

Heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf
Di dunyaê tu nabî ne meşhûr û ne me'rûf

Mefa'îlun fe'ûlun mefa'îlun fe'ûlun
Çi xweş wezn e bibîtin hezec mekfûf û mehzûf

Beş 2: Recez

Perde ku rabitin ji ber aridê dilistan e xweş
Dil ji xeman ku bête der bulbulê gulistan e xweş

Mufte'ilun mefa'ilun mufte'ilun mefa'ilun
Behra recez ku xebn û teyy ger bibitin rewan e xweş

CamScanner ile tarandı

Beş 3: Remel

'Arifê ku b' qenciyê me'rûf(i) bit
Dê helîm û sabir û mewqûf(i) bit

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilat
Wezn ev e hîna remel mehzûf(i) bit

Beş 4: Recez

Ger dê te meqsûdek hebî lazim divê lêbî bi lez
Xasma te me'bûdek hebî daîm di emrê wî bibez

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
Salim musemmen her ev e ey talibê behra recez

Beş 5: Recez

Her çî bi îlmê cehl kir mubeddel
Sifrê xwe wî kir bi zêr mubeddel

Mustef'ilatun mustef'ilatun
Behra recez bû çi xweş mureffel

Beş 6: Mudari'

Ey ku te kibrê daim kirye ji bo xwo merkeb
Ewwel tu bê bike "yê" paşê bigîre merkeb

Mef'ûlu fa'ilatun mef'ûlu fa'ilatun
Xweş wezn e bê melal e ger bit mudari' exreb

Beş 7: Remel

Şêx û sofitî keramet, 'ilm(i) xwendin hem 'emel
Xilwet e hucre, terîqa te şerî'et bê xelel

CamScanner ile tarandı

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilat
Xweş tu vê behrê bixwune lew ku xweş çûne remel

Beş 8: Besît
Ger te divêtin bibî mîr û ser û mu'teber
Kîzb û xilafê mebêj ger te bikin ker bi ker

Mufte'ilun fa'ilun mufte'ilun fa'ilun
Metwî ye behra besît lê bike carek nezer

Beş 9: Hezec
Herçî ku ji dinyayê berdaş(i)te damen bû
Bê şubhe di nîv 'amê evraş(i)te gerden bû

Mef'ûlu mefa'îlun mef'ûlu mefa'îlun
Wezna hezeca exreb evrenge musemmen bû

Beş 10: Recez
Ger te divêtin ku beraber nebitin kes bi te ra
'Ilm(i) bixwûn hem 'emelê tu bike sin'et ji xwe ra

Mufte'ilun mufte'ilun mufte'ilun mufte'ilun
Ev receza metwî ye, da qenc(i) bizanî tu bira

Beş 11: Serî'
Herçî kesê 'ilmekî qenc xwendiye
Dewlet e ger wî bi esil zaniye

Mufte'ilun mufte'ilun fa'ilun
Behra Serî' e çi ye xweş metwî ye

CamScanner ile tarandı

Beş 12: Hezec

Di fesla nûbiharê da digel dilber biçin geştê
Ji ew xweştir umur nabit li min ew hal qewî xweş tê

Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
Hezec salim musemmen bit li teb'a xweş muneqqeş tê

Beş 13: Muteqarib

Mu'ellim bila dil wekî ber bitin
Divêtin ku şagird(i) dilber bitin

Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl
Teqarub xweş e ger muqesser bitin

VII. MÎNAK Û RAHÊNAN

1. BEHRA "HEZEC"Ê

Binarê firqetê sohtim ji ferqê ser hta pê da
Xedenga xefletê nohtim ji berqa lami'a tê da
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Ji re'na nêrgizên te y' mest û xûnrîz
Zeman bû 'ehdê cengengîzê cengîz
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Were xanim bikuj beste bi xencer
Melê emma bi destê xwe y' mubarek

Herçî ku ji dinyayê berdaş(i)te damen bû
Bê şubhe di nîv 'amê evraş(i)te gerden bû
(Ehmedê Xanî, *Nûbihara Biçûkan*)

CamScanner ile tarandı

Xeşm li feqîran meke zû padişehê min
Pirsê bike carek li xeta û gunehê min
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

2. BEHRA "REMEL"Ê

Muhbetê mihnet di zor in hub dibêm bê şek bela ye
'Umr(i) jî xoş pê diborin sotin û derd û cefa ye
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Min di dil kovan hezar in dax û keyber bê hisab
Mihneta werdên bixar in wên di dil da sed nişab
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Şah bi qesda kuştina min rim hejandin bê sebeb
Dame çeşmê qehr û xeşmê rim li dil da ku edeb
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Gerçi bilbil cewherê zatê gul e
Lê gulê rewneq ji 'eşqa bilbil e
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Senema sur ji semed şewqê ji Heq daye wucûdê
Ger 'ezazîlî bidîta nedibir xeyrê sucûdê
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Tu dizanî bi Xudê min tu xeyal î şeb û roz
Bi xeyala xwe mudam min tu li balî şeb û roz
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Dê ji Heq cazibeyek dil bigirit wer ne Mela
Ji ezel ger tu hidayet nebit irşadê çi kit
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

CamScanner ile tarandı

Şerbeta lam û bêyan ez bi heyatê nadim
Badeya le'lê bi ava zulumatê nadim
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Were canim ku çi nazik weres in
Ji gul û nesterînan em te bes in
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Serê zulfa te bi gullabê du'a
Hate destê me bi cullabê du'a
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

3. BEHRA "RECEZ"Ê

Îro ji remza dêmdurê minnet ku min mesrûr e dil
Dilber bi fincana surê mey da me û mexmûr e dil
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Dîsa ji nû 'eşqa berê pir enderûnem ateş e
Zilfa muzeyyen 'enberî de'wa digel xala reş e
(Eliyê Herîrî)

Yek bûse bexşî ewwel bi ihsan
Axir li min kir curm û xeramet
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Ger te divêtin ku beraber nebitin kes bi te ra
'Ilm(i) bixwûn hem 'emelê tu bike sin'et ji xwe ra
(Ehmedê Xanî, *Nûbihara Biçûkan*)

CamScanner ile tarandı

4. BEHRA "XEFÎF"Ê

Pê li ser dîdeyên Melê dayîn
Xelweya sûfiyan munewwer ke

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

5. BEHRA "SERÎ'"Ê

Dil ji 'ilacê ku biderket mizac
Dê ji lebê nûş 'itabet 'ilac

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Herçî kesê 'ilmekî qenc xwendiye
Dewlet e ger wî bi esil zaniye

(Ehmedê Xanî, *Nûbihara Biçûkan*)

6. BEHRA "MUZARI'"Ê

Sernameê name namê Ellah
Bê namê wî natemam e wellah

(Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*)

7. BEHRA "MUNSERIH"Ê

Gunah û zuhd û tamat hilnagirit xerabat
Kesê bi vê derê ret divê bikit ri'ayet

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

8. BEHRA "MUTEQARIB"Ê

Tu guhdêre nutq û beyana fesîh
Ku îman û îslam û merdê melîh

(Mela Xelîlê Sêrtî, *Nehcu'l-Enam*)

CamScanner ile tarandı

9. BEHRA "TEWÎL"Ê

Selat û selamê Heq li ser zatê enwerî
Dil û rûh û ruxsarî serasre munewwer î

(Mela Ebdulkerîmî Muderris)

10. BEHRA "BESÎT"Ê

Muxbeçeyên meyfiroş her sehrê tên sema
Badexoran noş(i) noş mane li dorê cema

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

11. BEHRA "KAMIL"Ê

Eme boy nesîmî behar e ya xeberî siruştî hewayî ye
Demî ruhbexşî nigar e ya nefesî Mesîhî semayî ye

(Bêxud)

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA DUYEM
SERWA Û PAŞSERWA



Serwa û paşserwa (qafiye û redîf) digel kêşa erûzê du unsurên herî girîng ên estetîk û ahenga helbesta klasîk in. Berî ku mirov dest bi mijara teşeyên nezmê bike, pêwist e li ser serwa û paşserwayê bê rawestan. Lewra di kifşkirina teşeyên nezmê de mijara serwayê jî roleke sereke dilîze û hin teşe bi vê mijarê ji hev tên veqetandin.

Di edebiyata klasik de serwa û paşserwa bi awayekî giştî ji dubarekirina dengan a dawiya misrayan re tê gotin.

I. SERWA

Serwa di şûna peyva qafiyeyê de tê bikaranîn û ji aliyê etîmolojiyê ve têkiliya wan bi hev re heye. Di ferhengê de wateya "qafiye"yê, pişta serî ye ku ev peyv bi forma "qefa"yê derbasî Kurdî jî bûye. Peyvê piştre wateya "dawiya tiştekî" û di edebiyatê de jî wateya "dawiya beytê" bi dest xistiye. Wekî têgeheke edebî serwa/qafiye, ew aheng e ku di dawiya beytê yan jî di wî cihê ku wekî dawiya beytê tê qebûlkirin de, ji dubarekirina dengên di navbera peyvên cihêwate de derdikeve meydanê. Di helbesta klasîk de ji wan herfên ku tên dubarekirin re herfên "rewî"yê tê gotin. Hevbeşiya serwayê pêwist e di binemaya bêjeyan de çêbe.

A. LI GORÎ CIH CUREYÊN SERWAYÊ

Li gorî cihê serwayê di misrayê de du cureyên serwayê hene.

1. SERWAYA BÊPAŞSERWA

Di serwaya bêpaşserwa (redîf) de peyva ku dubrekirina dengan tê de çêdibe di dawiya misrayan de ye. Ev cureya serwayê di Kurdiya Soranî de wekî "Serwaya Kutayî" tê binavkirin. Wekî:

CamScanner ile tarandı

*Xweşreng û letîf e şubhê sorg***ul**
*Ya jar û ze'îf e mislê bulb***ul**
(Xanî, *Mem û Zîn*)

Di vê beytê de di navbera koka her du bêjeyên di dawiyê de hevbeşiya dengên "ul" heye. Ev dibe serwa. Lê piştre tu hevbeşiyeke dî tine ye. Wate li vir redîf tine ye.

*Çiqa ku dimînin di qeyda hey***at**
*Digel me ewî kir ku 'eynê nec***at**
(Mela Xelîlê Sêrtî, *Nehcu'l-Enam*)

Di vê beytê de peyvên "heyat" û "necat"ê di dawiya her du misrayan de cih girtine ku qafiye ji dengê "at"ê pêk hatiye.

2. SERWAYA BIPAŞSERWA

Di van cureyên serwayan de di dawiya misrayan de paşserwa û berî wê jî serwa cih digire. Ji ber wê jî cihê serwayê carinan nîvê misrayê, carinan jî serê misrayê ye. Eger serwa di nîvê misrayê de be, wekî "Serwaya Navekî"; eger di serê misrayê de be, wekî "Serwaya Sereta" tê binavkirin. Di pênaseyê de îfadeya "cihê ku wekî dawiya beytê tê qebûlkirin" vê yekê îşaret dike.

Wekî nimûne;

*Sabitqedem e li de'w***eta te**
*Rû daye te bext û dewl***eta te**
(Xanî, *Mem û Zîn*)

Di vê beytê de di navbera "de'weta te" û "dewleta te" de dubarekirina dengan heye. Ji ber ku "de'wet" û "dewlet" binema ne (kok in), ew hevbeşiya di nav wan de ku "et" e dibe serwa. Koma "a te" jî dibe paşserwa.

CamScanner ile tarandı

B. LI GORÎ HEVBEŞIYA DENGAN CUREYÊN SERWAYÊ

Li gorî hevbeşiya di navbera dengên di dawiya misrayan de sê cureyên serwayê hene.

1. SERWAYA MUCERRED

Serwaya ku tenê bi dubarekirina herfa rewiyê pêk tê serwaya mucerred e. Di vê cureya serwayê de herfa rewiyê bê hereke ye û berî wê herfeke bi hereke heye. Di çarçoveya alfabeya latînî de dengdêr ne piştî herfa rewiyê, berî wê tê bikaranîn. Wekî; "...kef/ ...sedef", "...ser / ...seher" û hwd.

Nimûne:

*Îro ji şehkasa surê mey hate fincana sed**ef***
*Minnet ku dîsa dêmdurê da min meya husna xwe x**ef***

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

*Derya 'ê 'işqê hate xoş dîsa ji nû bû mewc û k**ef***
*'Aşiq ji nageh bir ji hûş durdaneya fincan sed**ef***

(Mela Ehmedê Heyderî, *Dîwan*)

2. SERWAYA MUREKKEB

Serwayên ku derveyî kombînasyona serwaya mucerred tên, serwayên murekkeb in. Sê cureyên vê serwayê hene.

2.1. Serwaya Murdef

Serwaya murdef, ew serwa ye ku di xwe de herfa "rîdf"ê dihewîne. Herfên rîdfê jî "Elîf, Waw û Yê" ne. Eger yek ji van herfan bêyî ku herekeyek stendibe, beriya herfa rewiyê di serwayê de bê dubarekirin, ev dibe serwaya murdef. Wekî; "...bihar/ ... şikar" û hwd.

CamScanner ile tarandı

Nimûne:

*Da xelq nebêjitin ku ekr**ad***
*Bê me'rîfet in bê esl û biny**ad***

(Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*)

*Xema 'işqa ḥebîba min ji nû bêm**ar** kirim îro*
*Firaqa mehcebîna min ji kerban b**ar** kirim îro*

(Mela Ehmedê Heyderî, *Dîwan*)

2.2. Serwaya Muqeyyed

Serwaya muqeyyed, beriya herfa rewiyê dubarekirina herfên hemcins ên ku bêhereke ne. Weki; "...de**rd** / ...me**rd**", "...xede**ng** / ...re**ng** û hwd.

Nimûne:

*Ku îşaret bi bîşaret bidirit nexmeê ç**eng***
*Ji ruwê ayîneê dil biretin perdeê ze**ng***

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

*Tîrê di xedar in ji keman**eynê** du ebrû*
*Hemwar e dibarin ji hilal**eynê** du ebrû*

(Mela Ehmedê Heyderî, *Dîwan*)

2.3. Serwaya Muesses

Eger berî rewiyê herfeke bi hereke û berî wê jî "elîf"ek hebe "serwaya muesses" tê meydanê. Wekî "ker**amet** /îş**aret**". Di serwayên bi vî rengî de ji bo ku aheng pêk bê bi piranî di hemû misrayan de herfa "Elîf/A"yê tê dûbarekirin. Di helbesta Kurdî de serwayên bi vî rengî kêm in.

CamScanner ile tarandı

II. PAŞSERWA

Piştî serwayê û di dawiya misrayan de ji her cure tekrarên ku tên kirin re paşserwa (redîf) tê gotin. Ji helbestên bi paşserwa re "mureddef" tê gotin. Li gorî tiştên ku tên dubarekirin sê cureyên paşserwayê hene:

A. QERTAF

Di vê cureya paşserwayê de tiştên ku tên dubarekirin ji qertafan tenê pêk tên. Wekî;

*Baziyê hecrê ji nû dil rave rûyê mexleb***ê**
*Kun dikit furqet dilan hem rengê şîş û metqeb***ê**
*Zalimê çerxê behêtim ger reşadê lewleb***ê**
*Ya rebbî dîsan muyesser ke ji bo min metleb***ê**
*Bê hicabane bibînim car(i) dî dêmkewkeb***ê**

(Bateyî-Macin)

B. QERTAF Û BÊJE/KOMBÊJE

Di vê cureya paşserwayê de tiştên ku tên dubarekirin ji qertaf û beje yan jî kombêjeyan pêk tên. Wekî;

Qertaf û Bêje:

*Sabitqedem e li de'wet***a te**
*Rû daye te bext û dewlet***a te**

(Xanî, *Mem û Zîn*)

Qertaf û Kombêje:

Şox û şengê zuhrerengê ***dil ji min bir dil ji min***
Awirên heybetpilingê ***dil ji min bir dil ji min***

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

CamScanner ile tarandı

*Sorgula xunçedehen nazik nihal***a kê yî tu?**
*Mehweşa dilpîrehen şox û şepal***a kê yî tu?**
*Gulruxa sîmînzeqen fikr û xeyal***a kê yî tu?**
*Ahûya deşta xeten mişkîn xezal***a kê yî tu?**
*Nazika sîmasemen qenc û delal***a kê yî tu?**

(Macin)

C. TENÊ BÊJE/KOMBÊJE

Di vê cureya paşserwayê de qertaf tine ye. Piştî serwayê bêje yan kombêje tên dubarekirin. Wekî;

Ahî ji destê wê sirê dil ji meyê hewale ***kir***
Her çi li min kirî Mela camê meya du sale ***kir***

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA SÊYEM
TEŞEYÊN NEZMÊ

DESTPÊK

Çawa ku di destpêkê de me gotibû, lêkolîna li ser helbestê du beş in: Lêkolîna ruxsarî (şeklî) û ya naverokî (muhtewayî). Teşeyên nezmê jî wekî kêş û serwayê bi estetîk û ruxsara helbesta klasîk ve girêdayî ye. Di edebiyata klasîk a rojhilatî de helbest li gorî teşeyên xwe tên dabeşkirin. Ew tişta ku teşeyê derdixe meydanê jî kêş, serwa û yekeyên helbestê ne. Berî niha derheqê kêş û serwayê de agahî hatibûn dayîn. Li jêrê jî derheqê yekeyên herî biçûk ên nezmê de agahî dê bên dayîn.

Di edebiyata klasîk de, teşeyên nezmê yên ruxsarî sê beş in: Yên ku ji beytan pêk tên, yên ku ji çar misrayan pêk tên û yên ku ji bendan pêk tên. Teşeyên nezmê yên ku ji beytan pêk tên, yan jî bi beytan tên nivîsandin qesîde, xezel, xezela mustezad, mesnewî û hwd. ne. Em dikarin qesîde, xezel, xezela mustezad û xezela musemmet bikin beşek û mesnewiyê jî bikin beşeke dî. Yên ku ji çar misrayan pêk tên jî ruba'î û dubeytî ne. Yên ku ji bendan pêk tên jî ji "muselles"ê heta bi "mu'eşşer"ê ne ku li jêrê di vî warî de dê agahî bê dayîn. Lê berî em derbasî van teşeyan bibin, lazim e em pêşî li ser têgeha nezm û helbestê, piştre jî li ser yekeyên herî biçûk ên nezmê rawestin.

A. NEZM Û HELBEST

Ji ber ku sernavê vê binbeşê "Teşeyên Nezmê" ye û bi mebesta ku ferqa di navbera "nezm" û "helbest"ê de zelal bibe, di serî de rawestana li ser van her du têgehan pêdawîstiyek e. Di ferhengê de nezm tê wateya rêzkirinê. Ji ber ku misra li pey hev tên rêzkirin, ji vê tiştê re jî nezm hatiye gotin. Heçi şi'r (helbest) e, ew jî tê wateya têgihiştin û îdrakê. Ji ber wê jî ji wê tişta ku têgihiştin û îdrakê bixwaze re şi'r hatiye gotin.

CamScanner ile tarandı

Ji aliyê ruxsarî ve nezm jî û helbest jî wekî hev in. Lewra di her duyan de jî kêş û serwa heye. Nexwe em dikarin bêjin ku ew komepeyvên bi kêş û serwa dibe ku wekî "nezm" û dibe ku wekî "helbest" (şi'r) bên binavkirin. Ji bo ku ev biryar bê dayîn dive cudahiyên di navbera wan de bên zanîn. Ev cudahiyên di navbera "nezm" û "helbest"ê de ji du aliyan ve ne:

1. Cudahiya ji aliyê naverokê ve: Heçî nezm e, di naveroka wê de zehftir mijarên pedagojîkî, dîdaktîkî û zanistî hene. Lê heçî helbest e, di naveroka wê de zehftir mijarên lîrîk û evînî hene.

1. Cudahiya ji aliyê Ruxsarê ve: Heçî nezm e, zimanê wê sade ye, hunerên edebî tê de zehf cih nagirin. Lê heçî helbest e, zimanê wê giran e û helbestvan bi zehfî cih dide hunerên edebî.

Nexwe weki encam em dikarin weha bêjin. Hem di nezmê de hem jî di helbestê de kêş û serwa hene. Lê ew komepeyvên bi kêş û serwa eger di wan de hunerên edebî hebin, zimanên wan giran be û mijarên wan lîrîkî bin ew helbest in, eger di wan de hunerên edebî zêde tinebin yan jî hindik bin, zimanê wan sade be û mijarên wan zehftir dîdaktîkî bin ew jî nezm in. Li gorî vê îzahê hemû helbest nezm in, lê hemû nezm ne helbest in. ji bo ku nezmek bibe helbest divê bi wate û edebî be.

Di edebiyata klasîk de ji wan berhemên ku bi nezmê tên nivîsandin re "menzûme" tê gotin. Wekî mînak Ehmedê Xanî ji bo ku zarokan hînî esasên baweriyê bike, "Eqîdeya Îmanê" nivîsandiye. Dema em vê berhema Ehmedê Xanî bi nav dikin em nabêjin "Helbesta Eqîdeya Îmanê", lê em dibêjin "Menzûmeya Eqîdeya Îmanê"

Di edebiyata klasîk de helbest di dîwanan de cih digrin. Bo nimûne dîwana Melayê Cizîrî ji helbestên wî (xezel, qesîde) pêk tê. Heçî "menzûme" ne, ku bi cureya mesnewiyê tên nivîsandin, berhemên serbixwe ne. Bo nimûne menzûmeya "Bersîsê Abid" a Feqiyê Teyran wekî berhemeke serbixwe tê hesibandin. Lê wekî îstîsna carinan hinek menzûmeyên biçûk di dîwanan de jî cih di-

CamScanner ile tarandı

girin. Evana kurt in û ji bo mebestekê di dîwanan de cih digirin. Bo nimûne ji bo destnîşankirina tarîxeka nivîsandina wê dîwanê, yan jî tarîxa tiştekî dî dikevin dîwanan.

Li aliyeki dî ew berhemên serbixwe yên ku bi teşeya mesnewiyê hatine nivîsandin û mijarên wan serboriya evîndariyekê ne (lîrîkî ne) û zimanê wan jî giran e, ne di kategoriya nezmê yan jî helbestê tenê de ne. Evana ne di dîwanan de ne û zehf dirêj in. Ji van aliyan ve dişibin nezmê lê ji aliyê giraniya zimên û naverokê ve dişibin helbestê. Ji ber vê em vana wekî kategoriyeke sêyem dihesibînin. Bi piranî ev berhemên bi vî rengî wekî "Mesnewî" tên binavkirin. Bo nimûne mesnewiya "Leyla û Mecnûnê" di vê kategoriyê de ye.[217]

B. YEKEYÊN HERÎ BIÇÛK ÊN NEZMÊ

Sê cure yekeyên nezmê yên herî biçûk hene: Misra, beyt û bend. Li jêrê em dê yek yek li ser wan rawestin.

1. Mısra

Yekeya herî biçûk a helbestê û nezmê misra ye. Ji misrayê re bi Kurdî peyvên wekî "nîvmalik", yan jî "riste" tên bikaranîn. Eger misrayek ne di nav beytekê yan bendekê de be, bi gotineke dî eger ne di nav helbestekê/nezmekê de be û bi awayekî serbixwe hatibe nivîsandin, ji wê misrayê re misraya "azade" tê gotin. Yanî ew misra bi beyt, bend û helbestê/nezmê ve ne girêdayî ye û azad û serbixwe maye.

2. Beyt

Beyt ew yeke ye ku ji du misrayan pêk tê. Lê pêwist e ku her du misra bi heman pîvana kêşê hatibin nivîsandin û di navbera wan de ji aliyê mijarê ve ahengek hebe. Ji du misrayan beytek û ji çendîn beytan jî helbestek yan jî nezmek derdikeve meydanê. Beyt di helbestên wekî xezel û qesîdeyan de tê bika-

217 Mensûr Restgar Fesaî, *Enwa'ê Şi'rê Farisî*, Şîraz 1373, r. 40; Tahir-ül Mevlevî, *Edebiyat Lügatı*, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994, r. 115, 139.

CamScanner ile tarandı

ranîn ku di binbeşa "Teşeyên Nezmê" bi firehî dê li ser wan bê rawestan. Ji beytê re bi Kurdî peyvên wekî "malik", "xane", yan jî "dêr" tên bikaranîn. Eger beytek ne di nav helbestekê de, lê wekî helbesteke serbixwe bê nivîsandin ji wan re "ferd", yan jî "mufred" tê gotin. Peyvên "ferd" û "mufred"ê di zimanê Erebî de tên wateya kit û yekjimariyê. Ji ber ku beytên bi vî rengî kit mane, têkiliya wan bi beytên dî re tineye û neketine nav helbestê/nezmê de ji bo wan ev peyv hatine bikaranîn. Mufred/ferd bi piranî di dawiya dîwanan de cih digirin. Ev beyta Melayê Cizîrî ji bo "mufred"ê nimûneyek e.

Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun

Serdefterê wesfên te ye dîbaceyê dil
Yek qetre ji lutfa te ye serraceyê dil

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

3. Bend

Di edebiyata klasîk de bend, yekeyek e ku herî kêm ji sê misrayan pêk tê. Dibe ku hijmara misrayên bendan ji sisê heta bi deh misrayan biguhere ku her kategoriyek ji van navekî xwe yê taybet heye û di binbeşa "Teşeyên Nezmê" de bi firehî dê li ser wan bê rawestan. Ji bo ku ev her yek ji van kategoriyan navê bendê bisitînin, divê di nav helbestekê de wekî yekeyên herî biçûk cih girtibin. Helbestên bi vî rengî ne ji bendeke tenê, ji çendîn bendan pêk tên û hijmara misrayên hemû bendan wekî hev in û di navbera hemû bendan de ji aliyê kêş û qafiyeyê ve ahengek heye.

Hinek bendên çar misrayî carinan bi tena serê xwe dimînin û nakevin nav helbestekê de. Ji vê teşeyê re "Ruba'î", yan jî "Dubeytî" tê gotin ku dê li ser wan bê rawestan.

CamScanner ile tarandı

I. TEŞEYÊN NEZMÊ YÊN KU JI BEYTAN PÊK TÊN

Teşeyên nezmê yên ku ji beytan pêk tên sê heb in: Qesîde, Xezel û Mesnewî. Ev her sê teşe jî di nav xwe de di bin di kom. Koma qesîde û xezelê û koma mesnewiyê. Xala herî girîng ku van her du koman ji hev vediqetîne, sîstema wan a serwayê ye. Serwaya xezel û qesîdeyan bi awayê "aa, xa, xa.." ye, lê serwaya mesnewiyan bi awayê "xx, xx, xx.." ye. Li jêrê em dê di çarçoveya van her du koman de li ser vê mijarê rawestin.

A. QESÎDE Û XEZEL

1. QESÎDE

Qesîde û xezel di gelek xalên ruxsarê dee hevbeş in. Di vê hevbeşiyê de xala herî girîng sîstema wan serwayê ye. Lewra di her duyan de jî, her du misrayên beyta yekem di nav xwe de bi serwa ne, lê di beytên dî de, ji aliyê serwayê ve, misraya yekem serbest, misraya duyem jî bi beyta yekem re hevbeş e. Di teşeya qesideyê de şemaya serwayê weha ye:

1. _____a _____a beyta "metla"yê
2. _____x _____a
3. _____x _____a
4. _____x _____a
5. _____x _____a beyta "meqta" û "mexles"ê

Ji bo hijmara beytên qesîde û xezelan rêzikeke ku hemû helbestvan pê ve hatibin girêdan tine ye. Di edebiyata Kurdî de bi giştî qesîde ji pênc-heft beytan heta bi derdora 20-30 beytî pêk tê. Herçiqas di edebiyata Faris û Tirkan de hijmara xezelan ji ya qesîdeyan kêmtir be jî, di edebiyata Kurdî de bi qasî ku tê dîtin hijmara beytên xezel û qesîdeyan nêzî hev in.

Di edebiyata Kurdî de hinek qesîdeyên ji 30 beytî dirêjtir jî tên dîtin. Bo nimûne qesîdeya Melayê Cizîrî ya ku destpêka wê "Ellah Sehergaha Ezel" e, ji 284 beytan pêk hatiye.

CamScanner ile tarandı

Di beyta herî dawî, yan jî ji dawî ve di beyta duyem û hinek caran di ya sêyem a qesîde û xezelan de, helbestvan navê xwe yê taybet (yan jî navê xwe yê di helbestê de) dinivîse. Di edebiyata klasîk de ji vî navî re "mexles" tê gotin ku bi Kurdî "nasnav" e. Bo nimûne "Sewadî" mexlesa Harisê Bedlîsî, Pertew" mexlesa Mustefa Begê Mîrê Hekkarî ye. Hinek helbestvan carinan ji yekî zêdetir mexlesan bi kar tînin. Bo nimûne Melayê Cizîrî, mexlesên "Mela", "Nîşanî" û "Ehmed"; Feqiyê Teyran jî mexlesên "Mîm û Hê", "Miksî" û "Feqî" bi kar anîne. Çawa ku di helbesta jêrîn de jî xuya dibe, carinan helbestvan di du beytan de cih dide mexlesa xwe. Ji wê beyta ku tê de mexlesa helbestvan derbas dibe re, beyta mexlesê tê gotin.

Di xezel û qesîdeyan de beyta yekem, wekî beyta "metla"yê û beyta dawî jî wekî beyta "meqta"yê tê binavkirin. Beyta herî xweş a qesîdeyan wekî "beytu'l-qesîd" û beyta herî xweş a xezelan wekî "beytu'l-xezel" tê binavkirin.

Bi piranî qesîde û xezel di kategoriya helbestan de ne û di dîwanan de cih digirin. Lewra zimanê wan giran e û hunerên edebî jî di wan de zehf in.

Qesîde û xezel ji aliyê naverok û mijarê ve ji hev cihê dibin. Di qesîdeyê de bi piranî li ser pesnê desthilatdarekî siyasî, yan jî kesayetekî giregir tê rawestan. Mebesta helbestvan ji nivîsandina qesîdeyê, bidestxistina hîmayeya desthilatdar û qezenckirina piştgiriyeke malî ye. Lê gelek caran jî qesîde derheqê pesindayîna kesayetên dînî de jî tên nivîsandin.

Herçiqas mijara qesîdeyan pesindayîn jî be, helbestvan di wan de tenê li ser pesindayînê ranaweste. Helbestvan bi rêbazeke edebî hem berî pesindayînê, hem jî piştî wê li ser hinek mijarên dî jî radiweste. Ew mijarên ku di qesîdeyan de cih digirin, bi gotineke dî beşên qesîdeyê ev in.

Nesîb: Beşa girîzgahê ye. Helbestvan di vir de li ser evînê, yan jî li ser tebîetê û mijarên dî radiweste.

Medhiye: Medhiye, beşa sereke ya qesîdeyê ye. Di vir de helbestvan bi firehî li ser pesnê desthilatdar disekine.

CamScanner ile tarandı

Texezzul: Di vê beşê de ji bo ku monotonî ji holê rabe, helbestvan xezelekê dixe nav qesîdeyê de.

Fexriye: Helbestvan di vê beşê de bi xwe şanaziyê dike û xwe ji helbestvanên dî mezintir dibîne.

Di'a: Di'a beşa dawî ya qesîdeyê ye. Helbestvan di vê beşê de ji kesê ku pesnê wî dide re di'a dike.

Lê divê bê gotin ku, helbestvan bi van mijaran tevan re ne girêdayî ye û ew heta dereceyekê azad e.

Li jêrê wekî nimûne em dê cih bidin qesîdeyeke Melayê Cizîrî ku ji bo mîrê mîrnişîniya Cizîra Botan nivîsandiye.

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1 *Ey şehinşahê mu'ezzem, Heq nigehdarê te bî*
Sureyê "înna Fetehna" dor û madarê te bî

2 *Her kenarê pê ve wergêri 'inanê himmetê*
Zuhre bî peykê te û keywan rikêbdarê te bî

3 *Daîma menzilgeha sûra te bit birca Şeref*
Tali'ê ferxunde û bextê se'id yarê te bî

4 *Seb'eyê seyyare û neh çerxê sergerdan bi vê*
Gerdiş û dewrê 'eceb der xizmet û karê te bî

5 *Mahîtaba dewletê yek pertewek şem'a te bit*
Afîtaba ref'etê berqek ji enwarê te bî

6 *Lami'ê fetha ezel berqê ji ber tacê te dit*
Kewkeba se'da ebed necmek ji seyyarê te bî

7 *Berqê subbûhi ku îşraqê li sed canan didit*
Ew ku keşfa dil dikit remzek ji esrarê te bî

CamScanner ile tarandı

8 *Rayeta fethê ji nesra te ku her menşûr(i) bû*
Şehsiwarê ferrê subhani 'elemdarê te bî

9 *Ney tinê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê te bin*
Sed wekî şahê Xurasanê di ferwarê te bî

10 *Ger çi der iqlîmê rabi' hate textê seltenet*
Padişahê heft(i) iqlîman selamkarê te bî

11 *Çîmena siltaniyê yek laleyek baxê te bit*
Gulşena xaqaniyê xarek ji gulzarê te bî

12 *E ji emrê tey mukerrem serkeşî kit şibhê şem'*
Ber serê tîxê te û meqtûlê mûkarê te bî

13 *Şahibaz er çend(i) perwazê bi bala bêt û ret*
Dê di nêv tûra te bit û seydê şunqarê te bî

14 *Şahê pirheybet didêrit lê bi sehmê zêde yî*
Sa'eta xeflet xuya bî kûz di bin barê te bî

15 *Her serê dewlet hebit dê her di nêv benda te bit*
Her kesê aqil bitin dê her di çokarê te bî

16 *Ê divêt azade bit dê çehvenêrê lutfa te bit*
Her çi îstixna di dil ber minnet û parê te bî

17 *Her kesê qestek di dil dê qestê dergahê te kit*
E di xatir ercû kit dê her ricakarê te bî

18 *Ê ne dewletxwahê Hezret bit ji nêva can û dil*
Şibhetê ehlê şeqa ber qehr û azarê te bî

19 *Ma bi 'îş û noş û şahî ew qeder 'umrê te bit*
Çendekê salik mucedded bêt û bêzarê te bî

CamScanner ile tarandı

20 *Her kesê ne j'can du'agoy û senaxwanê te bit*
Girtiyê qeyda te û amancê nûbarê te bî

21 *Medrekê 'ilmê demîrê şemmeyek wesfa te hat*
Wer ne key 'alem bi şe'nê qedr û miqdarê te bî

22 *Qest û daxwaza* ***Melê*** *daim ji can û dil ev e*
Her di benda xizmetê pêşdestê dîdarê te bî
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

2. XEZEL

Xezel ji aliyê ruxsarê ve di gelek xalan de bi qesîdeyê re hevpar e ku di mijara qesîdeyê de em li ser vê mijarê rawestiyabûn û me xalên wan ên hevbeş nîşandabûn.

Herçiqas di edebiyata Farisî û Tirkî de hijmara beytên xezelan ji yên qesîdeyan kêmtir be jî, di edebiyata Kurdî de tam ne wisa ye. Di edebiyata Kurdî de, bi qasî ku tê dîtin, hijmara beytên xezel û qesîdeyê nêzî hev in. Mirov dikare bêje ku di edebiyata Kurdî de xezel jî wekî qesîdeyê bi giştî ji pênc-heft beytan heta bi derdora bîst-sih beytî pêk tên.

Di xezelê de jî şemaya serwayê wekî ya qesîdeyê bi awayê (aa, xa ...) yê ye. Herweha di termînolojiya "mexles", "metla" û "meqta"yê de jî xezel bi qesîdeyê re hevbeş e.

1. _____a _____a beyta "metla"yê
2. _____x _____a
3. _____x _____a
4. _____x _____a
5. _____x _____a beyta "meqta" û "mexles"ê

Xezel jî wekî qesîdeyê di kategoriya helbestan de ne û di dîwanan de cih digirin. Lewra hem zimanê wan, hem jî mijarên wan giran in.

CamScanner ile tarandı

Mijara xezelê ya sereke eşq e. Lê digel vê xezelên ku bi mijarên cuda jî hatine nivîsandin hene. Di vê çarçoveyê de eger mijara xezelê tesewif be, ew "xezela sûfiyane" ye; eger hikmet û felsefe be, ew "xezela hekîmane" ye; eger daxwaza xweştiviyê û taybetiyên endama wê be, ew "xezela şûxane" ye; eger çêj û zewqên dinyayê bin, ew "xezela rindane" ye; eger kêf û izdiraba ji eşqê be ew "xezela aşiqane" ye.

Li jêrê em cih didin xezeleke şûxane ya Melayê Cizîrî:

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1 *Çîn çîn kirin zilfên siya kesk etlesa dîba qeba*
Êdi nîşan nabin xuya têkil kirin lazim seba

2 *Min dî seba dayê seher madarê bedrê kir du ker*
Qews û qezeh jê hate der dîsa bi zulfan ra teba

3 *Îro ji me l'bedra temam 'enberfeşan bin sed selam*
Ey hudhudê şîrîn kelam ehlen we sehlen merheba

4 *Min dilberek wek dur heye mehbûbê şîrîn sur heye*
Husn û cemalek pir heye Belqissifet mesken Seba

5 *Şox û şepala meyperest ew zalima hişyar û mest*
Vê nameyê xef dê vi dest "fi teyyiha neşru'n-neba"

6 *Bêj ew şirîna surperî durdaneya ez muşterî*
Ka ehd û peymana berb befayde çûn şubhê heba

7 *Me d'vê periya dilberê lê hê bi uslûba berê*
Lê kifş bibîte j'pencerê bê û biçit teşbihê ba.

8 *Dilber mecala name dî nasî ku nîşana me dî*
Nûnek mixalif tê nedî "hel qelbuha nehwî seba"

CamScanner ile tarandı

9 *Neyşekera s'pi dest û zend zanim mecala name xwend*
Lêvan tebessim kir ji qend "maset ke banin fi ruba"

10 *Qasid bi meqsûda me hat ba mujde û emr û berat*
Nîşan hinarin hem xelat şehzadeya gulgûn qeba

11 *Îro mecal lê hat û wext disa ciwan bû min di rext*
Ew lami'a dayî ji text "ma kane berqen xulleba"

12 *Selwa rewan zerrînwereq çîçek* ***Melê*** *dîn sed neseq*
"Yaqûtuha yehki'ş-şefeq yehkî 'uqûden kewkeba"

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Li jêrê jî em cih didin xezeleke sûfiyane ya Seyîd Qedriyê Cizîrî:

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1 *Ah û nalên dil ji kû tên ma çi zanin bu'l-hewes*
Waqifê esrarê Heq zanin bi nalînên ceres

2 *Der serayê xelwet im şahim heqîqet nist(i) xeyr*
Ez cunanem cuz ruwî wey qet nemîmeylem bi kes

3 *'Ûd û tenbûr berkevem dilber muqabil hate reqs*
Ber tu ey dil seyr(i) kun ev reqs û ev awaz(i) bes

4 ***Qedriya*** *dil wadiyê Eymen çira ye lew me seyr*
Nûrê nûr der şûşeê can dî bi ummîdê qebes

5 *Dest be dest yara şirîn em der sefer bazan û seyr*
Her du bazî per dibin emma bi awaz û hewes

CamScanner ile tarandı

6 *Wek Şirîn nezmê te dil-ara û lu'lu kes nedî*
Tali'ê şi'ra me da ez himmetê 'Îsa-nefes

7 *Sebr eger bînî li deryayê kerem da bête coş*
Ez Husameddîn teleb kon ***Qedriya*** *canane res*

(Seyîd Qedriyê Cizîrî, *Dîwan*)

Ji aliyê ruxsarê ve jî hinek cureyên xezelê hene ku li jêrê em dê ji wan cih bidin xezela mustezad û xezela musemmet.

2.1. XEZELA MUSTEZAD

Çawa ji navê wê tê fêmkirin xezela mustezad cureyek ji teşeya xezelê ye. Ferqa wê ji xezelê ew e ku li dawiya her misrayekê, misrayeke kurt tê zêdekirin. Ji xwe xezela mustezad tê wateya "xezela lêzedekirî". Ev misraya zêde wekî "ziyade" tê binavkirin.

Kêşa "ziyade"yê ji her du tef'ileyên pêşî û dawî yên kêşa misraya dirêj pêk tê. Bo nimûne di helbesta jêrîn de kêşa misraya dirêj "Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun" e. Ji ber wê kêşa "ziyade"yê (misraya kurt), dê "Mef'ûlu Fe'ûlun" be.

Ji aliyê serwayê ve, çawa ku di şemaya jêrîn de jî xuya dibe, misraya kurt bi misraya dirêj re hevbeş e.

1. _____a __a _____a __a
2. _____x __x _____a __a
3. _____x __x _____a __a

Xezela mustezad jî wekî xezelên xwerû li ser mijarên curbicur tên nivîsandin. Bo nimûne ev nimûneya li jêrê sûfiyane ye.

Di edebiyata Kurdî de helbestvanên wekî Ehmedê Xanî, Salim û Seydayê Licî bi vê teşeyê helbest nivîsandine. Di dîwana Seydayê Licî de du xezelên mustezad hene ku li jêrê wekî mînak em dê cih bidin yekê ji van.[218]

218 Mela Mihemedê Lîceyî, *Dîwana Hadî*, Amd. Tehsîn Î. Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2012, r. 38-40, 66-68; Herweha bnr. Zeynelabidîn Amidî, *Mecma'u'l-Qesaid*, Diyarbekir 1995, (destxet), wr. 18-20.

CamScanner ile tarandı

Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun
Mef'ûlu Fe'ûlun

1 *Ellah çi 'eceb narekî xeddar deranî*
Sohtî bi wî canî
Neqqaşê ezel neqşê bedî'ek li wî danî
Heyrî di dumanî

2 *Herçi ku ji 'işqê nebit ew me'denê enwar*
Hem mexzenê esrar
Bê faîde dê her biçitin 'umrê zemanî
Meqnizanî

3 *Qesda te ye ger tu bikî islaha di nefsê*
Mehfûz bike ricsê
Rabe bi edeb meş ke bi nik şahê cîhanî
Geylaniyê sanî

4 *Sed sondê dixwim ez bi wan ebruwê hîlalî*
Tu 'eynê cemalî
Qet nîne bi mislê te tebîbê dil û canî
Qutbek di vî anî

5 *Her rojê li ser bamê xerabatê çi xweş tê*
Ew hûra bihiştê
Her gav bi 'uşşaqî didit raha cinanî
Hey kir'ye cenanî

6 *Xew nayête çavan ku bibînim wî di xew da*
Bed tali'ê peyda
Xweş bext e ku dilber veke berqe' bi 'eyanî
Dil şake nihaî

7 *Herkes ku cemala te wî dî bi 'eynê qulubê*
Safî ji 'uyûbê
Memlû bibe dil wî ji mebanî û me'anî
Wek seb'ê mesanî

CamScanner ile tarandı

8 *Wî tel'etê gulnarî veke dil ke kebab e*
Der 'ehdê şebab e
Kesek bide bende ji meya le'lê Yemanî
Mehbûbê zeman î

9 *Ez kuştî û mecrûhê ewan çeşmê du sad im*
Xaib ji mirad im
Carek tu bi ser kuştiyê xud res bi rewanî
Îhya ke wî fanî

10 *Ez bendeyê naçar û segê derge me her dem*
Tu şahê sifet Cem
Camek ji meya tel'et û xeddeynê rumanî
Îhsan ke tu canî

11 *Xweş dêm e ku dî me tu dibe bedra munîr e*
Hem nûra zemîr e
Loqmansifet î xweş dikî emrazê nihanî
Tu şahê Hezan î

12 *Tu şah î li Serhedê heta biçite Beriye*
Ev xelq û beriye
Bilcumle ji te dîtine esrar û me'anî
Tu yî behra 'umman î

13 *Her lehze wekî kebkê derê tu ke bi meş tê*
Dil xweş e û geş tê
Weqta wekû sohbet dikî tu sirr û 'elanî
Feyz tê wekî kanî

14 *Qitmîrsifet ser li berê 'utbeyê yar im*
Her çende nezar im
Lew yudrib bi's-seyfî fuadî we cînanî
La utwî 'inanî

CamScanner ile tarandı

15 *Tu sahibê enfas î di qudsî û uweysî*
Nas î te nenasî
Tu mexzenê eltaf î çi zanit bi çi şanî
Ev munkirê sanî

16 *Her yek bi umîdek dike ew geşt û guzar e*
Der kûh û diyar e
Mecnûnsifet im terk kirim amal û emanî
Der 'işq û ciwanî

17 *Her çend li vê etrafê hebûn gelek meşayîx*
Bûn bê ber û nî bîx
Hîna ji resûlan kire teşrîf bi keyanî
Ew qutbê heqanî

18 *Hezan da Xweda qutbekî Dawan û Hezan da*
Yek dî jî nîşan da
Geylaniyê sanî ye bi nam û bi nîşanî
Rebbanê mebanî

19 *Der bû te ê hicran heliya qelbê ze'îf e*
Bû jar û nehîf e
Xweş tali'ê se'd e ku ji enfasê dehanî
Neqşek li wî danî

20 *Xweş zat î çi mimkin bikim ez wesf û beyan e*
Ev xett û nîşan e
Xweş dilber û canan î tu hem rûh û rewan î
Hem şehdê zeban î

21 *Ez kelbê derê Şahê Resûlanê Hezan im*
Her çend nizanim
Rehmê li Muhemmed ke bi seyda kî tu kanî
Feyzê ra tu kanî

(Seydayê Licî, *Dîwan*)

CamScanner ile tarandı

2.2. XEZELA MUSEMMET

Xezela musemmet cureyek ji xezelê ye û hemû taybetiyên xezelê di xwe de dihewîne. Lê di xezelên musemmet de beytên xezelê di nav xwe de jî bi serwa ne ku dema mirov wan serwayan li bin hev rêz bike, murebbayek derdikeve meydanê. Ji ber wê jî di van cureyên xezelan de pêwist e qalibên erûzê yên ku bibin çar parçe bên bikaranîn. Ji xwe ji ber ku murebba cureyek ji musemmetan e, ji xezelên bi vî rengî re xezelên musemmet hatiye gotin. Li jêrê wekî nimûne em cih didin xezeleke bi vî cureyî.

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun

1 *Dilberê îro seher avête cergê min du dox*
Yek li sîne, yek li dil da lew ji min tên ax û ox

2 *Ah û oxên min ji dil tên lê ji ber tîra qizil tên*
Yan ji kovanên di kul tên jê dizêt her xûn û zox

3 *Xûn ji dil cû cû rewan tê wek 'eqiq û erxewan tê*
Lê ji dest selwa ciwan tê ew şepala şeng û şox

4 *Ew şepala şox û şeng e kafira rom û freng e*
Da me ber cotek xedeng e zalimê kuştim bi dox

5 *Zalimê kuştin şepalê nazikê qencê delalê*
Bûn hîcaba zilf û xalê êdek û ala û tox

6 *Netrik û tayên bi rêşi ê di zêr in pê ve wêşi*
Min du fêris din di pêşi mirwet û insafî yox

7 *Lew heriftim ez ji meylê şubhetê sehl û suheylê*
Muhbet û işqa di Leylê ez kirim yekser pilox

CamScanner ile tarandı

8 *Dest nehêlim ez ji dînê şibhê Ferhad û Şêrînê*
Wer ji ber 'işq û evinê min di rê çit ev kilox

9 *Suhbeta çerx û sema tê wek* **Melê** *sed mubtela tê*
Zemzem û ava heyatê muşteri sed şex û şox

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

B. MESNEWÎ

Mesnewî, di edebiyata klasîk de ji teşeyên nezmê yên ku ji beytan pêk tên formeke herî zêde berbelav û naskirî ye. Wekî têgeheke edebî, mesnewî ew teşeya nezmê ya ku hemû beytên wê bi heman qalibê erûzê tên nivîsandin û her beyteke wê di nav xwe de hemserwa ye. Ji ber ku di mesnewiyan de du misrayên her beytekê misra di nav xwe de hemserwa ne, ji vê cureyê re mesnewî hatiye gotin. Lewra peyva mesnewiyê di zimanê erebî de tê wateya dido dido.

Li jêrê di çarçoveya taybetiyên mesnewiyê yên ruxsarî û naverokî em dê li ser vê mijarê rawestin.

1. TAYBETIYÊN RUXSARÎ

Çawa ku di şemaya jêrîn de jî xuya dibe, di mesnewiyê de ne tenê her du misrayên beyta pêşî di nav xwe de bi serwa ne, belkî di hemû beytan de her du misra di nav xwe de bi serwa ne. Ev sîstema serwayê rehetiyekê dide xwediyê mesnewiyan. Lewra mesnewî li gorî xezel û qesîdeyan gelekî dirêj in. Eger serwaya wan wekî ya xezel û qesîdeyê di nav qalibekî de be ku helbestvan xwe pê ve girêdayî hîs bike, wê demê helbestvan dê di pêkanîna wê serwayê de gelekî zehmetiyê bikişîne. Lê dema ku serbest be, helbestvan dê zehmetiyê nekişîne.

1. _____x
2. _____x _____x
3. _____x _____x
_____x _____x

CamScanner ile tarandı

Hijmara beytên mesnewiyê ji yên xezel û qesîdeyê gelekî zêdetir in. Ev hjjmar pirê caran bi sedan, carinan jî bi hezaran tê îfadekirin. Mesnewiyên ku bi vî rengî dirêj in, berhemên serbixwe ne. Lê carinan di dîwanan de hinek mesnewiyên kurt jî (bo nimûne bi qasî xezelekê) tên dîtin.

Ji ber ku hijmara beytên mesnewiyan zehf zêde ne, di mesnewiyan de qalibên dirêj ên kêşa erûzê nayên bikaranîn. Mesnewî bi qalibên sivik û kurt yên erûzê tên nivîsandin. Wekî,

Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl
Mefa'ilun mefa'ilun fe'ûlun
Mef'ûlu mefa'ilun fe'ûlun

Ji ber ku berhemên ku bi teşeya mesnewiyê hatine nivîsandin dirêj in, helbestvan di hişê xwe de li gorî mijaran tesnîfekê çêdike û her mijarekê dike beşek û ji bo her beşekê jî sernavekî didane. Ev sernav ji pêxşaneke bi secî tê meydanê. Hijmara van beşan jî li gorî dirêjiya mesnewiyê diguhere. Bo nimûn Mem û Zîna Ehmedê Xanî ji 60 beşî pêk hatiye û ji bo her beşekê sernavek hatiye bikaranîn.

Berhemên ku bi teşeya mesnewiyê hatine nivîsandin ji aliyê tertîb û plansaziyê ve ji sê beşên sereke pêk tên: Beşa Destpêkê, Beşa Mijara Sereke û Beşa Xatîmeyê/Encamê.

1. Beşa Destpêkê

Helbestvan berî ku dest bi mijara sereke bike di beşa destpêkê de cih dide çendîn mijarên pêwist ku her mijarekê dike binbeşek. Derheqê van mijaran de rêzikeke ku helbestvan xwe pê ve girêdayî hîs bike tine ye. Lê digel vê jî bi piranî di beşa destpêkê de ev mijar cih digirin:

a. Tewhîd

Di vê binbeşê de helbestvan li ser yekîtiya Xwedê radiweste. Binbeşa Tewhîdê destpêkirina bi navê Xwedê îfade dike. Ev binbeş di berhemên pexşan de beramberî "Besmele"yê tê.

CamScanner ile tarandı

b. Munacat

Di vê binbeşê de helbestvan ji Xwedê gazî, lava û diayan dike. Binbeşa Munacatê di berhemên pexşan de beramberî "Hemdele"yê tên.

c. Ne't

Di vê binbeşê de helbestvan pesnê Cenabê Pêxember dide. Ev binbeş di berhemê pexşan de beramberî "Selwele"yê tê.

d. Medhiye

Di vê binbeşê de helbestvan pesnê desthilatdarê serdema xwe yan jî kesekî girîng dide.

e) Sebebê Te'lîfê

Di vê binbeşê de helbestvan sebebê nivîsandina berhema xewe tîne zimên.

2. Beşa Mijara Sereke

Piştî beşa destpêkê îcar helbestvan dest bi mijara sereke dike. Berhem derheqê kîjan mijarê de hatibe nivîsandin, helbestvan di vê beşê de behsa wê mijarê dike. Ji her sê beşan a herî dirêj ev beş e. Lewra hijmara binbeşên wê zêde ne.

Carinan di beşa mijara sereke de helbestvan cih dide hinek xezelan. Ji bo vê terzê Seyfilmilûka Siyahpoş nimûneyeke baş e.

3. Beşa Xatîme/Encamê

Di beşa Xatîmeyê de helbestvan dawî li berhema xwe tîne û ji xwendevanan dia dixwaze. Di vê beşê de derheqê tarîxa nivîsandina berhemê, hinek zanyariyên malbatî û hwd. de jî agahî cih digirin.

2. TAYBETIYÊN NAVEROKÎ

Teşeya mesnewiyê di hemû mijarên dirêj de tê bikaranîn. Bi taybetî serpêhatiyên du evîndaran (aşiq û me'şûq) bi vê teşeyê hatine nivîsandin û ew cureyên berheman ne wekî menzûme, wekî "mesnewî" hatine binavkirin. Her weha mijarên dîdak-

CamScanner ile tarandı

tîkî, exlaqî, dîrokî, dînî û hwd. jî bi vê teşeyê hatine nivîsandin

Li jêrê wekî mînak navên hinek menzûmeyên ku di edebiyata Kurdî de bi teşeya mesnewiyê hatine nivîsandin hatine dayîn.

1. "Mem û Zîn"a Ehmedê Xanî: Mîjara wê evîndarî ye.

2. "Leyla û Mecnûn"a Siwadî: Mijara wê evîndarî ye.

3. "Yûsuf û Zelîxa"ya Selîmê Silêman: Mijara wê qiseya Yûsif Pêxember e.

4. "Mewlûd"a Melayê Bateyî: Mijara wê jidayîkbûna Cenabê Pêxember e.

5. "Nehcu'l-Enam"a Mela Xelîlê Sêrtî: Mijara wê pend

6. "Rewdetu'n-Ne'îm"a Şêx Ebdurehmanê Axtepî: Mijara wê mi'raca Cenabê Pêxember e.

7. "Siyera Cenabê Pêxember"a Mela Nûrullehê Kodişkî: Mijara wê jînenigariya Cenabê Pêxember e.

Mînak 1:

Li jêrê em dê cih bidin Xatîmeya "Nehcu'l-Enam"a Mela Xelîlê Sêrtî:

Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl

Xelîlê qe ev terz bida'et nebû
Welê ew bi fermana exê xwe bû

Ewî nav(i) lê danî "Nehcu'l-Enam"
Welêkîn ku pê muntefî' bin 'ewam

Eya wa'izê zu'l-fesad û hilak
Tu hemdê Xwedê ke 'ela ma hedak

CamScanner ile tarandı

Ilahî digel me bi lutfa xwe kî
Heçî ku sewab e muyesser bikî

Me nespêre nefsa me ya bed-'emel
Ew e a me waqi' dikit der xelel

Çiqa ku dimînin di qeyda heyat
Digel me ewî kir ku 'eynê necat

Di hengamê nez'ê me hişyar(i) ke
Le'în û munafiq ji me dûr(i) ke

Nebî pêşî destê xwe me rûsiyah
Nezanîne em dê çi bêjine Şah

Di yewmi'l-qiyame me dil-şad(i) ke
Bi yunma Muhemmed me derbaz(i) ke

Gelek hêvîkarê liqae te yin
Me bê behr û muflis nekî bende yin

Me da û we babê di me mu'minan
Digel ê wekû bo me bêjit du'an

Efû kî ilahî bi sidq û sefa
Bibî cennetê tabi'ê Mustefa

Mînak 2:

Li jêrê em dê cih bidin çend beytên pêşî ji Mewlûda Melayê Bateyî:

Hemdê bê hed bo Xudayê 'Alemîn
Ew Xudayê daye me dînê mubîn

CamScanner ile tarandı

Em kirine ummeta xeyru'l-beşer
Tabi'ê wî muqtedayê nam(i)wer

Mînak 3:

Li jêrê em dê cih bidin çend beytên pêşî ji Mewlûda Melayê Xasî ku bi Kurdiya Zazakî ye:

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Ez bi bismillahi îbtîda kena
Raziqê aman û xasan p'ya kena

Rebbî hemd û Şikrî ancax to rê bê
Kîbr û medh û fexrî pîro to rê bê

Çende ray bê masîwa bi hemdê ma
Labelê nêrê hîsaban çendê ma

Hemd û şukrê to eda qet nêbenê
Ma ser a Rebbî ti zanê vînenê

CamScanner ile tarandı

II. TEŞEYÊN NEZMÊ YÊN KU JI ÇAR MISRAYAN PÊK TÊN

A. RUBA'Î

Ruba'î jî wê nezma ku jî çar misrayan tenê pêk tê û bi kêşeke taybet tê nivîsandî re tê gotin. Ruba'î peyveke Erebî ye û tê wateya wê tişta ku jî çar pêkhateyan pêk tê. Di Kurdî de dikare wekî "çarbare", yan "çarîne" bê binavkirin.

Rubaî carinan wekî du beytên pêşî yê xezelekê (aaxa), carinan wekî du beytên navîn ê xezelekê (xaxa) tê serwakirin, carinan jî her çar misrayên wê di nav xwe de hemserwa ne (aaaa). Di edebiyata klasîk de jî vê cureya dawî re "Ruba'iya muserre'" jî tê gotin ku ruba'iyên Melayê Cizîrî bi vî rengî ne.

Di edebiyata Îranê de kêşa ku ruba'î pê tê nivîsandin taybet e. Ruba'î tenê bi behra hezecê tê nivîsandin. Lê 24 qalibên wê hene. Jî van qaliban 12 qalib bi tef'ileya "mef'ûlu" û 12 qalib jî bi tef'ileya "mef'ûlun" dest pê dikin. Jî koma "mef'ûlu" re "exreb" û jî koma "mef'ûlun" re "exrem" tê gotin.

Exreb

1. mef'ûlü mefa'îlü mefa'îlün fa'
2. mef'ûlü mefa'îlü mefa'îlü fe'ûl

Exrem

1. mef'ûlün fa'îlün mefa'îlün fa'
2. mef'ûlün fa'îlün mefa'îlü fe'ûl

Di ruba'iyan de jî ber ku helbest di çar misrayan de diqede, divê nivîskar hizra xwe jî di çar misrayan de biqedîne û mesajeke yekpareyî bide.

Di edebiyata Kurdî Melayê Cizîrî di vî warî de girîng e.

CamScanner ile tarandı

mefûlü mefa'ilü mefa'ilün fe'ûlun

Peyxam û beşaret bi îşaret me gehîştê
Nazikzeriyê surperiyê hûrsiriştê
Remza du hîlalan xet û xalan qed û qiştê
Nadim bi şemalên bi şepalên di bihiştê
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

Mefûlü mefa'ilü mefa'ilün fe'ûlun

Ellah çi şirîn î çi nebat î çi heyat î
Mehbûb(i) wekî dîn e dibêjim but û lat î
Ya sûretê rûh î tu ya pertewê zat î
Dîdar(i) me pur dîne li derdê me tu hatî
(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

B. DUBEYTÎ

Dubeytî jî wekî ruba'iyê teşeyek e ku ji çar misrayan pêk tê. Ji ber ku dişibe du beytên pêşî yên xezelekê jê re "dubeytî" hatiye gotin. Herçiqas li cem ereb û tirkan peyva "dubeytî"yê wekî peyveke farisî tê qebûlkirin jî, ev cure hê di sedsala Xan de ji aliyê helbestvanên Kurd ên Kurdistana Rojhilat ve (Îran) hatiye bikaranîn. Kesên wekî Baba Tahirê Uryan (k.d.1010) Baba Serhengê Dewdanî (k.d.1007) bi vê teşeyê helbest nivîsandine. Loma jî, herçiqas ev peyv wekî form di nav zimanê farisî de digunce jî aşkere ye ku ev peyv pêşî ji aliyê kurdan ve hatiye bikaanîn.

Dikare bê gotin ku dubeytî di du xalan de ji ruba'iyan vediqetin:

1. Di serwayê de: Di ruba'iyan de sê cureyê serwayê hene. Lê di dubeytiyan de cureyek tenê heye. Di dubeytiyan de misrayên yekem, duyem û çarem hemserwa ne, ya sêyem ji wan cihê ye (aaxa).

CamScanner ile tarandı

2. Di kêşê de: Dubeytî bi kêşa erûzê ji behra Hezecê li ser wezna "Mefaîlun mefaîlun feûlun" tên nivîsandin. Lê ruba'î li ser weznên "exreb" û "exrem"ê bi 24 qaliban tên nivîsandin.

Di edebiyata kurdî nûnerê herî kevin û girîng ê dubeytiyan Baba Tahirê Uryan (k.d. 1010) e. Baba Tahir dubeytiyên xwe bi Kurdiya Lorî nivîsandine. Di Kurdiya Kurmancî de Weda'î di vî warî de derketiy pêş. Di dîwana Weda'î de 28 heb dubeytî hene.

Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun

Dilê mu xeyrê te dilber negîre
Bi cayê cewherî cewher negîre
Dilê mu sûte mihrê te azer
Benê nasote azer dernegîre
(Baba Tahirê Uryan)

Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun

Dilem ez 'ışqê xûban gêc û wêc e
Muje berhem zenem xûnawe rêce
Dilê aşiq mîsalê çopê ter be
Serî soce serî xûnabe rêce
(Baba Tahirê Uryan)

Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun

Bê te ser der girîban im şew û roc
Sirişk ej dîde baranim şew û roc
Ne bîmar im ne cayim mî kero derd
Hemî danum ki nalan im şew û roc
(Baba Tahirê Uryan)

CamScanner ile tarandı

Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun

Bê te gulşen çi zindan e bi çeşmem
Gulistan azeristan e bi çeşmem
Bê te aram û 'umrê zindeganî
Heme xab û perîşan e bi çeşmem
(Baba Tahirê Uryan)

Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun

Bi mislê te nehin mewzûn û dîba
Di libsê etles û xara û dîba
Ez im armancê tîrê qews(i) ebrû
Bike derman birîna min tebîba
(Weda'î)

Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun

Xerîb im bênewa bêyar û bêkes
Dibûrînim fixan ez çerxê etles
Hemî alem dizanin meqseda xwe
Ji herdu alem min tu wî bes
(Weda'î)

CamScanner ile tarandı

III. TEŞEYÊN NEZMÊ YÊN KU JI BENDAN PÊK TÊN / MUSEMMET

Di edebiyata klasîk de bend, yekeyeke nezmê ye ku herî kêm ji sê misrayan pêk tê. Hijmara misrayên bendan ji sisê heta bi deh misrayan dikare biguhere. Carinan ji deh misrayan zêdetir jî çêdibe. Ji van helbestên ku ji bendan pêk ten re di edebiyata klasîk de "musemmet" tê gotin. Di zimanê Erebî de jî dura ku bi tayê ve hatiye rêzkirin re "musemmet" tê gotin. Menzûmeyên ku ji bendan pêk tên ji aliyê xweşikayiyê ve bi wan duran hatine şibihandin.

Di van cureyên helbestan de ya girîng ew e ku helbest ne ji bendekê tenê, ji çendîn bendan pêk bê (ji 4 heta bi deh beytan û hê zêdetir), hijmara misrayên hemû bendan bi qasî hev bin û di navbera hemû bendan de ji aliyê kêş û qafiyeyê ve ahengek hebe.

Di edebiyata klasik de teşeyên nezmê yên ku ji bêndan pêk tên ev in: Muselles, murebba, terbî, muxemmes, texmîs, museddes, tesdîs, musebba, tesbî, musemmen, tesmîn, mutessa, tetsî', mu'eşşer, te'şîr, terkîb-bend û tercî'-bend.

Ewliya Çelebî, dema di sala 1642an de çûye Îmadiyeyê (navenda herêma Behdînan) dibêje ku ji aliyê helbestvanên Îmadiyeyê ve bi teşeyên muselles, murebbe', muxemmes, museddes, musebbe' û musemmenan gelek helbest hatine nivîsandin.[219]

Ev teşe, li gorî jimara misrayên bendan û qafiyeya wan di nav xwe de dibin du kom.

A. KOMA YEKEM

Di vê komê de hijmara misrayên bendan ji sisê heta bi deh misrayan dikare biguhere. Di musemmetan de serwa weha ye: Benda yekem di nav xwe de hemserwa ye. Bendên dî jî, mis-

219 Evliya Çelebî, Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahetnamesi, YKY, Istanbul, 2010, b. II, r. 711-713.

CamScanner ile tarandı

rayên dawî ne tê de, di nav xwe de bi serwa ne. Bi gotineke dî di bendên dî de her sê misrayên pêşî hemsewa ne. Misrayên dawî yên hemû bendan jî bi benda yekem re hemserwa ne.

Teşeyên nezmê yên ku dikevin vê komê 13 heb in:

Jimara Misrayan	Helbestvanek	Du Helbestvan
Teşeyên Sêmisra:	muselles	-
Teşeyên Çarmisra:	murebba	terbî
Teşeyên Pêncmisra:	muxemmes	texmîs
Teşeyên Şeşmisra:	museddes	tesdîs
Teşeyên Heftmisra:	musebba	tesbî
Teşeyên Heştmisra:	musemmen	tesmîn
Teşeyên Nehmisra:	mutessa	tetsî'
Teşeyên Dehmisra:	mu'eşşer	te'şîr

Ev teşe li gorî nivîsandina ji aliyê helbestvanekî, yan du helbestvanan ve dibin du beş. Li jorê yên pêşî ji aliyê helbestvanekî ve, yên duyem jî ji aliyê du helbestvanan ve tên nivîsandin.

1. YÊN KU JI ALIYÊ HELBESTVANEKÎ VE TÊN NIVÎSANDIN

Teşeyên ku ji aliyê helbestvanekî ve tên nivîsandin ev in: muselles, murebba, muxemmes, museddes, musebba, musemmen, mutessa, mu'eşşer.

Eger bendên menzûmeyê ji sê misrayan pêk be ew muselese e, ji çar misrayan pêk bê ew murebba ye, ji pênc misrayan pêk be ew muxemmes e, ji şeş misrayan pêk bê museddes e, ji heft misrayan pêk bê musebba ye, ji heşt misrayan pêk bê musemmen e, ji neh misrayan pêk bê mutessa ye û ji deh misrayan pêk bê ew jî mu'eşşer e.

Di van teşeyên nezmê gişan de carinan misraya dawî, yan jî her du misrayên dawî ya her bendê tê dubarekirin. Ji musem-

CamScanner ile tarandı

metên bi vî rengî re, "musemmetên mutekerrir" û ji yên ne bi rengî re "musemmetên muzdewic" tê gotin. Bo nimûne eger di murebbaykê de ev tekrar hebe, ew dibe "murabbaya mutekerrir", eger tine be ew jî dibe "murebbaya muzdewic". Herweha ji muxemmesê heta bi mu'eşşerê jî rewş bi vî rengî ye.

Muselles

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji sê misrayan pêk tê û ji aliyê helbestvanekî ve hatine nivîsandin re "muselles'" tê gotin.

Murebba

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji çar misrayan pêk tê û ji aliyê helbestvanekî ve hatine nivîsandin re "murebba'" tê gotin.

Muxemmes

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji pênc misrayan pêk tê û ji aliyê helbestvanekî ve hatine nivîsandin re "muxemmes'" tê gotin.

Di edebiyata Kurdî de kesên wekî Melayê Cizîrî, Macin, Weda'î bi teşeya muxemesê helbest nivîsandine.

Li jêrê wekî nimûne em cih didin muxemmeseke Melayê Cizîrî. Ji ber ku di misrayên dawî yên bendan de tekrar tine ye, ev dibe "muxemmeseke muzdewic".

Museddes

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji şeş misrayan pêk tê û ji aliyê helbestvanekî ve hatine nivîsandin re "museddes'" tê gotin.

Musebba

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji heft misrayan pêk tê û ji aliyê helbestvanekî ve hatine nivîsandin re "musebba'" tê gotin.

Musemmen

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji heşt misrayan pêk tê û ji aliyê helbestvanekî ve hatine nivîsandin re "musemmen'" tê gotin.

CamScanner ile tarandı

Mutessa

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji neh misrayan pêk tê û ji aliyê helbestvanekî ve hatine nivîsandin re "mutessa'" tê gotin.

Muaşşer

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji deh misrayan pêk tê û ji aliyê helbestvanekî ve hatine nivîsandin re "muaşşer'" tê gotin.

***

Li jêrê wekî mînak em dê cih bidin muxemmeseke Melayê Cizîrî.

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1 *Min di ber qal û bela batin vi wê ra bû evîn*
Hêj li ser 'ehda elest im ta bi roja axirîn
Min divê lê eşkera kim, carekê daxa nihîn
Guftem o ra ma du'agûyê tu yem ey horî'eyn
"E'redet 'ennî we qalet ma du'au'l-kafirîn"

2 *Ey şehê alî cenab pir aciz û perkende em*
Ah ji dest cewra evînê çi b'kirim min bende em
Sebr û taqet min neman lê bêkes û dermande em
Ger bixwanî wer beranî, bende em ta zinde em
"Wacibûn lî imtisalu'l- emrî maza te'murîn"

3 *Suhtim ez pêta evinê, têk(i) bûm gird û heba*
Înne lî ayatî sidqin kane fi haze'n-neba
Horiya roja liqaê, nazika mexmûrqeba
"Hebbeza rewdat û necdin zurtuha 'ehde's-seba"
Rewdetun yecrî 'ela ercaîha maun me'in"

4 *Min Ii ser bedra munîr, mektûb diye neqşê sewad*
Ser bi yek anî du nûnan xettê reyhanî du sed

CamScanner ile tarandı

Hadirî min secde bir lew xerqê xûnê bû fuad
"Ber derê baxê wîsaleş hatifi awaz(i) dad"
"Hazihî cennatu 'ednin fedxulûha xalidin"

5 *Naêtin gohtin bi qal şerh û beyana husnê tu*
Dê bi hal û sir binasin dil fesana husnê tu
Xweş ***Mela*** *amancê tîran kir kemana husnê tu*
Qisseê 'işqa celal û dasitana husnê tu
"Tilke enbaun yeqûlu'n-nasu minna be'de hîn"

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

2. YÊN KU JI ALIYÊ DU HELBESTVANAN VE TÊN NIVÎSANDIN

Carinan helbestvanek bi zêdekirina du, sisê, yan çar misrayan li pêşiya her beyteke helbesteke helbestvanekî dî, teşeyeke dî yê helbestê tîne meydanê. Bi vî awayî helbesta her du helbestvanan bi hev re di nav qalibekî de derdikeve holê. Îcar dema li pêşiya her beytekê du misra hatibin zêdekirin ji wê re terbî', sê misra hatibin zêdekirin jê re texmîs û çar misra hatibe zêdekirin ji wê re jî tesdîs tê gotin. Di hemû teşeyan de ew misrayên ku hatine zêdekirin, li gorî serwaya misraya yekem a beyta pêşî ye.

Di van cureyên helbestan de di benda dawî de mexlesa her du helbestvana cih digre. Ji xwe nivîsandina musemmetan ji aliyê helbestvanekî yan du helbestvanan ve ji benda dawî ya helbestê tê fêmkirin. Eger di benda dawî de mexlesek hebe, ew ji aliyê helbestvanekî ve, eger du mexles hebin ew ji aliyê du helbestvanan ve hatiye nivîsandin. Loma dema em musemmetekê bibînin pêşî divê em li benda dawî binêrin.

Terbî

Di edebiyata Kurdî de kesên wekî Melayê Cizîrî, Şêx Nûredînê Birîfkanî bi teşeya terbî'ê helbest nivîsandine.

CamScanner ile tarandı

Texmîs

Di edebiyata Kurdî de kesên wekî Laxer, Melayê Bateyî, Miradxan Bazîdî, Şêx Nûredînê Birîfkanî, Pertew Begê Hekkarî, Mihemed Teyar Paşayê Amêdiyê, Şêx Ehmedê Feqîr û Salim bi teşeya texmîsê helbest nivîsandine.

Tesdîs

Di edebiyata Kurdî de kesên wekî Mela Remezan (li ser xezeleke Mela), Melayê Bateyî, Miradxan Bazîdî, Şêx Nûredînê Birîfkanî bi teşeya tesdîsê helbest nivîsandine.

***

Li jêrê wekî mînak em dê cih bidin texmîsek û tesdîsekê.

Texmîsa Melayê Bateyî li Ser Xezeleke Macin

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1 *Baziyê hecrê ji nû dil rave rûyê mexlebê*
Kun dikit furqet dilan hem reng e şîş û metqebê
Zalimê çerxê behêtim ger reşadê lewlebê
Ya rebbî dîsan muyesser ke ji bo min metlebê
Bê hicabane bibînim caredî dêmkewkebê

2 *Arezû min ma di dil da carekê rûyet reqîb*
Roj û şev her wê du'ayê kirme hevrê 'endelîb
Bi du'ayê min bibît hasil ilahî 'en reqîb
Rûnim ez zanû bi zanû dûşî ba dûşê hebîb
Kamira bim ez ji nar û hem ji zewqa meşrebê

CamScanner ile tarandı

3 *Lezzeta kamil ew e ba şem'ê yarê hemçû meh*
Çeng û nayê berbet û saqê muşewweş ta subeh
Mest û nazê 'işwe-sazê keç du-zulfê keç guleh
Xoşeçînê xermena weslê bim ez ba gah û geh
Cur'enûşê abê heywan im ji çaha xebxebê

4 *He wekî Yûsiv nûşustî we Zeliyxa pasuban*
Lê 'erf bit .... dan û cê be cê cê durfeşan
Geh be nagoşî we xeyb hem geh zenexdan û zeban
Întixaba bûseyan kim ez ji etraf û leban
Her di destim bin hemail l' gerdena gîsûşebê

5 *Meste ya min ya di dil da min vexwarî ew mey e*
Her ji wê mest bû me w her dê we bit û her we ye
Kes nebêjin bê wîsalê 'aşiqan derman heye
Hindî ku dil mubtelayê derdê hîcrana te ye
Şamê ta subhê neyê farix ji ya reb ya rebî

6 *Wadiya Eymen kû tarî bit kî ye feryadres*
Ma ji Tûrê dê tenê hel bit li min nûrîn qebes
Arezû dîdarê min ma dê kû çêbit multemes
Ger muyesser bit ji bo min weslê canan yek nefes
Padişahim ma bi dunya ra didim wê mensebê

7 *Min nedî hemrengê rûyet gul di nêv bax û rezan*
Leb ji leb ser ger helînê dê bibêjî mu'cizan
Bê hişim ***Batey*** *dinasim nexmesazê nexmeyan*
Macin*ê tûtîzeban û bulbulê baxê gulan*
Ew dinasîtin newaya 'endelîbê Xoşebê

***

CamScanner ile tarandı

Tesdîsa Mela Mehmûd Bilge li ser Xezeleke Melayê Cizîrî

Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun

1 *Hudhudê şirînkelam xweş qasida zêrînperê*
Qet neanî ji me ra dur û lebê dêmguherê
Da emanet ko diçî tu di sera qeder'erê
Bikî teqbîlê yedê şahida sîmînberê
Ey nesîmê seherê ma di mecala seherê
Sed selaman bigihînî ji me wê lebşekerê.

2 *Dilbera şox û şepal biskqeseba şeng û kubar*
Zeriya ten ji sedef xunçeleba sebzeuzar
Bûyê gîsû tu dibê 'enber e dêm fesla buhar
Hebeza qişt û rex û turre û zulf û qedê yar
Nêrgiza nazik û ter neyşekera mest û xumar
Dêmdur û le'lîleb û muhteşem û mu'teberê

3 *Te bila qesd û xered bî Hecerûleswedê can*
Xet û xalan tu mede sed Hecer û Beyt û hecan
Bi xena kengî ko hat ûd û rebab, çeng û keman
Meşiha yara delal rabe here dest û piyan
Asîtan û şibak û kulek û pencereyan
Da bi miskînî û zarî tu bibûsî diberê

4 *Ey şehînşahê cîhan emrê bikî ser dibirrim*
Tu ne zullamî xusûsen ko segê xakê der im
Wekû ber emrê tem e zilmê çî ye tacê ser im
Têkî bûm pêht û pereng sohtiye cewrê cîgerim
Ez bi wê qamet û bejnê li te sondê dixurim
Bes ke ey padîşeha min li esîran xederê

CamScanner ile tarandı

5 *Te bi wan zulfê perîşan kir cîhan zîr û zeber*
Ji leb û le'lê şekerxayê te ye durrê guher
Pertewa husn û cemala te ye ew şems û qemer
Te bi wê nûra îlahî bir ji çehvê men ezer
Tûzekê bîn bixwere, ta bikirîn kuhlê beser
Li terîqa qedema dilberê wê rehguzerê

6 *Dêma enwer, bi Xudê kim wekû bedr e di felek*
Herdu qewsên te ne mihrab ji bo cumle melek
Çi yeman in herdu çeşmên te yê sehhar û belek
Bi serê zulfê te bend kir dilê uşşaqan gelek
Dêmê bedr û eniyê zulfê li ser bûne helek
Erqeman helqe û gerr dane li dora qemerê

7 *Gulbina baxê cemalê murxekî tûba mekan*
Padîşaha husn û anî seyyida hura cenan
Tu yeqîn rûh û heyat î beser û sem' û rewan
Cewherek ferd î tu cana, bilbilê şêrîn-zeban
Ne bûyîn e ne dibin wek te şepalê di cihan
Kî dîn mislê te sêmînten û zerînkemerê

8 *Dilberê tîrek reşandî cegerê min bê sebeb*
Weke bilbil bi fixan im her dinalim rûz û şeb
Ji hebîbê seetek min ji wîsalê kir teleb
Bi xedeb da ji firaqê cehnemek pêt û leheb
Ji ber ahên me dinyayê agir û dûd bit ne eceb
Me di dilda heye narek ko disûjit seqerê

9 *Xusrewa padîşeha îro veda der Seba text*
Neşrê enwarê seadet ra digo "hatiye wext"
Zihî îqbal û seadet hebbeza tali' û bext
Ku muşerref bûm bi dîna cebhet û noqte û xet
Da bibînî senema min tu bikî xwe bide xet
Bike telxîsê cewabê me ji vê muxteserê

CamScanner ile tarandı

10 *Ji firaqa te şepalê rûz û şeb em digirîn*
Em di hamûna firaqa te da haîm digerîn
Ne tûbî hemdem û mûnîs ji me ra kû û kerr in
Bi Xwidê kî me ji beydaê firaqa xwe derîn
Qederek şefqe ji lutfa te temenna dikirîn
Da me mehrûmî nedêrî tu ji lutf û nezerê

11 *Çi qeder bextê me yar e ko dî dil min heye yar'ek*
Xelet im haşa ne yar e ji evînê heye nar'ek
Hem di nêv ateşê işqa te disojît wehe jar'ek
Ji hebîbê re nivîsî şerha işqa xwe me bar'ek
Ma bi zehrê şekerî dostê bixûnit carek
'Erdîhala ko nivîsî me bixûna cegerê

12 *Bes bi giryê neke feryad tu sirişkên xwe femal*
Nebe me'yûs ji wîsalê periya şûx û şepal
Misk û xalê bi wîsalê veîsand şem'ê şemal
Subehê îd e û min dî bi du çehvê xwe hîlal
Lew ko pur şefqe didêrit kerem û lutf û kemal
Ah ji dest remz û surên wê dur û gewherxeberê

13 *Hat ji nesrîn û gul û sumbul û wesla te bihin*
Çûme ser ava heyata te dihen hişk û tehin
Ku me dî dêma te êdî me nema hûş û zehin
Çira derbên te delalê ji me ra her bicih in
Bi Xwidê qet te di dilda ji Xwidê tirsê nehin
Dikirî zilm û cefayê tu li min vê qederê

14 *Me ji işq û ji xeramê ji evîna te ye de'f*
Ceger û qelb û cesed rûh û rewan atêş e sirf
Me ji ber derd û cefa û elem û zilmê ye ûf
Me ji zilf û bisk û xal û xet û dêma te ye ûlf
Bisk û gîsû ji herîr in qeseb in turre û zulf
Ne ji kafûr e beden xalî ji miska Teterê

CamScanner ile tarandı

15 *Da te* **Zatî** *elem û êş zeriya hûrîsiriştî*
Da te sed rengê 'ezabê enwera rengê feriştî
Tiliyên sor û 'eqîq yarê bi xûna te ye reştî
Feyde nakit li te êdî ne tebîb û ne niviştî
Paşê wan gezmeê çehvên te **Mela***yî pê kuştî*
Ma xedengin dikirin qet li me êdî eserê

(Latînîzekirin: Abdulkadir Bîngol)

B. KOMA DUYEM: TERKÎB-BEND Û TERCÎ'-BEND

Komeke dî ya musemmetan terkîb-bend û tercî'-bend in. Tiştên ku vê komê ji koma duyem (koma muselles û yên dî) cuda dikin ev in:

1. Di van her du teşeyan de hijmara misrayên her bendekê guherbar in û dibe ku ji deh misrayan jî zêdetir bin.

2. Her bendek yan di nav xwe de, yan jî wekî xezelê tên serwakirin.

3. Di dawiya her bendekê de beytek heye ku jê re beyta "wasite"yê tê gotin. Beytên wasiteyê ya her bendan di nav xwe de bi serwa ne.

Ev taybetiyên heta bi vir hem ji bo terkîb-bendê hem jî ji bo tercî'-bendê rewa ne. Eger beytên wasiteyê bên dubarekeirin ew tercî'-bend e, eger neyên dubarekirin ew jî terkîb-bend e.

Li jêrê wekî mînak em dê cih bidin tercî'-bendeke Melayê Cizîrî. Di vê tercî'-benda Mela de du xal bala mirov dikişînin.

1. Ev tercî'-bend ji 6 bendan pêk hatiye. Benda yekem ji 21, benda duyem ji 22, benda sêyem ji 22, benda çarem ji 21, bendên pêncem û şeşem jî ji 25 misrayan pêk tên. Ev jî dide nîşandan ku dibe ku jimara misrayên hemû bendan ne wekî hev bin.

2. Wasite ji sê misrayan pêk hatiye. Ji van du misrayên dawî wekî neqeratê tê dubarekirin, lê misraya yekem tenê bi wan re hemserwa ye. Loma jî di vir de hem taybetiya tercî'-bendê, hem jî taybetiya terkîb-bendê derdive holê.

CamScanner ile tarandı

Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun

1.

Me bi dil nêr(i)gizên xasse divên
Semen û yasemînên taze divên
Nazik û neyşekerên tuhfe divên
Sosinên nazik û terwende divên
Dilberên dêm-dur û durdane divên
Kewkebên şewq û şefeq zuhre divên
Nazê perwerde û şehzade divên
Sayeperwerde me bê perde divên
Serw(i)qed dêmgul û lebxunçe divên
Ayetullahî şerîf nusxe divên
Lê bi î'rab û xet û cezme divên
Dilrûbayan ne tinê xemze divên
Bi mesîhasifetê 'işwe divên
Senemên sur ji semed her me divên
Ji me eswedheceran secde divên
Bi ziyaret me ji wan bûse divên
Turreya şengê dilaşufte divên
Mihridarên xwe di pejmurde divên
Pêşkişa te me dused nafe divên
Sed hezar etles û hem xare divên
Her li bo zînet û xemla te divên

Textebend û sifetên qeyseriyê
Dînbirê horîmisalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

CamScanner ile tarandı

2.

Pur ji dîna te xerîb im xanim
Ji te ser ta bi qedem heyran im
Her bi can teşnelebê le'lan im
Dil di benda giriha zulfan im
Yûsifê cur'ekeşê hicran im
Nuqteya daireyê zindan im
Lew şubê daire sergerdan im
Badenoşê qedehê hirman im
Bi dil ateş ji ceger buryan im
Lew perîşan im û pir êşan im
Aşiqê nazik û mehbûban im
Tu mebîn bê ser û bê saman im
Gulê baxê Îremê Buhtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistan im
Çi tebî'et beşer û insan im?
Lillahilhemd çi 'alîşan im
Di riya yarê li rêza san im
Lew di iqlimê suxên xaqan im
Sibehê 'id e û ez pê zanim
Ku bi kêra te seher qurban im
Xweş birîndarekî bê derman im
Carekê şefqe ke rûhim canim

Ji xwedê re veke benda beriyê
Dînbirê horîmisalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

CamScanner ile tarandı

3.

Sosinên taze û mişkên walan
Bes perişan ke li ser sermalan
Veke carek tu ji dora xalan
Ji dil em dayîne ber çingalan
Xencer û şîr û rimên qettalan
Nezerê wer bide sahibhalan
Ku çi êsir in di dest heyyalan
Lew elif tên me di herfên falan
Ku li şiklê reqemê sersalan
Tu y' murada me ji 'er'erbalan
Zimzim û deng û zimihna lalan
Cezbe da me bi hezar ehwalan
Lew dinalin ji neseq 'ebdalan
Ku bi mestî didirin yek palan
'Enberên xemrî yû sosinalan
Sohr û zer şitrî yû çîçekalan
Misriyên wan dil ji me kir kalan
Te ji qews û qezehên xilxalan
Ku bûyin daire şubhet halan
Xemriyên xemzede nisbet dalan
Ku çevandîne ji reng kopalan
Misriyan wer bide ber sîqalan

Zuhrerengê û şefeqmuşteriyê
Dînbirê horîmisalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

CamScanner ile tarandı

4·

Sunbulan taze musenna nekirî
Turreya şengê muterra nekirî
Xemriyan şifite tuxra nekiri
'Er'erê xare û diba nekirî
Dil û dîn xaret û yexma nekirî
Serê sewdazede sewda nekirî
Guherên nêrgizê şehla nekirî
Saetê vê saetê ranekirî
Me ji qeyda xwe tesella nekirî
Lê xeramê li me mestane kirî
Ji me dil Ke'be û butxane kirî
De'weyê dilberiyê dane kirî
Cilweyek mîrî yû şahane kirî
Pêş(i) şem'a xwe me perwane kirî
Dilê xemdideyê ma şa nekirî
Li me bê perde tecella nekirî
Wehe carek me tewella nekirî
Xencekê qenc(i) li "Mela" nekirî
Cegerê riş(i) mûdawa nekirî
Bikujî aşiq û perwa nekirî
Li şehîdê xwe temaşa nekirî

Ma we dilber dikirin dilberiyê?
Dînbirê horîmisalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

CamScanner ile tarandı

5.

Herdu qewsên te ji qudret ne ji Yeng
Jê bi mîzan bireşînin me xedeng
Biderin sîne bi ser pence peleng
Romê pişt dit 'ecemê bête Fireng
Lê ne wek waqi'eya Gî û Pêşeng
Hilbitin qenc ji nêv ateşê ceng
Tên siwaşê Hebeş û Nûbî yû Zeng
Tu dizani çi neheng in çi neheng
Veke le'Ian tu ji ser şekkerê teng
Ku j'mûrada te bûyîn pêt û pereng
Mestê cewra te me bê bade û beng
Bête cana li me alem bûye teng
Ji cefaya te nema qet li me reng
Ji çi peyweste dinalin seradeng
Me dixwûnin qed û bejna te yî şeng
Nêrgizên mest(i) bi naz û neyinreng
Lê tu tûba û ezê xesteyê leng
Çi bikim feyde ku êvar e dereng
Mutriban da nekevin çengê ji çeng
Da nedit perdeyê, ayîneyê zeng
Ku ji çenga me binalit xerçeng
*Wek "**Melayî**" bi hezar reng û aheng*
Bi fixan bêt û ji ber sed ferseng
Çi xeber dim ji dilê tey weki seng
Dikujî aşiqê miskîn bi tifeng

Nekirî terkê tu vê kafiriyê
Dînbirê horîmisalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

CamScanner ile tarandı

6.

Bi qedê nêrgiza Buhtan î
Nazikek şeng î şubê reyhan î
Çi xetişkeste û şêrinreyhan î
Ku te pê nesx(i) kirî dîwanî
Ellah Ellah ji çi reng insan î
Yusifê lebşekerê 'Îbranî
Bes e ger wek te bidêrit sanî
Horiyên rûhisifet rûhanî
Wek te ser ta bi qedem nûranî
Wek te haşa hebitin şîranî
Ehsenellah ji sira subhanî
Ku cemalek we munezzeh anî
Di misalek beşerî da danî
Me bi ilhama îlahi zanî
Bi nişan qudret i bê nîsanî
Çi nişan? zulmeti nûrefşan i
Li cemala semedi burhan i
Tu li der heq me çira erzan î
Ku sehergeh bimeşî seyranî
Te "Mela"yê xwe qe carek nanî
Bi serefrazi yû alişanî
Secde bit ber qedema siltanî
Ne tinê rûhî i tu rûh û can î
Zineta husn û sura xûban î
Tacê ferqê serê mehbûban î

Tu bi şîranî yû lebşekkeriyê
Dînbirê horîmisalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

(Melayê Cizîrî, *Dîwan*)

CamScanner ile tarandı

IV. TEŞEYÊN HEVPAR

Heta niha me behsa sê komên teşeyên nezmê kir. 1. Teşeyên nezmê yên ku ji beytan pêk tên 2. Teşeyên nezmê yên ku ji çar misrayan pêk tên û 3. Teşeyên nezmê yên ku ji bendan pêk tên (musemmet). Ji bilî teşeyên nezmê yên ku di van koman de cih digirin, hinek teşeyên dî jî hene ku ew wekî komeke çarem nayên nirxandin. Ev cureya teşeyê bi van her sê koman re têkildar in. Lewma jî em van teşeyan wekî "teşeyên hevpar" bi nav dikin. Di vê beşê de em dê ji van teşeyan li ser "nezîre" û "mulemma"yê rawestin.

A. NEZÎRE

Nezîre, ji wê helbesta ku ji aliyê helbestvanê xwe ve, bi heman teşe, kêş, serwa û paşserwaya helbesta hebestvanekî dî hatibe nivîsandin re tê gotin. Ji nivîsandina helbesteke bi vî rengî re jî "tenzîr" tê gotin. Nezîrê ji helbestên ku hatine ecibadin re tên nivîsandin. Di hemû teşeyên nezmê de (wekî xezel, qesîde, muxemmes û hwd.) dikare nezîre bê nivîsandin. Li jêrê wekî nimûne em dê cih bidin nezîreyeke Melayê Bateyî ku Bateyî ev nezîre li ser muxemmeseke Macin çêkiriye.

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1 *Sorgula xunçedehen naziknihala kê yî tu*
Mehweşa dilpîrehen şox û şepala kê yî tu
Gulruxa sîmenzeqen fikr û xeyala kê yî tu
Ahûya deşta xeten mişkîn xezala kê yî tu
Nazika sîmasemen qenc û delala kê yî tu

2 *Ew çi dêm e, ew çi rû ne, ew çi zulf e ew çi xal*
Ew çi gul baxê gulan e ew çi husn e bê mîsal
Ew çi ebrû ne çi qews in ew çi nûn in rengê hilal

CamScanner ile tarandı

Ew çi mujgan in çi tîr in ew çi elmas in bi qal
Qatilê xûnrîz û xûnxûr pur qîtala kê yî tu

3 *Ew çi badamin siyah in ew çi çav in xemzerîz*
Ew çi reyhan in di şeng in ew çi zulf in muşkebîz
Ew çi hindû ne siyehdil ew çi xal in fitnexîz
Ew çi lêv in rûhîperwer ew çi unnab in ezîz
Leb-xemûşî badenûşî laubala kê yî tu

4 *Ew çi bejn e ew çi qamet ew çi qeddê dilruba*
Ew çi exbar in te can de ew çi durr in purbiha
Ew çi narinc û turinc in ew çi sêv in sîneca
Ew çi mehtab in binakûs ew çi subh e nûrfeza
Rohniya şama firaqê şem' û mala kê yî tu

5 *Hûr û 'eynê xem-revînê diltişînê dilfirîb*
Bê qusûrî hem çi hûrî nûrê Tûrî pur'ecîb
'Işwesazî serfirazî dilnewazî dilşikîb
Şehlewendî leb ji qendî çeşmebendî purxerîb
Sînesûjî dil-firûzî mehcemala kê yî tu

6 *Ew çi 'ac e reng zucac e ew çi nûrîn gerden e*
Ew çi durca le'lê kon e can rewan tê mesken e
Ew çi destên reng-henayê riştina xûna min e
Şubhê te mehbûb û xûb ma qed di dunyaê hene
Cebherojê qelbîsojê qedşemala kê yî tu

7 *Ew çi dil bend in muselsel ew çi zincîrin kezî*
Ew çi mehyûş in çi ala kesk û sor û qurmuzî
Netrik û îlan û ştrî têk li dêmê tewwuzî
Dê bi meş carek tu serwa min were seyra rezî
Da bi qurbanê te bit ***Macin*** *xezala kê yî tu*

CamScanner ile tarandı

Nezîreya Bateyî Li Ser Muxemmesa Macin

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1 *Subh û êvarê şeva tarî şemala kêyî tu*
Leyletu'l-Qedr û Berat in nûrê mala kêyî tu
Çîçeka baxê Îrem şox bejn û bala kêyî tu
Bo xwedê kî bêje min kanî şepala kêyî tu
Dêm kitêb e zulf[î] haşî şerhê xala kêyî tu

2 *Dilbera gerden-şefîfî daniwa durra 'eden*
Nazik û mewzûn letîfî nexliya selwa çîmen
Gul libasî gul qiyasî gul enî gul pîrehen
Ahûya deşta tetarê rehzena aska xeten
Hûriya baxê bihiştê çav-xezala kêyî tu

3 *Qiblegaha 'aşiqanî şengela ebrûzirav*
Hate burca şaneşînê sed melaîk çûn silav
Daxû kohvana evînê sotî canê min tevav
Extera subha se'îdê reş rihana te belav
Filfila Hindûsitanê zulf û xala kêyî tu

4 *Ew çi dêm e şah e baxe gulşena daru'l-qerar*
Sed hezaran nal û awazê [di] bulbul çar kenar
Helqe pê da best û hatin 'eqreb û îlan û mar
Nêrgiza şehla şepalê asemîna mêrxuzar
Lebxemûşê meyfiroşê dêm peyala kêyî tu

5 *Pêncî salî şehlewendî keftime çaha resed*
Min nizanim çerxê dêm e tê heye burca esed
Çengelek avête dil kun kir li min dad û meded
Qelbekî hişk û sefal in min divêt can tê ebed

CamScanner ile tarandı

6 *Şah li textî dilberê fikr û xeyala kêyî tu*
Sefhe kêşa katibê xeybê ji nûra la-yezal
Xaleke wa'l gerdenê mislê berê reş mah û sal
Sed hezaran rukbe hacî tên tewafa zulf û xal
Netrik û şutrî yû îlan dane ber bayê şemal
Laubalî çardehxalî çardehsala kêyî tu

7 *Şeh kitêbek min divêt behsê muhebbet bittemam*
Sed tilism û sihrî tê da pêkve Suryanî meqam
Ebceda 'işqê me xwend û 'eql(i) winda kir we mam
Hûriya baxê bihiştê tûtiya tawus xeram
Xeyrê ***Batey*** *padîşaha min delala kêyî tu*

B. MULEMMA

Di edebiyatên klasîk ên rojhilatê de ji wan helbestên ku li gorî hunera "telmî'"ê hatine nivîsandin re "mulemma" tê gotin. Hunera telmî'ê jî ew e ku di helbestekê de çendîn ziman bi hev re bên bikaranîn. Naxwe "mulemma" ew helbest in ku ne bi zimanekî tenê, bi du yan zêdetir zimanan hatine nivîsandin. Wateya ferhengî ya mulemmayê ew tişta ku rengareng e. Di helbestên bi vî rengî de her zimanek wekî rengekî hatiye qebûlkirin û ev helbest mecazen bûne helbestên rengîn.

Hunera telmî'ê di hemû teşeyên nezmê (wekî xezel, qesîde, muxemmes û hwd.) dikare bê bikaranîn. Eger ew helbesta ku bi teşeya mulemmayê hatiye nivîsandin "xezel" be, ji wê re "xezela mulemma", eger "murebba" be, "murebbaya mulemma" tê gotin.

Îcrakirina hunera telmî'ê li gorî teşeya nezmê diguhere. Di teşeyên nezmê yên ku li ser esasê beytan tên nivîsandin de (xezel û qesîde, mesnewî), carinan tenê di beytekê de ev huner tê îcrakirin. Di vê rewşê de misrayek bi zimanekî û misraya dî jî bi zimanekî dî tê nivîsandin. Carinan jî her beyteke helbestê, li

CamScanner ile tarandı

gorî jimara zimanan, li pey hev bi zimanekî cihê tê nivîsandin. Di musemmetan de îcrakirina hunera telmî'ê nîzamîtir e. Lewra di bendên musemmetan de her misrayek bi zimanekî cihê tê nivîsandin. Eger jimara zimanan sisê be, teşeya musellesê, eger çar be, teşeya murebbaê, eger pênc be teşeya muxemmesê tê tercîhkirin.

Cara pêşî Farisan bi Farisî û Erebî helbestên bi teşeya mulemmayê nivîsandine. Piştre Tirkan bi Tirkî-Erebî, Tirkî-Farisî yan jî Tirkî-Farisî-Erebî helbestên mulemma nivîsandine. Kurdan jî mulemmayên Kurdî digel van her sê zimanan bi hev re yan cuda cuda nivîsandine. Di edebiyata Kurdî de mulemmaya Ehmedê Xanî ya ku bi çar zimanan nivîsandiye navdar e. Bi qasî ku tê zanîn ev mulemma di edebiyata Kurdî de yekem mulemmaya çarzimanî ye. Mela Ehmedê Xasî jî digel Kurdiya Zazakî mulemmayeke bi Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdiya Kurmancî nivîsandiye û di vî warî de nimûneyeke ku ji pênc ziman/diyalektan pêkhatiye derxistiye meydanê. Ji bilî wan hinek helbestvanên ku bi vê teşeyê helbest nivîsandine ev in: Melayê Cizîrî, Şewqiyê Xanîneseb, Salim (Soranî-Farisî), Kurdî, Seydayê Licî.

Xanî di vê mulemmeya ku li jêrê wekî nimûne hatiye pêşkêşkirin de misrayên her bendekê bi rêzê bi zimanên Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdiya Kurmancî nivîsandine.

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. *Fate umrî fi hewake ya hebîbî kulle hal*
   Ah û nalem hemdemem şod der firaqet mah û sal
   Ger benim kanım dilersen çoktan olmuştur helal
   Dîn û ebter bûm ji 'eşqê min nema 'eql û kemal

CamScanner ile tarandı

2. *Ente fikrî fi fuadî, ente rûhî fi'l-cesed*
Leşkerê xemhayê to milkê dilem wîrane kerd
Dade geldim 'ışk elinden isterem sizden meded
Wan tetaran bir bi yexma 'eql û dîn û milk û mal

3. *Tale xemmî zade hemmî şa'e sirrî fi'l-mela*
Teşneê camê wîsal em çûn şehîdê Kerbela
Yoksa sen dîvane oldun nice halim ey dila
Ya ji nû ve eşveyek da min hebîba çavxezal

4. *Bittu hacîren hebîbî leste minnî alîmen*
Her dem ez derdê firaqet xafil em ez halê men
Can û dilden 'arz(i) kıldım halimi canana men
J' 'erzêhala min tu xafil qet ne pursî 'erzêhal

5. *Hel lena min nî'metî wesli'l-hebîbî min nesîb*
Ûf(i)tadem ber deret bîçare sergerdan xerîb
Derdimiz çok lîk(i) senden öte yok hiç bir tabîb
Ey tebîbê min dewaê derdê Xanî her wîsal

(Ehmedê Xanî)

CamScanner ile tarandı

BINBEŞA ÇAREM
TEŞEYÊN BERHEMÊN KLASÎK

Di edebiyata klasîk ya Kurdî de, ev teşeyên helbest û nezmê yên ku em li ser wan rawestiyan, di sê cure berheman de kom dibin. Yek ji wan dîwan, ya dî mecmû'e, ya dî jî mesnewî ye. Bi gotineke dî her berhemeke ku di nav du bergan de hatibe amadekirin, ji aliyê teşeyê ve yan dîwan e, yan mecmû'e ye, yan jî mesnewî ye. Ev jî li gorî teşeyên helbestê û li gorî rêzkirina wan teşeyan çêdibe. Li jêrê em dê behsa vê yekê bikin.

I. DÎWAN

Dîwan ji wan berhemên ku helbestên helbestvanekî tê de kom dibin re tê gotin. Mesnewiyên serbixwe ne tê de, hemû teşeyên nezmê yên wekî xezel, qesîde, murebba, muxemmes, texmîs, terkîb bend û hwd. di dîwanan de cih digrin. Helbestvan mesnewiyên xwe yên dirêj naêxe nav dîwana xwe. Lê dema menzûmeyeke kurt bi terzê mesnewiyê hatibe nivîsandin, dibe ku ew jî di dîwanan de cih bigre. Ji ber ku teşeyên ku dîwanan de cih digrin, helbest in û giran in, dîwan berhema herî giring ya helbestvanekî ye ku di wir de fikr û ramanê xwe û huner û hêza xwe ya edebî nîşan dide.

Taybetiyeke dî ya dîwanê ev e ku, helbestên ku di dîwanê de cih digrin, li gorî serwayên helbestan, eger paşserwa hebe li gorî paşserwayê bi awayekî elîfbêyî li pey hev tên rêzkirin. Wate ew helbestên ku dawiya serwa yan jî paşserwaya wan elif / ا be, di serê dîwanê de, yên ku bê / ب ê be pişt wê re cih digrin. Ev rêbaz heta bi herfa yê / ی ê dewam dike. Ji ber ku bi hemû herfên elîfbêya Erebî nivîsandina helbestan tiştekî zehmet e, dibe ku di hinek dîwanan de bi hinek herfan helbest nehatibin nivîsandin.

CamScanner ile tarandı

Teşeyên nezmê yên ku di nav vê sîstema rêzkirinê de cih digrin, ew in ku me li jorê di beşên serbixwe de behsa wan kiribû. Lê ji van teşeyan sê cure zehf girîng in: Qesîde, xezel û musemmet. Bi awayekî giştî di dîwanan de pêşî qesîde, piştre xezel, piştî wan jî musemmet cih digirin. Eger hebin teşeyên biçûk ên wekî "ruba'î û "mufred"an di herî dawî de cih digirin. Ji wan dîwanên ku bi hemû herfên elîfbêya Erebî di wan de helbest kombûne û teşeyên nezmê jî li gorî vê rêzê di wan de cih girtine re, "dîwanên muretteb" (dîwanên tertîbkirî) tên gotin. Awayekî dî jî yên dîwanên muretteb heye ku di serê dîwanê de qesîde, li gorî rêza elîfbêya Erebî xezel, piştre jî musemmet cih digirin. Di vir de tenê xezel li gorî elîfbêya Erebî tên rêzkirin. Di her halî de eger di dîwanekê de bi van teşeyan hemûyan helbest hatibin komkirin ew dîwan dibin dîwanên muretteb. Eger di dîwanekê de ev cure tev tinebin ew dibe "dîwana nemuretteb".

Mirov dikare bêje ku di edebiyata Kurdî de ji bo dîwanan tişta esas ew e ku li gorî serwayên helbestan bi awayekî elîfbêyî li pey hev hatibin rêzkirin. Wate rêza teşeyên nezmê û naveroka helbestê ne girîng e.

Helbet ne lazim e ew teşe hemû di dîwanekê de bi hev re cih bigrin. Dibe ku dîwanek ji hin teşeyan tenê pêk bê. Lewra gelek caran di dîwanan de tenê xezel hene. eger di dîwanekê de tenê xezel hebin ji wan re "dîwanên xezelan" eger tenê "ruba'î" hebin ji wan re "dîwanên ruba'iyan" û hwd. tê gotin. Ev cureya binavkirinê di nav Kurdan zêde belav e.

Hinek helbestvanan hê li heyatê helbestên xwe di nav du bergan de kom kirine, hinekan jî ev tişt nekirine; piştî koça wan a dawiyê hin kesên dî helbestên wan kom kirine.

Di edebiyata Kurdî yekem helbestvanê xwedî dîwan Melayê Cizîrî ye. Ji bilî Melayê Cizîrî dîwan an jî dîwançeyên gelek helbestvanên dî jî gihîştine me ku di beşa duyem a vê xebatê de behsa gelekan ji van wan hatibû kirin.

CamScanner ile tarandı

II. DÎWANÇE

Eger helbestvanek bêyî ku helbestan li gorî elîfbêya Erebî rêz bike û bêyî ku cih bide hemû teşeyan çend helbestên xwe di nav du bergan de kom bike ji wan re bi wateya dîwana biçûk "dîwançe" tê gotin. Di vir de ji aliyê hecmê ve biçûkatiya dîwanê derdikeve pêş. Ew helbestvanên ku tenê çend helbestên wan ên belawela hene, dikarin wekî helbestvanên xwedî dîwançe bên binavkirin. Bo nimûne, çend helbestên Eliyê Herîrî yên ku gihîştine me, dikarin bên komkirin û wekî dîwançeya Eliyê Herîrî bên binavkirin.

III. MECMÛ'E

Herçiqas wateyên cubicur ên terma "mecmû'e"yê hebin jî di edebiyata klasîk de mecmû'e, ji wan berhevokên ku ji yekê zêdetir menzûme û helbestên edebî di nav du bergan de kom dibin re tê gotin. Carinan wekî "dewre", "keşkûl" "guldeste" yan jî "gulçîn" jî tê binavkirin. Ferqa mecmû'eyan ji dîwanan ew e ku di mecmû'eyan de ne helbestên helbestvanekî tenê, belkî yên gelek kesan kom dibin û mecmû'e ne lazim e wekî dîwanan li gorî rêza serwa yan jî paşserwayan ya elîfbêyî bên rêzkirin. Bi kurtî mecmû'e helbestên bijarte yên helbestvanên curbicur in. Mecmû'eyên Kurdî, piştî sedsala XV-XVIan derketine holê. Herçiqas diyalogên Ehlê Heqê ku di "dewre"yan de hatibûn komkirin kevin jî bin, ew di sedsalên dawî de derbasî nivîsê bûne. Hinek ji wan ev in:

1. Dewrey Balûl
2. Dewrey Şa Xweşîn
1. Me'rifetu Pîr Şalyar
2. Serencam
3. Dewrey Qirmizî
4. Dewrey Babe Celîl

Ji bilî van gelek mecmû'eyên ku di wan de helbestên Kurdiya Kurmancî, Kurdiya Soranî û Kurdiya Zazakî û hwd. hatine

CamScanner ile tarandı

komkirin hene ku di beşa yekem a vê pirtûkê de di vî warî de hinek mînak hatibûn dayîn.

IV. MESNEWÎ

Ew berhemên ku li derveyî dîwan û mecmû'eyan dimînin mesnewî û menzûmeyan pêk tînin. Mesnewî hem navê teşeyeke nezme ye, hem jî navê cureyek ji berhemên klasîk e. Eger wekî teşeyeke berheman em pênaseya mesnewiyê bidin, em dikarin weha bêjin: Ji wan berhemên ku ji aliyê ruxsarî ve bi terzê mesnewiyê hatine nivîsandin û bi tena serê xwe ketine nav du bergan, yan jî weke berhemeke serbixwe hatine hesibandin re "mesnewî" tê gotin. Ji vê pênaseyê derdikeve holê ku pêwist e mesnewî, ne menzûmeyeke kurt a di di nav mecmû'eyekê yan jî dîwanekê de be. Eger wisa be, wê demê di çarçoveya berheman de nakeve bin pênaseya mesnewiyê. Bi piranî mesnewî lîrîk in û mijarên wan evîndarî ye. Wekî Mem û Zîn, Leyal û Mecnûn, Yûsif û Zelîxa û hwd. Bo nimûne, Mem û Zîna Ehmedê Xanî, ji ber ku ji aliyê teşeyê ve mesnewî ye, ji aliyê mijarê ve evîndarî ye û bi tena serê xwe ketiye nav du bergan, ew nabe dîwan yan jî mecmû'e; dibe mesnewî.

V. MENZÛME

Menzûme jî wekî mesnewiyan derveyî dîwan û mecmu'eyan e. Lê heçî menzûme ne ne lazim e bi teşeya mesnewiyê hatibin nivîsandin. Ew berhemên serbixwe û dirêj, bi kîjan teşeya nezmê hatibin nivîsandin ferq nake, eger mijarên wan ne bûyerên evîndariyê yên wekî Mem û Zîn, Leyal û Mecnûn, Yûsif û Zelîxa û hwd. bin, ji wan re menzûme tê gotin. Menzûme bi piranî di mijarên dînî, dîrokî, dîdaktîkî û exlaqî de tên nivîsandin. Wekî nimûne Nûbihara Ehmedê Xanî, ji ber ku berhemeke serbixwe ye, ketiye nav du bergan û mijara wê ne bûyereke evîndariyê ye, dîdaktîzm e, ew dibe menzûme, nabe dîwan, mecmû'e, yan jî mesnewî. Ji menzûmeyan re carinan beyt jî tê gotin.

CamScanner ile tarandı

Carinan çend mesnewî yan menzûmeyên serbixwe jî di nav du bergan de bi hev re tên amadekirin û çapkirin. Carinan jî hemû berhemên helbestvanekî bi hev re tên çapkirin. Ev rewşên bi vî rengî mesnewî yan menzûmyê ji pênaseya wan dernaxe.

CamScanner ile tarandı

REFERANS

Açıkgöz, Burak Fatih, "İlk Osmanlı Edebiyat Tarihleri ve Tarihçileri Hakkında Bazı Değerlendirmeler", *Selçuk Ünv. Sosyal Bilimler Enst. Dergisi*, 27/2012.

Adak, Abdurrahman, "Mela Xelîlê Sêrtî: Helbestvanê bi Mexlesa Şewqî" û Helbestên wî yên Kurmancî", *Mukaddime*, j. 1, s. 2010, Mardin.

"Erdelanlı Kadın Bir Saray Şairi: Mestûre Mahşeref Hanım", *Kürt Kadını Kongresi* (Hakkari 1-5.10.2009), Hakkari 2011. r. 91-100.

"Şêx Cüneyd-i Zokaydî ve Mahtut Bir Şiir Mecmuası", *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, j. 1/ s. 2009.

"Di Serdema Osmaniyan de li Pey Rêça Ehmedê Xanî Sê Mem û Zînên bi Tirkî", *Komele Witarî Yekemîn Kory Nêwneteweyî Edebî Kurdî*, Zanistgay Kurdistan, Sine 2011, C. II, r. 585-601.

"Malbata Zêbariyan û Basreta Paytexta Neqşebendiyan-I Heta bi Serdema Postnişîniya Malbata Zêbariyan li Dergahê Basretê", *Nûbihar*, j. 107, Stenbol 2009.

Şükrî-i Bitlîsî, Uluslararası Tatvan ve Çevresi Sempozyumu, weş. Beyan. , İst. 2008.

Adak, Abdurrahman, Baluken Yusuf, Acar Hayrullah, "Gora Feqiyê Teyran /Faqah Tayrān's Tomb", *Kovara Nûbihar Akademî*, I/1, s. 2014.

Algül, Hüseyin, *İslam Tarihi*, weş. Gonca, Ist. 1991.

Aydeniz, Veysel, *Seyyid Şefik Arvasî*, weş. Nûbihar, Istanbul 2013.

Allison, Christine, *Yezidi Sözlü Edebiyatı*, weş. Avesta, Istanbul 2007).

Amêdî, Sadiq Behaedîn, *Hozanvanêt Kurd*, (Amd. Zeynelabidîn Zinar), weş. Pencînar, Stockholm 1998.

Azizan, Herekol, "Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin", *Hawar*, weş. Nûdem, Stokolm 1998.

Azîzan, Herekol, "Lawijên Mîr Miheme", (jêrenot), *Hawar*, weş. Nûdem, Stokolm 1998.

Azîzan, Herekol, "Lawij", *Hawar*, weş. Nûdem, Stokolm 1998.

Babê Zêrevanî, "Mela Hisênê Bateyî-1", *Nûbihar*, j. 87, s. 2002.

Badî, Îsmaîl, Remezanê Cizirî, *Di duyvçûn û Tuyjandineka Dîtir da Qeftek ji Helbestên Wî*, weş. Zankoya Dihokê Fakeltiya Zanistên Mirovayetî Sikula Adabê Senterê Vekolînên Kurdî û Parastina Belgenaman, Dihok 2011.

CamScanner ile tarandı

Barnas, Rojen, *Silvan Silîvan Farqîn*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013.

Termên Edebî, Nûdem, j. 1. s. 1992, r. 29-36.

Bazîdî, Mela Mehmûd, *Adat û Rusûmetnameê Ekradiye*, Amd. Jan Dost, Nûbihar, Stenbol 2010.

Bazîdî, Mela Mehmûd, "Muqeddîma Îlmê Serf û Be'dê Usûlê Lazîmeyê Te'lîmiyye bi Zimanê Kurmancî", *Camî'eya Rîsaleyan û Hîkayetan bi Zimanê Kurmancî*, Amd. Ziya Avcı, Lis, St. 2010.

Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî, Amd. Seîd Dêreşî, weş. Spîrêz, Dihok 2007.

Bedlîsî, Şerefxan, *Şerefname*, weş. Avesta, Stenbol 2007.

Bitlîs Vilayetine Mahsûs Salname, İkinci Def'a. Sene-i Hicriye-i Kameriye: 1316, Bitlîs Vilayet Matbaası.

Bîmar, Ebdurrezzaq, *Mûsîqî eş-Şi'ri'l-Kurdî*, Daru'l-Hurriye, Bexda 1992.

Birîfkanî, Şêx Nûredîn, *Dîwan Zibanê Kurdî*, Amd. Zahid Birîfkanî weş. Aras, Erbîl 2002.

Borekeyî, Sedîq Sefizade, *Mêjûy Wêjeyî Kurdî*, b.c. 1375.

Boyîk, Esker, "Şemsedînû Edeba êzdiyan a sedsalên 11 û 13 an", *Şêx Fexrê Adiyan Filosof û Xasê Ola Êzdiyatiyê*, weş. Dengê Êzîdiyan, Oldenbûrg 2009.

Celîl, Celîl, *Keşkûla Kurmancî*, Wien 2004.

"Mishefa Reş bi Zar li Nav Sîstema Qewl û Beytên Êzdiyan", *Şêx Fexrê Adiyan Filosof û Xasê Ola Êzdiyatiyê*, weş. Dengê Êzîdiyan, Oldenbûrg 2009.

el-**Cezerî**, Şêx Ehmed, *Dîwana Cizîrî*, (Amd. M. Şefiq el-Erwasî el-Huseynî), Ewqaf-ı Islamiyye Mat. , Ist. 1337

Cîhanî, Perwîz, Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Nûbihar, Stenbol 2013.

Çağmar, Edip, "Molla Halîl el-İs'irdî'nin *Risaletun fi İlmi't-Tecvîd*'i", *Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi* -www. e-sarkiyat. com- j. II, s. 2009.

Çelebî, Evliya, *Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahetnamesi*, YKY, Stenbol 2010.

Demir, Ahmet, *Qewlê Newala Sîsebanê*, weş. Nûbihar, Stenbol 2012.

Dêreşî, Seîd, *Dîwana Weda'î*, weş. Nûbihar, Stenbol 2012.

Dîwana Feqiyê Teyran, weş. Lîs, Ankara 2011.

Doru, Nesim, *Melayê Cizîrî Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri*, weş. Nûbihar, Istanbul 2012.

Doskî, Tehsîn Î. , *Leyla û Mecnûn*, Spîrêz, Hewlêr 2004.

CamScanner ile tarandı

Dîwana Melayê Cizîrî, Spîrêz Dihok 2005.

el-Medxel lî Dîraseti'l-Edebi'l-Kurdî, Dihok 2011.

Dîwana Perto Begê Hekkarî, weş. Nûbihar, Stenbol 2011.

Mela Mihemedê Lîceyî, Dîwana Hadî, Amd. Tehsîn Î. Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2012.

Yûsif û Zuleyxa-Vehandina Selîmê Hîzanî-, weş. Spîrêz, Dihok 2004.

Şerha Mesnewiya Camê Wehdet, Dihok, (Berhema Neçapkirî)

Doskî, Tehsîn Î. û Şemrexî, Huseyn, *Parçeyek ji Dîwana Laxerî*, Spîrêz, Dihok 2011.

Doskî, Tehsîn Î û Muhsin Doskî, *Melayê Bateyî Jiyan û Berhem*, Spîrêz, Duhok 2005.

Helbestvan Seyfiyê Şûşî û Berhemê wî, Weş, Kovara Metîn, Dihok 1999.

Doskî, İ. Tehsîn û Xalid Sadînî, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*, (Berhema Neçapkirî).

Doskî, M. Emîn, *Lewami'u'ş-Şehib*, weş. Spîrêz, Dihok 2007.

Doskî, 'E. N. S. , *el-Molla Xelîl es-Sêrtî we Menhecuhu fî Îsbati'l-'Eqaidi'l-Îslamiyye*, weş. Spîrêz, Erbil 2007.

Durre, Abdurrahman, *Şerha Diwana Ehmedê Xanî*, Keskesor, Stenbol 2002.

Ebdulla, Helîma Xurşîd, *Berawirdeyeka Kêşnasî di Navbera Erûza Kurdî û Farisî*, Spîrêz, Duhok 2011.

Epözdemir, Şakir, *İdris-i Bitlisi ve Kürt Meselesi*, weş. Fanos, Ankara 2011.

Di Dîroka Mîrekiyên Zirkan de Mîrekiya Derzin, weş. Fanos, Stenbol 2011.

Ergün, Zülküf, *Di peydabûna Edebiyata Kurdî ya Li Cizîra Botan de Karîgeriya Bajarvaniyê*, Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2012, r. 130-133.

Fesaî, Mensûr Restgar, *Enwa'ê Şi'rê Farisî*, Şîraz 1373.

Feyzî, Emîn, *Encumenî Edîban*, (Latînî: M. Xalid Sadînî), Dîwan, Stenbol 2012.

Geverî, Ayhan, *Yûsif û Zuleyxa-Selîmiyê Hîzanî-*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013.

Guest, John S. , *Yezidilerin Tarihi*, Avesta, İstanbul 2007.

Findî, Reşîd, *Min Yenabî'i'ş-Şi'ri'l-Klasîkî el-Kurdî*, Erbil 2004.

Herdî, Ehmed, *el-Erûz fi'ş-Şi'ri'l-Kurdî*, el-Mecme'u'l-'Ilmî el-Kurdistanî, Erbîl 2004

CamScanner ile tarandı

Helqetînî, Mela Yûnis, *Zurûf*, (Di nav pênc rîsaleyan de) b. c., bt.
Terkîb, (Di nav pênc rîsaleyan de) b. c. , bt.

Hizirvan, *Sîseban*, weş. Êkîtiya Nivîserên Kurd, Dihok 2007.

Hilmî, Refîq, *Şi'r û Edebiyatê Kurdî*, Hewlêr 1988.

Hecî, Bedelê Feqîr, *Bawerî û Mîtologiya Êzîdiyan*, Dihok 2002.

Hirorî, Sidqî, "Feqî Huseyn Sagniçî û Dîroka Wêjeya Kurdî", http://www.kulturname.com/?p=301.

Huşyar, Cewdet, "Zexaîru't-Turasi'l-Kurdî fi Xezainî Petersborg", http://brob. org/old/bohoth/bohoth/bohoth026. htm, 29. 10. 2013.

Îbrahîmî, Xeffar, Xanay Qubadî Leyla û Mecnûn, Binkey Jîn, Silêmanî 2011.

İpekten, Haluk, *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*, Dergah Yay. , İstanbul 2002.

İsen, Mustafa, *Künhü'l-Ahbar'ın Tezkire Kısmı*, weş. AKM, Ankara 1994.

Îssa, Şewqî Şemmo, "Şêx Fexirê Adiyan: Qewlên wî yên Pîroz û Felsefa wî", *Şêx Fexrê Adiyan Fîlosof û Xasê Ola Êzdiyatiyê*, weş. Dengê Êzîdiyan, Oldenburg 2009.

Kara, Sabah, *Baba Tahirê Uryan*, Nûbihar, Stenbol 1998.

Kavalcı, Ömer, *Baba Tahir Uryan ve Şiirleri*, Kültür Bak. Yay. Ankara 1989.

Korkusuz, Şefik, *Arşiv Belgelerinde Son Devir Diyarbekir Uleması*, İst. 1996.

Tezkire-i Meşayîh-i Amid, weş. Kent, İst. 2004.

Kreyenbroek, Philip G. , *Yezidism – Its Background, Observances and Textual Tradition* (Lewiston/Queenston/Lampeter: Edwin Mellen Press, 1995).

Kreyenbroek, Philip, Xelîl Cindî Reşow, *Tanri ve Şeyh Adi Kusursuzdur Yezidi Tarihinden Kutsal Şiirler ve ve Dinsel Anlatılar*, (wer. İbrahim Bingöl), Avesta 2011.

Kurdo, Qenat, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, weş. Ozge, Ankara 1992.

Lazerîv, *Tarîxu Kurdistan* (Werger Ebdî Hacî), Spîrêz Hewlêr 2011.

el-Meranî, Muhammed Ronî, "Bilinen En Eski Kürt Alfabesi", (wergera ji Erebî: Haşim Özdaş), *Kürt Tarihi*, j. 5, s. 2013, İstanbul.

Mermer, Ahmet (L. Alıcı, M. Eflatun, Y. Bayram, N. K. Keskin), Eski Türk Edebiyatına Giriş, Akçağ, Ankara 2006.

Mînorsky, V., "Kürtler", *İslam Ansk.*, weş. Milli Eğitim Bakanlığı, İstanbul 1993.
"Baba Tahir", *İslam Ansk.* , weş. Milli Eğitim Bakanlığı, İstanbul 1993.

Mayî, Enwer, "Evdisemedê Babek", *Ronahî*, j. 5-6, Bexda 1961.

CamScanner ile tarandı

Mela Fudayl, *Tercemetu Hali Ceddina'l-A'la Mela Xelîl es-Si'rdî*, Nusxeya fotokopî ya destnivîsê, Pirtûkxaneya A. Adak a taybet.

Mestûre, Mahşeref Hanım, *Divan*, (Amd. Şêx Yehya M'rîfet), Tehran 1887.

el-Mevlevî, Tahir, *Edebiyat Lügatı*, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994.

Mewlewî, Celaleddîn Muhemmed b. Muhemmed, *Mesnewiyî Me'newî*, Întîşaratî Hermes, Tehran 1337.

Muderris, Mela Ebdulkerîm, *Dîwanî Mewlewî*, Bexda 1961.

en-**Nibtî**, Ebûbekir Ehmed b. Elî b. Wehşiyye, *Şewqu'l-Musteham fi Me'rifeti Rumûzi'l-Eqlam*, (http://manuscrit-spirituel.blogspot.com.tr/2013/06/blog-post_1838.html)

Okay, Orhan, "Edebiyat Tarihi", *DIA.*, X/403-405.

Oxînî, M. Asim, *Birketu'l-Kelîmat*, nusxeya fotokopî ya destnivîsê, pirtûkxaneya A. Adak a taybet.

Öpengin, Ergin, "Kadim Kürtçe'nin İzinde Tevatür ve Temellük Kıskacında Kürt Kültür Tarihçiliği", Kürt Tarihi, s. 2013, j. 11, İstanbul.

Pakiş, Ömer, "Molla Halil Siirdi", *DIA*, İstanbul 2005, X/403-405.

Pala, Iskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Weş. L&M, St. 2003.

Perhîzî, Ebdulxaliq, *Wezni Şî'rî Kurdî*, Zeman, Tehran 1385.

Pirbal, Ferhad, *Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, Aras, Hewlêr 2000.

Pîremêrd, *Guldesteyî Şu'erayî Haw'esrim*, (Amd. Elî Kemal Bapîr) Wezaretu's-Seqafe we'l-Î'lam (Wezareta Çand û Ragihandinê), Silêmaniye 1969.

Qedrî, Mamoste, "Helbestvanên Kurd Heta Baba Tahir", Bîr, hj. 4 (http://www.kovarabir.com/mamoste-qedri-helbestvanen-kurd-heta-baba-tahir/).

Rûhanî, Baba Merdûx, *Mêjûy Nawdaranî Kurd*, (wer. Macid Merdûx Rûhanî), weş. Akadîmyayî Kurdî, Hewlêr 2011.

Sadînî, M. Xalid, *Mela Huseyn Bateyî Jiyan, Berhem û Helbestên wî*, Nûbihar, Stenbol 2010.

"Feqiyê Teyran'ın Mezar Taşı Bulundu", http://www.ilkehaber.com/haber/feqiy-teyranin-mezartasi-bulundu-27816.htm

Salname-i Vilayet-i Bitlîs, Birinci Def'a. 1310.

Samur, Aziz, *Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê, Zanîngeha Mardin Artukluyê*, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Teza Neçapkirî, Mardin 2012.

CamScanner ile tarandı

Saraç, M. Yekta, *Eski Türk Edebiyatına Giriş: Biçim ve Ölçü*, Anadolu Ünv. Yay. , Eskişehir 2011.

Rohat, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi*, weş. Deng, İst. 1991.

Sağnıç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2000.

Samî, Şemsedîn, *Kamûsu'l-A'lam*, weş. Kaşgar, Ankara 1996.

Seçkin, Bekir Sami, *Başlangıçtan Günümüze Siirt Tarihi*, İst. 2005. 272.

Selefî, Hemdî Ebdulmecîd; Doskî, Tehsîn Îbrahîm, *Mu'cemu'ş-Şu'erai'l-Kurd*, Spirêz, Erbîl 2008.

Iqdu'l-Ciman fî Teracimî 'Ulema we Udeba el-Kurd we'l-Mensûbîne îla Qura we Mudun Kurdistan, Mektebetu'l-Esaletî we't-Turas, 2008.

Siwadî, *Leyla û Mecnûn*, Amd. M. Reşit Irgat, Selman Dilovan, weş. Nûbihar 1999.

Siyahpoş, *Seyfu'l-Milûk û Bedî-ul Cemal*, (Amd. Bedirxan Amedî), weş. Nûbihar, Stenbol, 2011.

Şêx Fudayl, *Tercemetu Hali Ceddina'l-A'la Mela Xelîl es-Si'rdî*, Nusxeya fotokopî ya destnivîsê, Pirtûkxaneya A. Adak a taybet.

Şêx Ehmedê Feqîr, *Dîwan*, Nusxeya Fotokopî, Pirtûkxaneya Taybet a A. Adak

Şûşî, Seyfî, *Helbestvan Seyfiyê Şûşî û Berhemê wî*, Amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, Muhsîn Îbrahîm Doskî, Weşanên Kovara Metîn, Dihok 1999.

Tahir, Bursalı Mehmet, *Osmanlı Müellifleri*, Matbaa-i Amire, İstanbul 1334.

Teremaxî, Mele Elî, *Serfa Kurmancî*, Wergera ji tîpên Erebî, Zeynelabidîn Zinar, Pencînar, Stockholm 1997.

Telli, Mela Ebdullah, "Kund ji Birayê Bazê ye", *Nûbihar*, j. 65, s. 1998.

Temo, Selim, *Kürt Şiiri Antolojisi*, weş. Agora, İstanbul 2007.

Turan, Abdulbaki, Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi, Nûbihar, Stenbol 2012.

Teyran, Feqî, Amd. M. Xalid Sadinî, Nûbihar, 2003.

Varlî, Ebdullah M., *Dîwan û Jînewarî ya Ahmedê Xanî*, weş. Sîpan, İstanbul 2004.

Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî yêd Mayî, weş. Sîpan, İstanbul 2004.

el-**Xanî**, Ebdulmecîd b. Muhemmed, *el-Hedaîqu'l-Werdiyye fî Heqaîqî Ecîllai'n-Neqşebendiyye*, Camî'u'd-Derwîşiyye, Dîmeşq, bt.

Xeznedar, Me'rûf, *Mêjûy Edebî Kurdî*, weş. Aras, Hewlêr 2001.

"Nihêrînekî Gelemperî li Edebiyatê Kurdî", *Yekemîn Rojên Edebiyatê li Diyarbekirê*, weş.Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2004.

CamScanner ile tarandı

Yaşın, Abdullah, *Tarih Kültür ve Cizre*, weş. Kent, İstanbul 2011.

Yıldırım, Kadri, *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, İst. 2011.

Ehmedê Xanî Külliyatı Nûbehara Biçûkan,weş. Avesta, Stenbol 2008.

Tiba Melayê Erwasî, Weş.Enstîtuya Zimanên Zindî, Stenbol 2013.

"Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni", *Kürt Tarihi*, j. 5, İstanbul 2013.

"Baba Tahirê Uryan, Hayatı, Eserleri ve Görüşleri", *Mulemma*, j. 2, Mardin 2013.

Yılmaz, Serdar, Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2013.

Yûsif, Ebdureqîb, *Dîwana Kurmancî Şaîrên Klasîk ên Kurd* (Latînîzekirin: Ziya Avcı), Diwan, Stenbol 2012.

Yüksel, Müfid, Feka Teyran'ın Mezar Şahidesi, http://mufidyuksel.com/category/tarihe-notlarim

Zeki, M. Emin, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, (er.: V. İnce, M. Dağ, R. Adak, Ş. Aslan), Nûbihar, Stenbol 2010.

Meşahir-i Kurd û Kurdistan, Weş. Apec. 1998.

Zêbarî, Xalidê, Sîseban, Nusxeya Ma'rûfê kurê Şêx Hacî Muhammed Beşîr el-Xalidî el-Basretî, 1996.

ez-Zîbarî, eş-Şeyx Muhammed Şefiq, *el-Ehwalu'd-Durriye we'l-Exbaru'l-Miskiyye fi's-Silsileti'z-Zîbariyye*, Musul 1935.

Zinar, Zeynelabidîn, *Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Stokolm 1991.

Zivingî, Mela Ehmedê, "Hinek Agahdarî li Ser Tarîxa Jiyana Mela", *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, (wer. M. Emîn Narozî), Avesta, Stenbol 2013.

Zozanî, Wisif, "En Eski Kürt Alfabesi", *Gazetekurd*.com, 01. 10. 2012.

CamScanner ile tarandı

CamScanner ile tarandı

Perspektîfa akademîk a li ser Edebiyata Kurdî ya klasîk û di vî warî de kirina lêkolînên zanistî rasterast û di pileya yekem de daxwaza zanîna kîtabiyat û lîteratura tarîxa edebiyatê dikin. Herweha li ser esasên agahiyên di vê lîteraturê de bi şêweyekî sîstematîk tesbîtkirina qonax, kesayet, metin û ekolên tarîxa edebiyatê jî di pileya duyem de cih digire. Piştî vê merheleyê jî, vê carê wekî pileya herî dawî, bi awayekî spesîfîk û bi hûrgilî û bi arîkariya zanistên teorîk ên edebiyatê dor tê ser vekolînên li ser metnên edebî.

9 786055 053048

CamScanner ile tarandı